# ZIMAN Û ÇALAKIYA RASTIYÊ

**Abdulah Ocalan**

# ZIMAN Û ÇALAKIYA RASTIYÊ

## Abdulah Ocalan

**Werger: Nusret Kurt-**
**Reyhan Îke**

Ziman û Çalakiya Rastiyê
Abdulah Ocalan
Wergera ji Tirkî: Nusret Kurt- Reyhan Îke

Weşanên YRD
Ciyê çapê: Çapxaneya Ronahî
Mêjûyê çapê: Reşemî 2006

## NAVEROK

**Têbîniya weşanxaneyê**

**Gotina yekem**

**Azadî di zaroktiyê dest pê dike**

**Serhildana yekem**

**Amed**

**Artêşa bi yek kesî**

**Şerê hestan**

**Tevgera lêdana mezin**

**Xiyanet têk diçe**

**Mem û zîn**

**Şahmeran**

**Bi qandî ez bi ser dikevim gel bi serdikeve**

**Giyana miriyan**

**Li dûv bêmiriniyê**

**Çavê mezin**

**Paşgotin**

“ min wêneyek çêkir
Min xwast her lê were mêzandin
Ez bûm dengek
Min xwast her were bihîstin
Ji welatê xwe re
Ji cîhanê re
Ji gerdûnê re”

## Pêşgotin

"Ziman û Çalakiya Rastiyê" bi armanca ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdulah Ocalan bi zimanê xwe, xwe îfade bike hate amadekirin. Li hember pênaseya gelek mirovan weke encama pêwîstiya pênaseya bi zimanê xwe ev xebat derkete holê.

Ji bo Abdulah Ocalan, gelo mirov dikare bibêje, kesayeta ku ji bo guhertina rastiya ziwa ya dîrokê û ji nû ve zîndîkirina wê, hebûna xwe derxistiye holê û ew herikîna ku ji aliyê hêzên mezin ve hatiye diyarkirin guhertiye? Yan jî, ew li dij sîstemeke xwedî bingeheke dîrokî ya bihêz milîtaneke ku xwe bi şêwazeke zirav di kesayeta PKK'ê de pêk aniye? yan jî lihevhatina çalakiya hebûna bihêz a takekesekî bi rewşa hebûna dîrokê ve ye? Di sedsala em tê de û li erdnîgariya em lê dijîn ew, reberekî xwedî afirandina têkîliya di navbeyna takekes û dîrokê de ye? Ev pêşniyariyên wisa dikarin werin zêdekirin û dema ev yek were kirin jî dê eşkere diyar bibe ku em bi takekesekî cewaz û awarte re rû bi rû ne. Tu pênaseyên felsefîk an jî darezîneke teorîk bi serê xwe xwedî wê wergiriyê nîne ku Abdulah Ocalan hilde nava xwe.

Dîsa jî dema ku mirov bi feraseta dahurandineke rast bi ser mijarê de biçe, gelek xal dikarin werin ronîkirin. Em dibêjin dikare ronî bibe; ji ber ku bi rastî jî Abdulah Ocalan, hînkerî û felsefeya wî hîna nehatiye ronîkirin. Heke mirov bi gotineke wî bixwe îfade bike "eşkere li holê ye, li pêş çavan e" lê wisa eşkerebûyîna wî nayê wê wateyê ku ew hatiye fêmkirin. Niha di vê demê de, li hember rastiya Abdulah Ocalan mirov tenê bi bandor dibin û mecbûriyetên encamên vê bandorbûyînê dibînin. Ji pirsên weke çawanî, bi kîjan

bingehê û çima pêkhatina wê re hîna bersivên pir rûxarkî têne dayîn. Ji ber ku hîna teoriya vêbûna xwe temam nekiriye û weke pîvaneke rûyê erdê xwe pêşkeş nekiriye.

Li hember rastiya rûyê erdê rewşa Serokê Giştî yê PKK'ê Abdulah Ocalan, rexmî ku yek ji rewşên tevahî takekesan e, ji hemûyan cuda ye û xwedî bandoreke cewaz e. Ev nirxandin, tenê mirovên Kurd ên ku li erdnîgarên cewaz dijîn wernagre. Li gor pîvanên gerdûnê rastiya dijberiyekê mijara gotinêye ku, di wateya asta şaristaniya civakê yên weke etîk, felsefîk û teknîk ûhw. de pêkhatina wilfa redkirinê ye.

Dema mirov kesayet û gavên dîrokî yên mirovan dinirxîne, pêwîste zarokatiya wan baş were lêkolînkirin. Ji gelek aliyan ve girîngiya vê rastiyê heye. Ya yekemîn, her zaroktiya bi her aliyên tên bibîranîn û bi taybet ên nayên bi bîranîn ve; serdemeke bingeh a gihandinê û amadekariya gihînê ye. Aliyên ku her dem tên bibîranîn û yên nayên bi bîranîn ve û aliyên her dem tên ser ziman, di pêkhatina kesayet de xwediyên bandoriyên mezin in. Aliyên bi bîr nakevin, di hindek serdemên dîrokî yên diyar de sedemên tevger û bizavên kesayetan eşkere dikin. Derveyî vê aliyên ku her dem pêwîstiya eşkerekirinê pê heye jî, ji ber ku rast û zelal nehatine fêmkirin, her dem pêwîstiya dubarekirinê pê tê dîtin. Di vê derbarê de hindek bîranînên ku her dem Serokatî tîne ser ziman jî, jixwe di bingehê israra dubarekirina vê de gumana rast netêgihiştinê heye.

Kurd ji vê aliyê ve xwedî pirsgirêk in. Bi taybet di çerçoveya pêkhatina bûyerên dîroka nêz de, tekoşîna ku di bin rêbertiya serokatiyê de pêşketiye û pêşve diçe de, tê destnîşankirin ku sînorên netewî yên heyî divê werin parçekirin. Qada navnetewî, her ku diçe pirsgirêka Kurdan ji ya Kurdbûnê derdixe û weke pirsgirêkeke cîhanî disepîne. Hemû diyarde destnîşan dikin ku dê ev yek bi serkev e. Lê ev serkeftin dê ya kê be, yan jî dê ya Kurdan an jî ya dijminan be, bi nîşandayîna demê ve girêdayî ye. Dema em vê yekê têdigihên em dibînin ku ev yek ne mijara kesayet an jî takekesekî ye. Rastiya Abdulah Ocalan weke rêberekî netewî jî nirxandin pir teng dimîne. Hemû diyarde raberî me

dikin ku, ev yek dê damgeya xwe li serdemeke diyar a dîrokê bixîne. Bi kêmanî pêşveçûyînên ku ji bingehê derketina wî têne hêvîkirin dê gelekî balkêş be û di aliyê encamên dîrokî de jî dê gelek nakokiyên sedsalan û heta hezar salan ji binî ve çareser bike. Ev yek dê bi bahozên civakî yên mezin ve pêk werin. Vê yekê ji îro de destpêkiriye.

Hemû diyardeyên felsefî û bi taybet pêşveçûyîna dîrokî ya PKK ê vê rastiya Abdulah Ocalan eşkere diyar dike. Dema mirov weke yekbûneke bisînor a parçeyê gerdûnê lê temaşe bike, dê bibîne ku Ew pêtir tê fêmkirin. Fêmkirina rastiya Wê, tê wateya fêmkirina bi vaceke rastiya gerdûnî fêmkirina hemû nakokiyan, li gel tevahî binkeyên wê dîsan tê wateya lihevkirina civakî ya awarte û bipergaliya wê. Di heman demê de ev yek pir eşkere dijbertiya gerdûniyê û yekîtiya wê ya veşartî derdixe holê. Ji bo fêmkirina vê jî, bi gotina guncaw di çerçoveya sîstema îroj de hêza fêmkirina mirov têrê nake. Bergeha Wî, kirdeyatiya wî bi xwe û xweseriya takekesî divê pir baş binirxîne û ji bo vê jî derveyî tevahiya kirdeyatiyên derbasdar, lê dîsan jî li gor "guncawiya pîvanan (norm)" û divê weke rastiya ku ji hundirê "vê" cîhanê derketiye were dîtin. Ev helwesta li gor vê bergehê, nirxeke weke pesnandin û pîrozandina Abdulah Ocalan di nava xwe de ranagre. Ne kesê ku dibe mijara bergeha me, ne jî rewşa wî ya berhemdar misoger pêdîviya helwesteke wisa nîşan nade. Berovajiya vê, weke ku bi xwe jî gelek caran aniye ser ziman, rastiya wî encax bi helwesteke rexneyî pêtir dikare nêzî rastiyê were nirxandin. Encax hema piştî vê yekê, pêwîstiyeke bingeh derdikeve holê ku, ew jî ev e: kesê ku bixwaze Serokê Giştî Yê PKKê Abdulah Ocalan li gor guncawiya normên derbasdar binirxîne, li gel dîtina xwe xapandinê, dê xwe ji dijberiya pêwîstiya pêvajoya şoreşgerî rizgar neke. Dîsan sedema vê jî, ji ber wê sedemêye ku, rastiya kesayeta wî bixwe, li dijber rastiya asta civakî û dîrokî ya ku xetimiye û zerar dide pêkanîna redkirina şoreşger a wergiriye. Rewşeke wisa ya redkirinê, li gor zagonên civakî-dîrokî ya hawirdora redkirî nirxandin jî, di destpêkê de heke bigihîne xapînoka

mehkumkirina rastiya ku bûye mijara gotinê jî; pir eşkereye ku, fêmkirina mijarê ne, di serî de mehkumkirina, kirina nirxandinê tîne. Di vê wateyê de, bi tevahî fêmkirina rastiya Ocalan, bi rastî jî xebateke sotîner e û di pîvana zehmetiyên pêvajoya pêkhatinê de fedekariyê pêwîst dike.

Rastiya Abdulah Ocalan, ji hevkomiya lîteratûra teorîk a ku bi xwe aniye ser ziman dûr e. Darezîneke wisa weke ku dê di fêmkirina bûyerê de kêmaniyan derbixe holê, dê mirov bigihîne encamên xapînok jî. Pirtûk hindekî jî ji ber vê sedemê navê "rastiya ziman û çalakiyê" hildigre. Abdulah Ocalan, ji çalakiyên takekesî-dîrokî razber bi dest girtin, weke ku di hemwateya redkirina rastiya wî de ye, dibe helwesteke betalkirina xebata çavdêrekî ji rêzê jî. Berovajiya vê, ev yek dikare destpêkê bi şêwaza çalakiya wî bi dest were girtin. Aliyê wî yê ku bi teorî hatiye ser ziman, nikare wergiriya kêmekî çalakiyên wî jî eşkere bike. Di aliyê dîtirê de tiştên ku weke teorî hatine ser ziman weke parçeyeke çalakiyên wî hene. Bi çalakiyê re ji bûyîna diyaletîkê wêdetir, yek ji naverokên çalakiyê ye. Ya rast, sedemên bingehîn ên ku ew dixwaze bi helwestên olî yan jî bi têgehên olî eşkere bike ev e. Sedema herî bingeh a nirxandina wî ya weke xweda, ji zehmetiya fêmkirina wî çavkaniya xwe digre û weke ku wî jî di ev pirtûka xwe de diyar kiriye, tiştê ku tê xwastin bi xwedatiya wî were diyarkirin, ji mîlîtaniya wî pêtir tu tiştek nîne. Tevahiya van rastiyan, belkî jî destnîşana rastiya nîqaşeke mijara gotinê dike, ev jî rewşeke wisa ye ku hînkariya wî, li gor guncawî û wergiriya çalakiyên eşkerebûyî hîna xwe sîstematîze nekiriye û hîna weke têgeheke serbixwe ku çalakiya xwe eşkere bike derneketiye holê.

Di vê mijarê de rastiya rojaneyiya wî û ya dîrokî, bi piranî di zik hev de heman tişt bin jî, pirsgirêka ji hev cudakirinê heye. Ji bo bi sînorên tûj di nava diyalektîka jiyana rojaneyî de pêk were, di serî de divê kesayet li hember xwe rast û têra xwe be. Di aliyê bûyîna navendeke rêxistinî de encamên dîrokî yên vê rewşê di wergiriyeke bêyî hêvî de derdikeve holê. Ev yek, weke ku di aliyê mirovahiya roja îro de nîşana neyînî ya asta civakî-dîrokî dide

diyarkirin, di aliyê dîtir de dema rastiya Ocalan bi dest tê girtin ji bo li ser rawestîna vê neyîniyê hêviyên mezin tên destnîşankirin. Di nava ev tevlîheviya nûjen de, ji bo ku mirovê ku parçebûyî, cewhera xwe ji nû ve kifş bike û ji bo çalakbûna vê cewherê ya li ser cîhanê bikeve nava tekoşînê, weke naveroka giştî ya felsefeya Abdulah Ocalan cihê xwe digre.

Rastiya Serokê Giştî yê PKKê Abdulah Ocalan, di aliyekî de weke ku ji bo her kesê dixwaze bibe xwedî helwesteke şoreşger bûyereke hînker a xwedî pêwîstiya fêmkirinê ye, di aliyê dîtir de, weke rastiyeke sotînêr a ji agir, bûyereke xwedî pêwîstiya fêmkirin û amadekariyeke baş e.

## Gotina Yekem

Jiyana ku ez tînim ser ziman, kesên ku weke strana azadiyê fêm bikin weke şervanên semyan dikarin bersiv bidin. evdal jî, di bin lingan de tên cûyîn û diçin.

Lê her kes fîgureke vê pirtûkê temsîl dike. Li vê derê tu kes li derve nemaye. Bila dilê me şad be ku, me cihekî wisa daye hêzên dijberî xwe ku bêhn bi bêhn e. Li gor vê pirtûkê, çar gaviya hêzên dijber peroşmend e. Ji devên paşeyên olîgarşîk agir difûre. Ev jî pêşketineke baş e. Yên ku di bin lingan de diçin hene. Ev jî, rastiya pirtûkê ye.

Oblomov hene, evdal hene, cihê wan jî di vê pirtûkê de heye. Azar, êş, jandarî ev jixwe pêwîstiyên jêneger ên pirtûka me ne. Hezkirinên pirtûkê jî pêş dikeve. Divê ev jî hebe. Bi qandî dînemêr û şêtan; hişê mezin û vac di nava hev de ye.

Û heke hun baldar bin, Li Tirkiyê û Kurdistanê hema her kes vê yekê dijî. Di vê wateyê de hema her kes bi hilke hilk vê dilêyîze. Di berfê de di qiyametê de leşker çawa dilêyîze? Kuştinên kujyar nediyar çawa tirsnak pêk tên? Bêşên Randxwerên şer çawa li dûv planên xayin in, dişewitînin û dişehitînin? Di zindanan de çawa deh hezaran dixin bin îşkenceyan? Şervanên li çiyê çawa jiyaneke ku nedihiziriyan bi azweriyeke mezin, him jî bi teşeyeke jandar dijîn?

Viyanek vê derdixe holê. Yê ku vê dide jiyîn ez im.

Yê me romanek e, tê jiyîn lê hîna nehatiye nivisîn. Yê xwedî hîş di vê derê de cihê xwe baştir diyar dike.

Tê jiyandin.

Hemû tedbîrên me girtine, bi qandî hêza vac, hêza viyanê ye jî. Di wê astê de ye ku dikare bi her kesî rol bide lêyistin.

Bingehê vê romanê di 1970’an de hate avêtin.

Destpêk bû. Xwedî pêvajoyên jandar û jiyanîger bû.

Lê dema em li nîva 1990'an dinêrin, roman bûye malê hemû rastiya civakan û rastiya olîgarşîk. Her kes bi hilkehilk biriye rastiya jiyankirinê û niha jî em berbi encamê ve diçin.

Hun hemû kes dizanin ku hun xwe ji vê rizgar nakin. Tedbîrên ku min girtine, ne olîgarşî ne jî dostan rihet berdidin. Dînemêrî, ji bo hindekan qedînêr e. Ji bo hindekan dînoker e. Hindekan ji êşan berbi êşan, hindekan jî dibe dawiyeke jandar. Hindekan jî radike coşeke mezin û tolê dide hilgirtin.

Ya girîng ew e ku mirov vê pêvajoyê bi her kesî bide jiyandin.

Ev hêza viyanê, hêza anîna rê ye.

Heke em bijîn, em dê raberî we hemûyan bikin ku çawa em didin jiyandin.

Hindek Serok hene, xeta siyasî diyar dikin. Li gor xwe pêvajoya tekoşîneke xeta siyasî heye. Ya me tenê wisa nîne: xet heye, lê xeta me ya siyasî-pratîk, weke ya gelek partiyan xeteke pêkanînê ne, dişipe planeke romanê. Ewqas di nav yekbûyîna jiyanê de, bi jiyana paşverû û xeta pêşvebirinê re ketine zikhev û tehrîk dike.

Her kes radibe ji piyan.

Ya rast, şêwaz û uslubê me êdî ev yek girtiye.

Ji ber vê yekê, tiştê hun dijîn divê hun bi vî alî jî bi dest bigrin.

Paşeyên binkeya olîgarşîk ên ku agir ji devê wan dibariya çawa ketin rewşê? Pirêjineke bûrjuva dema li dijberî me bû serokwezîr çima rabû çar gavan? Tu kes nikare bigre. Her weke di nava romana me de xistin nava rewşekê. Ji beriya wê tu şarezayî û taybetmendiya wê tûne bû. Çima bi me re dikeve şer? Wisa her alî bi carekê ve radibe ji piyan. Malên gelê me bi ser serî de hatin hilweşandin, bi hezaran gund hatin şewitandin. Çima?

Janên kesên ku gundên wan hatine şewitandin çine? Nifûsa Amedê ji beriya vê bi çend salan 300.000 bû, niha du mîlyonan derbas dike. Ev hêza mezin a pirtûka me nîşan dide. Ev yek ji rast bi bandora min derkete holê.

Gundiyên ku koçberî Amedê bûn niha êşên wan çine? Li

Amedê birsîbûn, serma niha çi ji wan dike? Di menzelekê de çawa 30 kes diraze?

Zindan hatine dagirtin, bi heman teşeyê bi ser re difûrin.

Bi hezaran kujyar nediyar hene, komkujî hene û dîsan termên hatine parçekirin hene. Kesên ku bi îşkenceyên tirsnak hatine kuştin hene. Ev bi qandî ku di romanê de neyên jimartin zêde ne. Vaye, yê ku sermaya hewnak a çiyê dixwin hene, yên ku lingên xwe parçe parçe dikin, dîsa yên xwe bi mayinan parçe dikin hene.

Çima?

Vîn heye, vîna min heye.

Kî, çiqas, çawa tê qanehkirin? Yek jî heke hun bixwazin bi vî alî fêm bikin, gelek tişt hene. Mînak, çawa min dikarî ez wisa bibandor bikim? Ji zarokekî bêhêz ê gund çawa gihiştim kesayetê herî bandordar ê welat an jî yê welatan?

Em dê çawa bijîn?

Û ez hîna jî têr nebûme. Rexmî ku min ewqas serûbinê hev kiriye, tu tiştek ne weke daxwaza min e û li xweşiya min naçe. Ez nikarim têr bibim. Ma ez dînemêrek im, îlahek im, an jî maceraperestekî mezin im? Dehayekî mezin ê polîtîkayê me?

Şervanê gel im?

Divê hun ji bo fêmkirinê hewl bidin. Me çêkir, çêbû. Min bi rêk û pêk kir, hindekî bi hilkehilk min pêk anî. Bi hindek xebat vaye ev pêşketin derdikevin holê. Berê tu kesî cidî nedigirt, lê niha tu kes ji bandora wê xelas nabe. Ne dijmin ne jî dost xelas dibe. Hemû bûne dînemêr. Ez dibînim, her roj derdikevin pêşberî min. Çavên wan beloq bûne, ez dê hîna jî ji hev vekim.

Ez di nava hewldana tolhildana mezin de me. Ji ber ku ji xirabiyê, ji kîretiyê tol girtin hevkomiya jîna min e. Li dij hemû paşverûtiyan ez tirsnak im.

Divê mirov bizanibe encam derbixe. Ev tê çi wateyê? Hindekan ji ber jiyana wan a heyî ji hizirandinê pêtir divê mirov bi hezar caran bikuje. Pirseke ku ez her dem ji xwe dikim heye. Carna dema ez derdikevim nava gel ez dibêjim divê ez “nîvê van bi şûr bibirim. Bêguman wateya wê ev e: divê ez xirabiyên wan bibirim, kîretiyên wan bibirim,

ketîbûna wan bibirim. Heke yê berxwe bide peyda be, divê ez laşê wî jî bibirim. Vayê hêrs û îdiaya mîlîtan...

Ez li zilamên weke pîrêjinan û jinokan dimêyzînim. Hezar caran bi ser de eciz dibim, lê lenet tînim. Ev di min de dibe hêrs, xwe diavêje mejiyê min û ji wir reng dide vîna min.

Aliyên we yên wisa hene? Eşkereye, ez hemûyan pêk tînim. Ji kesayeteke herî bêhêz, herî qels û yê ku her kes laqirdiyên xwe pê dike, niha weke ku henekên xwe bi her kesî bike, jiyaneke romanî didime jiyandin.

Yê xwedî hêz kî ye?

Û min hîna tola xwe hilnegirtiye, vaye min hindekî girtiye. Û divê ev yek bi bêzirav, pasîf û qediyên derveyî min re were pîvan. Di vê pirtûkê de ji wan re jî cih hatiye dayîn. Lê weke ku xwedê bela xwe dayî!

Vekiriye.

Xistina min a bin kontrolê ne gengaz e. Bêbandor hiştina min gengaz nîne. Ji ber ku, yê herî mezin bandor kir ez bûm.

Xweziya ez hindekî weke yên din ciwan bûma û bi ser de biçûma...

Gelê Kurd rabûye fedakariyeke mezin. Berê xwe ji ber alîkariyeke pênc qirûşan jî dida alî. Niha her tiştê xwe pêşkeş dike. Dîsa jî ez dibêjim pênc pêran nake. Divê hîna cuda û hîna cewaz bidin.

Û ev dibe jî.

## Azadî di zarokatiyê de dest pê dike.

Hîna tê bîra min: em li ber siya mizgeftê bûn. Min vegot, vegot... kalo serê xwe vedigerand. Digot; “kurê min, em weke darên ziwa ne. Ma tê niha me şîn bikî?

Ev yek dibe bîranîna min a yekem û êz hîna ji bîra nakim. 1994’an de helbestvanek hatibû gel min, gotineke min anî bîra min: got “di kevir de şînbûna gulê”, yanî ez weke guleke di kevir de şîn hatime, yan jî ez dê bibim.

Ji dara ziwa şînkirin, di parçeyeke kevir de weke gulekê şîn hatin...

Hun hêrsa me dizanin.

Azadî di zaroktiyê de destpê dike. Ji berê de her min dixwast em bi hev re bimeşin. Di xebat û lêyistokên zarokan de, bûyereke ku herî zêde ez pê dilxweş dibûm, pêşxistina meş û xwepêşandana zarokan bû. Ji bo ku ew lêyîstokên tên zanîn ez tiştekî biafirînim, min ji hezar çeman av dida hev. Lê bi hev re. Bi tenê lêyîstin nîne. Min gelek lêyîstik derdixistin. Bi şev û roj min ew di tevgerê de digirtin. Jixwe di wê aliyê de ez hindekî navdar bûm. Her kesî zarokên xwe vedişartin. Digotin: “radestî vî nekin”. Piştre Kemal Burkay jî heman tişt got. Lê hîna wê demê jî yên ku wisa digotin gelek bûn. Ez weke nêçîrvanan li dor malên wan digeriyam. “dîsan” digotin, “hatiye dê bi hişên zarokên me bilêyîze”. Gelek bûn û hindekan zarokên xwe kirin fermanber (fermanber). Lê, ez dê wan dîsa jî bigrim. Heke em rojekê herin gund ew zarokên ku ji me veşartin ez dê bigrim hemberî xwe. Ez dê dîsan bibêjim “werin”. Ez dê wan li meydanekê bicivînim û wan fêrî lêyîstokan bikim.

Vaye, min bi qandî dixwast min nekarî ez bi zarokan re jî bilêyîzim. Azadî nîne. Ya me dixwast ne şer bû, tenê

lêyîstikeke bi zarokan re bû. Lêyîstikên erzan: li çiyan meş, komkirina pîvokan, komkirina gîha, nêçîra civîkan... hewla me hemû ji bo vê bû.

Me pir kêm dikşandin lêyîstokê, niha jî tên.

Min got, azadî di zaroktiyê de destpê dike.

Ez pir li çiyan dimam.

Tiştên xwarinê min didan hev, nêçîra civîkan dikir... ya rast zêde civîkên nêçîrê jî nebûn, lê min ewqas kevir diavêtin ku... Bi qandî ku tê bîra min li banî min li çend civîkan da. Wisa min xistin erdê. Xefikên ku min çêdikirin hebûn. Min gelek tivîlk nêçîr dikirin. Bêguman, çar pêncên wan bi hev re nêçîrkirin, serkeftineke mezin bû. Û êdî ew min bi xwe dipijandin. Vê yekê bala zarokan kişand. Li dûv civîkan min ew hetanî dolê dibirin. Û ji wan civîkan min her parçeyek dida yekî.

Ew dik hîna di bîra min de ye. Piştî ku min ew civîk nêçîr kirin min xistibûn nava kirasê xwe. Bi çar çavan min çavdêriya der û dora xwe dikir. Ji ber ku dewlemendiyeke mezin di berîka min de heye! Dikarîbûn min bigrin. Yek hema hindekî bibêje “were” ez dê hema xwe biavêjim, derfeta girtina min nîne. Min wisa di dilê xwe re derbas dikir: “ne malbat, ne gundî dê min negrin... ez dê weke zanîna xwe van civîkan bipêjim...”

Li pêşiya gundê me darek hebû. Me jê re digot tavî, yanî dara tavê. Dareke gelekî mezin bû. Belkî jî temenê wê sed sal didît. Di germa havînê de ez her dem diçûm bin siya vê darê. Bi qandî ku min dinasî wisa sê darên tavî hebûn. Her sê jî hîna ji bo min pîroz tên.

Ez li siya yekê ji wan bûm. Wisa germa havînê jî lê dida. Digotin, “teknîk tê”, “li avê digeriyan”. Bêguman dilopeke avê ji bo min di balkêşiyeke awarte de bû.

Heta hindekî ji wir wêdetir, cihekî weke şikeftokan hebû. Min navê wê ji bîra kiriye. Di biniya wir de dilop bi dilop av kom dibû. Di germa havînê de satilek av heye. Gihiştina wê, bêguman dîsan balkêşiyeke awarte bû. Min xwe dirêjî dikir, pir bi zehmetî di nava şîkêran de wisa min xwe dikemişand, dema devê min bi wê avê diket, min dilxwaşiyeke mezin hîs dikir. Ew av hîna bi hemû zelaliya xwe di bîra min de ye,

vaye armanceke wisa ye. Piştî min ew teknîk jî dît, pêwîstiya li ser zêdekirina têgeha welat min wiha dît: li dijberî ev hişkahiya mezin mirov dikare çi bike? Gelo ev li kîjan aliyê gundê me ye? Ma av li dolê ye? Çawa dikare were meydana ev zewiyê han?

Erê, hindek avên dîtirê jî hebûn.

Lêgerîna avê girîng bû.

Wê demê av dikirin kupan û ez ji paleyê dihatim. Dema di germa nîvro de me wisa xwe diavêt, hemû armanca me wisa vexwarina taseke av ji kup bû. Ma te digot tas çibû? Tiştekî ku biniya wî zingar girtiye. Dîsan av misoger nîv bi nîv tije toz e. Lê hindekî di kup de cemidiye. Te digot qey cîhan dibû ya me. Piştî wê jî em rûdiniştin. Dîsa me gêrmiya sawarê ya tamxweş dixwar. Ew gêrmiya dayîka xwe ez gelekî diecibînim, ez bawerim hîna kesekî ku wisa gêrmiyê çêbike nîne, yan jî wê demê bi min wisa dihat.

Jiyan ew bû: tasek av, pariyek gêrmî.

Dîsa me curn digot. Dema mirov wateya xistina serê xwe ya nava curn û vexwarina avê nizanibe; bi çawabûyîna axên ziwa û çawaniya zindîkirina xeyala wê jî nizane. Dîsan bêyî ku di nava xwîn û xwîdanê de mirov palê neke, tama xweşiya gêrmiyê jî nayê fêmkirin.

...

Hevalbendiyên min ên jêneger hebûn. Li gor vê hevalên kedê yên baş bûn. Bi hev re baş nêçîrkirin, dîsan bi maran re eleqedarbûn, ji dolan xweş derketina girên bilind û di vê mijarê de zanîna wan a bi min re tiştên giranbiha bûn.

Hîna tê bîra min

Her tişt tê bîra min hemû rêkên ez tê re meşiya me, hemû kesên derketine pêşberî min. Em ji mala me bigrin, malên mirovan, dîsa coşên lêyîstokan, lêgerînên nan û lêgerîna dibistanê... pir balkêş e; baxçeyeke ji darê fistiq û zeytûnan hebû. Çûyîna me ya dibistana seretayî di rojevê de bû. Hewayeke wisa çêbûye ku dibêjin hun dikarin herin dibistanê yan jî ihtimala çûyînê heye. Berbi payizê em diçin. Wê demê dema min destên xwe sparte ew dara zeytûnê ez wisa hizirîm “gelo ev mamoste şêr in, piling in, gur in? Dê çi ji min bikin.” Wê demê rastiya mamostetiyê min wisa fêm

dikir: “ev dikarin çi ji min bikin? Kî ne ev?” û tu hîna neçûye dibistanê, tu tiştekî nizanî, bi taybet jî tu Tirkî nizanî...

Ez hesas bûm. Cîranekî me hebû, kesekî ez lê baldar bûm, ji min mezintir bû. Xwedî çekeke Qeredaxî ya ku ji sedsala 19. mayî bû, bostek dirêjiya wê hêbû. Destpêkê saçmeyên wê dadigirt pişt re barûta wê û wisa diteqand. Ew çek jî hîna di bîra min de ye, yekemîn çek a min nas kiribû.

Pînek hebû. Pir caran mar dikete vê pînê. Wisa marên reş bûn. Tam ji keviya dîwarê me û cîranan derdiketin. Bêguman ez dê bi mar re mijûlbama. Ji bo mar ez dibêjim cîranê xwe “dê ka were ji bo mar wê amrazê bi kar bîne”. Lê cîranê me ez zıkreşî kirim. Nîv demjimêrê wisa tetik radike li bendê disekine, disekine û disekine... “min got ev çi amraz e” li gor dilê min bi têrahî neteqand. Min got, em zikreşî kirin. Lê her dem jî li ser wî bû. Ji bo wî ev nîşana hêzê bû.

Me zêde wate neda çeka wî, lê hîna tê bîra min. Erê, wê çekê ew bihêz dikir, ji bo wî avantajek bû. Ji wê pînê jî marên wisa derdiketin. Di dîwarên malên me de hêlînên kevokan hebûn. Dema mar derdiket û xwe nîşanî me dikir em gelek peroşmend dibûn. Em derdiketin jor, me kevir radikirin, silum dianî. Ma dê tu bi çi li mar bixî? Ew şerekî pir rişt (cidî) bû. Ketiye pîne çend cêlik xistine zikê xwe. Dîsa di çavê diduyê malê de mar heye. Yanî ev di nava malê de ne. Tu di heman cihî de radizî. Ev tê wateya hawirdoreke pir rişt û xeternak. Vaye me dixwast em bikujin. Lê em zêde bibandor nebûn.

Piştî wê her ku çû me kuştina maran bi ser xist.

Azweriya kuştina mar her ku çû vegeriya rastiyê.

...

Di min de aliyê welatparêziyê xort e. Weke ku ez dizanim çawa bi xwezayê re tê jiyîn, bi hêsanî ez wê ji bîra jî nakim. Ez li mayîna li wan qiracan, dolan û xirbeyan tu caran eciz nedibûm. Lê gundiyên me yên wê demê her dem direviyan. Jixwe teşeyê reva ji wan axan qet li xweşiya min nediçû. Ji ketina wan a nava jiyaneke hêsan pir eciz dibûm û vê yekê her dem ez didam hizirandin. Ez her dem li ser wendakirina wan mirovan dihiziriyam.

Lê pirsa "ez bibim mirovekî çawa jî" ji bo min bêpersiv bû. Di vê derê de pirsgirêka hêzê derdikeve holê. Tu qebûl nakî, lê ma tê çi bikî? Vaye sebr, xwe gihiştandin, taktikên jiyanê pêşve xistin û yekemîn hesta dijminiyê. Min lê temaşe kir, dê malbat min mezin bike û ez dê bi malbateke mirovan re şer bikim. Ji bo ez pêşiya vê yekê bigrim, min bi kurê cîranan Hesen re têkîliyeke veşartî pêş xist. Ew li cem min pir bi wate ye. Ew, têkîliyeke pir girîng a taktîkî ye. Li dij paşverûtiya feodal têkîliyeke girîng e. Û min zarokên wê malê cîranan baş didîtin. Yên herî zêde ez dikişandim ew zarok bûn. Min zêde ji yên din hez nedikir, ji zarokên mirovên xwe jî. Min zêde bal nedida wan. Ev, girtibûna min a ji têkîliya feodal re û daxwaziya min a aştiya bi wan re nîşan dike. Pêşveçûyîneke awarte ye. Ez di temeneke pir zû de li dijber şêwazê şerekî ku Kurdistan qedandiye radiwestim û vê li gor xwe dadihûrînim.

Ez zarokbûm, min dixwast ez zarokan bi ser xwe ve bikşînim; ji bo ez bikaribim bibim civat, hindekî bibandor bim û ji bo ez kêmekî ABC yê fêr bibim. Hindekî bi nêçîriya ji çep û rast, bi berhevkirina pîvokên li çolê û heke hebe bi anîna hindek tiştên ji rez û bîstanan rêxistinkirinên min ên destpêkê destpêdikin. Û yek bi yek min li hemûyan belav dikir. Yanî dema zarokek tê derûdora min dizane li gel min tiştek heye. Erê, min xwe dikir çavkaniyeke dewlemendiyê. Di gund de yekemîn komên zarokan min wisa ava kir.

...

Kevokên min hebûn. Dîsa kevokên min û yên cîranan pir xwezayî tên gel hev. Lê kevokeke min her diçe û bi kevokên cîranan re difire. Bêguman ez çavdêriyê dikim. Carekê firiya, du caran firiya dev ji koma xwe berda. Li gor min ev tişteke weke xiyanetê bû. Min girt ew kevok bi tevahî rûçikand, ripûrût kir û min berda ser banê xanî: min got "bifire". Azîneyeke min a wisa ceza kirinê hebû. Pir balkêş e, lê min kir. Hetanî ku yek mûye kevokê nemîne min ew rûçikand. Piştre çi bû, ez nizanim. Lê tawana wî ew bû ku dev ji koma xwe berda bû û bi kevokên cîranan re firiya bû. Ev ji min re weke xiyanetê dihat.

Kuçik jî wisa bû. Kuçikekî min ê sipî hebû. Bêguman me

pê dida xwarin, dida vexwarin. Balkêş e! Em li ber darên fistiqan bûn, piştî ku ez diketim xewê hema radibû diçû cem cîranan. Êdî ez nizanim, her hal wî baştir rêxistin kiribû. Weke kuçikekî xayin bû. Ya balkêş, ez jî dixapandim. Yanî hîna weke kesên ku me dixapînin, hema mîna wan bû. Wî kuçikî jî ez dixapandim. Min lê temaşe kir, hema bi roj, bi şev kengê mecal dibîne direve diçe ma cîranê me... ewqas dilxweş û baş li cîranan dimêyzand ku ez mat dimam. Dîsa çima wî kuçikî wisa kir ez nizanim. Dibe ku hindekî jî şensê me be.

Berê li gundê me ker hebûn. Min dixwast ku ez kerê me jî bînim pîvanan. Wî wisa serê xwe û quna xwe radikir asîmanan ku, me nedikarî em wî kontrol bikin. Di gund de kerê herî pêpîvan bû. Hîna di bîra min de ye, di gund de em kiribûn henekên her kesî. Tu kerekî wisa tûne bûn. Kerê super, bêguman navê kerê me dikarî bû bibe “kerê sûper”. Li gor vê kuçikê me jî dibû kuçikê sûper. Ji bo li nav baxçe, zewî û rez min biparêze, min bi destên xwe xwedî dikir. Piştî ku ez ketim xewê hema radibû direviya. Kuçikê sûper, kuçikê revok!

Ez zarokekî piçûk bûm. Min temaşe kir, me şer kiriye yekî serê min şikandiye. Bêguman bi ser de hatina dayîka min a erjeng heye. Got “na”, divê “tu neyê malê”. Waneya yekem dayîka min da min. Digot encax piştî tolhildanê ez dikarim te bigrim mal. Bi rewşa xwe ya dayiktî qet dilê xwe naşewite, misoger nafikire ku “kurê min e, nizanim çiyê min e”. Hêza min heye nîne li wê jî nanêre. Qet di xema wê de nîne ku “ev zarok, tirsonek e, destên wî zêde ranabin”. Ez nabêjim misoger, lê belkî li ser min bi bandor bûye.

Di zaroktiyê de tu kesekî ji min feqîrtir nîne. Yan jî her kesî digot: “bila xwedê zarokê tu kesî weke yê filakesî neke”. Demeke dirêj her wisa bû, her kesî bi qeşmerokî pêşwazî dikir. Navê bavê min Omer bû. Digotin “Omer şewitiye”, “şewitiye”... Dîsan weke kurê bavê biaqil hevalekî min hebû, pêş de ez dê wî bînim ser ziman. Kurê bavê biaqil û fiqareyekî weke min. Jixwe zilamê ku jê re Omer tê gotin bi rastî zilamêkî pir balkêş e. Ew jî zilamekî feqîr ê gund bû. Ma kî wî nas dike? Pir hêjar e. Lê ya balkêş!

Xizanbû, lê hetanî dawiyê misilman û girêdayî ola xwe bû. Ez dikarim bibêjim ku xwedî rêgez bû jî. Divê mirov mafê zilam jî înkar neke. Ez dikarim bibêjim ku tevî hemû bêhêziya xwe ji bo hindek nirxan dijiya. Mirov bibêje ku ez qet jê bibandor nebûme, ew dibe nankorî. Bêguman misoger di hindek aliyan de ez bibandor kirime. Bi rêgez ve girêdayî ye, lê pir bêhêz e. Û bêhêziya xwe dizane.

Erê, ez di heft an jî di deh saliya xwe de bûm. Dayîka min çi ji min re digot? Hun dizanin di malê de dayik axa ye, ji bo zarokê heft salî digot: "tu wisa şer bike, wisa şer bike". Min ne kir. Çima min nekir? Ez dadigerandim û digot "herê lê bide". Yek-du caran wisa bi ser min de hat: "tu bênamus î, tu nikarî şer bikî". Bêguman ez zarokekî xwedî hiş û aqil bûm, heke ez weke gotinên wê biçûbama, dê li min xistiba. Jixwe li min didan jî. Ez jî weke şervanên niha yên ji rêzê dihatim û digiriyam: "ev dera min şikest, ew dera min şikest". Piştre min lê temaşe kir ku wisa nabe, min jî xwe amade kir.

Pîrika min jî digot: "hestên vî yên namusê xeter in". Min vegot: malbata hevalê Hesen Bîndal dijminê me bû. Ji ber ez jî zarokekî cewazbûm, min xwast herî zêde ez bi Hesen re hevaltiya xwe pêş bixim. Carekê dayîka min dît got; "wey vî bênamusî bi zarokê dijminê me re têkîlî çêkiriye". Têkîliyeke pir veşartî bû û me piştre ew dijminatî têperand. Min çima ew têkîliya veşartî bi dest girt? Ez ji bo têkîliya yekîtiyê tekoşînê didim meşandin. Ez dixwazim di heft saliya xwe de pîvaneke feodal xirab bikim. Heke wê demê ev helwesta min nebûya, min nedikarî niha ez evqas êşîr, qebîle û kesên cewaz bînim gel hev.

Deriyekî me hebû, hîna li pêş çavên min e. Ji ber şerê bi dayîka min re tu cihê wî derî nemabû ku nehatibû hûrkirin. Ka em dê vê çawa çareser bikin? Kê bihata û deriyê me binêrîba dikeniya. Digotin; "ev deriyê çi ye?". Ji ber şerê bi dayîka min re, wê ez hildigirtim hundir. Ez dibirim gomê, azîneya "pêkanîna" wê jî wisa bû. Sê caran destên xwe dikir qirika min û ez radikirim jor. Digot; "bêje tobe", him jî sê caran. Wisa hêsan nîne. Hetanî ku hilma min a dawiyê derdiket. Min neçar towbe dikir. Lê dema min kuneke biçuk

jî bidîta, ez hema difiriyam min xwe li derî dixist û direviyam. Piştre wê ew derî digirt. Min li her du deriyan jî dixist, dixist. Min perîşan dikir û piştre derbas dibûm. Ez ji wî temenî bi vir ve wisa me. Jixwe her dem diya min digot: “tu kes bi vî re nikare here serî” yan jî “tu kes bi te re nikare here serî, tu kes bi te re mijul nabe”. Ev aliyên min jî hene. Ez vekirî bibêjim: hun çawa şîrove dikin bikin, lê baldar bin. Hun weke ku min dibînin hun nikarin min bi dest bigrin. Piştre navenda me jî wisa ez bi dest girtim, hiziriyan ku dikarin min bi kar bînin. Xwe xapandin e.

Tiştên ku dayikê ji min hêvî dikirin, nedîtin... tiştên ku min ji dayikê hêvî dikirin û nedîtin... bi hev re jiyaneke me ya zêde demdirêj nebe jî, pir dijwar bû. Li gor xwe wê ez nasnedikirim, li gor xwe min dixwast ez wate bidim wê.

Tê bîra min ku ji bo nanekî sêlê (şerekî nan, hîna di bîra min de ye) min çawa bi dayîka xwe re şer dida meşandin. Piştî nanê garis dema nanê genim derket, ev di min de bû lêgerînek û nanekî sêlê zêde bi dest xistin, ji bo min tam bibû armanc. Ji bo wê min şervantiyeke mezin dida meşandin. Hedef jî dayika min bû. Diviya ku min ji cihê tê de veşartî yan jî ji destên wê girtiba. Mafê min bû yan jî ne mafê min bû ew mijareke dîtir e. Lê dema min nanê dixwast bi dest nedixist, ez derdiketim çiyê. Li çiyê gihayên tên xwarinê hene, berhevkirina wan, dîsa ji keskahiyên hatine çandin û ji darên fêkiyan nirx dana hev jî ji bo min hedef bû. Me hindek didizîn. Ji bo bi dest xistina hindekan jî me hewlên pir giranbiha nîşan didan. Serdemek wisa derbas bû. Ez dikarim bibêjim ku, di vê mijarê de min şerekî rêbertiyê dida meşandin ku, min komên yekemîn ên zaroktiyê li ser bingehê jêkirinê rêxistin kir. “vaye, werin ez we bibim berhevkirina pîvokan. Li filan cihî zebeş hatine çandin, em dikarin çendekan bigrin. Tirî derketiye, fistiq derketine.”

Bavik ji bo zarokên xwe rêber in. Bavê min jî ji bo rêber bû. Lê nedikarî bi rê ve bibe. Ji zû ve dest avêtina min a hunera rêbertiyê hindekî jî ji ber nebesiya bavê min e. Ez wê demê vî tiştî dibêjim: “bavê min jî weke bavê kesên dîtir bila ji me re rêbertiyê bike ku, valatiyê dagre.” Başe ku bave min ê wisa hebûye. Heke wisa nebûya min nedikarî ez di

temenekî biçuk de bikevim lêgerîna rêbertiyê. Min digot; “ev bav, nikare me bi rê ve bibe. Di rewşeke pir zor de ye, pir xizan e kêmaniyên mezin dijî.” Bi rastî jî di gund de bi qandî ez dizanim kesê ku di nava malbatê de yê herî zêde di lêgerîna rêbertiyê de bû ez bûm. Dibe ku di wateyê de li ser rêbertiyê min waneyên bingeh wergirtine.

Şerekî ku bavê min kiribû hebû. Lingên wî li banî dilêyîstin. Yekî ew xistibû bin xwe. Xwişkeke min a mezin hebû bi ser wê de diqêriya: “wê kêrê bîne...” di binî de ye, lingên wî banî ne, yek kêrê bîne jî nikare bigre, ji ber ku destên wî hatine girtin. Rewşa giyana têkçûyî, kesayeta felç bûye, bi ser de jî kêrê ji min dixwaze. Çekê ji min dixwaze. Dibêje, “bîne Evdileh”. Erê dibe ku navê min jî gotibe. Min ji vê yekê şerm kir û min got “ez tu carî wisa şer nakim”. Serkeftinên min ên mezin tunebin jî, ez neketim nava karekî ku ez nikarim ji binî derbikevim. Tiştê ku hêza min lê nabe, ma çima ez bi mirinî xwe bikim nav de?

Hîna tê bîra min. Dema ez bervî Berêçûk (Birecik) dimeşiyam min bi kirasê bavê xwe re girtibû û min wisa li her tiştî temaşe dikir. Min tirsnak didît. Min dipirsî “ev çi ye? Ev çi ye? Ji her tiştekî ez tiştekî dîtir digrim. Dema yekem car ez li ber kirasê bavê xwe ketim bajêr şerê min dest pê kir. Belkî bajar çiyayekî mezin e û bi ser min de dirûxe. Gav avêtina min a li kolanên Berêçûk weke meşeke di qada dijmin de bû. Bavê min ji bo min hêzeke mezin bû: ji ber ez di wan kolanan de didam meşandin.

Bavê min kesekî zêde xirab nebû. Ew jî, her dem min hêvîdar bû û ji min bawer dikir. Dîsa yê ku herî zêde dilê bihêvî kiribû ez bûm. Lê rêxmî vê yekê min gelekî li dijî wî serî hildida. Yanî min mînakeke zarokekî malê yê ne baş raber dikir. Wisa yekî bêfêm, her xwedî kirdeyên xirab, serî hildide ne, berovajiyê vê, bavê min ji min gelek hêvî dikirin. Ez vê jî hîna bi bîr tînim. Di bin darekê de, êdî çi wî bandor dike, ez nizanim, ez nîşan dam ên kêleka xwe û wisa got: “dest nedin wî, li ser eniya wî fetih hatiye nivisîn.” Ez bawerim dîsa vê yekê li gor hedefên min ên xebata jiyanê û berhemê dibêje. Min zêde xwe nedida ber kar, lê dema ez diketim nava karekî min ew kar pir paqij bi kar dianî. Belkî

jî aliyê min ê ku herî zêde ew bi bandor kiriye ev bû. “tu herî ku derê here, tê fetih bikî. Li ser eniya te nîşana fetihê heye.” Ev gotin hîna tê bîra min û ji bo çi ev yek got hîna nayê bîra min. Ez lê nedihatim, ez di nava pêvajoyeke dijber de bûm. Karê min ê paqij misoger bû, lê ez gelekî jî du dil bûm, bi hêsanî lê nedihatim. Hawirdor jî wisa bû. Min zêde kar nedikir. Kêm û cewherî min dikir. Bûyera ku jê re fetih tê gotin, şêwaza fetihkirinê ye.

Ez hîna di deh saliya xwe de hebûm an jî tune bûm. Hişyariya min hebû. Ez zarokekî xwedî hiş bûm jî. Ez hîna bi bîr tînim, baş di bîra xwe de digrim: ez fêrî baldarbûna li ser mirovan dibûm... bavê min, li gor alimiyê pîvan dadianîn holê, digot: “peleke cigarê bixe bin balifa xwe. Heke tu hindekî ji bilindbûyîna wê balîfê fêm bikî, tuyê bigihê asta alimekî baş.” Û min qet ji bîra nekir. “pela cigarê çiqas e? Dema bikeve bin balîfê, dê tu bibêjî ‘balîf bilind bûye’ yanî dê tu ferx bikî.” Lê îro ji bo hindekan ne pela cigarê, mirov daran jî bixe bin balîfa wan ferx nakin.

Berê hêza min jî zêde nebû. Bavê min wê demê jî digot, “tu kesî ku li te guhdar bike nîne”. Di vê watê yê de heman tişt didome. Erê, di wateyekê de ev yek îro jî rast e. Ez bi tenê me. Lê ez ji bavê xwe jî bihêztir im. Zilamê ku ev yek digot bi xwe ne tu tişt bû. Li gel ku ez jî wisa me dîsa jî min ji ya xwe bostek jî bi paş ve neavêt. Dîsa li gor hemûyan ê herî xort ez im. Li gor kalik û bavê ez im.

Digotin, “bila kurê tu bavî weke yê wî nebe”, bavê min jî ne di we rewşê de bû ku aqil bide min. Jixwe min ew zilam qedandibû, baviktiya wî jî bi temamî min qedandibû. Hîna di bîra min de ye, Îsmaîlekî pir tembel hebû. Îsmaîlê qurbanê bû yan jî Îsmaîlê bêhiş bû? Yekemîn pêşniyaza bavê wî jê re wisa bû, “derbasî pêşiyê nebe, li dawiyê nemîne, tam di nîvî de bisekine”. Tam felsefeya gund. Vî, demeke dirêj kurê xwe rê nekir dibistanê. Dît ku em zarokên xwe rê dikin dibistanê, dikin xwedî dahatû, wî jî rê kir. Piştre kete nav zar û zêçan, nehate pêşentiyê.

Jiyana hemû gundiyan bi şer derbas dibe. Lê di ev şêwaza şer de serkeftin nîne. Rewşeke dijî şerê gelerî ye. Û ji ber vê yekê ji nakokiyên hundirû xwe qedandine. Rûyêkî

vê yê dîtirê jî, pasîfîzma ji xwedê razî ye. Encamê vî şerî, pasîfîzma gunditiyê û serî tewandina ji qederê re ye.

Di her şerî de bavê min digot: “here, here! Li ser gund wisa şer bike, here wisa xeberan bide”. Min weke şêwazê wî nekir. Heke min weke wî kiriba, ez niha ji zû de miribûm. Ez nedigihiştim panzdeh saliya xwe jî. Bav jî axayek e, dixwaze şerê berê bide meşandin.

Wisa tê fêmkirin ku, dayîka min ji min re dibistana herî baş bû ye. Di gund de ev jin, kesa herî zêde diqêre, ji şer re vekirî û serhildêr e. Hîna di bîra min de ye û ez dikevim bin erdê. Min digot xweziya, bila dayikeke min a wisa serhildêr nebûya. Di gund de li hember xelkê ew wisa çawa şerm nake? Çawa wisa her kesî dixe nava welweleyê, çawa wisa serî hildide? Ez bi rewşa xwe ya zaroktiyê ve diketim bin erdê. Ez bawerim sedema çawaniya taktîkgeriya min jî dikare bi wir ve were girêdan. Ew serhildêriya wî, di heman demê de di nava xwe de lewaziyek hildigirt, min ev yek dîdit. Ji ber ku, ewqas bang dike, diqêre, lê encameke serkeftî nagre. Ez dixwazim ji dayika xwe bawer bikim, lê ji destên dayîka min tu tiştek nayê. Bavê min jî wisa bû. Çalakiya wî ya herî mezin, derdiket ser ban û xeber dikirin... Çawa xeber didan ew jî ne diyar bû. Vir vir vir. .. xeberên herî giran dikirin, piştre dihat li cihê xwe rûdinişt. Li dij dijminên xwe bingehê şêwaza çalakiyên wî wisa bû. Tê wê wateyê ku herduyan jî ez gelekî bandor kirime. Min ev bingehên mezin ên seroktiya taktîkî ji pêkanîna berovajiya wan bi dest xistiye. Yanî hîna di temenê xwe yê biçuk de min ev tişt weke tiştên vala û pûç didîtin. Min didît ku ew xwe gelekî bêwate dikin, pir şerên bêyî encam dikin û min berovajiya vê yekê pêk dianî. Wisa tê fêmkirin ku, sedema bingeh a fêrbûna di temenê biçuk de, bi rastiya vê malbatê û rastiya dayik û bavê ve girêdayî ye. Min waneyên xwe yên herî bingeh jî ji wan girtine. Hal-î harabê bavê min hişt ku ez di van karan de bibim rêber. Êşên ku me di zaroktiya xwe de jiyan kirin, em birin berbi wê encamê ku em ji van karan re rêbertiyeke baş bikin.

Bêguman li hember ketina mezin, li hember girîna mezin, li hember layiqiya biçuk a ji xwe re helwesteke min heye.

Jixwe bavê min digot, “dema ez bimrim dê tu rondikekê jî nebarînî”. Wî dizanibû ez li dijî çi me. Li hember biçukbûnan û erzanbûnan ez rondikan nabarînim. Lê di aliyê dîtirê de jî cîhan hemû dizane ku ez çiqas hestyar im. Aliyê min ê evînê û yê hestê ji aliyê min ê zanebûnê bihêztir e. Lê zanebûn jî heye, ez wê jî piştçav nakim. Meşa min a nêzî zanistiyê tu kes nikare piştçav bike!

Ez şerekî balkêş ê hestan im. Jixwe şoreş bi hestan destpê dike. Di min de jî aliyê hest pir bihêz destpê kir. Biqandî kîn û hedan bi xwastek, bi qandî dijbertiya kîrêtiyan, bi bingeh girtina bedewiyan bi pêşveçûyîneke li gor xwe destpê kir. Destpêkê zanebûn, siyaset nebû, hest hebûn.

Min xwast ez feraseta herî paşverû û kirêt a gundê me jî fêm bikim. Hîna tê bîra min zarokên xwe ji zarokên paşayan jî nirxdartir didîtin. Li gel wê belkî jî di kirêtiyê de tu kes weke wan tunebû. Lê digotin, “hele binêrin çiqas bedew e, çiqas jêneger e”. Bêçareserî ne. Tevî ku gelekî ne xweşik in malbat vê yekê wisa dinirxînin.

Ev îdeolojiyek e.

Îdeolojiyek e. Di bingeh de ewqas bênirx û pêmen hatiye hiştin ku, hebûna mijara gotinê ew e: belkî xwedî çend bost erd an jî yek-du bizin, kerek, yek –du kuçik û yek- du zarokan e. Wan dixe cihê welat jî, cihê xwedê jî, di sîstema nirxan de çi hebe dixe cihê wan hemûyan. Çavên wan weke din tu tiştekî nabîne. Têkîliya me ya malbatê wisa ye.

Xebatên zewiyan girîng bû. Min di zewiyan de xebat kir. Pale ji bo me barekî giran bû. Min digot pale pêwîste û min pale dikir. Lê divê bi vê yekê re temenek neyê qedandin, ez wisa difikiriyam. Piştre ez çûm Çukurovayê jî, yan du yan jî sê caran çûm. Min pembû berhev kir. Min li wê derê jî jiyan di nava xwîn û xwîdanê de dît. Li wê derê ked çi ye, jiyana biked çawa dibe, dihate fêmkirin. Min baş kar kir, lê min digot ez bi vî karî nikarim temenekî biqedînim.

Ez bi xwişk û birayên xwe re pêv diçûm. Lê dîsan jî xwişk û bira bûn. Her tiştên wan de kîrêtî jî hebe dîsa xwişk û bira bûn. Xwişkeke min hebû, ez bawerim min xebatek li ser wê dida sepandin. Belkî jî zehmetî dikşand. Ma min serdestî armanc dikir? Ez bawerim di xebatê de min çalaktî

jê dixwast. Wê jî digot; “encax hêza te digihêje min”. Hêz pê anîn. Di nava malbatê de min ev yek diceriband, lê li ser bingeheke rast. Bi birayê min re jî wisa bû. Zilam pir bêçalak bû, di malbatê de xeteriya mîratxwariyê hebû. Her wiha ez bawerim piştre hindekî weke mîratxwarekî ma. Hîna ji wê demê de mafdariya bi ser de çûyîna min eşkere derkete holê. Zilam nedikarî rast û dirûst li kerê jî siwar be. Me du biran wisa bi lingên wî digirt li kerê siwar dikir û wisa dibir navçeyê. Birayekî wisa bû ku bi hêsanî nexwaş diket û xwe radestî destan dikir. Bêguman min ev yek qebûl nedikir û şerê ku ez dê piştre bînim ser ziman jî ji ber vê yekê kir.

Min lîstok jî dilêyîstin, lê zêde ne. Lêyîstika bi lingekî, lêyîstika evîndariyê û hindek jî kortvanî. Min dixwast ez bi keçan re jî bilêyîzim. Keçeke ku min dixwast ez pê re bilêyîzim, lê zû zewicî bû gotineke min a weke; “ka were em bi te re lêyîstika xwe bidomînin” hebûye. Bîranîneke wê jinê yê wisa hebûye. Li gel min bîranîneke wisa nîne, lê wê gotiye dibe ku hebe.

Heke hêrsa min a bêyî encamiya lêyîstika bi keçên gund re nebaya, min nedikarî ez keçan wisa bikşînim ev lêyîstika azadiyê û tekoşînê. Divê kesayet li hember xwe xwedî îstîkrar be. Gotineke min hebû, ne xiyanetiya li zaroktiyê. Bi bingeh nakokiya mezinan çi ye? Nakokiya destpêka bi hêviyên xwe yên zaroktiyê re ne. Min nedixwast ez li vê jî xiyanetê bikim. Azadî wisa dest pê dike. Hêviyên zaroktiyê hêviyên pîroz in, hêviyên aştiyane ne. Pê ve girêdan, têkîliyeke rast e.

Pejirandina zilamê Kurd ê ji rêze û kevneşop gelekî xeter e. Min ji keçan ev pirs pirsî: “hun zilamê wisa çawa dipejirînin?” Heke min bi zincîran jî girê bidin ez têkiliyeke wisa qebûl nakim. Hat bîra min. Li gund jinek dabûn. Min ew rewşa xwe ya zaroktiyê ve bihîstibû. Gotin ji bo ku jin ji malê nereve ew bi dîrekê malê ve girêdane. Û dîsan digotin: jinê ta birîne û revî ye. Ji ber çi revî ye, wisa bala min kişand. Lê rexmî vê yekê, îro hemû jî weke ketiyan pê ve tên girêdan. Başe ma ez dê vê malbatê çawa weke malbat qebûl bikim?

Dema mirov dest bi dibistanê dike, bi mirov nav-paşnav

didin hînkirin. Dema ez destpêkê rabûm ber textê reş tê bîra min. Mamoste ez rakirim got; “binivisîne”, “navê te-paşnavê te”. Ji bo min ev yek ji ezmuneya herî girîng bû, hîna di bîra min de ye. Min êdî tîp di mejiyê xwe de nexş kiribûn. Bêguman navê min û paşnavê min hindekî dirêjbûn. Lê min rêz kir. Dema min qedand ez bawerim min gelek puanên erênî jî girtibûn. Ez bi jiyaneke zor a serkeftina ezmuneyeke mezin çûm di cihê xwe de rûniştim. Rojên destpêka dibistana seretayî bûn. Gelekî zor bûn: zehmetiyên ziman hebûn, zehmetiyên jiberkirinê hebûn. Jixwe min di malbatê de tu aramî nedîtiye. Gund bi zehmetiyan ve dagirtiye. Zehmetiyên dibistanê jî li ser zêde dibin. Hîna di wan salan de weke ku mirov ji ber baranê bireve û rastî teyrokan were. Yanî rewş wisa bû.

Rastî, bi qandî ku te aram neke bêeman e.

Ez bawer nakim ku tu zarok li hember van rastiyan evqas xafil bimîne.

Ji ber ku mercên we hêsan bûn. Malbateke li ser zarokan serdest dikare pêvajoyên dibistanê jî baş amade bike. Bi kêmanî bihevseng û bêyî ku bixe nava tengezariyê. Bêguman ji bo zarokan ewleyî ne. Tu ewlehiya min nebû. Ez bawerim qenciya wê jî çêdibe. Di ew temenê zaroktiyê de ez bi xwe dibûm ewleyiya xwe. Heke ez pişta xwe bidim xal û bavan, bi ihtimaleke mezin ez dê di xeteke cewaz de pêşbiketibama. Vaye wisa nepêkhatina wê, mirov dikare bibêje ku gava yekem a bûyîna min a xwedî xetekê ye.

Mamosteyê yekem... ez bawerim mamoste hindekî hişyar in. Navê wî tê bîra min, ji Çorûmê bû, Mehmet Meydankaş. Min hindek mast an jî hêk jê re biribû. Tenê ji ber vê jî ne, dibe min ji roja yekê ve bala wî kişandibe ku, ez vexwendim mala xwe. Xwerina min bi wî re xwarî hîna di bîra min de ye, ji bo sifreyeke baş bû. Tiştekî şanaz bû. Ez şanaz bûm. Ez bûm xwendevanê herî berbiçav ê mamosteyê xwe. Û min ew rêz her parast. Ji sala destpêkê hetanî roja ku min xwe naskiriye, hetanî niha li hember rastiya mamostetiyê ez her rêzdar bûm. Misoger ez bêrêz nebûm, sivik nebûm û her dem min dixwast ez bibim xwendevanê wî yê herî baş. Vê yekê hîna di wan salan de destpêkiriye. Xwendevanî, meletî

û pale her wisa çêbû.

Kesayeta min çima bi hêsanî têk naçe? Ez him di pergalên lêyîstika zarokan de û şeran de, him jî piştî wê dema min dest bi dibistanê kir, ez têk nediçûm. Hetanî zanîngehê jî ez her dem berbiçavê mamosteyên xwe bûm. Nêzîkatiya min pratîka perwerde û xwendevaniyê re awarte bû. Gelek ji wan mamosteyan îro dijîn. Pesin û nêzîkatiyên wan ên ji min re; hemû xwendevan di nava hesûdiyê de û di bin bandora min de hiştin. Rebertiyeke min a xwezayî hebû. Di perwerdeyê de, di fêrbûna ABC yê de, pir rişt, rêzdar û baldar bûm.

Di dibistana seretayî de meleyekî baş bûm. Min xwe dabû olê û min gelekî jî nimêj dikir. Bêguman ez demekê ponijiya bûm. Min di xala meletiya gund de cih girt û ez dikarim bibêjim ku di asteke pêş de bû.

Dibe ku şensê min hindekî jî ji ber taybetmendiyên malbatê bûn. Bavekî ku xwe zêde saz nekiriye, pîvanên xwe pêk nayne, dîsa dayikeke ku xwe weke têyî xwastin serdest nekiriye, dîsa di hawirdora bira û xwişkên ku xwe pêşnexistine de, ez derfeta gav avêtinê bi dest dixim. Di nava malbatê de şerê rêbertiyê min wisa bêeman bi rê ve bir. Di hundirê wê de bi hezaran bûyer û şer hene. Niha ev şerê ku ez bi Komara Tirkiyê re didim meşandin hîna wê demê pir bi dijwarî min da meşandin. Wê demê gelek gotin û çarîneyên ku dayika min ji min re gotibûn hene. Şêwaza xebata min didît. Hîna tê bîra min, digot “evdal ma tu kes weke te dixebite”. Cewaziya min dizanibû. Komeke piçûk a me xwendevanan hebû. Li derûdora deh kesan bû. Min dixwast ez wan bibim dibistanê. Ez dikarim bibêjim ku min gelekî baş perwerde kirin. Min bi hemûyan nimêj dida kirin. Em diçûn dibistanê curn hebûn. Dema baran dibariya hindek av tê de kom dibûn, min bi hemûyan destav dida girtin. Hema li dûv min rêz dibûn û nimêj dikirin. Di vê wateyê de min gelekî meletî kir. Di dibistana seretayî de û bi xwe bixwe min kir. Qonaxeke girîng a rêxistikirinê bû. Bi xwe bixwe re meletî kirin girîng e ma ne wisa? Yanî li gor gundê xwe weke zarokekî oldar û baş di temeneke zû de bibe mele. Peywireke wisa ye ku her zarok bi hêsanî nikare hilde ser

milên xwe.

Min dixwast ez dibistanê li ber dilê koma xwe ya xwendevan xweş bikim. Min ABC bi wan dida hînkirin. Ev hewla ku min bêyî bihayê tiştekî dikir, diya min weke evdaliyê dinirxand. Diya min bi ser min de dihat; “bêyî ku tu berdêlekê bistînî çima tu deh-panzdeh zarokên gundiyan perwerde dikî.” Kî rast bû, tu kesî weke min nedikir. Taybetmendiyeke min a ku wê demê xwe derxistiye pêş ve jî, hewla perwerdekirina mirovan e. Di aliyê din de zarokekî ku li gor xwe nagihê, diyare ku ez berbi ciwanmêriyê ve diçim.

Wê demê bi vî tiştî hesiyan: ev zarok dê nebe zarokekî asayî yê malbatê. Hîna wê demê dayika min ji min re digot tu nikarî malbatekê saz bikî. Wiha rexne dikir, “tu kes keçan nade te, kar nade te”. Diviya ku ew jî rast bûya. Ji ber ku diyardeyên ji min, çavkaniyên min, eşkere derdixist holê ku ez dê bi tendûrist nebim weke zarokekî ku ew dixwazin.

Tê bîra min wê demê wisa li derûdora min zarok hebûn. Piştre ew hemû çûn radestî pergalê bûn. Kesên ku ji bo xwendinê ez bi wan re bûm alîkar, yên ku min bixwe fêrî xwendinê kirin, çavên wan her dem li pergalê bû. Dixwastin bibin mamoste yan jî wisa çavên xwe berdabûn pergala malbatê û pergala dewletê.

Di saziya ol de, di saziya dibistanê de, piştî wê di saziyên îdeolojîk û polîtîk de serê min her bi bela û ez her di rewşa lêgerîna tiştên ku min dıxwast de bûm. Bi bingeh ez pê ve girêdayî bûm, lê nedîtina min a xwasteka xwe, ez birim pirs û encama çawaniya pêkanîna tiştê herî baş. Tu kes weke min ne bi mamosteyên xwe ve ne jî bi hevalên xwe ve girêdayî ye. Hemû mamosteyên min, min nas dikin. Min dizanîbûye ku ez hezkirinên hemûyan bi dest bixim. Ev gotin nînin, peyitîn hene. Û ji her beşê mamoste hebûn. Hevalên min jî wisa bûn. Yên ku ji beriya 20-30 salî ez nasdikirim niha hemû dostên min in. Tirk jî wisa ne. Hemû hevalên min (belkî niha hindek ji wan di qonaxên dewletê de bûn.) min weke dost bi bîr tînin. Tiştê ku ez dixwazim bibêjim, ji bo girêdana hevaltiyê di min de hewldaneke mezin hebû. Lê rexmî vê min got divê hemû werin têperandin. Têperandina

mamosteyê xwe bûyereke zehmet bû.

Ji hevalên xwe re bûyîna rêber jî zehmet e. Bicerbînin çiqas zehmet e hun jî dê bibînin. Rexmî her tiştî bêyî ku tu wan bişkînî, bêyî ku tu wan nerihet biêşînî... ji ber ku têperandina wan belkî jî wan biêşîne. Têperandina kesekî gelekî zor e. Lê heke pir erênî were têperandin dilxweş dibe. Du dibî mamosteyê mamosteyê xwe, ev yek wî/ê dilxweş dike. Tu dibî rêberê hevalê xwe ev yek jî wî/ê dilxweş dike.

Dîsan yekemîn hevalê min ê zaroktiyê gundê Hesen Bîndal hebû, gundê Cîbînê. Gundekî Tirkan bû û malbatên wan hîna jî me bi xêr bi bîr tînin. Ji bo rojekê min vexwînin malên xwe gelekî eleqe nîşan didan. Wisa nêzîkatiyeke min ê rêzdar hebû. Niha em tevgereke mezin ê êrîşê ne, şehitîneke mezin rêxistin dikin, lê misoger wisa rewşeke bêqisur a rêzgirtinê jî hebû.

Hîna jî ez di cihê nivî de radiwestim. Nayê payîn ku ez bi hêsanî werim têperandin û vala werim derxistin. Em hîna mijûl dibin. Yanî ez dîn jî bibim ez pêşiya vî karî û pêşiya we bernadim. Yê ku ji heft saliya xwe ve xwe bi vî karî ve girêdaye dikare bi hêsanî dev jê berde? Tê bîra min mamosteyê min ji bo ez bi yekî re werim kortê ez rakiribûm ji piyan. Ez bawerim Hesen Bîndal bû. Min pir şerm dikir min digot, “ez nikarim bi vî hevalî re werim kortê”. Ew hindekî din bi hêz bû. Ez di hunera kortvaniyê de lewaz bûm. lê ev hest hîna di bîra min de ye: ma ez rabim an ranebim? Di vê mijarê de bi rojan, bi mehan min dudilî jiyan kir. Dema ez rabûm jî me nekarî em ji hev bibin. Ji bo min rewşa herî zêde min bi ser xistî, di ev rewşa wekheviyê de mayîn bû. Ji bo min rabûna kortê rexmî ku gelekî zehmet bû, bi zehmetî rewşa wekhevmayînê afirandin gelekî girîng e. Êdî min dilê xwe li ser wê bingehê amade kir. Wekhev mayîn. Heke ez dê nikarim jê bibim jî, nepejirandina têkçûyîneke bingehîn.

Di her qada jiyanê de ez wisa me, di fêrbûyînê de jî ez wisa me. Dema min dixwast ez ji refê derbas bibim, fêmkirin çiqas lewaz dibe bila bibe, heke gengaz be xala herî baş wergirtin, lê pir kêm ketina bin pêncan şêwaza min bû. Pir kêm sê yan jî çar hebûn. Bi qandî pêçiyên destekî hebûn

an jî tunebûn. Û di tevahî jiyana min de wisa bû: Di revê de, di meşê de, di mijûlbûna her tiştî de. Li lîsêyê, di dibistana navîn de, wisa gelek nêzîkatiyên balkêş, gelek pêvçûn û hemû jî bi hilkehilk bûn.

Heke ez nebim nabe, ez têk biçim qet nabe. Ev her du hest.

Bêyî ku ez xwe ji karekî re amade bikim, ez nakevim nav. Di derbarê hêz gihiştandinê de taybetmendiyê pîvanê ye. Di bingeh de ez ne kortvanekî xort im, lê bi rabûnê re hema ketin zêde li gor min nîne. Di hemû lîstokan de ez wisa me. Yên ku min dikarîn ez bi dest bixim, jixwe min bidest dixistin, ên din jî wekhevî bû. Ez bawerim min pir kêm di lêyîstikan de wenda kir. Ev taybetmendiyeke derûnî û takekesî bû.

Şêwaza min pir balkêş bû. Dema min nimêja xwe ya destpêkê kir meleyê gund (ez bawerim 1984'an de mir) digot, "heke tu bi vê lezê bidomînî tuyê bifirî. Tuyê bibî ewliya û bifirî". Nimêja min a destpêkê bi meleyê gund vê nirxandinê dide kirin. Esas ez zêde ji duayan fêm nakim, lê bi kemanî ez dişopînim. Şêwaza min a şopandinê, di derbarê min de mele dibe vê darezînê. Weke vê gelek ezmûneyên min ên jiyanê hene. Ketina ji hemûyan re cidiye, bi wate ye û wisa birina encamê heye.

## Serhildana Yekem

Jiyan bi xwe xewnek bû, ma tuyê di xewnê de xewnê bibinî? Esas di zaroktiya min de tu tiştêkî awarte nîne. Heke hun baldarbin tê dîtin ku rewşeke li paşjîna hemû kesî ye. Ya balkêş divê ev der be. Dayik û bav zêde tu tiştî nadin zarokê xwe, xwediyê wê şarezayiyê nînin. Gund dîsa nikare tu tiştî bide. Aveke rast a vexwarinê jî nîne. Dibistan nîne. Rewşeke wisa ku mirov xewnên bihêz bibîne jî nîne. Zarokê me di axa xwe de qedî dimîne. Mirov dikare weke xeyal jî bi nav bike.

Çawa bû; ma xewneroşk bi pêş diketin? Min zêde wêrekiya xewroşk û xewnan raber nedikir.

...

Xezo: cîran zêde hev naecibînin, tê bîra min, cîraneke me ya bi navê xezo hebû. Xezo xizan bû. Ji bo ku mirişkeke xezo hatibû mala me dayîka min her roj erd dihejand. Deqeyeke ku bêşer tûnebû ya wê jinê. Bawerim, ez ji hizra bêwatebûna wî şerî gihiştim şerê biwate. Erê sibê hetanî êvarê şerê cîranan li cem me gelekî zêde bû. Bêwate û vala.

...

Rewşa destpêkê ya bihîstima min a dengê tebanceyê hîna di bîra min de ye. Min carekê dît ji pişta mizgeftê dengê tebanceyê tê. Ez zirav qetî bûm. Min got “ev çi deng e?”, “ev çi dînêmêrtiye?”, “çawa wêrekiya vê yekê dikin?” min demeke dirêj wate nedayê û vê yekê ez veciniqandim. Di gundê me de berdaneke tebanceyê bû ev. Hêza min a ku ez lê temaşe bikim tune bû. Ji ber çi bû? Esas min tiştekî mezin ê derveyî hiş li wir didît. Bi ihtimaleke mezin ez li ser nebûna bi vê teşeyê çareserkirina nakokiyên nava gel de difikiriyam. Ev nêzîkatiyeke baş e. Ez dibejim; “di vê

lihevdanê de hêvî nîne”, ez vê yekê bi wate nabînim; ez xeteriyê dibînim ku, vediciniqim. Min tu caran wate neda ev şêwaza şer. Bi hevaltiyê ve pêşî girtina min a nakokiya ku ez dibirim şer, bi vê yekê ve girêdayî ye.

Li dijî van hemûyan, her ku çû min şêwaza xwe ya tevgerê pêş xist.

Erê, li gor min şerên bi kevir gengaz e, lê di hawirdora gund de bikaranîna tebanceyê karê dîna ne. Xaleke balkêş e. Him tuyê wisa serî hildî, him jî tuyê hiş nebî bi ser tebanceyê ve. Dema li pişta mizgeftê zilam tebance teqand min got; “ev cinawirek e, çawa dikare vê tebanceyê biteqîne”. Hîna hişên min nedigirt. Ez dibêjim “li hawirdora gund tebance nabe” û ev jî nirxandineke rast e. Ji ber ku divê nakokî bi tebanceyê çareser nebe. Heke bal were kişandin ez şoreşgeriya herî mezin disepînim. Di vî şerî de ez tebanceyê misoger weke amrazeke şaş difikirim û ez ev fikra xwe hîna jî diparêzim. Wisa di hawirdora gund de divê tebance neyê bikaranîn.

Hema di vir de ez tiştekî dîtirê jî li ser zêde bikim:

Du hevalên min hebûn her du jî hîna di bîra min de ne. Min rojekê bihîst di şer de yekî bi kêrê yê din kuştiye. Ez niha jî hîna wî şerî û bûyera kuştinê ji bîr nakim. Ji bo min gelekî jandar bû. Divê misoger ew bûyera kuştinê li hawirdora gund çênebûya. Min gelekî jandar û hovane didît. Dîsa ew karê bikaranîna tebanceyê jî, min xeternak û hewlnak didît. Her du jî şaş bûn.

Bandorên wan pir dem dirêj bûn. Min hîna ji bîra nekiriye.

Ji tekoşînekê re girêdana min a hişyarane heye. Bi teşeyeke ku tê pejirandin ji meşandina tekoşînekê re girêdana min heye. Yan jî dê veguheriya rewşekê ku tu kes nedikarî ji binî derbikeve. Mînak em cewaziya di navbeyna şerê min û şerê Kurd de hindekî vekin. Di gund de her kes dikare wî şerî bide. Jixwe yek jî kuştin, hevtemenê min, her du hevalên min ên zaroktiyê li hev dan. Kuştin karekî wêrekiyê yê awarte ye. Bikaranîna çekê jî pir awarte ye. Lê ez çima ji kesên wê rojê eciz bûm?

Jixwe ew kes piştre mirin. Yê ku mir jixwe mir, ê ku çek

bikaranî zêde serkeftî nebû. Di şer de navê wî jî derbas nebû. Ez bawerim di navbera şerê klasîk û şerê min ê wê demê de cewaziyên mezin û girîng hene.

Dema ew di şerên xwe de diqediyan, min şerê xwe vegerand pêşveçûyîneke mezin, ev yek di wan şertan de ji bo Kurdistanê cewaziyeke mezin e.

Hîna ji heft saliya xwe bir vir ve, berçavkirina perçiqandina pîvanên civakê, diyardeya xirabkirina lîstokê nîşan dide. Di vê derê de divê girîngî û nêzîkatiya çawaniya giyanê were fêmkirin. Dema ez hîna di civata gund de bûm jî dewsa ku ez bibim weke her kesî, dîtina pêwîstiya cewaziyê û bi ser de çûyîna min e.

Divê mirov fêm bike. Dibe ku hînker be.

Lê min çawa bi dest xist û her ku çû min çawa têperand?

Hîna tê bîra min, li pişta gund parçeyekî me yê rez hebû. Ji bo xwe min weke dibistanekê bi kar dianî. Min ew der bi pirtûkan ve dagirtibû. Di bin mêwên rez de, li bin darên fistiq û bayifan de çend cihên min ên wisa hebûn. Min sererast dikir, radizam, dixwend. Min gelekî xwe diwestand. Xwendineke wisa bi azîne nebû. Hindek bi matematîkê re, hindek bi dîrokê re hindek jî di derbarê her tiştî de bûn. Wê demê hezeke me ya ku em bikaribin nirxandineke zanistî bikin tune bû. Meraqeke xwendinê ye, ez dixwazim li ser rawestim. Di vê navberê de ez bi rez re jî mijûl dibim.

Birayekî min ê navîn hebû, hat. Êdî ji ber sedemekê em rabûn şer. Divê sedema wê çibûya? Bi ihtimaleke mezin di xebata rez de kêmaniyeke wî hebû. Wisa min nêzîkatiyeke wî yê beredayî yan jî ji kedê re bêrêz, helwesteke bêwate ji peywirê re dît. Min xwast ez wî ji rez biqewitînim. Piştî ku ez hindekî mijul kirim, min ew bi ser revê ve bir û dest bi revê kir. Min da dûv wî û min ew şopand.

Bi hêrseke mezin, min ew dida ber keviran. Hîna tê bîra min, li ser tehtan bûlxur dikelandin. Malbata me, dayik-bavik hemû li wir in. Çû xwe avête wir. Bêguman stargeha wî malbat e. Li hember êrîşên min ên giran hiziriya ku encax wisa xwe biparêze. Heke min ew girtiba, belkî bi keviran min ew gelekî êşandiba. Hindek ji derbeyên kevir girtin jî.

Heke min hîna girtiba, diviya ku min hindek cihên wî xwîn kiribana û bişkênandibana, hêrseke wisa.

Bêguman dema xwe bispêre malbatê yê ku destpêke li dij derbikeve bav e û hîna di bîra min de ye, bav li dij derket. Meşiya ser min. Bêguman ji ber ku bav bû diviya ku min çend gavan xwe paş ve daba. Berbi gund ve min tevgereke paş ve kişandinê kir. Hemû gund rabibû ji piyan. Şerekî bav û kur ê dijwar bû. Bêguman dema ez paş ve kişiyam, wisa paş ve kişandineke lewaz û bêşer nebû. Paşve kişandineke xwedî îdîa û sing bi sing, bi kevir barandinê bû. Ew jî êrîş dike, hindekî zêdetir xwedî hêz e. Lê di nava gund de êdî kolan hene ez dikarim xwe berdim nava kolanan. Her wiha zêde derfeta min a serkeftinê nîne. Piştî em ketin nava gund, ji ber westandinê bû yan jî êdî pêwîstî nedît... xwe bi paş ve kişand. Bi vî awayî em di hevsengê de man.

Lê ez bi vê têr nebûm. Hêrseke min a wisa hebû ku, ez bi wê hêrsê ketim nava malê û hîna tê bîra min, parçeyek çixina wî hebû. Wisa çixinek bû ku gelekî li paçan dipêça û pir jî vedişart. Dîtin gelekî zehmet bû. Lê ez di vê mijarê de gelekî lêkolînêr im. Piştî çend lêkolînan (belkî çixin xistibû gomê) ez çûm nava kevir û daran min li wir dît. Tê bîra min, min deh lîra girtin. Li gor diravên wê demê diraveke zêde ye. Piştî ku min deh lîra girtin me tevgera berdana gund plan kir. Yan jî hêrsa me em anîbûn wê xalê ku ji me re digot “tûyê vir berdî”.

Çima dev jê berdan? Ez bawerim ji malbata wê demê re hêrsa min pir zêde çêbibû. Û bêguman piştî ecizbûnê êdî tu nikarî zêde li gund û malbatê bimînî. Heke tu nikaribî zêde li mal bimînî, wê demê çi karê te li gund heye? Bi kêmanî ji malbat û gund re berxwedaneke yekgirtî bû. Ez bawerim wisa bêwatebûyîna gund em birin ramana “xwe dirêjkirina bajêr ” ve bir.

Wê demê bajarê ku min hindekî nas dikir Nizip bû. Berêçûk (birecik) hebû, piştî wê Nizip dihat. Wisa tevgereke bi ser de çûyîna bajar. Nîva rojê, hewa pir sotînêr e û di wê demjimêrê de rabûn û ketina rêka bajêr zêde karekî hişdarî nîne. Lê min ezmûne kir. Bi lez bi ew diravên me girtî, min xwe berda jêr. Newalek û pişt re bi lez hilperîna gir. Û dîsa

tê bîra min, ji beriya ku gund ji asoya min wenda bibe, bi hêrs û di nava firmêskan de, ez bi xwatirxwastineke veqetînî derketim.

Gundekî cîran hebû. Bêguman derbaskirina wî gundî mesele bû. Kuçikên wan hebûn. Tu zarokekî pir fedok î, heta dawiyê tirsonek. Yek jî çi tê bi serê meriv de, çi nayê...min got “tuyê xwe hetanî dawiyê bi serkeftî bikî”. Ez bawerim bi vê hestê, ji aliyekê ve ez xwe ji kuçikan diparêzim, di aliyê dîtir de jî, ez xwe ji hindek nezeran diparêzim. Min gundê yekem derbas kir, bi lez ez ketim rê. Ketim rêka gundê duyem, divê ku ji Xelfetiyê wesayît were. Bi ihtimala mezin divê wesayîta postayê were, ji rêzêye wesayîta rêwiyan ne. Bi lezeke mezin, bi wê hersê ez gihiştim gundê Qeremezrê. Dareke wî gundî hebû, ez li binî rûniştim wesayît hat û ez lê siwar bûm. Du dirav û nîvê min çû ez baş nizanim, lê ez gihiştim Berêçûk.

Dîsan di hewaya sotîner de min xwe li pira Berêçûk da. Min ew jî bi ser xist. Rexmî ku ez hîna di temenekî biçuk de bûm min bi ser xist. Çûyîma min a dibistanê nayê bîra min. Ji bo yekî di wî temenî û wê binkeyê de siwarbûna li wesayîtê gelekî zor e. Diviya ku min dibistana seretayî jî qedandibûya. Bi wê lezê min xwe avêt Nizibê.

Û piştî wê bi şûn ve şêwaza min paleya deşta Beraqê heye. Ev Beraq deşteke pir bixêr û ber e, genim lê tê çandin. Ji bo paleya genim jî hêz pêwîst dike, kokên wê pir zehmet tê hilkirin. Bi çend dost û komeke nas ve em çûn. Yoma du rojan bi pênc lîrayan bû. Ya herî gîring jî, sibê, nîvro û êvaran dew hebû. Min ev roj bi dewê germ derbas kirin. Min dît êdî nabe yan jî min zêde nekarî bikim, an jî ji ber sedema qedîna genimê çinînê; ez ketim nav amadekariyên vegerînê.

Lê min deh lîra bidest xistibûn.

Hîna tê bîra min, ew vegerîneke biwate bû. Deh lîra wisa min ji bavê xwe sitend, deh lîra jî min ji vê derê bi dest xist. Bi vî teşeyî min bi dawî kir. Piştre çi bû ez nizanim.

Ev serhildana min a yekem bû. Weke baxçeyê ku min piştre li Rojhitanavîn ava kiribû. Ez dikarim bibêjim ku esas wê demê akademiyê dest pê kir. Baxçeyeke xweş bû, min ew sererast dikir. Zilam hat xirab bike, min li dijî wî şer dest

pêkir. Baş tê bîra min ku di derbarê rastiyekê de bû. Li gor min jiyaneke rast hebû, xwast wê xirab bike. Min şer wisa da destpêkirin.

Ez şer weke hunerekî bi dest digrim. Temenê şerê ku ez didim meşandin, bi kêmanî qandî temenê min e. Bi qandî ku ez bijîm, qutbûna leza vî şerî ne mijara gotinê ye. Plana wî min çêkiriye. Roj bi roj ez di nav amadekariyên wê de me. Asta vî şerî tu kes nikare bi paş ve bixe. Viyanek heye, vaye çemkeke min a planê heye. Berê min di tewereya gund de, yan jî di nava civateke biçuk de dikir, ez niha di wergiriya netewî de dikim. Bêguman, ez gelekî jî dikim.

...

Û çalakiya bi keviran, çi bû ew? Ji ber ku li min dan, gelekî zor be jî ez rabûm çalakiyekê. Li dij Cimo û Miho çalakiyên ku min birêkxistine jî, qandî serhildana yekem girîng e.

Kengê min ev her du çalakî xistin hişê xwe? Min dît ku gelekî bi ser min de hatin çêdibe, êdî malbat tê rewşa ne qebûl kirina min. Min dît êdî jêneger e û heke êdî ez nekim zêde nikarim bijîm, çi hate hişên min ên zaroktiyê?

Başe ez çawa çalakiyê bikim? Cimo zarokekî pir nerehet e, tevlî hemû xirabiyan bûye, di şer de pîvanan nas nake. Ez jî gelekî şermende me. Ez bi hêsanî nayêm şer û ev jî astengiyeke rişt e, çareserkirin zehmet e. Me jê re digot “firdo” bi rastî jî Cimo fir fir digeriya li her derê.

Çar neçar, êdî nizanim, weke pêngavên min ên her demê surprîz. Min carekê dît Cimo di newala jêr de dimeşe. Êdî em bûne dijberê hev. Tê bîra min ez derketim aliyê jor ê newalê. Min xwe li wê jorê bi cih kir. Min dest bi şopandinê kir. Dîsa wê demê kiras hebûn, cilên dirêj. Min kirasê xwe bi keviran ve dagirt. Hindekî li pêş cîranekî min hebû. Yanî ne dostekî baş be jî, dikare di nav me de bisekine yan jî ji min re bibe hevkar. Misoger beşdarî şer nabe, lê çavdêriya min bike. Di vî şerî de esas li ser şêwaza rast her tişt heye. Amadekariya pêwîst, çeper girtina zexm, şopandin, şêwaza tevgerê û îtîfaq. Yanî rewşeke rêxistinî. Piştre min dest pê kir, ji jor ve kevir bi ser Cimo de gindirandin. Weke ku min gotî, Cimo ne yekî ku xwe bi hêsanî paş ve bide û fêrbûye

her dem bi nêyînî bi ser min de were. Bi barandina keviran ve herî dawiyê min Cimo xist pozîsyona revê. Dema dest bi revê kir jî, ez pêtir bi ser de çûm. Ji rûbar hetanî malê da revandin (baş tê bîra min) û piştre kete mala xwe. Û hîna ez bawerim derî jî li ser xwe girt.

Pir balkêş e. Ew ji bo min serkeftineke mezin bû, ez bawerim dayîka min wê demê ev baş nirxandibû. Ev çalakî wisa pêş ket û encam jî serkeftin bû. Hîna tê bîra min, ez nanepixînim. Misoger serkeftin bû. Ji ber ku, kesekî ji min bi belatir bû. Hetanî wê rojê ez şikandibûm, lê bi çalakiyeke ku min bi rêxistî, min Cimo qedandibû. Çalakiyeke pir bi amadekarî, bi plan û bi însyatîf bû.

Ji bo Miho jî heman tişt bû. Miho jî ez gelekî mijûl kiribûm, serê min şikandibû. Belê hîna şopa wî jî heye. Ji bo wî jî bi heman planê ez derketim serê ban. Dê ji quncik ve Miho derbikeve, yek jî divê ji min ve newê dîtin. Dê ji quncik ve derbikeve, ez jî li quncikê din ê ban im. Dîsa min kirasê xwe bi keviran ve dagirt û dema Miho ji quncik ve derket min kevir li ser barandin, Miho birîndar bû. Ew jî bi reveke lez hetanî hundirê mala xwe çû. Tê bîra min ez bawerim min hetanî tariyên mala wan jî da dûv wî. Û Miho jî wisa qediya.

Dema ez niha li van her du çalakiyan dinêrim, bi hemû aliyan vê şêwaza min xwe dide dest. Plan, veşarîn û însyatîf heye. Êrîşa yekem ji min de ye û hetanî dawiyê jî ez bi dûv dikevim. Heke bal bê kişandin di vê derê de hemû taybetmendiyên gerîla veşartîne. Hîna di temenê biçuk de weke van mirov dikare behsa gelek çalakiyan bike.

Çi ye? Di şertên gund de şerên bi malbatê re, şerên bi zarokan re...tirsa min a ji ber zehmetiya şerê zarokan, gumana min a ji ber encamên xirab ên lêdan-şikênandinan; hesta ev derbeyên giran ji bo jîna min a demdirêj e, hemû hîna di bîra min de ne. Heke gengaz be nemirin, lê heke negenganz be, weke çîroka Cimo û Miho bi rêxistina çend çalakiyên biplan û bihêz. Û min peyitand ku hişyariya gerîlayekî qedîm nikare nîşan bide, min di ew temenê xwe yê biçuk de nîşan da. Piştî ku ez demekî dirêj di parastinê de mam, bi carekê ve min dest bi êrîşê kir û derbeyên mezin lê

dan.

Nakokiyên nava malbatê hebûn. Kevneşop û normên malbatê yên ku xwe disepandin hebûn. Li dij wan jî, weke serhildana yekem ez ketim nava berxwedaneke mezin. Hêrs, şer û serhildaneke mezin. Piştî wê vaye hetanî serhildaneke li dij gund, li gor min şêwaza şerekî mijara gotinê ye. Ev jî şerekî hêrsê bû. Wê demê piştî ku ez ji gund qetiyam, bi temaşekirina dawiyê re rondikên min ên weşiyan tên bîra min. Bêguman ev ji hêrsê dest pê dike. Sosret e? Çima tu wisa şer dikî û çima tu wisa qut dibî. Taybetmendiyeke kesayetê ye. Min got kesayeteke wisa bi hestan ve barkirî.

Ez diqetim. Qutbûyîna ji civata gund û bi ser civaka bajêr ve çûyîn heye. Bi her aliyê xwe ve şerekî civakî ye.

Hêrseke min a ku di deh saliya min de mezin bûyî hebû. Bi hêrseke mezin, weşîna rondikan a ji çavên min hebû. Lê min ew bir serhildanê. Xwatir xwastin heye. Ez di ew temenê xwe yê zaroktiyê de, xwatir xwastineke sotîner bû. Lê ji nû ve veger hene û hemû jî kûr in. Bêguman min ev ji tu kesî re venegotin, tu rewşeke min a vegotinê jî tunebû. Lê bi puxteyî wisa bû.

Veqetîna min a ji çiya, kevir, av, civîk, gumgumok, pirpirûk, mar û mişkên welatê xwe gelekî girîng e û tu carî ne ji kirina min a wir bi siyaset kirina min ve girêdayî ye.

...

Bîranîneke biçuk: mezinekî malbatê hebû. Dixwast hindekî mala me jî biwênerîne (denetim). Hîna di bîra min de ye, zilam me dişopîne. Di destên wî de bavê min jixwe weke xizanekî ye. Ez bawerim hindekî bi pêşveçûyîna min a azad hesiyaye. Hat û got; “ev destên te dîsa bi çi re mijûl dibin, li hember min rişt(cidi) be, min pir rişt guhdar bike!” Tê bîra min wê demê ev gotin kir; “ma di te de civa (madeyeke bêrawestan) heye lo?, li hember mezinên xwe zexm bisekine!” pîvana feodalî li ser min disepand. Min jî wê demê bi rastî lêyîst. Ez bi ber çavên mêrik ketime û hîna wê demê dixwaze min rast bike.

Ji ber ku min radestî qebûl nekir û li ber xwe da, di aliyê civakî de asta qebûlkirinê hindekî bi dest dixim. Îro ez di nava gelê xwe û dostên xwe de hindekî eleqeyê dibînim. Ez

di hêzên dijberî xwe de jî rêzê diafirînim. Heke em hîna şênber biaxifin, min bi salan nedikarî xwe bi gundiyekî bidim guhdarkirin. Daxwaza min çi dibe bila bibe, min ji diya xwe re, ji bavê xwe re, ji gundiyên xwe re, ji hevalên xwe yên dibistanê û zaroktiyê re vegot ku ez nikarim xwe bidim guhdarkirin.

Li wê derê min pêvajoyeke sosret a tekoşînê derbas kir. Dîsa di aliyê jiyana civakî de divê mirov hindek taybetmendiyan zelal bike. Di hawirdora gundekî wisa de, astengiyên têkîliyên malbatê çawa ne û bi nakokiyeke rûbarî malbat çawa bi hev re dibin dijmin, min ev çawa weke xeteriyê dît, ev min vegot. Ev tê çi wateyê? Hindekî xwastina pêşveçûyîna civakî ye.

Li pêşiya pêşveçûyîna civakî nakokiya Kurd a navdar heye. Şerê xwînê, şerê cîranan, şerê kuçîkan, şerê keran, şerê bostek ax. Min xeteriyên vê dît. Ev jî rewşeke pir paşverû û paşvemayî yê eciziyê ye. Ez ji vê nerihet dibûm. Bersiva ku hîna min di zaroktiya xwe de peyda kir, gihiştina berovajiya vê ye.

Gihiştina berovajiyê ve çi ye? Ez dê nebêjim binkeya civakî ya gund ku bi cih bûye, li dij binkeyeke ji civakbûnê re girtî hindekî afirandina civaktiyê ye. Hîna di wê demê de bi hevtemenên xwe re ji pêwîstiya têkîliyên veşartî min xwe neda paş. Temenê min heft-heşt pir zêde deh bûn. Di hawirdora gund de yekem têkîliyên xwe yên veşartî min wisa ava kirin. Pir baş tê bîra min, ji mezinên malbatê veşartî, bi zarokên malbatên ku weke dijmin hatine binavkirin re min têkîlî ava kirin. Rêxistinkirineke veşartî, yên ku wan weke dijmin bi nav dikirin, min xwast ez weke heval pêşwazî bikim. Yanî derveyî armanca cigehî ez ketim nava armancan. Tekoşîna min, wisa bi nepejirandina têgeha wan a dijmintiyê ve dest pê kir.

Dema ez heft salî bûm min xwe wisa fêr kir. Ez diçûm hema digotin; “vaye dîsa ciwa hat”. Ez deh salî bûm, min got “ma tu dayikî?”, “ma tu dizanî te ez di cîhaneke çawa de, bi şertên çawa re rûbirû hiştim?” Ew pirsîneke hesabê bû. “ma tu dizanî tu ji zarokekî çi dixwazî?” Min mirîşk û çêlik nîşanê wê dan û min têkîliya me şipande ya wan. Ez pê

hesiyam ku hindek tiştên dayikeke dînok ji zarokekî nexwaze hene.

Jiyaneke wisa pêwîst e. Ez bi tevger bûm. Hevseng jî hebû. Bêguman disîplîn pîştê wê yekê tê, ez xwedî disîplîn bûm jî. Mesela ez yekemîn şerên xwe yên bi maran re, guran re û civîkan re gelekî xwedî disîplîn bûm. Ji ber ku dikarîbûn bi min vebidin. Ez hema di nava hemû tehtan de direviyam, min hema destên xwe diavêtin hemû tiştî, yekî jî bi min veneda. Ew jî bi disîplînê ve girêdayî ye. Min xwe bi hêsanî neda girtin. Ev bi tempo ve girêdayî ye. Tu kes berovajiyê min nebû. Min dizanîbû ku ez xwe bi hemû kesî jî bidim guhdarkirin. Yanî tiştên herî bêbawer min digotin. Her kesî bi ken derbas dikir. Ya girîng xwe dayîna guhdarkirinê bû. Balkêşî bû, xweşikiya uslub bû? Wan çawa dixwast weke wan dibû, weke ku min dixwast ne. Yan jî çawaniya xwasteka xwe min piştre nîşan dida. Ez şerekî çawa dixwazim. Ez yekîtî û tekoşîneke çawa mezin dixwazim. Ez encama wê çil salî bi şûn ve nîşanî mirovan didim. Ji bo ez wan nîşan bidim, wan çawa dixwast ez weke wan dibûm. Mînak digotin, “ax kurê me jî hebûya, wisa bixwenda, wisa bixebitiya”, min wisa nîşan dida. Ji bo ku gundî min biecibînin. Bêguman, rexmî ku ez qet wan naecibînim, rexmî ku li hember wan ez di nava eciziyekê de bim, ji bo ku tenê ez wan bikşînim nava refên xwe.

Erê, li dij jiyana gund a feodal di nava eciziyeke bêeman de me.

Zilamekî cîranê me zeviciya bû. Zewaceke duyemîn a ku min wate nedida kiribû. Û zewaca xwe ya duyemîn bi keçeke di temenê min de re kiribû. Wê demê jî ew zewac ji bo min qels bû. Keçikeke di temenê min de wisa bi hêza peran çûyîna ji zilamekî wiha qels re tawanek bû, bêehlaxiyeke mezin bû. Heke ji destên min hatiba wê demê min dê ew keç ji destên wî zilamî derxistiba. Min bi ser nexist, ji ber ku ez bêhêz bûm. Hêza min tune bû.

Xwişka min: ên ku qet ew nedîtine, ji rêka du rojan hatin, gotin “em dixwazin”. Hatin li beramberî çend telîs genim, çend qirûş dirav girtin û birin. Ev têkîlî hîna min nepejirandiye. Zilam ji rêka çend rojan hatiye, yek jî weke

ku xulamê feodal, azepê axa ye xwişka me bir û çû. Min got; “çiqas guneh bû”. Dîsa hêza min têrê nekir. Çû.

Dîsa tê bîra min (ev ên ku min di jiyana biçukahiyê de jiyîn e) dîsa keçeke paqij bi zorê dabûn malekê. Wisa pir bêyî eman, bi lêdanan dabûn. Keç, li hember zilam serê xwe natewîne, direve. Tê bîra min ez xwende bûm, ya ku cara yekem hat kêleka min û ji min re got, “tu dikarî hindekî min fêrî xwendinê bikî” ew keça gund bû. Wisa dihat li hevokan temaşe dikir. Hîna di bîra min de ye, min yek-du peyv jê re gotin, weke din hêza min çênebû.

Weke din hêza min çênebû. Vaye ez îro tola wê hildidim, ez hîna li dûv tola wê me. Ev asteke civakê bû, heke dê wisabûya bila qet nebûya baştir bû. Îroj di civaka min a rêxistinkirî de, êdî weke ya berê ne wisa asta civakî dimîne, ne jî jinên wisa dimînin. Jin jî êdî zilamên weke berê nabînin. Ji ber ku li gor min ew jî ketineke mezin e. Jineke ku bi şêwazên serdestiya kevin bi têkîliyan ve hatiye girêdan wê wenda kiriye, dê wenda bike. Jixwe ji bo min îro jinek bi qandî ku azad e heye. Jineke ku şaş bi zilamekî ve hatiye girêdan, ji bo min qediye. Li gor min, jina ku şaş hatiye girêdan, a ku xwe li gor asta rêgeza azadiyê bi rê ve nebe, hêza xwe wenda kiriye, yan jî qediye. Jin her dem tê îdealîzekirin. Îdealîzekirina wê jî bi azadiyê ve girêdayî ye.

Ez weke kes jî bi hêsanî hez nakim an jî mafê hezkirinê di xwe de nabînim. Mînak weke gelek kesên ku qet ne xwedî maf in, xwe mafdar dibînin. Ez, weke ku gelek kes dibêjin evîndarê gelê Kurd jî nebûm. Li dij gelê Kurd ez di nav êrîşekê de me. Bêguman ev jî evînek tê hesabîn, lê weke wateya yekemîn ne. Di wateya bi qirika hev girtinê de, di wateya şerê bi kirêtiyan re, lê belkî bi çavreşî ye. Û di rewşa bêmafiya min de, ez ji tu kesî re nabejîm “tu çawayî” jî, ez hêza “merhebayê” jî di xwe de nabînim. Ev gelekî girîng e. Ne hezkirin, ez dê bibêjim mafê min ê derbasbûna di kelêkê re jî nîne. Lê piştî ku hewl nîşan da, piştî ku keda xwe ya mezin nîşan da, wê demê ez dikarim bibêjim ku niha ez dikarim ji vî gelî hez bikim û ew jî dikarin ji min hez bikin. Ev bi çi pêk hat? Bi kedê, bi keda şerê herî babistînî (soydar).

Em berê jî di kêleka keçan re jî û di ya ciwanmêran re jî derbas dibûn. Min feraseta hezkirina kevin weke feraseta hezkirina meymûn şîrove kir. Tiştê ku li ser rastiya civakî serdest ev e. Min ji vê re lenet anî, jê tirsiyam û bi paş ve kişiyam. Reviyam.

Hevalên me yên zaroktiyê hebûn, keç jî hebûn. Ne hezkirin, min nediwêriya navê wê jî bînim ser ziman. Bêguman di hawirdora gund de. Û her dem hindekan keç digirtin û direviyan. Min bi hewlnakî pêşwazî dikir. “çawa wêrîbû wê keçê birevîne?” Keç jî dixwastin. “çawa diwêriyan keçê bixwazin?” Di vê mijarê de wêrekiya min tune bû. Bi rastî girtin û revindina keçê ji bo min bûyereke hewlnak e. Tirsnak e, keç xwastin bûyereke pir zor e.

Piştre tê bîra min dayîka me di vê mijarê de hindek ezmûne kiribûn. Agahiya min jê tunebû û min digot, “nabe”. “ew çawa dikarin bi navê min keçê bixwazin?” Wisa keç xwastineke navdar nebû. Wisa ji dûr ve me bihîst, tu cara dîtirê jî gotina wê nebû. Ji ber ku di Kurdistanê de girêdana vê bi pirsgirêkeke bingehîn re heye. Min didît, xwişkên me hatine xwastinê. Li beramberî çend bizin û kerekî digrin û dibin. Wê demê min bi ecizî pêşwazî kir. Min digot, “wisa rewşeke xwezayî nîne, wisa girtin û şandina keçên me yên ji cihên nediyar re.”

Jixwe her dem dixwast ez ji malbatê, ji Kurdeyetiyê û ji zorê birevim. Di vê wateyê de tu kes weke min tirsonek nîne. Tê bîra min dema cara yekem leşker hatin gund, di mal de sê telîs hebûn, ez ketim navbera wan û min xwe veşart. Ev jî li xwe mukir hatine. Lê ez niha weke xwedayê şer im. Dê ev kar bibe. Ji kur hetanî ku derê?

Pîvaneke xwedayî hatiye çêkirin.

Bêguman bi hewla min a zaroktiyê êdî vejîna gelekî pêk tê. Ji ber ku ez meşa xwe ya awarte dixim meşa gel. Misoger şêwaza meşa min cewaz e. Divê mirov vê yekê jî pir baş pênase bike. Misoger ez di xeteke cewaz de dibînim. Ez bi tenê xwe me û pir li dijî kevneşop û şêwazê jiyanên kevin im. Lê pir bêdeng, bi şêwaza ku xwe zêde eşkere nake yan jî kesekî ku hêza xwe nagihê û di vê wateyê de têkîldarî tu kesî nabe.

Jiyana me, ne jiyaneke pêwîstiya jiyankirinê bû. Min xwe li gor vê pîva. Tiştê ku pêwîste neyê jiyîn ez dijîm. Xwe xapandina min, ji xwe re û ji vî gelî re dê bibe xerabiya herî mezin. Lê piranî, li tiştê ku pêwîste neyê jiyîn re, bi jiyankirineke erjeng, bi teşeyekî xwe lê pêçaye û di temenekî de lê eliqî maye.

Pîvana xwedayî hatiye kirin û divê em pir mezin bilêyîzin. Vayê wisa min bi tena serê xwe, xwe ji tirsonekiyê derxist û hatim rewşekê ku li dijberî hêza herî barbar a dîrokê bimeşim. Û di ev tekoşîna me de navê wendakirinê nîne, tenê serkeftin heye. Leşkerê rast, fermandarê rast ê PKKê bi taybet divê bi tiştê xwe ve bi serbikeve. Di pirtûka wî de, di meşa wî de cihê peyva wendakirinê nîne.

Min bûyîna xwe peyîtand. Me ev bi keda evqas şehîd afirand. Şehîd hêza sereke ne û niha gel bi min ve girêdayî ye. Ev hêz (ku zagon û teorî vê dibêjin) di min de kom bûye.

Bûyera ku em jê re xwedayî dibêjin jî ev e.

Hêza teoriyê xwedayî ye. Me hemû jî gihiştandine hev.

Û ez van bi navê bavê xwe nabêjim. Her roj bi navê nirxên mezin hêza min a axaftinê heye.

"Nizanin, lê dikin."
**Karl Marx**

## Amed

Di pêşveçûyîna xeta civakiyê de li hember gund min serî netewand, ji malbatê re serî netewand, min serî li hember pergalê jî netewand.

Dewsa civaka gund, ketina sînorên civaka bûrjuva gelekî westînêr e. Yekem car ketina civaka bajar, ji bo destpêkekê gelekî zor bû. Him bajarên biçuk, him jî Enqere ketina nav wan gelekî zehmet e. Ev jî girîng e. Ez ketim nav lê min xwe wenda nekir. Rexmî ku ez gelekî negirtîbûm, di nava bajêr de ez neheliyam. Bi salan bi mehan ez li bendê mam. Li beramberî mereq û hewla mezin a fêmkirina bajêr, ez di qeraxa jiyana bajêr re jî derbas nebûm. Hevalên min di nava sê mehan de diketin nav û xwe didan jiyîn, lê min nekarî û li beramberî vê yekê zikê xwe bi min dişuştin. Erê zarokên bajêr bi beşeke mezin di nava nêzîkatiya zik şuştinê de bûn.

Eleqeya mamosteyan cewaztir bû. Di pêşketina min de xwedî hêvî bûn. Lê li gor mirovên min û kesên derûdora min ez di rewşeke henekî de bûm. Bi ihtimaleke mezin li gor pergala jiyana wan ez di xaleke cewaz de dimam û yek ji bo xwe xeter didîtin. Li hember civaka bûrjuva kêm zêde ez weke xeteriyekê didîtim. Li hember jiyana civaka bûrjuva eciziya min hebû û ez neketim nav, min hêza xwe wisa ji dest berneda. Min ew di cîhana xwe ya hundir de mehkum dikirin, wan jî ez bi ew henekên xwe ve mehkum dikirim. Wisa derbasbûyîneke civakî mijara gotinê bû.

Ez li dij bandorên kemalîst û feodaliyê jî xwedî endaz (temkin) bûm. Ez di rewşeke wisa de bûm ku, bi carekê ve nediketim nav û ev cewaziya xwe min her dem diparast.

Ji bo avakirina komên hevalan min hewla xwe ya mezin gotibû. Ez carna ketim nav hindek mijarên bingeh, lê carna jî

min xwe ji yekê diavêt yeke dîtir. Ez bi destpelkî diketim nava mijarên weke ol û felsefeyê. Di hemûyan de mirov nikare bibêje ez gelekî serkeftî bûm. Lê şêwazeke min ê ezmûneyê heye ku balkêş e. Yanî hindek dikevin nav, dawiya jiyana xwe tînin; ez tenê dest dipelkînim.

Qutbûyîna min a ji kesayeta Kurd a kevneşop, bi dîtîna min a bêmafiya di civakê de û bi dijderketina min a ji hemûyan re ve girêdayî ye.

Dema ez hîna li Nizibê diçûm dibistana navîn her tim henekên xwe bi min dikirin. Bihizirin, bi zarokekî weke min ku xwediyê serhildana hatiye diyarkirinê, pê henek dikirin. Di dibistanê de belkî ez zarokê herî feqîrok bûm an jî li gor mamosteyan ez ê herî hişmend bûm. Ji ber ku li gor dema wê, him mamosteyên jin, him jî yên zilam gelekî nirx didin min û her ku diçe zanebûna min bi pêş ve dixin. Di dibistanê de ez her dem li rêzên pêşiyê bûm, lê rexmî vê yekê ez dibûm henekê zarok û xwendevanan, bandorên neyînî yên bajar hebûn. Piştre ji bo ez vê vegerînim teqînê sal pêwîst bûn. Hîna tê bîra min, hindek ji wan zarokên serbendan, gelek jî yên axa û xulaman bûn. Di min de hindekî taybetmendiyên Kurdî hebûn, ez bawerim nêzîkatiyên min zêde bihêz nebûn an jî li gor wan hindekî cewaz bûn. Min nedikarî ez weke wan bim. Pir vekirî bû ku ez li gor taybetmendiyên wan ên civakî nahelim û wan ev yek weke xeteriyekê didîtin. Bi biçukdîtinê ve û bi henek kirinê ve her roj dixwastin min li gor xwe paş ve bixin.

Bersiva ku min dida çi bû? Bi mamosteyan re avakirina pêwendiyên rast. Min gav avêtin di pêwendiyên baş ên mamosteyên xwe re didît, min baş li pirtûkên xwe dinihêrt; ez her gav di yekemîniya refê de bilind dibûm ku, ev jî di encam de şer e.

Şerekî pir bi wate ye. Piştî ku ez di pêwendiya bi mamoste re şareza bûm, yek jî piştî ku min yekemîniya refê bi dest xist, dihate wê wateyê ku min ev zarokên bûrjuva têk dibirin. Pir şênber e, ez her sê refan jî wisa derbas dikim. Li dij teşeyê pêwendiya bûrjuva eciziyeke min a misoger pêş dikeve. Belkî pêtir xeter dihatin û ez ji şêwaza ku wan disepand dûr disekiniyam. Ji ber ku, min hindekî xwe nêzî

bikira dê mala min xira kiribana. Bi şêwaza ku wan disepand ne, di rastiya min de tekoşîn pêşxistin, bûyîna yekemê refê û ketina çavên mamosteyan; dikarim bibêjim ku min ev her du jî bi ser xistin.

Vaca kemalîst, hindekî jî vaca dibistana leylî (yatılı okul) ye. Kemal bi xwe xwendevanê dibistana leylî ye. Li navenda Enqereyê ez bûm xwendevanekî dibistana qedestro yê. Ez bawerim wê rê li pêşiya vê pêşveçûyînê vekir: min ew derfet bi dest xist ku, him bi dewletê ve spartî li Enqerê dîtina rastiyan, (ku ev gelekî girîng e) him jî li navenda Enqerê çavdêrkirina civaka bûrjuva. Heke ez negihiştibama wê derê, wê derfeta min a çavdêriyê nebûya. Ez dikevim nava civaka bûrjuva, dîsa bi dewletê ve spartî, dibistaneke ku min bîrê nekiriye, lê dema Enqere bû mijara gotinê, diviya ku min ezmûne kiriba.

Dema ez gihiştim Enqereyê, mamosteyekî ku min rasthatî di bosê de naskir hebû. Min got, "tu hindekî dikarî alîkariya min bikî". Min bi kirasê wî re jî girtibû. Weke ku min berê li Berêçûk bi kirasê bavê xwe re girtibû, heman hawirdor. Dîsa Enqere weke çiya bi ser min de tê û ez tirsnak lê temaşe dikim. Min peykerê ataturk dît. Min zilam zixtand; "ka li vî bînêr!". Her tişt bi min hewlnak dihat. Nakokiya mezin. Weke nakokiya axa ya li gund. Hemû niha di bîra min de ne.

Di Tapu-qedestroyê de mamosteyên min ên leşker hebûn. Diçin dibistana herbê. Ez li ser destan digirtim. Ez nizanim, gelo ma wî mamosteyî jî bi zanebûn wisa dikir? an jî gelekî hez dikir? Dihat û wisa digot, "zarokno, min kompozîsyona Abdulah girt, çûm bi profesorên dibistana herbê da xwendin, hemû şaş man". Û bi xwe şîrove dikir. Yanî heke li gor wî bûya, ez firişteyek bûm, dahî bûm. Zilam evqas nirx dida. Leşker bû. Belkî jî di min de xeterî dît, xwast wisa min bidest bixe. Ev zêde girîng nîne.

Weke hest jî, min xwe diçewisand û li dij bûrjuvaziyê xwe zêde xwedî şens nedidît. Dîsa rexmî ku ez yekî çalak bûm, min gelekî xwe diçewisand. Her ku çû min pêwîstiya bi nav de çûyîna olê dît. Ez bawerim li dijberî nirxên civaka bûrjuva weke teşeyeke ku min hîna di zaroktiya xwe de li

gund dîtibû, ez li ser rastiyeke olî ya ku xwe tê de aram dihizirînim ponijiyam.

Nimêjkirina min a li gund min vegotibû. Meleyê me digot," heke tu bi vê lezê biçî, tuyê bifirî". Ew firîn piştre pêk hat. Firîn, şoreş e. Tê wê wateyê ku wî meleyî hindekî li gor ferasetên xwe yên olî be jî, ev yek dîtiye. Li hember civaka bûrjuva hetanî dawiyê min xwe parast. Û ez bawerim ev bû tiştekî baş. Ji ber ku, heke nirxên darezandina bûrjuva ez dagir kiribama, ne gengaz bû ku, ez bi tendûristî ketineke rast ji pêvajoya 1970'an re bikim.

Di dîtbariyê de ez hindekî muhafazakar bûm. Lê di bingeh de min rewşeke pir bi nakok jiyan dikir. Ji bo heram nebe, her gava xwe min bi pîvan diavêt. Li dij heramê hişyarbûyîneke min a awarte hebû.

Wê demê pirtûkeke alimekî mezin ê ku oldaran dixwend hebû. Wê demê min pirtûkeke Seyîd Kutub bi dest xistibû: "ol ev e". Pêvajoyeke ku ez dibêjim ev rêka min e û jiyan ev e heye. Bêguman, ez şeş salên xwe yên dibistana navîn wisa dinirxînim. Ku dirêjahiyên vê yên gund hene.

Dema ez li Enqerê di lîseya pîşeyî ya tapu kadastro de bûm, ez ji çûyîna mizgefta maltepeyê bi paş ve nedimam. Mizgefta maltepeyê, hema li kêleka dibistana me bû; mizgefteke pir xweş e. Pir caran ez diçûm wê derê. Ez beşdarî konferansên komeleya tekoşîna bi komûnîzmê re dibûm. Heta ez dikarim bibêjim ku ez diçûm ocaxên ulkucu'yan jî. Lê min zêde ne eciband. Ez di nava atmosfereke wisa de bûm. Ew hulusî turgut hebû, min gelekî guh dida wî û hevpeyvîna wî ya bi berzanî re jî bi baldarî dixwend. Yanî ev aliyê min jî hebû. Weke raman min eleqe nîşanî pirtûkên olî dida. Min necîp fazil kisakurek bi baldarî dişopand. Ez beşdarî yek-du konferansên wî bûm, min awarte dît. Heta ez coşandim. Dîsa di ocaxa Tirkan de beşdarî du konferansan bûm. Ez bawerim ev di fêmkirina xeta bingeh de bîranînên girîng in. Berpirsyarekî Komeleya Tekoşîna bi Komînîstan re hebû. Ez bawerim refîk korkut bû. Teorîsyen bû. Ez li vir beşdarî civîneke ya Demîrel jî bibûm.

Dema ez di pêvajoyeke wisa de bûm, tê bîra min, bi rasthatî min pirtûka hubermann a bi navê “Alfebeya Sosyalîzmê” bi dest xist. Min xwast ez binêrim, wisa bi plan ne. Yanî tu niyeta min a girtin û xwendinê tunebû. Min wisa hilda destên xwe yek-du rûpel xwendin, ku ez jê eciz bûm. Wê demê li dibistanê hevalekî min ê gundî bi navê ezîz hebû. Heyranê çetîn altan bû, li dij NATO yê radipeyîvî, bi navê çepgiriyê radipeyivî. Niha bûrokratekî baş ê pergalê ye. Ez jî ji wî eciz bibûm. Dema wisa bû, min ew pirtûk hilda destên xwe, her ku hevok pêş ve çûn tiştê ku ji zimanê min weşiya ew bû, “ol wenda dike, Marks bi ser dikeve”.

Ev dirûşmeyeke guhertinê bû. Heke ev yek şênbertir were îfadekirin, îdeolojiya kevneşop wenda dike, jiyana sosyalîst bi ser dikeve. Ez dikarim bibêjim ku di sala 1969’an de ez gihiştim vê biryarê. Ji ber ku, tê bîra min, min ev gotin bi xwe ji xwe re kirin.

Piştî wê ez weke fermanberekî (fermanber) kadastro firiyam Amedê. Li Amedê çavdêriya Kurdistanê diviya ku hindekî din aso berfireh kiriba.

Weke fermanberê (memur) dewletê, li wê derê bêhtir derfet hebû ku ez rastiya sosyalîst û rastiya dewletê baş bînim ber hev. Ji ber ku, berê me nedikarî di nav zewiyên genim û pembû de çavên xwe vebikin. Lê wisa hindekî xwedî pere, bi qandî tê xwastin bi dest xistina derfeta çavdêriyê, jiyaneke wisa ya otelê. Hindekî bi bûrjuvayên biçuk re jiyîn dibe ku hindekî te wêrek bike. Axa nêzîkatiya yekem nîşan didin. Bûrjuvayên biçûk ên weke xirbeyên demagojiyê ku berê me nedikarî em di kêleka wan re derbas bin, her roj em rû bi rû ne. Ev hemû hêza çavdêriyê zêdetir dike.

Gundiyên girêdayî, gundiyên axeyan, rexmî ku fermanberekî kadastroyê bûm, her dema ku ez derdiketim nava erdan digotin, “xwîn ji pozê me tê” û bi rastî jî wisa bû. Di ew jiyana fermanberiyê de jî, min xwîn ji pozê gundiyan dianî. Bêguman, ev tempoya xebatê nîşan dike.

Ez di fermanberiya tapu ya Amedê de salekê mam.

Dayik mirov a herî nêz e û bi xwezayî ji kurê xwe hindek tiştan dixwaze. Rik danabû, digot, “tu çima ji min re çend

mîtro paç nakirî?" Ji wê rojê bi vir ve min ji wê re tu tişt nekirî. Ma dibe ku kurek tiştekî nekire? Ez xwedî muçe (maaş) bûm jî, lê min got "ez nakirim". "heke te çav berdabe paçekî, di ne dayîna wê de ez jî misoger xwedî helwest im". Lihevhatinên min ên wisa jî hene. Çima? Ji ber ku, karên min ên mezin nabîne, di vê mijarê de daxwazan pêşkeş nake, dixwaze her tiştî bixe asta parçeyê paçekî. Ji rewşa min a wê demê tê fêmkirin ku, ez çiqas xwedî edebim û dixwazim di nava hişyariyeke mezin de bimînim. Yan jî ne ji ber nefêmkirina min a dayîkê ye û nebûna kurekî layiqe dayîka xwe ye. Wisa erzan fikirî, min jî rik danî û nekirî. Wisa çavên wê li paş mayî çû.

Wê demê qet ez nabêjim ku diravên min nînin. Esas ez dizanim ku min deh hezar lîra di banqeyê de razandiye. Her wiha dema min ji wan gundan, ji axeyan dirav digirtin, min digot, "dibe ku ev bibin diravê şoreşê". Tiştekî weke bertîlê bû, lê tê bîra min ku min bi şertekî qebûl dikir. Diravên bavê çawa ji bo serhildanê min bi kar anî, min digot diravên min ji wan girtî jî "ez dê rojekê ji bo serhildana giştî birazînim". Û min qebûl kir. Dema bertîla yekem dan min, ji bo qebûlkirina bertîlê min got "tu çawa dikarî bertîl bixweyî" û min xwîdan dida. Ez hizirîm, min nîqaş kir di dawiyê de min bi wîjdana xwe da qebûlkirin. Ev dirav dikarin ji bo Kurdistanê werin bikaranîn û rewa ye. Ev dirav ji vê derê tê, dîsan mirov dikare ji bo başî û xweşikiya vê derê bi kar bîne. Girêdayîneke min a wisa hebû.

Hevalên min jî gelekî vedixwerin û ev dirav di her karê qirêj de bi kar dianîn. Pir girîng e, girtina bertîlekê dikare mirov xirab bike, bêehlaq bike. Hîna tê bîra min, di wan şertan de (1970) bi carekê ve bi destketina du-sê bihayê mûçeyên min gelekî balkêş bû ji bo min. Ji bo nexirabûyînê bi lez fikirîn û dîtina çareyekê gelekî girîng e. Û ez hizirîm ku, bertîlekê ez gazî Kurdistanê kirim. Ramana Kurdistanê bû rewşeke girêdayiyê bertîlekê. Lê ya ku Kurdistan qedandiye jî ev bertîlgeriye. Li wê derê berovajiyê vê, vê bertîlê hişt ku ez li ser Kurdistanê bihizirim. Ji ber ku, heke tu vî diravî bigrî û bi kar bînî tuyê misoger kesayeta xwe wenda bikî. Ez hatime fermanberiyê bikim, belkî ez dikarim

pereyên zedê bibînim û xwe dewlemend bikim. Lê heke ez dirav bigrim û bikevim riyeke xirab an jî şaş (ku, Kurdistan şênber nîne) dibe ku kesayeta min bikeve riyeke cewaz. Dikare bi bertîla yekem wenda bibe û here. Lê ez dibêjim, “ma ez dê bertêla yekem çi bikim”. Hetanî sibehê xwîdan didim û ez çareyekê dibînim. Wê demê ramaneke pir bi sînor a Kurdistanê hebû û bi ser de çûyîna min ne diyar bû. Heke ez bi ser de biçim jî, ez dê cewaz biçim, ezê lez nekim. Vaye, bertîl dide lezandin. Ev diravê ku di berîka min de sekiniye dibêje, “Kurdistanê bihizire, ji ber ku te ev dirav ji bo vê yekê girt”. Vayê dema min deh hezar lîra dîtin, min xwe avêt Stenbolê.

Di rastiya civaka me de, dewsa gelek meşên, girêdayî, bimal, qels û lewaz; bûyîna xwedî meşeke şanaz, bi kesayet, bi nasname, bi vîn, wekhev, weke moral xwe îfade kirî, wisa bi biryar û jiyanî gelekî girîng e. Ez dihizirim ku azweriya rast ev e. Divê li gor wê ev hêza bandordar û jêneger were nîşan dayîn. Ez îro jî, çiqas dixwazim wisa bim? Ev ne şerm e, berovajiyê vê ya şerm di wateya qedîna her tiştî de bi ew şêwaza jiyana kifnikî jiyîn e. Ez heyfdarim, van jiyînan giyana min xirab dikir.

Di encam de salek fermanbariya min a Amedê balkêş e. Ez hindekî bi dirav re hevnasînê dikim, bertêlê dinasim, bi gotinên weke “axê min, begê min” re rû bi rû dimînim. Ez fermanbarê dewletê me, têkîliya di navbeyna gundî û dewletê de fêm dikim. Lê ez xwedî niyetekê wisa nînim ku weke fermanbarekî biçuk bimînim. Misoger ji bo ku ez hindekî din bilind bibim, amrazê dibistanê heye, dibêjim ku divê ez vê ezmûne bikim. Ji bo vê yekê ez beşdarî xebatên amadekariya zanîngehê bûm.

Ez gelekî di sûrên Amedê de geriyam û mam. Wê demê oteleke sur palas hebû, ew biryargeha min bû. Otela lîceyiyan bû, bi qandî ku min bihîstî ya behçet canturk bû. Piştî wê vegeriyaye otela demir an jî tiştekî wisa. Yanî oteleke di derbarê de Kurdan de xwedî çavdêrkirineke zêde bû. Azweriya min a çûyîna zanîngehê, ji bûyîna bûrokratekî bilind zêdetir, rastirîn beşdarbûna hewaya siyasî ya Tirkiyê bû. Di armanca min de siyasal hebû. Bi vê re têkiliya

siyasetê derdikeve holê. Lê weke dibistaneke navbeyn jî, heke ez di wê de bi sernekevim, li Stenbolê li ser hiquqê jî hiziriyam û min tayîna xwe hilda wir.

**“di tekoşînê de şêwaza tenê ya ku mirov bibe jiyanê; şêwaza serkeftina peyitî ye.”**

## Artêşa Yek-kesîn

Dawiya 1971'an min xwe li hiquqa Stenbolê qeyd kir, lê ez qet neçûm dibistanê. Ez li Bakirkoyê fermanberekî kadastroyê bûm. Nêzî Avcilar li gundekî bi navê Şambayat min fermanberiyeke kadastro ya baş da meşandin. Hindekî li wê derê jî hevkomiya diravan çêbû. Çavdêriya ku min ji bakirkoy û atakoyê girtî gelekî pêşveçûyîna jiyanê bû.

Min qet xwe bi destê jiyana Stenbolê de berneda. Dîsa bi tenê bûm. Min dixwast ez bixwe xwe dahûrînin, min hesab dikirin. Li gel ku hindekî hestên min pêş ve çûbûn, jiyana Stenbolê tu caran di min de xwe eşkere nekir.

Wê demê, di nava refên pirtûkan de pirtûka lenîn a bi navê "mafê tayînkirina qederê ya gelan bixwe" min dît. Cara yekem li vê derê pêk hat û min ev raman ji xwe re kir mal. Tê bîra min, min dest bi xwendinê jî kir. Ez di pansîyoneke nêzî warê xwendevanên sîte yên Stenbolê de dimam.

Piştî wê DDKO (ocaxên çanda rojhilat a şoreşger) hatibû sazkirin, Dev-Genc (ciwanên şoreşger) hatibû sazkirin. Çalakbûyîneke zêdeyî hebû. Ez bûm endamê DDKO yê. Tiştê di vir de diyar, ev rêxistineke zarokên feodal-bûrjuvayê biçuk bû. Ez di vê watêyê de, di aliyê reseniya çînî de bi tenê bûm.

Semînereke ku min destpêkê hildabû ser şanên xwe hebû. Ez bawerim mijara wê "dîroka civakan û mijara Kurdan" bû. Û min gelekî bi wêrekî û li gor serdemê di asteke herî pêş de semînerek da û her kes şaş kir. Ez gelekî xeter dîtim. Digotin ev ji kur derket. Ji ber ku ev peyva ku min li wir gotibû tê bîra min: min got, "qaşo peyxemberê me gotiye, xwedê tu derfeta sazkirina dewletê nede Kurdan", "heke tu bidî dê li serê cîhanê bibin bela". Dema min ev gotin kir, ji ber ku min

peyva dewleta Kurdan daye bikaranîn, zimanê hemû kesên li wê derê sekiniya. Ez bi rexnedarî nêzîk bûm. min got, “di vê derê de bêmafiya ku îdeolojiya ol dike eşkere ye”. Ez bawerim wê demê ji pirsgirêka netewî re nêzîkatiyeke min a misoger rast mijara gotinê bû û min nîqaş hindekî din jî geş kiribûn. Bi israr daxwaziya min ji min dipirsiyan. Bêguman li gel baş nezaniya xwasteka xwe min DDKO ya wê demê rexne dikir.

Piştre kongreyeke dawî ya DDKO yê hate sererastkirin. Ew, kongreya qedînê ye.

Li Stenbolê ji bo min serdemeke pir cewaz hatibû destpêkirin. Destpêka sala 1972’an ku min semîner da, tiştê ku berzanî û gelek serhildêrên dîtir nedikarîn bînin ser zimanên xwe, min bi serê xwe anî ser ziman. Di waneya ku min dayî de, ez pirsa “çima dewleta Kurdan nebe?” dipirsim. Tê bîra min, min qatek cilê hêşîn li xwe kiribûn û qravat girêdabû. Ji bo her kesî ez rengekî nû bûm.

Di kongreya dawî ya DDKO de hikmek kivilcimli jî axifî bû. Tê bîra min gotineke weke “zarokên Mezopotamya yê” bi kar anî bû. Hîna di bîra min de ye, berpirsyarên Dev-Gencê jî diaxifiyan. Her wiha rexneyek jî hebû. Piştî wê sêyemîn axaftina girîng min kir. Ez bawerim gelekî bal kişandibû û axaftineke gelekî wêrek bû. Jixwe hema ez girtibûm nava endamên bingehîn û piştre jî hate girtin.

Di vê serdemê de bîranîneke din a girîng jî, civîneke Dev-Gencê ya di Zanîngeha Teknîk de bû. Piştre sê kesên ku dê bibin çekdarên THKP-C (partî-eniya rizgariya gelê şoreşger) yê, Mahîr Çayan, yusuf kupelî û sînan kazim ozûdogrû jî di vê civînê de bûn. Sîmayên wan hîna di bîra min de ne. Ez bawerim wê demê van li hember Dev-genca mîhrî belî helwest raberkiribûn. Û bingehê THKP-C yê avêtibûn. Qetîn û cudabûn mijara gotinê bû. Di xalên bingeh ên îdeolojîk de di mijarên weke kemalîzm, revîzyonîzmê de Mahîr gelekî wêrek xeber dabû. Ev demeke kurt ji beriya xwe kişandina bin erdê bû.

Min cara yekemîn dît ku bi wêrekî mijara Kurdan li wir hate vekirin. Axaftina ku Mahîr li ser kemalîzm û mijara Kurdan kiribû gelekî wêrek bû û di bandorbûna me de xwedî

asteke pêş bû. Ez bawerim nû xwe ji bin bandora kemalîzmê rizgar dikir. Heman tişt ji bo revîzyonîzmê jî îfade kir.

Ez bawerim nîqaş û rexneya Mahîr a li ser rêxistina îlegal û xwe bi paş ve dayîna ji dijwariya şoreşgeriyê hebû. Du axaftin kirin, her du jî hişk bûn. Tê bîra min çekek jî teqiya. Ji bo min helwesteke pir wêrek û îdeal bû. Di jiyana min a Stenbolê de xala herî girîng a nirxdarê balkişandinê ev e.

Di dawiya 1971'an de ez bibûm sempatîzanekî baş. Heke bal were kişandin, min endamtiya komelê dikir. Ez sempatîzanekî baş im, lê min hîna rêka xwe nedîtiye. Ez endamê DDKO yê me, lê hezkirina min ji ciwanên şoreşger re jî heye. Dîsa di şopandina rêberên şoreşger de ez tu dudiliyê nîşan nadim.

Qetîn her ku çû dijwar bû û jixwe hema berbi dawiya 1971'an min qeyda xwe rakir ser fakulteya zanistên siyasî. Min siyasal di rêza puanê de bîstemîn bi ser xistibû. Vê yekê jî ji maliyê ji min re bûrs dianî. Jixwe bi dawiya 1971 û destpêka 1972'an 12 Gulanê pêkhatiye, hemû berpirsyarên ciwanan ketine hundir, li Enqereyê dor hatiye kesên weke me yên di asta duyem de û yên nû.

Di bingeh de ev xal gelekî girîng e. Heke li pêşiya me rêberên xwedî bandor ên Dev-Gencê nebin, di bingeh de dê ji bo me şensê rêberiyê tune be. 12 Gulanê bêyî ku bizanibe di vê mijarê de ji me re hawirdoreke mezin vedike. Ez bawerim piştre ev bû mijara kovaran: "Bakî Tug çima Apo negirt?". Pergal piştre pir qehirî. Wê demê zêde rewşeke min a girtinê jî tune bû. Wê demê Apo tu tiştek e, tu aliyê wî yê ku balê bikşîne nînin. Tawanbarkirina bakî tug jî bêwate ye. Piştre di parlementoyê de bû serokê komîsyona parastinê. Belkî şopandina min, darezandina min, ji xwe re weke şerefekê didît. Di mehên çile, sibat û adara 1972'an de SBF (fakulteya zanistên siyasî) bi tevahî di bin bandoriya THKP-C yê de ye. Ji bo min jî ev serdem weke sempatîzaniya wan derbas bû. Hindekan digotin ku ez bûme endamê wan. Raste, bi wan re min hema dest bi rêxistinê kiribû. Lê ji ber ku, ew nediketin rêxistineke rişt, di wateyekê de ez weke rêberekî amator derdiketim holê.

Reva ji girtîgeha maltepeyê peroşmendiyeke mezin çêkiribû. Ez di bin bandora vê ya kûr de bûm û min ev yek pir bi qehremanî dinirxand. Em hemû di nava wê hêviyê de bûn ku dê niha hindek karên mezintir bikin. Lê dema ev rev li kizildereyê bi jandarî encam bû, me bi amatorî bi rêbertiyeke xwepêşandanê bersiv da. Piştre em di 7 Nîsana 1972'an de hatin girtin.

Di vê serdemê de her ku diçû min rêbertiya xwe dipeyitand. Piştî 12 adarê hêdî hêdî ez berbi valatiya rêbertiyê ve dimeşim. Him di şoreşgertiya Tirkiyê de him jî di şoreşgertiya Kurdan de lêgerîna çareseriyê heye. Ez bawerim di heman demê de niyeta me ya kombûyînê diyar dibe. Ji her alî, ji ciwanên xwendevan endam tên girtin. Ji bakur, ji başur, hema ji her eşîretê, malbatê, qadê em dixwazin kesan kom bikin. Piştî 12 adarê hawirdora Enqereyê ji nû ve dibe dika tevgerbûyîna ciwanên xwendevan. Dibistan xwedî atmosfereke nîqaşa germ bûn. Di ev çerçoveya bingeh de, têkîliyeke me ya komê heye. Wê demê min kemal û Hakî kişandibûn nava têkîliyên komê. Ez bawerim ên din jî hêdî hêdî dihatin.

Di vê serdemê de ez bi milîtaniya xwe xwendevaniyên xwe dipeyitînim. Hawirdora Enqerê ji aliyê jiyana civakî ve asta herî pêşketî ya Tirkiyê îfade dike. Siyasal, cihê zarokên dewlemendan bû, (kurê kurê serokomarê Tirkiyê yê berê Korûturk jî di dibistanê de bû) weke din zarokên gelek bûrokrat, serleşker û kesên dîtir hebûn. Di vê dibistanê de çalakiya ku min li ser bîranîna berxwedanêrên 31 adarê li dar xist, çalakiyeke pir wêrek û misoger rêberiyane bû.

Însyatîfa tevgera xwendevanan hîna di Adara 1972'an de me bi dest xistibû. Ew roj ev roj e ev rêbertî didome. Esas ew jî gaveke ji nişka ve ye. Cara yekem bû pêleke ku bandorên 12 Adarê ji holê rakir û ev her ku çû li Tirkiyê belav bû. Lê bi gotina ozal em weke "bermahiyên devê şûr" mabûn, yanî şûrê 12 adarê qasî ku karibû çinîbû. Dema nifşa yekemîn çû, em weke nifşa duyemîn derketin û di wê rewşê de nebû ku me ji nû ve bibîne û şûr di ser serê me re bihejîne. Bi nirxandina wê valatiyê re me gaveke biplan avêt.

## *Ziman û Çalakiya Rastiyê*

1972'an de jixwe yên ku bibûn rêber diyar bibûn. Rêberên Dev-Gencê diyarbûn, DDKD (komela çanda rojhilat a şoreşger) jixwe hatibû girtin, ew dosya hîna li Stenbolê hatibû girtin. Tê de navê min derbas bibe jî, li Enqerê qet nîne, bi tevahî bal çûbûn ser hindek kesên dîtir. Şûrê 12 adarê belkî mûyê porê me dibire, lê weke din li cihê me nakeve. Yê ku 12 adarê pêşwazî kir Dev-Genc bû, weke ku tê zanîn rêberên wan ên qehreman şehît ketin. Mîrata ku berdan girîng bû. Em bibûna milîtanên wan me xwe ji wan dihesiband. Êdî qehremanên me di nav xwînê de çûn. Heke me biryara hevalbendiya wan daye, (ji ber ku egîdî ye) divê ku em çekên wan li erdê nehêlin. Yên ku têdikoşin, şer dikin, şehîd dikevin. Yên ku mane ji destê sêyem sempatîzan bûn û min bi lez di nava wan de rêbertî bi dest dixist.

Girîng e, ez xwe ji tevgerê dihesibînim, ez amade me bibim endam jî. Min çawa xwe tevlî kir? Hîna partiya min nîne. Rêxistinên weke THKP-C, TÎKKO (artêşa rizgariya gundî, karkerên Tirkiyê) bi nav hene, lê dîtina deriyê wan gelekî zehmet e. Lewra tu kesekî ku mirov rêxistin bike jî nîne. Lê ez amadebûm ku bibim berendam. Bi niyeta baş û weke milîtanekî baş min dixwast lê xwedî derbikevim. Ev xwedîderketineke girîng bû. Ez xwedî hewlbûm, min dixwast ez kombûyînê bi niyeta xwe ya herî baş û bi bizavên xwe yên baş bi teşeyeke balkêş bimeşînim.

Di vê demê de rexmî kemal û Hakî gelekî nêzbûn, hîna bingehê feraseta kombûyînê nebû. Derveyî vê em bi her ast û çîna civakê re têkîldar bûn. Taybet bi gelek xwendevanên çîna serdest re jî têkîlî sazkirin gelekî girîng bû. Li gel kêmjimara çîna kedkar ên weke kemal û hakî, zêde nebûyîna şarezayiyê, di van salan de taybet ji aliyê sosyo-ekonomîk ve tevlîbûna xwendevanên çîna serdest jêneger e. Bi vê teşeyê me bi gelek zarokên axa û fermanberan re têkîlî saz kirin.

Bêguman, bidestxistina rêbertiya sosyo-siyasî jî, weke ku tê zanîn hêsan nîne. Bi qandî ziravî û nişkaviyê, çav vekirîbûn, asta rêgez dixwaze. Yek jî divê tu demê baş bi kar bînî. Dîsa ji bo plankirina vê, sebir û çavdêrî heye.

Lewma gavek hate avêtin, girtina 7 Nîsanê bi mamakê encam bû. Li mamakê min pêvajoyeke şeş-heft mehan

derbas kir. Di vê pêvajoyê de ez girtîgehê baş dişopînim. Zîndan çi ye? Çi dide, çi distîne? Mamakê peywireke rişt a dibistanê dît û ez derketim. Dîsa li vê derê jî bi xwînsarî, sebir di bin rûpoşê şoreşgerê dibistanê de dozeke pratîkî tê dayîn.

Li mamakê çi gihişt? Me li wê derê rêberên xwe dîtin. Çûyîna deniz a darvekirinê me dît, me TİP î,(partiya karkerên Tirkiyê) PDA (ronahiya şoreşgerên proleter) yî, THKP-C yî dîtin. Pir kêm me hev naskir, me nîqaş kir. Dîsa jî min hîna tercîha xwe ya misoger nekiriye. Lêgerîna min didome.

Niyeta bakî tug hebû ku 7-8 salan bide me. Lê ji ber ku şahid tune bû, neda. Li gel min Doxan Firtina hebû. Hîna şahidê zindî yê wê demê ye. Ez bawerim ji destpêka salên 1990'an bi şûn ve di ÎHD (komeleya mafên mirovan) yê de dixebitiya. Bavê wî albayek bû. Ez nizanim, gelo ma li ser dadgehê tu bandorên wî çêbibûn? Heke hebû û ji bo wê yekê kurê wî derketibe, misoger nîne, dibe ku di derketina min de jî xwedî erk be.

Piştî ku ez derketim, di mala biniya anitkabîrê de mam. Gelek caran min serdana anitkabîrê dikir. Ev yek gelekî balkêş e. Ciwanekî ji Muşê ku bavê wî serbaz bû hebû. Hindek jinên nerihet an jî yên dost dihatin. Gelo ma dixwastin me bixînin? Min tu tiştek ji wan fêm nekir. Diviya ku şopandinek bûya? Ez pê re eleqeder bûm. Yanî hîna wê demê jî jiyaneke min a girtî hebû.

Di navenda kemalîzmê de û di biniya anitkabîrê de min biryargeh saz kiriye. Mala hevalekî min ê gelekî tolaz bû. Bavê wî serbaz bû. Ez bawerim diya wî ji muşê bû. Navê wî tê bîra min, gelo atîla bû? Li gor ku navê kurê xwe kiriye atîla bavê wî yekî kemalîst e. Dibe ku jinên dihatin wê derê, ji bo avakirina têkîliya bi xwendevanên wê demê re yan jî li gor rewşa xwendevanan xwedî xwastekên serpêhatiyan bin jî. Wisa du-sê jin bûn. Nizanim, zêde dewlemend jî nebûn. Lê balkêş bû, wisa dihatin gel ew hevalên min ê kurê serbaz. Wêneraniya polîs îhtîmalek e. Lê misoger ez neketim.

Wê demê rewş ewqas tevlîhev bibû ku, yên ku Kurdeyetiya sexte dikirin bi gotinên çil caran ji me qerasetir

li holê bûn. Ên ku çepgirî dikirin jî wisa bûn. Lê, di hundirû de amadekariyeke min a baş hebû. Min diyardeyên destpêkê yên vê xetê yên xeta PKK ê di ev mala biniya anitkabîrê de ava kirin. A balkêş, her roj çûyîna min a serlêdana qebir çi bû? Ez bawerim di dîtina nakokiyên nêzî min de ji min re dibû alîkar.

...

12 adarê Dev-Gencê pêşwazî kir û hemû rêberên qehreman şehîd ketibûn. Dilê me dişewitiya, lê ez hîna nebibûm milîtanê wan. Lê mirata ku hiştibûn girîng bû.

Bi şixûlîna 15 roj li ser wan, ez derbasî refa duyemîn a siyasalê bûm. Min ew serkeftin nîşan da.

Min wilfa xwe ya komê hîna baş eşkere nekiribû. Lê gav avêtina komeke nû ku serbixwe digihişt hebû. Ev di dawiya 1972 û destpêka 1973'an de şidyabû. Ez xwe didim ponijîn. Min dixwast ez hevalên weke Fuat (ali haydar kaytan), Hakî Karer, Kemal Pîr û Cemîl Bayik bibînim. Ev di wê demê de hevalên min ên nêz bûn...

Min ev hevalên xwe hîna baş negirtine wergiriya komê, me li ser komê zêde nekiriye.

Wê demê li Enqerê hemû şertan ji min re ev digotin: "divê ku tu ji vê şoreşê re germ bî, ezmûneyên ku te jiyîne dikarin te bi rê ve bibin. Bi kêmanî di nava sempatîzanên çîna sêyemîn de misoger tu dikarî rolekî bilêyîzî." Di encam de ez bilez û bi dirûstî tevlî dibim.

Di serdema faşîzma 12 adarê de, bi tevahî dewletê xwastiye min bi tawaneke giran pêşwazî bike, lê bi ser nexistibû. Belkî wê demê di kesayeta Bakî Tug de bi xebatên min hesiyabû, lê nedikarî tiştekî bike. Çalaktiya min hetanî cihekî hatibû. Serhildana dewletê di vê derê de dest pê dikir. Milîtanên rêza yekem çûne, yên mane pasîfîze hatine kirin, valatî derketiye û em dikevine nav. Dema ku dewlet bi yên ser re mijûl dibe, zêde me xeternak nabîne û ez jî vê pêvajoyê dinirxînim.

Hevalên min hîna ne di wê ferxê de ne ku emê bibin kom. Lê asta di hundirê wê bi xwe de her ku diçû digihişt û dema em nêzî 1973'an bûn, min nîqaşa xwe ya mêtîngeriyê pêş xist.

Rêka ku em diketin nav êdî misoger dibû. Bi qandî hemû pêşdîtinên gav avêtina bervî Kurdistanê ve, di kesayet de jî gavên me yên ji xwe bawer hebûn. Tê bîra min me du-sê derî baş digirtin û min di guhê hevalekî xwe de jê re digot “Kurdistan mêtingeriye ye”. İhtiyateke mezin bû, lê di nava xwe de wêrekiyeke mezin veşartibû. Gelekan piştre dema ev gotin bihîstin gotin “jixwe me zû ve digot”. Derew e. Ev peyv cara yekem me di guhan de bi cih kir. Û gav bi gav gihişt. Li dora vê tezê me pêwîstiya kombûnê derxiste holê.

Di vê derê de bîst saliya min tê bîra min. Bi navê şer tu tişt li holê nîne. Rewşeke min a ku ez du gotinên mafdar bikim nîne. Û bêguman giyana min dîsa li pêşiya min senaryo sererast dikirin. Dema ku min xwe disparte quntara çiyayekî min bi xwe ji xwe re wisa digot, “gelo dema leşker were, tu dikarî xwe bispêrî vir?” Ez wê demê weke kêvroşkan bûm. Ji ber ku tiştek nîne. Bêyî ku tiştek hebe dema leşker werin mirov dikare li ber xwe bide? Lê ez di hişê xwe re derbas dikim, gelo ma tu dikarî şerekî welat bidî? Di nav rez û zewiyan de digeriyam. Bêguman dîsa vê yekê dihişt ku dilê me weke yê kevroşkan lê bide. Di van cihan de tu dikarî şerekî çawa bidî? Lê ez pê difikiriyam û hîna di bîra min de ye: min digot “tu nikarî bi tena serê xwe bidî”. Ew tenêbûna mezin di min de çi diafirand? Giyana mezin a rêxistinê... giyana mezin a rêxistinkirinê çawa di min de pêş ket? Li hember ew zorî û tenebûnên mezin derket.

Pirsên ku min di van salan de dikirin, hîna di min de bersivên xwe nedîtine. Şer bi pirsîna van pirsan re dest pê dike. Ji bo welat û gel ez li ser gelek tiştan diramiyam. Ew tişt hemû weke ku di dilê min de were nexşkirin wergeriya zanebûna rêxistinê. Ji ber ku tu bi tena serê xwe nikarî tu tiştî bikî, ji bo tu bikaribî bikî divê tu bi mirovan re bibî yek. Vaye, pîvana min a mezin.

Min xeteriya çekan dît.

Min çewisandinêriya mezin a çekê dît.

Min afirandina bêviyaniya çekê dît.

Û min bêeman xwe da ev tekoşîna mezin. Hîna jî wisa me.

Afirandina mirovê têkoşînêr, di dilê min de hîna azweriye.

Ez dê bibêjim, “werin em bibin kom”, weke di zaroktiya destpêkê de “werin em bilêyîzin...”. bi zimanekî herî hînker ez dê bangî dost û dijminan bikim, ezê ramanên rast vebêjim. Heke ev hemû bes nekin ezê rêxistinê saz bikim, ji bo ku ez rêxistinê bidim şer kirin jî, çi pêwîst be ezê bikim. Ezê têkçûyînê nepejirînim, di her têkçûyînê de ezê sedemeke gavavêtinê bibînim. Û ezê van hemûyan bibim şer, di şer de ezê kêmaniyê qebûl nekim. Di şer de ezê taktîk bigihînim radeya herî jor. Di şer de ezê qiyameta sor rakim. Hetanî ku derê? Hetanî ku jiyana azad bi dest bixim. Li dijî me şerê taybet hebûye, cîhan hebûye, di xema min de nîne.

Kesekî ku wisa li hember şer û dijwariyê xwedî tirs be, gotina wî ya weke, “cîhan hemû li aliyekî, ez li aliyekî” divê mirov çawa pêşwazî bike?

Ew çûyîna me ya bendava Çubûkê bi rastî Newroz bû? Ez bawerim an Nîsan an jî adar bû. Di vê derê de cara yekem ez ji ragihandina yekane derbasî ragihandina komî bûm û kombûyîn eşkere hate diyarkirin. Ji beriya vê ev heval bi tenê bûn. Ez ji wan re bi naverokeke baş mêtîngeriyê vedibêjim. Pêwîstiya bi dest girtina Kurdistanê ya weke welat, li gor vê guncawiya ramana rizgariya netewî û her wiha pêwîstiya teşebûna komê ya li ser vê bingehê... ev hemû eşkere bûn û ez bawerim peyam ev bû.

“Kurdistan mêtingerî ye”.

Ev peyv, di destpêkê de çeka min a yekem bû. Weke din tu çeka me tunebû.

Rêxistin evqas e.

“Kurdistan mêtingerî ye”,”divê di rastiya rizgariya netewî de em bibin kom...”

Weke din tu tiştek nîne. Sê peyv in.

Waneya dijwar a ku min ji zîndana mamakê derxistiye, careke din neketina hundir û bênavber çûyîna rêxistinê ye. Em bi dewletê re diçin hesabgirtinê. Îro jî em bi dewletê re diçin hesabgirtinê, şerekî herî germ heye, şerê taybet heye. Lê yên niha ji aliyê partiyê ve tên perwerdekirin, tên beralîkirin. Wê demê partî tenê ez im, derveyî min tu

endamê rêxistinê nîne. Divê ez destpêkê xwe bidim bawerkirin, piştre ezê derûdorê pê bidim bawerkirin, ezê çend hevalan (heke ez bikaribim bibînim) bibînim û vebêjim.

Pirsgirêkeke mezin e.

Bi mehan ez digerim, zilamekî ku ez jê re peyvekê vebêjim nabînim. Ez bi findê digerim, bi neynûkê dikolim. Ez dê kesekî dîtir ji kur bibînim? Heke ez bi şîrinayî bixwazim vebêjim, zilam zêde ji gotinê fêm nake. Dibêje, “na, derkeve çiyê”. Ez jî dibêjim encax bi hev re dibe. Tu tiştekî nabêjin. Hêza wan nîne, bingehê çîna wan ji xwe dest nade. Astên ku ji nîv-feodalan tên gelekî hevkariyê dijîn. Şoreşgeriya wan bi guman e. Yên ku hatine bi beşeke mezin di çanda komarê re derbas bûne, hetanî her dera xwe hevkarî jiyan e yan jî kesên xwedî azweriyên bûrjuvaziya biçuk bûn.

Rexmî vê yekê ezmûneya komê heye. Mîrat an jî bandora Dev-Gencê... Di bindeh de zêde xwedî mîrat jî nîne. Mîrata wan bûye dûkel, agir yanî tu tiştekî ku mirov zêde jê werbigre nemaye. Divê tu bi xwe biafirînî. Weke ku min gotiye, bi vê bandoriyê û baş bi karanîna valatiyê ve min xwe da vê xetê.

Ji kesên ku min dixwast ez wan bi rêxistin bikim cewaziya min diyar bû. Li dij darezînên nirx a bûrjuva, min xwast ez xwe li dor hindek rêgezan biparêzim. Li ser bingehê dahûrînê ketim nava darezînên nirxan. Darezînên nirxên olî pir cewaz û bi teşeyeke bi nakok be jî min derbasî qonaxeke şoreşgerî kir. Min di xwe de ew wêrekî dît. Li gor min amadekariyên min hebûn. Bi taybet di mijara darezîna nirxên bûrjuva de li ser bingehê ku şoreşgerên wê demê nêzîk dibûn, raberkirina heman nêzîkatiyê min gelekî xwe amade û bi rêxistin kiribû. Tiştên ku olê jî bikaribiya bida min, min girtibûn û tiştên mayî min pêwîstî pê nedidît. Min dixwast ez êdî vê yekê li ser bingehê jiyaneke nû têperînim. Ev dihat wateya serhildan û rêgirtina ji bo jiyaneke nû. Min çi dixwend, bi teşeyê ku ev yek ji me re pêwîst e min di cihekî de kom dikir. Ên ne pêwîst min vediqetand. Ev hemû piştre ji salên 1970’an bi şûn ve bûn xeta îdeolojîk a PKK ê.

Bêguman wê demê tenê çend giştîname ne. Êdî her ku berbi roja me ve were dê jiyanî be.

Ji wê bi şûn ve di 1973-'74-'75'an de ezmûneya ADYOD ê (komeleya xwendina bilind demokratîk a Enqereyê) heye. Ezmûneyeke ku bi tevahî di bin berpirsyariya min de pêş ketiye. Dîsa di vê serdemê de bingehên Dev-Solê (çepgiriya şoreşger) jî tê avêtin û di her du yan de jî misoger para min heye. Ji ber ku, rêbertiya kombûyîna ciwanên şoreşger ên xwendevan ez dikim. Hindek kesên ji Dev-Yolê (riya şoreşger) astengî derdixistin. Dîsa hindekan jî bi navê THKO (artêşa rizgariya gelê Tirkiyê) yê. Mînak, Mustafa Yildirimtûrk hebû, bi wî re têkîliyên min çêbûn. Em him li hev dihatin him jî di navbera me de nakokî hebûn. Dev-Yolî ji bo min têpêrînin astengî derdixistin. Lê kontrol di destên min de bû. Hetanî 1976'an wêneranî di destên min de ye. Ji destpêka 1972'an hetanî 1976'an li Tirkiyê min pêşengtiya kombûna ciwanên şoreşger ên xwendina mezin kir. Di vê wateyê de serdema min a rêbertiya çalak, ji destpêka 1972'an bi vir ve ye. Ji wê rojê hetanî roja îro bêyî ku ji lez û tempoya xwe tiştekî wenda bike hîna jî didome.

Kombûn di serdema destpêkê de li Enqerê di bin navê ciwanên xwendevaniya bilind de meşandin, me ev yek weke taktîkeke guncawtir dît. Min zêde eleqeyê raberî DDKDê nekir, heta min xwast ez wan tecrîd bikim. Ev aliyê kar ê fizîkî ne, di vê derê de puxte (cewher) gelekî girîng e. Weke ku min gotiye, viyan û giyana wê demê, sazbûna wê komê piştre beşdarbûna jinan (kesire yıldırım-fatma) a wê komê û nakokiyên me yên dest pê kirin... wisa him dendikeke netewî him dendikeke partî. Heyvan (meyan) û dendik li ser vê bingehê ye.

Di pêvajoya komê de heyvaneke wisa hebû. Min ev yek weke şidyaneke beriya baranê li asîmanan kelîna ewran, ketina dilopên yekem û weke barîna baraneke mucizevî dît. Min beramberkirineke wisa kir. Heke bal were kişandin, ax jixwe gelekî ziwa ne, qelişiyane. Di wateya hêviyê de, di wateya raman de bi tevahî wisa ye. Lê kombûna me di wê wateyê de ye ku, em ji bo ev axên qelişî û ev hawirdora ku tê

de piçê hêviyê nemaye bibin ewrekî wisa û weke dilopên destpêkê li nav bireşin.

Lewra vê hawirdorê ji her alî ve rev disepand, bêyî peywendî bûn.

Karê dîna ye.

Pêvajoyeke wisa bû ku qet hêviya jiyanê nemabû û pîvanên olîgarşiyê misoger serdest bûn.

Divê di vê derê de hun min fêm bikin. Ji kişandina hevalan a nava pratîka kombûnê divê hestên min, ramanên min, hewlên gelekî baş werin fêmkirin. Ji ber ku gelekî girîng e. Belkî pêşveçûyînên paş bi biryarbûneke hişk werin meşandin, lê ewraniya wê demê û barîna ji rûyê erdê re wisa hêsan nebû.

Hindekî peyxemberiyane û mucîzevî bû.

Her tişt xayîn e, her tişt tarî tarî li rastiya xwe dinêre. Ji her tiştî bêhna bêhêviyêtiyê tê. Her tişt ne li gor me ye. Wê demê dema min ev yek di rewşa hevalên xwe de dît, min ax û wax dikişandin. Divê hindekî mirov nêzî fêmkirina wan rojan bibe. Dibêjin dîroka Kurdistanê, dibêjin dîroka azadiyê lê ma wê demê tiştekî weke dîrokê hebû? Bihêlin dîrokê, ma gel bi xwe hebû? Gelekî ku bibû dijmin. Gelekî ku ji xwe pêvetir bibû yên kesên dîtir. Hewlên min hindekî jî, ji bo rizgarkirina gelê di rewşa lenetê de bû. Serlêdana min, rexmî ku wan wê demê dixwastin di nava wê kirêtiyê de avjêniyê bikin, hewla min, serlêdana min kişandina qewmê musa ya ji çiyayê tur sîna bû. Erê ya me jî wisa çêbû. Hetanî ku me kişand çiyayê cudî me ji deh çeman av berhevkir.

Dema em ketin bihara 1974’an, rêbertiya min a di ADYODê de her ku diçû ez navdar dikirim. Gavavêtineke rêberiyane, lê weke ya Tirkiyeyî. Stenbolê jî bi bandor dike. Misoger polîs pê nahese ku ez bi navê Kurdiniyê yan jî Tirkiniyê dilêyîzim, an jî ez di ku dera Dev-Gencê (ciwanên şoreşger) de me. Yan jî lêyîstin û nelêyîstina min ji DDKOyê (ocaxên çanda rojhilat a şoreşger) re napeyitîne. Di vê derê de şaşkirina min mijara gotinê ye û ev yek pêk tê.

Di vê demê de dewletê çawa dixwast dest biavêje min? Şovenîzma civakî sepandineke dewletê bû. Ku ya di çepgiriyê de serdest jî şovenîzma civakê bû. Ez li hember wê

şiyar bûm. Ev jî dibe TKP (partiya komunîst a Tirkiyê) ya mistefa kemal, yanî çepgiriya kemalîst. Jixwe piştî ku rêberên wan hatin qetilkirin bi şûn ve, yên din belkî jî rasterast ketin bin bandora dewletê. Bi taybet Dev-yol (riya şoreşger). Ev nêzîkatiya giyaneke têkçûyî ye. Dev-Yolgerî ev e. Gavavêtina min piştre 1976 ‘an de dê Dev-Yolê bixwastiba pêşî bigre. Him jî bi lêyîstokên erzan ve. Weke milekî pêşengê bûrjuvaziyê, dê xwastibana vê gavavêtinê bi min nedin kirin.

Dema min xeta PKKê (partiya karkerên Kurdistan) pêşdixist, konferansa min a ku min di 1974’an de da her kesî ji dil û can guhdarî dikir. Pirsgirêkeke şêwaz û riştmendiyê bû. Yanî wê demê min bi du peyvan kar dikir: “Kurdistan mêtingeriye”. Dîsa rewşeke min a ku ez zêde rastiya formûle bikim jî tunebû. Lê li gor asta civatê jî, min xwe awarte dikir. Min wisa pêşkeş dikir.

Tevlîbûna Kemal Pîr.!

Nîv demjimêrê ez guhdar kiribûm ku, wê demê danasînên ku min zêde di destên xwe de eşkere kiribûn nebûn. Mijar bi riştmendî û ji diliyê ve têkîldar bû. Mijar weke hevnasîn ji berê de jî nebû. Min nîv demjimêrê dît, hemû ewqas bû. Şêwaza PKKê ev e, şêwaza serokayetî û şêwaza me ya rêveberiyê ev e. Her kesê ku ji dil ve bi me re bû, hemûyan ev yek nîşan dan. Kêmaniyan li aliyekî bihêlin, hemû ji dil û can bi hev re girêdayî bûn. Rastî ev e.

Di van salan de min bavê xwe dît.

Li hemberî min têkçûyîn pejirandibû. 1970’an de dengvedana min li xweşiya wî çûbû. Di radyoyê de anonsên yekem wê demê çêbûn. Hîna di bîra min de ye, ez hatim min li ber derî ew dît. Hemû him bişayiş bûn, him jî şanaz bûn. Digotin, “navê te derketiye, her kesî bihîstiye baldar be.” Li gel şanaziyê, ez bawerim baweriya wî jî hebû. Gihiştibû feraseta “fetihkirinê”. Ev gotina ha jî dikir: “tu bi tenêyî. Yên van komînîstan jî Ecevîtê wan heye. Lê yên ku bi Kurdewariyê re mijûl dibin, tu kesî wan nîne. Baldar be.” Bîranîneke baş e. Bi kurtasî ji wê bi şûn ve em bi bavo re li hev hatin. Misoger ji aliyê min bû û gelekî bawer bû. Di navbeyna ketina civaka bûrjuvazî û derketina ji Enqereyê de

15 sal hebûn. Weke ku bi civaka gund re nebûye yek, bi civaka bajar jî nebûye yek, piştre em dê ji Enqereyê derketineke baş bikin. Ji bûrjuvaziyê fêrî gelek tiştan bûn. Em fêrî tekoşînê bûn. Em gelek çekên tekoşînê bi dest dixin.

Ez di ciwanmêriya xwe ya van salan de, berovajiyê her kesî ez bi girêkureke mezin re rû bi rû me. Ji bo min her tişt di tariyê de ye û di hawirdoreke xayin de, her tişt bi niyetên xayînî ve hatine dorpêçkirin. Li Enqereyê çar aliyên min bi kesên ku min bigrin re pêçayî bû. Hêjar û jixwe bi tenê bûm, zêde tiştekî ku hêza min nîşan bide nîne. MÎT (rêxistina îstixbara Tirkiyê) jî dema ku di wê serdemê de min dinirxîne ku wê demê li ser maseyan ez peroşmend xeber didim, laqirdiyan dikim. Wan jî gotiye, "li ser masê zimandirêjiye dike","hele bila here Kurdistanê". MÎT piştre bi xwe li xwe mukir hat û got, "me sivik girt, biçuk dît, dema mar bostek bû leşkerekî me dikarî bi potînên xwe ew biperçiqanda", "me biçuk dît û niha çi hate serê me". Li ser rewşa min bihizirin di sîleyekê de dikaribûn min bifetisînin. Çima ez nehatim fetisandin? Gavavêtina ku dewletê jî bawer nedikir min çawa çêkir? Gelek kesên ku nikarin hawirdora xwe fêm bikin û binirxînin, min di bin desthilatiya dewletê de çawa gav avêtiye. Hema her tişt biguman bû, her tişt weke mar li lêdana we re li hember we bû. Me wisa dest bi partîbûnê kir. Heke ev were piştçavkirin misoger PKK nayê fêmkirin.

Divê were fêmkirin, ji ber ku ev çîroka jiyana hemû kesî ye. Yê ku fêr nebe, nabe milîtanekî hêzdar. Fêmbûna min, bi dîroka partiyê re gelekî têkîldar e.

Di ciwanmêriya xwe de, weke ku min gotiye, dema ji bo derketin li keçan bigerin, min got karesat bi ser min de tê û min xwast ez xwe biparêzim. Piştî wê dema ez bixwe derketim lêgera keçan, min rû bi rû mayîna xwe ya bi cinawiran re dît. Keçên bûrjuva hebûn, gelek jî ji wan heyranê me bûn. Dema em di siyasalê de bûn, gelek jî keçên bûrokratan û serbazan bûn. Ez bawerim gelekî jî ez li xweşiya wan diçûm. Ji ber ku, wê demê min rêbertiya xwendevanan dikir. Piştgiriya min dikirin. Lê, nêzî wan bûyîn ji bo min mesele bû û baş bûye ku min xwe

nexapandiye. Xwe xapandina min a wê demê, dikarîbû dîrokekê berovajî û serberjêr bike.

Ciwanekî ji Amedê hebû. Ez bawerim kurê miftiyê lîcê û navê wî jî farûk bû. Hîna bi bîra min de ye, kete nava hewayeke dildariyê. Zilam piştre kêrek girte destên xwe. Kete dûv keçeke edeneyî, hemû siyasal tevlîhev kir, her kes rabû ser serê me. Ji ber ku, hevalê wî ez bûm. hêza xwe ya manevî hindekî ji min digirt. Yekî wisa bû ku ji dudiyan yek dikete dildariyê. Hetanî ku em ji wê rezaletê rizgar bûn, ez ketim bin erdê. Bihizirin, heke wisa yekî rewşenbîr, kurê miftî kete wê rewşê, dê kesayetên din çawa tevbigerin? Ku, wê demê hindek keçên ku li xweşiya min diçûn hebûn. Hîna di bîra min de ye, yek hebû, navê wê jî min qet nepirsî. “tu çawayî, tu çiqas xweşik î...?” tu caran min ev yek nepirsî û niha jî ez nikarim bipirsim. Ev pirsgirêkeke şêwazê bû. Ji ber ku wê demê ez wisa bibêjim, ez dizanim ku ez dê wenda bikim.

Ev şêwazek e.

Piştre me dest bi ketina nav îdeolojiyê kir. Me çawa siyaset û sosyalîzm lêkolîn kir? Bi riştmendiyeke mezin me pirtûk li hev qulibandin. Weke pirsgirêka netewî bi nav dikirin. Me mêzand tê de tenê çend peyvok hene, lê di nav de yek peyva Kurdan jî derbas nabe. Heye tuneye çend peyvok in. Derveyî vê li holê tu tişt nîne. Meseleya Kurdan çi ye? Bi serê xwe bireve hundirê pirtukxaneyan, nîqaşan guhdar bike, bihizire, birame... Di dawiyê de bi zehmetî me teoriya îro derxiste holê. Bêguman teorî çekeke mezin e. Piştî ku teorî û hêza raman hate afirandin, me kom bi kom mirov li dora xwe komkirin. Sazbûyîna PKKê wisa ye. Heke me teorî neda jiyandin, me nedikarî em du mirovan jî li hev kom bikin. Ez dizanim ku min ev yek bi serê derziyê kola, ji pirtûkxaneyan, ji jiyanê, ji vir ji wir bi westîneke mezin derxiste holê.

Ev hemû jî, di bin fermana mirin û tunekirinê ya rejîmî de pêk hatin.

Bi Kemal Pîr û Hakî re em ketin yekitiyê. Ew heval bûn ku, bi rastî li dij şovenîzma-civakî pêşentiya tekoşînê dikirin. Ji bo Hakî û kemal digotin, “ev bûne Apoyî”. Van

rizgargerên gel, Dev-yolgeran weke ku li wan xiyanet hatibe kirin, li van hevalan dinêrtin. Lê bi wan re jî gelekî em xwedî tekoşînbûn û ez bawerim em hindekî xistin hevsengê. Ew li paş, di komelgeriyê de man. Her ku çûn ji şoreşgeriyê jî dûr ketin. İhtilalgerî me ji destên wan xelas kir.

Bi vê teşeyê cudabûneke xetê çêbû. Ev yek dihate wateya têkçûyîna çepgiriya dewletê jî. Çawa ku, 1920'an de mistafa suphî wan hatin pelixandin û TKP (partiya komûnîsta Tirkiyê) ya sextê damgeya xwe li Enqerê xist, dîsa wisa çêbibû û koma Mahîr wan jî hatibû îmhakirin. Dîsa koma THKO, koma kaypakkaya jî wisa bû. Bi vê yekê re dorpêçkirina mîrata şoreşgeriyê heye. Em jî li dij vê dorpêçê şer didin meşandin, ev şerê parastina mîrata şoreşgeriyê ye. Derketina me jixwe derketina xwedî lê derketina mîrata şoreşgeriyê ye.

Ez bawerim yên Dev-Yolê di derbarê min de hîna wiha dibêjin: "berxwedanî ji me dizî." Ne dizî, me li hember xwediyê ev nêzîkatiyên xayîn mîrata şoreşgeriyê parast. Hêrsa mezin a Dev-Yolê li hember min ji ber vê sedemê ye û ev yek tê fêmkirin. Yên din wisa ne, ji perînçek bigrin û wêde, beşeke mezin ji wan wisa ye. Pir kêm rewşenbîrên rast ên ku bi me şanaz in hene. Yên bi me ve girêdayî jî hebûn, lê gelek ji wan heyf dikirin ku, "çima faşîzmê ev nepelixandin, çima 12 Rezberê (îlon) ev nepelixandin." Hêrsa wan ji ber eşkerebûyîna rûyê wan ê rast e.

Bandora kemalîzmê ya çepgiriyê, dewleteke veşartî bû. Weke 1920'an destpêkê dikuje, piştre mîrata mayî jî bi dewletê ve girê dide. 1970'an de jî dikuje, piştre mîrata mayî bi dewletê ve tê girêdan. Ez li dij vê hêrsdar bûm.

Di bûyera Kurdeyetiyê de jî ev rewş hene. Hindek milîtanên ku bi navê Dev-Gencê tevdigerin tên pelixandin. Ji aliyê deniz wan ve tê xwastin ku li Kurdeyetiyê xwedî derbikevin. Lê tên bi darvekirin. PDK (partiya demokrata Kurdistan) ya bi dewletê re di nava hevkariyê de ye, dixwaze li vê mîratê xwedî derbikeve. Ez li dij vê jî dibin derketin.

Dema em berbi 1975'an ve tên, li derûdora tezên me him nîqaşeke mezin hebû, him jî kombûyîn didomiya. Lê dewletê hîna baş ez pênase nekiribûm. Hîna lêkolîna,

"çawaniya şêwaza Kurdeyetî û çawaniya şêwaza şoreşgeriyê?" heye. Gelek xalên pirsê hene, lê hîna bi tevahî nebersivandibûn. Ez bawerim di vê çerçoveyê de hêdî hêdî siya dewletê bi ser me de dihat. Em hêdî hêdî bi ser dewletê ve diçin, hêdî hêdî dewlet jî bi ser me de tê. Ev aliyekî yê kar e.

Piştî mala biniya anitkabîrê maleke ez tê de rûniştibûm hebû. Bi taybet maleke ku zêdetir têkîliya Pîlot (necatiyê agirî) bû. Hindek jin hatibûn wê derê jî. Ez bawerim 1975 bû dibe ku 1976 be jî. Wê demê jî misoger min guhê xwe nedayê. Yanî min nedixwast ez fêm jî bikim. Di wan salan de jina bûrjuva çi ye, têkîlî çi ye nizanim. Heke hêza te nîne tuyê nekevî têkîlî û tekoşînê. Hêza min jî ya naskirina jina bûrjuvayê tûne bû. Di dibistanê de jinek hebû, weke ku min gotiye min ji axaftinê jî şerm dikir. Hîna di bîra min de ye, gelekî zehmet dihat. Di salên zanîngehê de jî wisa bû. Bi taybet di mijara jinê de salên gelekî zehmet bûn ji bo min. Ez gelekî baldar nêz dibim. Hêza min a bandorkirinê jî hêdî hêdî bi pêş dikeve. Lê, bi ser de çûyîna min a ji têkîliyeke bûrjuva, ji xwe avêtina hendefê jî zortir bû.

Lê ya balkêş, di vê demê de girtina me ya jineke nava komê gelekî girîng e. Dema koma me pêk dihat Pîlot jî bi wê re têkîldar bibû. Di ADYOD tê de hev naskiri bûn.

Wê demê li gor min lêgerîneke min a sosyalîzmê hebû û ez bi pirsgirêka netewî re mijûl dibûm. Derveyî wê min bi tu kesî re nedikarî bibêjim merheba jî. Belkî jî ez balkêş didîtim. Ji ber ku hemû deman peyva Kurd ji devê min derdiket, ji min re çepik lê didan. Hîna tê bîra min û hemû jî nîv bi nîv zarokên bûrjuva bûn. Pir awarte piştgiriya min dikirin. Lê rexmî vê jî min bi yek peyvê negot "tu çawayî?". Dîsa jî eleqeyên wan hebûn. Lê merhebeyeke erzan, têkîliyeke bi keçeke bûrjuva re tu caran nebû. Rexmî ku min gelekî xweşîk didît jî min nedigot "tu çawayî?".

Piştre pir baş tê fêmkirin ku, heke di wan salan de kêmaniyekê bikim, encama wê îmha ye.

Eladîn kapanek hebû. Piştre provakator derket. Potîn kiribûn lingên xwe û hetanî hundirê siyasalê hatibû. Diviya ku ew jî bûyereke dewlete bû. Bi navê THKO yê xwe dida

nasîn. Yanî hêdî hêdî dewlet dixwaze bi ser me de were. Hindek rêkên cewaz ên bandorkirinê ezmûne dike. Li gor min ev bi zanebûn rêkên bandorkirinê bûn û li dij derketina me ya dewletê hêdî hêdî bersiv bi pêş diketin.

Lê ez, di holê de qels û di rewşeke bêxeterî de me. Ewqas e ku dibêjin, “welatekî wisa heye, gelekî te yê wisa heye, hindekî jî ramana xwe li ser van mijaran pêş bixe”. Wê demê ji bo bi destxistina mirov ez çawa dikevim nava kar, hewlên min ên ji tunebûnê afirandin, diyarî hemû fermandarên wenda dikin dikim. Di bêderfetiya wê demê de ez van dikim. Û yek jî diviya ku min hêvî bidaya dewletê. Divê ez him rejîmê bihêvî bikim him jî bixwapînim. Wê demê nakokiya min a herî mezin ev e. Di aliyekî de ji bo ku ez rastiyê bidim hevalên xwe serî li tiştên herî zehmet didim. Ji ber ku ev ciwanên di bin bandora pergalê de ne, bi xwezayî dê ji van gelek bi bayê pergalê bikevin. Lê ji aliyê dîtirê ve pergal ketiye dewrê. Weke ku dê piştre gelekî vekirî derbikeve holê, kesayetên herî bibandor ên pergalê ketine dewrê û dixwazin min di bin darezîna “ji mirinê mirinan biecibîne” de biqedînin. Û weke din derfeta tu hêzî nîne. Zilamên pergalê jî dibêjin, “kuştina ev parçeyê gundî, ev xizanî ji her tiştî bêpemenî li zerara me ye”. Û didomînin: “em vî wisa amade bikin ku, bila di dîroka me de bibe hevkarê me yê herî baş”. Belkî jî hindekî planên wan ev bûn. Jixwe zilam paşê gotibû: “em bi girêdana malbatê ve wî bikin zilamê herî baş ê dewletê”. Erê ev plana dewletê bû. Weke ku min gotiye, mirina min ji bo wan zerar bû. Ji bo bike “kerêkî” herî baş qaşo planan pêş dixe. Ev nêzîkatî bi rastî jî, ji mirinê xetertir e. Tu mirov carekê bikujî xelas dibe. Ev yek tê wateya her roj kuştina min û li gor xwe dayîna meşandin e. Ev hestek û pêngaveke hêsan nîne. Giyan, panîk, şayiş, destdayîn, destnedayîn û sebra min a wê demê çi ye?

Ji bo ku ev lîstok di vê xalê de were fêmkirin, sûdwere ku mirov hindekî din mijarê vebike. Di ketina sosyalîteya bûrjuvayê de ez gelekî zehmetiyan dikişînim. Ne ez dikarime bikevin nav, ne jî ew dikare min bikşîne. Ez dikevim sosyalîteya koma şoreşgeran. Ev şêwazeke ketinê ya balkêş e, pir têkoşînêr e. Lê ez li Enqereyê me û di ev

hawirdora xeter de min feodalîzm û malbata feodalî misoger nêzî giyana xwe nekiriye. Civaka bajêr jî wisa.

Di ev serdema 1970’an de ez xwe weke rûpeleke spî didim koma şoreşgeran. Destpêkirineke pir taze ye.

Ji bo kesên din rêxistin hebûn. Ên ku diketin nava tekoşînê, hîna bêyî ku bibin sempatîzan, di nava rêxistinê de dihatin dîtin. Dewlet jî bi ser wan de diçû. Fêmkirina min a ji kîjan rêxistinê çîrokek bû. Divê ku ev taybetmendiyeke diyar be. Ji bo şop neyê hêlan an jî nebe nirxandineke weke“ev ew e” ez rewşekî pir têkilhev derdixim holê. Tiştê ku tê nîqaşkirin ev e. Ev jî çepên Kurdan e? Yan ji çepên Tirkan e? THKO yî ye yan jî THKP-C ye, ji artêşa Kurdan e, polîs wisa salekê diduyan di nava du diliyê de bûn. Vaca polîs li gor min hetanî niha jî ew tam derbas nekirine. Û dibe ku niha jî hewl bidin ji bo ku vê yekê derbas bikin. Niha ji têkîliya jinê ya wê demê re divê bal were kişandin, xwedî girîngiyeke girîng e. Lewra dewlet 1974-‘75’an de bi hişmendî hat ku me dorpêç bike. Ji nava rêxistinên din dihat. Kontrola Dev-Yolê ne rasterast be jî ya dewletê bû. Di komên din de, jêr û jor di heman taybetmendiyê de bûn. PDKê dixwast Kurdiyetiyê bikşîne, ew jî kontrola dewletê bû. Jixwe wê demê ev yek pir vekirîbû. PDK bi tevahî ketibû destên MÎTê. Lê hîna em reng nadin. Û hîna rêxistineke çawa ye, nayê zanîn û navê wê jî tuneye. Zarok hatiye temenê heftan û bênav e. Hetanî ku taybetmendiyên wî yên bingehîn jî ne diyar in. Wê çawa pêşbikeve, ne diyar e. Min pêvajo şipandibû xwe. Jixwe ez dê bibim zilamekî çawa, demek dirêj tu kesî wate nedayê. Di gund de jî û di malbatê de jî wisa bû. Gundiyan dua dikirin û digotin xwedê tu kesî neke koma wî. Her kes ji ber ku kurê wan ne weke min bû pê şad dibûn.

Ezê wan bavan bibînim û hesabên kurên wan ji wan bixwazim. Erê digotin ev serberdayî ye. Ji ber ku nedişipiyan min pesnên zarokên xwe didan. Hevalekî min ê dibistana seretayî hebû, ji bo min, ji rêkirina silavekê yan jî ji hatina gel min ditirsiya. Lê diviya ku netirsiya, bi taybet jî bavê wî digot kurê min çiqasî bi aqil e. Niha jî li cihekî fermanber e. Ji bo kişandina wî min gelekî hewl da, lê belê

min bi ser nexist. Zêde ne girîng e. Fermanbarekî baş ê dewletê ye.

Erê dewletê jî di vê pêvajoyê de zêde bawer nedikir ku emê bibin mirov û teşhîs nedikir. Ji vê û wêdetir jî zêde em rişt nedigirtin. Gelo dewletê ew digot, “di van de jîn tuneye, yan jî nikarin tiştekî bikin”. Tiştekî diyar tuneye yan jî tevgereke mezin a veşartî ye.

Ez pir vekirî bûm, lê belê her demê ne vekirîbûm.

Bihizirin, dewletê hîna di sala 1975’an de bihîstiye ku me artêşa Kurdan ava kiriye yan jî bi şêwaza xwedî nêzîkatî ye. Heke di salên 1975 û 1976’an de di vê mijarê de dewletê bêbandor nehêlim, bi kîjan çalakiyê ve ez dê komê derxim derveyî Enqereyê? Rêberên ciwanan ên weke Mahîr Çayan û Denîz Gezmîş jî encax mehekê bi çalakiyan jiyîn. Mahîr rêxistin damezrand, du mehan nejiya. Vayê TÎKKO saz bû, heman tişt. Rêxistina herî bihêz a îhtîlalê jî temenê xwe çend meh in. Tiştê ku ez jî bi navê artêşa Kurd bikim, hefteyekê jî najî. Partiyên veşartî tên sazkirin, bi rastî hemû encax piştî çend heyvan eşkere dibin. Mustafa suphî partî saz kir, hat di nîva rê de xistin bin avê. Partiya çayanan bi deh kesan ve li kizildereyê çû. Denîz wan bêyî ku bibin artêş çûn benê dardekirinê. Kaypakkaya jixwe li Dêrsimê hate çalakiya yekem û wisa çû. Dîsa li dijî dewletê yek mînakeke serkeftî jî nîne. Hun li serhildanên Kurdan dinêrin, Şêx seîd hîna ji beriya rabe serhildanê xistibûn bin kontrolê. Dîsa seyît riza bi xapandinê birin benê darvekirinê. Bi van tu kesan jî gav nedane avêtin. Rewşenbîrên Kurdan derdikevin hîna bêyî ku peyveke Kurdan bikin bêbandor tên hiştin.

Ev hemû rast in. PDK tê damezrandin, bêyî ku deh roj derbas bibin, bi bûyereke weke şerê êşîrtiyê ve faîk bûcak tê îmhakirin. PDK ji sala 1970’an bi şûn ve weke rêxistina ajanî tê rawestan û piştî em derketin holê bi şûn ve bi teşeyê KUK (rizgargerên netewa Kurdistan) li ser me hate sepandin. Çepa Tirkan piştre dibe sosyal-şoven û lewma di eletewşkirina pirsgirêka Kurdan de misoger tê bikaranîn. Ji TKPê bigrin hetanî her kesê ku dibêje ez çepgir im, wisa tê bikaranîn. Li gor dewletê di nava çepgiriyê de ev yek kiriye, li cihên din çima dê neke? Em jenderme, polîs û îstixbarata

wî li aliyekî bihêlin, çizirîneke (sızma) herî biçuk jî rêxistinekê diqedîne. Ev yek misoger wisa ye û bi vê şêwazê bi ser me de jî tê.

Her wiha xwe diçizirîne nava me. Yek jin yek jî zilam e. Kesîre Yildirim (fatma) û necatiyê agirî (Pîlot).

Jin ji Dev-Yolê tê. Ya ku carna rola diyarker dilêyîze, rola têkîliya bi Pîlot re, ya têkîliya komê giştî û bi taybet rola têkîliya bi jinê re ye. Artîsta esas ev jin e. Pir balkêş e. Heke bal were kişandin, di vê çerçoveyê de nêzîkbûyîna ji çepgiriyê re, yan jî heke koma me mijara gotinê be, nêzîkbûna kesên bi pirsgirêka Kurdî re pêwendîdar tê hêvîkirin. Di vê qonaxê de derketina kesayeteke wisa, bi mirov aliyê civakî-hestyarî dide hizirîn. Di aliyê civakî de malbatê û sekna wan a di serhildana Kurdan de divê mirov pêş çav bigre. Jin eleqeyê raberî çepgiriyê dike û tê Kurdeyetî yê.

Pir vekiriye ku ji bala kesekî weke min nareve. Him jin e, him xwe weke sosyalîstan dide raberkirin û li dijî serhildana ne. Ji malbateke wisa tê ku di serhildana Dêrsimê de neyinî, lê gelekî çalak û roleke weke hevkar-ajan lêyîstiye. Weke kesayet jî xwedî taybetmendiyên gelekî balkêş e. Qaşo di nava tevgera şoreşgerî de cihê wê heye. Dev-yolî pir taybet pê re têkildar dibin. Misoger di wê astê de ye ku dikare rêberên piştî 12 adarê bandor bike û bikaribe di nava komên nû de bibe endamekî bihêz. Lê çiqas ji bo dewletê ye, çiqas ji bo sosyal şovenîzmê ye ew mijara dîtir e. Ji bo me ewqas zêde girîng nîne. Ya ji bo me girîng, dîtina vê yekê û bi komê re çêkirina têkîliyê ye.

Di destpêkê de, ji bo girtin an jî negirtinê du dilî heye. 1974-1975 wisa derbas dibe. Beramber pêvajoya hev ezmûnandinê ye. Ez him fedok him jî du dilî me. Hawirdora Dev-Yolê ya ku jê hatiye, di aliyê me de wesfa xwe ya sosyal-şovenî her ku çû derket holê. Ji ber ku, piştre di sala 1976'an de dema Hakî bi xwe çû civîna damezrandina wan, bi tenê ma û avêtin. Hakî jî bi tena serê xwe tekoşîn kir. Bala min dikişîne, jinê disepînin ciwanên Kurd û dixwazim koma me jî bêhêz bikin. Bikaranîna vê ya Dev-Yolê yan jî bi hev re wisa xistina me ya tengezariyê tê çi wateyê? Dixwaze

yekser dixwaz e, ne yekser dibe ku ji nû ve bibe amraza êrîşê ya kemalîzmê.

Ya herî girîng jî, di wateya pêşdîtina me de nepejirandina Dev-Yolê (riya şoreşger) ya pirsgirêka netewî ye; bi teşeyê ku şoreşgeriya Tirkiyê ya Hakî û kemal beşdarbûne nepejrîne, aliyê wan ê sosyal-şoven û niyetên wan ên xirab her ku çû xwe eşkere kir. Ev jin jî, ji bo wan xwedî roleke sereke ye, heke em baldar nebin, rola ku malbata wê di serhildana Dêrsimê de lêyîstiye, wê di kesayeta me de li dij tevgera rizgariya netewî ya nûjen bilêyîze.

Ez çerçoveya giştî ya eleqeya me didim diyarkirin. Ez di wê hişyariyê de me ku bavê wê li dijî serhildana Dêrsimê roleke xirab lêyîstiye. Ji nû ve serhildan hatiye kirin û keça wî jî li ser tevgera me di nava destwerdanekê de ye. Tam di nav de nîne, lê li derve jî nîne. Dev-Yol bi wesfa xwe ya kemalîst her ku diçe dixwaze pêşiya tevgera me bigre û ev kes dibe ku amrazek be, lewra dikare ajanek be jî. Gelekî pirsnîşan hene.

Gelo min qet pêwendî ava nekiriba, diviya ku ji aliyê taktîkî ve baştir bûya? Keç e, keçeke Kurd e û sosyalîst e, em xwedî komeke sosyalîst a Kurdan in. Ya xwezayî hatin û tevlîbûna wê ye. Berovajiyê vê divê ku em wê weke dijmin bi nav bikin.

Erê rêgeza azadiyê: heke me qebûl nekiriba, di aliyê azadiya jinê de jî me dê ji rêgez tawîz bidaba. Ez bawerim yek jî kirûya (olgu) zanistê hebû û bi hêsanî dikarîbû bi rê ve bibe. Heke em vê yekê bi pêş çav negrin, em dê ji rêgeza besbûnê jî tawîz bidin. Em wisa ji têperîna rêgez re razîbûnê nîşan bidin jî, wê demê di pîvanên me yên şoreşgerî de hilnedihat. Dîsa rêgeza hest û hişyariyê jî, diviya ku yekî weke min nîşan dabûya. Rêgeza Moral: keçeke Kurd, malbata wê çil salan ajantî kiriye, ev jî dixwaze bibe rizgargera netewa Kurd û sosyalîst. Weke keçekê dixwaze ciwaniya xwe jî wisa pêşkeş bike. Bêguman di vê derê de şiyarbûna aliyê hestyarî nayê hizirandin. Heke xayin e, ajan e divê em li gor wê hesta hêrsê, kînê pêşbixînin. Na heke dixwaze xwe ji xiyanetê û di dirokê de ji sekna malbatê ya neyînî, bêyom û bilenet rizgar bike, divê em çi bikin? Divê

hestyar bin, a xwezayî ev e. Dibe ku tu hindekî xemdar bî. Lê bila ev yek ne bi bingehê redkirina wê, bila di aliyê pejirandinê de pêşbikeve. Em dikarin vê xilas bikin, rexmî malbata wê di nav rizgariya netewî de dikarin perwerde bikin û bihelînin, em dikarin bixin rewşeke pejirînê.

Di vê derê de li dij mêtîngeriyê û hevkariyê nêzîkatiyeke balkêş heye. Esas bi qandî ku em bibêjin, “ji ku derkete pêşberî me?” em xwe bêşens dibînin, lê ji aliyê din ve pirsnîşaneke weke “temam em dikarin ji vê hesab bipirsin” heye. Sê salan ez li ser vê yekê hiziriyam, ponijiyam.

Ev nêzîkatî gelekî xwedî wate ye û piştre hindek encamên vê yekê derketin holê. Hema nêzîkatiyeke ku min di gelek têkîliyan de ezmûne dikir, min di vê derê de jî ceriband. Awarte bûn, têkîliyeke ku rê li pêşiya encamên girîng vebike saz kirin. Yanî têkîliya stratejî, tekîliya krîtîk. Hetanî zehmetiyên têkîliya encamgir, hetanî pirsgirêkên wê; bi aliyê dahûrînî esas girtin, bi aliyê tekoşînî esas girtin di min de bûye weke fêrbûyînekê. Ev astên têkîliyan pêtir bala min dikişînin. Ez zêde ji yên fêrbûyiyane, statukoyî û yek astî bi bandor nabim, vala naçe. Ya zêdetir meraqê dikişîne, ya ku bikaribe encaman serûbin bike, ya ku pêtir bibe mijara tekoşîneke girîng min dikişîne nava xwe. Ji bo têgihiştina şêwaza min, fêmkirina vê yekê gelekî girîng e.

Nêzîkatiya min a ji bûyer û pêvajoyan re her dem xeternak, lê di cihê herî encamgir de dibe. Tişta ku ji aliyê her kesî ve were bi serxistin tercîha min nîne. Tiştên ku zû bi zû nayê hişên mirovan û yên herî zehmet ji xwe re dikim mesele. Gelek kes ji bo fêmkirina ev aliyên min xwedî hewl in, lê min ev yek evqas eşkere neanîbû ser ziman. Di polîtîkayê de û bi giştî di tekoşînê de, ne min xwe ji bûyîna kesekî pêvajoya vê diyalektîkê rizgar kir ne jî min tu ferasetên din ecibandin. Yanî ji ber ku ez hişmend an jî dahî bûm, weke şêwazekê min xwast ev yek wisa be. Yan jî ez neçarî vê yekê mam. Yê xwedî asoya fireh û xwedî serpêhatî min tercîh kir. Lê ez gelekî jî rasteqînêr bûm.

Divê şaş neyê fêmkirin; derfeta serkeftinê pir lewaz e, lê bêîmkan nîne û ez wê tercîh dikim. Ez xwendevanekî ji rêzê me. Esas ez di waneyên xwe de gelekî jîr im û di nava

sînorên pergalê de ez dikarim bibim yekî rewneq. Lê ev yek qet min eleqeder nake û ez dihizirim, “ma şoreşek pêwîst nake?” Di civakê de hema di her têkîliyê de dema têkîliyeke ketûber mijara gotinê be, ez dikarim bibêjim ku şensê min baş e. Yan jî heke ez nûbûyînekê bigrim ez di vê yekê de xwedî israrbim (ez xwedî israrim, taybetmendiyeke min ê wisa heye) ez dikarim di wê de encamê bigrim. Nêzîkatiyên wisa weke fêrbûyînên mezin xwe disepînin û diçin.

Ez bawerim ji ber bandora ku tevgera me di Kurdistanê de rê li ber vekiriye, rojekê ji nişkave malbata jinê barî Enqereyê kir. Semteke ku malên MÎT’iyan lê hebûn, ez bawerim barî etlîkê kirin. Ez misoger ajan îlan nakim, lê misoger dixwastin di bin hîmayeya CHP (partiya gelê komarê)-Ecevît de bijîn. Di warekî wisa de bi cihbûn. Ev ji bo min zêdetir hizrînêr hat. Çima bi lez û bez mala xwe digrin. Me dikarî em vê malbatê di bingeha Kurdistanê de jî, hîna bisudwertir bikin. Lê hatina wan, guman didane çêkirinê, weke ku ji navendê û xwe dispart biryargeha rejîmê. Ji bo me di her aliyekî de bi wate bû û diviya ku em bi ser ve biçin. Him ev taybetmendiya malbatê û him jî ev taybetmendiya jinê, pirsgirikeke ku kor bûye û her ku diçu rihetî çêdikir, çareserî ferz dikir. Malbat rêgezeke feodal, rêgezeke hevkar, jin weke zayend jî xwedî giringiyekê ye ku çareseriya xwe ferz dikir. Yek jî ji bo serokatiyê dilêyîst. Li kêleka vê jî, serokatiya me ya ku dixwaze derhatinê bide çêkirin heye. Û li der û dora wê rewşeke astengiyê pêk tîne. Bi vî rengî yan jî bi wî rengî gelekî nîşanan û bi şopandinî derbas dibe.

Ji bo min serdeçûyîna herî zor bû. Rexmî ku min xwe dida paş, lê ji nişkave min li derî da û ez ketim nava vê malê.

Li gor pîvanên Kurdistanê, cihekî ku xwe pir baş bi rêxistin kiriye û gelekî lihevhatî û xwediyê rêkûpêkiyeke di asta sosyeteyê de ye. Heta wê demê avabûna malbata bûrjuvaya biçuk a ku min zêde çavdêrî nekiribû, mijara gotinê ye û ez vê yekê dibînim. Lê pergaleke wisa bilind rabûya nîne. Ez bawerim, di pêvajoya desthilatiya çil salan a rejîmê de asta herî bilind hindekî dîtiye, ew jî dixwaze li gorî Kurdistanê hindekî lihev bîne. Malbateke wisa ye. Jiyanê bi

tekîliyên hevkariyê ve têkilhev dike û li gor xwe teşeyekê pêk tîne. Jiyaneke pir pêşveçûyî, livînên lihevkirî û tenik hatiye rûniştîn. Xwedî jiyaneke aram bûn. Ya min jî berovajiyê vê, tam çil salan weke yekî ku di çiyan de mayî û dişipe ketina nava malbeteke ku pêvajoyeke çil salî li dûv xwe hiştî.

Niha ji derî ve ketina min a hundir dişipe çi? Di dîmen de ez li hevala xwe ya hezkirî digerim, gelek diyarde jî wisa ne û malbat bi xwe jî wisa pêşwazî dike. Ez pirsên fediyokî dipirsim. “keça we li ku re? Hevala min e” lê hetanî dawiyê şêwazeke ketinê ya balkêş bû. Her çiqasî pir bi nakokî be jî hevalek e. Çi dibe jî, li ser sosyalizm û Kurdeyetiyê radiweste. Bi carekê ve, ez helwesta xwe ne ji aliyê netewî û ne jî ji aliyê çînî ve nikarim eşkere danim holê.

Yanî şêwaz bi teşeyekî serdegirtinê ve dibe. Malbat bi guman e.

Di nava komê de jî guftugo zêde bûn. Ji bo ku em zêdetir nêz nebin, em dê eleqeder bibim û emê biçewisînin. Ji derî ve ketina min a hundir dişipe girtina min a wê bertîlê. Di dîtinê de diviya ku min qet tiştekî wisa nekiriba, ez bi barê hestan diçim. Yek ji endamên koma me, malbateke ku herî zêde rola hevkariyê lêyîstiye, di Kurdistanê de malbateke wisa ye. Ez wê ji komê dizanim û ev jî di cihekî de tê wateya lihevkirina bi dewletê re. Weke CHP ya kemalîst. Her çiqas ew bi xwe bibêje, ez çepgirim jî bila bibêje, dema ku mirov bi rasteqînî lê temaşe dike cihê wê yê di tevgera rizgariya Kurd de diyar e. Cihê wê yê çînî diyar e. Em komekî tevgera herî radîkal a sosyalîst in. Ketina wê demê dibe hesab xwastinek.

Ew ketineke pir gîring e. Dîsa dilê min tê ber devê min. Esas erzan e, “merhaba, tu çawayî?” dê ew jî silava te bigre ewqas e. Lê li gorî min rewşeke pir cuda ye. Bawerim ku dema ez ji derî ve ketim hundir her çiqas ne bi zanebûn be jî, qasî belaya ku min anî serê xwe, mezinahiya ku min avêtiye jî mijara gotinê ye.

Min dixwast ez Enqereyê dahurînim.

Hewl didim ku Enqereyê yan jî hevkariya Kurd a li dora binkeya olîgarşîk xwe rêxistin kiriye dahûrînim. Sê

nakokiyên mezin! Îdeolojiya fermî di eniya pêş de cihî girtiye, hevkarî herî zêde xeter bûye, dîsa jin di rewşeke herî xeterde ye. Têkîliyeke ku sê nakokiyên mezin di asta herî bilind de temsîl dike. Li navenda Enqereyê qada ku MÎT tê de desthilat e. Kelhe ji hundir ve fetihkirinê bixetertir bi wêrekî û şêwaza fetihkirina kelhê ku şiyariyê pêwîst dike.

Min çawa kir?

Di wê demê de ew tê bîra min: livîneke cuda û lîvîneke bi xeter û livîneke ku rola jiyanî dilêyîze mijara gotinê ye. Ji bin derketin belkî jî gengaz nayê dîtin. Lê belê ji bo çareseriya Kurdan jî, li gorî min jî çareseriyeke dîtir tune ye. Çawa ku serhildana min a yekem li hember bavê min, pir girîng û damge li kesayeta min dabe. Ev têkîlî jî ji wê bi çil carî hîn girîngtir e û dê muhra xwe li dîroka ji vir û pê ve bide. Tenê ji bo min, ji bo tevahî Kurdan şênber e. Daîreya dewletê û têkîliyên dewletê pir baş hatine rêxistinkirin û bi şênberî keleyeke xwedî parastina tund e. Serdestiya wê di wateya civakî, siyasî, madî û hestyarî de tam e. Asta rêxistina min jî di hemû aliyan de ji serhildana min a yekem hîna lewaztir e. Rawestgeheke wisa ye afirandêriya me diyar dike. Teşwîk dike. Çarenûs tevnên xwe dihune û me dikişîne nava xwe? An jî tevgereyeke ya bi ser de girtinê bû? Yan jî taktîkeke siyasî ya mahîrane bû? Yan jî weke ku gelek kesan jiyaye, hestyarî û tevgera kesayeteke lewaz bû? Dibe ku hemû bin jî. Jixwe di wan rojan de ez gelekî westiyayî bûm, roj ewqas bi zehmetî derbas dibûn ku...

Di min de taybetmendiyek e, têkîliyên min ên civakî her bi vê teşeyê bû ne.

Ez li xwe diçim û têm xaleke wisa ku dibêjim, “an tûyê vê têkîliyê çareser bikî, yan jî tûyê nikaribî bijî”. Di aliyê siyasî de û ji aliyê îdeolojiya fermî ya sosyalîzmê ve bi hemû aliyên hestyarî ve, “yan tuyê têperî, yan jî tûyê tune bibî û biçî”. Bi van rastiyan ve her roj weke azaba dojehê derbas dibe.

Di vê xalê de bîranineke min a din heye.

Min xwast ez ji nava vê komê birevim. Ev yek tam rev nebû, em dikarin bibêjin xwe paş ve kişandin jî. Qasî panzdeh rojan min ji vê komê îstifa kir. Min digot ji ber vê

kesayetê ezê “paş ve bikişim”. Hêza min têra nedikir, kesayeke pir bibandordar bû û ez reviyam. Gelek hevalên min qet bi vê yekê jî nehesiyan. Belkî hîna tê bîra wan, min digot “ez îstîfa dikim”. Ez bawerim vê yekê çend hefteyan berdewam kir, ji nû ve bi ser de hatim. Min dît ev karê ku ez karibim bikim, qebûlkirina têkçûyîneke wisa çiqas zehmet be jî, ez paş ve kişiyam.

Ez bawerim çekeke jinê ya wisa mijara gotinê bû û ev yek jî bi zanebûn bû. Ez serê komê dikişînim. Di komê de hindek endamên din ên xetertir jî hene û ev li der û dora wan teşe digrin. Jin, dixwaze vê yekê xirab bike. Dema xirab dike jî, gelekî berovajiyê rêgezan, pir xeternak, bi azîneya ku ez qet nahizirim yanî jiniya xwe dide bikaranîn. Bi vî awayî dixwaze komê parçe bike. Ev yek pir eşkere tê dîtin.

Niha li hember vê ezê tedbîreke çawa bigrim? Dev ji komê berdan û çûyîn nabe. Bi destên wê de berdan qet nabe. Heke ez bibêjim, “neke” nabe... bawer nake, giran tê. Ez jî di wê şarezayiyê de nînim ku vê yekê pisporane pêşwazî bikim. Lewaziya ciwanmêrên me yên Kurd (bi taybet kesayeta îro di zîndanê de) bi jiniya xwe bandor bike, bi xwe ve girê dide û bi ev taybetmendiya xwe ve dixwaze komê bêkar û bêçalakî bihêle. Vê yekê eşkere jî nabêje.

Di vê rewşê de min, pêşniyara xwe ya çareseriyê ku ez pê dihiziriyam pir pratîk û li gor xwe pêş xist. Ev gelekî bandor dike. Tenê yekî ne, hema dixwaze me hemûyan bandor bike. Yek jî bi hevaltî ne, ez hindek xeteriyan jî hîs dikim. Bi karanîna jintiya vê wisa bi azadî û hevaltî nîne. Xeterî her ku diçe xwe diyar dike. Jin, di asteke din de dinirxîne û dixwaze girê bide. Lewma dema ez di nava hestên wisa de bûm, pêşniyariya min carekê ve bi pêş ket. Li gor pîvanên civaka me her çiqas şaş be jî (ez niha tiştekî wisa nikarim ji tu kesî re bibêjim) lê li gor min di qonaxeke wisa gotineke pêwîst bû: min got, “tu bi yekî re bibe destgirtî”. “ev yek hema yek ji me hemûyan dibe”. Ev gotin cara yekem û dawiyê ji wê re got. Qet hêvî nedikir û hema dijderketineke wê ya dijwar çêbû. Wisa ez dixwazim derbasî pêşiya kesayeta wê ya ku weke çekeke mezin û amadebûyî bûyê bibim. “tu bandordarî, xwedî hêz î. Di nava ev komên ciwanan de weke

teşeyê têkîliya tu dixwazî, tu dikarî bi hêsanî bi rê ve bibî. Lê ez jî tedbîrekê pêşniyarî te dikim. Ji bo rewşa te ya dîtbarî şaş neyê fêmkirin, bi yekî ji me re bibe destgirtî.”

Fêm kir ku ez dixwazim pêşiya hindek tiştan bigrim ji ber vê reaksiyoneke dijwar raber kir.

Jin, wisa hatiye amadekirin, hatiye perwerdekirin û balkêş e, bikeve nava kîjan komê dê ji hev belav bike. Bi ihtimaleke mezin him objektîf û him jî subjektîf ev yek wisa ye. Em nikarin bipeyitînin lê ev xal divê pişt çav neyê hiştin. Ev tedbîreke civakî, siyasî û hestyarî ye. Heta endamekî xwe yê herî girîng jî wenda kir. Ez bawerim Tekoşîngeran (navê rêxistinekê ye) jî xwastin vê têkîliyê wisa bi kar bînin. Û Tekoşîn hindekî weke encamê vê pêşniyariyê pêş ket. Kesê ku jin pê re hatibû têkîldarkirin, piştre li derûdora xwe yan jî di nava xwe de rê li bûyereke Tekoşînê vekir. Vê têkîliyê ji rêxistinkirina ajanekî re zêmîn pêşkeş dikir. Di cihekî de ji bo xelaskirina komê em bi vê yekê jî qayil bûn.

Ev mijar vaceke zirav û hişyariyê dixwaze. Hetanî 1976-1977’an me wisa bi rê ve bir. Lê jin, ne yeke wisa bû ku bi têkîliyeke wisa re sînordar bibe. Min nedikarî ez ev têkîliya demî hetanî dawiyê bibim.

Pir balkêş e; ev sal, di heman demê de bû saleke bi bahoz a ku zêde dewlet bi ser me ve hat û sala diyarkirina çarenûsa me.

1976 tam bû saleke wisa ku, kombûyîna me di Kurdistanê de gelek pêş ve çû, lê dewlet jî pêtir bi ser me de hat. Vaye di vê xalê de Pîlot dikeve dewrê. Bi giştî di dîroka rizgariya netewa Kurdistanê de, bi taybet di dîroka PKK ê de bû sala herî krîtîk.

Her ku diçe kar tevlîhev dibin. Li gor min heke em xwe bispêrin malbata jinê, ev tê wateya xwe spartina CHP û Ecevît. Dê ji vî zilamî re rapor biçe: “rêberê filan komê, bi filan malbatê re têkîldare, têkîliyê pêş bixînin!” Bi hisî, her çiqas bi guman be yan jî tecrîta min jî bi xwe re bîne, ezê pêtir bi ser de biçim. Tedbîra min girtî bes nake. Keça me destgirtiye, lê ev yek ne ji aliyê min ve ne jî ji aliyê wê ve jixwe nayê pejirandin.

Şer destpêkir. Çarenûsa komê mijara gotinê ye. Niha êdî bi înkarkirina van re bi rêvebirina komê ne gengaz e. Di aliyê siyasî de ne gengaz e, di aliyê civakî de, aliyê kadro de ne gengaz e, divê misoger em vê yekê çareser bikin. Min gaveke din avêt. Dawiya 1976 û destpêka 1977'an de diviya ku ez derbikevim. Weke din tu riyên derketina min a ji Enqerê û saxlem derxistina komê nîne.

...

Di mercên bûrjuvaziya biçuk de beşdasbûna evînekê xeter bû. Di gund de jî û piştî wê jî, ez tu caran nêz nebûm. Keç hene, tunene, yan jî ez zilamim ne zilamim pirsên wisa min qet jixwe nekirin. Di rasthatina me ya di salên 1975-1976'an de rastlihevhatineke cewaz bû. Sedemên wê yên dîrokî hene. Sedemên wê yên civakî û siyasî hene. Ez jî êdî di rewşa gavavêtineke nav şoreşê de me. Heke yê li hember min xwe bi hêz dibîne, qasî ku nêzî min bibe xwedî baweriye, ez jî ciwanmêrek im. Ma ezê birevim? Min zehmetî dikişandin lê belê ji bo ku ez nerevim, min gotibû bila bibe û heta min gotibû bila were nava komê. Erê ev dihat wateya destpêkirina şerekî mezin û di nava kar de gelek bandor û rol dilêyîzim. Ji aliyekî de siyasî, rêxistinî, ji aliyekî de hestyarî û ji aliyekî madî û manevî ve meşandina şerêkî perçiqînêr e. Di vî şerî de pir awarte li gor xwe heke min şêwaz negirtibûya, berdin PKK ê weke kes min dê xwe çawa xilas kiriba, hetanî niha nekariye were fêmkirin.

Belayeke mezin e. Dibêjin a, "sax nahêle" ji wê zayendê ye. Yek jî heke em nezanin û bibêjin bila ev têkilî tekiliyeke ketûber be, dîsa wê tune bibe. Û pêvajoya bingehîn a ciwanmêriya jiyanê ye. Lê belê pîvanên min, pîvanên kesî yên ketûber nebûn.

Ji zaroktiya xwe û bi vir ve ez yekî cewaz bûm. Hevala min a keç dema di zaroktiya xwe de zewiciya jî, ez zivirîm û min ew vedixwend berdewamkirina lêyîstokê. Di bingehê xwe de muhafazakar im lê ev rengên pêşketinan didin diyarkirin ku lêgerîneke min a azadiyê jî berdewam dike. Min temaşeyê keçên gund dikirin. Zilamekî pîr ji xwe re girtiye, ji bo ku bibe mînak ez dibêjim. Di zaroktiya min de keçeke ku diviya bibe heval, lê min temaşe kir, zilamekî şer

kiriye heke ev yek ji bo wî bixwe nebe jî, ji bo zarokên xwe dixwaze. Hevala min a ku mijara gotinêye dixwast hindek tiştan ji min hîn bibe. Lê belê wê demê hêza min a ku ez fêm bikim û bi zanistî bidimê tûne bû.

Li gorî min ev bêmafiya mezin bû. Keçeke ku hindekî dikeve çavan, li ser çarenûsa wê çima li derveyî giyana wê şerek dibe. Wê berde, xwişkeke min hebû, ji gundên axayan rojekê tên wê dixwazin, ev kîne? Û hîna tê bîra min, di nava min de cih nedigirt. Ev zava dibe kî? Hindek pere û hindek tişt didin xwişka min, lê ne şêwazekî baş e, heta niha jî biçuk dibînim. Têkiliya koleyan e. Bi vî şêweyî bi hezaran bûyer hatin li gel hev kombûn û di min de feraseteke azadiyê derxistin holê. Kirêtiyên zayendîtî û pirsgirêkên ku zewaca zû ya keç û xortan a di demeke kurt de derdiketin holê... bêkar û bar... ji bo cêyîz û qelen hemû xortên xwe û yên ku hemû ciwanên xwe qurban dikin...

Piştre ev hemû dihêlin ku ez xwedî endaze bim. Ez dê hiziribiyam ku ev kar ne hêsan e, pirsgirêkên mezin bi xwe re peyda dike. Di dawiyê de jî ez dê biketibama nava ezmûneya têkîliyekê. Çawa? Bi esas heke ku çarenûsa komê ne mijara gotinê bûya, dê ji tedbîreke wisa re pêwîstî nehatibaya dîtin.

Li gor min ji bo çareserkirina vê nakokiyê, ya herî baş bi ser de çûyîn e. Li ser vê bingehê min rêbazeke bingeh girt. Şerê vê dê tam deh salan bidomiya. Ev jî pêvajoya bûyîna PKK ê ye.

Li Enqerê şerekî cewaz hebû.

Yek du kesên gumanbar nêz bûn. Bi van re ez vekirî şer bikim an jî vekirî gotinên wan pêk bînim. Wê rojekê jî min nedin jiyîn. Lê dîsa jî diviya ku min şer kiriba û kom rizgar kiriba.

Dîrokî ye.

Di salên 1975'an de sazkirina komeke şoreşger bi navê Kurdan, wê seyra dîrokê bide guhertin û kesên ji min wêdetir dest biavêje vî karî nîne. Ez nikarim birevim, weke Denîz Gezmîş û Mahîr Çayanan ji nişkave nikarim derkevim û tekoşîn bidim. Ev hêza min tune ye. Rewşa min cewaz e.

Lê dîsa jî divê em koma şoreşger pêk bînin û şer bidin meşandin.

Şêwaz û baweriyek heye.

Bawerî heye. Hindek sosyalîzm û hindek jî ezmûnên şoreşa rizgariya Kurdistan hatine hînbûn. Êrê em tenê dikarim bibêjin ev aliyê kar û baweriyê ye. Tenê tê gotin ku "divê bê kirin" û ewqas. Lê şêwaz bûyereke pir cuda ye, nêzîkatî bûyereke cewaz e. Bawerî heye. Zanebûn heye. Lê heke ku şêwaz nebe nikare bijî.

Êdî bîst komên ku digotin "Kurdistan mêtînger e" hebûn. Komên çepgir ên Tirk jî ev digotin. Tê zanîn ev hemû piştre bi binketin. Çima binketin? Yê herî lewaz ez çawa ji vê filitîm û min tekoşîn hilperand. Tirsa herî jiyanî jî ev bû. Ji bo dîtina bersivê lêkolîn dibû. Bi taybet sazkirina koma yekê û derxistina wê ya ji Enqerê jiyanî ye. Li gorî min cewherê gerîla û ramana wê ya bingehîn jî di vir de ye. Heke mirov şidyayî bi bîranînan ve girêdayî be, di çiyan de gerîla nepêşvexistin naye hizirîn û binkeya olîgarşîk nerûxandin jî nikare were hizirîn.

Li navenda Enqereyê, milîtantî û serokatiya PKK a ku bi çil çemberan ve hatibû dorpêçkirin îro di çiyan de bûye desthilat û hema di rewşa hêza dorpêçkirina dijber de ye.

Di Enqereya wê demê de hêza rejîma li dijberî me tenê ne siyasî, polîsî û îstixbaratî, di heman demê de madî û manevî û di aliyê hestyarî de ye jî. Yanî misoger desthilat e. Lê rexmî vê yekê ez dîsan tekoşînêr im.

Arteşeke yek kesî me.

Arteşeke bi yek kesî. Nebêjin "ma wisa dibe?", wisa bûyîna wê derkete holê. Yê ku piştgiriya vê kir çi bû? Yan jî kîjan şêwazan serkeftina vê pêk anî. Ya ku divê were dîtin ev e.

Min ev kom saz kir, lê bi vê komê ez dikarim çi bikim. Hîna di wan şertên ku ji mercên şerê îro gelekî dûr bû jî, ez li dorê digeriyam. Min her tevger diceriband. Dema ku min hewl dida ez komê pêk bînim, hevalên me yên herî ji xwe razî, girtina demjimêreke wan a bi kar anîna ji bo xebatê mesele bû. Ez diçûm, hemû dersên xwe dixwînin. Heya ku min di derbarê rizgariya netewî de pirtûkek dida, ez

diteqiyam. Kişandina wan a nava guftugoyekê dibû mesele. Yanî zilaman ji dema xwe bîstûçar demjimêran yek demjimêr jî nedidan. Ji aliyekî ve hewldana me ji bo pêkanîna vê yekê, ji aliyê din ve jî çend qirûş dirav. A herî girîng jî, ji bo afirandina baweriyê û piştre mijara mafdariya me û çima pêwîstiya kombûnê heye, bersiva van pirsan ji bo ragihînim, ji hezar çeman min av berhevdikir. Min hewl dida ez danim holê ku pirsgirêkek heye.

Di 1975'an de her kesî kovar derdixist. Kovarên pirxwedî û mezin derdixistin. Ji bo rengdar bikin her tişt dikirin. A me jî ne di aliyê madî de ne jî di aliyê niyet de zêde rewşeke me ya ku em kovarekê derbixin nebû. Lê heke bibûya jî, diviya ku me reng nedabaya.

Ji bo vegotinê divê em meseleya tempo bi bîr bînin.

Di Enqereya salên 1975'an de hestên li ser min desthilat hebûn. Min çima pêwîstî dît ku ez ewqas şêlû bim? An jî pir ne bi zanebûn û ji ber xwe de be jî, li wir şêwazeke min mijara gotinê bû. Tenê ji ber veşartiniyê, di şêwazê pêşketinê de jî derfeta xwe zêde eşkerekirinê tûne bû.

Rastî tam derneketiye holê, tenê serî nîşan dide.

Diyardeyên xetê hene.

Dewlet bêhna wê hîs dike lê wê bi çi darizîne?

Aliyekî me yê ku weke rêxistinê bi dest were girtinê tunebû. Hetanî salên 1977'an jî min hişt ku ew wisa be. Rêxistin him heye, him jî tune ye. Di bingeha xwe de ew şêwazeke xebatê ye, hetanî niha jî ez wê berdewam dikim. Niha hîna zêdetir pêşketiye. Ji ber wê ye ku sedema ji me fêmnekirina her kesî jî ev e.

Mirov bi yek alî tên kuştin.

Rola ezmûneyan çi ye? Rizgarî (navê rexistinekê ye) jî gelekî xwedî ezmûn bû. Serokê wan ê wê demê xwediyê ezmûnên zindanê bû. Civaktiyeke wî ya dewlemend jî hebû. Radibe, rûdine û xwedî îdiayeke misoger a seroktiyê ye. Lê belê qasî bejna liba ceh jî nikare bi rê ve biçe. Tenê nedikarî çalakiyekê jî li dar bixe. Em vê berdin çepgirên Tirkan jî wisa bûn. rexmî mîrata wan a mezin bi hezaran girseyên alîgir, lê belê zêde şensê pêşveçûyînê nedidîtin.

Lê em jî wisa li xwaringehan hatibûn girtin ku, tu kesî bawer nedikir emê derketinekê pêk bînin. Dewletê jî bawer nedikir. Me ji diyardebûyînê wêdetir tiştek nîşan nedida. Yanî ev yek ne tenê damezrîneke siyasî ye, damezrîneke civatî ye, em dixwazin vê yekê bi derûdoreke civakî re pêk bînin.

Pêvajoya ketina nava malbata PKK ê. Bi salan em xwedî hewl in.

Em digerin, lê pêşveçûyîneke pir kêm bi dest dixin. Li vir a girîng dîsa dewlet e. Helwesta dewletê ya derketina me ya ji Enqerê ye.

Min ji salên 1966'an û bi vir ve di aliyê madî de xwe spartiye dewletê, û encax salên 1977-1980'an de emê derbasî qutbûyînê bibin. Tam 12 salan bi derfetên dewletê yên madî û hawirdora ku daye afirandin min mesafeyeke diyar girtiye. Dema ku me hewl dida em derketinê pêk bînin, ên ku li hawirdora me digerin hene. Binkeya binketî yan jî olîgarşîk hewl dide ku çepgiriyê bi bandor bike. Nûnerên PDK ê yên dixwazin Kurdeyetiyê bikin hene. Ew jî neyekser dixwazin me bigrin bin kontrola xwe. Em napejrînin. Lê di koma me de jî mirov dikare bibêje ku bi hêsanî nikare xwe ji dewletê rizgar bike. Dewlet bi hişdarî bi ser me de tê û di salên 1977'an de yekser dikeve nava çalakiyên tunekirinê.

Hîna di dawiya 1975'an û bi şûn de bi giştî digrin bin nirxandinê. Qasî ku tê bîra min di ewlekariyê de tê gotin artêşa gelê Kurdistan hatiye afirandin, ew jî wê demê ji aliyê berpirsyarê DDKO ji me re hate ragihandin. Gotibû bila li xwe baldar bin. Wê demê me dest bi manîfestoyê kiribû. Di zivistana dawiya sala 1975 û destpêka sala 1976'an de min bi xeyrî re manîfesto amade kiribû. Di ewlekariyê de nîqaşên weke artêşa Kurd tê damezrandin, dida nîşankirin ku zilamên dewletê xwediyê hindek zanistiyên seranser in û ev yek didan nîşankirin.

Di sala 1976'an de piştî ADYOD ê em dixwazin koma xwe cuda bikin. Pîlot jî weke wêneran tam di sala 1976'an de dikeve nava kar. Di dîtinê de her weke ku ez di himbêza wan de me, yan jî ez di rewşeke li gor xwasteka dewletê de me. Destwerdana dewletê pêş dikeve û hevkarên Kurdan bi

şêweyên cuda hindek ajanan dixe dewrê. Pir balkêş e, ya wan ne çiziran (sızma) bû û her weke ku ez digrim û dibêjim "werin em bi hev re bimeşin." Şêwaza min e. Her weke ku dibêjim "hun dikarin bi hêasanî peywirên xwe pêk bînin" uslubeke min heye. Yanî di şêwaza rêxistinê de modeleke pir cewaz heye. Serdeçûyîna min a ji têkîliyan re nêzîkatiyeke pir girîng a siyasî ye. Di cewherê xwe de ez li hember dewletê dendika tevgereke pir mezin diçînim. Bi zanebûna mezinahiya xeteriyê, yekser nebe jî ji van kesan re bi hêsanî dikarim bidim hîskirin ku em ewqas xeter nînin an jî wan bixim nava xapandinekê de, ez wan bi asteke wiha pêşwazî dikim.

Ev zilam, di salên 1976'an de bi hişmendî hewl didin ku min bi dest bixin, beriya vê gavê rê neyekser têrê nekirin. Niha jî me dest bi xeterbûyînê kiriye. Pîlot gelekî xeter e, gelekî xwedî dirav e, digot, "keko ma ez koma te xwedî bikim?", "em vê çalakiyê jî bikin, wê çalakiyê jî bikin". Digot, "ezê misoger diravan peyda bikim û bînim", "ferman bide ez xwe ji xaniyekî çar qat biavêjim xwarê. Dikaribû xwe biavêje jî, ewqas egît bû. Him jî li hewayê bi avêtina teqleyan. Rojekê dihat digot, "keko min di rê de du sê polîs kuştin û qulibandin erdê". Yanî ewqas dixwast xwe weke yekî bandordar bide nîşandan. Dixwast bibêje ez milîtanekî li gor daxwaziya te me û dikarim her karî pêk bînim. Jixwe planên şêlandinê û pêşniyara wê jî anîbû. Dixwast fermana wê jî ji gel min derbixîne. Tê fêmkirin ku ew ferman berê ji polêsan girtiye. Heta dawiyê diravan dide û dixwaze hetanî dawiyê hêza xwe raber bike. Hêviya dahatuyê dide. Ya din jî Kemal Pîr dixwast di cih de vê rewşê binirxîne. Min digot, "naxêr niha ne dema çalakiyê ye". Yanî me bi Pîlot re salek an jî sal û nîv heta dawiya salên 1977'an belkî jî em bi hev re bûn.

Gelekî balkêş bû. Dixwast me zû bîne provakasyonê. Heke em weke çepgirên Tirk ên roj derbas dikirin ban, dê hîna di salên 1976'an de emê bixeniqandibana.

Sekna mezin.

Her tişt dema ji min re dihat pêşkeşkirin, min bi qandî pêwistiya xwe digirt. Çi tiştê ku me bi têne bike hebe

dixwast wê bîne. Lê min digot, "raweste". Lê min digot ê ku me xwedî bike çi hebe jî bîne.

Taktîkekî erjeng bû, me pêk anî û encam eşkere ye. Me kom bi dewletê dida xwedîkirin, zilam jî dixwast me bixwe û ji bo xwarinê hemû planên xwe amade kiribûn. Lê dîsa jî jiyaneke me ya hevsengî heye.

Em neketin.

Û jin jî xwedî vê armancê bû. Xistin, qedandin, kuştin...

Ma li gel Mahîr serpel (yuzbaşı) İlyas hebû? Ew jî serpelê yekîneyê bû. Lewra ev serpelên yekîneyan serpelên herî lêdanêr in. Tê fêmkirin ku, zilamên şerê taybet in. Wisa tên hilbijartin. Ez bawerim ên ku Mahîr ew kişandin çalakiyê ew bûn. Di kişandina çalakiyê de rola hindek tahrîkan jî heye. Heman azîne hate xwastin li ser me jî bê ceribandin. Pîlot, rojane planên çalakiyan amade dikir. Hîna tê bîra min ku, gelekî jîr bû. Lê ji ber cewaziya şêwaza min, hate fêmkirin ku em bi vê teşeyê nikarin werin rûxandin. Lê gelekî balkêş e, wê demê ji bo jina di koma me de mirov dikare çi bibêje? İhtimala bûyîna wê ya dewletê jî bilind bû, sepandina dewletê bû.

Ji ber malbatê yan jî bi taybet, aliyê wê yê têkîliya bi dewletê re gelekî xurt e. Lingê herî bingeh ê ku em pê ji Enqereyê derdikevin ev e. Yanî yan tuyê çalakiyê bikî, yan tuyê werî fetisandin. Heke tu nakevî nava çalakiyê tuyê di wê têkîliyê de bifetisî. Ji her du aliyan bi ser de hatina dewletê ya xurt heye.

Çawa çêbû ku ez ketim nava têkîliyê? Şêwazeke balkêş a ketina nav e. Dewletê ji dû baskan ve tam em girtine dorpêçiyekê. Yek jêderka hestyariyê, ya din jî jêderka madî ye. Li hember daxwaza me ya gavavêtinê dewlet dixwaze bi van her du rêkên bandorkirinê pêşiya me bigre.

Her du jî 1976'an di heman demê de dikevin nava me.

Bêguman e, di hevdem û ji aliyê dewletê ve ye. Zilam li gor derfetên wê demê kulm bi kulm diravan belav dike. Tenê min ne, koma me hemûyan dibe xwaringehê. Her yekî ku tê dibêje, "bira min jî bibin xwaringehekê, ji min re jî şîrînahiyekê bikirin." Di saya me de zikê milet têr dibe. Bi esas ev şêwazekî têkîliyê ye, ev navdar e. Ugur Mumcu jî

digot: “MÎTê Apo xwedî kir”, vaye çîroka xwadîkirinê wisa ye.

Gelo eniya jinê esas bi kîjan lîstokê dixwast me pêşwazî bike? Girîng e û divê mirov kûr li ser rawest e. Him ketina beşa civakî û him jî ya siyasî ye.

Dibe ku qelsiya min a jinê û dirav tespît kiribin? Heke lewaziya min hebe, him jin û him jî dirav, ji bo bikaranînê her tişt heye. Zilam digot, “bes tu bixwaz e”. Jinê jî hetanî dawiyê ji komê re ketina nav disepand. Ez wisa bawer dikim ku, wilfa me ferx kiribû. Ji 1974 hetanî sala 1976’an du salan şopand. Heta xwast fêm bike ku em çepeke çawa ne. Çepa Tirk an jî Kurd e? û piştre dema tercîha xwe li aliyê koma me kir, ez bawerim bi tevahî dixwast bi dest xwe bixîne. Ev bênîqaş e.

Dewleteke hatî amadekirin bû.

Xwedî amadekariya îdeolojîk û siyasal bû. Xwedî amadekariya kesayet û hêza dirav bû. Jixwe Pîlot jî digot, “bira ma tuyê li kijan malê bimînî?” Bi navê min ji beriya ku ez bibînim digot, “min malek girtiye û kelûpelên te birine wê derê.” “bira bes tu bixwaze”.

Di sala 1977’an de li mala vî zilamî (1 Çile 1977) me civîneke herî li pêş li dar xist. Zemîna ku komê li Kurdistanê ava kiriye û di asta herî jorin de pirsgirêkên dîtir dihatin nirxandin. Devê sobeya me vekirî bû. Bi serdegirtina polîs ve me dê axaftinên xwe biavêtibana wir. Heke were, em dê bibêjin, em pîrozbahiyeke erzan dikin.” Di bin zanistiya dewletê de ye. Lê, rewşeke me ya weke girtinê tune ye. Bi qandî ku em bikaribin bi kar bînin, em bi kar tînin. Piştre nirxandineke wisa ya dewletê pêk hat: “me 1978’an de şaştiyeke mezin kir”. İsmail selen fermandarê artêşa şerê taybet jî digot, “li hember PKK ê me her dem şaştî kir” ku, piştre zilam bû serokê îstixbaratê. Di taktîka PKK ê de, di pêşveçûyîna PKK ê de di destpêkê de di nava xeletiyan de bûn. Lê, wisa ji ber xwe ve ne, heke em wateya ku didin jiyanê nesepînin, dê em di ava kevçiyekî de bixeniqandibana. Destên zilam di nefesa me de ye, deqe bi deqe kontrol dike. Hezar sal in heman çîrok e. Heke kevir

biteqe jî serhildaneke ku temenê wê sê heyvan bihoriye tûne ye.

Pîlot bi israr çalakiyê disepîne û hevalên me yên herî gihiştî jî vaye Kemal Pîr ew, dibêjin em lê bidin. Ku, pêşniyariya çend çalakiyên ku dirav bîne hebûn. Yek jî wê demê ez hîna zêde negihiştibûm encama ajaniya wî. Ez dijî anîna dirav a bi çalekiyê derketim. Dîsa ji çend hevalên me yên milîtan re jî pêşniyariyên wisa dibirin. Digot, “Apo, gelekî pêwîstiya me bi te heye; tu canê me û giyana me yî”

Bi aliyê xwe yê çalakger derdikeve holê, di aliyê din de dixwast jiyana min sererast bike. “bira tuyê ji vê bi şûn ve çawa bijî?” vaye li ser senaryoya zewaca wê demê gelekî hatiye rawestîn. Li Enqereyê dê wisa were jiyîn, wisa zêr pêwîst in, cemedank pêwîste... Ew jî senaryoyek bû. Dixwast di wê senaryoyê de pir baş bilêyîze. Ji lêyîstina peywira xwe jî bawer bû. Min ev şopandin didan û piştre jî min ev yek bi zanebûn dikir. Min hîsên wê jî kontrol dikirin.

Dewletê niha fêm kiriye, lê pir dereng e, kar ji dest çû. Dîmena ku me daye; em dê li Enqereyê bimînin komgeriyê bikin, weşanekê derbixin, dukaneke weşanê saz bikin.

Dîsa jin bi têkîliya taybet ve girêdayî ye. Dewlet çi dixwaz e? Ew, rojane rapor digre: “di hembêza me de ye”. Min xwe çar bi çar bi dewletê ve girêdayî ye. Bûyera ku Ugur Mumcu hindekî dixwaze binê ser ziman jî ev e. Dipirse, “ma MÎT ê Apo xwedî kir?” Vaye me wisa xwe bi MÎT ê da xwadîkirin. Me ewlekariya xwe pê da girtin, bi diravên wan me koma xwe fînanse kir, di malên wan de me civînên xwe yên herî girîng pêk anîn û me hindekî jî hêza wan a entelektûelî bi kar anî. Em wisa dirêjî hindek têkîliyan bûn û me di heman demê de xwe jê xelas kir. Ev yek ne wisa bi carekê ve ye, bi hatina tehrîkê û weke hindek hevalên me yên rayedar bi “lêdanê” ne, me wisa nekir. Vaye di vir de , ajan be jî lêdanê li aliyekî bihêlin, çawa tê bikaranîn, hêjayî dîtinê ye. Ma tuyê lê bidî, yan jî pê re bimeşî? Ev bûyereke mezin e, pirsgirêkeke mezin e. Ne şêwazekî wisa ye ku her kes bikaribe bide meşandin.

Niha li Kurdistanê her şêwazê têkîliyê wisa ye. Sedema eşkerekirina min a vê yekê, ji vegotina wê yekê ye ku hema

bi her têkîliyên xwedî van taybetmendiyan re em rû bi rû dimînin. Ew ne senaryoya fılmeke ku me sererast kiriye, rastiyeke jiyana me ye. Di nava wê de hest hene, têkîliyên taybet hene, sosyalîzm heye û her tişt heye. Lê belê ji aliyê dîtirê de jî, tiştên cuda yên ku min kirine jî hene. Ji ya her kesî kirî, ez pir cewaztir nû bûn. Ez bihêlim dê hevalên min ên herî baş jî çalakiyê bikin. Pîlotê ku çalakî pêşniyar dikir, digot “ji ber ku ez Kurd im, ez ji Pîlotiyê hatime avêtin”. Tuyê biceribînî. Ya din jî di aliyê aborî, civakî, siyasî heta ji aliyê entelektuel ve jî kesayeteke ku divê misoger ez jê bandor bibim. Yanî hindek kes misoger vê komê bigrin bin wêneraniyê. Ez dixwazim bibêjim şer ev e. Em vê bi giştî bikin dê were çi wateyê? Çîna hevkar a di Kurdistanê de dîsa binkeya ajan çawa gel şidiyayî girêdabin û çawa ku nahêlin bêhn bigrin, di kesayeta koma me de jî girêdaneke şidyayî tê armanckirin.

Îro komên çepgirên Tirk jixwe girêdane û xelas kirine. Û komên Kurdan jî jixwe tên sîxurkirin û dixwastin me jî weke wan bikin. Di vir de yê cewaz ez im. Û rewşa ku xwe li vir xelas kiriye rewşa min e. Ez mezinahiya xwe yan jî hindekî serkeftina xwe deyndarê nêzîkatiya van şêwazên xwe me. Min bi jinê re têkîlî saz kiriye, min bi zilam re têkîlî saz kiriye, rewşa min a îdarekirinê heye. Şêwaza min a îdarekirinê serkeftina min aniye. Na heke ez ji hevalekî din re bihêlim, misoger ne jinê ne jî zilam wê bîstûçar demjimêran jî sax nehêlin. Min du sal bi van re çawa dirêj kirin, hêjayî li ser rawestînê ye. Min ev bi pisporiya têkîliyan ve girt. Yanî ez ji zilam re tiştekî wisa didim û li ser vê jî nêzîkatiyeke wisa pêşkeş dikim ku, ew jî dibêje, “vaye me girt”

Ev taybetmendiyeke min a balkêş e. Zarokek jî dihizire ku dê min kontrol bike û heta difikire ku min bi kar bîne. Ev pirsgirêkeke mezin a nermbûyînê ye. Temam tu dikarî min kar bînî, ev yek mafê te ye. Lê şêwaza min a xwe ferzkirinê û şêwaza min a têkîliyê heye. Kî dê kê bi kar bîne? Lewra armanca min, ezmûna min û şêwaza min heye. Dijberên min jî xwedî van tiştan in.

Di nava PKK ê de ewqas provakatîf derketin, ên ku xwedî îdiaya “ha PKK qediya, ha em diqedînin” hebûn. Lê hatin xapandin. Hetanî niha li hundir û derve bi dehan ên ku dixwazin min bi kar bînin hene. Ma kî naxwaze min bi kar neyne? Him di bin navê dildariyê de, bi navê biratî û navê dostaniyê de!.. Encam di dahûrînên min ên dawiyê de encamên balkêş hatine derxistin. Dibe ku ji aliyê derûnî ve em bidin şidyabûnekê de hatibin girtin. Dibe ku di têkîliyên jin û zilam de bi şêweyeke ku bi çi aliyan ve nayê jiyîn û sebr nayê kirin, bi statuyeke mezin a sebrê me jiyan kir. Lê di Kurdistanê de me şêwaza têkîliyeke ku divê misoger jê sûd were girtin, me eşkere kir û yan jî pêvajoyeke ku diviya pê re were derbaskirin, me têperand.

Ji bo Kurdan bi şêweyeke din derçûn dikare çêbibe?

Li gor min bêderfet e. Bi şêweyeke din kom ji Enqerê derxistin ne gengaz e. Ev yek bi peyitînan ve diyar e. Di vê wateyê de li gor min du caran serkeftin çêdibe. Tenê ne di dîroka heftêsaliya komarê de, di dîroka osmaniyan heta di ya selçukiyan de jî, cara yekem ev lîstok bi vî rengî berovajî tê wergerandin. Tenê ne kom, di aliyê civakî de jî, bi serokatiya kedkaran ve tê rizgarkirin. Ev jî bûyereke wisa ketûber nîne. Ji aliyê azadiya jinê ve jî rizgarbûneke mezin heye. Di wateya misoger de derbaskirina têkîliya ku azadiya jinê difetisîne û azadiya têkîliyên jin û zilam de bi rengekî pir xeter berovajî dike û jinê û zilam ji tunekirinê tu caran xwe nade paş. Di vir de têperîna vê nêzîkatiyê jî heye.

Min zivistana ku sala 1975’an bi 1976’an ve dide girêdan bi nivisandina yekemîn tomara niviskî ya vê tevgerê ve derbas kiribû. Hîna tê bîra min, li Enqereyê di malekê de jî ez wisa axivîbûm. Mehmet xeyrî durmuş dinivîsand, manîfestoya me ya yekemîn e. Heke ku derbasî destên we bibe, hun jî dê bibînin ku, ka çiqasî berfireh e. Wê zivistanê vaye me destpêkeke wisa kir.

Kombûyîna me ya li Enqereyê 1976 û piştî wê jî di salên 1977’an de li Kurdistanê hatibû reşandin. 1971 di civîna 1 çilê de, hêjayî gotinêyê ku guftugoyên herî berfireh û ji bo hindek peywiran jî hîna zêdetir zelal bûyîn bi xwe re anî. Weke ku tê zanîn sala 1977’an di dîroka tekoşîna me de

saleke pir girîng a biryarê ye. Di vê salê de min bi biharê re qasî du mehan gereke min a Kurdistanê ku, Agirî, Qers, Elezîz, Dêrsim, Amed, Riha û Dîlokê digre nava xwe hebû. Min piştî vê gerê, digot heke di xeteriyan de mirin jî hebe zêde wateyê îfade nake. Wê demê bi rastî dewletê jî çavdêriya min dikir û qetla Hakî Karer jî bi teşeyê xwe ferz kiribû.

...

Dêrsim

Di gera min a Kurdistanê de dema ku ez çûm Dêrsimê ji nişka ve giyana min tijî peroşmendî û hewayeke romansî bû. Min piştî wê dipirsiya û digot ev mirov çima ewqas qels in. Min digot ev welatê ewqas romansî çawa berdidin û direvin û ez lê dihêriyam. Him keç û him jî lawên wan di hewayeke romansî de bûn, lê çiqasî piç piçî bûn û kirêt bûn.

Li Dêrsimê mirov kî ye?

Çawa ket û çawa dikare rabe?

Ev pirsên min bûn. Min wisa lê dinêrî û gelekî jî bala min dikişand. Piştî sedsalan hindek taybetmendiyên mirovî dîsa qedîna pergalê û hetanî niha Dêrsim wê bernade.

Dêrsim çi ye? kî ye?

Karesat.

Divê mirov çawa nêzî vî welatî bibe? Hetanî duh rabirduyeke vî welatî ya nû hebû. Hîna yên ku hetanî duh dijiyan, nedişipiyan ên îro. Û ev ên ku dibêjin “naxêr” derewkerên mezin in. Bêyî ku ev derewkerên mezin werin dîtin Dêrsim nikare were fêmkirin. Şervan neçarin ku di rewşeke ne pir hestyar de bin û ji ber hestyariyên xwe divê nekevin.

Sefera Kurdistanê di Gulana sala 1977’an de bû. Min vegot, civîna Karakoçanê ya yekê Gulanê... Civîna me ya Dêrsimê di taxa çiya de li jêrzemîna maleke sê qat pêk anî. Wê demê hesen kuş ê ciwan ê ku ji me re rêbertî dikir, di dawiya salên 1977’an de di zivistana sala 1978’an de şehîd bû.

Herêma heyderan, em sê-çar caran derketin qada bi navê qutuderesî yê. Di wê navberê de me xwast em peywir bidin bêyomê Kamer ozkan jî. Sabote kir, ajan bû. Dikarî bibe

kontrayekî ku dewletê li herêma heyderan bi cih kiribû. Lê yekî pisporane bû. Derveyî wî jî Seyfî cengîz hebû, lîstoka wî di Enqereyê de lêyîstî, kamer ozkan di şênberiya Dêrsimê de dilêyîst. Projeya me ya gerîla ya girêdayî Dêrsimê, him bi kar neanî û him jî xwe da girêdan. Em çûn mala wî ya li herêma heyderanê. Me bername, bernameya partiyê nivîsand. Piştî wê jî me got gerîlagerî çawa dikare were kirin û xwast hindek derfetan bi wir ve girê bidin. Lê belê pir zirav bû, kesê ku İbrahîm kaypakkaya vala derxistî jî ew bû.

Di bihara sala 1978'an de li elezîzê civîn çêbû. Ez çûbûm mala aytekîn. Aytekîn hevalekî xwedî nirx û hêjayê fêmkirinê bû û weke heyî mala xwe ji me re vekirî bû. Derveyî wê maleke me yê du qat hebû. Em çend hefteyan li wê derê man. Pirsgirêka me ya bingehîn îdarekirina rêxistinê bû. Di elezîzê de cur be cur komîte hatibûn sazkirin. Emê weke partî îlan bikin, an jî weke rêxistineke ciwanan îlan bikin? Wê demê guftugoya vê hebû. Sala 1978'an saleke pir girîng bû. Em diketin nav pêvajoyeke nû. Ez derbasî Amedê dibim û ji wir jî derketim Enqereyê.

Di mijdara sala 1978'an de îlana partiyê pêk hat.

Di sala 1979'an de şahîn hatibû girtin. Apartmana ku ez bi şahîn re lê rûdiniştim, bi ser de hatibû girtin. Vê bi ser ve girtinê rê li pêşiya zû şiyarbûyîna me vekir. Ji ber ku jihêvçûyîna şahîn em berbi 20ê Gulanê fêr bûn. Biryara derketina derveyî welat li ser vê bingehê min da. Heke ew rewşa girtinê pêk nehatiba, me dê biryara derketina derve wisa nedaba. Ez bawer dikim girtina şahîn bêxebera ewlekariya Enqereyê bû. Girtineke bi destên ewlekarên elezîzê ve bû. Şahîn an pir tolaz, karîyerîst an jî kesekî girêdayî dewletê bû. Lê belê ji bo ku benê rêxistinê bigre destên xwe pir hewl da. Heta ku piştî min kesêkî xwe ji bo serokatiya rêxistinê amade dikir. Her weke kamer ozkan. Dibe ew ji bo ku di hundir de PKK ê bi dest bixe kesekî xwedî amadekarî bû. Ji ber ku min di semîr de jî ev dît. Piştî ketina me ya qada Dêrsimê bi şûn ve bûyera kiymet heye. Malbeteke wê ya xwedî têkîliyên bi dewletê re heye. Binkeya Dêrsimê girêdayî malbata xwe kiribû. Ya balkêş ew e, 26 heval kiribûn destgirtî. Bi plan û zanebûn bû. Komên

hêzên taybet gelekî birêxistin bûn. Kamer di çiyan de, kiymet jî di navenda bajar de û bi ihtimaleke mezin şahîn jî di hundirê me de. Dîsa semîr dikeve dewrê. Fatme jixwe li Enqerê ketiye nava me. Her weke ku ji çar aliyan ve em hatine dorpêçkirin.

Em li gor nêrînên derve hatin bi destgirtin û hatin nirxandin. Misoger hêvî dikirin ku bi vê taktîkê hîna di salên 1980'an heta di salên 1978'an de me ji hev belav bikin. Ez bawer dikim ku di wê demê de wilfa dewlet û MÎTê (ku dê piştre baştir were fêmkirin) ya bingehîn ev bû. Di bizavên Pîlot de ev yek pêtir şênber bû.

Çîrok cewaz e, rastiya tekoşîna me ye ku, erênî û neyênî bi kirûyên wan daye peyitandin. Dê li Dêrsimê jî jin pir çalak beşdar bibe, beşdar bû. Wê hîna pêştir bikevin, ez dizanim. Ya girîng em jî wisa ne. Vaye, Fuat hevalekî me yê ji Dêrsimê ye. Me xwe bi hemû aliyan ve derxiste holê. Divê hun bikaribin fêm bikin.

Em naxwazin tiştên di xeyalên we de xirab bikin, lê rêzdariya li hember rastiyê jî esas e.

Azweriyên me hene, daxwaziyên me hene, dilxwaziyên me hene. Çawaniya girêdana bi me ve, me di şênberiya Dêrsimê de raber kir. Yanî azweriyên wisa, dilxwaziyên wisa, weke yên din di serhildanên berê de hatine çewisandin, weke azwerî û dilxwaziyên bi xwîn û tevkujiyan ve hatibûn çewisandin.... Belkî jî wateyeke wê hebû. Lê niha wisa revîna berbi pergalê ve, revîna li dûv dilxwaziyên takekesî, ji dîroka mirovatiyê re çiqas înkar e, çiqas xirabî ye.... Bêyî ku ez vê yekê fêm bikim, ez dê çawa ji wî re bibêjim mirov, ez dê çawa wî bipejirînim. Vaye bi dîtina vê yekê ve, ez jî xwedî îdealeke Dêrsimê bûm.

Mesela yê ku îro rê li pêşiya tevgerbûna Dêrsimê vekir û bi hemû Tirkiye yê, heta bi cîhanê da berhemêzkirin, ev pêşveçûyîn bû. Ev îdeal, azwerî û bi ser de çûyîna min e. Heke li bi ya gelekan bûya ne gengaz bû, we hemûyan dikir pitepit. Lê vaye dibin pergala misoger a desthilatdariyê de hun dê bihêliyana û biçûbana. Ev mekanîzmayek e. Ez hema di her cihekî de mekanîzmayeke wisa bi cih dikim. Van bi hemûyan bihizirin û fêm bikin ezê çawa ji bin van

derbikevin. Dibe ku ev we hindekî kûr bide hizirandin û hun jiyana mirovî wenda nekin. Hun dê girîngiya hevaltiya bi me re fêm bikin. Heke hebe dilê we û wijdana we, dema ku hun pêdîviya nemirina hêsanî jî bipejirînin, pêdîviyên xebata serkeftî jî hunê bihizirin. Pêdîviyên xebatên serkeftî dê we rojane bibe berbi çalaktî û misoger bi ser de çûyîna xebatê. Ev jî, ji şêwazên serkeftî yên xebatê re, dê rê vebike. Bûyera ku ez jê re dibêjim hevgirtî û girêdan jî hindekî ev e.

...

Dema ku Hakî şehîd bû, em ji Enqereyê ketibûn rê, dema ku ji Enqereyê dihatin, di otobusê de bi rastî jî cîhana me hatibû reşkirin, emê ji vir û pê ve çi bikin? Esas rewş baş pêş diket. Piştî gera me ya du mehan li Kurdistanê û bi şûn ve me ev raman bi dest xistibû. Esas dê Kurdistan bibûya warê tovreşîna îdeolojîk û me digot ji vir û şûn de li her quncikekî Kurdistanê yê ku şîn bibe wê dîroka me bide diyarkirin. Ez gelekî bi xwe bawer bûm. Bi taybet jî piştî me bi Hakî wan re civîna dawî ya li dîlokê (ku nêzî 80 kes beşdar bibû) me bi ser xist şûn ve ev kar êdî gihiyabû bingeheke zexm. Tam dusê roj bi ser ve neçûn, nûçeya şehadeta Hakî hat.

Ev bûyer tenê ne kuştina kesekî bû, esas berfireh bû.

Beşparçaciyên (pêncparçeger) ku bûyer pêk anîbûn jî qaşo Kurdistanî bûn, lê tu têkiliya wan bi vê rastiyê re nebû. Ew zilamê bi navê eledîn min nas dikir û min behsa wî kiribû. Yekî gelekî tolaz bû, rojekê hatibû Enqereyê. Potîn û bi ser de jî qabût li xwe kiribû, te digot qey niha ji çiyê dadikeve. Zilamekî xwedî şarezayiya lihevkomkirina girse nebû, hat zanista siyasî. Dost û heval jî hebûn. Planên şêlandinê pêş dixistin. Di ODTU (zanîngeha teknîkî ya rojhilatanavîn) yê de qaşo dê ciwanên şoreşgêr ên xwendekariya bilind a Enqereyê rêxistin bikira. Wisa hetanî dawiyê bi şêwazên provakatîf dixwast serdest be, bigre û bi dest bixe. Bûyerên wisa pêk anîn. Tu têkîliya wî bi Kurdistanê re tûnebû. Çû, bi carekê ve bû Kurdistanîvan û Bêşparçaci (pêncparçeger). Tolaz, beredayî û bi rastî jî diz bû. Her li dîlokê li vir li wir banqe dişêlandin. Bi vê teşeyê qaşo jiyana partiya xwe pêş ve dixist. Bêehlax bû, qereçî bû. Çû bûyera kuştina Hakî pêk anî. Lê pir vekiribû ku, her çiqas

wisa be jî, misoger bi dewletê re têkildar bû. Bi netewperestiya seretayî re jî têkîldar bû. Bi kêmanî dizanibû ku dê were lêdan. Ji ber ku ev xala wî ya herî qels bû.

Erê, ev bûyera Hakî ya ku wî pêk anîbû em gelekî êşandibûn. Lê, rêka me hindekî hatibû ronîkirin. Hakî di komê de xwedî pratîkeke serkeftî bû. Bi lez berbi dawiyê ve çûyîn çêdibû.

Em dê bibin partî.

Em hatibûn dawiya qonaxeke pir girîng. Di heman demê de em di qonaxa destpêkirineke nû de bûn. Baweriya me gelekî bi me hatibû. Me ev pêngava dîrokî çêdikir. Weke ku min got kuştin û bêbextî derkete holê.

Kemal Pîr tê bîra min, wê demê wiha digot, “bi kadroyên me yên heyî ve em herin, bi polîs re bikevin şerekî dijwar.” Hindekî jî hestyarî hebû. Piştre me dît ne raste û me dev jê berda. Yanî vê bûyerê dê hemû hebûna partiyê bikişandiba nava xwepêşandaneke dijwar. Di aliyê lez li ser rawestîna êşê de jî helwest hebû. Em bi ser vê rewşê ve nediçûn. Me got, girêdana bi bîranîna şehîdan re ne hêsan e. Dixwastin me bihejînin û rêka me reş bikin. Gava ku pêwîste were avêtin eşkere ye. Divê gava ku hatiye avêtin em bidomînin.

Dîsa avakirina derbeya 3 Hezîranê li dûv vê yekê hat. Ev derbeya namik kemal ersun bû û pêtir jî armanc tasviyekirina me bû. Wê demê jî rêjîmê bêhna xeterbûna me girtiye û bi çend kuştinan, girtinan û pêwîst be bi derbeyekê tasfiyeya me armanc hatibû girtin. Jixwe derbeya ersun bi Turkeş ve girêdayî bû. Derbeyeke faşîst bû û serlêdaneke bi giraniya kontr gerîla bû.

Ji beriya ku em derbasî hûrekûra wê û pêvajoya piştê bibin, eşkere kirina pêvoya ku bi lêdana Hakî ve bi dawî bû girîng e.

Hemû kesên ku di pevçûyînên talabanî û berzanî de şehît ketin hemû welatperwer bûn û ji gelê xizan bûn. Her wiha klîka feodal an jî rêbertiya feodal; bi tevahî ji bo berjewendiyên malbatê, axatiya feodal û serdestiya berjewendiyên eşîrê şer didin meşandin. Çi têkîliya wan bi rizgariya netewî û kedkaran re nîne. Ne ji bo rizgariya netewî, ne ji bo damezrîna demokratîk tu hewlên wan nebûn

û niha jî nînin. Bi tevahî him di nava xwe de, him jî di nava refên din de bi her şêwaza komplogeriyê dixwastin her awayê welatparêziyê bifetisînin. Çil sal in vê yekê dikin. Ji berê û pê ve dîroka Kurdistanê wisa ye. Dema em nû derketin holê, temsîlkarê van ê Enqereyê di sala 1975’an de ez vexwendim mala xwe. Ez çûm, di şertên Enqereyê de xweş dijiyan. Gotibû, “wisa bi çeka çînayetiyê ve ketina we ya Kurdistanê tê wateya hatina rewşa we ya xeter”. Heta ev gotin jî kiribû, “weke şurê demokles ê li ser Kurdistanê ne”. Wê demê min refên nîjadperestiya wan nepejirandibû. Me hîna gaveke biçuk avêtibû û vî zilamî digot hun şurê demokles in.

Lê, di salên paş de şer ev rastî piştrast kir. Bi rastî jî em him xwedî amadekarî ne, him jî bi bihaye mirinê be jî xwe ji dayîna axaftina serokê xwe, xwe nadin paş û heke pêwîst bike ji kuştinê jî xwe nadin paş.

Weke ku di mînaka KUK (rizgargerên netewa Kurd) ê de tê dîtin, li Mêrdînê bi kêmanî nêzî 75 sempatîzan û şoreşger qetilkirin. Ji bo paroleya wan wisa, “em ji Mêrdînê wêdetir bernadin”. Hetanî 1980’an ev yek dan meşandin û pişta wê jî baş tê zanîn. Qaşo digotin PDK ya Tirkiyê. Welatparêzî pir bi şêwazeke xirab didan bikaranîn.

Û bi rastî jî wê demê peywireke ku MÎT ê dabû pêşiya wan hebû. Di 1972 ev bi xwe bangî zilamê bi navê dêrwêşê sado dikin û dibêjin, “tuyê biçî bi Tirkiyê re têkîliyên me pêş bixî”. Piştî ku van her du seît bi komployan bi hev dan kuştin, wisa diaxivin: “tuyê herî li Tirkiyê temsilxaneya me vêbikî. Û peywira te jî, tûyê tenê bi misteşarê Amedê (ku rayedarê Kurdistanê ye) re têkîliyê saz bikî.” Esas ew têkîlî pêş dikeve.

Weke ku tê zanîn, vê yekê di 1975’an de reng da me. Milek ava kiribûn. Ev Stêrka Sor bû û me weke Beşparçacilar bi nav dikir. Digotin “Sovyet emperyalîstên civakî ne”. Esas ev dirêjahiya CIA û MÎT ê bû û ji PDK yê hêz digirt. Çalakiya van a yekem bi komplo şehîd xistina Hakî bû. Temsîlkarê wan ê wê demê digot, “me wisa ji PKK ê tol wergirt”.

Û di demeke ku em qet ne amade de, me Hakî wenda kir.

Sûda me jê ev bû: girêdana me ya hevgirtî ya bi Hakî re, hişt ku em şerê çînayetiyê baş bidin meşandin.

Stêrka sor kî ye? Beşparçacî kî ye?

Ev bi rastî jî xwe dispêrin neteweperestiyê, PDKê û ji wan hêz digirtin. Li cihên weke dîlok û edeneyê ku PKK tê de vebibû xwe bi cih kiribûn û digotin, “werin em nîqaş bikin”, her car ji bo me nûçe dişandin. Di nava rengê nîqaşê de bûyer weke qeza nîşan dan. Ne qeza bû, pêşçûyînê jî ev yek piştrast dikir. Lê em bêyî amade bûn çima? Ew dihizirin ku di nîqaşê de tiştek nabe.

Şehadeta Hakî bi me gelekî zehmet hat. Jiyandina bîranîna hakî, bi tasviyekirina vê ajan provakasyonê ve gengaz bû. Berovajiyê vê pêşvebirina komê gengaz nebû. Bi mehan em bi tasfiye kirina ve rêxistina ajan provakasyon ve mijûl bûn. Wê demê çekên me jî tunebûn. Û gelekî em bi xwe re mijûl kirin. Ên tên bîra wan dizanin, gelekî jî xeterbûn. Bi rastî piştre jî baş hate fêmkirin ku, te têkîliya wan bi rizgariya netewî re nîne. Kesên tolaz bûn û bi diravan hatibûn girtin. Me hindek ceza kirin, ên man jî piştre ev rewşa wan piştrast kir. Bi planbû, wendakirin jî, wendakirina bêyî amadebûyîna me bû. Lê sûda wê jî wisa çêbû: encax bi baş fêmkirina hêza dijber û bi ser de çûyîna wan ve, pêşvexistina rêxistin û çalakiyê re jiyandina bîranîna Hakî gengaz e. Yanî qelsbûn ne, berovajiyê vê tolhildan û li hember ferasetên hêzên xwedî daxwaziya fetisandina me, hişyar bûn pêş ket. Lê bi ser de çûyîna me wisa bi feraseteke stur, “yê li me bide em jî dê li wan bidin, ev kar diqede” nebû.

Bi taybet bergeha van a cîhanê çi bû? Beşparçaci kî bû, çi bû? Me lêkolîn kir, lêpirsîn kir. Wê demê me dît ku ev amrazeke ku nîjadperest dixwazin pê vê pêşiya me bigrin. Armanca wan ew bû: PKK bi çepgiriyê ve tê. Em jî çepgir in, lê em çepgirên pêncparçeyan in. Piştre vediguhere KUK ê, KUK hindekî din belav dibe.

Di encam de pevçûn hilperîn. Li Mêrdînê ku me tê de tekoşîn pêş ve dibir, van di kuştina bi dehan welatparêz de rol lêyîstin. Wê demê UDG (hêzên demokratîk ên netewî) hebû, qaşo li dijî PKK ê hezeke pir navdar a lêdanê bû.

Demirel jî navê vê rêxistinê kiribû devê xwe û wisa nirxandibû, “li dij PKK ê bikaranîna me ya van gelekî xeter e, bi hêzên wisa ve derketina pêşberî PKK ê li gor giraniya dewletê nîne.” Ev nirxandin di destpêka sala 1980 de kiribû. Lê, van gelekî wendahî dan. Rabûn û pêşveçûyîneke mezin hebû. Li Mêrdînê gelekî wendahî dan, ku van li wê derê derbekirina pêşveçûyîna welatpareziyê armanc dikirin. Bi xebatên pir alî me bi zehmetî ev nabos da rawestandin. Bi pêşkeşkirina sedan kadro, milîtan û derfetan ve, me xwast em hindekî welatparêziya li Mêrdînê zindî bigrin. Tasfiyekirina van, piştî şerekî wergirî ya çînayetiyê ve gengaz bû.

Tekoşîn jî, versiyoneke cewaz a vê ajan provakasyonê bû. Dema provakasyona ku beşparçaciyan li ser sepand pêk nehat, vê carê kliga tekoşînê hate sepand. Piştî qetilkirina Hakî beşparçacecî hatine teşhîrkirin, ji ber vê yekê ketibûn rewşekê ku êdî nikaribûm tu karî bikin. Di bûyera Hakî de milekî wan jî xwe disparte mehmet uzunê nava me. Di birina Hakî ya cihê bûyerê de ew bi xwe jî hebû. Piştre wî bi tekoşînê re dest bi xebatê kiribû. Hakî, wê demê berpirsyarê me yê dîlokê bû. Û hevalê me yê milîtanê herî baş bû. Gelekî rêxistinêr û çalakîger bû. Yek jî, em di serdema herî bêyî derfetiya xwe de bûn. Hakî, bi hemaltiyê hindek dirav bi dest dixistin. Pêdîviyên koma perwerdeyê ya ji 20-30 kesî wisa pêk dianîn. Rojekê em çûn mala wî, gelekî cemidî û weke qerîsokê bû. Maleke beton a nû bû. Me bi zeytûn û çayê ve zikê xwe têr kir. Pir zehmet tê bîran. Kombûyîniya Hakî ya li dîlokê, bi tevahî bi diravên ku ji rêka hemaltiyê hatibûn bi dest xistin çêbibû. Hakî bi wan ciwanan re kombûyîn wisa pêk anî û çend çalakî jî kirin. Li yek du tiştan dabûn, li dîlokê rêbertiyeke baş dikir. Piştre hindek sabotaj kirin. Di nava PKKê de bi şêwazên xwe çalakiyên destpêkêne ev. Û xebateke wisa ya milîtaniyê di şênberiya dîlokê de gelekî pêş ve bir.

Wê demê MÎT jixwe di zanebûna vê yekê de ye. Hakî di encama van de hate armanc girtin û armanckirina wî gelekî bi zanebûn bû. Sedema ketina beşparçaciyan a nava rêxistina me ya dîlokê, weke temsîlkarê herî milîtan ê PKK biryara

rawestandina Hakî ye. Li gel gihiştina serkeftinê, tekoşînê xwast berhemê rabike. Digotin, “rêbertî çû, mîrat ma ji me re.” Dîsa digotin, “heke afirandêrên rast ên PKK ê werin îmhakirin, ên din jî dê bitirsin û dûr bikevin.” Jixwe piştî şêhît ketina hakî, gelek kesên ku reviyan, pir em mijûl kirin. Çend cih jî, tekoşînê girtin. Û zerara ku dan jî ewqas kêm nebû.

Wê demê tê bîra min; piştî Hakî hate lêdan, ez çûm dîlokê. Min armanc dikir ku ez vê hizbê bixwe tasfiye bikim. Di nav de nêzî 17 hevalan hebûn. Li gor xwe beşeke girîng bi dest xistibûn. Di nava van de gelek hevalên şidyayî û durist jî hebûn. Piştre hindekan di girtîgehê de cezayê îdamê jî girtin. Wê demê ez çûm û me ew ji nû ve bidest xistin. Lê weke vac ji bo berdana PKK a bi hev hawirdoreke gelekî gumanbar afirandibûn. Armanc dikirin, bikin du beş û bere hev din. Dîsa bi qandî ku tê bîra min me di malekê de bi 17-18 kesan re civînek li dar xist. Wê demê kesekî ku piştre hate lêdan hebû, navê ehmed bû, nizanim baş nayê bîra min. Dema em rûniştibûn qaşo ew dixebite. Dema ji bin wêneraniya me dûr dikeve ev hizib dixwaze bi nermî karê xwe bi rêve bibe. Piştre hindek hevalên ku provakatorê bakî ew dixistin nava xeteriyên mezin jî mijara gotinê bûn. Bakî zana ye û provakatoriya xwe di wilfa malbatgeriyê de pêş dixîne. Ew e, alî çetîner e, piştre kesê ku di doza Elmanya da heval îxbar kirin Cehfer e (ku xwedî 400 rûpel îtîrafname ye û bi qandî şahîn xwedî îtîrafa ne), ev du PKK yiyên ku li dij hev şer dikin armanc dikin. Di nava yekî de tekoşîn heye. Wê demê tekoşîn hîna fermî ne hatiye îlankirin, lê ji bin ve xebatên wê hene.

Me bi beşeke girîng provakasyon vala derxist. Heke li gor ev prokavatorên dîtirê ba, diviya ku me li hev daba. Digotin, “biryare, divê em wan berî hev bidin û bila ew bi xwe bi hev bikevin” me pêşiya vê yekê girt. Mesela di navbeyna kesên ku hatine armanckirinê de berxwedanêrên mezin derketin. Ji wan yek hevalekî bi navê mahmut e, piştre hate girtin û niha hîna di girtîgehê de ye û îdam girtiye. Ew tam li me kiribûn dijmin. Ez bawerim piştre li zîndanê bi navê PKK ê berxwedan raber kir. Tam kiribûn

dijmin û fedayî ew bû. Wê demê me ew qezenc kirin û piştre tevî ku tekoşînê xebatên xwe domandin nekarî bi bandor bibe. Rêxistineke provakator bû. Û mezinê wan kesekî bi navê seyfî cengîz bû, niha li swêdê ye.

Nêrîna tekoşînê ya mêtîngeriyê, weke ya me bû. Dihate zanîn ku li pişta wan yekî ji çepgirên Tirkiyê heye, ev yek ji wî çavkaniya xwe digre. Dema van nîjadperestan beşparçaci derdixistin holê, hawirdora ku jê re rizgarî dihate gotin jî ev derdixistin. Ku, van xwe pê xweş dikirin. Ez bawerim dewlet jî van dişopîne, yanî dixwaze bi komeke çepgirên Tirk ên xwedî rûpoşa çepgiriyê, yan jî bila bi nîjadperestên seretayî ve be, hewl didan ku bi rêka van, kombûyîna PKK a wê demê ji holê rabikin. Vî zilamî (seyfî cengîz) piştre hindek teoriyên cewaz derxistin. “Zaza netewek in.” Dîsa di ew meseleyên elevîstanê de jî ew hebû. Dixwast antî-PKK’ geriyê rêxistin bike. Esas xwedî bingeke mezin e. Di nav Dêrsimiyên ku koçberbûne de dixebitin. Tevî ku di nava Kurdistanê de xwedî tu hewl nînin, bi rastî jî kesekî bêkêr e. Weke nîjadperestiyê, 1975’an de ew gotin gotibû: “bi tezên mêtîngeriyê ve çûyîna ser Kurdistanê karê CİA yê ye.” Heke rojekê hate dîtin ( ku piştre teza mêtîngeriyê ji min zêdetir parast) mirov dikare bipirse, “te ev gotin got an jî negot?” Tiştê ku ez dixwazim bibêjim, nêrînên tekoşînê jî wî dida meşandin.

Alatînekî din jî hebû. Ji ber qetla Hakî hate cezakirin. Tu têkîliyên wan bi Kurdistanê re tunebû û dikarîn di heman rojê de her nêrînê biguherin. Pratîka tekoşînê tevî ku rê li pêşiya hindek wendahiyan vekir, demeke dirêj em bi xwe re mijûl kirin. Hîna jî sedema qelsiya me ya li dîlokê û dervemayîna gelek hevalên ji tekoşînê re, vê tevgerê rê li ber vekir. Di bêbandor hiştina neh deh endaman de van rol lêyîst.

Dema em hatin 1975’an, bi du seriyeke tekoşînê ya xeter re rûbirû mabûn û min dixwast ez komê bidim birêvebirin. Di navenda dewletê de û hetanî 1977’an wisa pêş ve hatina me gelekî girîng bû û vaye xwastin 1977’an de derbeyê li me bixin. Ji ber ku wergiriya me gelekî biçûk bû, xeterî jî gelekî mezin bû, ku bi gotina wan, “mar hîna bostek bû”. Heta li

gor min hîna bostek jî tune bû, nû ji hêkê derketibû. Li gor wan pêwîstiya lê mêzandinê jî nake. Bêguman ne em ew bixwe mar in.

Piştî vê di 3 hezîran 1977’an de derbeya namik kemal ersun heye. Fermana mirina me hîna wê demê hatibû dayîn. Sedema negihiştina armanca wê derbeyê (ku derbeyeke bêaman li dûv me, ya Turkeş e), ez bawerim ji ber destnedayîna derfeta hevsengên çînî ya nava Tirkiyê bû.

Sibeha 3 Hezîranê Mustafa Karasu hatibû girtin, him jî tevî Kemal Pîr. Neçûyîna min a wê malê û negirtina min rewşeke lêhatî bû. Karasu dizane, di 5 hezîranê de dê hilbijartin çêbûna û dê van hilbijartin nedabana çêkirinê. Li ser Ecevît jî suîkast çêkiribûn. Jixwe ji wê û şûn ve xistin bin fermana şerê taybet. Ez bawerim bi şêwazeke cuda, em jî dê hatibana îmhakirin. Çekên qirêj ew zilamê bi navê Pîlot danabû gel me, ev yek eşkere bû. Tawana van çekan bi kêmanî sî sal bûn.

Em di nîva 1977’an de ne. Heke ez dê li Enqereyê bimînim divê ez dibistanê biqedînim. Weke komên din ên çepgir, çepgiriyê bike, kovara xwe derbixe, lê li Enqereyê bimîne... vayê amadekarî ji bo vê yekê ye. “tolazê xwedê tu hîna çi dixwazî”. Heke tu bibêjî jin, vaye jin, heke tu bibêjî dirav vaye dirav! Heke tu bibêjî apartman vaye apartman bigre; bixwe û di hundir de biraze! Ez jî di vê xalê de tam weke kurê paşeyan tevdigerim. Zêdetir dirav! Xwe pêtir bidin kar! Pir balkêş e, lihevanîn girîng e. Bûrjuvaziyê çawa didim kar? Piştre tiştê ku serê Ugur Mumcu bir, vaye ev şêwaza têkîliyê ye. Di salên 1976, 1977 û 1978’an de ez wan, dewletê didim bi karanîn û tevger dimeşe.

Û tam şêwazeke rastgiriyê heye.

Divê mirov li hember rastiyan rêzdar be. Rastiya siyasî û rastiya civakî çi ye?

Ez van tevan wisa bi şêwazeke entrîka û lêyîstokvaniyê ve nakim. Hetanî dawiyê durist im. Heta ez ji Pîlot û vê jinê jî bawer dikim. Lê, pirsa “gelo” jî dipirsim. Dibe ku ajan derbikevin? İhtimalek e. Li gor wê jî emê dest werdin.

Em li Enqerê ne. Salên 1976-77-78’an heke em bi van nedin spartin, gelo em dikarin derçûyîna rast bikin? Ev

hindekî jî dişipe planên me yên qedandina SHP (partiya gelê sosyal) yê, ku niha termê SHP yê maye. Derbeyeke me ya siyasî li dijî kurê Înonû bû û di bingeh de me ev yek li dijî CHP (partiya komara gel) yê kir. Ev di 1976 û 77'an de alîgirên CHP yê ne. Him rewşenbîr û him jî kemalîst in.

Pîlot jî wisa dihiziriya û piştî ku ez wendakirim bi şûn ve xwe li erdê dide, diteqe. Dibêje, "çawa ji destên me filitiya?" dihate gotin "dîn bûye" Dibêje, "li kû ye?" û li dora xwe digevize. Belkî ferman girtibe, dema ku piştî Amedê ez wenda kirim, hetanî gundê me jî çûye. Piştre mir an jî hate kuştin, ez bawerim ji ber bêserkeftina wî bû.

Jin jî pir balkêş bû. Têkîliya me têkîliya çi bû? Divê mirov çawa bi nav bike?

Pir vekiriye ku têkîliya şer e.

Têkîliyeke civakî û siyasî ye.

Têkîliyeke yekbûnê, dorpêçiyeke weke mertal e.

Di vê xalê de divê mirov hindekî asta Tirkiyê pêş çav bigre. Piştre di çileya 1978'an de Ecevît tê ser desthilatdariyê. Çileya 1978'an girîng e. Piştre di vê astê de ketina evqas Tirk a nava şerê taybet ne rast hatin e. Me bi wê aliyê nirxand. Wateyeke lîstokê ew e: esas şerê taybet dixwaze Ecevît bike alîkarê xwe. Lê ji ber çepgirê navîn e, bi tevahî dikeve nav. Dema hindekî gotinên kontr- gerîla ji devê xwe derdixe wê demê bi sûîkastê ve tê bêdengkirin. Lê, li gor min tam radest nebûye. Ya rast kevneşopiyeke ku têyî zanîn heye. Şerê taybet wê demê, yanî piştî 1960'an bi şûn ve ji aliyê Turkeş ve hatiye kontrolkirin. Rewşa Înonû hindekî cewaztir e. Ev di nava dewletê de du wilf in. Kevneşopiya Turkeş, Amerîkanî û Turanî ye. Amerîka jî xwedî wilfa turaniyê ye û Turkeş jî yek ji vê wilfê ye. Her wiha di nava daîreya şerê taybet de bandor di destên Turkeş de ye. Ecevît jî ji hevkarên înonu ye. Ew CHP ya klasîk a ku tê zanîn, aliyê giran ê artêşê ye jî. Ev yek hîna jî didome.

Beşa artêşê ya derveyî daîreya şerê taybet hindekî Ecevît bi rê ve dibe. Her wiha Pîlot bi şerê taybet ve girêdayî bû. Malbata fatmeyê jî girêdayî CHP yê ye. Bi rastî jî şerê taybet hema dixwast derbeyê dane. CHP ê jî, hema weke DEP (partiya demokrasiyê) a niha dixwast me bi kar bîne û wisa

encam bigre. Dixwast min jî bi kar bîne û di nava xwe de bihelîne. Weke taktîk şêwaza xwe ji ya şerê taybet cewaztir bû.

Heke bal bê kişandin, me di navbera baskê kemalîst ê klasîk û 1960'an bi şûn ve, di navbera baskê şerê taybet ê ku pêşveçûyîna xwe spartiye Amerîka de rewşeke hevsengî bi dest xistiye. Esas her du jî dixwazin me kontrol bikin û misoger girêbidin. Dema ev yek nabe jî, misoger dixwazin bi erdê re bikin yek. Jixwe vekiriye ku, weke din dewlet tevnagere.

Misoger me rewşa dewletê ya piştî 1977'an him baş û him jî rast dîtiye yan jî me hîs kiriye. Bi yekê ve me xwe peyitandiye ku em ne hezêkî hatina komployê ne (komloya ji her du aliyan ve). Dema em dixwazin gav biavêjin ev kesên ku bi navê dewletê tevger dibin re baş li hev têm. 1994'an di rojnameyan de derket, qaşo, "MÎT ê Apo rêkiriye Kurdistanê" nûçeyên wisa hebûn. Esas vê gotinê kesên ku dixwazin di nava dewletê de hev tawanbar bikin dibêjin. Esas ne şandin, têkîliyên wan in. Vaye weke ku di bûyera Ugur Mumcu de tê dîtin bi xwe li hev dan. Ji ber ku, yek baskê kevneşop e, yek jî baskê şerê taybet ê Amerîkayê ye.

Piştre ev tam bûn yek. Qaşo DYP(partiya riya rast)-SHP li dijî hev bûn. Weke encam dibêjin "dê Apo me ji hev neqetîne". Û hîna jî heman kesayet yanî Turkeş û Karayalçin diaxivin. Vaye demirel û Mesut Yilmaz, ku ev rûpoşê sivîl ê dewletê ne, ji ber derbeya ji min xwarine ders girtine û xwe di nava yek rêxistinê de, yek partiyekê de xwe kirin yek. Yekîtiyeke bi zorê çêkirin. Ev gelekî girîng e û hîna bi dijwarî tekoşîn jî didome. Cudabûna ozal jî, pêvajoyeke pir girîng bû û dîsa bi me ve girêdana xwe hebû. Hatina ozal, cudabûn û hîna bi ser de çûyîna wî hebû. Dîsa qedîna Înonû û pêşveçûyîna rêveberên şerê taybet heye. Her wiha cem ersever herî dawî bi me re şerekî bêyî eman da meşandin. Ev jî bi vê derketinê re têkîldar bû.

Erê rexmî ku hemû derfetên jiyana nav pergalê ji aliyê Pîlot û jinê ve dihate pêkanîn, Enqere weke derziyê di min re diçû. Bi qandî tu dixwazî dirav heye. Tê gotin, "tu dixwazî çepgiriyê jî bikî", "Kurdeyetiyê jî bikî." Li hember te jineke

gelekî xwedî bandor. Û li ber çavan hemû jî Kurdewar in. Dirav, jin û her awayê jînê hebû. Di vê xalê de ma neketin gengaz e?

Min çawa ev yek têperand, ji bo têperîna vê min afirandêriya xwe çawa bi kar anî yan jî çima min pêwîstiya afirandêriyê dît?

Bihizirin, weke komên milîtan ên Tirkiyê yan jî weke koma Dev-Gencê heke ez tevger bibim, dê zilam min bifetisîne. Plana wî amade ye. Milîtan, Mahîr çawa birine, dê min jî bîne wê lîstokê. Jiyana pergalê tê pêşkeşkirin. Jixwe heman kes e, digot, “ yan tûyê milîtaniyê bikî, yan tûyê bijî.” Pir eşkere tê fêmkirin. Ji min re zêr dikirîn. Digot, “bira nizanim bavê min çiqas erdê xwe firotiye, ji min de weke diyariyekê ji te re ev zêr”. Ev gotin jî zilam li nav çavên min dinêrî û digotin. Min dizanî ev yek bi diravên bavê xwe nekiriye, lê ji bo ku balê nekişînim, min digot, “temam”. Digot, “bira em çalakiyê bikin, em çalakiyên pênsedhezar lîra bikin”. Ji bo wê demê ew diravekî pir zêde bû û digot, “tu tenê ferman bide”. Min got, zilam dema ji kolanê tê li zilamekî mîna dêwan daye, dibêje,”ez ji her teşeyê çalakiyê re heme”. Xwe ji qatê çaran ve diavêje, teqle dide xwe. Li ser lingan dimîne. Ma tu dikarî milîtanê wisa peyda bikî?

Ez dibêjim, “bimîne, hindekî dem bide”.

Ji jinê re tevlîbûneke hestyarî heye, lê guman jî heye. Têkilhev e.

Di vê derê de eleqeyeke min a nayê hêvîkirin û rişt heye. Heke bal bê kişandin, li dijberî me di rewşeke xwedî vexwendina me de nînin.

Ez dikarim bibêjim, hetanî salên 1977-78 û 79’an dewletê baş bawer kir ku dê bi rêka dirav û jinê ve bikaribe min bigre. Ev dibe şaş agahdarkirina dewletê. Di dîrokê de xeta wî ya herî mezin e. Bi min wisa tê ku, esas min bi wan ev şaşî dan kirinê. Yanî bi jinê ne, ez bi yê din jî didime kirin. Yê din jî qandî jinê dewlet agahdar dikir. Digot, “weke xwêyê ye”. “civîkek e, civîka di qefesê de ye”... ji bo me ev nirxandin dikir. Dibêje, “kêngê em bixwazin, emê civîka di qefesê de derbixin, pibrêjin, xwêyê li ser werkin û bixwin.” Min dixwast ez wê demê jî biaxifim. Min bi xwe ji xwe

dipirsî, “çima van gotinan dike?” Tu nabêjî em di çavên wî de civîka di qefesê de bû ne. Me civîna çileya 1977’an di mala wî de kiribû ku, civîna me ya herî mezin bû. Ya balkêş, Pîlot her tişt amade kir û em jî çûn û me civîn pêk anî. Bêguman tomar nîne, tu tiştek nîne, nav nîne. deriyê sobê vekiriye heke polîs bi ser me de bigre emê biavêjin sobê. Jin jî heye. Heke polîs were em dê bibêjin, şahiya sersalê heye. Pir balkêş e, em her du aliyên dewletê çawa bi kar tînin. Ez bawerim dema MÎTê ev yek bihîst him ji kenan re diket erdê, him jî ji hêrsa xwe dîn dibû. Hevalê D... hebû, ez bawerim 1979 bû, ez girtim. Li gor ku wî vedigot MÎT li serê xwe dide, gotiye, “ev ji sedî sed di destên me de bû, me çawa hişt ku bireve”.

Pîlot rapor dide, dibêje, “civîka di qefesê de kengê hun bixwazin em dikarin serê wî bibirin”. Jin jî dibêje, “min ji sedî sed kiriye bin kontrola xwe”. Weke nêrîn ev yek wisa ye. Tê hizirandin ku, ez gelekî hêsan polîtîka dikim, lê ya ku ez dirjînim xwîdana mirinê ye. Tê bîra min, di ew derbeya 3 hezîranê de, bi xwe eşkerekirina Pîlot a di bûyera Karasu de ez curifiyam. Berdaxa çayê ya di destên min ket xwarê. Ket û çoka min şewitand. Ez gelekî dileriziyam. Ji ber ku min digot, “dawiya me hat”. Dê zilam derbeya xwe lê bide. Derbe pêkhatibû û hedefa sereke em bûn.

Çima bi ser neketin?

Di nava xwe de ez xwedî rêgezekê bûm: çima min wêrekiya vî şerî kir û ez pê bawer bûm.

Ji ber ku zilamê şer neke bênamusê herî mezin e.

Gotina min a destpêkê ev bû û min xwe bi vê da bawerkirin. Ev zilam hemû bênamus in. Çima? Ji ber ku ev ji qehpikan pêtir qehpik in. Min got, ez dê ji bo armancên pîroztir şer bikim. Di ew temenê zû de min xwe bi vê yekê da bawerkirin û binêrin, ev bawerî hilberîna min e, ava min a jiyanê ye. Hîna jî min bi rê ve dibe. Bêguman bawerî tenê bes nake, yek jî min behsa taktîk kiribû. Taktîk bi rastî jî gelekî di ser şeytên re ye. Biçin çawaniya wî ji MÎTê re vebêjin, dê şaş bimîne. Dê bibêje, “em dan bawerkirin”, “heta em kirin xewê”. Vaye serketin di vir de ye. Û yek jî

gelekî dide xebitîn, lê xebat tenê bes nake. Tenê lîstok bes nake, ji bo lîstokê divê tu gelekî bixebitî.

Hêza dijber girîng e û hêza artêşeke mezin hatiye li pêşiya me rawestiya ye û du zilamên xwe jî ( her yek ji yekî şarezatir e, di her tiliyeke wan de deh şarezayî hene, jineke super û zilamekî super) li ser serê me dayîne rawestandin. Min got, zilam dikare bi kulmekê deh zilaman li erdê dirêj bike. Ewqas xwedî şareza ye.

Min çi kir? Temam min got divê ez bi vî re bijîm. Ma çi ji destên min dihat? Heke ji rast ve ez bixwazim kulmê lê bidim, ew dikare di heman demê de min biperçiqîne. Heke ez bixwazim bi jinê re bejna xwe bipîvim û yek nêzîkatiyeke ne di cih de raber bikim, dê min di heman demê de biqulibîne. Di vê derê de ez hêza hevsengê hesab dikim. Ji bo ez misoger gaveke şaş neavêjim, ihtiyadiyeke mezin raber dikim. Yek jî divê ez xwe bi riştbûyîna (cidîbûn) wan bidim bawerkirin û wan jî bi xwe bidim bawerkirin. Vaye, ew jî ji me ne, ji komê ne. Tûyê agahiyeke herî biçuk a dijber jî nedî dest. Teşeyê destpêkê ya ku ez dixwazim li ser bêgumaniya xwe bidim wan, "ez ji we bawerim" an jî "hun hevalên baş ên koma me ne". Bila qet gumanbar nebin, ji ber ku heke bibin xwedî guman, rojekê jî min nadin jiyankirin. Ez vê yekê jî didim.

Di nêrîn de bi hev re em komê dadimezrînin, lê gumanên min hene. "ev dikarim çi bi min bikin?", "dê kengê bikin?" weke ku tê zanîn ji bo ez vê yekê vala derbixim, hema her roj ez hildigrim nêzî xwe. Dibêje, "ha temam êdî bîstûçar demjimêran di destên me de ye". Ev yek çi dide çêkirin? Dihêle ku ez hindekî bi hêsanî dema kar bi dest bixim û di nava ewlekariyê de dixebitim. Di vê derê de ez dibim afirandêrekî mezin. Weke din tu tevgerên Kurdan û partiyên Kurdan nayê damezrandin. Partiya Sosyalîst jî (li Tirkiyê) saz nabe. Weke Mahîr û Denizan, artêş jî avakirin, partî jî damezrandin û enî jî saz kirin, lê temenê wan tenê du meh bûn. Heke ez bixwazim vê yekê bikim, temenê min ne du meh 24 demjimêr in.

Ez azîneyê diguherim, ez ji vê re dibêjim afirandêriya taktîkî. Azîneyeke ku misoger van bixapîne pêwîst dike. Ev

taktîk e. Zilam dibêjin, “em dê vî Kurdî bi kar bînin, me çar bi çar dorpêç kir”. Bêguman zilam û jin jî gelekî hişyar in. Zilam rojê pêncî caran dipirse, “bira”, “ev mijar dê çawa bibe? Ew mijar dê çawa bibe?” Ez bersivên bawerkar didim. Ez wisa bawerkar bûm ku, vaye min çû di mala wî de civîna herî bilind li dar xist. Zilam temam bû, ji min bawer bû.

Min ji jinê re jî xwast ez di asta herî jor de girêdana xwe ya hestan raber bikim an jî min wisa raber dikir (di vir de durûtî nîne) û plan jî dikir. Belkî ez wisa me, lê tenê ez wisa nînim, ez weke dîtir im jî. Hesabên min ên weke din jî hene, armanca min heye.

Armanca min a bingeh, komeke şoreşger a Kurdistanê derxistina holê ye. Lê dema vê saz dikim rejîm dibêje ku, “ev zilamên ku behsa Kurdistanê dikin, heke ji xweringehên Enqereyê derbikevin, ezê serê xwe jêbikim”. Navdar e, evqas ji xwe bawer e. Dibêje, “dernakeve, di hembêza me de ye.” Gotineke erzan a ku her kes dike heye, ev jî wisa dike. Temam rast e, ji ber ku wisa hate bawerkirin, him jî çend salan.

Bêguman di ev şerê taktîkî de, çend salan her ji zilamên xwe dibêjin, “bila ji me re agahî were.” Heta ev tiştê han jî me kir; ezê li Enqerê bimînim, zewac heye. Jixwe weşanxanê tê sazkirin. Hîna 1978 in û bêyî ku beşeke mezin a komê ji Enqereyê derbikeve, Pîlot dibêje, “başe bira emê heqê wê bidin.” Zilam razandinê dike, malê ava dike, zêran dibîne, cemidankê dibîne, weşanxaneyê saz dike... Agahî diçe jor: “zilamê me çar bi çar hate girêdan.” Jin jî dibêje, “mecnunekî çar bi çar girêdayî ye.” MÎT çima gumanbar be? Bêguman her roj ez gavên biçuk diavêjim. Gavên biçuk çine? Divê em karên Kurdistanê bi rê ve bibin. Niha dema ez van dibêjim, ew jî dibêje, “civîka di qefesê de ye, dê wisa bê qewirandin, wisa were xwarin.” Jin kenê xwe bi min dike. Pir xizan dibîne. Ewqas hêjar dibîne ku, “ma ev e”, “ ez bi şivanekî re dikarim hêsantir bijîm. Lê ma çawa ezê bi vî re bijîm?” ji ber ku ez dîl girtime. Bi zilamê dîl re çawa têkîlî tê sazkirin. Dibêje, “hêjar e.” Pir vekirî ye. Her roj li benda mirina min e, dibêje, “ka dê kengê ev bimire?” belkî hetanî dema dawiyê jî wisa bû.

Yanî esas min weke miriyekî tîne ber çavan.

Ez jî wê weke miriyekê tînim ber çavan.

Lê ew rasteqîntir e, ji ber ku dewlet li gel wê ye. Dewlet dê îro yan jî sibê fermana kuştina min bide. Wê rojê armanca hikumeta Ecevît (ku îro bu Turkeş re bûye yek) ev bû. Biryara MÎT ê ew e, “destpêkê serê zilama ne yan jî tenê serê wan ne, di derbarê wan de agahî bînin.” Me agahî daye. “ji bo kuştinê hîna zû ye...” “ev Kurdekî di bin kontrola me de ye, bi rêka vî bi hêsanî em dikarin komê hemû bigrin bin wêneraniyê. Çima em bikujin? Emê vî zexm bigrin. Bi vê teşeyê emê yên derûdora vî bêbandor bihêlin.”

Her wiha dihiziriya ku dê îroj jî di bajaran de gelek kesan weke tov bi kar bîne. Bêguman ev xwe xapandineke dîrokî ye. Piştre dê Ugur Mumcu di pirtûka xwe de binivîsandiba. Lê belkî jî zilam rasterast ji ber vê yekê hate kuştin.

Kî kê xapand? Di encamê de kê xapandina mezin û beralîkirina mezin pêk anî? Bihizirin, ez bi dewletê re partiya Kurdan didim damezrandin, Ugur Mumcu bi xwe (ku, ew jî ajanekî MÎT ê yê xwedî bandor an jî bi wan re xwedî têkîlî bû) got. Rast e, ew jî rast e. Me çawa partiya şoreşger a Kurdan bi dewletê ve spartî damezrandibe, em dê dewleta Kurdan jî (dewleta başur a ku niha em di nav de ne) bi dewleta Tirkan ve spartî saz bikin. Zilam nivîsand, weke din çare nîne.

Taktîk tîne vê derê, bilindiya taktîk di vir de ye.

Baş e, em çawa gihiştin ev bilindahiya taktîk? Vaye di nava kar de, sebra mezin, xebata rêxîstinî, zanebûn, lêhûrîna mezin, bawerkarî, insyatîf, vala nesekinandin û ezmûnekirina her rêkê heye. Jinê çi digot: “ev naşipe tu Kurdan.” Pîlot çi digot: “bira tu çi dikî?” Di bîstûçar demjimêran de agahî dixwast. Min jî hebûn jê re radigihand, zilam şaş dima. Yanî misoger hindek tiştên ku ew didan xapandinê hebûn, a herî girîng jî kesayet bi xwe dizane xwe bi şêwaza xwe, pêş bixîne. Yanî hêzên ku xwe dispêre bingeh nagre. Vaye Mahîr Çayan, Denîz Gezmîş wan ev yek esas girtin, yek-du ajanan dawiya wan anî. Belkî ajanên min jî hebin, lê ez ajanên xwe didim bikaranîn, didim xebatê û di encam de îro ew li ku derê ne hêjayê dîtînê ye.

Di bûyera me de ya girîng mijara jinê ye? Ev têkîlî çima wisa pêş ket û wê demê ya li ser min serdest çi bû? Bi giştî rexmî ku ez ewqas fediyok bûm, çima bi yekcarê ve min serlêdan kir? Ev yek tenê bi sedemên hestyarî dikare were ravekirin? An jî çepgirî, çepgiriyeke baş, bi wesfa sosyalîstiyeke baş re dikare were ravekirin?

Dema hemû hevalên min ji malbata vê jinê direviyan, berovajiyê vê yekê min ew girtin. Pîlot jî wisa. Her kes dibêje, “ev zilam biguman e”, min digirt. Bi teşeyeke herî balkêş em bi nêzîkatiya şaşkirina dewletê re rûbirû ne. Hest, nêzîkatiyên siyasî, rêgezên sosyalîzmê... hemû dibin yek. Di heman demê de bi min re vaceke hesab dîtinê heye. Min digot, “ev çi Kurdên balkêş in? Em van bibînin, çi ne em bizanibin” û em tevlî civata wan dibûn.

Ev şêwaza min a têkîliyê ye. Di nêrîn de ez tu kesî red nakim, baş an jî xirab. Ez bawerim mafekî pir girîng e yan jî hêjayî esas girtinê ye. Niha jî rêgezeke nêzîkatî yê îstixbaratgeran e. Lê wê demê bi ew rewşa xwe ya bêtercûbe, min ev pêşwazî kir. Yanî rexmî hemû pirsnîşanan, hemû gumanan, şêwaza me ya wisa bidestgirtina ya her du têkîliyan, di dîroka Kurdistanê de pir girîng e, di aliyê pêşvexistina qonaxeke nû de bi rastî şarezayiyeke awarte û hêzeke berxwedanê dixwaze. Min xwast ez vê yekê pêk bînim. Bi taybet derbaskirina van sê salan a bi vê teşeyê weke ku hun dizanin nîne. Tirsnak e. Dewleteke tirsnak e. Him baskê kevneşop, him baskê Amerîkanî dest dane destên hev û dibêjin, “bila erd veqelişe û hun bikevin nav.” Dibêje, “kurê min heke tu dixwazî milîtaniyê bidî kirin bide kirin. Heke tu jiyanê dixwazî ji te re jiyan. Zêde hişên me tevlîhev neke.” Dibêje, “tu gundiyekî yan jî xizanekî xwedêyî. Tu çi dixwazî?” nêzîkatiya dewletê hindekî jî wisa ye.

Cuneyt Arcayurek, piştre dibe şêwirmendê demirel, nirxandina weke, “gafa mezin a dewletê” dike. Di sala 1978’an de nirxandineke wisa dike. Ji şêwaza têperandina me ya vê demê re dibêje, “mar hîna dema ku bostek bû diviya bihata berçiqandin.”

...

Di nava pêvajoyê de pirsnîşan pêşketin.

Li gor nêzîkatiyên normal ên kesayetê divê ez ev şêwazê têkîliyê bikujim. Lê ez li berxwe didim. Wisa li ber xwe dayineke durû nîne, ez pêwîstiya girêdaniyê û ya sosyalîstiyê dibînim, ez pêwîstiya pir rêxistinkirinê dibînim. Lê rexmî vê yekê weke demî zikreşî ye. Niha divê ez zikreşiyê baş fêm bikim. Ev dewletek e. Wê demê ev pirs li ber hişên min ketibû, "mirovek çawa dikare wisa bike?" û ez diteqiyam. "kurê tolazan niha li dijberî te dewlet heye!" Û niha ez vê tekîliyê li gelek cihan dijîm, ez dibim şahidê wê jî. Di nêrîn de ez kesek im. Bêguman niha ez ne weke berê me, dilpak nînim. Hema fêm dikim. Bêguman wê demê jinek e, him jî jineke bi hestan ve barkirî ye. Û ez bawerim dewlet bi xwe bû. Hest-mest nayên hizirîn an jî encax weke amrazekî taktîkî tê bikaranîn. Pêwîstiya ketina nava wê jî nabîne. Berovajiyê wê, xwedî armanceke siyasî ya misoger e. Armanca siyasî ya misoger çi ye? Ji Enqereyê yan jî ji rastiya dewleta Tirkan dê zindî dernexîne. Neyekserî malbat jî dibe, bi spartina malbatê jî dibe. Peywir hildaye ser milên xwe. Kurdê dîtir jî wisa ye. Ev weke ajanên tên zanîn nînin. Him îdeolojîk, him leşkerî, him siyasî çar divegerin. Kesayetên bêkemanî ne... Ez jî dixwazim bi zorê silumên jiyanê hilperim.

Erê niha berpirsyarî çi ye? Lêhurîn çi ye?

Em ji jinê re destpêkê dikin. Em dixwazim li dijî malbatê, girêdana dewletê, yanî civakî-siyasî yan jî li dijî dewleta fermî, derveyî û şêwaza şer gavavêtinekê pêş bixin. Jiyan weke ku hun dihizirin nîne. Divê di pirsgirêka dewletê de, divê di pirsgirêka têkîliyên civakî de, jiyana gelekan weke ku ga li trenê temaşe dike derbas dibe. Li hember vê jinê ez ne xwedî pêşdarezîn bûm. Li gor min heke biba welatparezekî Kurd an jî sosyalîsteke baş, ji yên min jî pêşvetir xwedî şarezayî bû û bi kar anîna van re dikarîbû seroktiyê jî bike. Lê ev tenê nêrîn e. Di cewhera xwe de, amadekariyeke dewletê ye, çepgireke dewletê û Kurdperesteke dewletê ye. Weke mistefa kemal bavê xwe bi kar aniye, wê jî dixwast me kar bîne. Yan jî kemalîzmê piştî mistafa suphî bi gelek kesan çepgiriya sexte da kirin an jî

komunîstiya sexte da kirin; ev jî wisa ye. Him çepkiriya sexte, him jî Kurdperestiya sexte dide kirin û dixwaze di kesayeta min de Kurdistana serdema şoreşê bike bin kontrolê. Hesab wisa bû.

Heke gavavêtina me nebûya, ne sosyalîzm ne jî Kurdewarî dima. Lê niha em di rojeva cîhanê de ne. Divê mirov van ji eniyê lê temaşe neke û biçuk nebîne. Şêwazeke bi dest girtina mirov: zilam min weke çivîka di qefesê de dihesibîne, lê min xwe bi wî neda fetisandin. Berovajiyê vê yekê min ew erjeng bi kar anî û ez bawerim ê ku fetisiya ew bû. Jin jî wisa. Me deh salan îdare kir, lê rojekê wê jî ji bo qetla wê xwedî sedemên têr e. Yan ewê qetil bike, yan tûyê qetil bikî, di vê wateyê de derbas dibe. Lê rexmî vê yekê, taktîka mezin têdikoşe. Jixwe di encam de hat gihişt, “mirovê wisa nabe.” Lê min sebir kir.

Çima ez wisa nêzîk bûm, çima min wisa kir?

Di tekoşîna siyasî de di şexsê kesayet de têkbirina dewletê gelekî balkêş e. Jineke him dewletê temsîl dike, him feodalîzmê, him jî hevkariyê. Vê hêzê gelekî baş temsîl dike. Ez sosyalîstekî kedkar û xwedî bawerî me û ez gelekî jî şoreşgerî nêzî rastiya Kurd dibim û şoreşê disepînim. Hêza min sifir e, ez bi tena serê xwe me. Ew jî dewlet e. Di nava ev bêhevsengiya hêza mezin de, bi asayî, zilam yanî zilamê Kurd çi dike? Esas ewqas hebûn û nebûna wî ya ajantiyê jî ewqas girîng nîne. Vaye têkîliyeke asayî ye.

Hemû çepgir çawa wenda dikin?

Li gor min kesayet divê li gor armanca misoger bilêyîzin. Ez niha jî pir xwedî îhtiyat im. Vaye di vê derê de pîvan dikevin dewrê. Zilam her roj ez vedixwendim dûeloyê, her roj mirin heye, plana çalakiyê disepîne.

Ez di heman demê de zilamekî gelekî hestyar im.

Weke ku min daye diyarkirin, ez wê demê di wê rewşê de nebûm ku van hemûyan fêm bikim. Lê dîsa jî min dest jê berneda. Wê demê bi ser de çûyîna min çi bû, ez nizanim. Piştre têkîliyeke balkêş, pêtir nirx dayîna bi wê mijara gotinê ye. Ji bo jinekê nirx dayîn, ji bo serbazekî Kurdan wate dayîn, weke encam heke ji rast ve bi pergalê ve têkîldar in, dîsa jî vala ne berdan. Ev yek tê çi wateyê? Vala hiştin tê

wateya serbest berdana dijberê xwe. Bi kurtasî şêwaza min a ketina nav, hema hemûyan hildigre nava xwe. Heke baş derbikeve baş e, heke xirab be li dij derbikeve. Heke tu xwedî namusî tuyê tişta pêwîst bikî. Ev nêzîkatiyeke wergiriye û wisa weke ku tê hizirîn ji ber xwe ve me bi dest negirt. Min got, weke ku ez li ber fetisînê bim.

Di min de dest avêtina têkîliyekê çawa dibe? Ez dixwazim him çepgiriyê, him Kurdewariyê û him jî jiyaneke civakî ya baş sererast bikim. Him jî ez dibêjim, bila ev xwedî bikin, bi hêz bikin. Têkîliyeke ku pergal bandor dike dikare te rehet bike? Encama herî girîng a ku min derxistiye, dixwaze yekser, dixwaze neyekser têkîliyeke ku pergalê gihandiye bi hêsanî nabe malê gel.

Jina amade weke mal e. Ev ne jineke amade jî, jineke ku dewletê ew ji 7 saliya wê de bi perwerdeya taybet perwerde kiriye, him jî di asteke jor de û di hawirdoreke hevkar de. Niha yekî weke min gundî derdikeve (jixwe wisa digotin), dikeve nava têkîliyeke wisa. Ji hindek hevalên min re wisa digot, “ên weke we gundî li pêşiya mala me weke kuçikan in, me hestî diavêtin pêşiyê.” Bêguman, bi rastî jî ew li cem gel di rewşa esefkirinê de ne.

Di vê derê de bûyerek heye: destpêkê ez ji gel im û wesfên serokatiyê hêdî hêdî di min de pêş dikevin. Bi navê gel ez dikevim nava têkîliyeke hevkar, cewaziya civakî-çandî heye. Çand û hawirdora civakî ya ku ez ji serî hetanî binî tê de mezin bûme ji gel e. Aliyê kedkarî pir tê jiyîn; aliyê din gelekî di ser gel re ye, heta li dijî gel e. Di pêvajoya serhildanê de li gel dewletê bi kemalîzmê re lêyîstiye. Weke çand cuda ye, aliyê mezheb cuda ye, aliyê pêşveçûna civakî cuda ye, ola wê cuda ye, yanî bi hemû aliyan ve ev yek wisa ye. Lê yek jî sererastkirineke nû ya netewî û civakî tê pêşvexistin. Di nava ev sererastiya cewaz de, tê xwastin ku pirsgirêk were çareserkirin. Ew jî jêrbinkeya kar û bi dest girtina ji eniyeke cewaz ve ye. Lewma, ji bo pevçûneke mezin hatin vexwendin. Du rêk tên nîşankirin, an tuyê radestî milîtan bibî, yan jî ji deriyê din ve, tûyê radestî jiyana li Enqereyê bibî. Neketina herduyan jî pir girîng e. Ev zilam jî, weke ku hun dihizirin nîne. Yê ji te re ewqas mesref bike,

ma qet pêşiya te berdide? Dewlet min dizane ji pêvajoya perwerdeyê min nas dike. Weke gundiyekî qels mayî, li Enqerê di siyasalê de ewqasî hewl nîşan dikim. Dikevim nava wilfeke şoreşger a ewqas xeter û yek jî xwe dispêrim zilamen dewletê bi xwe û koma xwe ava dikim. Ma dê min zindî berdin?

Niha şaştiya dîrokî ya dewletê li vir çi ye? Ez bawer dikim şaştiyeke taktîkî wisa dike, "temam em dikarin wî bikin hevkarekî baş."

Ji bo vê yekê gelekî xebat kirin, lê çima niha Ecevît bi taktîkeke berovajî vê yekê pêk tîne. Her wiha, ev yek tê fêmkirin. Turkeş niha dikare bi Kurdan re li hev bike. Lê Ecevît hîna dûr e û nîjadperestiya wî ji ya Turkeş bi pêşdetir e. Niha her kes şaş dimîne, lê ez wî baş dizanim. Çima wisa ye? Ji ber helwesta wî ya destpêkê li hember min, heke ku lihevbikin emê perwerde bikin, bixwe jî zilam di rewşeke radestiyê de ye. Bi tevahî jî bi malbatê ve hatiye girêdan. Digot. diravên wî jî em didin, xaniyê wî jî em didin, mehaneyên wî jî em didin. RAporên ku diçûn, digotin, "kewê di çente de ye." Û jinê jî digot, "sedî sed ji aliyê malî, hestyarî, siyasî û îdeolojîk ve bi min ve hatiye girêdan û dibin kontrola min de ye." Ma dewletê ji derveyî bibêje temam îdare bikin cuda ma dê çi bibêje?

Di dawiya sala 1978'an de wilfa min a azadiyê ku tê zanîn heye. Ez wilfa xwe ya azadiyê tu caran bi dûv zincîrên wilfên tu kesî naxim, ez hîna jî wisa me. Niha mirovên min perwerde kirine, encamên wilfa min a azadiyê neyekser in. Di nava azadiyeke misoger de xwedî dibin. Yan jî ewqasî derfetên min ên azadbûnê tune ye. Lê ewqasî ku dixwazin dikarin bigihijin û qasî ku dixwazin dikarin bigihijin çiyayên azadiyê. Ez ji wan re ewletiyeke wiha didim ku, ez nikarim ji xwe re bidim. Ew berê jî wisa bû.

Dema ku min bi sedan heval ji Enqereyê derxistin, ez rewşa girêdana çaraliyan ve bûm.

Mezinahî di vir de ye. Him jî min erjeng derdixist. Bihizirin, dema ku THKO, THKP-C pel bi pel diweşiyan, min hevalên xwe gelekî xwedî kiribûn û hetanî sala 1978'an jî, min bi pir erjeng ew mezin kirin. Di encamê de, her weke

ku tu kes nema. Min derketin dispartin vê têkîliyê didan pêkanîn. Min xwe girêdaye. Derketinan bi rêxistinê didim çêkirin. Jiyana min wisa ye. Bêguman ev xwedî hêvî bûn. Min xwe wisa li ser wan sepandiye. Min xwe wisa daye pejirandin ku dibêjin, ev serok e, kontrol dike, ger em vî bigrin emê bikaribin Kurdistanê jî bigrin" ku rast bû jî.

Bi rêka wan girtina min, girtina Kurdistanê bû.

Enqere bi vê şêweyê hetanî salên 1979'an mijul kirin taktîkeke mezin bû. Him jî kom hemû bi spartina derfetên wan ve. Kîna vê, tengezariya vê û hêrsa vê ma tune ye? Heye. Heke ku hindek hevalên me yên din bûna misoger li ber xwe nedidan û wê çalakî li dar xistibana. Kemal Pîr bi xwe rica dikir û digot, "Apo destûr bide, em bi Pîlot re vê çalakiyê pêk bînin." Çavên min nedigirt û min digot, "ne dema wê ye."

Jin min ezmûne dike. Li gor pîvana nêzîkatiya xwe, dixwaze asta min a hestyarî bipîve. Dibêje, "yekî ku ji aliyê hestyarî ve wisa girêdayî jî, divê wisa nêzîk bibe." Lê tam ji xwe bawer nîne. radestiya misoger disepîne. Ez jî dibêjim radestiya misoger ne, "bila ji sedî deh vekirî bimîne." Sedî nod pîvaneke xirab nîne, lê bes nake û dibêje, "bila ji sedî nod û neh be hetanî bila girêdayîneke misoger be." Dikare wisa tevbigere? Pir zor e... Hevalên me pir xwedî gumanin û diteqin, lê ez li ber xwe didim. Ev taktîkeke wisa yê sebrê ye. Ez hîna bi ew taktîkê sebrê ve kar dikim.

Li dijberî min dixwaze di nava 24 demjimêran de biqedîne.

Dibêje, "tu parçayekî gundiyan î, tu nikarî wisa rawestî. Tu hestyarî, dê encamên hestên te wisa bin, heke tu milîtanî divê wisa çalakiyê li dar bixî, biryar bidî." Jixwe wê demê tekoşîniyan, kawayiyan û hindek rêxistinên dîtirê ez bi pasîfbûnê tawanbar dikirim. Ez wisa îlan dikirim û dixwastin dîmeneke wisa biafirînin. Lê ew jî xwedî guman bûn. Hindekan ji kêmaniyên wisa, hindekan jî behsa kêmaniyên dîtirê dikirin. Niha ev di nava sepandina yekgirtî de îfadeyên xwe dibînin. Dîsa sebir û israra di şêwaza xwe de heye. Esas niha tê fêmkirin ku, me dewlet teqandiye. Di dîtinê de ew

min diteqînin, hetanî qirika min tê, lê niha tê fêmkirin ku, me dewlet daye teqandin.

Ev taybetmendî pir girîng e. Kesekî ku vê taybetmendiyê bi dest bixe, tê wê wateyê ku wî hindek giyana serkeftinê bidest xistiye. Bêguman encamên ku min ji vê derê derxistine hene. Ji beriya her tiştî bi vê şêwaza damezrandina PKK ê, dahûrînên kesayetî (ku ev dahûrînên PKK ê û Kurdistanê ne) û bi kûrahî bi dest girtina sosyalîzmê tê zanîn. Her wiha kûr bi dest girtina hevkariyê, xiyanetê û di dest girtina jinê de min waneyên erjeng derxistin holê.

Bihizirin, şêwaza têkîliya ku min bi kesêkê re pêş xistiye, dihêle ku ez waneyên dîrokî derbixim. Hîna jî şêwaza min ew e, ez didomînim. Him jî min xwast ez bi devokeke cuda ev têkîliya civakî eşkere bikim. Bêguman heke ez xwe danehûrînim, hevalên me nayên fêmkirina tiştekî. Civakê hindek qalibên diyar amade kirine, dibêje, “divê mêr wisa be, divê jin wisa be.” Ez nabêjim ku ev van piştçav dikim, lê li gor min xefikên mezin mijara gotinê ne. Min di vê derê de jî azadî bingeh girt.

Gotina diya min hate bîra min. Esas ew tiştê hatiye gotin, wisa bi teşeyê henek kirinê nebû, cewaziya min dibîne. Heke ez wisa cewaz nebûma, tê gotin, “vaye li gor kurê min keç, vaye li gor keça min kur” û bi vê teşeyê her tişt diqediya. Feraseta malbatê ya klasîk, heta feraseta hest, a evîndariyê hîna di nava partiya me de dibe pirsgirêka mezin. Misoger ne ji ber guman û bêbaweriya min e, lê ev têkîliya jin-zilam de ez zehmetiyên herî mezin dijîm û didin jiyîn.

Sedemên vê yekê hene.

Li gor min têkîliya Kurdan ma hatiye fetisîn, rizîn an jî girêdayîn? Di vê têkîliyê de qedîn heye, rizîn heye, girêdanî heye û yek jî rewşa ji nav nederketinê heye. Derketina ji tengezariya mêtingêriyê çiqas zehmet e, rizgarkirina hevalên me yên ji tengazariyê jî, bi kêmanî ji vê yekê zortir e û ji bo vê bi teşeyên cewaz ez tekoşînê didim meşandin. Vî şerî di destpêkê de ez li ser xwe pêk tînim û misoger di destpêkê de di hundirê xwe de dadihûrînim.

Ma ev yek pêwîst bû? Ma mirov evqas xwe dike textê cerîbîn û ezmûnê?

Erê! Ji ber heke ku neke wê wenda bike. Ew ezmûneyên mezin û xeternak bûn û heke me nekiriba, dê partî derneketiba holê.

## Şerê Hestan

Me xwast di sala 1975'an de bi jinekê re dest pê bikin. Vaye teşeyekî Kurd: eleqe nîşanî Kurdewariyê dide. Xwe çepgir û sosyalîst dihesibîne. Dîsa di nava dîrokê de xwedî rewşeke watedar a civakî-malbatî ye. Pir vekiriye ku dixwaze hesab bipirse û bide.

Me got, "hevdîneke baş e" û me dest pê kir.

Aliyê hestan wê hîna pêşketir be. Heke bal were kişandin cotbûneke pir qeşeng tê pêkanîn. Her ku diçe ji bo pêngava dema ya îdeolojîk û partiyî guncaw e.

Heke bal bê kişandin dema em dikevin civaka bûrjuvaziyê, hest hatine cemidîn, hest nînin. Di pêvajoya şoreşgerî îdeolojîk, polîtîk û heta leşkerî de jî me dît ku em hestên xwe yên cewherî weke ku em dixwazin nikarin derbasî jiyanê bikin. Civaka bûrjuva qet firsend nade vê yekê. Dîsa pêvajoya îdeolojîk a şoreşger û dema siyasîbûyînê firsend nade.

Esas em dixwazin bijîn, lê ev yek dê siyasî be.

Di vir de me dubare şerek jiyan kir ku, qet naşibe tu şeran.

Teşeyê jiyana bûrjuva, desthilat ê kemalîst ku me xwast em xwe jê biparêzin rêberên wê yên bûrjuva û hevkarên wê yên Kurdistanî hene. Rexmî ku me xwe parast û gelek jî tedbîr girtin dîsa jî em hatin beramberî hev. Hestên me yên derbasbûyî, gelo ma em dixistin rewşeke xirab? An jî pêwîstiya demekê ku êdî em xwe ji şerê hestan re amade dibînin bû? Tenê armanceke siyasî heye di vir de?

Yan jî ev ji bo mezinkirinê hatibû hizirandin?

Yan jî ji ber xwe ve pêş ket?

Ev bandor bi tevahî dikarin rol bilêyîzin, li vir a girîng dema ku me dest bi vî karî kir, me wisa dest pê kir.

Di vê babetê de ji kesê Kurd bi giştî çi aliyên min ên bilind nebûn. Ez ji firîşteyan têm hesibandin. Û hemû balên min û hestên min bilind in. Misoger ev yek ne wisa ye. Gotina van xwe xapandine derew e. Ez ji her kesî zêdetir belengazê hestan im. Lê belê tiştek heye ku di min de di tu kesê dîtir de tûneye. Tenê di min de hindek hebûna xwe berdewam dike. Girêdana bi armanca siyasî ve girêdayîn berdewam kirin û min ev yek tu caran piştçav nekir. Niha hemû hevalên min ji ber wê demê hindekan şerê bi armancê siyasî ve xistin plana dûyemîn û hindekan jî ji bîra kirin. Û ev jî dibin navê hestên ciwanmêriyê de dibûn.

Vaye cewaziya min a ji her kesî, ji vê û bi şûn ve dest pê dike. Di hest de, belê ez dikarim bibêjim ji we hemûyan erzantir bûm. Lê di ew ciwanmêriya xwe de min bi carekê ve armanca xwe ya bingeh bin pê nekir û ez radestî ajoyan nebûm an jî ez bi çavreşî neketim nava sewdaseriyê û min xwe wenda nekir.

Dema ez van dibêjim, misoger ez xwe napesnînim. Esaz ez jî sewdaser bûm.

Tê zanîn ku sewdaser zehmet dijîn.

Lê ez jiyam.

Çawa jiyam, êdî divê ev yek were lêkolîn kirin. Jiyaneke balkêş a sewdaseriyê ye. Ev şerekî mezin e. Dayîna şerê hestan gelekî girîng e. Girêdana wê bi siyasetê re heye. Her ku diçe em partiyê dadimezrînin, em dikevin nava pêngaveke dîrokî. Ev hemû di hundirê xwe de bi rêkûpêk kirin û esas armanca bingeh a gel tekoşîna azadiyê nerawestandin, heta her tişt, her hest kirina qurbana wê... Ez dixwazim vê hêzê raber bikim, bêguman tirsnak giran dibe. Rast di vê xalê de, kesên ku pêwîst li hember min hevaltiya hestan bikin, yên pêwîste ferasetdar bin; em ji şaş têgihiştinê bigrin hetanî qedandina hestên nava wê, bi her teşeyê pêşveçûyînê xwe neyênî raber dikin.

Ez şerekî mezin ê navxweyî dijîm. Bêguman feraseta zilamê Kurd ê klasîk heye. Dema bi tiştekî ve hate girêdan, an bi zorê yan jî bi kêrê divê pêwîstiyên hestên xwe bi cih

bîne. Hele yekî weke min hindekî jî evîndarê rêbertiyê be, divê di vê mijarê de misoger xwe dahûrîne. Şerekî vekirî, li hember armancên bingeh dide qedandin. Ma dê sebir bê raberkirin? Hun dizanin di ciwanmêriyê de sebir, karekî zehmet e. Serî tewandin jî, di hestan de xeniqîn jî qet nabe.

Niha çetiniya vê pêvajoyê wisa ye.

Ev, di cih û dema min de qada şerekî erjeng e.

Û şerekî wisa ku her egîd li ber xwe bide nîne. Ya esas şarezayiya girêdana bi armanc ve ye. Vaye aliyê ku em jê re artîstîk dibêjin ev e.

Ev huner e.

Huner ji rastiyekê, çalakiya afirandina pêşveçûyîneke cuda ye. Çalakiya afirandêriyê ye.

Ev jî çi ye? Vaye dema rastiya Kurdê klasîk dibe mijara gotinê, ji girêkoriya têkilhev bûye derbasbûyîna dahûrîna şoreşgerî û ji zemînê seretayî derbasbûna zemîneke bilind e.

Çi ye têkîliya hesta vê serdemê?

Esas di hemû civaka me de têkîliya jin-mêr a li ser zilam, jin û keçan serdest têkîliya namusê ya bingeh e. Heke mêr nebe pîrek nikare bijî, heke pîrek nebe mêrik nikare bijî. Ji sedî nod rastiya jiyanê di nava vê têkîliyê de ye. Dema nû dibe, ev yek pê tê hînkirin, dema dimire bi vê yekê dikeve gorê. Bêguman qonaxên vê yekê hene. Mesela mijarên qonaxa keçtiya ciwan û qonaxa ciwanmêriyê qonaxên herî qedînêr in. Jixwe heke aliyekî min ê afirandinê heye, ez bawerim ew jî hindekî di vê derê de derkete holê. Belkî weke mumînekî baş jî min dikarî ez jiyana xwe bi rê ve bibim. Weke sosyalîstekî sofî jî min dikarî derbaskiriba. Lê, min zêde cih neda van teşeyan. Ji bo azadî tam be, ji bo hemû mirovan û jinê jî bigre wergiriya xwe min gelekî hewl nîşan da. Yanî li gor feraseta min a mirovahiyê hemû bindest û bi taybet jin divê biketibana nava vî karî. Ev jî mirov in, çima wisa defê van girtî tê hiştin? Çima ev her dem ji paş ve tên? Çima her dem zilam li pêş e? Vê yekê di min de nakokî çêkir û min got, “divê beşdar bin.”

Meşa min her dem li ser bingehê hevaltiyê ye. Ez ji rêbertî û otorîteyê bawer dikim. Lê dixwaze bila şivanek were, dixwaze bila jin an jî zarokek, dixwaze kesekî heftê

salî; çiqas hêza min a otorîteyê hebe jî, ez her dem dixwazim li ser bingehê hevaltiyê wan rabigrim û bi wan re bimeşim. Dema em wisa bûn jî, hindekan digotin, "em êzingên darên hişkbûyî ne", hindekan digotin, "em nikarin bimeşin." Mînak jin her dem dikeniyan. Belkî ez gelekî baş ditîtim. Lê dê çawa bimeşin, çawa biaxivin. Bi salan bi xwe bi xwe re dikeniyan. Zarok peroşmend dibûn, digotin, "birayekî me yê mezin heye." Bêguman dema min jî ji bo wan xwe dikire pêlik, ev yek ji wan re gelekî balkêş dihat. Ji bo pîran jî ev yek wisa bû. Dema me gotinên nû dikirin, dema hindekî cewaziya me didîtin, ew jî gelekî peroşmend dibûn.

Erê me jin jî, bi dest girt û me xwast em di pratîka komekê de bi hev re bin.

Lê erjeng derdikeve.

Çiqas nirxên bûrjuva yên ku min xwe jê diparast hebûn, vê carê hemû ji jor ve hetanî hundirê dilê min dixwastin min bigrin. Û ez jê bandor bûme. Bêguman li ser van hemûyan armanceke min a siyasî heye. Û ew armanca siyasî ya ku ew disepînin dikare min daqultîne. Di mijara bandordariyê de, li beramberî min pêtir xwedî ezmûne, rêxistin û amadekarî ye. Tûyê bi çi bijî? Heke tu bibêjî diravê zêde nîne, lê li aliyê din pir e. Heke tu bibêjî hêz li aliyê dîtir zêdetir e, li gel te nîne. Heke weke heyî tu serê xwe bitewînî, li kesê xwedî îdîaya seroktiyê nayê, heta li mêrekî naye. Li bergerîn jixwe nabe. Heke tu bixwazî di nava wekheviyê de bimeşî, aliyê dîtir li dûv serdestiyê ye. Him jî gundiyekî weke te, dixwaze ji bo dewlet, çîn û xwe bide bikaranîn. Jin e dixwaze di zilamekî lewaz de misoger xwe serdest bike. Belkî dema dixwaze ji jina bindest hilkişe bibe jina serdest, dixwaze yekî weke min erjeng bi kar bîne. Yanî dixwaze tola xwe ya heyamî ji kesekî weke min fiqare, xwedî çanda gundiyetî û nikare jiyanê beralî bike rake. Vaye dibêje, "min zilam dît, ez dikarim bikin amraze daxwazên xwe yên piralî. Dîsa ez vî zilamî ji bo armanca xwe ya jina serdest, ji bo armanca xwe ya siyasî û dewleta xwe dikarim xweş bi kar bînim û bidim xebitandin." Yanî di min de, li gor armancên xwe gelek aliyên kêrhatî dibîne. Û bi hizra balkêşiyê li ser vê bingehê lêkolîn dike.

Esas tu jin wisa nêz nabe. Ne zilamek dikare bi vê şêwazê nêzî jinekê bibe, ne jî jinek dikare nêzî zilamekî bibe. Balkêş e! Heke zilamekî din be... esas di pêvajoyên paş de ew tişt hate gotin: di navenda me de, li derûdorê çar zilam hebûn, ez pêwîst nakim navê wan bi kar bînim. Ew "weke kewê di çente de" daye pênasekirin. Dibêje, "hemû taybetmendî diyarin, yekî weke ku ez bixwazim bi kar bînim tenê yek hefte bes e."

Bêguman ji min digot, "bi salaye min tu fêmnekiriye." Rewş ew e: ez li ber teqînê me, "emê çi ji vê jinê bikin?" niha ez gelek zilamên me fêm dikim. Zilamtiyê, bi teşeyê stur ê pêkanîna zayendîtiyê ve tu nikarî pêk bînî.

Her ciwanmêr û keça me di van mijaran de, ez bibêjim çalakiya yekemîn, evîna yekemîn an jî di nêzîkbûna yekemîn de diqedîne. Maçek serê wî dizivirîne. Zayendîtiyeke bi teşeyekê yan wî dibe gorê, yan jî radike asîmanan û dide jiyandin. Li gor min jî ne ev e, ne jî yê din. Jixwe di ezmûneya me jiyayî de, jin dixwaze xwe milîm bi milîm bifroşe. Yan jî dixwaze me bide bikaranîn, an jî hewl dide ku me bixe. Me lewaziyên xwe yên zayendîtiyê di ev şerê dijwar de hîna zêdetir fêm kir.

Ev tiştekî têkilheve ku, jiyanê bi taybet jî jiyana rêxistinî dikare bi tirsnakî birûxîne. Ez ji bo rêxistinê her weke ku bi serê derziyê bîrê dikolim, ew bi carekê ve ji pişta min ve rêxistinê dirûxîne. Di dîrokê de pêvajoyên siyasî cara yekemîn, bi teşeyeke dijwar didim destpêkirin, ew jî ji pişta min ve bi carekê ve diqedîne. Ez dihizirim, ev beramberiya çi ye? Qaşo vê yekê li beramberî jiniktiya pêşkeş dike digre. Ev jiniktiya çi ye? Em ji binkeyê devê wê bigrin hetanî binkeya zayendîtî tu çavdêriya gelek tiştan dikî ku ev hemû her yek ji bo çekekê ye. Şêwaza xwe rêxistinkirina jinê ye.

Sekna mezin.

Dema her tişt ji min re tê pêşkeş kirin, ez qasî pêdîviyên xwe digrim. Pîlot jî digot, "bira ez koma te xwedî bikim, em vê çalakiyê bikin, wê çalakiyê bikin." Û digot, "ez ji kûr bînim ezê diravan peyda bikim." Min digot, "bila bimîne." Yanî her tiştekî ku me di çerxekê de tune bike çi hebû anîna

wan pêşniyar dikir. Û jinê jî deqe bi deqe dixwast min bixwe, bixe, tune bike û bikuje.

Her dema wê şer bû. Şûna ku ez jiyaneke wisa qebûl bikim, min rojê bi hezar caran mirin digirt pêş çavan. Ev li hemberî rastiya jinê pir bi wate bû.

Lê belê di wir de şerekî mayîn û nemayînê hebû. Niha pergalê xwast li min bide, him jî bi kesayetên xwe yên di asta herî bilind de xwedî bandor in. Şerê giyanî û şerê li dij pergalê.

Dilê min jî hebû, pêwîste were fêmkirin. Giyaneke min jî hebû, weke mirovan ajoyên min jî hebûn.

Planên rejîmê hebûn. Digotin, “em bi malbatê ve bidin girêdan û bikin malê dewletê yê herî baş.” Zilam jixwe ev yek gotibû. Daxuyaniya wî heye. Mirina min dê ji bo wî zerar bûya. Ji bo min bikin kerekî baştir, qaşo planan peş ve dixin. Bi rastî jî ev nêzîkatiyeke ji kuştinê xetertir bû. Tuyê mirov carekê bikûjî û dê ew xelas bibe û vê dixwast min her roj bikuje û li gor xwe bide meşandin. Niha jî ev hestekî erzan û pêngaveke erzan nîne. Giyana min a wê demê û ramanên min, şayîşên min, fikarên min, derfetên min û bêderfetiyên min, sebir û rika min çi ye?

Vaye di vir de ramana ku min bi rê ve dibe, bûyera ku min gotî heye. Di wê gavê de her gav min dikarî ez giyana xwe bifroşim. Ji ber ku jina hêzdar heye, dirav hene, hêz heye, hereşe heye û hemû derfetên jiyanê yên ku pergal pêşkeş dike hene. Wê gavê ji bo ku ez wenda nekim tenê tiştek pêwîst e, tiştê ku min weke armanc bi nav kiriye. Dema ku pêwîst bike ezê van hemûyan qurban bikim. Lê belê ezê radest nebim. Û ezê bi wan ve neyêm girêdan. Hindekî din dema di asteke pir ketî de dibûn dîlê hindek fêrbûyînan ez bi dewletê ve nehatim girêdan. Weke ku ez nehatim girêdan, yek jî min taktîk pêşxist û ev yek pir erjeng bi kar anî.

Pir eşkere ye, dema ku ez bi ser vê têkiliyê ve çûm, aliyên bi fikar hene û gelek gotin tên pêşxistin. Di sala 1925’an 1940’an malbateke ku di hemû serhildanên Kurdan de rola hevkariyê lêyîstiye. Heta ku bi damezrînêrên dewletê re di nava girêdanên pir nêzîk de ne. Ev jî ji malbateke wisa

hatiye. Bi serê xwe têkiliyeke gumanbar e. Hetanî dawî ketina rewşeke riskdar e.

Dema ku me ew kişand nava komê pêwîste me bi vî rengî dest pê kiriba. Lê çima me ew girte nava koma xwe û ez rasterast jê re dibim piyê pêş? Jin yeke wisa ye ku, divê di nava çepgirên Tirkan, CHP, Dev-Yol an di nava komeke wisa de divê bi cih bibe. Em dest diavêjin wê, yan jî çima ew dest diavêje me? Heta gelek berendamên koma me jî zêde hiş bi ser vê têkîliyê de nabin. Yanî him takekesê malbateke di serhildana Kurdan de xwedî roleke xirab e, him jî keseke ku divê di cihên din de xwe bi cih bike, çima em dixwazin bigrin pêş? Silametiya koma me mijara gotinê bû û hîna sedemên dîtirê jî dikarin werin rêzkirin. Em, komeke ji ciwanên kedkar an jî proleter saz dikin. Diviya ku me ev yek bingeh girtiba yan jî diviya ku bingehê çîna wê bingeh girtiba, lê di vê xalê de têkîliyeke wisa dîsa balkêş e. Ji aliyê silametiya komê ve di wesfa şayişî de ye, lê heke bal bê kişandin jê re eleqeya me pêş ketiye.

Meraq e. Wisa em dibêjin,” ma dê çi bibe, em wê jî tevlî komê bikin.”

Divê mirov di aliyê derûnî de jî bi dest bigre. Jê re eleqe tê nîşandan, yeka baş e, sosyalîst e, bi esas Kurd e, hindekî zana ye, weke jinekê jî dikare bibe mînakeke baş ûhw... Ev nêzîkatiyeke derûnî ye. Dibe nêzîkatiyeke siyasî-psîkolojîk. Heta wisa dide hizirîn jî, “dibe ku ajan be yan jî dikare me hetanî dewletê bikişîne?” lê li dêrê tiştê ku divê baş were fêmkirin ew e: esas dewsa reva ji rastiya civakê meraqa bi ser de çûyînê yan jî hebûna têkîliya wê derdikeve holê.

Vekiriye ev kes, ji aliyê malbatê ve, ji aliyê kes ve ji nava bûyera Kurdan tê. Bi dîroka xwe ya di serhildana Kurdan de pir bi rewşeke xeter derdikeve pêşberî me. Dibeje, “ez çepgirim”, heta dibêje, “ez sosyalîst û Kurd im.” Wê demê kesê tekoşînêr dibêje, “ev kî ye, em vê fêm bikin.” Yanî şêwaza min şêwazeke tekoşîniye, ev yek niha pêtir tê fêmkirin. Her çiqas em dikişînin nava komê jî, rast weke berendamekî hevaltiyê ne, tê fêmkirin weke kesê li dij tekoşîn bê meşandin nêzîkatî tê raberkirin. Ji bo ku kom li

gor diyalektîka Kurdistanê were avakirin destpêkeke pir girîng tê çêkirin.

Esas heke em ji endamên komê yên dîtirê re berdin, dê di heman demê de biqewtînin. Lê şêwaza ku em bi rê ve dibin, heke kesekî tekoşînê pêş çav bigre; dê bibîne ku weke ku têyî hizirîn xeter nabe, dê tekoşîne encamê diyar bike. Li hawirdora Enqereyê, di heyameke bandoriya çepgiriyê de, bi navê Kurdistanê em komeke wisa dadimezrînin. Û li beramberî me, weke ku min gotiye, heke em ji keseke ku di serhildanên Kurdan de roleke dijber lêyîstiye, xwe çepgir û Kurd dide nasîn re têkîlî raber nekin, ev nayê wateya şarezayiya me ya polîtîk. Her wiha kesayet bi xwe bi rola seroktiyê tevlî jiyanê bûye. Malbat malbateke serokatiyane ye. Li Kurdistanê hevkarî serdest e. Belkî ji çend malbatên serdest yek jê ye yan jî li gor serdemê ev yek wisa ye. Sedema tercîha wê ya çepgiriyê, ji ber pêvajoyê ye ku dibêje, "heke tu dixwazî bibî xwedî bandor dibe ku bibî çepgir." Heke çepgiriya wê yan jî nêzîkatiya wê ya ji pirsgirêka Kurd re nebe, weke berendameke serokê ciwaniyê dê qet şensê wê tune be. Her wiha ji ber berdewamiya statuya xwe ya berê be jî dê pê re mijul bibe. Û çavdêriyê dike. Koma herî pêşketî kîjan e? Hawirdora herî pêşveçûyî kîjan e? Ku der bûya dê xwe bisparta wê derê. Bi wê wateyê, rastiya xwezayî ya tekoşînê û azweriya desthilatdariya hevkarî ya li Kurdistanê hatiye sepandin, di kesayeta xwe ya beramberî me de eşkere derdikeve holê ku dê bi hêsanî dev ji taybetmendiya xwe ya rêbertiyê bernede.

Ya me jî li ser bingehê çinayetiyeke nû û sosyalîzmê bi ser de çûyîna me heye û ev, dibe li dij derketin û bi vê teşeyê ve bi şêwazeke nakok rewşa derketina komê çêdibe. Di serî de em di nava komê de tovên tekoşîna mezin diçînin.

Esas ev yek di gelek têkîliyên min de wisa ye. Hema ji bo her tevlîbûnê dibe şêwazeke destpêkirinê. Bêyî ku ez cewaziya çînayetiyê bikim bangewazî dikim. Lê ez bi ser aliyê kedê û serokatiya kedê ve diçim. Ev şêwazek e û rastiya wê tê fêmkirin.

Di nava partiyê de tekoşîn şert e.

Ev di mao de cuda pêş ket. Di lenîn de cuda pêş ket. Weke encam heke tu tekoşîna nava partiyê rast bi rê ve nebî, weke reel sosyalîzmê encax dikare 70 salan bi rê ve bibe. Li çînê jî heke wisa bi rêve biçê dê çêbe. Bi kurtasî heke di rêxistina pêşeng de bêyî eman tekoşîn neyê meşandin, di nava têkîliyên pêşêng de zexmtir û pisporaneyî nayê meşandin, şoreşek dikare 70 salî piştre wenda bike. Û weke tê zanîn wenda kir. Ji ber vê yekê nîha ji roja yekemîn ve her derê belav kirina me, wisa destpêkirina me dibe nêzîkatiyeke Mahîrane. Ma ez pispor û Mahîr bûm? Na. Weke şêwazeke fêrbûyiyane yan jî şêwazeke nêzîkatiyê ye.

Esas ez ewqas jî amade nebûm. Ma ez dikarim encamên vê rabikim? Lê li gor min ez ji xwe bawerbûm û min dikarî ez rabikim. Nêzîkatî heke hindekî dîtir werin lêkolînkirin, dê were dîtin ku ez dixwazim, deriyê tekoşînê vebikim, deriyekî dîrokî vebikim, dewsa sergirtina bûyerên dîrokî, ez dixwazim vebikim, dewsa serî tewandina li hember vê têkîliyê ji wê re dikê vebikim an jî ji wê re bibêjim, “fermo, tu çawayî?” û dema ez vê yekê dikim jî bi dirûstî û niyeteke baş dikim. Ma tu çepgirî? Keremke pêwîstiyên çepgiriyê pêk bîne. Ma tu Kurdewarî? Fermo pêwîstiyên Kurdewariyê. Ev nêzîkatî pir rişt û lihevhatî ye, di asteke herî pêş de li gor guncawiya taybetmendiyên armanc in, nêzîkatiyeke di cih de ye. Li ser vê bingehê hest jî dibin. Ji hestan re jî rêz û eleqeyeke ji dil tê raberkirin, ev yek nayê kêmkirin. Her wiha ev jî aliyeke tekoşînê yê girîng e.

Têkîliyên ku di asta bilind de nehatine bidestxistin tu rûmeteke wê ya bilind jî nîne. Di van têkîliyan de pêtir radest girtin û radestbûna hev heye. Mînaka min vê yekê pir balkêş eşkere dike. Ji ber ku di aliyê netewî de divê em hesab bipirsin. Ez bi vê têkîliyê re di aliyê çînî de ez hesab digrim, aliyê zayendî de hesab digrim û di aliyê çandî de hesab digrim. Ka dibêjin, te bi serê xwe bela da rûniştandin, vaye rewşeke wisa ye.

Bi giştî di têkîliyên jin-zilam de lihevhatinek heye. Tê gotin, “ez gelekî ji te hezdikim, erjeng hezdikim. Evîna min, te diecibînim...” an jî, “me hev dît, em li hev hatin û em bûn

cotek." Ma ev yek wisa ye? Carekê ma têkîlî li ser bingehêke azad e?

Ji ber ku, ev ji bo şerekî pêwîst e.

Ya pêk tê desthilatdariya zilam û koletiya jinê ye. Jixwe ev şêwaza yekbûnê li serê partiyê dibe bela. Gelek kirêtî û koletiyê vedişêre. Bêrêxistiniyê vedişêre, bêtekoşîniyê vedişêre. Gihiştina lewaziyên erzan, dibe qedîna erzan a zayendîtiyê. Hevgirtina lêwaziyên erzan dibe bêrêxistiniyê, bêtekoşîniyê û berbi bêsiyasitiyê ve dibe. Dema ku tê artêşbûnê jî, jixwe berbi tûnebûnê ve dibe. Li gor têkîliyên wisa tê avakirin encam bi pêş dikeve. Pir balkêş e, hindek ji bo hev ketine nava partiyê. Armanca siyasî, civakî û leşkerî bi aliyekî ve berde, keç û kurên ku di malbatê de tengav bûne hev girtine û hatine nava PKK ê. Dema ku yek diçe ya din jiyan nake û xwe dikuje. Yan jî dema ku ew têkîliya takekesî ya ew dixwaze nebe, xwe dikuje. Weke ku bêşarezayî ye tevdigere. Bi wateye ku ev kêmanî di destpêkê de hatiye kirin.

Niha di têkîliya min de çima wisa nebûye? Têkîliyeke hetanî qonaxa dawiyê bi nakok û têkîliyeke ku tekoşînê ferz dike. Bi rastî jî di hundirê wê de tekoşîneke pir mezin heye û tekoşîna îstîxbarat û sîxuriyê jî heye. Ez wê jî li ser zêde dikim. Xwe serokê siyasî dizane û yek jî ji bo xwatirê wê tekoşîneke wê heye.

Sazbûneke cewaz a siyasî û tekoşînî çêdibe. Ji aliyê çandî ve cewaz e, ji ber vê yekê jî tekoşîneke çandî û wêjeyî dê çêbibe. Ji ber ku cewaz e û wisa xwe ferz dike. Statuya wê ya civakî bi serê xwe tekoşîneke çînî ye. Yek jî hindek pîvanên ku jinayetî li gor xwe disepîne hene û ev yek dikare bibe tekoşîneke mezin a di navbera zayendan de.

Di vê mijarê de ji bo ku ez nebim kesayetekî demî çi pêwîst dikir? An diviya ku ez serê xwe bitewînim ( ku rewşa serî tewandînê de jî ezê bi gelek teşeyan bi binketibama). Yanî hun ji bo ku hêza li hevkirinê ya zayendîtiya erzan û hestyariyê bi dest bixin, esas keç ji kur re, kur jî ji keçê re serî ditewîne. Ev ji bo we rawe ye. Lê ji ber ku min pêwîst dît ez hindekî xwe biparêzim vê yekê rê ji tekoşîneke mezin re vekir. Me fêm kir. Vaye li gor sosyalîzmê têkîlî, vayê

pîvanên rêxistinê, vaye şêwaza propagandayê û vaye pîvanên cur be cur ên azadiyê û wekheviyê. Tu carekê dinihêrî ev nayê pêk anîn. Ji ber ku ya li hember ji bo serokatiya Kurdistanê dilêyîze. Ji desthilatiya zilam zêdetir, bi kar anîna ketîbûna jinê lîstokeke pir erzan a jinê dike, di hundirê xwe de dihizire ku li komê desthilatiyê pêk bîne. Piştre jî derket holê ku qelsiya zilamê Kurd a pir kûr girtiye, hemû hevalên min ên ku li derûdora min pir bi nirx bûn bi wî şêwazê nêzîkî wan bûye.

Di vê navbêrê de em Kemal Pîr bi bîr bînin. Ew ji zû ve pê hesiyaye ku, ew bêyî ku di vê komê de bixebite, bi ihtimaleke mezin bi taybetmendiyên xwe yên jintiyê ve dixwaze komê bike bin bandora xwe. Qaşo hîna di heft-heşt saliya xwe de li gor pîvanên feodal û hevkariyê weke serokekê hatiye mezinkirin. Statuya civakî bi tevahî wê disepîne seroktiyê. Çi têkîliyên wê bi kedê ve tuneye. Bihizirin him pîvanên xiyaneta netewî û him xiyaneta civakî û him jî taybetmendiyên dijberî civakî yek jî serokatiyeke ku ji taybetmendiyên jiniktiyê ve hatiye afirandin. Û ev wisa bi plan û amade tê nava komê. Em jî ji her alî ve xwedî rewşeke nebes in. Ji aliyê civakî ve, hatiye parvekirin çi amadekariyeke rişt a serokatiyê nîne. Dîsa aliyê naskirina jinê jî tune ye. Di derbarê zilamek divê bibe zilamekî çawa de jî, hîna gumanên min hene. Hîna weke zilamekî min xwe bi pîvan amade nekiriye. Hindek gelemperiyaneyî û li ser çawanî pêşvexistina kar hîs û hizrên min hebûn.

Di vir de ya girîng, rewşa ku gelek kes di biçuktiya xwe de ketine nav, xwe nexistina min a wê rewşê bû. Ew rewş çi ye? Vaye weke ku em hêsanî evîndar bûn, em li hev hatin, me li hev kir, rewşeke wisa nabe. Em li hev nehatin ku! Dîsa nêrina van hevalên me digotin, "em lêbixin û biavêjin." Hindek endamên hêja yên koma me, di temeneke pir zû de bi şêweyeke herî tund li cezakirinê dihizirîn.

Kemal Pîr û hevalê me cemîl bayik digotin, "hevalê me çawa tehemula vê dike û divê em vê hema bikujin." Li hember ev heqareta mezin tu zilam nikare li ber xwe bide. Ev darezîna demekê ye, lê di encamê de digotin. Tiştekî ku hevalê me dizane heye, em xwe têkil nekin û di navbera xwe

de guftugo kiribûn û kemal piştî berxwedana xwe ya mezin bi şûn ve dema ku şehîd dikeve dibêje, pêwîstiya ne jibîrkirina wê jinê divê misoger bê zanîn û heke pêwîst bike divê were cezakirin. Kûrahiya wê ez nizanim. Lê taybetmendiyeke girîng a wesiyata wan ev e û wisa pêş dikeve. Ew, dihizire ku belkî ez dê ji baskê ve bibin û bikevim. Bêguman li gor wî ez hevalekî wî yê nirxdar im. Kemal şervanekî baş bû û erjeng li ber xwe da. Erê, baweriya wî ya bi berxwedan û serkeftina min pir bilind e. Lê dihizire ku bi riya wê jinê gengaze ez bikevim an jî ji ber wê xeterê pirsgirêkek were serê min. Û di wir de pêwîstiya ne ji bîrkirina wê dibêje, ku nêrîneke di cihê xwe de ye. Lê ez jî ne di rewşeke wisa de me ku bi hêsanî bin bikevim. A rast ew jî dibêje heval dizane, lê dîsa jî ji diyarkirina van paş ve namîne.

Erê nêrîna hevalên me yên zu cezakirinê, diviya ku rastbûya? Piştî wê derkete holê ku, dê neşiyariyeke mezin bûya. Hema hema dewlet temsîl dikir. Me bi wê re arîstokrasî, hevkariya feodal girtiye bin kontrolê. Dibe ku di destpêkê de ne ewqasî bi zanebûn bû. Lê bi wate hîsdarî bûn. Me azadiya jinê girtiye bin kontrolê, heke ku em xwe berdin, her weke ku emê xwe ji wijdana rejîmê re bihêlin. Bi xwe ji niha ve, bûyereke mezin e ku ez bawerim vegeriyaye rewşa têkîliyeke bingeh a dewletê ku dikole.

Dewletê bi ihtimaleke mezin, di salên 1976-77-78'an de bi riya vê têkîliyê xwastiye me bigre bin kontrolê û ji bo vê xebitiye. Û me jî ev yek hindekî bi hîs û piştî wê bi zanebûn hewl da ku binirxînin. Bi vê re kontrolkirina vê dewletê dihate wateya kontrolkirina beşên hevkar. Prototîp e, lê wateya wê ev e. Me bûyera jina azad bi vê re derxiste holê. Kişkişîna serokatiyê heta ku bûyera serokatiyê jî me bi vê yekê re derxiste holê. Ev yek bi tevahî pêwîstiya meşandina tekoşîneke pisporane derdixe pêş. Û em jî wisa bi nêzîkatiyeke erzan pirsgirêkê tênaperînin.

Di sala 1978'an de biryarbûyîna hevalan a tasfiyê kirinê derdikeve holê. Niha wê demê helwesteke min jî hebû, heta mala ku ez tê de dimam, ez jê reviya bûm. lê dîsa jî min xwe her weke ku ji vê têkîliyê re neçar hîs dikir. Ev neçariyeke

hestyarî bû, yan neçariyeke zayendîtî bû? Zêde bawer nakim. Hîseke wisa heye ku, digot, "tu ji vê têkîliyê re neçarî, niha ev têkîlî ji te re pêwîst e û tu nikarî wê biavêjî." Niha hîna baştir tê fêmkirin ku, weke tedbîreke siyasî ew tehemul pir bi bandor û ew neçarî pir bi bandor e. Yanî çi ji bo derketina ji Enqerê be, çi ji bo ya Amedê be ev têkîlî ji bo min pêwîst bû. Esas gumanên min jî hene, dîsa her wisa dema dibêjim girêdayî û mecbûrim jî gumanên min pir vekirî û tekoşîna min pir vekirî ye. Aliyê dijber jî wisa vala nasekine. Ji ber ku bi ihtimaleke mezin, ew bixwe jî rewşa dîrokî ji me baştir dizane û di ferxê de ye. Û di ferxa wê de ye ku em dixwazin çi rizgar bikin. Yanî em parî ji devê şêr xelas dikin. Pirsgirêka Kurd berbi rizgariyê ve tê birin û bi ihtimaleke mezin dîsa pirsgirêk di wêneraniya wê de ye. Her wisa ji bo tehrîk bike û zû encam bigre çi pêwîste wê dike. Bi jiniktiya xwe dilêyîze. Rûyên xwe yên serokatiyê yên heyî bi kar tîne. Zanebûna xwe ya siyasî bihêz bi kar tîne û pir bi pîvan û hevseng tevdigere.

Yên bêpîvan û hevseng em in. An jî yên di vê mijarê de bêplan em in. Erê armanca me û xwe sepandina me heye. Lê ya wê cewaz e. Ya girîng dema ku ew jî li gor xwe min kontrol dike dihizire ku dê gelê Kurdistanê kontrol bike. Ew jî naxwaze berde. Lê çawa naxwaze berde. Ez wê demê rojane rê digrim, jiyana min a hefteyane û mehane ji bo rejîmê dibe derbeyeke mirinî. Û hindekî jî ji ber wê û rexmî wê û bi wê re di nava şerekî de, dualî di nava nakokiyekê de dibe. Dewlet dîsa bi ihtimaleke mezin (ku wê demê di nava kar de bûyera Pîlot jî heye û ew jî bi vê ve girêdayî ye) ew ji aliyekî de, ev ji aliyêkê de hewl didin ku me bikin bin kontrolê û ji beriya 1980 î bi dawî bibe me bigihînin encamê. Em bi hev re ketine nava têkîliyeke pir germ an jî bi hev re ketine nava şerekî pir germ.

Tê bîra min, bi rastî jî wê demê çayek jî ji destan nedihate girtin û di germa tîrmehê de hema jiyan hatibû asteke neliberxwedanî. Lê dîsa jî neçariya di bin bandora ev têkîliya dualî de meşandina tekoşînê hebû. Başe ku me kariye em vê tekoşînê bidim. Ji ber ku ez dihizirim, ev

nebûya gelo şêwaza bi ser me ve hatina dewleta Tirk dê weke din çawa çêbûya?

Dê dubare bibe. Piştî wê rojnameger cuneyt arcayurek nivîsî, "şelipîna mezin a dewleta me." Ugur Mumcu di pirtûka bernivîsê de dibêje, "ma MÎT ji Apo re bû alîkar?" Esas alîkariya ku dibêje, ew endamên peywirdarbûn. Her wiha wê demê Pîlot bêeman li min digere, hetanî gund diçe û dibêje li kû ye? Ya din jî di nava malê de her weke ku jiyaneke nayê pejirîn disepîne. Dema ku Kemal Pîr ew dika di mal de dibîne dibêje, "em lêbidin bikujin." Lê em dijîn. Piştre ev yek derkete holê ku dewlet girêdayî van şopandina me bes dibîne. Di vê navberê de pêwîste mirov bi bîr bîne ku Ecevît jî di serê kar de ye. Hîna zêdetir bi şopandinê xwe têrkirin, ez bawerim pîvanek e. Piştî wê kontr-gerîla hesabê vê giran ji Ecevît girt. Ji ber ku, piştre fêm kirin ku bi vê şêwazê îdarekirina min têr nekiriye û ev yek jî bi rêka Ecevît hatiye kirin ( Ecevît vê yekê nizane, hetanî wê demê hîna navê PKK ê jî nîne ma dê çawa Ecevît bizane!). Şopîna ku ji wan re hatiye diyarkirin wiha bû, kesekî ji rêze ye, weke çepgir an jî Kurdewarên dîtir e. Ya li ser wan dihate pêkanîn bi rêka kovarê eşkerekirina nêrîn û piştre girtina dadgehê ye. Dê ji bo me jî ev yek pêk anîbana. Vaye tiştên ku dixwazin bibêjin, Ecevît bêku zanibe di vê derê de ji me re bûye alîkar.

Pirsgirêk ne ev e jî, li gor hawirdora rojê zêdetirê wê nedihate kirin. Lê dîsa jî gelekî girîng e. Ji ber ku gavavêtina me weke her gavavêtinê nîne, ji aliyê wan ve gelekî xeternak e, (ku, wê demê hindekî pê dihesin jî), lê hindekî jî pir rebenî ye. Ji ber ku rexmî hindek gumanan, dema me di 1'ê çileya 1977'an de di mala Pîlot de civîn li dar xist, Pîlot jî digot, "kewê di çentede ye." Ji diduyan yek her ew çîrok vedigotin. Digot, "weke xwêyî ye", "civîk çawa bi xwêyê tê xwarin?" yanî misoger em di wêneraniya xwe de dihiziriyan. Piştre bi şêwazeke zanistî pêwîstiya xwe xilaskirina ji vê atmosferê hetanî ku em ji Enqerê, heta ji Amedê derketin me nebihîst. Û piştre eşkere bû ku vê yekê dewlet xistiye nava xapandinê û taktîka me rast girtiye.

Taktîkeke gelekî girîng e. Hetanî wê demê me ji vê dewletê mehane digirt. Em bi wî diravî komê bi rê ve dibin. Him jî me dişopînin. Ez bi karanîna wan gelek têkîliyan didim meşandin, ew jî dihizirin ku wan ez weke malekî girtî me. Ramaneke weke, "di destên me de ye, her dem li gel dewletê ye, dibe ku niha bînin" serdest e. Di dawiya zivistana 1978'an de li Enqerê li benda min dimînin. Hemû şopandinên ku ez didim, di wê rengê de ye ku ezê bizivirim Enqereyê. Heta li Amedê mal hatiye girtin, kelûpelên malê hatine standin, em jî ji vê yekê re pesendî raber dikin. Dema rapor wisa diçin, tu planeke cuda pêş nakeve.

Bêguman ji nişka ve bi teşeyeke dizî ji holê wendabûyîna min heye, di serî de ji Pîlot û piştre jî ji wê jinê dema ez bi dizî di wateyekê de dema ku bêxeber çûm ev dibû vala derxistineke mezin a dewletê. Ez vê ewqas bi eşkereyî nakim, dema ku ez niha vê yekê eşkere rave dikim, wê demê ez ewqas ne zanebûm û ne jî di rewşeke şarezayiya diyarkirinê de bûm. Me jî dişopand. Dema ew te bi kar tîne, tuyê jî wê bi kar bînî. Ew çiqas pîvanan dixe zorê, tuyê jî wê ewqas bixî nava zorê. Radestî nîne. Em bibêjin li gor şêwaza Kurdên kevin lawo ev pîrek çima wisa ye û qedandin nîne. Hetanî heval ji vê yekê bi guman bûn. Ew Tekoşîn derketibû, digot, "Pîlot bi guman e, çima nakujin?" Niha ez li Pîlot bixim, a rast emê dewletê şiyar bikin û ev têkîlî jî wisa ye. Û girêdayî vê gelekî hate xwastin ku muxalefet were pêşvexistin.

Dema niha ez van hemuyan dibêjim, esas ez bi têkîliyeke pir rast re dikevim rê. Di destpêkê de wisa, "ajan e ez wê bi kar bînim ne" min digot dibe ku bikare bibe rêheval û ez wisa nêzîk dibûm. Lê ez şiyarbûyînê jî ji dest bernadim. Ên herî nêzîkî min bin jî ez wisa me. Ev yek girîng e.

Aliyên jinê yên balkêş hene, zilaman gelekî bandor dike. Ez dizanim zilamê Kurd jî di mijara jinê de çiqasî lewaz e. Heta ez bi xwe jî yekî lewaz im. Ez komê saz dikim, esas raman û sazkirina hemû komê dibin berpirsyariya min de ye. Lê jin her weke ku destekî dizî komê serûbin dike. Bi taybet jî aliyên xwe yên jinî yên bi bandor bi kar tîne û vê yekê dike. Wê demê hindekî nêzîkatiyên balkêş ên ku min bi pêş

dixistin hebûn, niha ez ji her keçê re nabêjim bizewice yan jî nezewice ez vê yekê nasepînim. Ev yek tê zanîn. Têgînên weke "destgirtiyê" jî zêdetir nirx nadimê û bi wate nabînim. Lê wê demê min berovajiyê vê yekê kir. Min got tedbîr tedbîr e û heke di nava koma me de keseke baş ku ez pê re bibin destgirt dê baştir bibe. Bi esasî, gotineke di cihê xwe de ye û yek ji karên baş ên min e. Min got dibe ev yek ez jî bim û hevalekî dîtirê be jî. Aliyê dijber jî, vê helwestê dişopîne. Ez vê gotinê vala nabêjim û li hember gelekî baldar im. Yanî dema ez wan dibêjim, ez di hewayeke taktîkî de me. Hevaleke me yê cewaz hebû. Min got bi wî re tiştekî wisa bike.

Ev jî li gor min çareseriyek bû. Piştre ez dinêrim bi wê têkîliyê dihizire ku însyatîfa komê bigre destên xwe. Hevalê xort ê ku bi xwe pê re têkîldar bû jî, ji serokên komê yên sereke bû. Yan jî yekî ku ji vê yekê berendam bû. Bi kêmanî namzetê wê bû. Bi ihtimaleke mezin dema ku ew hilbijart bi ferasetekî wisa bû ku "bi vî re ez dikarim kar bi pêş ve bixim". Her wiha ev feraset piştî wê jî hebû. Bi vê têkîliyê re dê însyatîfa komê bigre destên xwe û min biavêje aliyeke ku hîna ji wê demê ve encama ku dixwaze dê bigre.

Piştî wê nêrî ku şensê wê li hemberî min zêde tuneye, heta qet tune ye. Û piştre jî bi ser pêşniyaza min ve hat. Eleqe nîşan dan, vaye bi wê re dikeve pêşniyaza têkîliyê.

Pir balkêş e. Têkîliyên min ên bi wê malbatê re tê bîra min û ez dibêjim, "min çawa bi ser xist?" pir zor e lê min ceriband. Yanî wisa bi wêrekî min gav avêt. Ez çûm ketim mala wan. Maleke balkêş e. Li gor pîvanên Kurdistanê hetanî qonaxê baş hatiye rêxistin û heta maleke pir klasîk bû. Ez bi xwe jî şaş dimînim, me çawa cesaret kir û me xwe lê anî. Ew jî gelekî bi guman bû. Dihizirî û digot, "gelo bi rastî jî encama evîneke pir bilind e, yan jî di nava wê helwestê de armanceke siyasî ye?" bêguman nezanîna wê negengaz bû. Lê pêwîstiya wê jî ji vê yekê re heye. Ew bi xwe jî xwedî armanceke siyasî ye. Xwe dispêre çekên xwe yên herî mezin, çeka jiniktiyê û dixwaze encam bigre. Ev ji aliyê wê de jî dibe rastiya guftûgoyeke dirêj. Ji ber ku lebat tevahî vê yekê diyar dikin. Heke ev encama evîneke bilind û

eleqederekê be û bi xwe yeka wisa be, wê min radest bigre û rewşa ku gelekî ketiye nav de, divê ez jî bikevim nava rewşeke şipandiyê wê.

Niha ez li wê dinihêrim, ev tam ne wisa ye. Dibêje, "heke ev tam hesabê serokatiyeke siyasî be ezê bikarim baştir vê yekê pêk bînim." Yek jî dinihêre, ez xwe ji serokatiya siyasî jî nadim paş û di vê rewşê de têkîliyeke asayî jî wê tu caran bi pêş nekeve. Bûyereke kişkişîne wisa didome û diçe.

Domandin û germbûyîna tekoşînê jênerev e. Ji ber ku armanc pir cewaz in. Di vir de zayendîtî tenê ji bo hev bandorkirinê ne. Yan jî ji aliyê min de wateya wê cewaz e û ji aliyê wê ve jî armanca wê cewaz e. Lê dîsa jî gavek e. Bi esas jin dê nêzî têkîliyeke wisa nebe. Lê hetanî dawiyê piştgiriyê dike û piştî wê jî ev domand. Yanî jiniktiya xwe weke çekekê bi kar anîn bi ihtimaleke mezin bi zanebûn bû. Yanî ji ber ku ne jineke wisa ketî bû. Lê vê dike çekek. Lêwaziya di zilamê Kurd de dizane. Jixwe di nirxandinên xwe de jî ev dianî ser ziman û ez ji vê re şahid bûm. Xwediyê hunereke bi şêwaza nêzîkatiyeke herî biçuk zilam xistina bin bandora xwe bû. Piştî wê hetanî sala 1986'an bi tu keçan nefes neda girtin û hemû hevalên xort ên li derûdora me, yan bi ser de çûyîna xwe yan jî bi kar anîna hindek keçan ve xist bin bandorê. Esas ev kar jî hêjayî fêmkirinê ye.

Ji bo baş were fêmkirin ez dibêjim. Li gel min hindek heval hebûn. Ew bi qandî ku qesta canê me bikin xistibûn bin bandorê. Dema beşekê dikşîne gel xwe beşa din jî dibe berbi xeta xwe kuştinê ve. Jineke ku dixwaze hindekî bi pêşbikeve weke ku bênefes dihêle, yan bi xwe ve girê dide yan mirin jî tevlî, wê ceza dike. Zilamekî yan tam diavêje derveyî komê, yan jî misoger bi xwe ve girê dide. Têkîliya jin-zilam jî bi tevahî li ser vê bingehê dide bikaranîn.

Hun dibînin ku, bûyereke mezin e.

Çima wisa dibe? Ji aliyê min ve di serî de diyar e, wê bûyereke riskdar be. Bêguman min jî tedbîrên xwe girtine. Heke ew weke jineke serbest tevbigere, dê bi tevahî serûbine hev bike. Ez dixwazim bi pîvanan ve bidim girêdan. Eşkere derdikeve holê ku wan jî nasnake. Ez jî pêdîvîdar im. Ji ber

ku pêkanîna derketina ji Enqerê û piştre jî ji Amedê ewqas hêsan nîne. Yan jî weke ku hindekî din dikin pêk nayê.

Û piştre heman azîne berdewam dike.

Zilam di heman deqeyê de tune dibe, jin ji planên xwe yên bi vê şêwazê cudatir tu tiştekî nahizire. Pênc-deh keç hene. Tevahî kar û xebatên wan bi dest xistina hindek zilam in. Hindek zilam hene kar û xebata wan tiştê ku ji têkîliyê fêm dikin ji ketîbûnê wêdetir derbas nabe.

Min bi vê re çawa îdare kir? Esas meseleyeke mezin e. Em vê dikarin çawa rave bikin? Encax ev dikare bi wêjeyeke pir baş bê ravekirin. Tu çi zilambî zilamekî wisa be û tu çi jin bî jineke wisa be. Di ezmûnên min de heye. Îro jî gelek hewl didin wê teqlîd bikin û gelek dixwazin wê bi kar bînin û ya li hemberî min jî vê têkîliyê hewlnak bi kar tîne. Rakêşa derûnî ya ku ew dide afirandin besî kuştina kesan e.

Ez di hindek mijarên dîtirê de jî wisa me. Heke ez bi karekî ve mijul bibim ezê hetanî dawiyê pê re mijûl bibim, nabêjim çi heye çi nîne û dest jê bernadim. Di vê têkîliyê de jî wisa ye. Di jinê de çi heye çi tune ye ji bo ku hetanî dawiyê fêm bikim pê re mijul bûm. Çi ye? Dibe azîneyeke girîng a fêrbûyînê. Tiştekî nîv hiştin nîne. Ta ku ez bi giştî fêm bikim dikevim pêy. Dema ku ez vê yekê dikim, bêguman weke hindekên din bi rû û çavan dernaxînim. Bi hêsanî evîndar nabim. Dilê min heye, lê mejiyê hîna zêdetir lê pêy fêmkirina pêvajoyê ye. Dîsa ez ezeziyê nakim. Hunê bawer bikin, li ser vê pêvajoyê bi giştî belkî her gav diviya bi kuştinê bihata encamkirin. Lê ji bo kom neyînî bandor nebe min tenê yek gotin jî nekir. Min rojekê jî rojev neşidand. Û tenê rojekê jî negot têkîliya min a taybet heye û ev têkîliya taybet min aloz dike, “hey komê ji min re bibe alîkar!” tu caran min ev yek negot û min gotineke wiha neanî ser zimanê xwe.

Ev jî şêwazek e. Xeternak e. Ka em binêrin dê çi bibe? Û bêguman em aliyê dijber kontrol dikin. Ji bo ku ez weke zilamekî kevneşop neyêm nirxandin rewşa ku deh demjimêran jî jê re tehemûl neyê kirin min bi sebrekê deh salan tehemul kir. Mesele, “ji çawaniya têkîliyê û viyanê wêdetir, fêmkirina bûyerê ye.”

Ma sosyalîstek dikare wiha be? Rewşenbirekî entelektuel ma dikare wiha be? Ma Kurdek dikare wiha be? Ji vê yekê zêdetir aliyê gumanbar e. Dixwaze jiniktiya xwe çawa bi kar bîne? Dibin rûpoşa sosyalîst de dixwaze çi bike? Yan di bin rûpoşa Kurdeyetiyê de çi ye? Kesayeta feodal-komprador dixwaze bibe ku derê?

Heke bal were kişandin tam serpêhatiyek e. Ji serpêhatiyê wêdetir pevçûyîneke mezin e û esas li gor min şerekî mezin e. Ji ber ku vî şerî weke şerê xwe nabînin, asta hevalên me yên dahûrîna civakî, zexmkirina têkîliya yan jî asta çareserkirinê pir paş ve ye. Bêguman dema ku dibêjim balkêşbûn, destpêkbûn vê yekê tînin ser ziman.

Hetanî dawiyê dirûst im û ji bo her têkîliyê re vekirî me. Lê aliyê dijber qasî ku bibînim jî li ser viyanê desthilat im. Li vir li cihê me zilamekî dîtir bifikirin. An dê tam bikeve bin fermana jinê yan dê jinê bedre, yan jî bikuje. Weke din tu rêkên navbeynê nînin. Him jî deh demjimêr an jî hefteyek.

Lê li holê malbateke ku xwe bi her alî ve spartiye dewletê heye. Li ser komê hindek teserûfên xeternak mijara gotinê ne. Min dê yan dev ji karê komê berda, karê Kurdeyetiyê berda, weke fermanberekî bigota, “xwedê yarebî, careke din tobe ji van karan re”, yan jî min dê dawiya vî karî anîba. Ez bawerim di şêwazê têkîliyên we hemûyan de rewşên cuda mijara gotinê ne. We qet atmosfera siyasî, civakî, çandî û giyanî bi pêş çavan negirtiye. “zayendîtî xweş e, zewqê tîne” û di wê derê de viyana we şikestiye. Yan jî bûyera nedîtin û ne jiyîna zayendîtiyê di gelekan de bi bandor e. Ez bawerim ev yek jî bi kêmanî qasî ya din dibe xeternakiyan. Bi zayendîtî azwerî, bi zayendîtî hest divê ev yek jî di me de li ser çerçoveyeke dîrokî were rûniştandin. Ji bo sosyalîstekî têkîlî gelekî girîng in. Heke ketûber bi dest were girtin, di serî têkçûyîn çêdibe.

Vaye di bingehê dîrokî de min ji vê jinê derxiste holê. Di zayenditiyê de rastiyeke rûxîn û qedîneke mezin dijî. Bi azadiyê re tu têkîliya wê nîne. Zilam jixwe ewqas qurbanê xapandinên xwe ye. Di vê derê de sosyalîzm namîne; berxwedan, azadiya viyanî û viyana berxwedêr namîne.

Di vê xalê de ez çawa zayendîtiyê berni encamê ve dibim? Esas vê encamê jî em dikarin ji pêşiyê de bibînin û formûle bikin. Misoger e ku desthilatdaran ji sedhezar salan bi vir ve têkîlî wisa bi kar anîne; ji çemka namûsê bigre hetanî çemka zewqê ev têkîlî xistiye nava şaşûmaşiyekê. Ez vê yekê dibînim. Lê divê tedbîr çibe? Vaye yên ku min li ser xwe pêkanîne hene. Mesela min dikarî bi hêsanî jinek bidîta. Hîna di temenê biçuk de bi kevneşopên gundiyetiyê ve dikarîbûn min bizewicînin. Û heta min anî ser ziman di malbatê de lêgerîneke wisa hebû. Wêrekiya gotina ji min re jî raber nekirin. Evîna min a wê demê muhafazekariya min bû.

Divê hest hebin.

Di vê xalê de divê ez rastiyekê bi bîr bînim; divê hezkirina mezin û hesta mezin hebe. Vaye ez her wisa me. Hîna di dema zaroktiya min de, li gor min keçên gundemê yên ku divê bi hêsanî nedana tu kesî, divê her bi min re bûna. Heta bejna çend kesan hîna di bîra min de ye.

Te digot belkî ew keç ên min bûn û bi darê zorê ji min girtin.

Min weke heqaret dinirxand. Hun dikarin bibêjin ku, “ji te re çi ye, keça mala filankesî di filan dîrokê de dayine mêr an jî hatiye dayîn. Her tişt di dîrokê de bûye û çûye. Tu çima hîna wisa difikirî?” bêguman ezê bifirikirim. Heta xwîşkeke min jî hebû, min vegot. Zilamekî ku qet nasnedikir hat, bi teşeyeke stûr çend telîs genim û çend bizin dan bavê min û keçik girtin û birin. Ev yek hîna di bîra min de ye. Ev çi têkîliye? Bêguman ev hemû pirsgirêk in. Vaye, keça filankesî çûye filan mêrî, ez baş dizanim ku ew ketiyekî zayendîtiyê bû. Esas keç dikarîbû pêş biketa. Navên wan jî hîna di bîra min de ne, hemû jî bûn qurbanê şaştî, yan jî paşverûtiya gund. Jixwe piştre bi dest girtina min a keçan misoger bi pêkanînên min ên gund re têkîldar e. Piştre di dibistana navîn û zanîngehê de jî hebû.

Ez bawerim niha dikarim hevokeke di cihê xwe de bibêjim. Xweşikiyên şoreşê ( vaye ev dibe dengek jî. Cara yekem dema min kilamek ji aram guhdar kir, min got divê misoger ev deng bê rizgarkirin û min wisa gav avête nava

siyasetê), di bin pergaleke wisa de ev keç, ev xweşikî yan jî pênaseyên van xweşikiyan divê wisa neçûbana. Heke bal were kişandin niha ez xwedî şensê jiyîna bi van xweşikiyan re nînim. Lê ev pirsgirêk e û divê li oxira wê şoreşek were çêkirin.

Erê, li hember zûqetîneke ji min, tevgera ku min piştre sererast kiriye, ji civakê toleke mezin hildigre. Zilamê tekoşînvanê duh qadirî çi ye? Ez her wisa me. Dibe ku wê demê min tu tiştek nekiribe, lê min kîna xwe, hesta xwe, hêrsa xwe li hev komkir, komkir û vegerande teqînê. Niha bi hezaran, heke em hîna derî vekin gelek keç tên. Ev yek tê çi wateyê?

Ev yek tolgirtina min a mezin nîşan dike.

Ez bûm xwediyê wîjdanê. Di vê mijarê de ez naşipim tu kesê dîtir. Bi hezaran jin, keçên ciwan bi teşeyeke xeternak digrin û tên birin û dê wîjdana min, hestên min ji vê yekê bandor nebin!

Vekirî li holêyê divê were hizirîn. Van hemûyan jî bigre û bifroşe! Têkîliyeke ji Mêrdînê tê bîra min. Qaşo hevalê min ê şoreşger bû. Lê rasthatî ez rojekê çûm mala wî. Keç hîna di bîra min de ye. Gotin, "ev keç jina wî ye." Min li zilam temaşe kir, şêstê xwe derbas dike. Min li keçikê temaşe kir, 12-13 salî ye. Qaşo ez di maleke şoreşger de me û xwarinê dixwim. Çiqas malbateke xweşik a şoreşger e! Bêguman min yek ji sondên xwe yên tolwergirtina mezin jî li wê malê da. Min got, "emê wê têkîliyê bi erdê bikin yek." Tu kesî ew keç nedizanî, nedibihîst, lê min bihîst. Wisa gelek bihîstinên min hebûn. Hindek kesên dîtir bûna dê gotibana, "rêzên mezin, mezinê me ye." Ji ber ku dil tuneye.

Belkî ev ji we re weke gotinên dînan bên. Lê hevkomiya taybetmendiyên min in. Zêdetir ez bi vê mijarê re mijul dibim, yanî kûrahî-serdestî pêş dikeve.

Kontrolkirina jinê weke kontrolkirina dirav e.

Jin, diravek e, ji dirav ziravtir e.

Di heman demê de divê di civaka çînayetiyê de yan jî di civaka meta de li ser bê hizirîn. Civaka metaya jinê weke metayê herî nirxdar amade dike û li gor wê pêşkeş dike. Rêgezeke sosyalîzmê jî, dewsa sîstema nirxa metayî anîna

sîstemeke cuda ye. Ev yek pêwîstiyeke cewaz a ji jinê re jî diyar dike. Em dê çawa jinê ji metabûyînê derbixin? Bûyereke mezin e û nêzîkatî û hewleke mezin dixwaze.

Him jî diraveke çawa? Hindek diravên ku ji serdema romayê mane, hindek diravên ji tenekeyan in, hindek jî diravên zêrîn in... Çawa jin ketiye rewşa diraviyê. Bêguman em nikarin bibêjin, “vaye ji te re ewqas dirav, vaye ji te re ewqas jin.” Ez di vê mijarê de rêgeza azadiyê bingeh digrim. Di vê rêgezê de bûyera dirav kar nake. Hewlên min ên pêvçûnê yek jê jî ev e. Têperandina ev rewşa diraviyê sererastiya jiyanê ya li gor rêgeza azadiyê bûyereke mezin e. Ev, belkî ji tekoşîna dijberî desthilatdaran zortir e.

Esas ez gelekî hestyar im.

Hîna ji heft saliya xwe ez raber dikim ku, ez çawa bi keçan re têkîldar im. Yanî wisa nebêjin, nezane fêm nake. Ez, kesekî erjeng im ku li dûv xweşikiya jinê ya erjeng digerim. Ji dibistana navîn ve be, ji lîse yan jî zangîngehê ve be hîna hemû keç li pêş çavên min in, lê bêguman ev yek pêşveçûyîna di hundirê min de ye. Lê di aliyê dîtir de jî ez wateya dirav dizanim. Ji ber deh qirûşan her roj bi keviran didan dûv min. Lê niha min ew her du xeterî li gel xwe dîl girtine. Di wê wateyê de dîl: yanî min ew xirabiyên wan û li gor pîvanên kapîtalîzmê tevgerbûna wan asteng kiriye. Bi teşeyeke erjeng divê ez pêşiya xeteriya dirav bigrim û ya girîng jî divê ez bigîhinim rast bi kar anînê. Dema min bertêla yekem girt jî, pirsgirêkeke wisa derkete pêşberî min. Ezê girtina bertêlê çi bikim? Hetanî sibehê ez aram nebûm, di nava gumanan de mam. Min got, “gelo ma ez xirab dibim?” Min got, “ev bi yek şertê dikare were qebûlkirin.” Ev, bûyereke pêkhatî ya di nava Kurdistanê de ye. Dibe ku ev dirav xerabiyê tîne serê Kurdistane. Min got, ezê vê diravê ji bo başiya wê bidim bikaranîn û min qebûl kir.

Her kes bi dirav xirab dibe, lê niha ez wê didim kontrolkirin. Ez bawerim niha têkîliyeke baş a dirav heye. Hindekî baştir dibe. Jin jî wisa ye. Em jinê didin lêhûrînkirin û bi hêz dikin. Bêguman dema ku ez jinê didim girêdan di wateya koletiyê de ne, berovajiyê vê yekê ji bo rizgarkirina wê ya ji koledariyê ye. Weke din dibe kirêtiyeke mezin e,

weke din jin kambaxiyeke mezin e. Di reva min a dîtir jî paşverûtiya jinê heye. Hîna tê bîra min û gelekî jî li ser hizirîm: min digot, "bila xwedê tu kesî weke jinê neke." Yanî ji ber ne ecibandina min, berovajiyê vê min weke çavkaniya jiyanê ya bihêz nirxand. Lê statuya ku hebû ji bo min tirsnak bû. Û jin çawa dikare vê statuyê bijî? Ez hîna vê pirsê ji xwe dikim. Yanî xwe bixin dewsa keçeke ciwan, bi ew pîvanên klasîk ve xistina pîrek, ez dibêjim karê herî xeternak û kirêt ê cîhanê ye.

## Tevgera mezin a lêdanê

Min ji Enqerê derketin pêk anî.

Lê bi têkîliyeke taybet ve.

Em wisa daketin Amedê him jî bi firokê.

Em bi firokê ji dilê desthilatan Enqereyê, daketin hatin dilê Kurdistan Amedê, ji kelha kemalîstan em hatin navenda Kurdistan Amedê. Li vir di heman salê de di 27 mijdara 1978'an de em dixebitin ku PKK ê fermî damezrînin.

Min têkîliya taybet hilperandiye. Li gor hemû pîvanên xwe ez jî kesekî ji wê malbatê me. Him jî di dîtinê de malbata CHP yî. Malbateke wisa ma çima dewlet bikuje? Tu bi bandor dibî. Hatî dorpeçkirin. Jixwe ji polêsan ditirsî. Ji sala 1976'an bi şûn ve bi tevahî di bin dorpêçeke bêeman de hatiye girtin. Pîlot kontr -gerilayekî girêdayî daîreya şerê taybet e. Her roj min weke civîkekî di qefesê de pirtikandî diqelîne, xwê dike weke ku min bi pariyekî bixwe dibîne. Lê ez bi taktîkeke mezin li wir digrim û ev ji hizirînê derbas nabe. Ez wî di wir de digrim, lê dîsa jî ez civîka di qefesê de me. Ez dibêjim civîkê baş xwedî bike, ji aliyê wê ve ez hetanî dawiyê ji malbatê me. Rêka ji vê malbatê derdikeve jî dibe daîreya şerê taybet. CHP ji wir diçe dewletê. Jixwe di rAporên diçin de daxuyaniyeke me ya wisa heye. Di van salan de dibêje ji sedîsed di himbêza me de bû, di wêneraniya me de bû. Min jî di dîtinê de sedîsed dihişt ku wisa bû. Niha dibin kî? Û çi navî li vê têkîliyê dikin?

Tam ez ketime nava kelha hezeke dijber. Him jî ez hindekî şipandêr im. Ez çepgir im, Kurdewar im. Lê di nava wan de hetanî dawiyê zemînê helandinê yê madî jî mijara gotinê ye. Çil sal in, pîşeya malbatê Kurdgerî ye, pir baş nasdikin. Wê çi bikin? Min çawa bînin rê baş dizanin. Çi ji

aliyê siyasî ve çi ji aliyê hestyarî ve kûrkirina min a vê têkîliyê hatibû xwastin. Her weke yek ji min re bibêje, divê tu di vê mijarê de pêş bikevî, vê yekê bike yan jî tuyê nikaribî bijî. Pêwîste ez hestên xwe jî perwerde bikim. Divê hestên min ên heyî ez pêş bixim, evîna min a heyî ez pêş bixim. Di dîtinê de misoger divê ez bidim bawerkirin. Ji ber ku ya li dijberî min weke gura ne, weke tu wisa were daqurtîn nîne. pêwîste ez bidim diyarkirin, ez pê ve hatime girêdan ku bikaribim gavê biavêjim. Bêzêdayî dibêjim min rol nesepand û lîstok nelêyîst. Lê min zanebûna xwe jî û girêdana xwe bi armanca siyasî ve bêyî ku wenda bikim parast û ev yek bi serkeftî têperand. Çi malbata li dijberî min, çi jinê baweriya "ev zilam ji aliyê giyanî ve hat girêdan, ji aliyê madî ve hate girêdan, jixwe tiştekî bike jî tûneye" bi dest xistibûn.

Vaye, têkîliya dîrokê ya herî krîtîk, şerê di hundirê kelhê de me hindekî wisa da.

Amed.

Jinê û Pîlot li wir jî hema weke mala xwe pergala malekê pêş xistin. Mal nediecibandin. Jin malê sererast dike. Lê ne cihê milîtan bikaribe bi kar bîne, cihê karbidesteke dewletê yê payebilind bi kar bîne. Ez zêde dengê xwe dernaxim, lê di hundirê xwe de pê re nabim yek. Jiyan her ku diçe tengezar dike.

Ez bawerim, a li dijber jî pariyekî wisa bi hêsanî were xwerin û daqurtandin nîne. Qaşo li gor kevneşopiyeke Kurd an jî pergaleke Kurd zewacek pêk hatiye. Lê, şer hilperiya.

Şer hilperiya. Li gor wan pêwîst bû ez temamî di bin kontrolê de bûma. Dewlet êdî rojane min dişopîne ez bawerim peywira jinê jî ew bû. Wê çawa min bi vê pergalê ve girê bide? Weke zilamekî ketûber ê Kurd ê ku beşdarî vê pêvajoyê bûye, pîvanên asayî yên ku nîşan bide hene. Her ku biçe dê bibe malbatî, her ku biçe dê giyana xwe bi tevahî bifroşe û bigihîje zarok û zêçan. Biryara bi vê malbatê re têkîlî, lê di min de yekî ji van jî pêşnaxîne. Aliyan li beramberî hev çeper girtine. Di aliyê hev binxistinê de. Ew dema dixwaze min bi bin bixe, bi ihtimaleke mezin wê li ser bingehê dewletê bihelîne û bibe. Ez jî bi kar anîna wê

didomînim. Him jî weke ku sala me 1977 têperand, ne bes be, ezê sala 1978'an jî têperînim ku têperandina vê tê wateya têperîna du salên serkeftî yên PKK ê. Yan jî tê wateya serkeftî bersiv dayîna pêvajoya damezrandinê ya pir krîtîk.

Ji bo aliyan demjimêr jî girîng dibin.

Heta ev ji rê derketin û xapandina dîrokî em pêk tînin: Malbat çil sal e hevkar e. Serokên Kurd ên nû ketin nava malbatê. Çima? Ew jî hevkareke çil sal ê dewleta Tirk bû. Him jî di kesayeta kevneşopiya TKP ê(partiya komûnîst a Tirkiyê) de hevkarekî şêst salî yê TPK ê. Çepgirên Tirkan jî wisa. Hevkarên ku hatine wê xalê. Bi dizî ketina nav heye. Ez jî ji dil dîtime, min stûyê xwe dirêj kiriye û ji dewletê re dibêjin malê tu lê digeriyayî û te nedidît me dîtiye. Bi rastî jî wisa bû. Zilam him serok, him şareza û him jî tam li nava xefikê. Jixwe Pîlot li ser hev digot, "tu ketiye xefikê.", lê pir rêgeza dizîbûnê ve jî girêdayî ye. Kî dizane di hundirê wî de cuda çi hebû? Gelo alîgiriya min di hişên xwe re derbas dike? Ji ber ku piştre gotin, "firoka wî ket û mir." Ez nizanim kontr -gerila ye, belkî jî dijî. Belkî jî hate kuştin, ji ber ku dibe min ew di aliyê giyanî de bi dest xistibe. Pir bi bandor bû. Tê bîra min digot, "tu civîka di qefese de yî," dixwast mezinahiya xeterê bîne bîra min. Min bi paş guhên xwe ve diavêt. Di dîtinê de pir asayî bû, weke ku têkîliyeke pir alî ye, her weke ku dê pir hêz bide min dida nîşandayîn. Esas tiştekî wisa nîne. Esas şêwazeke min ji sala 1976 û 1977 hîna zêdetir dê rizgar bike yan jî ev yek armanc dikir.

Cemil Bayik û Kemal Pîr ji jiyana min a Amedê re rojeke dibin şahid. M. Xeyrî Durmuş jî heye. Dibêjin, "wê gavê em daketin jêr, me biryar da ku em wê jinê bikujin." Min nedizanî çawa li hevalan heqaret dike, ji çil qatî zêdetir bi wan re baştir dijiya. Lê heqerata wê ya li hember hevalan û şopîna ku êdî ji rewşeke ku tê wateya nebûna evqesî jî, gelekî dide hizirîn.

Lê ez vê pir bi hêsanî bi pêş ve dibim. Û her wiha, tam jî di wê navberê de em manîfestoyê dinivisînin. Li Amedê cihê ku em lê diman, me manîfesto nivisî û bihizirin hêza di manîstoyê de eşkere ye. Lê pir lezgîn û dijwar tehrîk heye.

Rexmî vê yekê min karî ez weke bersiv manîfestoyê bihizirim.

Tam di vê pêvajoyê de min reva duyemîn ji malê ( vê jî 15 rojan domand) pêk anî. Piştî wê ez vegeriyam. Ev xwe paş ve kişandinek bû. Heke yekî dîtir bûya yan dê di cihê de bimiriba yan jî dê wê bikujtiba. Weke ku heval dihizirîn, heke ez karê kuştinê bikim, dê kom serûbin bibe, ya herî xirab jî ez bi xwe xwedî guman im. Dewlet dê têkîliyê xelas bike. Lê diviya ku min têkîlî bida jiyîn.

Kêm zêde min dewlet mijul kir.

...

Di van salan de jin, demjimêrên xwe jî wisa dihesibîne û wisa tê ku yan tuyê eşkere bibî, yan tuyê werî qedandin, an tûyê dahûrî, yan jî jiyîn tune ye. Ez direvim nabe. Weke hevalan lê bidim nabe. Ezê çawa bibim yekî ku bi temamî weke ew dixwaze. Ez wisa baş im ku, ev jî feyde nake. Dema ku ez tam di rewşeke wisa de bûm, me ew rêkir Enqerê. Sal bibû 1979 û me ew rêkir malbava wê.

Bi ihtimeke mezin li Enqerê nirxandineke pir berfireh kirin, pêvajoyeke sê mehî bû. Dibe destpêka sala 1979 an. Divê em pir bi hişyarî tevbigerin. Dê çi bibe, çi nebe. Ji sedî sed, ez dibim kontrola zilaman de me. Dema ku fêmbikin ez ji bin kontrola wan derketime dikarin di cih de min bikujin. Divê gav bi gav hetanî dawiyê ez çiqas girêdayî me ez ji wan re dubare bikim.

Di sala 1973’an de dema me dest bi xebata xwe ya bingehîn kir tenê çekeke me ya bi çend gotinan hebû. Û ez 5-6 salan tenê şervanê van çend rastiyan bûm. Ez şervanekî îdeolojîk bûm. Weke din tu tiştî nahizirim. Ew salên min, qasî ku ez tiştekî cewaz nebînim zelal û misoger rastiyên bêeman dubare kirin û kombûyînê re derbas bû. Cuda weke din tu tişt nedihat hişên min û ne dikarî bala min bikişîne. Heke bikşîne jî her tim bi şeweyeke ji wê re xizmet bike bi cih didayê. Dewlet be û zarokekî axayan be jî ev yek wisa bû. Komên civakî-şoven hebûn, komên çepgir hebûn. Her nifşê mirovan hebû. Me hemû kêm zêde girêdayî armanca bingehîn bi teşeyekê pêş xistin. Di encamê de koma me hindekî pêş ket. Rêgezên min ên îdeolojîk hindekî bû

girêdayî komê. Vaye cihê ku me weke Kurdistan bi nav dikir, (ku, navê wê heye ew bi xwe nîne, yan jî ew bi xwe heye navê wê nîne) me got hayde em herin. Kom dema ku çar neçar dakete Kurdistanê, qasî ku zimanê wan vegere hindek tişt gotin û ev jî bû pêşveçûyînek.

Me got em navê xwe bikin PKK

Kabîneya Ecevît hatibû damezrandin. Ecevît bi gotinan di nava nêzîkatiyeke wisa de raber dikir, “ez li dijî kontr gerîla me, li ser min jî ezmûneya sûîkastê kirin.” Em dikarin bibêjin hindek şêlûbûna hiş û nakokî hebû. Me xwast em hindekî ji wê sûd werbigrin. Piştre Ecevît bû dijminê me yê herî dijwar. Ji ber ku, me 1978 di vê wateyê de, di serdema hikumeta wî de baş nirxand. Bi gotinê be jî, kontr -gerîlaya MHP (partiya tevgera nîjadperest) yê hatibû paşvexistin. Dîsa di civîna 1’ê Çileyê de nirxandina çawanî têperîna 1978’an dikir. Vaye weke ku tê zanîn, di vê çerçoveyê de me dest bi pêşveçûyîneke girîng kir. Me 1978 weke sala damezrîn û îlankirina partiyê hizir kir. Dema ku me dixwast em di aliyekî de berxwedana çekdarî ya Hîlwanê bidin domandin, me got di vê bingehê de em herin îlana partiyê jî. Ji aliyê me ve pêwîst bû ku, bibe saleke hizrînêr û biryarkar. Em dipirsin, “gelo ma emê weke partî îlan bikin an nekin?” û ya herî girîng jî zilamê amade tune bûn. Tu kes di wê rewşê de nebû ku xwe tevlî rastiya rizgariya netewî û rastiya partiyê bike. Ciwanên xwendevan bi mafdarî, bêberpirsyarî, bêpêşbînî û zêde xwedî hêvî nebûn. Rexmî vê yekê weke ku tê zanîn, fermî civîna me ya damezrandina partiyê, di dawiya meha mijdarê de dest pê kir. Me digot, “ emê tenê navê wê îlan bikin, qet nebe dê ji dîrokê re navekî wisa bimîne. Dê ev yek jî bibe bingehek.” Dewsa ku salek vala derbas bibe yan jî erzan were wendakirin, me got em navekî wisa di vê sala de bi cih bikin.

Û di encam de me navê xwe wisa avête ortê. Cara yekem bi navê PKK ê, li Amedê bi lêhûrîna ev berpirsyariya mezin û amadekirina belavoka encamê ve me girt. Tê zanîn, min manîfesto di deh rojên destpêkê ya Tîrmeha 1978’an de amade kiribû. Belavoka damezrînê jî me nêzî zivistanê amade kir.

Tevkujiya 1978 ya Mereşê (23 Kanûna 1978 de ye) ji rast ve hereşeyeke li ser gelê Kurdistanê ye. Me partî damezrand, wan jî mehekê piştre tevkujî sepandin. Tê vê wateyê: "heke hun gavên pêşdetir biavêjin, emê we qetil bikin." Esas ev hereşe û hişyariyeke mezin e. Weke encam ev tevkujî li dûv hev li Meletî, Semsûr û her diçû li tevahî Kurdistanê belav dibû.

Hîna di salên destpêkê yên damezrîna partiyê de, di serdema Ecevîtê ku ji aliyê Înonû ve hatiye mezinkirin de, tevkujiya Mereşê pêk hat. Ev tevkujî her çiqas kiribin malê herikînên faşîstên Tirkan jî, ji binî ve dewletê piştgiriya vê yekê dikir. Armanca bingehîn a vê tevkujiyê, bersivdayîna ji rêka rizgariya netewî ya gelê me re bû. Desthilatdaran ev yek digotin: "ma hun şiyarbûn û rizgarbûna nû dixwazin? Vaye ji we re tevkujiyek!" Cih, dem ji aliyê wan ve pir guncaw e. Ji binîve faşîst dike, ji jor ve demokratên civakê û Ecevît jê re roniya kesk pê dixe. Lê hemû jî weke hev in, yek in. Ew li pişta eniyê li hev dikin û vî karî bi cih tînin. Lê ji gel re hebûna nakokiyên xwe raber dikin. Bi teşeyê hindekî din gelê Tirk û Kurd dixapînin.

Ma Celal Bayar û Înonû di tevkujiya Dêrsimê de wisa nekirin? Qaşo yek li dijî yê din bû. Lê dîrok vê yekê dibêje: yek ji yekî zalimtir û yên din ji yê dîtir zalimtir e. Ev ji bo ku wê demê gelê me bixapînin, qaşo yek li gelbûyîna gelê me xwe raber dike û dibêje, "divê hesabê ev tevkujiya Mereşê were pirsîn!" Naxêr, ev heman xapîn di mînaka Înonû û Bayar de jî hebû. Ev yek di mînaka Ecevît-Turkeş de dubare kirin. Bi vê yekê ji gelê me re digotin, "dev ji van evîna, rizgariya netewî û seroktiya PKK ê berdin!"

Rojane tê bîra min, di meşa rêkê de, di bosê de, di cejna komarê de, di 23 Nîsanê de, di 19 Gulanê de her ev hereşe dihatin kirin. Dihate gotin, "bila li rabirduya xwe temaşe bikin, di dahatuyê de dê çi bi serê wan de were bila fêr bibin." Bi vê yekê ve dixwastin çi bibêjin? Ma me hîna çi kiribû ku, van ev gotin digotin? Erê ev xayîn pir baş xwe nas dikin. Ji ber ku yên gelê xwe bikujin, xwe ji me baştir nas dikin. Bêguman gelek kesên ku van gotinan guhdar dikin, bi taybet ên ku xwe zana dihesibînin û bi wan re di nava

hevkariyê de ne, ditirsin, xwe dikemişînin û dibêjin, “em nînin.” Ev yek bi teşeyê, “min tiştek nekir, min nedît, nebihîst, neaxifîm, rengê xwe dide îfadeyên wan. Helwesta hevkarên me yên şûnger, hema bi hişyariyeke biçuk ve dev berdana ji her tiştî ye. Di dîrokê de him waneya xulamtiyê baş dayîne wan û him jî bi çewisandinê ew radest girtine.

Her ku diçû dixwastin înkar û îmhayê li tevahî Kurdistanê belav bikin. Ji radyoyan, çapemenî-weşanan hereşe zêde dibûn. Pir zêde digotin, “emê we îmha bikin, li kalikên xwe binêrin dê çi bi serê we de were, bibînin.” Bi rastî, ne şêwazeke serpêhatiyane diviya ku mirov bi berpirsyariya dîrokî bimeşiya û vê yekê jî wêrekî pêwîst dikir. Rexmî vê yekê me di sala 1978’an de bi belavoka damezrîna PKK ê ve xebatên xwe zêde kirin; û em hiziriyan ku bi taybet rêxistina piştî Hîlwanê û tekoşîna çekdarî ya Siwerekê ji tekoşînê re were vekirin û pêşvexistina gerîla hate armanckirin.

Ez di mehên biharê de, di 7 Nîsanê de bi Ferhat Kurtay re çûm Qosera (kiziltepe) Mêrdînê. Piştre dema rejîmê ev yek bihîst ew girtin îşkenceyên hovane. Vî hevalî piştre di çalakiyekê de xwe şewitand û di nava dîroka hevalên xwe de cihekî birûmet girt. Em mehekê bi vî hevalî re man. Bi Mehmet Karasungur re em çûn Rihayê. Di şertên pir zehmet de çar neçar em mehekê li Rihayê man û têkîliyeke ku me qebûl bike jî tune bû.

Desthilatdaran êdî hêdî hêdî rêveberiya şidandî jî belav dikir, qaşo ji ber tevkujiya Mereşê bû. Riha jî girtiye nava xwe û her ku diçe Mêrdînê jî digre nava xwe. Jixwe dîsa huriyetê(rojnameyeke Tirkiyê ye) manşêt diavêt: “Apoyî rojhilat diqewirînin.” Diyare ku bi ser me ve tên û her dem rewşa me ya tasfiyeyê mijara gotinê ye. Binçavkirina Elezîzê dest pê kiriye, Şahîn Donmez bûye îtîrafkar û heta ji Valî re gotiye, “em herin Apo bigrin. Weke ku min bi destên xwe veşartiye ez herim raberî we bikim, tenê tu ferman bide.” Biryar nîne, heke biryar hebe misoger dê bi ser min ve were. Lê, navenda Enqereyê hîna cudatir plan dike. Belkî jî li ser demeke pêş dihizirin.

Û vaye êdî ji bo vê yekê me gaveke baş avêt. Lê hizra bi dawî anînê wêrekiyê dixwaze. Me gazî hevalê Mehmet Karasungur û hindek hevalên dîtir kirin. Min got, “em li Sîwerekê jî berxwedanê bi pêş bixînin.” Heta li ser “yekîneyeke gerîla çawa tê avakirin” min tiştekî weke rêvebernamê amade kiribû. Çareserî ew bû. Her ku diçû rêveberiya şidyayî tengtir dibû. Me got, “em çareseriyê bi pêş bixînin, derçûnekê biafirînin.”

Desthilatdar hereşeyan dikin, tevkujiyan disepînin? Em jî tekoşînê pêşvetir dibin û bi ser ve diçin. PKK’gerî tam wisa ye. Li Mereşê bi sedan mirov hatibûn serjêkirin û sala 1978’an wisa hatibû temamkirin. Çawaniya wê zivistanê baş tê bîra min. Belavoka damezrîna PKK ê dihate wateya vebûna zêde û lez bi biharê ve çûyîn. Me karê rêxistin kirina PKK ê zêdetir şidand û me giyana berxwedanê esas girt. Me civînên Nîsana 1979’an pêk anîbûn û li ser vê yekê piştî tevkujiyê bêyî ku çend meh derbas bibin, tekoşîna me li Kurdistanê pêtir digobiliya (esme).

Di dîroka 1979’an de rejîm hîna zêdetir û bi plantir çembera derûdora me teng dikir.

Bi binçavkirinên Elezîzê, laderên (donek) xeternak ên destpêkê û piştî wê jî êdî bi rojên me yên qedînê ve serdemeke krîtîk hatibû destpêkirin.

Em temaşe dikin, her ku diçe enî teng dibe. Em li Rihayê ne û çend cihên me yên ku em bikaribin tê de birazin nînin. Hindek hevalan digotin, “ma em li Dîlokê yan jî Wanê mal bigrin?” me jixwe dev ji Amedê berdabû. Li Rihayê jî encax em dikarin çend rojan bimînin an jî nikarin bimînin. Di nava hefteya dawiyê de min ji vî hevalî (Mehmet Karasungur) re got, “dibe ku em bi derve ve biçin, lê misoger nîne.” Dîsa me hevalek ji bo keşfa sînor (li tenişta sînor mirovên wî hebûn) şandibû. Dê carekê temaşe bikira ka çi heye çi nîne.

Erê ji beriya salan dema em paşve kişiyan Rojhilatanavîn hêzeke me ya pir kêm hebû. Ev hêz weke heliyanê bû. Û heke kevir biderize jî, xwedî temeneke çend mehan bû. Vê yekê li ser dilê min, li ser ramana min çewisîneke çawa afirand? Dîrok ji destên te diçe, hêviyên te yên herî xweş bi erdê re dibin yek. Heke tu çend mehan li ber xwe bidî jî, ev

berxwedaneke bêyî hêvî ye. Çareseriyekê peyda bike! Vê yekê ez sepandim lêgerînekê û vê lêgerînê ez birim ser bersiv dîtina ji van pirsan re, “ka here binêre li pişta vî sînorî çi heye? Li pişta vî çiyayî çi heye?” Dîsa hevalê me yê Mehmet Karasungur ku me dixwast em beşdarî van xebatên artêşê bikin jî, bi rêvebernameya gerîla ya ku me di rojekê de amade kiribû ve çû Siwêrekê. Min got, “heke hun tengav bibin, ji wê wêdetir çiya ye.” “hun dikarin bi ev rêka gerîla derçûnê pêk bînin.” Bihizirin çiqas amadekariyeke seretayî ye. Dahûrîneke ji nîv rûpelê û çend gundiyen çekdar.

Wê demê çare ev bû. Şert girantir dibin. Û min gazî hevalê Ethem Akçam kir. Min got, “ka tu jî here li aliyê din ê sînor temaşe bike, mirov dikare riyekê bibîne?” Ev di heman rojan de dibin. Roja paştir çû û hat. Got rêk heye. Min mêze kir, dewsa ku em bihelin divê em çareyekê jî ji bo wê derê bihizirin. Dîsa min got, “hevalno, hun li Siwêrekê gaveke wisa biavêjin!” Vaye ew çalakiya Bucakan me plan kir. Me ji hindek hevalên dîtire re jî got, “hun jî li bajaran wisa xwe bi rêxistin bikin.” Belkî dê ez jî deriyekî vebikim.

Û ev çareyek bû.

Li hember çi çareyek? Dema kar zêde dikevin xeteriyê, ji bo em wenda nekin divê li gor serdemê em çareyekê bibînin.

Girîng e, kesên ku bi doza xwe ve girêdayî, naxwazin xwe bêhêvî bihêlin. Dema tu nexwazî xwe bêhêvî bihêlî tuyê çare bibînî. Divê niha mirov durû nebe yan jî bi spartina hêza partiyê ve tu kes xwe nexapîne. Hêvî, ji bo her kesî pêwîst e. Û her kes bi qasî ku xwedî hêvî be, divê ewqas li berpirsyariya wijdana xwe bihizire. Û divê her hêvî, mirovan bisepîne çareseriyê. Berovajiyê vê dê mirov bibe kadroyekî şaş û derew û kadroyekî ku xwe dixapîne. Ev yek mirovan bi pêş naxîne.

Şêwazeke min a nade binxistin heye.

Dibe ku ji we re erzan were, dibe ku weke xebateke erzan hun pê bihizirin. Lê dewamî ye. Kûrahiya hîsên min û aliyên min ên ku xwe bênefes nahêle ev e.

Dewletê jî niha fêm kiriye, lê êdî derbas bû. Hindeka ji wan digotin, “emê li Enqereyê bimînin, komgeriyê bikin û li wir weşanekê saz bikin.” Yek jî di hêviya sazkirina dikaneke

weşanê de bûn. Me 1979'an jî wisa derbas kir. Ev ji gel me diçûn û diketin nava rejîmê. Plangeriya sala 1979'an wisa bû. Ma ji derketina me guman hebûn? Tune ye. Ji ber ku derveyî min hema tu kesî din nedizanî. Li gor ku ji min pê ve tu kesî nedizanî zanîna MÎT ê jî ne gengaz e. Digotin, "nikare biçe." Wê çi bike? Ji bo min çend meh firsend hebûn. Him jî di pêvajoyeke girîng de. Ew pêvajo çi ye? Bi çend çalakiyên çekdarî ve me partî îlan kiriye. Me ji raya giştî re dabû eşkerekirin. Ya piştî wê çi ye?

Tofan

Ew jî serkeftinek e. Gava vê partiyê dayîna avêtin jî û heke em karibin pêvajoya piştî wê xelas bikin serketin e. Di şeş mehên dawiyê de li min digeriyan, dîn bibûn. Vaye di wê demê de bi zanîna çend hevalan ve, di dîroka me de bi rastî jî derketina derve ya ku rê li pêş pêvajoyeke girîng vebike, lê bi giştî ji nişkave pêk hat. Niha ev yek tê çi wateyê? Rejîm hawirdorekê amade dike, neyekser di sala 1978'an hawirdoreke ku me hîna navê PKK ê jî îlan nekiriye de, me Hakî jî hîna nû şehîd dabû. Civîna me ya damezrandinê, belkî rasterast di bin zanîna dewletê de bû. Wê bandoreke pir xofnak biafirîne. Tê bîra min dema Hakî hate kuştin, cîhan û asîman bi ser me de hilweşiyan. Emê bikaribin çiqas bijîn? Jiyîn wisa erzan nîne. ji bo me jiyîn, jiyandina bi tendurist a serdemeke tevgerê ye.

Li gor ku Hakî jî çûye, me dê dev jê berdaba û di cihê xwe de rûniştibana. Dewlet bi komplo û taribûnan ve bi ser me de tê. Ji aliyê din ve wilfên me hene. Qaşo dewlet dixwaze di nîvî de wilfa me bi dest bixe. Dibêje, "were li vir bijî." Pîlot digot, "keko min malûmilk firot, bav ji Agirî çûyê Denizliyê. Ji wir jî çûye Nazîlliyê. Mîrateke mezin di destên me de ye, em dikarin bi kar bînin." Înşelah sax e û guhên wî vedizenin. "Dirav zêde ye, weke ku tu dixwazî li Enqereyê bijî." Esas rêka jinê vekiriye. Ez jî mirov im, heke wê demê hindekî qelsiyên min hebûna min dikarî ez wê yekê bikim. Hemû çepgir li Enqereyê dijiyan. Hemû jî bibûn xwedî mal û milk û dijiyan. Min jî dikarî ez jiyanê plan bikim. Ji ber ku min plankiriye, ku ez nebim kesekî ewqas tawanbar. Lê girêdana bi taktîkê ve hebû.

Yên me piştre li başur gotin taktîk û dûviktiya PDK ê pêş xistin. Ya wan fikara jiyanê ye. Esas hewldaneke wisa xayintî nîne. Dê sûd jê were girtin, lê di navbera me de hindek cewazî hene. Me ji wê derê karîbû xwe bispêrin Enqereyê û komê jê derbixin. Bi xwespartina nîjadperestiya paşverû ve jî, di sala 1982'an de dikarî gav werin avêtin.

Ji bo ku digotin, taktîkgerekî erjeng e. Wê demê ew bi kar anî, piştre jî hindekên dîtir bi kar anîn... Ev şer e. Erê di taktîk de kî serketî be, ewê bi ser bikeve. Erê me dikişînin xiyanetê, em jî wan dikişînin azadiyê. Bêguman dê hetanî dawiyê taktîk were domandin. Ez li Enqereyê mam lê min kom derxist. Tam di dema pêwîst de ez mam, û piştî wê min êdî careke din Enqere nedît. Lê li Enqereyê li hêviya min bûn. Girêdayî rapora dewletê hêvîkirineke bi hesab heye. Û em hindekî bi zanebûn ji vê hawirdorê direvin.

Em direvin, lê nayê bîra tu kesî.

Piştre hate bîra çepgirên Tirkan. Giyana kesî jî pê nehesiya ku em derketine derve. Ev yek nedihat hiş, ne zanebûn û ne jî plana desthilatdaran. Ev gava dîrokî me ji bo xwe weke şêwazeke jiyanê bijart.

Em derketin.

Tevgereke mezin a lêdanê, em bi ser tevgereke lêdanê de çûn ku di dîrokê de encamên pir girîng afirand.

Ji bo em şensekî jiyanê yê nû bi dest bixin, ji bo herin hesab dîtineke baştir, ji bo em ew fetîsîna mirînî û wê xelekê parçe bikin em derketin.

Divê em ji bîra nekin ku, dema em hatin bi berbi 1980'an ve, hîna bêyî ku rêveberiya leşkerî-faşîst a 12 Rezberê bibe mijara gotinê, tiştê ku bi rêveberiya şidandî ve tê xwastin fetisandina PKK ê ye û ev yek jî bûye sereke pirsgirêka hikumeta wê demê. Dihate xwastin di kesayeta PKK ê de rizgariya netewî, her wiha nasnameya netewî ya nûjen were tasfiyekirin. Qet jî hetanî roja îro şensê jiyînê nedabûn. Di serdema rêveberiyeke şidandî ya navîn de wê em bihatana qedandin. Di xebatên rêxistinên lewaz û belaveyî de li dûv hev binçavkirin hatibûn çêkirin.

Encam, dihate xwastin ku ji beriya em bizên, me bixeniqînin.

Divê mirov di vê serdemê de wisa nêzî dîrokê bibe. Divê mirov zanebûna dîrokê xurtir bike. Xeteriya ku di serdemeke dîrokê de hate pêşdîtin û hate sepandin, divê baş were dîtin. Kesên ku dîrokê bi her alî ve, weke wate di hundirê xwe de hîs bikin, di mejî de dubare bijîn û fêmbikin, dikarin di jiyana rojane de gavên zexm biavêjin. Heke wê demê em hindekî bi zanebûna dîrokê tevnegeriyana, weke gelekan niha jî zû ve navê me wenda bibû, weke partî em hîna di gava yekem de bibûn xwediyê têkçûyîneke mezin. Zanistiyeke dîrokê ya rast, pêşdîtina gaveke rast a rojevê û wêrekiya nîşandayîna wê gavê. Vaye vê yekê hiştiye ku em ew neqeba teng têperînin.

Bi şêwazeke pir zirav, hîna dema ku leşker di xewê de bûn, bi xwînsarî, ez di aliyê dîtir ê qereqolê re derbas bûm. Di gundê sînor de (gengaze ev gundî ajanên qerekolê bûn) bi şêwazeke şoreşgerî ne, hetanî dawiyê weke kesekî qaçaxger nêzîk dibim, heta weke ku ezê ticareta çekan bikim şopînekê raber dikim. Zilamê li gel min digot, “tu çawayî, tuyê çi bikirî?” belkî hîna dijî. Ez bawerim navê wî Canî bû.

Misoger nedizanîn ku ez im. Hişyarî û tedbîreke min a mezin hebû. Vaye, em di agirekî weke qerekol re derbas bûn. Di hundirê min de bager diqewimîn, dilê min tê ber devê min, lê ez qet reng nadim. Heta di dema derbasbûnê de em li ser planê bûn û Canî got, “temam, vaye leşker hatin, me rêkûpêk kir.” Tê bîra min leşker bixwe têl rakiribû û got, “dê hemşarê min, zû derbasbin bila fermandar nebîne.” Bi xwînsariyeke wisa me sînor derbas kir. Mehmet Saîtê li pêşiya min digot,” tu pêle dewsên min bike.” Em di erdê bi mayin re derbas dibin. Her roj li vir mirov qurban diçin. Nêzîkatiya min a wê demê wisa ye: Mehmet Saît pêle kijan derê bike, ez jî pêle wê derê dikim. Yanî ez rêberim, xwedî nav deng im, lê rêberê erdê bi mayin ew bû û diviya ku ez bi her awayî li dûv wî çûbama. Şêwaza leşkeriyê! Erê mirov dikare wisa bibêje. Yek jî me serî li hember dewletê rakiriye, divê em derketina di dema xwe de jî bizanibin. Me wêrekiya serhildaneke mezin raber kiriye, ev serhildaneke wisa ye ku nayê hiş û eqlê tu kesî. Lê derketineke wisa nayê hişê tu kesî. Ji civata PKK ê û civata dewletê gelekî bêxeber e. Ev

serhildanek e û taktîkeke rişt e. Ji nişkave hizirîm, bawerim di du rojan de. Heke min dirêj kiriba û ev yek bi hevalên me bida niqaşkirin, dê xeterî mezintir bibûya.

Di Mijdara 1979'an de em li Rojhilatanavîn in.

Di rojên destpêkê yê meha Çileyê de li komeleke Filîstînê (1980) me bi zorê komek anî gel hev. Ez bawerim di taxeke Filîstîniyan de, bûroya Eniya Demokratîk bû. Ev yek wê demê ji bo destkeftiyeke mezin bû. Bi rastî hevalên wateya "deskeftin çi ye" nizanin. Ji aliyê min de, êdî me serhildaneke biçuk kiriye, di dema çewisandina vê serhildanê de yê hatiye kuştin miriye, yê hatiye bi darvekirin, hatiye bi darvekirin û yên li paş mane heke em xelas bikin, dilxweşî ye! Cara yekem em dixwazin xelas bikin. Di encam de desthilatan digot, "bermayiyên devê şûr in." Hate gotin ku, "ji sedî deh bermayiyên devê şûr in" lê belkî jî ji sedî yek bû.

Bihizirin, ji Şêx Seîd tu tişt xelas nebûye, ji Seyît Riza tu tişt xelas nebûye, ji Agirî tu tişt xelas nebûye. Serhildana me jî ewqas bihêz nîne, bi zorê em çend nirxan xelas dikin. Lê dîsa jî gelekî girîng e. Cara yekem ez derketime û koma yekem jî min kişandiye. Kêmaniya taktîkî, heke di dema xwe de tedbîr neyên standin dê karesatên çawa bi xwe re bîne?

Di dawiya 1979'an de, ji beriya ku girtinên wergirî pêk werin dema ku min li derve derfeteke pir bi sînor bi dest xist, min ji hevalê berpirsyarê hundire welat re ev yek got, "min ji bo 250 kesî cih amade kiriye. Zêde cih jî nîne.lê heke em hindekî xwe tengav bikin, em dikarin îdare bikin, qasî 250 kesan bişînin." Heke tam fêmkiribana û hindek sererastiyên bi sînor çêkiribana, ez bawerim dê ew girtinên ku zîndana Amedê dagirtin pêk nehatibana. Di destpêkê de Xeyrî û Ferhat gelek kadroyan dikarîbûn derketibana derve. Me dê 12 Rezberê bi wendahiyeke pir kêm pêşwazî kiriba û dê derfeta xurtir rêxistinkirina PKK ê derketiba holê. Lê heval fêmnekiriye, bi hizra, "çima wisa dihizire heke ev biçin tu kes namîne" tev digere. Xwasteka min çiqas hevalên di xeteriyê de hene hemû pêşwazî dikir. Heval berxwedana li dijî 12 Rezberê dihizire, lê hetanî wê demê bi navê girsê tu

kes namîne. Tu kesî ku vê yekê bihizire nîne. Weke ku yên neşînin dê biparêzin û rêxistin bikin, ev hevalê me yê berpirsyar girîngî û wateya derketinê fêm nake. Ev nêzîkatî weke nêzîkatiya şerê başûr bû. Wê demê jî li wê derê heman heval hebûn. Mixabin, bi ne pêkanîna fermanê ve (ku ew name gihiştibû dest), rê li pêşiya girtinên hezaran û îşkenceyên tirsnak vekirin. Siwêrek hîna ji beriya bigihîje dawiya sala 1979'an kiribûn xirbe. Vegeriya bû çetegeriyeke gundîtî.

Di 1980'an de gotineke Kemal Pîr heye: digot, "heke ez berpirsyarên vî karî bibînim, ezê her du destên xwe bikin qirika wan û hesab jê bipirsim." Xistibûn wê rewşê. Rexmî vê yekê me xwast em hindikekî xelas bikin.

Bi kurtasî talîmat tam pêk nehatin, me pir kêm heval kişandin vir. Me gihiştandin Rojhilatanavîn...

Ne kes me dizane, ne jî (ku navê min Elî ye) ez kî me, rêxistina min çi ye, tu kes nas nake. Yek têkîlî jî nîne. Em firsendeke bi qandî serê derziyê dinirxînin. Rêka reş a Beyrûtê bi berf e. Ji bo ku em çend hevalan derbasî wê derê bikin bi rojan em li hêviyê dimînin. Bi zorê me derbas kir û vaye weke ku tê zanîn me dewreya destpêkê ya perwerdeyê li Libnanê da destpêkirin. Hevalên gelekî hêja bûn. û hîna di bîra min de ye, wê demê kevneşopiyên baş ên şoreşgerên Filîstiniyan jî hîna dijiyan. Hindek kesên ku ji şoreşê bawerbûn û dixwastin hindek tiştan bidin me jî hebûn.

Di nava atmosfereke germ de, di ew çiyayên xweş ên Libnanê de, me di bin rêbertiya Kemal Pîr de dema dewreya xwe ya perwerdeyê da destpêkirin, ez bînim bîra we ku fermandariya yekem Kemal Pîr da. Di bihara 1980'an de berpirsyarê koma yekem a ku derbasî welat bû ew bû. Bêguman, piştre em ji 1981'an derbasî 1982'an dibin. Em li Libnanê ne û em dixwazin ji nû ve partiyê organîze bikin.

Di vê navberê de provakasyon heye û dixwazin hişan şêlû bikin û rêbikin Ewrûpa. Bermayiyên şûr in! Bila serê hemuyan li aliyekê bimîne, dilê wan jî nîne. Bi dizî dixebitin, qelsiyên mirovan xirab bi kar tînin. Bêguman, li welat li dûv hev girtin hene. Em dixwazin kêmek hêzên me yên li çiya mane xelas bikin. Em ji Dêrsimê, ji Qersê digrin.

Di nava 1980-1981'an de her tên. Îşkence bi hemû dijwariya xwe ve didomin.

Di demeke wisa dîrokî de û bi wergiriyeke wisa derkete holê ku, em him sedema bingah a nabosê ne, him a çareseriyeke dibetî.

Dahatû hêvî ye, ew vedigere rastiyê.

Dîrok dem e, bi wê hêviyê re dibe yek.

Di vê wateyê de ji bo welat min xwast ez salan xizmete yekî bikim. Min xwast ez xizmetê mezinên me, şervanên me, ji Berzanî ve bigre hetanî Komunîstan, oldaran xizmet bikim. Piştre min dît ku, hemû sextekar in.

Hemû kesayetên qels in, bi pirsgirêk û bi ramanên mezin ve dilêyîzin.

Ev yek nayê qebûlkirin. Bi vê teşeyê ve bi qandî ku gelek kesên dîtirê sûd dan welatê xwe, wan sûd nedan.

Bêyî puxte, hikmet û nirx in.

Kesên xwedî gotinên xwe nînin.

Bêguman ji ber ku mezinên me wisa ne, me wisa dîtiye, ma diviya ku em bireviyana?

Ezê ji wan hesabên misoger bipirsim.

Ev mezinên me wisa ne, ji destên wan tu tişt nayên. Ez di zarokatiya xwe de jî wisa dihiziriyam, "dê dîsa bavê min hindek tiştan bike. Xalên min hene belkî ew hindek tiştan bikin."

Piştî çend salan min dît ku bav miriye, xal mirine. Û bi bavan û xalan ve tu tişt nayê kirin.

Piştre ez bi ser oldariyê ve çûm. Ji bo meleyê gund min got, "ev ji xwedê xeberan tîne. ji asîmanan, ji bihûşt û dojehê agahiyan tîne, dibe ku ji derdên me re bibe çare." Piştre min dît ku ev jî qedîneke cuda ye. Min got, "ji vî jî tu tişt dernakeve." Ez çûm dibistanên dewletê. Min digot, "dê ev me bilind bike, dewlet e dê xwendin û nivisandinê hîn bike, hetanî dawiyê mirov dikare di vê rêkê de bimeşe." Lê piştî çend salan min dît ku, di hundirê wê de ketina me heye, bêariya me heye.

Di nav de şerm û mirin heye.

Piştre bi çepgirên Tirkan re têkîliyên min çêbûn. Min got, "çepgirên Tirkan şer dikin, di şoreşê de, di Sosyalîzmê de

rizgariya me heye.” Ez bi mirinî nêzî van jî bûm. Piştî çend salan me dît ku, bi navê çepgiriyê, bi navê Sosyalîzmê dîsa ketina me heye.

Derveyî vê jî min felsefe xwend. Li ser îdeolojiyan, ramanan lêkolînên min hebûn. Min digot, “belkî di hundirê wan de hindek tişt hebin.” Me xwast em li ser Kurdewariyê jî rawestin. Me çend kesên li ser navên Kurdeyetiyê dîtin ku, ew jî nikarin xwe hilbigrin. Sed sal jî derbas bibe nikarin xwe rakin. Me ji van tu encam negirt.

Piştre di salên 1970’an de min wêrekiya çend gavavêtinan raber kir. Xebata min a puxteyî jî wisa dest pê kir. Heke di nava me de nirxa mirov heye; em jî dê bi navê welatekî û gelekî, li ser rastiya mirov, rastiya welatparêziyê, rastiya wekheviyê, dadweriya mirov û şerefê çend gotinan bikin.

Divê hindek tişt serbixwe werin dîtin. Mejiye me heye, nêrînên me hene. Xwe biparêzin, emê gav bi gav hindek tiştan bibînin. Berê ev nêrîn çawa bûn? Min xwast ez ji bo welatekî biaxivim. Ji bo ramana Kurdewariyê min got gengaze civatek were pêkanîn.

Her kesî ez dîn dihesibandim.

Digotin, “welatekî wisa nîne. Ji kû derê derket ev welat? Li vî welatî gelekî wisa jî nîne. Yên heyî jî heliyane çûne.” Mirovên min, hevalên min û bavê min digotin, “kurê min di tiştekî wisa de hêvî nîne. Her tişt qediye. Ma tu dîn î? Seyît Riza, Şêx Seîd, Berzanî gelek tişt kirin, lê tu tişt bi dest nexistin. Yek jî tu bi tena serê xwe yî. Divê tu çend qirûşan bikî berîka xwe, li tomobîlê siwarbî û herî bixwînî.”

Derfetên me yên wisa tûne bûn. Tu her tiştî bi lingên xwe pêk tînî. Heta hetanî zanîngehê jî ez bi piyan dimeşiyam.

Ji rewşeke wisa, ez çawa bûm xwedî hêz? Rewşeke bûyîna mirov û kesekî belengaz peyda ye. Rast-şaş min hindek tişt digotin. Digotin, “na.” Ma giyan û raman alîgirên min bûn? Na. Ez du salan veqetî mam û di rêka xwe de meşiyam. Ya girîng, diviya ya ku pê dimeşiyan ramaneke nû bûya. Di çend salên dawiyê de me di xwe de şênber kir û piştre me bi derûdora xwe re şer kir.

Dijminên me dijminên dîrokî ne. Min xeterî dît. Tu carekê temaşe dikî pir hişk lê dide. Tu lê temaşe dikî, fêsadî heye û di dawiyê de bi carekê ve bi şûrê xwe her kesî ji holê radike.

Me xwe ji ber şûrê wan xelas kir.

Pişti ku em derbasî Rojhilatanavîn bûn me serê xwe nekir bin şûrê desthilatdaran. Me xwe di çiyayekî biçuk ê Libnanê de saz kir. Ma karên mezin kirin. Di Rojhilatanavîn de carna cihên wisa dibin.

Musa, Îsa û Mihemed wisa xebat kirine. Derveyî van jî gelek şoreşger xebitîne. Me jî cihekî teng dît û xebatên xwe pêk anîn.

Çîroka me ev e.

Çi ye çîrok? Desthilatdar her tiştî bi şûrê xwe ve digrin. Bêyî şûr û çek tu nikarî xwe biparêzî.

Li ser şûr û çeka girîng rawestin.

Şûr û çek ji bo çi ne? Li ser çi ye, çawa bi dest tê xistin? Piştî ku te bidest xwe xist, tuyê çawa bi şûr û çekê kar bikî? Tuyê li ku derê kar bikî, azîneya te çi ye? Ji neçarî divê bi salan tu li ser vê yekê rawestî. Çima? Ji ber ku weke din tu rêk nîne, bêyî şûr û çek tu nikarî nefes bigrî. Tu çi bikî derew e, tu çi bibêjî bêyî şûr û çek derew e. Ji ber ku desthilatdaran bi şûr û çekê her tişt ji destên te girtine. Heke wisa tu serhildaneke bêyî amadekarî bikî, tuyê bikevî. Weke din tu rêkên vê yekê nînin.

Heke tu egîdî, li ber xwe bide, lê tuyê bimirî.

Heke tu birevî bireve. Her wiha piştî ku tu reviyayî bi şûn de jî rêka te dibire. Ev her rastiyên mezin in.

Ev rastiyên mezin in. Me bi evîneke mezin, firsend û derfetan ve şûr girtiye.

Erê şûr, wêrekî û dilekî mezin dixwaze. Lê piştî bêçareyiya mezin, tenê tiştê ku tu bigrî destên xwe şûr û çek e. Me jî ev girtin. Her yek ji me li aliyekî bimire jî, derbeyên me zêde bi hêz nebin jî, dîsa em dê her tiştî bi şûr pêk bînin.

Me xebatên xwe domandin. Min li ser vê yekê amadekarî kirin. 15 Gelawêjê di dîroka Kurdan de bû gaveke mezin. Em çiqasî pê hiziriyan, me çawa plan kir û me çek çawa girt? Di aliyê siyasî û leşkerî de divê gelekî li ser were

rawestîn. Lê ez dîsa jî dibêjim: ji bo çi, me dixwast bi şer emê çi rizgar bikin? Min gotibû, ez her dixwazim pêşiya xwe azad bikim.

Min rastiya xwe diyar kir. Ez li ser vê rastiya xwe dijîm. Rastiya min rastiya welat û gel e. Bila dilê we azad bibe. Bila tu kes bi xirabiyên xwe ve bi min re nelêyîze. Bila tu kes ramanên xwe yên paşverû û zora xwe li ser min nesepîne. Ji bo welat ez çiqas bibêjim û nebêjim jî.

Hevalbendiya xwe bi pêş bixin. Dostaniya xwe bi pêş bixin.

Û ev gelê me ye. Bêyî vê jiyana me nameşe.

Heke kar, armanc û hedefa xwe wisa nekim, pênc qirûş nirxa jiyana min nabe. Di encam de karê ku me kirine em dikarin wisa rêzbikin.

Lê dîsa jî bes nake.

Di zaroktiya min de, hemû kevir, herî, êzing, civîk, mar, yek bi yek darên welat, hemû tên bîra min. Her yek ji wan hevalê min bû. Her keskahiyeke wê, her avek û civikeke wê di bîra min de ye. Divê mirov li ser xweşikiyên welat raweste. Li hember welat deynê me ev e.

Li ser faşîzma ku li welat didome rawestin.

Gelek gundiyên me, cîranên me, hemû gund wisa dihizirin û wisa dibînin. Lê xwe ji wê rewşê xelas nakin, ji destên wan diçe.

Tê bîra min, dema ji welat diqetiyan û diçûn, welat ji bîra dikirin. Ev yek tê bîra min. Hemû diçûn bajarên mezin ên Tirkiyê.

Kurdan hemûyan wisa kir. Yanî bi xwastekên xwe ji welat reviyan. Min bi çavên xwe dîtin, yekîne bi yekîne direviyan. Dema te welat dianî bîra wan dilê wan li hev diket. Agir bû, dişewitand diviya ku bireviyana. Digotin, “di nava wê de tu tiştek nîne.” Edene, Stenbol Almanya... hetanî niha jî ev yek wisa ye.

Ez li vê derê rawestiyam. Çima ji bo welat reveke xirab be? Min ji xwe pirsî. Temam Stenbol, Enqere baş in, ez jî dixwazim li van deran bijîm. Min welatên biyanî jî dîtin. Ji xwe re welatên weke bihuştan çêkirine.

Piştre min got, “misoger giyana min vê yekê naxwaze.”

Min ev yek tespît kir. Weke ku min gotiye, ji bo me bû siyaset. Em çiqas li wan welatan bimînin, ewqas me dixin. Derveyî vê tu li welat û jiyanên kesên din dinihêrî; pêşketîne, xweşik in. Tu li gundê xwe, malbata xwe, keç û lawên gund temaşe dikî, hemû ketîne. Kurdek reviyaye, hemû ciwan, rewşenbîr li dûv wî reviyane. Ji sedî sed pergalê çi kiriye, ew jî wê dikin. Piştre Ewrûpa derkete pêş. Çavên hemûyan li vir beloq bûn. Ev hemû rewşa we hemûyan e, hun nikarin înkar bikin. Kesê ku van înkar bike, xayinê herî mezin e. Tu ji pergalê, welatê wî, jiyana wî hez dikî. Baş be, xirab be, mafê te hebe tunebe tu jê hez dikî.

Derveyî vê yekê hindek tiştên din jî hene.

Heke tu jiyaneke wisa saz bikî, tuyê carekê binêrî ku tu jî weke wan lê hatiyî. Ji dîroka netewa xwe û jiyana xwe direvin. Dibêjin, "Kurdeyetî şerm e."

Tê bîra min di zaroktiya xwe de min digot, "xweziya ez ne Kurdekî wisaba ma." Ez ji malbateke pir bêtalih hatime, gelo koka min xwe dispêre Kurdan? Min ev yek lêkolîn dikir. Ez dihiziriyam ku koka min jî bigihije ya Tirkan, piştre min dît kesekî ku wisa bihizire dê bikeve. Bêguman pirsgirêk firotina mejî, giyan û ramanan e.

Li pêşiya çavên min, ji hevalên min ên zaroktiyê ve bigre her kes direviyan. Tu kesî ji bo rastiya welat, li ser aştiyê, li ser jiyanê nedigot, "ev çawa ye."

Bi ew rewşa xwe ya zaroktiyê, wê demê ez dihiziriyam ku ev qetînên ji vî gundî wisa ne ji xêrê re ne. Ev yek weke qutbûyîna ji hevalekî xwe yê, "xizan, hêjar, belengaz û bêçare bû." Divê wisa nebe.

Divê wisa nebe! Dibe ku, tu kesê wê tunebe, dibe ku ne cihekî zik têrkirinê be jî, dibe ku weke jiyana biyaniyan û metrepolan rengûreng jî nebe. Lê ez tam li vê derê rawestiyam û min xwast ez hindekî dadwer bim. Çima wisa bi hêsanî ji kalik, bavik û dayîkê qutbûyîn çêdibe, bi biçukditînî dev jê berdidin? Hema xirbeyên van gundan hatin bîra min, gur, civîk, mar û mişkên wir hatin bîra min. Heke mar û mişkek be jî şayişa qutbûyîna ji wir hate hişên min. Bi hesteke ku civîk bi tenê diman em ji wir diqetiyan. Û di her vegera me ya wê derê de, me bi eciziyeke mezin

têkîlî rabere cih û warê bav û kalan dikir û di dema veqetîna xwe de jî em xwedî helwesteke nerihet bûn. Diviya ku wisa nebûya. Ne tu bi şer dizanî, ne jî tu dikarî bikevî nav de. Di nava duseriyeke rastîn de sekinîn mijara gotinê ye. Çiqas cih, jiyan û aliyên hezkar ên biyanî û dagirkeran hebe jî, tu nikarî bi tevahî ji wê derê qut bibî. Û vaye ev yek, te bi ser şoreşê ve dibe.

Û vaye ev yek te bi ser şoreşê ve dibe, dibe lêgerînek. Ramana şoreşê dibe şerê vî yê rêxistinkirî.

Me wisa dest bi vê şoreşê kir.

Tê bîra min, em bi nîşana ciwanmêrekî Filîstînî derbasî nava sînorên Libnanê bûn. Meseleya tenê bi nîşana destan bi rê ve çûyîn çi ye? Di vê derê de wateya rojên tên derbaskirin çi ye? Meşeke tarî yê. Lê dîsa jî girêdana bi rojeke qels ve û jiyankirina rojekê mijara gotinê ye. Dîsa tê xwastin ku hindek tişt werin jiyîn. Mezinkirina hêviyê heye. Hesabeke wisa heye, ji bo gihiştina encamê sebir heye.

Hatina Beyrûtê, li wê derê xwe bi çend kesan ve girtin. Me hîna ji xwe re cih nedîtiye. Lê ji welat gazîkirina hevalekî, ji wî re cih dîtin, weke çalakiya rişt a yekem, pêtir xwe bi wate kirine... Em wisa ketin nava gelek hewldanan. Bi rojan, bireve vir, bireve wir, ev têkîlî, ew têkîlî, wisa me xwast em razînekê bi pêş bixin. Yekem car çûyîna Filîstînê, dewreyeke bi Kemal Pîr re bû. Ji zindanê reviyabû û dîsa bi ser welat de çûbû. Komeke me hebû. Bi wî re tê xwastin ku ji 12 Rezbera wê demê hindek tişt werin xelaskirin. Ji bo nasnameyekê, ji nû ve gihiştina tixub, ji bo derbaskirina tixub.

Ma erdên mirinê, erdên mayînan dihatin derbaskirin, ma kî dixebitiyan? Şehît hebûn?

Ji beriya salan demeke berbangê bû. Lê rasthatî wê rojê ez zû şiyarbibûm. Bi merşan min hatina derbeyê bihîst. Hêza di destên me de jî ji bermayiyên şûr pêkdihat. Komeke wisa bû ku, hîna rast û dirûst xwe bi cih nekiribû. Jimar an 20-30 kes hebû yan tunebû. Me wisa li dijî 12 Rezberê dest bi berxwedanê kir. Cihê ez lê dimam jî tê bîra min, li ser somyeke hişk me betaniyek rêxistibû. Qaşo biryargeha şer bû.

12 Rezberê.

Dema ez di demjimêra pêncê sibê de bi merşan şiyarbûm, hatina rejîmeke nû ya bi ser me ve weke duh tê bîra min. Li maleke ku şehîdê me yê birûmet M. Saît Ethem Akçam girtî de, me textek û naylonek kirîbû. Maleke veşartî bû. Erê faşîzmê xwe li ser me disepand. Me jî xwe wisa girt. Mirovek çiqas di tengasiyê de be bila bibe, dikare jînê bi pêş bixîne. Salên şer ên herî bêyî eman ve wergerand romaneke zindî.

Îdîa çibû? Faşîzmê digot, “ezê te weke ku tu careke din di nava mirovahiyê de nefes negrî, biqedînim.”

Em çawa dikarin vî dengî ji bîra bikin?

Çiqas biryareke zalim e. Vê faşîzmê weke ku tu caran navê me qebûl neke, bi biryareke wisa ve dixwast me tune bike. Ez çawa xwe li ber negrim û ber xwe nedim?

Min kêm jî, xwe li ber girt û li ber xwe da.

Di salên 1980’an de dewreyên perwerdeyê hatin pêşvexistin û cih hatin girtin. Û mirov dikare bibêje ku, ev sala min bi piranî li Libnanê derbas bû. Di bin rêbertiya Kemal Pîr de me komeke ji 30-35 kesan rêkiribû welat, hindekî rola xwe lêyîst. Erê em wisa bi xebateke bingehîn ketin salên 1980-81’an.

Di zîndanê de heval di bin îşkenceyên giran de bûn. Weke ku baş tê zanîn xiyanet jî hebû. Pêvajoya xiyanetê dest pê kiriye, bi sedan heta bi hezaran kesan digre bin bandora xwe. Mistek heval ji bo ku şanaziya mirovahiyê nekin bin piyan, bi hewleke dawî canê xwe dadinin holê û li ber xwe didin. Li çiyê jî hindek komên me yên ku li ber xwe didin hene. Û ya esas jî em li vê derê şerê berdewamiya partiyê didin. Weke ku tê zanîn di sala 1981’an de konferansek hate li darxistin. Ev yek ji bo pêtir bi rêkûpêk bi serveçûyîna kar ve ye.

Di dîroka perwerdeya me de 1981 xwedî rol e. Bi jimareke nêzî 300 kesan ve em dixwazin perwerdeyê pêşve bixin. Û dema em hatin dawiya 1981’an hêdî hêdî em berbi biryara çûyîna welat ve diçin.

Di destpêka 1982’an de destpêk dîsa li Libnanê çêbû. Me hîna zêde dest neavêtiye welat. Di vê derê de hîna cihê me

nîne. Ev yek di sala 1982'an de pêş ket. Di destpêka 1982'an de em hindek koman rêdikin welat, lê em hindek koman jî ji wê derê digrin. Me kongreya 2. jî di sala 1982'an de bi cih kir.

Esas hemû tiştên ku me dixwast em di van salan de bikin, pêşgirtina qutbûyîneke dîrokî bû. Di dîroka gelek gelan de, ev hovaniya sîstemê ev gel weke ku tu carên dîtir li xwe venegerin qut kirine. Ya li me dihate sepandin jî ev yek bû. Esas di cihekî de dê 12 Rezberê dawiya Kurdan anîba. Me ev yek fêmkiribû. Bi bihaye çi dibe bila bibe, zêde ji welat ne qutbûyîn û heke gengaz be vegera welat armanca me bû.

Qetîna bi hezaran salan a ji axên bav û kalan, dibe ku ji bo kesekî ketûber zêde xwedî wate nebe. Vaye jîna Ewrûpayê tê zanîn, hemû zarokên înkarê ne. Lê dema carekê ketin, li mînaka Cuhiyan binêrin, 2500 salan berê ji welatê xwe qetiyane, niha dewlemendên cîhanê ne. Lê dema tên axa Filîstînê, (axên wan nîne, ji zû ve bûye ya gelê Filîstînê) erdê maç dikin. Welatê me di pirtûkên pîroz de weke bihuşte tê binavkirin. Weke ku em bi hev re di pêşbirkê de bin em ji welatê xwe direvin. Di van salan de kesekî herî hêjar û xizan jî ji bo xwe bigihîne Ewrûpa yan jî metropolan hebûn û tunebûna xwe difirot. Hindekan ji ber çewisandinê, hindekan ji ber hêviyên xapînok ên sîstemê ev sal wisa pêşwazî kirin. Ev yek dîaspora ye, belav bûne. Belavbûna fizîkî, giyanî û ramanî jiyan kirin. Divê belkî welat xirbe û dojeh e! Birevin ha birevin!..

Bêguman di van salan de ji xwe direvin. Xwe lenet dikin û direvin, karê hiş û mejî nîne! ez dikarim bibêjim ku, aliyê min ê herî baş, neqebûlkirina dilê min a van tiştan û li hember vê berxwedayîn e. Belkî me nikarîbû em xeta berxwedanê li welat bigrin, lê me li Rojhilatanavîn di qada şerê germ de girt. Û di encam de kokê dîsa xwe bi axê ve girêda. Bêguman ev bûyereke mezin e.

Bi derbeyeke piçûk kom diqulibe, partî diqulibe, gel diqulibe. Ma tuyê bi çi ji piyan bimînî? Hiş û dilê Kurdan jixwe naxebite. Weke ku ez dibêjim mîna ku ji dojehê birevin direvin. Hişên hevalên li gel me li cihên dîtir in, tenê laşên xwe li gel me ne. Ji aliyekî ve jî provokasyon tev dide.

Me ev sal bi hewlên veguherandina pêngavên li dijberî vê rastiyê, bi dahûrîneke rika mezin, ne dûrketina ji welat û heke gengaz be bi vegera li ser welat re me derbas kir. Min wisa nirxand û ez bi ser de çûm. Weke ku tê zanîn, me hindekî ev yek bi ser xist. Bi 1982'an re me dest pê kir ku em koman rêbikin Botanê. Provokatorên sereke wê demê digotin, "em yekî jî rênakin Botan û Colemêrgê." Hîna felsefe û hewlên vê provokasyonê li ser vê bingehê ne.

Min ji jinê hîna têkîliyên xwe nebirîne û ez bangî wê jî dikim. Rexmî ku însyatîfa min pêşketiye û derfetên min ên li dij derketinê pêşketine, dîsa jî hetanî dawî xwedî rêgez tevdigerim û girêdayî me. Lê ez pîvanên şoreşgeriyê jî bêyî eman disepînim. Hawirdor hatiye guhertin, min lingên xwe hindekî din danîne cihekî zexm. Ez tundtir tînim ser ziman û baştir xebatên rêxistinê bi rê ve dibim. Lê di vê pêvajoyê de jin jî vala ranaweste. Di heman demê de bersiv dide hemû pêşveçûyînan. Misoger çiqas tedbîrên ku min girêbidin hebin, wan hemûyan digre. Lê weke Enqere û Amedê dîsa tu kontrola wê ne mijara gotinê ye. Beyrût misoger vî şensî nade wê. Beyrût bêyî erka dewletê yê û bi tevahî dibin erka Filîstîniyan de ye. Ez jî hetanî dawiyê têkildar im. Dewleta Tirkan jî hîna bi Filîstîniyan re têkilî saz nekirine.

Bi ser de çûyîna Bakurê Kurdistanê, li gel perwerdeyeke girîng a leşkerî, di heman demê de bi jiyîna perwerdeya kadroyî û pêşveçûyîna kadroyî ve pêk tê. Di vê navberê de navîneke provakator heye û bi devekî bêyî eman dibêje, "ji bo Colemêrgê gav nadin avêtin." Ez bawerim hindek kesên cewaz ên ji tevgera dewletê bûn. Li gel giraniya tirsnak a bi ser de çûyîna welat, kêmanî hene. Hevalekî herî xwedî niyeta paqij jî dibêje, "em herin firokekê birevînin, hevalên zîndanê rizgar bikin û pêşiya bi dardekirina wan bigrin." Lê, deh firokan jî birevîne, ne gengaze ku yekî jî xelas bike. Yên din jî xwedî lewazî ne. Zilam derketiye Ewrûpa bangawazî dike, "werin Ewrûpa jiyan hetanî dawiyê vekiriye!" Ez ji bo peydakirina nasnameyekê xwe diavêjim holê; ji bo xwerinekê, ji bo malekê hewleke mezin raber dikim. Tu nabêjî, zilam tumbelekê lê dixe û bi keçan re dilêyîze. Dîsa jî

şensê jiyandinê heye. Li her cihê ez diçim dibêjim, ewlekarî, derfeta perwerdeyê, piştre hemû tê valaderxistin.

Jin bi teşeyekê, Semîr bi teşeyekê û di dawiyê de şerekî sexte didin destpêkirin. Dixwazin min li holê bihelînin.

Komek ciwanmêrên tolaz û keçên tolaz tînin malê û Semîr bi wan tumbelekê dide lêdan, strana, "çi jîneke xweş e!" dide gotin û piştre dibêje, "bila Serokatiya Partiyê ji me re li tenişta behrê çend malan bigre." Gelek hevalên me yên weke Cuma jî hene. Heta ez bawerim hevalê Fuat di li mukirhatinên xwe de gotibû, "ma ji zilamekî weke te zewicî re, ma li serê çiyê bêyî betanî razandin dibe? Ji Fuat re misoger li tenişta behrê lojmanek pêwîst e." Semîr li ser vê bingehê Fuat gur kiriye. "ma ne şerme zilamekî weke te zewicî wisa dijî?" jinê wisa gur dike, wî wisa gur dike û vaye weke ku bixwe vedibêje, hişên Fuat ji serî çûbûn, qet nedixebitiya. Dîsa nameyeke ku Semîr bi xwe nivisandibû hebû: digot, "ji çaran sê beşên binke bi min ve girêdayî ye." Ev yek rast bû jî. Bi dizî kar kiribû, lewaziyên kesan xwendibû. Wê demê ji milîtanê me yê herî xurt re rêka jîna derew raber dikir. Dibêje, "berde êdî vê berxwedanê." Û Fuat jî gelekî bûye dîlê hestan, tam nebe jî, ketiye rewşeke serûbin. Semîr, ha wî tehrîk dike, jina wî Seherê tehrîk dike. Ez bawerim birayê Seher, Yildirim heye di hundir de. Têkîliya Yildirim a bi dewletê re bi beşeke mezin hatibû fêmkirin. An jî li ber fêmbûnê bû. Semîr ji Fuat re dibêje, "tu jî dikarî bibî rêber, wisa jiyîn mafê te ye jî." Her du jinan (Seher, Fatme) tîne dijberî hev. Bi vê têkîliyê ve spartî dixwaze Fuat bîne dijberî me. Bêguman ez bi vê yekê hesiyam. Min ji Fuat re got, "tu hişdar be, tevlî pêvçûyîna van nebe. Di dîtinê de bi hev re şer dikin, lê di puxte de bi hev re dibin yek. Em neyên lîstokê." Bêguman hevalê me ye. Zêde xwedî rêxistin û encamgir nebe jî, hema zanîbû xwe li me bîne. Zêde nebû amrazê şerê van jinan. Lê moral û hestên wî serûbinê hev kirin an jî xwastin xirab bi kar bînin.

Çû Ewrûpa li wê derê jî heman tişt meşand. Me carekê dît rêxistin ji dest diçe. Bi rastî jî dê rêxistin hîna di sala 1982'an de ji dest biçûya. Zilam bi ser xistiye him jî bi lihevanîna milîtanê me yê herî baş. Çima?

Vaye dîsa hindek zor û zehmetiyên jîna şoreşgerî hene. Pêvajo dîrokî ye û misoger divê were têperandin. Ez vê yekê temsîl dikim. Ew jî dibêje, “na, divê yek kes jî neçe Colemêrgê. Dem ne guncaw e.” Piştre me dît ku, ev yek bi tevahî plana dewletê ye. Di meclîsa Tirkiyê de hatiye gotin, “ev kar diqede. Heke bikeve Colemêrgê em derbeya herî mezin dixwin.” Zilam vê fermanê pêk tîne. Û ji bo wê jî dibêje, “li Ewrûpa bijî”, li vê derê bi firaxan dumbelekê dide lêdan û gelek kesan jî, ji vê yekê re dike amraz. Jixwe di giyana xwe de kesê carekê ji vê re bibe amraz, careke din bi hêsanî bi ser xwe ve nayê. Kesê ku ji vê re bibêje erê, vê yekê pesend bike careke din bi ser xwe ve nayê. Wê demê Dawidek hebû, Şoreşek hebû. Ji van yek teorîsyenê me bû, yek jî milîtanekî me yê herî baş bû. Destgîrên herduyan hene, got, “em wan derbixin Ewrûpa.” “ji bo derxistina Ewrûpa em di kongreya 2. de piraniya navendê bi dest xwe bixin, heke em piraniyê bi dest bixin, emê bibin hêza biryarê.” Vaye li gor van biryaran dê çûyîna welat çênebe û derketina Ewrûpa were esasgirtin. Wê demê Dev-Yolê wisa kiribû, bi wan re bûye yek. Esas ev biryareke dewletê ye. Tê gotin, “ji bo wê dibê em kongreyê bi dest bixin, em hiş û eqlên van milîtan û şervanên ciwan tevlîhev bikin.” Vaye ew meseleya ji çaran sisê jî wê demê derkete holê.

Yek jî birayê Hakî Karer gewedê Silêman hebû. Piştre MÎT ê şandiye û gotiye ku, “herin tola birayê xwe ji Kurdan an jî ji komê bigrin.” Kesekî bi teşeyê hatiye xapîn. Ev hemû wê demê PKK ê felç dikin. Konferansa 1. û Kongreya 2. bêbandor dihêlin. Bi perwerdekirina kadroyên nû em çiqas dixwazin hindek tedbîran bigrin jî, nahêlin. Her tişt ji hev belav kirin.

Bêguman em jî di cihê xwe de giran in. Em hindekî dixebitin. Li gor me ya esas şoreş û welat e. Di encam de me dît ku zilam bi me re şer dike, gelek tişt birine. Nîvê binke jixwe ketiye rewşeke nexweş. Jixwe gotineke wî yê dîtir jî wisa bû: digot, “vê carê yên ku diçin welat piraniya wan xwedî hişên şêlû ne, bi vê hişê tu nikarî wan bidî şerkirin.” Piştre min lê temaşe kir ku ev gotina wî jî rast e. Ji sedî nod hişê binkeya me şêlû kiriye; gewed, bi meseleyên ji rêzê ve

ew mijul kirine. Yên ku nexweş bin, tevlîhev bin ma dikarin şer bikin? Û ji wê binkeyê tu xêr nehat.

Rexmî vê yekê dîsa bi sebreke mezin min sala 1983'an derbas kir. Wê demê pirtûka bi navê "pirsgirêkên me yên pêşveçûyînê û peywirên me" nû derketibû.

Sala 1982'an saleke girîng a veger û pêngavê ye. Di nava vê salê de min dahurînên berfireh kirin. Çi "pirsgirêka kesayetê dibe", çi jî pirtuka "zorê" dibe dîsa "rapora polîtîk" û weke vê li ser rêxistinê bingehê gelek pirtûkan û temamkirina wan di nava vê salê de pêk hat. Di pirtûka zorê de çima pêwîste ku em li ser dijwariya şoreşgerî rawestin, ji bo peyitîna vê me ji hezaran çeman av berhev kir û hewl da ku rave bikin. Pirtûk li ser rêxistinê wate û girîngiya rêxistinê bi hemû aliyên xwe ve derdixîne holê. Rapora polîtîk nirxandina 12 Rezberê çêdike. Xebata li jor behs kiriye, bi sergotara pirsgirêkên pêşketinê û peywirên me jî, di sala 1983'an de li hemberî provakasyonên min bi pêş xist. Kesayeta xwe disepîne, li hember tekoşînê oportonîzmê û nêzîkatiyên rêka navîn disepîne, tên dîtin û ev xebat hewl dide ku vê yekê binirxîne.

Dema em tên dawiya salên 1982'an dîsa ev komploya nîjadperestiya paşverû (di bin seroktiya Şahîn Kilavuz de tevkujiya komeke me ya ji deh kesan) derveyî vê bi giranî me vegera welat dabû pêkanîn. Her çiqas di sehaya Libnanê de çalakiyên me hebin jî, bi giranî me kişandibûn kûrahiyên welat.

Zivistana sala 1982 bihara sala 1983'an di vê wateyê de li Kurdistanê em dikarin dest bi pêngaveke nû bikin? Bi bersivdayîna vê pirsê re derbas bû. Hêz derbasî welat hatiye kirin. Lê mixabin pêngava ku em dixwazin hîna di sala 1983'an de me nedaye destpêkirin. Diçin mala axê yan jî ya mixtar bi erzanî dikevin dest, nebesiya taktîkî her ku diçû xwe eşkere dikir. Xwe bi duvikên nîjadperestên paşverû re dizeliqandin û nedixwastin qut bibin. Bêguman piştre girêdanên van hemûyan jî dê bi dewletê re eşkere bibaya. Li Colemêrgê rewşa nepêkanîna çalakiyê hebû û hetanî niha jî bandorên wê hene. Rexmî vê yekê lezandina gavavêtina me ya pratîkî, him di aliyê pêşvexistina qadê de xebatên me

hene, provokasyonê jî xebatên xwe zêde kirine. Di sala 1983'an de xwe eşkere kiriye. Xwe dispêrê Ewrûpa û hindek bermayiyên rêxistinên weke Dev-Yolê re hevkarî dike, dîsa xwe dispêre emperyalîzmê. Bi taybet jî tevgera em dibêjin bi rêveberiya Semîr pir zêde bi paş ve dikişîne. Heta îdîaya wan, qasî ku êdî PKK nevejene, binaxkirin û tasfiyekirin bû. Vekirî derbasî êrîşê dibe. Pira ku desthilata ji bo nevegerîna welat firandibûn, dema me dixwast em ji nû ve sazbikin, ew jî ji piştre derbas dibe. Pêwîste mirov vî şerî wisa fêm bike.

Heke pêngava sala 1983-1984'an wisa lewaz pêşketibe, para provokasyona Semîr belkî ji sedî pêncî zêdetir e. Weke encam di pêvajoyên piştre de em girtin dijberî xwe û me xwast em wan çareser bikin. Hemû Ewrûpa bi ser me de hat.

Yek jî dê PKK di vê demê de bihata bidestxistin. Ji çaran sisê hatibûn bidestxistin, dixwast min jî bi dest bixe. Çawa? Fuat vedibêje, ji Fuat re dibêje biçe, yekî din bi navê Diyat hebû, ji wî re jî dibêjin di derbarê parvekirina PKK ê de em li hev bikin. Parvekirin çi ye? Li dijî şoreşê biryar derxistin. Dibin rênîşanêriya dengdanê de sîstemeke bênav a dengdanê tê pêşvexistin. Li niyetê binêrin! Û hevalê herî baş ji vê re dikarin bikin amraz.

Tiştê ku ez dixwazim bibêjin ev e, her salê niyetên desthilatdaran ên bi vî rengî hebûn û Semîr pisporekî pir baş perwerdekiribû. Pisporê bi destxistina PKK ê. Li gor min hetanî salên 1982-83'an ew peywirdar bû. PKK a ku derketibû derveyî welat, pisporê nevegerandina wê ya nav welat bû. Pêwîste ev yek biçuk neyê dîtin û gelek kar jî bi ser xistin. Di encamê de tekoşîneke me ya pir berfireh jî heye. Di serî de wê demê li Kurdistanê pirsgireka kesayetê û pirtûka taybetmendiyên milîtanên şoreşger hatin nivisandin. Ew nivisandin li hember kesên ku dixwastin vegera welat asteng bikin hatin nivisandin. Dîsa kesayetên milîtan li hemberî têgeha ku dixwaze bi kesayeta milîtan bilêyîze hate nivisandin. Li ser vê yekê jî rojane qasî qiyametê hewlên me yên pratîk hene.

Çi pêk hat? Di encamê de me karî em komê bikişînin hundirê welat. Lê bi gotina Semîr di rewşeke tevlîheviya serî û felc de, ji vê yekê kî berpirsyar e? Ji vê yekê milîtanên me

yên herî ji xwe bawer vaye hevalê me yê Fuat jî di vê rewşê de ye. Çima ji vê re destûr nîşan da. Hevaltiya min bingeh nagre. Hemû hewldanên min naxweze fêm jî bike. Bi jinekê re derbasi têkîliyê bûye, belkî jî hebûn û tunebûna wî jî ew jin e. Dirûst e, girêdayî ye, lê dilê wî ji dest çûye. Mejiyê wî ji ya xwebûyînê derketiye.

Min vegot, yek jî Şoreşek hebû. Ciwanmêrek û yekem zilamê ji me re çalakî pêk anîbû. Di sala 1977'an de di çalakiya bi destên xwe kirî de 300 hezar TL anîbû. Ciwanê ku ew dirav radestî me kiribû. Rewşa wî ya têkîliya bi keçekê re hebû. Got, "ez naçim welat." Xwe sepand û avête erdê. Gelek lîstokên nexweşiyê kirin. Ez bawerim herî dawiyê heval Egîd tê tixub û ev dibêje, "heke ez bimirim jî, ez nakevim nava tixub." Li wir hevalê Egîd wî dide ber guleyan û ev biryareke di cih de ye. Ewqasî Semîr ew perwerde kiriye. Zilamê ku ji xwe re kiriye ling, yek jî ew bû. Jinek hebû, ew jî perwerde kiriye. Li Ewrûpa serê xwe bi rêka wê keçê bi kar tîne, mixabin hevalekî me yên bi navê Şah İsmaîl ku em gelekî pê bawerbûn, bi rêka wê da revandin. Hemû hewldanên wî bi teşeyê zêde zerardayîna PKKê bû.

Ev ne vegotinên ziwa ne. Ez van çima dibêjim? Da bidim diyarkirin ku, hîna di sala 1982'an de xebatên rejîmê qasî ku bikaribin serkeftinê bi dest bixin bi bandor bûn.

Ev li gor ku tê hesibandin tekoşîneke hîna mezintir bû. Zilam dikarî bi ser bikeve û di salên 1982'an de PKK ê tune bike. Biryar bi xwe ew bû. Zîndan hatiye tunekirin û ji zîndana Amedê nûçeyên ji hezar kesî zêdetir berbi li xwe mukirhatinê ve diçin, ji me re tên. Jixwe piştî berxwedana Mazlum wan berxwedana Kemal û Xeyrî wan jî ji bo rawestandina vê leneta mezin e. Jixwe Kemal dibêje, dîsa şehîd Ferhat ew hene dibêjin, "ji bo rawestandinê derveyî xwe şewitandinê weke din tu çareya me nîne." Mazlum dibêje, "di Newrozê de wisa xwe gihandina şehadetê wêdetir tu çareyên me nîne." Yên din jî dibêjin, "derveyî rojiya mirinê çareya me nîne." Hundir wisa ye. Heke bal bê kişandin, di sala 1982'an hîna me gav neavêtiye çiyê. Li vir Semîrê provakator jî her weke ku hemû binke bi dest xistiye

bi Ewrûpa ve dide girêdan. Bi hêza xwe ji bo ku bikaribim gavekê bidim avêtin, qasî qiyametê hewl didim. Erê tenê bi serê xwe, xwe ji wir biaveje wir, ji vir biavêje vir, ku bikaribim berê PKK ê bidim welat û çend koman bi zexmî derbasî welat bikim. Çîrok ev e... Lê milîtanê herî xwedî bawerî jî nikare xwe biparêze. Heke di wê demê de milîtaniyeke ku van hewlan bi wate bike hebûya, me dikarî ji beriya 1985’an ew desthilat ji wê derê biavêtibana. Hun dê bibêjin, ma milîtan li ku ye. Milîtaniya ku nikare xwe ji amrazbûyînê xelas bike, bûye kesayeta bingehîn.

Em dixwazin pêngava 15 Gelawêjê bidin çêkirin, heman nexweşî xwe digihîne wê derê jî. Navenda me pêkanîna peywirê li aliyekî bihêlin... li başurê mezin pêngaveke ku Ebbas ew tê de bûn hebû. Ketin nava kêmaniyên mezin. Bi vê teşeyê bi tenduristî ne destpêkirina 1984’an, heke dest pê bibejî nedomandin û rewşa navlingiyê her domandin.

Ez hîna xwedî guman im. Ji bo vê têkîliyê (bi taybet di welat de) min dît nakeve bin kontrolê, min jin dîsa kişand qada xwe. Çûbû Ewrûpa. Me ji Ewrûpa kişand. Ew der felç kiriye. Me xwast em bidin nava pêngava dîrokî ya 15 Gelawêjê (tebax), ew der jî felç kir. Ev enî me dê di 15 Gelawêjê de îlan kiriba. Vê jinê ne belavoka xwe nivisand, (ku bi fermana wê bû) ne jî da nivisandin. Di encam de eniya bi îlankirineke bêtendurist re rû bi rû ma. Ez bawerim wisa bi hişên gelek kadroyan ve lêyîstiye. Bi milîtanan lêyîstiye, bi jinan lêyîstiye. Di encam de weke gavavêtineke li gor xwasteka me nebû. Pêşveçûyîna wê pêngavê jî bi watedarî nehate domandin. Heman tahrîkgerî. Bi hemû hesasiyeta xwe ve me xwast em girêdayî bimînin, me careke din bangî wê kir û diviya ku êdî berbi encamê ve biçuba.

Dîsa em bi heman kesayetê ve rû bi rû ne. Piştî pêngava 15 Gelawêjê me Mijdara 1985’an jiyan kir. Him jî dixwast têkîliya me ya biçuk a bi Suriyê re biderizîne, rê li pêşiya nebicîhbûnê vebike yan jî dibêje, “rêber ez im, têkîlî dikare bi min re were sazkirin. Û dixwaze kar bervî mezhebgeriyê ve bibe. Ez bawerim dixwaze di vê derbarê de gelekî gavan biavêje. Pêngava 15 Gelawêjê di 1985’an de li welat li ber têkçûyînê ye. Em dixwazin li vê derê pêngavê xwedî bikin,

bi zehmetî dixwazin bispêrin hindek têkîliyan. Divê ji nû ve em wargehekê saz bikin. Akademiya me ya heyî vê carê li gor ku misoger bibe ya me divê em sererast bikin. Firsend nade wê yekê jî. Çû wargehê û hemû tedbîrên bi karneanîna wargehê bi cih anîn. Me hindek milîtanên nirxdar rêkirin. Mînak Abdulah Ekinciyek hebû, ew dibir bi berbi xwe kuştinê ve. Li derûdora me qaşo Cemalê kor û Cemalê terzî hebûn. Mehekê bi wan re di têkîliyê de ma. Dîsa bi gelek hevalên girêdayî re, heta bi biraderê me re jî lêyîstiye û min carekê dît ku şarezayiyên afirêndêr ên hemûyan hatine birîn. Heta gelek hevalên me hatin rewşa bêfêmkariyê. Weke ku min gotiye, tehrîkên wisa di wê wesfê de ne ku, dikarin têkîliyên herî bingehîn jî bihejînin. Bêguman ev hemû jî bi şêwazeke pir zirav dilêyîstin.

Emê bikevin nava amadekariyên Kongreya 3. Cara yekem em pêwîstiya dahûrînên kesayetê dibînin û bi taybet têkîliya jinê êdî em dixwazin rasterast dahurînin. Ev pirsgirêka ku bi salane ez pê ve mijul dibim, em dikarin çawa bi encam bikin? Bi taybet weke jinekê dê biçe ku derê?

Me di hevdîtînên xwe yên dawiyê de ev nîqaş pir vekirî kirin: “tu qet naşipiye Ebûbekir. (N.U.’yek heye) tu qet naşipiye wî, terzî Cemalek heye, Cemalekî kor heye, nizanim Ebbas heye, ev heye... tu naşipî tu kesî. Tu kiyî? Weke zilamekî vaye İbrahîm Tatlises derketiye, gelo ma tu dikarî bibî Îbo?” Na! Rewşa min naşipe ya tu kesî. Erê, dewsa ku ez ji wê re bibêjim, “tu çiyî, ka derkeve holê!” ew radibe ji min dipirse, “tu kesekî çawayî, tuyê derkevî holê!” Bêguman ez van hemûyan bêyî ku ez xwînsariya xwe wenda bikim dixwazim. Ez dibêjim, “tu xwe dixapînî.” “tu nikarî bi pêkanîna ev çeka jiniktiyê ve min binî rêkê. Yanî te xwast tu zayendîtiyê weke çek bi kar bînî û min raber kir ku ezê dijberiyeke dijwar nîşan bidim, di dîtinê de be jî ezê demeke dirêj bi te re biborînim. Sebra min gelekî mezin e. Vê yekê bûyera Gandhî anî bîra min. Ez ewqas sebirdar dibim. Di aliyê zayendiyê de jî, ez dikarim li ser xwe desthilatdar bim, ez wî hesabî nakim. Lê dê ji bo gelekî xirab bibe. Heke dirûstiya te gengaz be, dirûst be, yan jî dê dawiya te xirab

be. Tu nikarî wisa derbikevî pêşberî mirovahiyê." Ez bawerim ev axaftina dawiyê bû.

Piştre derket. Derketin bû ew derketin, çi dike? Qet girîng nîne, çi dike bila bike. Dixwaze bila me tune bike. Ev jî çareseriyeke mezin e. Yanî ya girîng sedhezar caran pejirandina min a mirinê ye.

Li ser vê yekê hema dixwazim vê bibêjim ku, li gel me ajovan hebûn. Jixwe tu hevalekî ku bandor nekiribû nemabû. Hemû biribûn hetanî zik êşê jî. Ez bawerim hevalê me yê Mehmet Saît li hember wê eşê li ber xwe neda û bi zik êşê şehîd ket. Hevalê me yê Abdulah Ekîncî xwe kuşt. Hemû mirovên gelekî nirxdar bûn. Ez bawerim ew tolazê me jî ji wê bandor bibû. Jixwe tolaz bi xwe dinivisîne. Ji bo wan belkî jî bandorbûyîneke ji dûr ve ye. Em bi şêwazeke bêeman şer dijîn. Vaye ji hevalên me yên ajovan yek jê Ferhan bû. Ew zarok bi teşeyên cuda bandor kiriye. Ferhat bi şayîş û bi xwîdan hat ev tişt gotin: "serokê min ev jin di derbarê te de pir xirab dihizire, pir xeternak e." Rojên çûyîna berbi Kongreya 3. bû. Wisa xwe dadiqurtand û radiwestiya. Digot pir xeter e. Ajovanekî me yê dîtir hebû ew jî reviya. Niha li ku derê ye ne diyar e. Encama ku min derxistiye, dihizire ku dê ji destên min xelas bibe.

Êdî berbi dawiya vê lîstokê ve tê û em berdewamiya tevgerê jî digrim zexmiyê. Sal 1986. Êdî dê karê wê xelas be, jixwe bi xwe jî hindekî hîs dike. Pir baş hîs dike. Ez bawerim komployek bû ku dixwast tê de pêş bikeve. Xwast vê komployê bi hevalên derûdora me re pêk bîne. Jixwe baweriya navendê dişehitîne, hişên wan tevlîhev dike. Belkî jî sedema bêberhemdariya wan ev e. Bêguman li gel vê yekê sedemên dîtirê jî hene. Li nêzî me ajovan hene, yên ku bi karê malê re mijul dibin hene. Ez bawerim tiştê ku di paşvemayîna wan de dibû asteng jiniktî bû. Bi lîstokên xwe gelek hevalên jin ên derûdora me bi kar anî û hîna li Beyrûtê gelek kes wisa xistin. Me dixwast em çend keçan, jinan peşve bixin, lê negengaz e. Her kesê ku em dest diavêjin, roja diduyan an dibe xulamê van an jî dibe qurbanê komployên van. Ne zilam dihiştin ne jî keç.

Bi derbeya xwe ya herî dawiyê re jî dixwaze wisa min bixîne. Bêguman zarok e, gelekî girêdayî ye, em jî xwedî rewşa berbi çûyîna encamê ve ne. Bi şayişane wisa li xwe mukir hat. Misoger xayinane dihizire, ku min neda vekirin. Çawa xayinane? Dê çawa hun bi kar anîbana? Encam me got em keçikê bigrin tecrîdê. Di hawirdora wargehê de tedbîrên wê hatibûn girtin, piştî tecrîdeke diyar me girt lêpirsînê.

Ji aliyê nîşandayîna çawaniya nêzîkatiya me ve ez dibêjim. Dihate gotin, “divê em cezayeke wisa bidinê ku di lêpirsînê de, di dadgehê de ji sedî sed biryara kuştinê be.” Ji bo ceza jî, “divê em çar hespan bînin, her ling û milên we bi hespekî ve girêbidin û berdin.” Zarok evqas hêrsdar bû. Lê gelekî jî jê bi bandor bibû. Bi wê wateyê ku, di bin hewlnakiya lîstokê de ewqas rê li ber hêrsê tê vekirin. Me dîsa tu tişt negot. Na, kuştin wisa bi hovane nabe. Berovajiyê vê em dîsa weke enîvanekê bigrin, heta em jê re rêka Ewrûpa vebikin. Çû Atîna yê. Li Atînayê jî ev hewlên xwe yên bêyom domandin. Çend hevalên dîtirê jî anîne ber deriyê xwe kuştinê. Hevalêkî me yê pir hêja M.O. dixe bin derûniyeke wisa ku, dibêje, “tu ajanî, gumanbarî, bireve yan jî bimire.” Ji ber ku ew jî milîtanekî pir teng e ji xwe re nade xwerin û xwekuştinê dicerbîne. Hevalekî me yê weke Ebûbekir heye, hîna dijî. Li ser wî lîstokekê dilêyîze. Dibêje, “ezê xwe ji qetê heftan ve biavêjim, ma ezê çi bikim.”

Hetanî dema dawiyê jî tehrîkên xwe didomîne. Me jî wisa berda. Herî dawiyê reng daye çapemeniyê, dibêje, “çima dernakeve pêşberî gel?” Ew provakatorê dawiyê Selîm Çurûkkaya dibêje, “misoger Apo tedbîreke wisa girtiye ku, dîktatorekî wisa ye ku, ne gengaze bi xwe bikeve vê rewşê. Em rûyê xwe derdixin û dikevin nava gel, ma ne cezayeke tirsnak e?” di dîrokê de ma rolê tu dîktarorekî wisa çêbûye? Vayê Fatmayê jî ev yek dizanî dernediket. Dibêje, “dîktatoriya mezin!”

Ya girîng rast bi dest girtina van encam e. Ev encam rast e û cezakirina herî mezin e. Ev yek ewqas jî girîng nîne. Piştre li ser vê têkîliyê gelek tişt hatin nivisandin, hatin xêzkirin. Bû dahûrîneke mezin a dewletê. Bû dahûrîneke mezin a Kurdistanê, zilamê mezin ê Kurd û jina Kurd. Vaye

weke ku hun dibînin, vê dahûrîna mezin rê li pêşiya şerekî mezin vekir û PKK ê ji vê yekê re hêz anî. Hîna kesên ku dihizirin şer dikin hene, lê tewereya (eksen) bingeh a vî şerî xwedî çîrokeke wisa û xeta pêşveçûyîneke wisa ye. Gelo ma çima ez wisa tevgerbûm? Ev tiştê ku em dikin çi ye?

Ma ev serhildanek e? Ma ev evîneke mezin e yan jî lîstokek bû? Şerekî mezin ê taktîk e? Jê re çi bê gotin bila were gotin, çîrokeke Kurdan a hizirmend û hêjayî encam girtinê ye. Çîrokeke Kurdan jî ne baş e gelo ma ev yek çi ye?

Dîrokê bi tevahî cudahiyek bi dest xist. Ji aliyê Kurdistanê ve destpêkeke gelekî cuda hate xêzkirin. Bû zêmîna herî zexm a dîroka azadiyê. Di rizgariya netewî de, di azadiya ciwakê de, ya herî girîng jî encam girtina ji dîroka desthilatdarên ku hezar sal mafê jînê nedane kes û kirûya Kurd e. Bi derfetên wan ji wan re helwesta sekinandinê tê raberkirin. Jineke ku pir bêeman hatibû amadekirin, hindekî bi xirabî dan meşandin. Lê bi wê re dewlet jî vala derket. Hindek qurban hatin dayîn. Lê tevgera mezin a dîrokî hejayî hemû tiştî ye.

## Xiyanet Têk Diçe

Kevneşopiya xiyanetê ya nîjadperestiya seretayî bingehî ye.

Ji beriya niha min ji we re vegotibû ka hema pişta serdema komgeriya me PDKê çawa weke KUK ê derketibû pêşberî me. Ketina dewrê ya vê KUK ê, di salên 1979-80 an de gelekî lezgîn bibû. Armancên wan ew bûn ku encama ku bi pênc Parçegeran û Tekoşînê ve nehatibû stendin bi dest bixin. Esas peywira bingeh ew bû. Bi bikaranîna welatparêzan ve vê yekê dikin. Lê da. Gelekî lê da. Gelek hevalên hêja qetil kirin. Ez bawerim me navê hindek hevalan dernexist rastiyê, lê di nav kesên ku hatine qetilkirin de welatperwerên gelekî xwedî hêz hebûn. Li Amedê, li Mêrdînê, li Sêrtê di nava kesên hatine qetilkirin de hevalên gelekî nirxdar hebûn.

Di qada rojhilatnavîn de jî van hatina xwe ya ser me domandin. Li Libnanê KUK bi dûv me xistin. Piştre wê demê UDG (Hêzên demokratîk ên netewî), Partiya Komunîst û Pêşeng şandin vê derê. Demeke dirêj bi me têkîlî nedan avakirin, gav nedan avêtin. Ger em bi kû ve diçin, Pêşenga sexte, wê demê bi karanîna navê Partiya Karkerên Kurdistan ve li ber difna me peyda dibûn. PKI (Partiya Komunîst a Iraqê) û Eniya Demokratîk jî tevlî digotin "em we nasnakin". Vê rewşê demeke dirêj domand. Malbat hemû di bin wêneraniya wan de bûn.

Komployeke ku bi salan diceribandin hebû. Bi hevalê Mehmet Saît (Etem) re em çûn. Em di bûroya Eniya Demokratîk de rûniştin. Niha qaşo komeke ku ji wan qetiyaye hebû, ku sexte bû. Navê xwe jî kiribûn Tevgera

Pêşeng. Lê rêveberê wan, qaşo ji Partiya Komînîst a Iraqê qetiyaye, zilam dixwaze ji me jî sudê werbigre. Lê ez bawer dikim ajanê wan e û ew şandine ji bo kontrol kirina me. Zilamekî ji bûroya Polîtîk a Eniya Demokratîk bû. Em bi wî re ketibûn têkîliyê. Navê wî Ebu Leyla bû. Sekreterê polîtbûro heta ya Komîteya Navendî bû. Ew jî hevalê herî nêz ê yê din bû. Qaşo bi hev re li Iraqê 20 salan di nava Partiya Komunîst de mane. Em çûn wê derê me dît vaye zilamê me jî hat. Piştî ku nîv demjimêrê wisa axivî neaxivî, xwedî rewşeke gumanbar bû. Her hal hatîbû ji me fêrî hindek tiştan bibe. Piştî ku bi me re hevdîtin çêkir hindekî jî bi şêweyeke xerîb veqetiyan. Gelekî jî nêzî mala me bû.

Wê demê di sala 1982’an de ez bawerim ev tespît hebû: “PKK xeta serxwebûnê bernade û li vir nakeve bin bandora PKI yê.” Tespîtên wan ev bû. Ji ber ku Pêşeng, KUK ev hemû di bin bandora TKP (Partiya Komînîst a Tirkiyê) yê de bûn. Him jî yek gotina wan nedikirin didu. Û misoger ji wan re cih û derfet hatibû veqetandin. Ev yek jî tespît kiribûn ku ka em çiqas asteng û dijmin in. Her hal pesenda TKP ji vê yekê re jî misoger bû. Yanî paşiya eniyê wisa xwe disparte wergirî û hevkomiyê. Û ez bawerim peywira pêkanînê jî dabûn Eniya Demokratîk.

Bêguman zilamên dirûst ên Eniyê jî hebûn. Mesela berpirsyarê leşkerî yê ku me pê re têkîliya vê wargehê bi pêş xistin wisa bû. Û ez bawerim hindek kesên din jî hebûn. Ez bawer dikim ku dost bû. Lê bi dibêtiyeke mezin ên ji Iraqê ne dirûst bûn. Li gel ku yên Filistînî dirûst bûn, di nav ên ji Iraqê de gelek kesên ne dirûst hebûn. Ew zilamên Partiya Komûnîst a Iraqê bûn. Û hetanî dawiyê misoger bi TKP yê ve girêdayî bûn. Hîna wê demê ji me re digotin “ger hun têkîliyen xwe bi TÎP (partiya karkerên tirkiyê) re avabikin dê gelekî baş bibe”. Behîce Boran sax bû. Zilamek hatibû, heta ma navê wî Zekî Kiliç bû? Me li vê derê têkîlî jî avakir. Yanî dê li gor PKI em li vê derê nermkiribana û piştre radestî TKP yê kiribana. Em wisa ketin têkîliyê, lê weke ku ne dirûst bûn, niyeta wan jî cuda bû.

Vaye wê demê min temaşe kir di bûroya Eniya Demokratîk de zilamê ku bi me re xeber daye gumanbar bû.

Piştî ku em derketin dîsa bi şêweyeke gumanbar wesayitek di pêşiya me re derbas bû. Me tiştên sosret dîtin. Ma ev şantaj bû, yan jî komplo bû? Nêzî malê bû. Her wiha wê demê em jî gelekî hişyar tevgeriyan. Lê weke ku hîna wê demê niyeta wan ne baş bû, biryara ku hevpar a KUK, Pêşeng; TKP û PKI stendiye nexistina me ya welat bû.

Amadekarî hebûn. Emê herin Hekariyê. Tê zanîn, wê demê gelekî bûn asteng. Ji bo ku wê gavê nedin avêtin peywirdarekî TKP hetanî nava Kurdistanê, hetanî bi Mêrdînê dişînin. Ma navê wî Ebû Şoreş bû? Dibe ku navekî din be jî. Qaşo zilamê rawestînêr ê PKKê bû. Kurdên Iraqê tam bi kar dianîn. PDK, Samî Ebdurehman. Têkîliyên me yên bi Yekîtiyê re hebûn. Me dixwast em hindekî Yekîtiyê binirxînin.

Yanî çûyîna me ya Hekariyê wisa hêsan, ji ber xwe û bêprovakasyon nebû.

Tê zanîn deh heval di Hêzilê de şehît ketin. Pêşengê wan pêşengê herî xurt ê PDKê bû û komploger bû. Hevalên din ên li Îranê şehît ketine, di destpêkê de Hemît, hevalên Mehmet Karasungur ew hebû, di bin kontrola wan a şidyayî de bûn. Hetanî sala 1982’an gav nedan avêtin. Û piştre dema koma me dakete Lolanê, li ser wan tam wêneraniyek û nêzîkatiyeke daxilkirina xeta xwe hebû. Li hember wan tekoşîneke mezin hate dayîn. Hindekan xwast bibin duvgerên wan. Me got divê em bi ser “helwesta serxwebûnê ve dagerin”.

Esas dema em berbi 1985’ an ve hatin, di encamên sepandinên PDKê de di nava me de bi israr nehatina xeta şer, bi israr nejiyanîkirina wê derkete holê. Hêza li pişta wan PDK bû û hindek kesan digot “ger em tevgav bibin emê herin wir.” Reva nêzî sî kesan tê zanîn. Kê ev hêz da? PDK, PKI û CUD (eniya netewiya demokratîk) kêm zilam ji nava me nedan revandin. Nîjadperestiya seretayî bi tevahî tasfiye kiribû armanc. Ew jî sepandineke mezin bû. Biryargeheke ku di encamên sepandinên dijmin de û ji hindek kesên revok ên xwedî xirabî hatibû damezrandin platforma wan bû. Di wê qadê de gelekî tekoşîn asteng kirin. Kesên ku reviyan her xwe spartin wê derê û her dem xwastin gavên ku em biavêjin

asteng bikin. Ji ber vê rewşê bi kotekî dereng be jî me gava Gelawêjê (tebax) da destpêkirin.

Dîsa kesên ku zêde bi şerê me bawer nedikirin çi dikirin? Rewşa PKI jixwe diyar e. Dema hawirdoreke pêvçûnê ya ne di cih de hate afirandinê, wê demê me pênc-deh hevalên hêja şehît dan. Esas derketina ji zivistana 1985'an gelekî zehmet bû. Li gel ku em bi binketineke pir rişt re (cidî) rû bi rû mabûn, me bi zorê pişta xwe rast kir. Ketina me ya rewşeke wisa bi vê provakasyonê re ji nêz ve têkildar e. Û ji me hindekan jî digotin "bi ser van de biçin, bimrin." Kom kişandin nava pevçûneke wisa ku, bi rastî jî projeya qedandinê bû. Van weke sepandinên derve yên li ser hundir bi karanîna feodal, bûrjuvayên biçuk û tolazan ve tol werdigirtin. Vaye kesên ku xwedî îdiayên "em wan naxînin Mêrdînê, naxînin Hekariyê", esas ji paş ve komên ajan-provakator ên xwedî plan û rêxistin bûn. Em bi deh-panzdeh kesan ve mijul bûn.

Divê erzan neyê.

Tekoşîna îdeolojîk-polîtîk a ku li dij van hatiye dayîn gelekî wergir e û bi bihayê canê gelek şehîdan e. Di refên rizgariya netewî de bi destxistina bandora îdeolojîk-polîtîk a PKKê, tenê bi serê xwe mijara dîrokekê ye. Gelek heval bi dilpakî çûn komployên van. Gelekan dev jê berdan, nikarîbûn rabikin. Gelek kêmên wan, ew jî rexmî ku em gelekî tengav kirin rewş xelas kirin. Dema em berbi 1985'an ve hatin di vê eniyê de ya herî bandorker rewşa van e.

Bêguman çepa Tirkan jî di dewrê de ye. Çepa Tirkan hetanî 1985'an bi Riya Rizgariyê ve li ser Dev yolê provakasyon sepand. Pênc Parçegerî berê hindekî ji Rizgariya Gel rû distend, him ji çepgeriya Tirkan û him jî nîjadperestiyê. Her du jî di vê rewşê de dihatin bikaranîn. Wan deman di bin kontrolê de ye. Bi yekkirina nîjadperestiyê û çepgiriya Tirkan ve. Ji ber ku bûyera PKKê him sosyalîzm û him jî welatperwerî bi hev re pêk dianî. Ji sosyalîzma PKKê re sepandina milekî sosyal-şovenîzma Tirkan û ji welatperweriya PKKÊ re jî sepandina milekî nîjadperestiyê. Him vala derxistina sosyalîzmê û him jî vala derxistina welatperweriyê.

Ev wisa gelekî bi kar anîn. Destpêkê PKI-TPK, Rizgarî, Tekoşîn û piştre jî xwastin Rizgarî û Dev Yolê li serê me bikin bela. Hîna jî têkiliyên wan hene. Qaşo dê temsîlkariya Kurdan ew bikin. Ev hemû hevkarên TKP bûn. Dîsa her lihevhatina bi PDK û PKI re.

Gelekî jî hêz didan. Mesele ew bû, diviya ji derketina PKK ê şovenîzma sosyal zerar nedîta. Di aliyê din de jî nîjadperestî. Tunekirina PKKê ya şovenîzma sosyal dihate wateya têkçûna TKP yê. Vaye di plana dîrokî de ev têkçûn îro pêk hat. Ev bûyereke mezin e. Lê ev wisa têkbirineke ji rêzê nîne. Ev têkbirineke wisa ye ku di rojê de qesta deh hezaran mirovên me kiriye, qesta bi hezaran rewşengeran kiriye, qesta bi sedan sosyalîst kiriye û qesta valakirin û wêrankirina Kurdistanê kiriye.

Sepandinên hetanî 1985'an di refên rizgariya netewî de û pêhtir derveyî me û di hundirê me de weke teşeyeke provakatîf rengê xwe dide. Di nava me de rasterast rewşa pêşvebirina provakasyonan a bi bikaranîna navê partî ya ji aliye MÎT ê ve, di zindanê de derdikeve holê. Di wê derê de dest pê dike. Û di bin pêşentiya Şahîn Yildirim de dest pê dike. Milê wî yê derve Semîr-Seher îdare dikin û bi berxwedana mezin a hevalan ve, bi hewlên me yên wergir ên ji sala 1983'an ên li Ewrûpayê ve hate eşkerekirin û her ku çû bêbandor hate hiştin. Lê tenê ferqa di vê derê de ev e: berê li gel ku MÎT ê bi giştî li derveyî me û di nava refên rizgariya netewî de bi zindî hiştina xêtên nîjadperest û şovenîzma civakî ve dixwast di bin hindek navên cuda de birêve birineke pratikî bû, ya ku di zindana Amedê de hatiye pêşkeşkirin û dihat xwastin li Ewrûpayê were domandin cewaztir e.

Ji 1987'an û pê ve di qada Rojhilatanavîn de jî hate kirin. Lê li vê derê wêrekiya pêkanîna eşkere raber nekirin. Ji bo ku PKK di zindanê de biqedînin girtin hundir. Ma dê çawa were qedandin? Weke tu tê zanîn hevkar hatine diyarkirin, radest bûne, hatine kirîn û bi şêweyekê ve bi xwe ve dane girêdanê. Van tiştan bi giştî hevalên zindanê baş dizanin. Ez bawerim li ser binke bi şêweyeke xurt serdest bûne. Wateya ew berxwedana Mazlum hindekî jî ji bo pêşgirtina vê

fetisînê bû. Ez bibêjim ger pêşveçûn ewqas bi aliyekî xirab ve ye û xiyanet hetanî qirikê hatiye, êdî karê ku were kirin, pêşkeşkirina çalakiya dawiyê ye.

Û ya ku hatiye pêşkeşkirin jî ev e.

Misoger li dij vê sepandinê ye. Çewisîn heye, lê aliyê din jî rewşa bi ser de çûyîna xiyanetê heye. Mînaka bi canê xwe xwedîderketina li partiya raber dikin û bi ser dikevin. Di pêvajoya dawiyê de, vê yekê Kemal û Xeyrî ew raber dikin, Ferhat ew didomînin. Lê divê haya wan jê hebe, rasterast li dijber dijmin e. Yanî li ber çavan li dij îşkenceyên KT û li dij binpêkirina şanaziya (onur, gurûr) mirovan e, lê di cewherê xwe de ger ev yek neyê kirin dê xiyanet her tiştî damale û bibe.

Di nameyên xwe de diyar dikin, "gav bi gav bi ser me ve tên" "dixwazin me bikişînin xiyanetê. Weke din tu bijarteke me ya parastina partiyê nîne."

Û di heman demê de kesên ku dibêjin "werin em nermtir bin" hene û nêzîkatiyên ku dixwazin PKKê di xeteke nerm de bigrin hetanî roja îro jî didomînin. Wê demê ev yek tê sepandin: bi navê PKKê, PKK'yiyên ku bi navê PKK'ya nerm radest bûne û bi karanîna PKK'yiyên xiyanet kirine ji PKKê tol wergirtin.

Semîr ev daxuyanî dida: "di 1973 de çawa bingehê vê rexistinê hate avêtin? Divê em wê tespît bikin û li ku derê zaye em li wê derê erdê veqelêşin û wê bixine hundir. Ji bo mirovatiyê divê em vê dernexin rûyê rojê." Wisa bersivdayîna wî ya ji derketina PKKê re, me di nivîsên wî yên têkildar de xwendibûn.

Reş reş dihizirin. Digot "esas", Dêrsim hemû kemalîst e. Digot "di Dêrsimê de tu kesî ku ji xwe re bibêje ez Kurd im nîne. Tirkiya herî xalis em diaxivin." Ev yek di pareznameya Yildirim de heye. Piştre "yekîtiya kemalîstên ciwan" li ser vê bingehê hatibû damezrandin. Xwastin bi wî navî xwe binav bikin. Digot, "destpêkê gotin çepgirî, piştre meseleya milî. Û herî dawiyê jî gotin PKK." Van xwast li Dêrsimê encam bigrin. Ev yek tê fêmkirin.

Tişta ku ez dixwazim bibêjim, zilaman teorîsyeniya pirsa "dijminahiya can a ev rêxistina li dij kemalîzmê derketiye

çawa tê kirin? dikirin. Lê destpêkê veşartî û sexte û piştre jî eşkere kirin.

Di encam de weke ku tê zanîn bi bihayê xwîna hevalên nirxdar tekoşîn hate pêşvexistin. Divê şehît ketina hevalên hêja baş were bibîranîn. Divê dîroka tekoşînê baş were hînbûn. Divê mirov xiyanetê û provakasyonê baş hîn bibe. Ya girîng nêrîna cîhanê ya li paş wî ye. Hêza beralîkirina wî ye. Çend torîk di vê mijarê de bûne maşa zêde girîng nîne.

Û wê berxwedanê da biserxistin.

Di dîroka Kurdistanê de herhal yek ji mînakên herî şandar, herî nirxdar û herî şanaz di zindana Amedê de hate biserxistin. Ne li cîhanê, ne li Tirkiyê tu kesên ku rojiya mirinê bi qandî me demdirêj pêkanîne nînin. Çalakiya xwe şewitandinê jî ewqas çalakiyeke mezin e. Ez bawerim di cîhanê de bi şêwazê çalakiyeke wisa ya xwe şewitandinê ve rawestandina zilmê nehatiye biserxistin. Li dij xiyaneta ku di PKKê de derketiye holê û li dij dijminê ku dixwaze vê yekê xwedî bike wisa li hember derketineke van çalakiyan heye.

Provakasyona ku di salên 1983-84-85’an de ji hundir ve dihate sepandin, dixwast gelekî encamgir be. Û wan jî digotin “em naşînin Hekariyê”. Li derve PDK û PKI her du jî dixwazin PKKê bifetisînin. Armanca êrîşên wan ên li Lolanê fetisandin û qedandin e. Razana hindekan a ji vê yekê re jî, ne ji ber ku PKK yiyên dirûst bûn, ên ku di cewher de ji PKK yê bawer nedikirin, û kesên di rewşa seranser xelaskirina dîmenê de bûn. Hewlên qedandina partiyê yên ji hundir û derve ve, ji sala 1982’an û pê ve êdî derdiket rûyê rojê. Û ji bo ku em rengê taktîka xwe nedin welat bi hemû hêzên xwe ve tevgeriyan. Kenan evren 1978’an de li Sarikamişê di civîna subayan de van gotinên han dibêje: “dê pêlî termên me bikin, em dîsa jî wan ji başurê Kurdistanê derbasî bakur nakin.” Dan kuştin, dan revandin. Bi yên di destan de mayî ve em neçar man bi zorê berxwedanekê bidin meşandin, ev yek pir şênber e.

Ya di zindanê de dibe çi ye?

Ew di hundirû de berxwedana PKKê ye. Dibêjin, “jixwe ev pêncî sal in cara yekem derdikevin emê wan bifetisînin.

Dê erd veqelêşe û dê bikevin hundirê axê. Emê serê wan beton bikin. Ev deraz dê ji nû ve were sererastkirin.”

Encam bû tekoşîneke mezin.

KT di asta serokwezîran de bi hevkaran re civînan li dar dixin. Civînên hikumeta Ozal ên bi nîjadperestan re zêde dibin. Ji me re ji wan şefan yek Mesut Berzanî digot, “eman hîna ne dema wê ye.” Heta gotina wî ya wisa heye: “Tirkiyê ji Lîbyayê re gotiye, Lîbya jî ji min re gotiye. Ka rewşa me ya pêşvexistina xweseriyê (otonomî) heye em di qonaxeke dîrokî de ne. Hun werin bi me re tevbigerin!” Ez bawer dikim qaşo dê bi ew hişên xwe yên biçuk ve dê Tirkiyê bixapîne û me jî piştre bixe bin kontrola xwe, yanî weke maşayekê bide bikaranîn. Li gor xwe, qaşo ger ew xweseriyê bi dest bixe dibe ku li Tirkiyê jî rewşeke wisa derbikeve holê. Hetanî asta dawiyê dê bi nermiyê meseleyan çareser bikin. Esas wê demê hindekî li devê me digeriya. Yan jî qaşo dixwast min jî bikşîne nava wê xiyanetê.

Berzanî di mehên bihar-payîza 1985’an de hatibû vê derê. Me pênc-şeş caran hevdîtin çêkir. Bêguman min fêm kir. Zilamê me, digot, “aman ha aman!” nerihetiyên xwe gelekî eşkere diyar dikirin. Wexta ew bi gotinê wisa ne di pratîkê de pêhtir xwedî hiş in. Digot, “eman bila bi ser yek qerekolê ve neyê girtin! Eman ha eman bila eskerek neye kuştin. Û gelek tedbîr stendin. Tedbîrên wan şênber û hetanî dawiyê bûn. Vaye di dema ew provakasyona PKI dê, di nava me de jî di hindekan de bêbawerî û serhildana bûrjuva ya biçuk hebû. Ew heval avêtin nava agir. Esas meşandineke gengeşeyî bû. Di rexnedayînên xwe de ev yek pir eşkere derketin holê. Bûyîna wan a amraziya ji vê provakasyonê re gelekî bêînsafî bû. Em bi ser van ve çûn. Piştre em sîtemkar çûn. Di mijara bi ser de çûyînê de riya hatiye çûyîn tê zanîn. Nîqaşên Kongre, dahurînan, him mezinbûna xeteriyê û him jî daxwaza girtina encama li hundir derxiste holê. Ji ber ku dema ferasetên provakasyonên derve, ya hevkariya di nava refên rizgariya netewî de, ya serî tewandinê û yên nîjadperestiya sexte dihatin têkbirin, li hember wê dema serbixwebûna me misoger dibû, li gor pêwîstiya berjewendiyên çînî, PKK hêz bi dest dixe û pêşveçûnê bi

dest dixe. Ji ber vê sedemê sedemên wan ên pêşgirtinê zêde ne û tên fêmkirin, ji beriya her tiştî çînî ye.

Yanî em nabêjin ku hemû rasterast bi dijmin re di nava pêwendiyê de bûn. Ya ku hêz bi dest dixe xeta çînî ya PKKê ye. Ya rastir taybetmendiyên xeta ku me jê re rêbertî dikir diyar bûn. Yani tekoşîna ku me li dij PDKê jî û li dij Yekitiyê û hemû binkeyên bûrjuvayê biçuk daye meşandin pir eşkere ye û ev yek zelal bûye. 1985'an de her kes dizane ku hesanê mirov zu bi zu serê PKK'yê bitewîne. Ev yek ne ji aliye polîtîk ve ne jî ji aliye îdeolojîk ve ne gengaz e. Van hêvî dikirin ku em di sê mehên destpêkê yên pêngava 15 Gelawêjê de tune bibin. Li bendê bûn ku emê çiqas û kengê têkbiçin.

Pêknehat.

Ez bawerim, 1985'an de bûyera CUD (eniya netewa demokratîk) derkete holê. Bûyera bi navê CUD bi taybetî PDK û PKI yê pir teng û sîtemkar girtin dest. Bûyea CUD bi tevahî girtina başur a ji me re ye. Û vê yekê jî di nav hevkariyeke şidyayî ya KT de dikin. Di nava me de jî dîsa hindek hêman (oge) li vê razan. Ger ev vê yeke dirûst li xwe mukir neynin jî digotin taktîk ev e: "emê başur bikin Vîetnam." Dîsa wê demê kesên ku pêwîst dikir di asta herî jor de şerê me bi rê ve bibin wiha digotin. Van hevalên me di nameyên xwe de hema wiha digotin: "emê li gel PDKê şer bikin, emê başur vegerînin Vîetnamê. Piştre bi spartina vir ve emê berxwedana bakurê Kurdistanê bi pêş bixin." Bêguman me got, "em di qonaxeyeke jiyanî de ne." "hun bi PDKê re nikarin başurê Kurdistanê bikin Vîetnam." Ev bi qandî ku girêdana PDKê ya bi emperyalîzm û mêtîngeriyê ve nebînin kor bûn. Ez bawerim hindekî jî polîtîk nebûn. Li gor xwe diaxiviyan. Di encamê de me ew bi zorê xelas kirin. Tuyê PDK bi kar bînî, bikî eniya paş û yek jî tûyê pê re şerê Vîetnamê bidî meşandin!

Yani ya ku ez dixwazim bibêjim bi van re tekoşîn dijwar e û ev yek rengê xwe dide hundir jî. Nîjadperestiya ku dixwast bi van bilêyîze û di nava me de jî bermahiyên bûrjuva biçûk a feodal hindekî serê xwe dirêj bike û xwast vê yekê bibêje: "komên din PKKê qedandin, KUK, Pênc

Parçeyî, Tekoşîn, Pêşeng, DDKD.” Ev hemû bi rastî ji dema em gihiştin 1985’an hemû qediya bûn. Ji ber ku rewşa pêngavê ev yek diyar dikir. Tedbîrên ku PDK’yê girtibûn hebûn, ew jî bêencam diman. Rexmî ku di asta herî bilind de reng dida me, derketibû holê ku emê serê xwe netewînin. Navdar e, wê demê di derbarê Partiya Komûnîst de ev daxuyaniya me hebû. “ev parti dê yan xwe fes bikin an jî dê têkbiçin. Êdî tu pêwendiya van a bi komûnîstiyê û bi welatperweriyê re nîne.” Dahurînên me yên di derbarê PDK de jî hebûn. Ev axaftin hevalê şehit Sadun sererast kiribûn. Di sala 1985’an de weke broşûr derketibûn. Bi kurtasî ev hindekî bêbandor hatibûn hiştin, rexmî van pêngava 15 Gelawêjê hatiye destpêkirin û tê meşandin. Lê dîsa kar li ser xalake pir krîtîk tê meşandin. Di nava PKKê de binkeyên feodal, bûrjuvaziya biçuk ji pêngavê gelekî nerihet in û yan jî qaşo hindek qadên bandorkariyê ji destên wan dişemitin. Jixwe piştre derkete holê. Bi gotinên xwe ve ev yek rasterast axaftine, heta klip-hizip avakirine. Qaşo li gor wan, li vê derê evqas xizmetkirina me remzî (sembolik) ye. Meşandina me ya tevgerê û gihandina me ewqas zêde girîng nîne. Yani “bi qandî ku em hêsan bikin em dikarin hêsan bikin. Hindek rewşenbîr hene bi qandî ku em dikarin di nava PKK de van bi kar bînin em dikarin bi kar bînin. Li paş ên gundî, xizan, evdal yanî yên cahîl dimînin. Emê li ser wan serdestiyê, sultantiyê ava bikin.” Ev zilam bi rastî dema ku nikarin bibin şorbexwar, çûne bi komplogeriyê ve mijûl bûne.

Mesela pratîka Cemal Kor eşkiyatî ye. Ne eşkiyatî jî, xirabtir e. Eşkiya hindekî li dij bêmafiyê ne. Mezinahiya wan xwedî wate ye. Em piştre hîn dibin. Fêrbûye her dem riya Mîdyatê bibire, bi şêlandina mirovên xizan ve bijî, dema firsendeke wisa dîrokî dikeve destan jî dixwaze bi hevkarên herêmî re tevgerê biqedîne.

Ji 1982’an hetanî 1985’an rewş ev bû. Min gazî vê dere kir. Di destpêkê de bi tevahî kadroyên partiye re, bi herkesî re mijûl bû. Wê demê gelekî çek şandin. Çek û bombeyên ku me şandibûn, ez bawer dikim pênc-deh hezar ditînin. Ev hemû çi jê kirin em nizanin. Gelek çek. Welatparêzên hêja dixebitiyan. Tu nabêjî ev li ser hemuyan rûdiniştiye. Du-sê

salan bi tolazgeriyê ve jiyaye, li gor xwe jiyana ku wisa bi tolazgeriyê ve dimeşand, bi şêlandina PKKê re û bi îstîsmarkirina PKKê re qedandina wê armanc dike. Yek du xulamên wî hebûn. Karê ku van dikirin, ji çend kesên ketî re dayîna jiyaneke erzan bû. Ger çend jin hebin, şêwaza jiyana wan a hezkar ev e. Ne rewa, yanî bi ketinî. Tam şêwaza feraseta desthilatdariya feodalan e. Piştre bila partî bixebite ji van re derfetan pêşkeş bike.

Piştre dema hatin vê derê rewş dîtin, ketin ferxa cewaziya rewşê. Lê zilam ji bo ku xwe nede eşkerekirin ev yek gotiye: "bi hemû hêza xwe ve ji bo ku ez Serokatiya Partiyê bi kesayeta xwe ya rast nedim hesîn ketim pozîsyoneke baş a awarte." Û bi rastî jî ketibû rewşeke wisa. Li vê derê helwesteke gelekî baş raber dikir. Û berbi Îranê ve çû. Wê demê gotiye, "ez bi ser ketim." Hindek heval dizanin. Li ser kadroyan texrîbateke mezin dide meşandin. Ji bo jiyanên xwe yên ketî tenê bi pisiyên xwe yên wê derê ve jî namînin. Li wê derê du-sê qafadaran jî dibîne. Û vê yekê dibêje: "ya girîng ev der e. Carekê şensê desthilatdariyê dikeve destên me. Ger me karîbû em bi kar bînin, me bi kar anî ger me nikarîbû em çûn. Sed sal jî derbas bibin, careke din ev firsend bi dest me nakevin." Yanî gotinên wan wisa ne. Em niha difikirin ku ew gotin xwedî gotin in. Ji ber ku di nava partiyê de hindek kes ewqas vedibêjin. Hindek hevalan rêdikin ser mirinê. Çi ye? Wisa qedandina hêza şerê lez a PKKê ye. Dişînin ser çalakiyên ku qet xwedî şensê serkeftinê nîne. Yan dê birevin an dê bimirin weke din tu care nînin. Dema birevin jixwe weke xayinan tên kuştin dema tên lêdan jî jixwe yê diqede PKK ye. Bi evqas taktîkên kor ve ev li ser binke (yapı) dilêyîzin. Rengê dahurînên encama kongrê nadin. Bi temamî bi şêwazeke pir zane binke dixin rewşeke şidîn, gumanbar û ajanên ku her dem hev dişopînin. Tu kesên ku ji hev gumanan nakin namînin. Û weke ku ez dibêjim kom jî çomez e. Qaşo desthilatî, kontrol bi destên xwe xistine. Feqirên din jî tên îdarekirin. Tiştên bi ser dixin, gotina min li wê weke minet bi kar anîna çek, pere û nizanim çi tiştên PKKê ne. Dema wisa yên ketî dibînin jî, bi pêşkeşkirina jiyaneke ketî ve bi wan xiyanetê didin kirin.

A ku bi pêş ketiye hindekî wisa ye. Hîna di 1983’an de li dij tekoşîna me dest bi komployên eşkere kirin. hereşeyeke weke “vegerin, dev jê berdin, hun nikarin bimeşin” bû. Me ev yek jî vala derxist. Me karîbû em bigihêjin asta tevgereke roja îro. Dijmin di zîndanan de ev disepand: “hun dê xwedî li PKKê dernekevin!” li hundir û derve hevdemiyek dihate armanckirin. “PKK êdî bi derbeya 12 Rezberê re hatiye mehkumkirin. Hun dê nikaribin bijîn, dê erd veqelêşe hunê bikevin nav.” Ev komployek bû.

Hindek rêberên komplogeran di bin rûpoşa PKKê de dixebitiyan. Lê piştre vekirî kar kirin. Ma ew komplo çawa hate şikestin? Bi pêşveçûyînê li duv hatine şopandin re. Di 1983’an de ji derve ve jî komplo hate sepandin. Bi ser ve meşiyan û serî hate perçiqandin. Piştre pêşveçûyînên tên zanîn derketin holê. Dîroka PKK ger di vê wateyê de jî baş were lêkolînkirin, her dem bi tekoşînên dij komplo û komplogeran ve derbas bûye. Ev di bin rûpoşa PKK û Kurdeyetiyê ve dihatin kirin. Dijmin di vê mijarê de dikarîbû hevkaran tevger bike. Berê pêhtir li derveyî partiyê didan bikaranîn, piştre hindekî din hundirê partiyê da bikaranîn. An jî teşvîk dike û bi pêşkeşkirina derfetan ve wan bi kar tîne.

Komplogeriya PDKê tê zanîn. Dema rêhevalê Hamît Avci şehît xistin, komploya "hun nikarin di başur de tevbigerin, hun nikarin li Colemêrgê çalakiyan bikin" hate sepandin. Hemît temsîlkarekî me û nirxekî me yê baş bû. Ew, gelekî bi partiyê ve girêdayî bû, ew kirin armanc. Ji vê komployê re jî emê bi amadeyî bersiv bidin. Em bi amadekariya ji komployên PDK û nîjadperestiyê re amade û bi raberkirina rûyê wan ê rast ji cîhanê re me bersiv da. Armanc dikirin ku em nikaribin li başur şer bikin. Piştre hindek êrîşên din jî çêbûn. Dîsa bi israr hindek helwest li ser me sepandin.

Tekoşîna ku me li dij komplogeran meşandiye, rê vekir ku tekoşîna rizgariya netewî bi kûrahî û firehî kok berde. Piştre di nava me de hewlên tasfiyeger hetanî dawiyê pêşveçûn. Bi giştî komploger, lê komployeke pir zirav hate sepandin. Di sala 1986'an de ev bi tevahî eşkere derketin

holê. Helwest jî hate raberkirin. Hindek hatin cezakirin û hindek jî reviyan.

Çi bû ew tariya ku wan dixwast biafrînin? Weke tê zanîn 1985 dihat wateya 12 Rezbereke duyem. Tişta ku van helwest û nêzîkatiyan dixwastin bipeyitînin ev bû, "ji vê û bi şûn ve hun dê nikaribin bimeşin." Hindek jî hetanî vê derê hatin, lê bi tevahî ji hev de ketibûn. Di sala 1986'an de rexmî her tiştî tişta ku pêwîst bû bihata kirin, êdî xelasbûna ji vê rewşê, sepandin û jiyîn bû. Esas ev di rûyên hindekan de dihatin xwendin. Ketin hindek rewşên xetertir. Ger firsend bikeve destên wan dîsa wê bikevin nava komployan. Hindekan jî ev yek kir. Ez bawerim van bi qandî ku li ser hindek kesan xwekuştinê ferz bikin bi pêş ve çûn. Ger ev rewş tam zelal nebe jî, komploger wê demê berpirsyarê wargeha me bû. Kesê ku em jê re Abdulah dibêjin. Divê mirov li ser wî raweste. Erê, komploger e. Kêmaniyên wî hebûn. Rewşa wî zêde zelal nebû. Belkî jî hindek qelsiyên wî hebûn. Rewşa wî ya qelsîn a di nava jiyanê de pir xirab bi kar anîn û birin xwekuştinê. Birin îdamê, hema weke ku li welat bi serê gelek hevalan ve hatiye.

Tê bîra min, ew kesê ku bi hindek helwest û nêzîkatiyên xwe ve diyarker. Weke ku ji barekî giran xelas bibe, digot ez mirim. Hun dê çi bikin ji van? Kesê ku hun herî zêde jê bawerin, bi qandî ku xwe bikuje qelsiyê raber dike. Erê, bi rastî jî wê demê bûyereke dilreş bû. Ev bûyerên ku qet nehatin hêvîkirin ger me bikaribûya pêşiya wan bigirtaba. Bi rastî diviya wisa nebûya. Her çiqas kesayeteke qels û nezelal bû jî, ne ew kes bû ku bikeve nava rewşeke wisa. Lê bi helwestên xwe yên heyî ve ev rewş afirandin. Dudilî, durûtî û ziravgerî bi pêş xistin.

Di kongreya 3. de bi wateya destpêkirinê be jî, em bi esasî bi ser van tiştan de çûbûn. Di encama bi ser de çûyînan de van wenda kirin. Weke ku tê zanîn, biserdeçûyîneke sînordar a pratîkî jî, peyitandin ku Kongra 3. dikare rê li pêşiya pêşveçûnên girîng vebike. Ji van hindek reviyan, hindekan jî eşkere dijminahî kirin. hindekan jî di nebesiyên xwe de israr kirin. Xwe xistin rewşeke pir zehmet. Vaye di van salan de dîsa weke min gotiye, bi pirsa "divê milîtanekî

şoreşger çawa be?" ve me xwast bigihên xeteke xwedî asta dîrokî. Di destpêka 1983'an de me civîneke navendî ya wergir pêk anî. Bi gumanan ve rexne jî hebûn. Bi teşeyên nirxandinên weke çimaniya pêwîstiya bi serxistina sala 1984'an, çimaniya pêwîstiya kirina sala çalakiyê, bi qandî ku em ji hezar çeman avê binin, bi pêşkeşkirina derfetan a li ber çavan ve, "ger biryar be biryar, ger derfet be derfet, hemû hene; baş e wê demê em çima radiwestin?" me hemû zelal danîn holê.

Weke ku me dixwast nebe jî, weke ku tê zanîn pêngava 15 Gelawêjê gaveke pêş bû. Lê dawiya wê girîngtir e. Dema em gihiştin dawiya sala 1984'an ji bo em bi ev gotinên dijmin ên weke "ger di 48 demjimêran de nebe jî, emê di 72 demjimêran de biqedînin." Ji bo em neyên qedandin em nefes bi nefes li ser kar bûn. Di me de gumana ger van em di 24 demjimêran de neqedandin gelo ma sibê dikarin me biqedînin? hebû. Lê me ev yek jî têperand. Heta me got roja sêyem, roja çarem, em gihiştin destpêka sala 1985'an. Dîsa weke ku baş tê zanîn, bêyî ku em bigihên destpêka 1985'an bêtalihî li dûv hev qewimîn. Koma Sebrî Ok wan hatin komployê û nîvê wan şehît ketin. Nîv jî birîndar ketin dest.

Em dîsa li Rojhilatanavîn bûn li gel me Egît hebû. Weke ku emê "çawa 1985'an bi ser bixin" me gelekî nîqaş meşandin. Xebateke rastê mijdarê bû. Ji welat nûçê dihatin. Dema nûçeya şahadetên Sasonê hatin, bi rastî jî emê wê zivistanê çawa derbas bikin, emê çawa bikevin sala 1985'an û emê ji piyan bimînin an nemînin muamayek e. Wê demê dijmin qanuna cerdevaniyê û qanuna poşmaniyê derxistibû. Serokatiya pratikî di nava kêmaniyên giran ên taktîkî de bûn. Komên bêhêçan (deneyim) rast û çep dihatin belavkirin. Lê wisa zêde di ferxa gerîla de jî nebûn.

Sala 1985'an weke tê zanîn, bi qandî sala çalakiyên mezin bû, sala wendahiyane jî. Bi rastî ger gerîlagerekî baş hebe, hêzeke bi qandî sêsed kesî hebû. Ji her alî ve daxwaziyeke mezin a tevlîbûnê hebû. Gelê welat careke rabibû ji piyan. Ji Dêrsimê hetanî Çewlikê, ji Amedê hetanî Botanê. Başur jî gelekî destdayî ye. Lê mixabin rêbertiya taktîkî, weke berxwedana Hîlwan-Siwerekê dîsa di nava kêmaniyeke

mezin de bû. Û di rewşa dûvgerê kar de bû. Hîna tê bîra min, ez dihiziriyam, "çima nêzîkatiyeke wisa ji çep û paş ve? "pirtuka Rola Zorê" hatiye nivisandin, çima dawiya wê nayê? Çima nêzîkatiyeke rast ji bûyera gerîla re nayê raberkirin?" bêguman ez jî bi qandî roja îro li ser bûyera gerîla neponijiya bûm. Min digot, "dê milîtan vê yekê bikin." Ji ber ku ez peywirên milîtanekî ji rêzê bi destgirtina min a peywiran wan rast nayê. Ez kevneşopiya tevgerê dihizirim. Min girêdanên derve yên tevgerê, pêwîstiyên lojîstikê yên bingehîn û dîsa kare bingeh ê perwerdeya kadroyan dida meşandin. Lê mixabin, milîtanên me yên pêşeng ku di qada pratikî de xwedî derfetên berfireh in, bi israr nêzîkatiyên xwe yên rastgir didin meşandin û dema em gihiştin dawiya 1985'an weke tê zanîn tevger bi têkçûyînê re rû bi rû dimîne.

Dîsa fermana Mijdarê heye: "weke ku her şêweyê derveyiya xetê dibe tasfiyegerî û wendahiyê, girêdana bi xeterê jî dibe serkeftinê" me bi teşeyeke wisa nirxandinek kir. Me dît ku, dê ev vî karî bi pêş ve nebin, di qada navîn de xetimîn, xirabgerî heye û hêza me ya gerîla ji sedî nod şehît dikeve. Bêguman, ji ber bêserokatiyê. Milîtan û şervan jî tam di rewşa serhildêrên gundiyan de ne. Tu nêzîkatiyên rast ji pêdîviya lojîstikê re raber nakin. Bi şev li gund, bi roj li ber serê gund dimînin. Dijmin bi kar anîna cerdewan û ajanan ve bi hêsanî wan nêçîr dike.

Me hevalên xwe yên herî nirxdar di vê salê de wendakirin. Bi rastî jî di du-sê salan de ev hevalên ku me bi zehmetî gihandine, ji sedî dehê wan man an jî neman. Ev, bi rastî jî hindek milîtan û şervanên rast ên PKKê bûn. Min bawer dikir ku, dê çiyan baş bi kar bînin. Lê mixabin dema kêmaniya giran a wan bi ya serokatiya taktîkî re bû yek, van wendahiyan bi pêşvexistina me ya gerîla kirin zehmetiyê.

Şervan û fermandarê rast dernakeve holê. Tê bîra min, Dêrsim erzan wenda dike. Li Amedê dikevin malekê, radizin û sibehê bi çepilan ve radestî dijmin tên kirin. li Botanê li derûdorên gundên gumanbar kom li ser komê tên wendakirin. Serokatiya taktîkî ya ku bi duv boçika nîjadperestiyê ve ketiye, qet naxwaze jê qut bibe. Me dest

werda û di nava zivistanê tevahî de me xwast em hindekan bikşînin.

Zivistana ku 1985 bi 1986 an ve girê dida, esas ji bo ji nû ve bi pirsnîşanên giran ve derbas dibû, "gelo ma em ji nû ve dikarin tevgerê bi cih bikin?" ev yek bi gumanên wisa ve derbas bû. Me got, "em kongreyekê çêbikin" û me xwast em hindekan bikşînin. Hatin û em zivistanê bi giştî bi wan re mijul bûn. Weke tê zanîn koma Egît wan jî hebû. Ew jî baş bû, dixebitiya. Zivistanê tevahî jî li hundirê welat li Botanê mabû. Li beramberî cerdewanan hindek çalakî jî li dar xistibûn. Lê komplo bû, dibe ku di dema pevçûnekê de be di 28 Adarê de Egît şehît ket. Hindek hêmanên pêş ên ku hatine gel me jî, di nava tevlîheviyeke hişî de bûn. Hemû di nava hewlên valaderxistina hev de bûn û yek jî komplogeriyê dîsa serê xwe dirêj dikir.

Weke ku bi tasfiyebûna hêzên heyî ve, dihate xwastin ku ji nû ve xeteriyeke 12 Rezberê bi me bidin jiyîn. Bêguman li ser pêvajoya Kongreya 3. me xebatên wergir kirin. Di nava salê bi giştî de hetanî biharê em bi xwînsarî nêzî rewşa provakatoran bûn û em nehatin tehrîkan. Me rewşên wan yek bi yek bi dest girtin. Azîneya dahûrînê cara yekem me wê demê bi kûrahî nêzîkatî raber kir. Eşkere derkete holê ku divê kesayet tenê weke ku tê diyarkirin ne, divê bi hemû aliyên wê yên malbatî, civakî û dîrokî ve bi dest were girtin. Û tekoşîna me esas bi çewisandinên dijmin ne, me dît ku tekoşîna me ji ber kesayetên nebes berbi têkçûyînê ve diçe. Û me got ku, "ger ev kesayeta nebes neyê têperîn ev tekoşîn bi pêş nakeve."

Ji vê aliyê ve me serî li çeka dahurînê da. Ev yek di heman demê de dîtina nebesiya taktîkî ye. Bi ser de çûyîna çareseriyên wê yên bingeh e. Ev ji beriya kongrê û piştî kongre nirxandinên pir wergir bûn. Û dîsa ponijîna di perwerdehiyê de bû. Hîna bêyî ku 1986 bi dawî bibe, me komên mudaxeleya welat amade kirin. Ji Rojhilat ve, di ser Îranê re me bi hindek mudaxeleyên xebatê ve daxwaz kir kongrê ji wir re ragihînin.

Li wê derê jî provokasyon heye û kar qet rast bi dest nayên girtin. Kesê ku me dişand provakator derdiket. Esas bi

provakasyona vê derê re ketibû pêvajoya bandor-tepkiyê. Û dema me dixwast em dahûrînên kongreyê di destpêka 1987'an de derbasî welat bikin, wan jî dixwast ew vê yekê sabote bikin. Zivistana 1987'an cara yekem dîsa li qada akademiyê hate derbaskirin û ez bawerim fermana me ya 1 Çileyê heye. Me nirxandineke "fermandar kî ye? Taybetmendiyên wî çawa ne? Bi pêş xist. Yanî edî kar bi hetanî bi dest girtina hemû aliyên fermandar, wisa wesfandin û diyarkirina peywiran van ve diçe.

Sala 1987 di vê wateyê de di dîroka tekoşîna me de cara yekem dest avêtina min a ji pirsgirêkên taktîkî re, eşkerekirina taybetmendiyên milîtan û fermandaran re sala destpêkê ye. Bi biharê re me dîsa kom şandin. Çalakiyên li Mêrdînê derketin holê. Hindek bi şêweyên provakatîf bin jî, serdemeke êrîşê bû. Ger weke daxwaza me nebe jî, me kir saleke pêngavî. Rêveberiya rewşa awarte weke tepkiya vê yekê derkete holê. Bi kurtasî sala 1987'an bû saleke berxwedanê. Dîsa li welat rûnişkandina gerîla (ku me got bersiva herî rast a girêdana bi bîranîna Egît re ye) li ser vê bingehê ji Dêrsim hetanî Serhedê, Başûrêrojavayê, bi kurtasî me kom şandin çar alî. Me dewreyên perwerdehiyê yên esas amadekirin û bêyî ku dawiya vê yekê were domiya. Encam sala 1987'an hate bidestxistin.

Ger em bi kurtasî bibêjin, di derûdora 1984'an û ji beriya wê di şertên zehmet de me hewleke nebawerker bi qandî 300 gerîlayî amade kiriye û şandiye welat. Tu hevalî ranebû û negot "mirov çawa dikare ji vê artêşeke gerîla biafirîne?" tu kesî nepirsî "ev dê çawa li çiyan were bicihkirin?" Li nîva rojê li gund, li malan xwarinê bibîne, weke çûkên Koçber xwarinê berhev bike, dema tu tengav bûyî jî hindekî derbikeve çiyê. Aso, wêrekî û fedekariya wî ji vê yekê zêdetir dest nade. Li başur dikeve bin bandora nîjadperestiyê, vê yekê nabîne. Şivan wan (Saît Kirmizitoprak û hevalên wî) hîna dema ku dihiziriyan dê çawa dest bi gerîlageriyê bikin ji aliye PDKê vê bi hev û dinê hatin lêdan. Li başûr dê tiştekî ji vê cewaztir bi serê yên me ve nehatiba. Ji ber ku ketibûn wê pêvajoyê. Bixebite

pêşiya vê yekê bigre, bixebite yên çiya bike gerîla, pê gav bide avêtin. Min got, piştî ku gav dan avêtin bi şûn ve çi pêş dikeve, bifikire û ha bifikire.

Şert gelekî zehmet bû, lê yê me jî her ku diçe hevkomiyên me yên ezmûneyê çêdibin. Bi kêmanî di min de hizra "divê xwe li gor vî karî bi rêk û pêk bikim, û pêşiya vî karî bernedim" serdest bû û min ji binke bawer dikir. Lê divê bi her çûyînê re êdî ji baweriyê zêdetir divê mirov rastiyan bibîne. Tenê bi baweriyê "dê bikin, pêk bînin" ve ev kar nedibû. Dema sala yekem a pêngava 15 Gelawêjê li paş ma, hevalan dest bi jimartina rojên qedînê kirin. Hêzeke pir kêm mabû û ew jî bi qandî ku bikevin hev xwedî disîplîneke sist bûn. Şens jî baş nenirxandibûn. Mezinkirin û plankirina pêngava yekem jî sererast nekiribûn. Serokatiya taktîkî çiqas xwedî hewl be jî, çiqas wêrekî jê re were dayîn jî, pisporanî nebû, kêm bû. Emê nebêjin ev an jî ew kes tawanbar e. Lê bi giştî bi qandî ku bikaribin xwe ji têkçûnê xelas bikin xwedî hêz nebûn. Ger min berdaba dawiya sala 1985 yan jî di destpêka sala 1986'an de dê ev kar razaba. Bêguman weke ku min gotiye, li ser serê me provakatorên ku kêm nedibûn hebûn û ev her li benda roj û demjimêra qedîna partiyê bûn.

Rêhevalê şehît Egît dixwast hindek tiştan baş bi pêş bixe. Piştî şehadeta wî koma ku jê re fermandarî dikir bi belavbûnê re rû bi rû ma. Dema şert wisa bûn, me bi pêwîstiya amadekariyeke bi serveçûyîna wergir dîtibû. Bi qandî ku me karîbû em bicivînin, me heval civandin û bi têşeyê Kongreya 3. hawirdorek amade kiribû. Me dest pê kir ku em pirsan bikin. Vaye ji ber sedema van nehêniyan, cara yekem me pêwistiya bi serveçûyîna hundir û pêwîstiya biserveçûyîna pirsgirêkên kesayetê ve kifş kir. Di salên 1982-83-84'an de me pêhtir pirsgirêkên giştî yên ciwaniyê, riya çareseriyê û weke riya partiyê me hindek xetên giştî danîbûn holê. Hindek diyardeyên me yên giştî hebûn, lê van ji me re têra danasîna malê me nedikir. Hetanî wê demê me toz nedigihand ser hevalên xwe. Me digot ên herî baş in, dê tiştên herî baş bikin.

Lê vê pêngavê û dawiya vê yekê rê ji me re raber kir ku, bi van zilaman ve ev kar zêde bi pêş ve naçe. Di kesayeta

Kurd de hindek aliyên ku mirov nikare tenê bi ajaniyê û provakatoriyê pênase bike hene. Bêyî ku ev kesayet werin dahûrîn, bêyî pêşvexistina van ev kar bi pêş ve naçin. Pêvajoyên nîqaşê yên sala 1986'an di van aliyan de gelekî erênî bû. Ev yek eşkere bû ku, kesên ku tu peywirên herî girîng didî, esas di hêza rakirina vê peywirê de nînin. Bi van şaşiyan û bi van kêmaniyan ger şer bibe dê encax wisa bibe. Li ser vê yekê me biryar da ku jimareke werimî ji nû ve bigrin perwerdehiyê. Me gihiştand jimareke dused-sêsed kesan. Di sala 1985'an de me dîsa xwe xist hewaya amadekariyên pişta 12 Rezberê.

Ez bawerim di mijara pêngava nû ya ku me bi destpêka 1987'an re destpêkiriyê fermandariya giştî ya Tirkan zêde fêmdar nebû. Divê mirov vê yekê xerîb nebîne. Dema ku hîna me nikarîbû em xwe baş nasbikin, ne gengaz bû ku fermandariya giştî pê bihese ku ka emê çiqas pêşveçûyînan çêbikin. Tê gotin, Ozal di serdema pêngava 15 gelawêjê de li qeraxa behrê bû ye, gotiye "tu tişt nabe." Asta wê demê bi Ozal ev yek dida gotin. Pêşveçûyîna dehsalan zêde texmîn nakin. Bi asayiyê ku dewlet bihizire bibêje, "ev zêde nikarin bimeşin û nikarin bi pêş bikevin."

Hate xwastin ku li ser vê bingehê ketina 1988'an çêbibe. Dîsa di van salan de dahûrînên wergir hene. Mirov dikare bibêje ku, dahurînên Adar, Nîsan, Hezîran, Cotmeh û Mijdar ên sala 1987'an wergir in. Li wê derê ji bo ev sal were bidestxistin tiştên hatine kirin divê baş werin lêkolînkirin.

Xebatên ji destpêka 1988'an û pê ve, bêyî ku ji leza xwe tu tiştan wenda bike domiyan. Me bi zorê di sala 1988'an de hindek kom şandin welat, saleke zehmet bû. Dijmin dixwast vê salê ji bo me bike saleke qedînê. Planên pêşgirtina pêngavê dihatin kirin. Ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku ev planeke pir bandorkar bû. Ez bawerim Ozal jî ji vê pêvajoyê serkeftin hêvî dikir. Serokê nû yê fermandariyê hate tayinkirin. Hikumeke nû bû mijara gotinê, lewra planek hate pêşxistin. Ya herî girîng jî di nava me de provakasyonên herî wergir hatin kirin. Dema ku provakasyona zindanê berbi encamê ve diçû, Ewrûpa jî di vê mijarê de serê xwe dirêj kir.

Di qada me de jî her wiha provakasyon dihatin bipêşvexistin.

Pêvajoya saleke rewşa awarte ya dijmin, li gor planan pêvajoya qêdandina me ye. Dîsa li welat di Botanê de provakasyonên mezin hatin sepandin. Li Botanê bi navê gerîla dijmingeriya gel tê kirin. Li Ewrûpa provakasyona parêzer (Husên Yildirim) pir bi eşkere dibêje, "me derbeyek kir, me partî bi dest xist." Ya herî girîng jî di zindanê de ew provakasyona Şener a ku tê zanîn heye. Serokatiyê tam bi dest dixe. Amedê dikşînin provakasyonê, tê belavkirin û her ku diçe Şener insyatîfê bi dest dixe.

Weke ku tê zanîn provakasyona Hogir li Botanê bi navê me xebata belavkirina ku kontrayê herî şareza jî nikare bike dike û vê yekê pir vekirî bi destxistina hemû rayên (yetki) partiyê û bi bêdenghiştina milîtanên partiyê ve dike. Di vê qadê de provakatorê bi navê Metîn (şahin baliç) ku ji Botanê hatiye bi qandî dikare bi ser binke ve diçe. Encam di nîva sala 1988'an de tê xwastin ku êdî bi planeke dijmin yanî di asta jor de bi planeke MÎTê ve PKK di rewşeke bênefes de were hiştin.

Di heman demê de hatina cem me ya Bîrand ku nûçegihanê Miliyetê heye. Bi dewletê re çiqas pêwendîdar e nizanim lê, dipirsiya "ji vê û pê ve ger kevir jî biteqe temenê we 1988 in. Ma hun bawer dikin ku hun dê hîna çalakiyên xwe yên leşkerî bi pêş bixin?"

Bêguman ez ji xwe bawer û ewlebûm. Lê di kesên derveyî me de feraseta serdest û hewaya dixwastin bê dayîn bi teşeyê "êdî 1988 dawî ye" ye. Piştre min jî ferx kir ku, pêşveçûnên derve û hundir nirxandinên bi vê şêweyê hindeki derbasdar dikirin.

Hatina cem a Huseyîn Yildirim gelekî balkêş bû. Pir girêdayî diyar dibû. Li hember min dicurifiya. Ji min re digot, "serokê min dema ez te dibînim, nikarim li ber xwe bidim, dilê min disekine. Ma tu çawa van karan bi rê ve dibi?" Bi xwe re yek du kesên din jî anîbûn. Wan jî wiha digotin: "li gor agahiyên me ji cihên ewle girtine, bêyî ku dawiya 1988'an were hun dê werin qedandin." Dema min digot "hun ji kû dere dizanin?" digotin "istixbaratên filan

cihî gotine. Dewlet xwedî planên girîng e." Wisa gotinên hereşeyî û şantajî dikirin. Piştre jî parezer digot "min ji Serokvezirê Awistiryayê destûr girtiye, were Ewrûpayê."

Tasfiyegeriya ku di zindanê de bi pêş ketiye, dema em gihiştin dawiya sala 1988'an di hundirê welat de xwe sepandina hindek kesên xwedî aliyên provakator, li Ewrûpayê rabûna parezer, dîsa li ber serê me derketina pratîkeke kontrayî, xeterî û îdiaya dijmin a vî karî derdixist holê. Li beramberî van hemûyan, dîsa ezmûneyên me yên zêde dibûn hebûn. Me xwast em pir watedar û xwînsar nêzî 1988'an bibin û li ser pêşveçûyînan fêmdariya me ya zêde û hewlên me yên têgihiştinê mijara gotinê bûn. Di rastiya dahurînên 1988'an bi serdeçûyîna pratîka Hogir heye. Di wargehê de bi perwerdehiyeke mezin dîsa em dixwazin rûyê rast ê kar fêm bikin. Bi serdeçûyîna provakasyona Ewrûpayê jî çêdibe. Û dema em gihiştin dawiya 1988'an, me pêvajoya perwerdehiyê kûr kiribû, jimar zêde kiribû û kêm zêde partî gihiştibû rewşekê ku bikaribe li hember tasfiyegeriyê xwe biparêze. Piştre dîsa destwerdana ser Botanê heye.

Dema em ketin 1989'an me gelekî derfetên pêşveçûyînê afirandibûn. Rewşa me ya perwerdekirina pêncsed berendaman hebû. Dîsa di nava welat de komên ku mezin dibûn hebûn û ev gelekî baş hatibûn amadekirin. Hemû diyardeyan destnîşan dikir ku emê 1989'an pir baş pêşwazî bikin. Dîsa jî gelekî nebesî derketin, me wendahiyên bêwate dan. Lê tevgerê derfetên ku hindekî din bikaribe bi pêş ve biçe afirandibûn. Ji beriya her tiştî em li vê derê gelekî wergir in. Di nava salekê de ez bawerim me hezar kes perwerde kir û me ew girtin bin baskên xwe. Bi qandî ku derfet pêşketin mê wergiriya perwerdeyê zêde kir. Dîsa li hember kesên ku nikarin xwe rast bikin tekoşîn her ku diçû wergir dibû. Li dij kesên seranser, serhildêriya gundiyane, û nêzîkatiyên xizmetî provakasyonan dikin tekoşîneke bêeman hate dayîn. Derfetên hêsantir gihiştina yên çiyan çêbûn. Rê vebûne, bi lez em teqwiyeyan dişînin, her dem û destwerdanan dikin. Van tevan rê li pêşiya pêvajoya asta çalakiya 1989'an vekir. Em dikarin bibêjin ku me ew sal baş

bi ser xist. Bûyera Cizirê hebû, gerîla li Cûdî bû, kok berdabû Botanê. Rewşa vepejrîna gel mijarê gotinê bû.

Di destpêka sala 1989'an cara yekem vebûnek li ser Cizîrê heye. Û di meha Çileyê de rewşa şehît ketina Bêrîvanan (Binevş Agal) heye. Ev yek tê wê wateyê ku me dest avêtiye Cizîrê. Piştre me gelek kom şandin. Nêzî 150 mêran di bihara 1989'an de me derbasî welat kir. Dîsa dahurînên 1'ê Çileya 1989'an hene ku, gelekî wergir in. Ji bo serxistina vê salê amadekariyên rêkûpêk îfade dike. Piştre çend komên destwerdanê yên ji sed kesî ji her aliyê welat re tên şandin

Divê ev sal gelekî baş werin lêkolînkirin û lêkolîn li ser vê bingehê be. Ji bo em 1989'an bi ser bixin û bi taybet li dij provakasyona 1988'an (vaye dixwazin vê salê jî pir biha bi me bidin raberkirin) bi tedbîrên ku me girtine ve em bi ser de diçin. Weke ku tê zanîn, dema berbi 1990'an ve hatin, kêm zêde 1989 hatibû biserxistin. Têkçûyîna ku dijmin hêvî dikir ne, derfetên pêşveçûyînê derketine holê û ev sal watedartir bûye.

Di encam de em xwedî îdia ketin 1990'an.

Baş tê bîra min.

Ji sersala 1990'an bi şûn ve ez demê li wargehê derbas dikim û dahurînan dikim. Di 1'ê çileyê de şehadeta Bêrîvan a li Cizîrê heye. Tam di roja bîstûpêncem de, şehadeta hevalê Hesen Bîndal heye. Û wê demê zilamekî ku pêhtir wesfên wî yên provakatoriyê derdikevin holê heye. Şener, Şahîn Balîç û zilamê ku di ev şerê başûr ê dawiyê de li dij me şerkirî Sari Baran heye. Her sê bûne yek bi ihtimaleke mezin li dij serokatiya partiyê jî komployan plan dikin. Û ev di meha Çilêyê de ye. Çima? ji ber ku ger em zivistanê rast derbixin, sala 1990'an dê bi pêşketinên mezin were biserxistin. Dijmin dixwaze pêşiya vê yekê bigre. Her wiha wê demê efuyeke ku Ozal derxistiye jî heye. Dê deriyên zindanê werin nîvekirin. Bi însyatîfa misoger a provakatoran ve amadekarî tên kirin. Weke ku "ger PKK dest ji çekan berde, em jî dikarin wan efû bikin. Em dikarin Apo jî efû bikin" nûçeyên ku me ji tekoşîna çekdarî bêpar bihêlin tên belavkirin.

## Mem û Zîn

Bi piranî ji bin li benda hêzeke îlahiyane bûn
Îlahê çi?
Ez milîtanek im
Ez jî dixwazim bi peywireke diyar ve bijîm
Peywira me ya pêkanîna bûyereke siyasî ya mezin heye.

Yekîtiya siyasî bûyereke mezin e û dikarin vê weke evîn bi nav bikin.

Evîneke mezin.

Ji ber ku ji bo hemû evînên biçuk wate biderbirînin, divê ev yekitî pêk were. Ger heye ew hêza we, xwe bixin cihê Mem û Zînê, ji bo ku hun evîna xwe bi ser bixin pêdivî bi yekîtiyeke siyasî heye û li dij KT pêdîviya rizgarkirina qadeke biçuk heye. Ji xeteriyê dûr. Berovajiyê vê yekê di stargehan de rewşên weke evînê, lêgerînên zayendiyê xiyanet in. Ji ber ku dikeve nava bêvîniyê, ji ber ku dikeve bêvîniyê nikare komê bi rê ve bibe, ji ber ku nikare komê bi rê ve bibe derbeyê dixwe, dema derbeyê bixwe jî dibe tawana xiyanetê. Bêguman zayendîtî wisa ye.

Û ez bawer dikim kesên ev yek pêk anîn hene. 5-10 kesan îdam girtin û hatin cezakirin. "vîna wî li ber xwe nedaye, vîna wî şikestiye." Ev şer e bêguman li ber xwe nade. Ji ber vê yekê evîn gelekî zehmet e. Li gor hindekan ger te dît, tuyê hema karê wê biqedînî, bû qediya. Dema tu rûbirû mayî, çav bi çav mayî weke tu dixwazî dikarî evîna xwe bijî. Li ku derê? Li hember evînê ma tu dikarî xwe bixapînî? Ma niha li hember rastiyê tu dikarî xwe bixapînî? Ger tu xwe bixapînî ma tu dikarî ji wê re bibêjî evîn?

Ev gaflet e.

Bêguman niha van tiştan ez naxuliqînim. Di bin desthatdariya dijmin evîn wisa ye. Li Botanê keçek hebû. Bi serkeftinî beşdarî çend çalakiyan bibû, gelek şarezabû, min digot çiqas çalakgereke xweşik e. Zilamek hebû, ew jî ji Botanê bû. Navê wî ez bawerim Bozan bû, ketiyek bû. Di serdemeke tengezar de firsend dîtine û reviyan e. Ev ketin zindana Amedê, keçê weke jineke kerxaneyê bi kar tînin. Ev ketî jî weke îtîrafgerekî hîna tê bikaranîn. Rewşa ku keçeke pir xweş bikaribe bi pêş bikeve. Qaşo, ew milîtanek bû.

Van hemûyan bi xwe re encamên balkêş anîn û hindek hatin îdamkirin. QurbanÊn erzan ên evînê. Kî çû bû îtîrafger, kî jî mir.

Ev demeke dirêj e di asta evîneke tirsnak de destpêkirina min a evînê heye. Evîna min a xwedê jî hebû. Lêgerîna min xwedayê tirsnak bû. Vaye evîna min a zanistiyê ya felsefeyê heye. Bêyî van hemûyan evîn nabe. Piştre azweriya min a siyasete heye. Dê baldar bin, ez kariyerîstekî siyasî nînim, min xwe bi siyasetê nekiriye şêt, lê pir eşkere ye ku şerekî min ê siyasî heye. Şerekî siyasî yê mezin pêwîst e, ji bo yekîtiyeke siyasî ya mezin. Ji ber vê yekê, ezê bi peywireke polîtîk a hewlnak xwe rapêçim û pêk bînim.

Piştre ev şev weşiya. Nêzîkatiyên tirsnak hene. Me li vê derê jî şer bi bingehîn kir. Ji ber ku her tişt bi wê, bi şer re dikare were dahûrîn.

Şer xwedayek e.

Tu çiqas bi xwedayê ve girêdayî tuyê ewqas bi şer ve girêdayî bî.

Heta tuyê bibî xwedayekî şer û xwedewendekî şer.

Niha xwedayên me yên herî mezin, xweda yan jî xwedawendên şer in. Kîne ev? Kesayet û serokên bi serkeftinê şer bi dawî bikin.

Bûyîna xwedayê şer tê çi wateyê?

Ji bo ku hun bibin xwedawend divê hun bikaribin şerekî mezin bidin. Bûyîna xwedewenda feodal-entrîkayî: vaye ya li beramberî min hindekî wisa bû. Divê qey ez qral im an jî diçim bibim qral, qraliçeyek kêm e! Lê kar wisa bi dest nedihate girtin. Kesên ku qralan diafrînin, (weke Joseph Fouche ku li Fransayê Napolyon afirandiye) min dît ku, qaşo

li paş min di rola afirandêriya min de ye. Dest ji afirandina vê kesê ya qralan berde, destên xwe ji ava germ nedixist ava sar.

Em min bixin şûna kesekî gundî. Wisa gundiyekî gelekî karker, xwedî kedeke hewlnak. Qaşo ew ji paş min axayê xwedî benên min e û nêzîkatiyeke ji vê yekê jî xirabtir a jiniktiyê. Li ser vê bingehê nêzî hemû zilamtiya me dibe. Şarezayiya wê çi ye? Hişmend bûye, fêlbaz bûye û jin bûye. Bêguman ev nêzîkatî di nava civakê de xwedî bandoreke giran e. Li gel me gelek kes wisa ne, mêtîngeran wisa rêveberî kiriye. Axayan wisa gundî bi rê ve birine. Entrîkayên jinê wisa zilam bi rê ve biriye. Van huneran hemû dike yek û dixwaze min têk bibe. Piştre çawaniya min me raber kir.

Ma çawa dikarin min bi rê ve bibin? KT çawa dikare min bi rê ve bibe? Dewlet hîna dixwaze min bigre bin kontrolê. Em binêrin ka dê kî kê bigre bin kontrolê?

Ezê hindekî behsa Egît bikim.

Em di pêngava xwe ya dîrokî de xwedî biryar bûn. Bi her meşa biryardar ve em qonaxekê li paş dihêlin. Erê di pêngava 15 Gelawêjê de komplo ketin dewre yê. Piştî şehadeta Egît tê bîra min, hindek kesan gotin, "ev kar wisa nameşe, zilamên ku tu gelekî jê bawerbûyî çûn, careke din bi te nefesê nadin girtin." Ji şehadeta Egît re şêwazeke me ya nêzîkbûnê hebû. Ger ku ew dixwazin şerê me yê çekdarî bidin rawestîn, em jî dê bi kêmanî jimarên yekîneyên xwe derbixin pênciyan û bi vê şêweyê bersiv bidine wan. Ger ku jimara yekînê ya ku Egît gihiştiye sih bû, emê jimarên yekîneyan zêde bikin. Emê vê yekê him bi dorfirehî, him bi kûrahî û bi wesfî zêde bikin û bersiv bidin.

Encamên hatine girtin tên zanîn.

Pêwîstiyên bîranînan bi cih hatin û gihiştina qonaxeke pêş çêbû. Bersiva li ser bingehê bîranîna Egît me daye, yek ji nêzîkatiyên herî di cih de bû. Ger min wisa berdaba, piştre emê jî biban çîrokeke bêdawî. Firsend nedayîna min a vê yekê girîng e. Wan deman jî keçek hebû, tê bîra min. Rehîme Kahraman keçeke egît bû. Li gel me bû. Ew jî bi bûyereke pir balkêş şehît ket. Ji şehîdên destpêkê ye. Heta di

derbarê nemirina wê de efsaneyek hatibû afirandin. Digotin ji nû ve vejiyaye, gel wisa vedigot.

Ev jî mir weke Zîneke qels mir û çû.

Hemû di bîra min de ne. Ev keça ku me şandiye Cizîrê jî wisa. Bêrîvan. Keçeke Êzîdî bû. Dema hat gel me xwendevaneke dibistana seretayî bû û ji bo ku xizmete zarokên xwişka xwe bike biribûn Ewrûpayê. Me ew gelekî bandor kir û me kişand qada xwe. Esas me xwast em hînî hezkirinê jî bikin. Me xwast em hindekî bi wê jînê şiyarbikin.

Û dema gihişt Cudî di nameyeke nivisandî de, behsa semyaniya çiyan û bi azwerî behsa bidestgirtina gel dikir. Û ket nava gel. Bi qandî ku li çiyan dihat, li çekê û li gel jî dihat. Û xwe bi gelê Cizîrê da hezkirin, gelekî da hezkirin. Gel jî ew girt, mirov dikare bibêje ku piştre di rabûna gelê Cizîrê de bandora vê keçê gelekî mezin e. Esas em van bûyerên wisa zêde nanirxînin, lê ma ew kes çi îfade dikin? Bi vê bingehê bi nirxandinekê re mirov dikare di cih de bide rûniştîn.

Û wisa li sedan kesan dan. Bêguman şêwaza lêdana wan a dijmin jî hindekî qehremaniyane ye.

Ji ber ku mirina Zînê ya li wir tê zanîn. Memê dibîne û dimire. Mem lê temaşe dike û dimire. Lê di destên van de çek hene, bi şerkirinê dimirin û ev yek jî gaveke pêş e.

Hezkirin û azadiya mezin ve girêdayî ye. Azadiya mezin bi şerê mezin ve girêdayî ye.

Evqas hesasiyeta me ji bo rê vekirina li pêş hezkirinên mezin e. Ji bo nêdîtina vê yekê ya di nava PKKê de divê mirov kor be. Nêfêmkirina çareseriya PKKê ya di vê mijarê de, tê wateya xwedî diliya conegan. Riya yekem û xwedî hêz a hezkirinê ev e. Derveyî vê yekê evîn miriye. Derveyî vê yekê hemû tiştên bi navê evînê tên kirin gemarî ne. Her wiha firsendeke mezin heye. Ev firsendeke bêhempa ye. Weke kur û keçên gel, piştî ku me şerê azadiyê wisa gihand şêweyê jiyaneke şênber êdî tu kesî ji we dilxweştir nabe.

Ji dilxweşiyên herî mezin ên ku min didin jiyîn yek jê jî ev e. Belkî di zaroktiya xwe de me baş bi keçikan re nelêyîst, lê ez niha bi keçan re baş şer bi rê ve dibim. Heke

hun dilxweşiya vê nabihîsin, bersiva pêwîst hun nadin, hun dîlê kevneşopiyên kevin, paşverû û zingar girtî ne. Di vê mijarê de yê ku winda bike dê ev paşverûtî be. Dema em di PKK de careke din çareseriyê dinirxînin, ez bawer dikim ku, di riya hezkarî ya ku mafê me ye de, me ya herî rast kiriye.

Ji warê hezkirina mezin bêpar, ez riya çûyîna hezkirina herî mezin vedikim. Belki dirêj be, lê di berbanga mirovahiyê de li ser ev axa ku yekem car bûye warê babistîna (soy) mirovan, hezkirinê û hestên zilam û jinê yên destpêkê jiyane, vê carê azadtir, zanatir û belkî tu azadiya jin-zilam a di tu rastiyên civak-netewa cîhanê de beden negirtiye, him ji bo pêşvexistina şerê li dij dijmin û him jî ji bo sererastkirina bêmafiya li ser hev şerkirin û di encama vî şerî de bi qandî dîroka mirovahiyê kevnar, a ku hatiye wendakirin dê bi şûn ve were bidestxistin.

Bi pisporaneyî rengdayîna wilfa azadiyê, taybetmendiyeke mirovî ya bingeh e. Me ew gîhand. Me daxwaza azadiyê xiste pêşiya gel. Û ez bawerim vê yekê tedbîrên şerê taybet parçe kir. Min pêhtir xwe xist awêneya civakê.

Min weke awêneyeke xwe xist nava gel.

Ez bawerim vê yekê jî tedbîrên şerê taybet parçe kir. Min çawa xwe amade kir? Mesela pergal feqîr dike, ez xwe dewlemend dikim. Pergal pir dixe lîtavê, ez pir dipîrozînim. Pergal pir ajoyan radike ji piyan, ez hezkirina awarte mezin dikim.

Esas bersivdayînên min ên mezin hene. Pergal pir tirsnak ji rêkê derdixe, nezaniyê bi pêş dixe. Ez çalakiya zanebûnê bêeman disepînim. Vê yekê ez pir erjeng dewlemend kirime û niha bi aliyekî min ê mezin ve, ez artêşeke bi serê xwe me.

Mirina min jî dê ji zindîbûna min pêhtir kar bike.

Zindîbûna min jî her roja biçe dê pêhtir kar bike.

Mirovê xwedî rêxistin hêzeke mezin e.

Tu kes nikare îdia bike ku ez ne hêzeke mezin im. Jixwe di hiş û eqlê dijmin de jî hilnayê. Dibêje ku, "kesekî wisa çawa dikare vî şerî bide meşandinê? Li paş wî cîhan heye."berovajiyê vê yekê tê zanîn ku ez li ku dera cîhanê me. Cîhan li pişta min e, yan jî li pişta KT yê ye?

Cîhan li pişta min e, lê ez dikarim bibêjim ku ez li pêşiya cîhanê me.

Mirovê ku xwe baş rêxistin kiriye li gor min dikare ji bombeya atomê jî bandorkartir bibe. Min ev yek kir. Û ez li ser vê bingehê ji mirov bawer dikim. Ger baweriya min a bi mirov evqas mezin nebûya, min nedikarî ez wisa xwe bi pêş bixim. Hemû hêza min bi rastî jî bi vê teşeyê ji destgirtin û pêşvexistina mirov tê. Tu kesî çend qirûş pere nedan me. Her qada ku ez çûyîme ji sifirê re hatiye destpêkirin. Bi bawerî, ked û zanebûnê stirîna me, pêşveçûn derxistiye holê.

## Şahmaran

Fatma di cihekî de dibe kurtasiya dîrok, civak, mêtînger û hevkarên desthilatdariyê. Bêşensî yan jî şensê min, wisa balkêş û dixwaze lêrasthatî be, dixwaze weke encameke xwezayî ya vaca tekoşînê be, dixwaze jî bila îfadeya kesayeta ku ez pê re rû bi rû mame, têkîliya bi jinêkê wisa re hêz dide mirov. Hîna tê bîra min, qey hemû giranî bibûn yek û li hemberî min rawestîbûn, hemû pirsgirêk têkilhev bibûn li gel hevbûn. Qey weke ku ez wê careser nekim nikarim tu gavekê biavêjim, asteng û lûtkeyeke mezin li pêşberî min rawestiyaye. Ger tu nikaribî çareser bikî tu nikarî bi pêş ve biçî. Ger tu têneperî meşa te nagihê encamê. Ka dibêjin, jiyanê tevna xwe hunaye û dê te bixîne nav. Tuyê têperî yan jî têneperî? Û her ku diçû ez difetisiyam, divê qey ez di nîva golekê de me û vedigevizim. Ma ezê bigihêm qeraxê yan jî negihêm, ez di nava van hestan de me.

Di wê derê de dîrokek veşartiye.

Mêtîngeriyek, xiyaneteke Kurdan, ketineke Kurdan, xiyaneteke jinê, xirab bikaranîneke jinê.

Şêwazeke min a kuştina maran hebû. Her ku çû ev şêwaza min li gund hate bihîstin û kê mar dîtiba direviya dihat gel min. Bi vî awayî min pêşentiya kuştina maran bi dest xistibû. Dîsa di paleyê de ez xwedî îdia bûm. Ez her kesayetekî wisa xwedî aso bûm. Dema em di rêkê de dimeşiyan diviya ku misoger ez gavekê bi pêş ve bûma û ya girîng jî dema ku min ev yek dikir ez xwedî baweriya hêza xwe ya puxteyî bûm. Tu deman bi spartina tu kesekî din ve ez nebûm xwedî derfeta pêşveçûnê. Tu daxwaziya min a wisa jî tunebû.

Em hemû tevgerên fetihgerekî ne

Ez li dûv civîkan direviyam. Li banî girtina civîkekî, bi qandî îmhakirina yekîneyeke dijmin girîng e.

Hilperîna bi hêlînên teyran ve, dîsa kuştina çend maran, tiştekî weke kuştina dijmin e.

Ez bi qandî ku gelekî xwezayî bûm ewqas jî bandorkar bûm.

Wisa bi hezaran bûyerên min hene.

Gelo pêwendiyên we yên wisa çiqas in?

Pêwîste mirov bi we ezmuneyekê bide jiyîn. Em direndeyekê yan jî marekî biavêjin rastê. Ka ev dê rê li ber hest, hizir, formasyon û teşegirtineke çawa vebike? Mirov weke gurekî serîhildayî bihizire, weke marekî bihizire, weke direndeyeke ji rêzê bihizire, dê çavên we derbixe, dilê we derbixe û dê hawireke wisa we gelekî tengav bike, wê demê mirov dikare taybetmendiyeke çawa bi dest bixe? Em rêxistineke mezin û hêzeke parastinê bidin we, ma hun dikarin wê bi kar bînin? Ma hun dikarin ji baldarbûnan birevin? Ma dê çavên we her dem amade nebin?

Ma ev yek ne taybetmendiya herî bingeh a şer û şervanan e?

Kurdistan bi maran ve dagirtiye.

Di bin her kevirî de marek heye ne wisa? Balkêşiya min esas zeka min e. Ez dibêjim ger welatê te çawa ye, divê hundirê mala te jî wisa be. Serhildana me ya yekem jî kêm zêde dişipe vê yekê. Hun çawa têkîliya jin-zilam dijîn ez ji we re bibêjim. Hun weke zarokê di paşila diya xwe de razayî ne. Di nava malê de jî hun ewladên gelekî baş in. Ger têkîliyeke jin-zilam jî hebe, dê ev hest we bibin ku derê? Ma ev li gor realîteya Kurdistanê rasteqîn in? Ev hest misoger we berbi xewokiyê û derveyî nakokiyan dibin. Berbi dahurînê û dîtina dijmin ve nabe.

Lê hawirdor û kevala ku min afirandiye gelekî balkêş e. Bi qandî ku hêza min bes dike ez dikim. Hêza min encax têra vî qasî dike. Jixwe ger min ev serkeftin bi dest nexistiba, ma min dikarî ez marên di nava PKK de bibînim? Ma dikarî ez provakator û koremarên nava PKK bibînim? Ger min hêza berxwedanê bi destnexistiba, di nav cîhana xwe ya hundirîn de, di nava PKK de, ma ez nediketim rast an jî

çepê? Di tekoşîna rizgariya netewî de ma min dikarî ez vê hêza berxwedayînê raber bikim?

Dê hemû bibana. Vaye binêrin, ez waneya xwe çawa hîn dibim, ez mamosteyê têkîliya xwe çawa derdixim holê. Di wisabûyîna rewşan de misoger tu qest nîne. Çawa ku, ez di serhildana xwe ya yekem de bi birayê xwe re rû bi rû mam, qaşo dê ev jî ji min re biba hevjîn. Lê rexmî vê yekê bûyerek çêbû. Ji dirûstiya min a vê derê tu caran guman nayên xwarin.

Di encam de damezrîn an jî plan nîne. Rewşeke girêdayî rast bi destgirtina şêwaza mirov bi xwe ye, girêdayî tawîz nedayîna ji rêgeza azadiyê ye. Hema weke serhildana yekem, li hember rêgeza feodal şerekî azadiyê hate dayîn. Li vê derê jî li dij mêtîngerî, hevkarî û heta li dij têkiliya jinê ya ketînêr bi wergiriyeke mezin şerekî azadiyê hatiye dayîn. Ya girîng jî, emê ew cîhana we ya ji cîhana Kurd pêk tê vebikin.

Ez her roj li ser fermanan kûr dibim. Ez dibêjim, hesas be! bi berbirsyarî tevbigere! Ma mirov wisa dikeve kemînê? Ma mirov wisa pêle mayînê dike? Tu caran ev tişt nakevin serê min. Ezê dîn bibim. Niha ev kesayet li paşila diyan de bi nazdarî hatine mezinkirin. Cîhaneke wan a têkîliyan heye, bi navê "dost" xwe li pêçane, xwe wendakirine, neqebûlkirineke wan heye. Ma şergeriya Kurdan jî wisa nîne? Di heman demê de xwewendakirina di wî şerî de. Her du jî bêencam in.

Lewra ya min dikeke pir balkêş e. Hun arenayê dizanin. Şerêkî diavêjin arênayê, yek jî gladyatorekî weke Spartakûs. Yekî weke Spartakûs derdikeve bi şêr re şer dike. Ya me naşipe şeran. Marekî mezin, jixwe giyana mirov dicemidîne.

Erê, marekî cemidînêr. Zimanê xwe derxistiye, dixwaze jehra xwe ya weke qeşayê birêje. Jixwe wisa kir. Erê wisa bihizirin ku hun deh salan bi wê re di heman cihî de man.

Niha Kurdistan bi maran ve dagirtiye. Em li ser qehremanên xwe yên ku dixwazin bi maran re şer bikin bihizirin. Di heman kêlikê de dê werin lêdan û biçin. Yani axa, beg û hevkar hemû mar in. Jixwe dorhêl bi ajanan ve hatiye dagirtin. Hemû cerdewan mar in.

Hun dê çawa ji destên van xilas bibin?

Vaye hindek waneyên ku hun ji şêwaza me derbixin hene. Tu wisa li Kurdistanê, li mala xwe yan jî di odeya xwe de bi hêsanî nikarî birazî. Dê çavên her li xeteriyê bin, dê destên her li ser tetikê bin. Ji ber ku hema wisa bi hêsanî jî tu nikarî li mar bidî û bikujî. Li welatê me bi mîlyonan mar hene. Divê mirov sebirdar be.

Yek jî gelekan xwe li kavilê berxan pêçaye. Tu bi çekê nikarî lê bidî. Ez wisa serkeftineke bi lêdana çekê bawer nakim. Pir eşkere ye ku mar bi şêwaza klasîk nayên lêdan. Li şêwaza lêdanê binêrin. Me got, "maro tu bireve! Emê li te nedin!" û wisa dika lêdanê cudatir û dema wê jî cewaztir bi pêş xist. Mesele di şexsê marekî de lêdana li hemû maran e. Di rastiya Kurdan de dema yek li yekî bide, dibêje "me tola xwe hilgirt." Di şerekî malbatî de, di şerekî gundî de her tim wisa dibêjin. Vaye şêwaza lêdana me wisa ye. Ger min jî di heman demê de lê daba ma dê wisa nebe?

Ger min bi şêwaza lêdana şerê Kurdan lê daba, min dê xwe biqedandiba. Vaye hişmendiya mezin di vê derê de ye. Vegezandina marekî, dayîna revandin û ya herî girîng jî xwe bi wî/ê nedayîna gezkirin gelekî girîng e.

Niha hindekî Kurdistan ji maran paqij dibe.

Paqijbûna ji maran jî ji ber vê şêwazê ye.

Mar jixwe bi çil cureyan in. Yani di hest û hizir de jî mar hene. Hest û hizrên we yên mirinkar û xwedî jehra mar hene. Min ew eşkere kirin ne wisa?

Bihizirin hestek çawa we dikuje? Têkiliyeke erzan a jinê, têkiliyeke erzan a zilam, rayeke erzan, gaflete erzan, rewşeke xewê, nemeşîneke rast a riyekê. Ev hemû mar in. Ev hemû ji şêwaza we ya xewok a kevneşop, ji neşiyariya li hember rastiya Kurdistanê, ji her teşeyê bandora dijmin re girtina çavên xwe, li her hawirdora xeternak ji meşa çavreşiyê û ji şerkirina we çavkaniya xwe digre. Ev yek jî qedîn e.

Ma hun dê çima rastiyan fêm nekin?

Ger hun xwedî hêza xeyalan bin hun dê van waneyan hîn bibin.

Ev welat wisa ye û li vî welatî şer wisa hate dayîn.

Digot ez şahbanû me, heta weke şahbanuyeke ku ez afirandime xwe bi rê ve dibir. Ji vê wêdetir, pir şanaz dilêyîst.

Ev şahmaranek e.

Pir balkêş e, bi her tiştê xwe bandor dike. Di deh tiliyên wê de deh şarezayî hene. Ciwanmêrên weke we di deqeyê de dibe. Keç jixwe li ser tiliya xwe didan lêyîstin. Şerê me bi rastî jî gelekî balkêş e û min jî ji karên wisa zewq digirt? Nizanim. Li gor we min çawa ber xwe da?

Cîhaneke wê ya desthilatdariyê hebû. Kesayeteke xwedî fêmkariya vê yekê ya lez e. Dîha di nîvên salên 1970'an de didît ku ez derbeyeke mirinî li jiyana wan di asta herî jorin didim. Ez li tu kesekî din rast nehatim ku xwe weke şoreşgeran raber bike, xeteriya herî mezin fêmbike û li gor wê xwe bisepîne. Bûrjuva û kemalîstên herî jîr jî evqas zû û rayeyî fêmnekirin. Jixwe hostetiya vê ya mezin jî di vê derê de ye. Ev rewş tespît kir û mal ji Qereqoçanê da barkirin. Di 1975'an de hîna rêkûpêk derkete beramberî min. Dixwast vê yekê bibêje, jixwe piştre hindekan gotibûn, "Fatma li ser Kurdistanê dilêyîze, ez li ser Botanê dilêyîzim û nizanim kî li ser kû derê dilêyîze." Vaye nîqaşên wisa bi rê ve dibirin, bêyî ku tu kedê birijînin! Bi lêyîstina li ser min ve dixwast ji desthilatdariya berê ya malbatê desthilatdariyeke mezintir bidomîne.

Ev hetanî asta dawî bi şeytanî karanîna hiş e. Lewra dikarîbû bi teşeyê watedayînê jî şîrovebikira. Tirsnak temaşe dike, dibêje, "tu cîhana me reş dikî."

Min pir vekirî raber kir.

Ez cîhaneke azadiyê xêz dikim.

Di ev cîhana azadiyan de tu jî dikarî bibî xwedî cih. Hetanî dawiyê emê piştgir bin. Jixwe têkîliya taybet jî ji ber vê sedemê ez hizirîm. Weke "ev gelekî hevkar e û dibe ku zehmetiyan bikşîne, bila ji niha ve xwedî piştgirî be", ez wisa remzî nêzîkbûm. Lê qutkirina têkîliyên xwe yên kemalîst û çîna hevkar li aliyekî bihêlin, xwe bi rengdayîna zemîna me ya çînî ve bi kar bîne.

Ez bawerim hebûna nakokiyeke mezin ferx dike. Ez bawerim me jî weke milîtanekî nû, dilpakekî gundî dihizire

û dixwaze bi karanîna jinikatiya xwe ve me ji rê derbixe û kontrol bike. Hişên xwe ji bo vê yekê bi kar tîne. Bi me re ji bo sosyalîzmê, ji bo rizgariya hiştên xwe bi kar bîne... na! Tiştekî wisa nahizire. Berovajiyê vê dixwaze van çekan ji destên me bigre, ji bo armancên xwe yên bêyom (ugursuz) bi kar bîne, bi xwe spartina me ve binkeya rêxistinî xirab bike û misoger rê nede bilindbûnekê.... Min tu kes weke wê nedît ku bi navê pergalê şer bike. Tu kesî ku bi fêmkariya me re wisa hunerên xwe yên jiniktiyê bi kar aniye bi rastî min nedît. Ji jiniktiyê jî wêdetir, esas gotina jiniktî-zilamtî jî ne di cih de ye. Bi kesayeteke pir cewaz dixwaze pêşiya me bibire. Bi vî awayî dida zanîn ku "ka ez çawa cîhanê difetisînime."

Mirov dikare bibêje "şahbanuya tariyan"

Weke ku min gotiye tu caran tarîtî ji serê xwe kêm nekir.

Ji ber li dij cîhana me ya bilindbûnê, temsîlkareke rikdar û hişmend a pergala kifnikî bû neçar bû ku em wisa dijberî hev.

Ma dikarîbû veguheriya?

Tê wê wateyê ku kesayeteke ku wisa hatiye stirîn xwedî şensê veguhertinê nîne. Jixwe ger em zêde bi ser ve çûyîbana dê bişkesta û bimira. Ji bo van mirov nikare behsa veguhertinê bike. Û armanca wê ya bingeh jî, bi şêweyeke pir jandar serpêhatiya PKKê bi dawî bike, û weke ku provakatorê din gotiye, "çawa za ye wisa kirina bin erdê" ye. Ev yek bi ser nexist. Ez bawerim li hember vê yekê gelekî hêrsdar bû û xwast xirab bike. Gelek kes xistin rewşa xwekuştinê, revê û tevlîheviyê. Lê em jî mezin hînbûn û me mezin bandor kir. Bi şêweyê veguherîna asta netewî me rengê bandora wê da û ez bawerim KT jî vê yekê fêm dike û ew jî fêm dike.

Rizgarbûna min a ji wê, zayîneke duyem e. Hîna jî bawer nakim, gelo ma ez ji wê kabosê rizgarbûm an nebûm?

Em li dij neheqiyê, li dij zordariya mezin şer dikin. Di vî zilamî de dil gelekî mezin e, hezkirina welat misoger mezin e. Bêguman, ger xwe rewşa şervanekî kor. Û ya herî girîng jî aliyê pêşvexistina mirov a şer heye.

Li gor min kesê şer neke ne dibe xwedî hest ne jî dibe xwedî hezkirin. Ger bibe jî gemarî ye. Ez hîna jî ji tu tiştekî ku baş tekoşîne neke hez nakim. Asta ku gav bi gav hezkirina min bi pêş ketiye, bi zanebûn, rêxistin, û asta pêşveçûyîna çalakiya kes ve girêdayiye. Ast misoger wisa ye, gav bi gav, bi pêşveçûyîna tekoşînê re tê. Derveyî vê yekê her tişt pûç e. Bila wisa fizîkeke we ya lihevhatî hebe, min ên wisa jî dîtin misoger nefret dikim.

Mixabin dewlet, di vê mijarê de jî bûn qurbanê hesabên damezrînên xwe. Ev wisa dihizirin ku, ger jineke wisa lihevhatî bi kar bînin dê min bi dest bixin. Lewra berovajiyê vê yekê ez xwediyê wê pisporiyê me ku him dewletê û him jî wan bi kar tînim. Bêguman niha nikarine diyar bikin. "Apo çawa mirovan bi kar tîne?" bêguman ezê bi kar bînim! Him jin him zilam kesên ku li ser bingehê xiyanetê, bingehê koledariyê nêz bibe ezê bi kar bînim. Ez eşkere dibêjim, ez dikarim zilam ji jinan xirabtir bikim. Ger li ser bingehê xiyanetê nêz dibe, ger li ser bingehê ketîbûnê nêz dibe, ez dikarim jinê hezar caran ji jintiyê bidim poşmankirin. Di vê mijarê de şerê min gelekî dijwar e. Ezê jînê li wê heram bikim.

Ez zagonekê li ser we bar dikim.

Zagona rast hezkirinê.

Zagona gihiştina azadiyê.

Li ser vê bingehê zagona dirêjbûna ji jinekê re û ji têkiliyekê re. Min got têkîliya hêsan nabe. Ev yek ji bo min jî derbasdar e.

Ez evqas ji bo azadiyê şer dikim, evqas ji bo azadiya jinê şer dikim û ev yek ji bo min destpêkek e. Na ger kes bibêje, "hêza min heye, bandora min heye ez hema jinekê bigrim bin desthilatdariya xwe" dikare vê yekê bike. Lê bi vê yekê re dê çi wenda bike? Dê mezinahiya xwe wenda bike, dê radestiyê bijî. Di vê rewşê de, ezê pê bihesim ku li dij, rêgeza rizgariya jinê ye û berovajiyê rêgeza rizgariya jinê tevdigere. Ezê jî ji wî sudê werbigrim, di her teşeyê tiştên erzan de bi kar bînim. Vaye pir di ser re derbas bû, ka mezinahiya te li kû ma? Hun dizanin ji bo ku ez jî xwe mezin bigrim, ez neçarim ku tekoşîneke mezin bidim.

We tenê jinek xist hişên xwe û dilê xwe. We got, "wisa hezkirina min, wisa evîna min" an jî jinek we wisa qebûl dike, wisa hate girêdan. Ma hun dê çawa vê yekê qebûl bikin? Li gor min, tuyê ji sedî yek wê di dilê xwe de hîs bikî, ji sedî nodûnehan jî bidî parastina nirxên din. Pîvanên min bi xwe hene. Jinek, an jî kesekî ji rêzê, zilam jî, bila were gel min û bi çav reşî bibêje, "ez evqasî bi te ve girêdayî me!"... Ezê bibêjim ez serok im, ev jî tê wateya Kurdistan. Kurdistan jî tê wateya şer. Tu tiştekî din ez qebûl nakim. Ezê bibêjim, "ji min pêtir hindek nirxên ên hêjayî girêdaniyê hene." Welatekî min heye. Di encam de ev yek wisa ye û em hişyariyeke mezin pêk tînin.

Tuyê evqas ji welatê xwe hez bikî, tuyê evqas ji mirovan hez bikî. Huner heye, zanistî heye, evqas asta civakî heye, tuyê wan jî bibînî. Piştre bêguman hindek nirxên bingeh hene, piştî van hemûyan, tuyê hezkirinê, tekîliyê, têkîliya hevjîn-dostaniyê binirxînî.

Hun di nava me de dîroka şeydayan dizanin. Çîrokên weke Leyla –Mecnun ku çavên wan tu tiştî nabînin we gelekî bihîstine. Ger her tişt wisa be, tuyê jî wisa biqedî. Ji kesekî ku wisa xwe di nava hestan de fetisandiye û evqas xwe bi kesekî fetisandiye xêr nayê. Çi ye ev? Vaye divê di vê xalê de, em aliyê civakê yê mezin bi aliye asta azadiyê ya mezin re bigihînin hevsengê.

Û em çawa dikarin ji jinê ev hestyariya mezin rabikin? Ev bêçareyiya mezin a li ser tekîliya serdest a Kurd em çawa ji holê radikin?

Ji ber nêzîkatiya hevsengî. Serokatî ev e.

Ez tevgera mezin a serhildanê me. Ez tevgereke mezin a çareseriyê me. Ez tevgera mezin a rêxistinê me.

Pir eşkere li holêye ku her kêlikê nêzîkatiyên min çawa bilind dibin.

Min xwe da destpêkirin ne wisa?

Min raber kir û didome.

Çiqas bêçare, çiqas bêkes, çiqas bêderfetî, çiqas serê xwe li rast û çepê didim, çiqas li erdê û asîman dimêyzînim, çiqas li guran-çûkan, maran-mişkan temaşe dikim, çiqas li hewayê, avê hemû tiştên li xwezayê peyda ne, çi tiştên li

civakê peyda ne temaşe dikim û dixwazim çareseriyekê peyda bikim.

Rêz ev e.

Fetihkirina jiyanê, fetihkirina şer, fetihkirina mirov û çi pêwîst dike bi wî re xwe fetihkirin.

We dît, ez çi ji xwe dikim?

Niha tirsa artêşa dijmin mezin e. Me çawa rê li ber wêrekiya nava me vekir? Bi hêzê me ev yek kir. Me ev yek bi kar kir.

Di aliyê madî de jî, ji bo ku ez deh qirûşan ji bavê xwe bigrim, bi qareqar bi girîn û nalîn min qiyamet radikir. Ger niha em bibêjin alîkariyek gel hebûn û nebûna xwe derdixe holê. Niha ref bi ref mirov, ji bo bi mirinî her tiştê xwe bidin çawa tên nava refan? Ma ne wisa bû ku bira ji bira re nedibû alîkar. Ên herî nêz derveyî berjewendiyên xwe gav nediavêtin. Ev yek çawa hate afirandin? Ez gelekî baş dizanim ku Kurdan berê ji bo bostek ax birayê xwe dıkuşt. Ji bo sê yan jî pisîkekê cîranên xwe dikuştin. Niha çawa hate vê fedakariyê? Berê ji bo dîtina keçekê xort deh salan li xurbetan diman. Ji bo qelenekê, him jî ji bo têkîliyeke bêdil, ji bo têkîliyeke koleyane. Lê niha pêl bi pêl jin tên. Me ev yek çawa afirand? Me çawa afirand ku hetanî dawiyê hebûna xwe tunebûna xwe dadixîne holê, divê ev yek were fêmkirin.

Dema em zarokbûn jî me xeyal avadikirin, belkî her kes xwedî van xeyalan e. Lê nayê zanîn ku ka dê çawa ew xeyal veguherin romaneke mezin û çawa bi jiyanê re bibin yek. Ev bû nasibê min an jî ji min re bû bar. Êdî gelo ev fermana xwedê bû, yan jî paşverûtiyên mezin, ketinên mezin û jiyana fêdîkar bû ya em xistin nava vê? Yan jî azweriyên me bi xwe bûn?

Belkî hema hemu jî tê de xwedî rol bûn. Encam mafê jiyaneke wisa. Ez weke qederekê jî nabêjim, weke jiyaneke ji berê de were tercîhkirin û bi vîna azad were bidestxistin hat em dîtin.

Yên qehr dibin bila qehr bin, ên dijîn bila bijîn.

Û em naxwezin bila tu kes wisa bi hêsanî wenda bike. Berovajiyê vê yekê em ji dijmin re jî dibêjin. Qet nebe dijmingeriya xwe li gor zagonên şer bike, evqas pêwîstî bi

dînbûna şerê taybet nîne. Wî hemû dînokiyên mezin ên şer kirin, hemû zagonên babistinî yên dîroka şer bin pêkirin. Esas li gor zagonên şer jî dikarîbû me biperçiqîne. Mixabin gemar kir. Navê şerekî weke şerekî pir qirêj di dîrokê de nivîsandin. Bêguman em jî neçar man ku em aliyê şer ê pîroz kûr bikin.

Ev şerê ku em dimeşînin pîroz e. Belkî jî yek ji şerên herî pîroz e. Ev jî bû malê dîrokê.

Lewra em aştîgerên pir xwezayî ne. Em jînê bi aştiyê pênase dikin. Jiyîn aştî ye. Ez bawerim ku em îfadeya herî bijarte ya vê yekê ne. Misogere ku ez vê yekê temsîl dikim. Lê were li vê sosretê temaşe bike ku li ser jîna aştî, aştiya jînê wisa bi şerê taybet azîneyên gemarî hatine bikaranîn ku, yekî weke min newêrekê zorê jî neçar dimîne serî li zorê bide.

Hîna gundiyên me dibêjin. "mirovekî wisa ye ku moriyekê naêşîne." Rast e. Ne tenê moriyekê ez ditirsim parçeyeke giha jî bişkînim. Lê kîjan demê min dît ku pêşiya jînê bi tevahî hate girtin, pêşiya daxwaziyan hate astengkirin û pêşiya berzbûnê hate birîn, wê demê min xwast ez gelekî biaxivim û gelekî nîqaş bikim. Min dît ev yek jî wisa hêsan nîne. Ji zû ve pêşiya vê yekê jî hatiye girtin û min dît ku hêzeke zorê li ser tê pêkanîn. Dîsa rexmî ku ez qet ne amadebûm, rexmî ku ez bi qandî kesên din wêrek û fedakar nebûm, ez eşkere diyar dikim ku min ev yek dît.

Divê şêwaza min a jiyanê baş were berhevkirin. Ez pir tirskar im, di vê wateyê de navê min ê din jî tirsonek e. Dibe ku ez wisa bim jî, lê bi rastî jî dema hemû rêkên jiyanê hatin qetimîn, dema hemû teşeyên şanaziyê di bin lingan de hatin perçiqandin, dema min dît êdî tu xalên bergehê neman (bêguman ez di wateya mirovê şanaz de dibêjim), min bi neçarî dest bi van karan kir. Di hunera şer de kesekî weke min tirsonek, îro bi şêweyê herî pêşveçûyîna pisporiya wî ya di vê hunerê de nakokiyek e. Lê vê yekê wisa dest pê kir. Ev yek tê wê wateyê ku, bi jiyan û aştiyeke mezin ve, kesê xwedî îdia, israr, bêxiyanetiya ji jînê re, bi şêwaza fermana pergalê nepêşwazî kirina jiyanê, berxwedana li hember pergalê, dîsa serî netewandina li hember koledariyê ve (ger

dixwaze bi rastiya xwe re yek be, ger naxwaze xiyanetê li îdiaya xwe bike, ger dixwaze biryariya xwe ya jiyanê misoger bidomîne) û kesê dixwaze jînê bi aştî û azadiyê ve bimeşîne, misgoer divê vê hunerê bidomîne.

Ez pêwîstiya mayina tendurist tînim ser ziman. Ji kesên xwedî birîn re dibêjim ku divê mirov şanaz bimîne. Ji kesên xwedî şanaziyên gemarî re, yên di bin lingan de hatine perçiqandin re dibêjim. Ne girîng e ku ev yek ji rêveberên şerê taybet re derbe ye yan na. Ev şêwaza min e. Ez ev im. Bi ihtimaleke mezin jî ezê wisa bi encam bibim.

Tu niyeteke me ya wisa jî nîne ku ez nûçeyeke xerîb weke ewleyiya serkeftinê û misogeriya serkeftina gel bidim. Di vê mijarê de jî şêwaza min şêwaza serkeftinê ye. Divê ne kes ji bo nepêkhatina xeyalên min, min rexne bike û nejî divê tu kes nirxanên li ser paşvemayîna serkeftinê bike. Ji bo serkeftin destpêk û dawî ye. Tenê her kêlikê serkeftin li ser hev dicive, di hindek serdeman de weke pêngavekê derdikeve. Her rojeke min, her kêlikeke min xelekeke serkeftinê ye. Di min de şikestina xelekan nîne. Tu rojekê bi paş ve namîne. Ev şêwaza xwerêxistinkirina kesekî ye. Ger ev îro hêviyê diafrîne, ger misoger vegeriyaye hêviya serkeftinê, ew mafê gel e. Ez xwe têkilî vê nakim. Ez xeyalên hêviyê yên taybet belav nakim. Ji tu kesî re jî derveyî şêwaza xwe hêviya serkeftinê pêş nabînim. Heta wisa xwe dayîna baweriyên serkeftinê zêde guncaw nabînim. Rastiya serkeftina min ev e.

Jiyana min e, şêwaza min e, tempoya min e, uslubê min e û di her cihî de derbasdar e.

Mezinahiya min di ku derê de ye?

Ev çil sal in li dûv çareseriya nakokiyan im û hindekî jî çareser dikim. Min dijminê esas tespît kiriye. Bêguman, ji bo naskirina dijmin peyv tunebû. Îro bi zanistiyeke qandî deryayê me gihandiye rewşeke bênefes. Kemalîzm bênefes hate hiştin. Hemû îdeolojiyên paşverû bênefes hatine hiştin. Heta bêpolîtîka hatine hiştin. Çima? min kir. Min xwe ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve daye û min kir. Emê artêşa wan jî bênefes bihêlin.

Erê bi tena serê xwe min hemû pêvajo hildan ser milên xwe. Min hetanî vê derê anî. Îro ew zilamê ku bi evqas derfet jî nikaribe xwe bi pêş bixe mafê wî ji tu tiştî re nîne. Û ez jî wî nasnakim. Ez ev im. Ez xwe li dij dijmin wisa amade dikim û wisa didim şerkirin.

Her çawa be jî mirov dikare xwe biafrîne û her dem pêşveçûnên mezin avabike. Ger mirov wisa jî temaşe neke nabe. Rexmî ku xwedî gelekî pirsgirêk e, rexmî ku me pirsgirêkên herî bingeh xistine rojevê li ser van neponijîn, xwediyên pirsgirêkan dixe rewşeke xirab û qonaxeke hesab dayînê. Bi salan e ji bo di ev karê dayîna hesab de ji bo ez kêmaniyan nekim, ez gelekî hesas nêz bûm. Jixwe di Kurdistanê de cara yekem em rêxistineke bi vî awayî pêk tînin. Ji bo neketina kêmaniyan bi qandî sebreke mezin, em zirav dihunin û şidyayî didurin. Ji ber ku ez kêm zêde dizanim ku ka ez bi kelûpeleke çawa re rû bi rû me. Di vê mijarê de divê mirov zêde dilpak nebe. Lê gelek caran jî ez ji xwe dipirsim, "gelo ma ezê hîna çi qasî din li ber xwe bidim?"

Yanî hîna şîreta dayîka min e: tu bi van re mijul dibî, lê ma dê ev weke hizra te derbikevin? An jî hewla ku tu raber dikî, fedakarî, ma dê bersiva van hemû bi serdeçûyînên te werin dayîn. Ev tenê hetanî ku karê xwe bi te re biqedînin weke bi te re ne dê xwe diyar bikin û piştre jî dê her kes li xwe binêre." Bêguman, ev rastiyeke hişk a jiyana me ya madî û materyalist e. Raste jî, lê rastiya kê ye? Ev rastî xizmeta kê dike? Ez hîna ji wê demê ve li hember vê yekê rikdar im. Ev kes weke kesên ku ez daxwaz dikim nabin, lê wekbûna wan a bi xwe jî bi kêrî pênc qirûşan nake.

Ew roj ev roj e heman çîrok didome.

Viyana şoreşger wisa rabû ji piyan. Pêşveçûyînên ku qet nedihatin hêvîkirin jî pêk hatin. Qural û pîvanên ciheyî li gor min têr nedikir. Her dervehiya cihwariyê, ji bo civakeke gund an jî bajar hindekî derketina derveyî quralan, her ku diçû ji min re weke îfadeyeke azadiyê disepand. Û em hîna jî bi kûrkirina vê hewlê re mijûl in.

Gelo ma hun vê yekê çawa fêm dikin?

Ji bo xwe, erê bi rastî jî ne bi gotinan, di pêkanînê de jî ez li ser tu sudeke wisa nahizirim. Lê ji bo serkeftina nirxên bingehîn, ez şervanekî gelekî dijwar im. Ez pir vekirî bibêjim, li derûdora min nirx dicivin. Ew nirxin ku gelek ji we van di xewnên xwe de jî nabînin. Ev ji bo min jî derbasdar in. Lê baldar bin, ez dibêjim ku divê ev tenê weke nirxên azadiyê, rizgariyê, netewiyê û yên hevpar werin fêmkirin. Tu mafê min li ser min jî nîne.

Carna ez ji xwe re dibêjim "ey Apo", tu mirovek î. Her çibe jî roja me weke pêwistiyeke mafê mirovan xwedî wate ye. Vaye weke pêwîstiyeke mafê mirovan wisa bi tenduristî, wisa tu jî bibe xwedî jiyaneke taybet a tê pejirîn. Ez bi xwe ji mafên herî bingeh ên mirovan bêpar im. Mafê min ê gerê nîne, rast û dirûst mafê min ê ku ez pêwistiyên xwe yên kesî pêk bînim nîne. Çima? ji ber ku divê xebateke leşkerî be. Niha ez ji xwe re zêde derfeta karê taybet nadim. Ez neçarim li hember xwe jî pir sotîner bim. Ji ber ku ger bibêjim mafê takekesî; dê mafê giştî û mafê gel zerarê bibîne. Dê şer zerarê bibîne.

Her kes xwedî mafê kişandina cigarê ye, lê ya min nîne. Her kes xwedî mafê xewkirineke rihet e, lê ya min nîne. Heta her kes bêwestîn xwedî mafê rûniştinê ye, lê ya min nîne. Berovajiya vê, peywira min a ji piyan sekiniyê û tekoşîn dayînê heye.

Eşkere ye, maf ne, ez dibêjim peywir heye û peywireke esas e. Naxwe ger ez jî bixwazim xewkirineke rihet bikim, hindekî bêhna xwe berdim. Niha derfetên min ji hemû kesên Kurdistanê zêdetir in. Ger bala we li ser be kesekî herî azad tevbigere hebe ew jî ez im. Lê rexmî vê yekê rewşa min ev e. Çima?

Dîsa bi rastiya şer re pêwendîdar e.

Ji bo ku tu di şerî heyî de têk neçî divê tu wisa tevbigerî.

Zarokek belkî dikare çil qatî hindek tiştan hîn bibe û bijî. Lê ez bi qandî zarokekî jî hindek tiştan hîn nabin û najîm. Ez di nava tengezariyeke wisa de me. Çima? ji ber ku ez bi armanca bingehîn ve girêdayî me. Ez ewqas bi armanca bingehîn ve girêdayî me ku, ez bi zimanekî din nikarim tu peyvan bînim gel hev û pê biaxivim. Ez lîstikê jî nikarim tu

deqeyan bilêyîzim. Ji ber ku lingên min her armancekê ve girêdayî ne. Li gor wê dimeşin. Tu deman li derveyî armancê ez gavên şaş navêjim.

Dîsa nefes bi nefes min dilê xwe bi nirxên bingeh ve girêdaye. Ne weke we bi şêweyeke herî erzan dilê xwe firotin, ez tozê jî lê nakim. Ji ber ku di wê de girêdana bi nirxa pîroz ve heye.

Gel evqas bi min ve tê girêdan, lê hîna di derbarê xwe de ez piçekî jî xwedî şanaz nînim. Berdin evîndariya li xwe, hîna bi behiciyane ez xwe bi armancên bingeh ve girêdidim.

Ez hîna qetek nan jî li erdê nahêlim, nahêlim tu kes biavêje sergoyê. Ev yek nêzîkatiya min a ji nirxên madî re raber dike. Ger qesrên min jî hebin, ji bo ku ew bibin saziyên netewî ezê wan bost bi bost bi kar bînim, lê ji bo xwe.

Di temenê herî ciwan de min xwe wenda nekir, hezkirin û rêzgirtin min rast nedît. Min hema zarokên din ên gund re yekîtiyek saz kir, heta bi zarokên malbata herî dijber re jî.

Ji ber ku min şêwaza têkîliya xwe her roj bi dorhêliyê, weke ku bi hors pola bikutim zexm kiriye, min îro rê li ber têkîliyeke netewî û heta rê li ber têkîliyeke gerdûnî vekiriye. Dema hindek zêde bi min ve hatin girêdan an jî zêde hezkirin li hember wan ez bûm xwedî helwest. Ez pê dihesim ku li wê derê kêmaniyek heye. Ji ber ku ez şêwaza xwe ya hezkirinê, şêwaza xwe ya girêdanê bi hêsanî erzan nakim an jî berbi xirabiyê ve nabim. Xala herî ku ez tê de hesas im ev e. Ger min ne têkîliya netewî, min têkîliya erzan a girêdanê qebûl kiriba, diviya ku ez encax bibama reîsekî malê. Ez jî nedibûm yekî wisa.

Ne ez xwe bi hêsanî diecibînim, ne jî dixwazim bila tu kes bi hêsanî min biecibîne. Lê ez dev ji tu tiştan jî bernadim, hemû mirovahî jî tevlî vê yekê. Xwedî israr im, xwedî hewl im û di encamê de jî pêşveçûnê derdixim holê.

Ji bo her kesî ez gelekî dihizirim.

Bi demjimêran li rûyên wan dinihêrim, bêyî ku eciz bibim diaxivim, vêdibêjim. Bêwestan. Di we de ev yek nîne. Awir nînin, dil nîne. Bêguman ez zindî dikim, hilrakirina hişmendiyê ye. Hilrakirina dil e.

Ez lîstikvan im. Tenê yek roja min jî bêperoşmendî derbas nabe. Di rojan de peroşmendiyeke awarte heye û him jî di peroşmendiyan de dubarekirin nîne. Jiyaneke erjeng peroşmend e. Her roj bi navê min bi sedan çalakiyên balkêş hene. Her demjimêr dilê mirovan tîne ber devên mirov. Dîsa jî besî peroşmendiyên min nakin. Mesela qehreman hene, bi sedan hene. Çalakiyên wan min têr nakin. Ez zêdetir dixwazim.

Vaye keç hene. Keç jî mirov peroşmend dikin. Bi sedan hene, qet min têr nakin. Ez dibêjim zêdetir, emê yên mezintir li kû bibînin? Ez dibêjim serkeftinên mezin li kû derê ne? Hun dibêjin xeyal. Bêguman tiştên ku ez dikim ji bo wan amadekariyên biçuk in. Bi ew jîriya 25 saliyan ez çûbama welat şer, ma min dê bi van çekan ve, bi van derfetan ve, li vî welatî û li hember vî dijminî yan jî van hevalan çi nekiriba..?

Vaye bezên min ên di zaroktiyê de hene, wisa bi peroşmendî. Di pêvajoyên dawiyê de jî bezîn, bezîn, dîtin, dîtin, ji nû ve lêgerîn, lêgerîn, dîtin, bezîn, dîtin, ji nû ve armanc diyar bike û her roj bibeze. Misoger dubarekirin jî nîne, têrbûn jî nîne. Ka ji mîtroyekê ve dest pê dikin, santîm bi santîm bilind dikin. Rekor li ser rekorê ye. Li gor xwe ez ben hîna bilind dikim, hilbiavêje ha hilbiavêje, bi peroşmeniyeke mezin.

Bêguman cîhana şoreşger wisa ye.

Pir balkêş e! Esas ezê ji vê re bibêjim tolhildan, ev paşnav çima li me kirin? Sosret dimînim. Ev taybetmendî çawa di me de hebû? Û misoger gotine û bi me ve kirine. Ji ew fermanberê nifusê re ku ev yek dîtiye bijî! Erê rewşeke tolgeriyê ya hewlnak heye. Di 1920'an de çawa tespîtkirin ku ezê ji van tiştên pêkhatî hemûyan tolê bigrim? Di pirtûka Îsmet Îmset de tiştekî balkêş tê gotin: fermanberekî nifusê hatiye. Qaşo kalikê min Şêx Sêîd bi dar ve kirine. Bêguman ne kalikê min e, lê wisa dinivîse. Wê demê gotine em paşnavê wan bikin tolhildan. Balkêş, tolhildan? Di bîstan de û kemalîstan bi xwe ev lê kirine. Nakokiyeke balkêş e.

Ji heft saliya xwe û pê ve têkîlî û nakokiya malbatê ya hetanî roja îro, vediguhere nakokiya mezin a malbata

mirovahiyê. Em dixwazin parçeyeke bijarte ji malbata mirovahiyê bidin rûnişkandin. Bêguman sedem û çawaniyên vê em çiqas rave bikin jî bi hemû aliyan ve baş zelal nabe. Ev karê romanên mezin in. Di dema pêş de romanîkirina mezin, belkî van hewlan dikare hindekî di asta hunerî de reng bide. Weke ku min niha gotiye, ez niha bi aliyên wê yên îdeolojîk, rêxistinî û leşkerî ve mijul dibim. Bêguman vebêja bi şêwaza zimanê wêjeyî anîna ziman girîng e. Girtina asta hunerî girîng e. Me behsa asta civakî kir. Wisa em di rewşa kesên bêfêm de nînin. Xayin jî di nav de yê ku hemû kesî dide meşandin em in. Xayin jî ger em nebin nikarin bijîn.

Ew xayinên me ne. Ji ber me dijîn, wisa xafil in.

Dijminên me jî tevnokên berjevendiyan avakirine û naxwazin ji vî şerî bigerin. Em dijminê xwe jî didin jiyankirin.

Mezinahî, yekgirtin e.

Lê bêguman, ji ber ku em afirandêrên van in, em dest ji tekoşînê jî bernadin. Divê em bizanibin wan wisa weke dijminên dîrokî bifetisînin.

Eşkerekirina dijmin gaveke girîng e. Ew xayinên kevin in, xafilên kevin in. Ev dijmin, dijminê hezarê salan e, lê xwe veşartiye, eşkere nebûye. Di kavilê berxan de xwe mîna guran raber dike. Ji lawiran xirabtir e, lê bi pîvanên hemdem mirovan dibîne. Destpêkê me eşkere kir ew bi ser xist. Karê eşkerekirinê dibe ku hindekî din were berfirehkirin. Lê ji bo kesên ku dixwazin şer bikin ev yek bes e. Bêguman ev yek têr nake. Yek jî divê ya hatiye eşkerekirin were dîtin.

Tê zanîn ku, bi şidandina kulmên di tariyê de dijmin nayê lêdan.

Min ev dijmin çawa anî vê rewşê? Divê misoger were zanîn. Bi şêwaza min a razana di kozikê de ve girêdayî ye. Di şêwaza meşê de bi bênefesmayîna min re têkîldar e. Divê were zanîn û lêgerînkirin ku ka çawa ez li Rojhilatanavîn jiyame. Divê hemû pêwendiyên min werin hînbûn, bi taybetî pêwendiyên bingehîn. Ya bingeh, pêwendiyeke çiya ya pir pêwîst, têkîliyeke dostaneyî, têkîliyeke çekê, têkîliyeke

kêşanê, divê ev bi tevahî werin girtin û berfireh werin nirxandin.

Mirov dikare encamên mezin derbixe.

"wêne ji min bihêztir e
Çi tiştê dixwaze bi min dide kirin."

**Pablo Pîcaso**

## Bi qandî ez bi ser dikevim gel bi ser dikeve

Salên bêeman ên hêrsê ne.

Divê mirov xwezaya şer baş fêm bike. Berpirsyariya şer çi ye, divê mirov vê yekê baş bizanibe. Min pirsên herî girîng di vê mijarê de ji xwe pirsî ne.

Çawa bijîn?

Rêxistiniya mezin, perwerdehiya baş, hesasiyeta mezin çawa tê bidestxistin? Tuyê hemû gavan bi baldarî biavêjî. Tuyê hemû hevokan di cih de bi kar bînî. Tuyê lez bihizirî. Lez bibînî. Lez bikî. Ez van tiştan hemû di kesayeta xwe de tînim ser ziman. Rexmî hemû hewlên dijmin ên tehrîk kirine, min biryar da ku ez şêwaza rast bi rê ve bibim.

Tehrîkên pir xofnak hebûn. Carna di hundirê me de dijmin dihate ziman. Lê ez gelekî baldar bûm ku ez tehrîk nebim û nekim meseleya takekesî. Min firsenda ketina nava derfetên jiyana erzan nedan.

Li ser vê bingehê em gihiştin pirsa çawa bijîn.

Tuyê çawa netewî bî? Tuyê çawa civakî bî? Tuyê çawa xwedî rêxistin bî? Dê vebêja te çawa be? bi kurtasî dê rêkûpêkî- disiplîn çawa bi pêş bikeve? Dê şêwaz-tempo çawa be? Di ev salên şer ên bêeman de min karîbû xwe ji nû ve biafrînim

Cewaziya min a ji kesên din ev e: baş dîtina derfetan, dema firsenda jiyanê dît, destpêkê raberkirina hewla fêmkirina wê ye. Destpekê ez vê yekê hildigrim ewleyî ye. Piştre mirov dikare li ser vê zemînê çi bike, dikare çiqas giraniyê rabike ez wê dipîvim. Piştî ku min bersiva pirsa "ev hevîr çawa strîn" da ez dikevim nav de. Bi hewleke mezin, lez, daxwazê ve bi ser de diçim û bi teşe dikim. Ev dibe şerek û piştre jî dibe jiyaneke nû. Sînoran nasnakim. Mînak,

belkî di hindekan de zehmetiya karkirinê heye. Di min de berovajiyê vê yekê dema ez rihet bim ez tengezar dibim û zorê dikişînim. Dema rihetî çêbû, ez gelekî zehmetiyan dikişînim.

Lez meşîn, lez revîn û lez pêkanîn di min de şêwazek e. Dema ev yek nebe nerihetî dest pê dike. Ev yek jî min û binke tîne beramberî hev. A wî pir giran, pir bêamede, dikeve hewayên ku ez jê re pîrejin dibêjim. A me pir lez e û herikînêr e. Di encam de ji ber ku şêwaza encamgir a me ye, em bi ser dikevin. Di wateya takekesî de derveyî vê me firsend ji tu tiştên din re nedaye.

Ez jiyana xwe xwaromaro nakim. Ez her tiştî dikim xizmeta pêşveçûyîna giştî. Kî çi dike, çi nake, ez hemûyan bi helatekî ve bi xebatên xeta giştî ve girê didim. Însyatîf di destên min de ye, her ku çû hêz jî kom kir. Me ev hêz pir bi pisporaneyî bi kar anî. Di hemû qadên weke leşkerî, siyasî, dîplomatîk û hemû qadên jiyanê de pir bi pîvaneke hevseng pêş ket. Ji ber ku pir pêşveçûyîn çêdibin, ez neketim nava hewayeke nepixandî û bi xwehezkirinê ve neketim xeletiyan. An jî ji ber zêdebûna tengezariyan ez li aramiyê negeriyam.

Azîne wêrekiyê dide. Pêşveçûn diyar dikin ku ezê zêdetir derbixim holê. Ez zêdetir bi ser de diçim. "pêşveçûyîneke girîng çêbû, vê yekê ez têr kirim!" na! Misgoger ev yek jî nîne. Ez dibêjim ne tu tiştek e. Ez ji pêşveçûyînên bi dest ketî nebawerim. Çavên xwe berdidim serkeftinên werin bidestxistin. Ez dixwazim a watedartir û xweşiktir bi dest bixim. Derveyî vê yekê ez ji tu tiştî re firsendê nas nakim.

Bi vî alî jî em bi ser salan de çûn. Me xwast em pêhtir rêbertiya partî û kesayeta şer derbixin holê. Kesayeta rêxistinî, kesayeta berhemdar kî ye? Me gelekî giranî da vê yekê. Derveyî vê yekê em bi karên ji rêze re mijûl nebûm. Em mijulbûn ku em a diyarker, a xwedî naveroka bandorkariyê û şêwaz û tempo diyar bikin. Min xwe wisa amade kir û ji piyan girt.

Bêguman çiqas rastbûna vê, me bi girêdana hemû Kurdistanê ya bi otorîteyeke navendî ve piştrast kir.

Ev derkete holê: xebateke wisa bi rastî jî mirov gelekî berhemdar dike. Şertên jiyana giran dike rewşeke wisa ku

mirov bikaribe bi hêsanî bijî. Westîn jî vediguhere aramiyê û xebatkariyê. Jiyaneke ku di kesayeta min de hatiye peyitandin heye. Aliyê dijber çiqas xwedî hêz dibe bila bibe, derfetên kesekî çiqas tengbin jî, ger bizanibe vê yekê baş rêkûpêk bike, ger bi qandî vac hestên xwe jî bikaribe baş bi kar bîne û hemûyan bike yek, bi qandî rastiyên xwe ji bo serkeftinê hemû şarezayiyên xwe tevbigerîne, dikare bibe kesekî serkeftî. Di asta netewetî de dikare serkeftinê bi dest bixe.

Niha di kesayeta min de, "kesekî serkeftî, gelekî serkeftî ye." Her kesek dikare di asta gelekî de kar bike û dikare hemû neyîniya vala derbixe. Dikare hemû zehmetiyan û qelsiyan têperîne. Ya nebawerkar dikare bike rojevê pêk bîne. Jixwe bûyîna hêza netewî, berbi nasnameya gelê azad ve çûyîn, di hawirdora PKKê de derketinên nasnameyên balkêş bi ev şêwaza min re girêdayî ye. Di aliyê hizir de, di aliyê hestan de şêwaza jiyan û pêşveçûyînê, bi şer re yekbûna vê yekê, bi cîhanê re xwe dayîna girêdan, xwe xistina rewşa kesekî erjeng di min wisa bi pêş ket.

Em van salan hewlnak jiyan; em dixwazin van bikin malê gelê xwe jî.

Erê, serokatiya PKK û ez, emê bixin ku derê? Li kûderê bi cih bikim? Bi qandî ku ez ji gelê bêwar re cihekî peyda bikim ezê ji xwe re jî peyda bikim. Em ji nasnameya wenda ya gelekî bigrin hetanî azadiya wê, dema ez bi karanînêr bikim, dibe ku wê demê cihekî min jî hebe. Derveyî vê yekê jî ez bawer nakim ku mirov bibin xwedî cih. Dema di hizir de ez xwe bi dest bixim cihê min heye. Dema ez bi fizîkî, çek û viyana xwe, xwe bipeyitînim cihê min heye. Cihê gelekî jî wisa tê afirîn. Ger mirovek nikaribe ji gel re cih çêbike, nikare ji xwe re cih çêbike, ger nikaribe nasnameya gel bi dest bixe, nikare nasnameyê ji xwe re jî bi dest bixe, ger kesek nikaribe ji gel re azadiyê bi dest bixe nikare ji xwe re jî azadiyê bi dest bixe. Ji xwe ez wisa bawerim ku bi nepejirandina helwestên sexte ve min pênaseya herî rast pêk aniye.

Xeletiyeke bi giştî tê jiyandin jî, rexmî gel xwe azad hizirîn û rexmî gel xwe fikirînêr hesibandin e. Ev ji aliyê gel

û takekes ve xeletiyeke dîrokî ye. Her kes qurbanê xeletiyeke wisa ye û ji bo ku ez nekevim nava vê xeletiyê min gelekî hewl raber kir. Bila her kes li hebûn û tunebûna cihê min temaşe bike û bihizire ka di vê cîhanê de û nav vî gelî de xwedî cih e yan na. Ez dizanim ji xwe re cih çêbikim. Min hemû çalakiyên xwe ji bo ku ez di dîrokê de, di wijdana gel de û di nav malbata xwedî şeref a mirovahiyê de cih peyda bikim min pêk anîn.

Min got ma pêwîstiya min bi azadiyê heye, "ez xwedî îdia me, xwedî hêrs im, ezê xebatê bikim û biserkefim, min ev yek hindekî jî pêk anî. Jixwe ji ber vê yekê wateya PKKê tê wateya APO. Dîsa ji ber vê yekê gelê Kurd bi navê min re hevwate tê dîtin. Sedema dîtina bi vê teşeyê, di şexsê min de bi serketina, Kurdê windakirî, Kurdistana windakirî û kesê windakiriye. Bi qandî ku ez bi ser dikevim gel bi ser dikeve, welat bi serdikeve, takekes bi serdikeve û her wiha bi vê şêweyê ji min re nirx tê pîvan.

Bêguman ev yek rewşa min e. Ev yek raber nake ku her kes bi serdikeve. Lewra bi xwe spartina ji min re be jî, li şûna rewşa xweheyînîkirina kes, bi şerekî cewaz pêwîstî bi xweheyînîkirina kes heye. Weke hemû olan, divê mirov nekeve nava xwexapandineke wisa: Di Xiristiyaniyê de Hz. Îsa gelekî baş e, Xiristiyaniyê îfade dike. Wê demê weke ku "hemû Xiristiyan baş in" em nikarin bi vaca Arîsto tevbigerin û mirov bi vê yekê ve nabe Xiristiyanekî baş. Bi heman şêweyê mirov nikare bibe misilmanekî baş jî. Bi nav mirov dikare bibe Xiristiyan an jî Misilman, lê bi hebûna xwe dê ji mûnafiqên kevin xirabtir bin. Divê mirov vê yekê baş bibîne. Kesayetê pirsgirêka nasnameya xwe û hebûna xwe çiqas peyitandiye? Di nava tekoşînê de weke teorîk û pratîk çiqas xwe ji nû ve afirandiye?

Karê afirandinê gelekî girîng e, divê mirov durû nebe. Divê mirov xwe nexapîne.

Ger dê misoger pênaseyeke min were kirin, ev yek dikare wisa be: ne bi gotinan xwe dixapîne, ne bi pratîka hemalgeriya erzan ve xwe dixapîne, bi qandî ku zanist e, xwedî vîne jî, bi qandî ku dikare bike dibêje û ev yek bi şerekî jî peyitandiye. Mirov dikare wisa pênase bike. Ma

weke din li hember mirovahiyê ez dikarim bibim çi? Li hember rastiya gel a qedî û tunebûye, îdiaya neqedîne û hebûnê, îdiaya jiyanîbûnê. Di vê mijarê de ez kesekî xwedî şerê azadî, xebatkariyeke awarte û bi qandî hizirînê xwedî çalakî me.

Esas ev yek cewaziyeke jî, xwebûna gelekî ye. Em dixwazin ew gelê ku di dîrokê de kerr maye, lal maye û kor bûye ji nû ve zindî bikin.

Ez çawaniya serkeftina vê yekê re mijul dibim. Ji ber ku xebateke cewaz , eşkere ye ku ez cuda dijîm.

Kes çima evqas ji xwe hezkirîne, çima evqas bêhêvî ne? Ji beriya ku kesek xwe bi min re bipîve divê pirsan ji xwe bike. Esas weke ku ji min re tê gotin weke "Serok, rêber" nabînim. Ez xwe weke kesekî şopandêrê îdiayeke bêeman, xwedî îdiaya şer, îdiaya çalakiyê, îdiaya rêxistinê, îdiaya îdeolojiyê û xwedî îdiaya asteke bilind dinirxînim. Divê qey hindek kes ji min re dibêjin, "tu ne tiştekî" ez jî dibêjim, "na ez tiştek im." Kesek dibêje, "tuyê wiha bijî", ez dibêjim, "na ezê wisa bijîm." Yek dibêje, "tuyê wisa werî sînordarkirin" ez dibêjim, "na ez van sînoran nasnakim." Ji dostan re jî, ji dijminan re jî, ji dê û bavê re jî vê yekê dibêjim. Hetanî asta bilind weke kesekî li gor xwe xwedî afirandêriya şerê azadiyê dinirxînim.

Zagonên xwe ez bi xwe derdixim holê. Bi hewldan ez çerçoveya îdeolojîk, taybetmendiyên çalakiyê bi xwe diafrînim. Carna bi zimanekî pir şêrîn, carna bi peyvên qedînêr ez xwe amade dikim û pêşkeş dikim. Li gor hindekan wisa, li gor hindekan bi avayekî din. Lê ev mafên min ên azadiyê ne yan jî mafên ên tekoşîna pêşvexistina şerê azadiyê ne. Ez dizanim ku gelekî kes tevlî vê yekê nabin û heta dixwazin vala derbixin. Lê divê bizanibin ku li hemberî wan şervanek heye.

Ger hun dixwazin misoger min nas bikin; ez kesekî xwedî pêşvexistina qada azadiyê me, xwedî zagonên rêkûpêk im, pêkanînêrê van im, bêeman baldariya taybetmendiyên bingeh ên mirovan dikim, aliyên kevin û nekêrhatî bi erdê re dikim yek û di vê mijarê de bi rastî jî xwedî rêgez im. Bi qandî baweriyê nirx didim zanistiyê, ne

weke fanatîkekî çavtarî gerdûnî dihizirim, ez wate didim, mafên takekes, taybetmendiyên netewî û taybetmendiyên êşîrî û malbatî.

Yanî dîve were fêmkirin ku ez mafên her kesî ber çav digrim, di heman demê de jî di gelek xalan de bêmafiyê dibînim û li dij radibim. Mesele ne fêmkirin an jî nefêmkirina min e, mesele ne xwe nirxandin û ne nirxandina min e jî. Jixwe ez vê yekê her roj dikim. Mesele çawa fêmkirina kes û binke ye. Gelo ma dê bibin xwedî nasname? Ma dê di vê dinê de bibin xwedî cih? Bi rastî jî ma dê di nava vî gelî de bibin xwedî cih. Ma dê di asta temsîlkariyê de bikaribin hebûnekê raber bikin? Ma di vê mijarê de hişyariyên wan bes in?

Ez bawer dikim ku min baş xwe di hinava gel de daye rûnişkandin. Ez dihizirim ku pir di cih de min bi mirovan daye pejirandin. Dijminên min jî tevlî, derveyî pir kesên kêm tu kes nikare di derbarê min de xwedî îdiayên bêbingeh be. Ez çiqas di karê de xwe de serkeftî me, çiqas xweser û di cih de nêzîkatiyê raber dikim.

Divê ev wateyekê biderbirînin. Wisa bi nirxandinên nepixandî re, kesên ku dibêjin "evqas mezin e" û xwe vedişêrin hene. Ez ji vê rewşê neqayil im. Ez wisa yekî mezin nînin. Bi temamî xwedî meşeke rêhevaliyê me. Ezê wisa li asîmanan nebim xwedî cihekî fermanger. Lê wisa ew kesên ku bi gotinên weke "mafê min e, hiquqa min e" dixwazin paşverûtiyên xwe û teşeyên jîna xwe bisepînin ezê misoger qebûl nekim. Ger tê xwastin bi netewekî bibin xwedî otorite, divê ev yek baş were zanîn ku, wisa tu kes ji asîmanan nayê û me nade meşandin. Dîsa weke ku gelek kes dihizirin ev kar li gor kêfan jî nayê meşandin.

Hindek kesên ku dibêjin, " KT em xwarine, em bikaranîne, em zarokên êşîran in, me ji axatiyê para xwe girtiye, tu zêde xwe têkîlî me neke me bi serê xwe berde" hene. Ew kesên van tiştan dibêjin bila baş bizanibin ku, ji dema ku ev yek gotin bi şûn ve dê belayên xwe bibînin. Ez ji van vê yekê dibêjim: "hun dê ne sosretiyan, ne jî bi kêfan rizgar bibin! Şêwaz, tempo û rê û azîneyeke ku hatiye pêşvexistin heye, hun dê li gor wê bin.

Wateya Apo hindekî jî ev e.

Divê her kes bizanibe xwedî hiş be. Rêhevaltî wisa hevaltiyeke ketûber nîne. Tê zanîn ku ez madî û manevî hêzê li hev dicivînim. Ezê vê hezê hindekî jî ji bo rêhehevaltiyê bi kar bînim. Ez dixwazim bînim ser ziman ku, dê tu kes nikaribe min bi kar bîne, dê nikaribe bi rast û çep ve bikişîne û nikaribe bixe nava serpêhatiyan. Dîsa ez dixwazim bînim ser ziman ku dê tu kes bi lîstokên nexweşiyê ve, bi fêlbaziya gundiyetiyê ve, bi bergerînan ve yan jî bi hestyarî û ketibûnan ve nikaribin pêşiya min bigre. Ez xwedî şêwaz, tempo, hîs, meş û vîna azad im.

Û ji beriya her tiştî ez şervanekî azadiyê me. Ez di heman demê de zagonan dibînim û derdixim holê. Di heman demê de disepînim. Ger mirin jî hebe dê ev yek werin kirin.

Ji ber ku azadî nirxa herî pîroz e.

Ji bo gelê me azadî ji beriya nan û avê tê.

Li gor ku zagon ev e, dê pêwîstiyên zagonê bi cih werin. Apo li cihekî zilamê vê pêkanînê ye. Yê li gor vê be dê were vê peywirê yê li gor nebe dê bireve biçe. Lewma hindek kes bi qandî ku dikarin direvin û diçin. Ger em rastiyeke di vê astê de ne, ger êdî hebûna me teşe girtiye divê mirov vê yekê fêm bike. Em bi ked, pir bi plan, pir hişyar û berpirsyariyekê ve em vê yekê didin meşandin.

Em pir vekirî vî tiştî tînin ser ziman; bar hilgirtina zêde peywira we ye, hun dê bizanibin xwe bi rê ve bibin. Misoger pêwîstiya we heye ku hun ji xwe re cihekî çêbikin. Ev ew rastînin ku em her dem ji bo binke tînin ser ziman. Hindek kesên ku dibêjin, "dê partî cih bide me, emê rizgar bin. Dê hindek kes kar bikin emê jî bixwin." Hetanî ku ez serokê vê tevgerê bim û hetanî ku ev tevger bimeşe ezê misoger derfet nedim ku hindek kes bi xapandinê, bi çewisandinê, bi fêlbaziya gunditî yan jî bi fêlbaziya ronakbiriyê ji xwe re cih peyda bike û nirxên madî û menewî bi dest bixe. Di vê mijarê de kesayeta ku me afirandiye, xwedî dadwerî ye, kedê esas digre û ji bo serkeftinê dimeşe. Ger bi ser bixin cihekî xweş ji wan re heye. Ger alîkarî hebe, tu wê yekê bidî hîskirin eleqe heye. Ger ev werin kirin dê pêhtir bibin xwedî cih. Ez pir eşkere bibêjim ku, gavavetînên xwe nespêre, vê

azîneyê, van pîvanên ked, serkeftin, bergeha rast dê tenê belayê bîne.

Ji bo vê yekê ez dibêjim hişdar bin. Gotinên min dikarin werin nîqaşkirin. Ez li tu kesî zorê nakim, ger dixwazin bila şer bikin, ger dixwazin bila birazin. Lê divê vê rastiyê jî bizanibin. Êdî weke hebûna misoger vîna gel û otorîteya gel mijara gotinê ye.

Ger dijmingerî jî were kirin, dostanî jî were kirin, ez pir rastîn dinirxînim. Ev yek di heman demê de tê wateya nirxandina gel jî. Soza ku min ji xwe re daye: "ger tu hebî dê gel jî hebe, ger tu hebî dê azadî jî hebe." Ev hemû jî bi azadiya gel ve tên peyitandin.

Ev rewşên girîng in. Kesek dikare encax wisa xwe derbixe holê. Bi qandî ku tu ji gel î, tu jî heyî. Lê ma tuyê çawa bibî malê gel? Ji bo mirovê ji gel û bi gel re hebe, asta rêxistinê pêwîst dike. Ger tu van nikaribî bi kar bînî, jixwe tu nabî malê gel. Bi qandî ku ez van pîvanan pêk tînim ez ji gel im, ji şer im, ji partiyê me; dê rêz, şanazî û cihê min hebe. Derveyî vê yekê divê tu kes bi tiştên din xwe nexapîne. Divê her kes hedê xwe, tixubê xwe bizanibe. Di vê serdemê de divê her kes bi ser ve biçe. Ez jî hindekî din xwe rastîqînêr dinirxînim.

Ji ber ku wateya APO wateya otorîteyê ye, hindek evdal dibêjin, "mirov bi hêza ji rêbertiya partiyê bigre dikare bibe mîr." Her şêweyê rihetiyê û hêzê dide pêkanîn, di vê wateyê de rast e. Bihizirin di heman demê de ez mirovê herî tengezar im. Rast û dirûst ne xwarina min xwarin e, ne kirinên min kirin in. Dema ez di vê rewşê de bim, ev kesayet çawa dikarin bi xwe spartina min ve, bi stendina hêza ji min ve qesrên xeyalan biafrînin? Ev encax dikarin weke tolaz, durû û minafiqan werin nirxandin. Mirov çawa dikare wisa ji bo hêzgirtinê û rihetbûnê nêzî mirovekî wiha xwedî pirsgirêkên bêeman û xwedî şerekî giran bibe? Ev helwesteke ketî û bêşerefî ye.

Ez gelekî baldarê pîvanên azadiyê me. Dîsa baldarî pîvanên xweşikiyê me. Ger hebin taybetmendiyên te yên wisa tu can, rûh û her tiştê min î. Ger nebe tu ne tû tiştek î û tû nikarî nêzî min bibî.

APO ev e, min xwe baş da naskirin. Hindek xwe dikin bin rûpoşan, xwe dikin rewşa bergerîn sergerînê yan jî dikevin nava komplogeriyê. Jixwe ev di heman demê de dibin provakator jî. Û wisa dihizirin ku dê wisa min bandor bikin. Hindek kes hene ku, kar û xebata wan xirabkirin e. Hindek hene, kar û xebata wan, bi fêlbaziya gundîyetî yan jî ehbabgeriyê ve dê ji min raye bigre, dê ji min eleqeyê bistîne, dê min nerihet bike yan jî dê min li gor xwe bike cihekî. Tu kî yî? Li holê meseleya hêzê heye. Li dîroka KT binêre, belkî di cîhanê de yek nimre ye, ew jî bi ser nakeve. Tu li wê binêre pîvana bejna xwe bigre.

Lê "vaye çi be jî ehbabgerê min e, birayê min e, nizanim wisa nêzî min e, ez wisa kevin im, navdar im, fermandarekî jêneger im." Ev hemû tu tişt in. Jixwe wisa tu fermandar an jî kesekî navdar ku hatiye pesendkirin jî nîne. Ez jî nahizirim ku min tam hatime pesendkirin. Ger min tam serkeftin bi dest xist, niha ez hindek karan bi pêş ve dibim. Gel dibêje "tu başî", dibêje "bijî APO." Ez ji bo ji min re bibêjin "bijî" ez fermanan dernaxînim. Li xweşiyê diçe yan jî dibîne ku hindek tişt tên bi ser xistin, bixwe vê yekê dike dirûşm. Misoger min ji tu kesî re negotiye navê min bipîrozîne, heta ez jê tengezar jî dibim. Lê xwe di şexsê min de pêkhatî dibîne. Zindîbûna hêviyên xwe yên hezar salan dibîne, serkeftinê dibîne, ji bo vê yekê van dirûşman diavêje. Bila bibêje, ev jî mafê wî ye ez nikarim tu tiştî bibêjim. Ev yek tê wê wateyê ku me hindekî bi ser xistiye. Tu jî bi ser bixe, bila gel ji te re jî û kesên din rê vê yekê bibêje.

Ger hun baldar bin, gel di vê derê de jî rasteqînêr e. Ji ber ku şerê jiyanê dide hînkirin. Kêm zêde ev min didin nasîn, dê çi bibe, dê çi nebe, dê çawa bi dest were girtin, dê çawa bi dest neyê girtin, dê çawa were bikaranîn, dê çawa neyê bikaranîn ev hemuyan bi hindek aliyên xwe ve raber dikim.

Esas aliyên min ên nefêhmî yan jî aliyên pêwîste werin lêpirsînkirin pir eşkere ne. Ez misoger wisa me. Ez dihizirim ku min eşkereyî û demokrasî baş gihiştandiye hev. Wisa derketina gelekî lal û kor, li gor min peyitandina vê yekê ye. Tenê hindek neçariyên bûyîna vê yekê hene. Di şexsê min de xwe nuximandin gelekî zehmet e. Li hember min girtina

puanên meşandina azadiyê gelekî zehmet e. Her wiha wateya xwe hîskirina nêzikî min, tê wê wateyê ku hun çiqas serkeftî bin, ewqas cihê we heye, hun çiqas xwedî ked bin, hun ewqas xwedî wate ne, hun çiqas estetîk in ewqas heyrantiya we heye. Ev pîvanên min ên jênger in.

Esas hemû rojên min tim beşa nepeniyan îfade dike. Bêguman pir balkêş e. Şêwaza min, bi rastî carna min bi xwe jî şaş dihêle. Ez hîna jî ji xwe dipirsim: tu kî yî, tu çi yî? Te çawa bi ser xist? Tu çawa hetanî vê derê hatî?

Hîna di temenê gelekî biçuk de jî ez hişyar bûm ku xwe bi xwe bidim meşandin. Dema ez li cihekî rûdiniştim digotin "civa hat." Bûyereke herikînêr îfade dike. Tê bîra min ku ez gelek caran bi pirsa "ma di hundirê te de civa heye" re rû bi rû mame. Lê her dem meşeke bi heyraniyê re têkildar bû. Ez bawer nakim ku ez xwediyê yek rewşa bêriştmend bûm.

Ger pêwîst kiriba bi kesekî 70 salî re jî nakokiyeke bêeman derdixist holê. Lê riyekê wê didît, zilam dîn dibû. Bi ser min de dihat û min jî ji xwe re lê temaşe dikir. Min mirov bi rewşên cewaz re rû bi rû dianîn. Min ew di nava sosretiyan de dihiştin. Armanc balkêşî derxistina holê bû. Ez ji ketûberiyê, yekrêziyê û fêrbûyînan qet hez nakim. Divê her roj ji bo min balkêşî be. Dema tiştekî nû neketiba rojeke min ez wê rojê tengezar dibûm û misoger min digot "ka tiştekî nû li kû ye". Ev yek ji bo min gelekî girîng bû.

Ez bawerim hun bi çavkorî bi fêrbûyînekê ve tên girêdan û dijîn. Dema hebûneke we hebe, hun bi salan wê diparêzin. Ez ji van direvim. Carekê ez ji tiştên xwe nefretê dikim. Her lêgerîna ya biyanî, her dîtina tiştên li cihên din û darûnişkandina wan li cihekî. Ez heznakim li ser tiştekî hatiye bidestixistin rûnim. Heta ez êdî wî ji xwe nahesibînim. Lê ev yek nayê wê wateyê ku ez wê tu tiştek nahesibînim, lê ew hatiye bidestxistin. Hindek dixwazin wê weke mîradxwaran bixwin. Ez tu caran jê tiştekî nagrim. Ez her dixwazim hindek tiştan li wê zêde bikim. Ev yek pêhtir min têkildar dike.

Nebûyîna mîratxwariyê gelekî girîng e. Dîsa ez tenê ji bo parastina xwe gotinan naxuliqînim. Ez ji zarokan jî fêr dibim. Hêza hînbûnê, xwe mezin nedîtin gelekî girîng e. Di

vê mijarê de ez gelekî dilnizm im. Weke zarokekî dibistana seretayî, ez xwe her roj bi rastiyên nû re rû bi rû dihêlim.

Rexmî hemû van destkeftiyan û navdariya min, esas ez jî di mijara xwe naskirinê de zehmetiyê dikişînim.

Dê çi be?

Vê pirsê ez jî ji xwe dikim. Ez diçim kû derê? Esas gihiştina min çi ye? Carna xwe dirêjî felsefeyê dikim. Weke felsefî ez hetanî vê xalê têm. Tiştê ku jê re mirov tê gotin çi ye ku, mesele dibe ku ew ji hindek kesan re tirsnak diyar be, lê esas parçeyeke siriştê ya xwezayî ye. Ez hetanî wê derê dibînim. Encamên jiberxweyî yên felsefeya xwezayê pir bi hêsanî dibînim. Li gor pêşveçûna zagonên gerdûnê ez dikarim binirxînim ku ka em ji kû hatine û emê biçin kû. Bêguman ez zêde girîngiyê nadim vê yekê. Niha ya girîng, pirsgirêka bingeh çawabûyîna bûyera Kurd e.

Jixwe dema em bi bûyera Kurdeyetiyê re mijûl dibim, ez dizanim ku ez bi hemû mirovahiyê re mijul dibim. Ez dibînim ku ez bi hemû taybetmendiyên bingeh ên mirovahiyê re mijul dibim. Ya girîng jî azîneya min ji xwe re bijartiye.

Ez xwe pir azad berdidim. Tu kes nîne ku xwe weke min azad berbide. Mesela bi qandî baldariyên zarokekî ez xwe baldar dikim, bi qandî hewesên zarokan xwe hewesdar dikim. Lê carna dikarim xwe bikşînim înzîvayê û tenê bi dilopeke av jî xwe bes bibînim. Ewqas nermbûneke berfireh heye. Carna dixwazim weke şahekî bim, carna jî baldar dibim ku weke xizanekî xwedî nanekî tisî bim. Carna her du sînoran jî lêkolîn dikim. Ez evqas azad im. Carna ez quralgerekî erjeng im, lê ji aliyê din ve kesekî dewlemendê jiyanê me jî. Ez xwe evqas di nava dewlemendiyan de berdidim.

Rexmî van hemûyan esas gihiştina helwesteke xwerû û zelal zehmet e. Bêyî ku ez tiştekî pêk bînim, ez hîs nakim ku min ew tişt pêk aniye, xwe naxapînim. Sosret dimînim, hindek kes rexmî ku nikarin gelek rêgezên bingeh bi serbixin dikarin bijîn. Mînak rêgeza azadiyê, rêgeza şer, weke vê wilfên din û rêgezên din. Ger negihiştiye serkeftinê ez jê qut

nabim. Çilhezar carî, weke dorgerîna gezegenan a li dor rojê difertilim, da ku ez wê bi ser bixim.

Vaye meseleya Kurd, pirsgirêkeke bingehîn e, meseleyeke mezin e. Ez li ser bêemaniyê me, ev jî taybetmendiyek e. Weke vê hîna gelek taybetmendî hene. Mînak ez hema weke yekî ketûber dest pê dikim, lê hewlnak bi encam dikim. Dema ez destpê dikim, ji her kesî erzantir û ji her kesî bêîdiatir destpê dikim, lê di encamkirinê de divê misoger ez serkeftinê bi dest bixim.

Ez yekî demî me.

Ez gelekî pêvajoyî dijîm, him jî kêl bi kêl.

Ji bo min jiyankirina kêlikê girîng e.

Rastjiyîna kêlê.

Weke ku dê her tişt niha pêk were, şêwaza min a bi ser de çûyînê heye.

Jixwe em dahatuyan jî diafrînin. Ez bawerim ji sedemên sereke yên serkeftinê yek jê jî ev e. Ji bo min tu demeke neyê bi serxistin nayê hizirîn. Divê hemû demên te weke xelekeke zincîrê bin, qet ji hev qut nebin. Ez dema xwe wisa hesab dikim. Ez di xafletê de bim, qutbim, serdemekê vala derbixim, ev ji bo min nabin mijara gotinê. Zincîreke hewlnak e. Weke helezonekê bilind dibe lê qet nayê dubarekirin, weke hespê gêj li gor xwe nazîvire, her tim xeteke li bilindahiyê ye. Ne weke fûzeyê firiya û ket ne jî weke hespê gêş li gor xwe dizivire. Na, bilindbûneke helezonî ye.

Wisa weke ya rêberekî bûrokratîk an jî teşeger, tu sekreter û şêwirmendên min nînin. Qet tiştên min ên wisa çênebûn û dê qet nebin jî. Lê ez dikarim bibêjim ku ez ji kesên wisa zêdetir bi rê ve dibim. Yek jî jiyaneke min a ku zêde xwe bi teşeyan ve girênade heye, ger ez wisa xwe li bûrokrasiyê û teşeyê biqelibînim, ezê taybetmendiya xwe afirandêr wenda bikim. Xwe azad berdana min, nirxa herî mezin babistîna mirov û taybetmendiya mirov e.

Xwe azad berde, xwe azad bigre, li pêşiya azadiyê nebe asteng.

Ez xeyalên xwe yên zaroktiyê jî hîna azad berdidim. Di panzdehan de kevneşopî wiha dibêjin, di bîstan de wiha

dibêjin û dema tu bigihê çilî tuyê wisa bibî. Di min de van hemûyan wateyên xwe wenda kirine.

Di Gelawêja 1994'an de gundiyekî me hatibû. Got, "tu hîna weke xwe ya berêyî, hindekî qelaw bûyî." Min di deh saliya min de çawa dizane hîna dibêje, "tu niha jî wisa yî." Ev yek rastiyekê diderbirîne. Ez di deh saliya xwe de çi bim niha jî heman tişt im.

Erê, ez hindekî qelaw bûme, hemû ewqas.

Yên ku dixwazin bi min re bimeşin bila vê yekê bipîvin. Ka gotinek heye weke, "kesê ku benê xwe qetandiye." Ez yekî wisa me ku min benê xwe qetandiye. Ji zaroktiya min ve vê yekê dibêjin. KT jî wisa dibêje. Cîhan jî niha wisa dibêje. Dibêjin, "li wî nenêrin, ne diyare dê ew çi bike, wî benê xwe qetandiye." Erê min benê xwe qetandiye, lê di cihekî de min hindek jî benekî ve girêdane. Weke ku min KT girêdaye. Ev bûyereke bi azadiyê re pêwendîdar e. Lê ez dîsa jî ji we re bibêjim, kesê ku ev yek ne li gor wan be bila li dûv me neyê. Ez naxwezim tu kes serpêhatînêr be. Bila ji xwe re bipîve, "Apogerî çi ye ne çi ye" bila piştre tevlî bibe. Ji ber ku ez rastiyan piştçav nakim, niha ez ketime nava jiyana gel û bi dest bi ketina nava dîrokê jî kiriye. Lê îro yan jî sibê, lê wisa yan jî bi awakî din emê bi jiyankirinê re bibînin. Her roja min weke veciqînekê ye ma ne wisa? Ez li çavên hemûyan temaşe dikim, hemû sosret bûne. Serokomar, serokwezîr, fermandariya giştî, muxalefet hemû dîn bûne. Her kes weke ku bibêjin, "ka ev bela ji kû derket?" bi hev dikevin. Ev hemû destnîşan dikin ku ez bûyerek im.

Di min de wilfan pir di temenê biçuk de dest pê kirin û min xwast ez pêşiya hemûyan vekirî bihêlim. Wilfa dibistanê, gelek wilfên mirovî, bi têgînên azadiyê ve ravekirina hindek xalan genganz e. Ev alî hindekî giran dibe.

Ez bawerim mirovê herî baş nêzî xwe bûye ez im. Ez bawerim aliyên min ên herî xweser wiha ne, xwe girtî nehiştin, xwe nexistina zindanê, xwe kirêtnekirin, xwe radestî cahiliyê nekirin, xwe radestî hêjariyê nekirin, li xwe neheqî kirin. Ger tiştek ji min tê xwastin, ez rêzdar im. Xeyalên min ên zaroktiyê hene. Ezê li cihekî bibim xizmetkarê wan xeyalan. Bêguman, ez, zarok an jî gel ferx

nake. Ger zarok tiştekî dixwaze, xwedî hêviye emê hetanî dawiya temenê xwe pê ve girêdayî bin.

Hîna bêyî ku ez dest bi siyasetê bikim jî, min bala hemû mamosteyên xwe kişandibû û ez xwendevanê wan ê yekem bûm. Ez dikarim vê yekê bi hêsanî bibêjim. Lê xebatên min jî hebûn. Tirsên min û gumanên min jî zêdebûn. Rexmî van hemû bêquralî serlêdanên azadiyê yên bi çavreşî ez gelekî xwedî guman im. Ez di nava gelek pîvanan de me. Ez dikarim bibêjim ku taybetmendiyeke min a ku çilî çil caran dipîve heye. Dibe ku tu kes ev aliyê min nizanibe. Tu kesekî weke min baş dipîve û bi pîvan gav diavêje nîne. Di cihekî gelekî teng de pir xwedî pîvan jiyîn.

Bi derfetên gelekî kêm zorkirina serkeftinê.

Lê gelek polîtîka dikin, dema gelek derfet li pêşiyê peyda dibin nizanin bijîn. Çawa dibêjin, “weke hespê têr ka ku parsuyên wî bi hev ve zeliqîne.” Rewşa gelek kesan hindekî jî dişipe vê yekê. Xwe xistina rewşa hêjarên xwedê. Bihizirin, ez zilamê herî xwedî tengavî me, lê di cihekî herî teng de jî derfeta manevrayê peyda dikim. Hewlnak bandor dikim, didim şerkirin, bi pêş dixim; bi şêwaza xwe bi tempoya xwe û bi şarezayiya xwe ya manevrayê ve di hundirê xwe de cîhanekê diafrînim, bi amrazeke biçuk ve xwe distirêm.

Min ji vir ve rasterast kulma xwe li dijmin wernekir, lê li Enqerê hatin lêdan, min lêda ne wisa?

Eşkere ye.

Hetanî niha tu Kurdan lêdaneke wisa sererast nekir.

Ez li vê derê me, min gav neavêt, lê tê wê wateyê ku ji dûr ve jî mirov dikare lê bide.

Weke din di gelek tiştên din de jî ev yek wisa ye. Ez xwe ji gel venaşêrim. Hundirê me derveyî me gelekî vekirî ye.

Niha bûyera hezkirinê-şer, a başiyê-xirabiyê, ya xweşikiyê-kirêtiyê. Bêguman, di cewherê şer de ev hene. Ez bawerim ev hindekî dibe taybetmendiya me ya civakî, dibe ku asta nakokiyan bi dagirkerî, mêtîngerî û dibe ku bi şertên xwezayê ve jî girêdayî bin. Dema li civaka xwe temaşe dikin her tişt gelekî kirêt e, her tişt gelekî bêhezkirin, bêrêz e. Li malbatê, li gund her min dirêjî ku derê kiribe wisa ye. Ji ber

ku ez kesekî gelekî hişyar im, min nedikarî ez van tiştan bipejrînim an jî vaye ez bi serê xwe nediçûm cihên xweş.

Ez mirovekî rasteqînêr im.

Ger welatê min evqas kirêt bûye, ger mirovên me evqas kirêt bûne, ezê bizanibim ji xwe pirsan bikim. Gelek Kurd reviyan Ewrûpa yan jî metropolan û heta xwastin weke Tirkan tevbigerin ma ne wisa? Lê bi qandî ku min ev yek dît ez jê bandor bûm û min pê kir ku ez şêweyê sekna rast bigrim.

Ez jî pê re ew ezê ku wisa kirêt, ew ezê wisa hêjar, ew ezê wisa bûye xirbe, ew ezê ku wisa hatiye şêlîn evqas bi têgîna dijmin re mijul dibim. Her rojê, her demjimêrê bi pirsan min nakokî derxiste holê. Min rê li tevgerbûnekê vekir. Bêguman van tiştan hemûyan, dema kesayeta min teşe digirt di pêvajoya lêpirsîna mezin de, ez xistim nava nefret, kîn, hêrs û di heman de xistim nava hizirînê. Min ev pêvajo bi hezaran caran jiyan kir.

Avabûn-pêşveçûn tê gotin. Bi qandî ku ez bi olê re mijul dibim, ez dixwazim bi felsefeyê re jî mijul bibim. Esas kesekî wisa afrandêr û fêmkar jî nebûm, ez vê yekê eşkere li xwe mukir werim. Min pirtûk dixwendin, lê hindek caran cihên ku min pêncî caran dixwend jî hebûn. Ez wisa kesekî hişmend û xwedî gotin jî nebûm, lê ez wê bernadim û min berneda. Olê vekole, xwedê li kû ye, xwedê çawa ye, bipirse hetanî ku tu dikarî bipirsî. Başî, xirabî ûhw.

Min bi olê çareser nedikir. Min xwe dirêjî felsefeyê kir. Felsefe hindekî din nêzî zanistiyê ye. Dîsa jî wisa nehizirin ku ez weke felsefegerekî hînbûme. Ger em hînî çend taybetmendiyan bûne jî ev ji bo me girîng e.

Nebû min xwe dirêjî siyasetê kir. Dema ez ketim nava siyasetê ez ji hemûyan pêhtir bêhêçanbûm. Esas belkî jî ez hîna wisa bim.

Lê ez cewaz siyasetê didim meşandin.

Ez heqê siyasetê didim.

Ez ji siyasetê re azadiyê nas dikim.

Ez siyasetê bi hizir bi ser dixim.

Min di siyasetê de çi bi ser xist? Bi taybet ji bo diyaloga siyasî min xwast ez van vebikim. Bêguman tu kesekî ku

zêde fêmkir tûnebû. Siyaset çawa hatiye çemandin, çawa ji nirx hatiye xistin, li şûna vê yekê mîlîtarîzma hişk û berhemê difetisîne, çawa hatiye damezrandin û çawa ketiye nava jiyana mirovê Tirk, çawa berhemê dibire çawa zerarê dide mirovahiyê? Ezê vê yekê raberî wan, wan generalan bikim. Jixwe azweriya min a şer ji vê yekê bi pêş ve tê.

Ez xwe ji şer didim paş, niha kesê pêşeng ê hûnera lêdanê ez im. Lê ya ku min dikişîne vî tiştî çi ye? Yê li beramberî min ewqas ji gotinan fêm nake ku, ewqas ji hêza xwe ya zorê bawer dike ku, ewqas set kişandiye pêşiya rastiyan ku, heta li ser dibêtiyên jiyanê ewqas serdestî daye çêkirin ku.

Ez di mîlîtarîzma Tirkan de vê yekê dibînim.

Esas di destpêkê de daxwazeke min a bûyîna leşker hebû. Eleqeya min hebû. Belkî jî ji ber ku pêşiya jiyana min dibirî, min xwast ez bikevim hundirê wê û wê fêm bikim. Belkî ez dixwazim bi wê re hindek tiştan veguherînim. Heta dema ez di dibistana seretayî de bûm, hevalekî min ê zaroktiyê hebû, em bi wî re li ser derbeyê hizirîbûn. Ez bawerim bandora 27 Gulanê bû. Wisa bibe fermandarê hêza asîmanî wisa derbeyê bike. Emê çi bikin, ne diyar e lê tê hizirîn. A girîng wisa serpêhatînêr hizirîn e.

Piştre ji ber ku ez nebûm leşker gelekî giriyam. Niha em bi hemû artêşa Tirk re şer dikin. Dê artêşa Tirk min bike leşker, min bike fermandar û piştre derdê min çareser bike. Niha emê li dij artêşa Tirkan artêşeke nû biafrînin û di destpêka şerekî hêjînêr de ne.

Ez nikarime li pêşiyê bibim asteng, dixwazim bikevim hundir û bigihêm hindek cihan, ger ev yek nebû, dixwazim li beramberî wê rawestim û misoger dixwazim vê pirsgirêka xwe çareser bikim.

Ez dizanim ku, amrazeke wisa xistine pêşiya jiyanê.

Min nedikarî ez herim artêşa Tirkan, her tişt qedexe ye. Ez li ewlekaran temaşe dikim, ew zêde xwedî hêz nîne, hêza esas artêş e. Di nava artêşê de jî artêşa taybet.

Niha rika min heye.

Taybetmendiya min berhemdariya hizir û xwedî îdia bûne. Ew pirsgirêka bi navê leşkerî çî ye? Ev desthilatdariya leşkerî çima evqas bêeman e?

Ez li Tirkiyê ji dayik bûm, ez niha dixwazim li Tirkiyê bibim xwedî berpirsyarî. Li hember artêşa Tirkan, em dixwazin ji pirsgirêka Tirk-Kurdan re çareseriyê peyda bikin.

Aliyê min ê leşkerî çawa bi pêş ket?

Esas daxwazeke min a azadiyê heye û ji aliyan ve pêşiya vê yekê tê girtin. Ji ber ku ez jî di vê mijarê de li hemberî xwe rêzdar im, dixwazim di warê leşkerî de bibim hêz. Ger ew nebû, weke hêzeke leşkerî ya dijber dixwazim pêşiya xwe vebikim.

Weke din tu çareya vê yekê nîne. Ger zanistiyê ev yek wisa destnîşan kiriye, divê tu ya pêwîst bikî, ji zanistiyê re xiyanet nayê kirin. Weke ku Îsmaîl Beşîkçî gotiye, zanistî tenê ji bo peyitandina hindek tiştan nîne. (rêza min jê re heye, mezinahî ye. Ji ber vê sedemê bi salan e di zindanê de ye.) lê yek jî tiştên ku zanistî difermîne hene. Mêtîngerî, mîlîtarîzm, tenê kirûyên peyitandinê nînin. Pirseke duyem jî: kî ji vê yekê zerarê dibîne? Ger Kurd evqas zerarê dibînin, gava duyem a ku pêwîste zanyar biavêje, divê tu birûxînî, ger pêwîst bike divê tu li wê derê jî cih bigrî.” Ez mamoste Îsmaîl tawanbar nakim ku ka çima wisa nake. Hezar carî şukir ku wî got. Ew kesên ku wan gotinan ji xwe re esas digrin bila êrîş bikin. Em dikarin bibêjin parvekirina peywirekê jî.

Zanistî ji bo min jipiyabûna viyana min îfade dike. Ez naxwazim bibim kuzê zanistê. Di vê wateyê de ez ji zanistê nefret dikim. Zanistî hindekî ji bo rast bi rê ve birina kar e. Bi teşeyên din ez zanistiyê qebûl nakim.

Rexmî ku di leşkertiyê de ez gelekî bêîdia me, ji ber ku li pêşiya hemû daxwazên min ên azadiyê asteng e û dîsa ji ber mezinahiya rêzdariya min a ji min re ez dibêjim, “ma tuyî artêşa ku pêşiya min dibire?” û weke ku bi navê Kurdê yekem be ez bi ser de çûm. Û tişta ku di dîrokê de tu kesî nedikarî bike min kir.

Kesekî herî bêbandor, hêjar, bêmalbat, bêêşîr, bêheval, bêçek, bêpere rabû û bi îdiayeke wisa derkete holê.

Şerekî gelekî cewaz e.

Don Kîşot jî wisa şer nake. Me wisa dest bi vî şerî kir. Jixwe hetanî demeke dirêj jî her kesî henekên xwe bi me dikirin. Bi salan wiha gotin, “çî ye Kurdistan, ên te gotinên vala ne.”

Di encam de min ji gelek kesan re karîbû xwe vebêjim. Di vê mijarê de ez gelekî hewlnak im. Ên ku bi dostanî ji min fêm nekin jî ez dizanim bi wan xwînê bidim vexwarin.

Kesê ku muxatabê min be yan dê fêm bike yan dê fêm bike. Ma ger ez bimrim jî dê mesele biqede? Tovên ku min çandine bes in ku hezar salan bi artêşa Tirkan re şer bikin. Min bingeh wisa avêtiye.

Karê ku ez dikim gelekî dipîvim. Ger ez sedsalî û hezarsalî pêşiya vê nebînim ji vî karî re nabêjim kar. Ji bo ez riya çiyan vebikim, bîst sal in sebir dikim û di dawiyê de riya çiyê vebû.

Bihizirin, zilamê ku ji sifirê hetanî vê xalê aniyê ma nikare çi bike! Bila generalên Tirk vê yekê bihesibînin. Ezê çend kesên din bigihînim, hîna zêdetir bikim. Jixwe ez dikim jî. Ma min destên xwe avêtin çekê? Na. Bi beralîkirina ji dûr ve ev yek da meşandin. Ger ez hindekî din nêz bibim bila wê demê dijmin ji xwe re vê yekê bihesibîne. Ger tu ji mirovbûnê fêm nakî, ji siyasetê fêm nakî, ger tu dibêjî na hebe nebe leşkertî, vaye ji te re leşkertî! Emê hunereke wisa ya leşkertiyê derbixin ku, dê bi teşeyê herî dînker be. Ez ji xwe bawerim. Her tişt di heman demê de nabe. Lê ez bawerim ku ezê di nava temenekî de bi cih bikim. Ev hemû raber dikin ku çawa ez jiyame û min çawa kar kiriye.

Di min de weke fêrbûyînekê ye. Ez dijminê xwe dişipînim ejderekî yan jî gornepaşekî. Devê xwe vekiriye agir diavêje. Ez li pêşiya wî, ez jî li dûv wî rawestiya me û her car xwe li gor amade dikim. Carna xwe dispêrim pişta zinarekî, carna tiştekî diavêjim nava çavên wî, ger ezê bikaribim diranên wî bişkînim, ez carna jî kevirekî diavêjim. Ev hemû taktîk in an jî esas naskirin û hîskirina dijmin e.

Piştre ez destpê dikim ku wate bidim lingên xwe.

Ez dinêrim ka lingên min çiqas bihêz in. Dema ez dibêjim ling, şarezayiya xwe ya hizir û giyana xwe yanî

hemû bandoriyên xwe qest dikim. Di vê wateyê de lingên min çiqas xwedî hêz in? Dijmin di hizir de tê hînbûn.

Weke teorîk tê hînbûn. Piştre mirov dibe xwedî ling û digihê amraza siyasî. Tuyê bizanibî siyasetê bikî.

Yek jî lez gelekî girîng e. Ger ez hêdî bimeşim dê misoger dijmin min daqurtîne.

Mijareke din a girîng jî, ne radestiya me ye. Cinawir her dem cinawir e. Mêtîngerî, faşîzm, şerê taybet her dem kesayeta xwe diparêze. Em tu caran cinawir ji hedefê ranakin û weke dost nabînin. Li gel vê yekê weke ku min gotiye, divê mirov taktîkên teknîkî baş diyar bike. Ezê çi bikim destên xwe? Ma ezê bi ço yan jî kevir lê bidim? Bi kurtasî, li beramberî dijmin ez çi bikim destên xwe ezê çawa lê bidim, vê yekê dipîvim, û ditêkoşim. Ji bo serkeftinê hewl raber dikim.

Şêwaz, taktîk, tempo hemû ji bo serkeftinê ne.

Min hindekî cinawirê xwe daye rawestîn, nêzî xwe nakim.

Gelo ma ji ber çi min şêwaza xebata kir evqas şidand? Çima ez evqas lez, pir lez dihizirim û bi lezî bersiv didim? Ji ber cinawir e. Pir lez pêşveçûyîna min jînê heye, çima? Ji bo nerawestîna li hember cinawir e. Çima ez hemû şarezayiyên xwe di vê xalê de dişidînim? Ji bo ji rê dernekevim. Çima her dem dilê min di nava peroşmendiyê de ye? Ger carekê biqete dê min bi erdê re bike yek. Çima her dem çavên min li ser dijmin e, çima ez her dem ji piya û amade me? Ji bo bi xafiliyê min danequrtîne. Divê mirov di van hemûyan de hişyar be. Hişyarbûn girîng e. Carna bikim, carna nekim nabe. Ger carekê tempoya te bikeve, ger carekê lingê te bişemite, cinawirê li dûv te dê te daqurtîne.

Carna lez direvim, carna dirazim. Her dem lezgîn, her dem dest bi dar û ço, her dem li dijmin temaşe dikim, her dem navbeynê dipîvim. Çeka min tifinga destên min e.

Bi demê re me partî damezirand, me bi peyvê lê da. Me ARGK damezirand, me li herêmê gerîla belav kir. Me girse rakir ji piyan. Ev hemû taktîk in. Yek jî ez bi xwe dibezim. Lîstikvanê sereke ez im.

Kesê ku şer daye destpêkirin ez im, divê ez ji wê re baş serokatiyê bikim.

Divê em hindekî gel jî biparêzin. Gelek serhildêran mala gel xirabkirin. Roja duyem bi xwe jî hate daqurtandin. Em gel jî diparêzin, xwe jî, partiyê jî û kadro jî. Ev hemû şêwaz û taktîkên me yên şer in.

Çareseriya di min de çawa bi pêş dikeve?

Ji ber sedemên weke yeknegirtin û nêrêkûpêkirina hizir, pratîk, şer, siyaset, rêxistinkirin, çalakgerî, însyatîfa takekesî, kolektîvîzim, destpêk, plankirina encamgirtinê, pêkanîn, têkîliya girseyî, rola pêşengtiyê, rêbertî, têkîliya navend û kadroyan, hîna bi giştî bêhevsengiya têkîliya bi gel re, bi taktîk re, têkîliya artêş-şer û li ser têgîna dost-dijmin wenda bûne û wenda kirine.

Lewra tercîhnekirina min a yek ji yekî yan jî hemû bi hev re di hevsengekê de bi ser ve xistina min, ez bawerim bi şarezayî û hêza min a serkeftinê re pêwendîdar e.

Ez hîna dikarim gelek tiştên wergir li ser vê yekê zêde bikim. Ji ya herî îlegal bigrin hetanî ya herî legal, em ji taktîkên şer ên bêeman bigrin hetanî taktîkên herî aştiyane vedibe. Gelek nakok diyar dibe, lê li gor min bi hev ve girêdayî ye. Ez herduyan jî bi nermbûneke têrker dibersivînim. Hindek dikevin şer, siyasetê û rêxistinê ji bîra dikin. Dikeve dîplomasiyê lê şer ji bîra dike. Dibêje ezê siyasetê bikim, lê girêdana wê ya bi şer re zû ji bîra dike. Bi kadroyê siyasî re dikeve nava nakokiyan an jî kadroyê leşkerî qet ji yê siyasî hez nake. Ger mirov pêşiya van berde dê bigihê lûtkeyê herî jor. Tevlî artêşê dibe qet ji gel hez nake. Dibe fermandar min bi tu tiştî nahesibîne. Ev qelsiyên kûr ên mirovên me ne. Eleqeyên wan bi yek alî pêşketiye, hêza wan têra bihevrebûna çend karan nake. Yan jî şarezayiyên xwe zêde eşkere nekirine. Civaka me bi taybetmendiyên wisa ve barkirîne. Di bingehê vê yekê de xirabkariya mêtîngeriyê heye. Ez dixwazim vê yekê sererast bikim.

Evqas nermahiya serokatiya PKKê, esas ji ber hişyariya xwe ya li ser sererastkirina xirabgeriya mêtîngeriyê ye. Serokayetî di hawirdoreke evqas qels û nakok de, li hember

evqas sepîn çawa dikare evqas nerm û yekgirtînêr be? Vê valahiyê çawa dadigre?

Serokekî netewî neçare vê yekê bike.

Hemû hikmet û harbiyeya min di vê derê de veşartiye. Yek baş siyasetê dide meşandin ê din jî dîplomatekî baş e. Yek prapandevanekî baş e yê din lêderekî baş e. Filankes xwedî şarezayiyeke wisa bihêz e. Serokatî jî van hemuyan temsîl dike. Wan hemûyan digihîne hev û biqandî ku yekê bi ser dixe dibe serokekî serkeftî. Ez xwe hewlnak pêşkeş dikim, hewleke awarte raber dikim. Ji ber vê sedemê ez xwe dixwazim xwerinî, daqurtinî bikim.

Hêviyên mîlyonan hene di vê derê de.

Di heman şêweyê de bêemanî jî heye.

Biqandî vîna şer, vîna hezkirinê jî mezin e.

Gelek ji fêmkirina vê yekê dûr in. Ger ez tenê bi pêşvexistina şer ve bimama û min ev hezkirin bi pêş nexistiba weke yên din migoser ez niha ji zû ve miribûm. Ger min aliyê siyasî hesab nekiriba, weke ku yên em fêm dikin ez bi ser gel de biçûma, niha ji zû ve qediyabû. Ger min tenê gotiba çeka îdeolojiyê, tenê yek gerîla dernediket holê. Ger min mirov bi gelek aliyan ve negirtiba dest, gelek xayin û xafilan niha ji zû ve ez qedandibûm. Ger min zagonên bingeh ên dîrokê nezanîbana, niha ji zû ve ez biribûm. Di van mijaran hemûyan de karkirina min a bi dîrokê re, şopgeriya min a ji armancê re, li ser taybetmendiyên bingeh ên mirov weke îlahekî rawestîna min gelekî hêzdar dike.

Vaye nepeniya yekkirina her du seran ev e.

Ez ji xwe bawerim. Ger hemû pirsgirêk derkevin pêşberî min jî, ezê xwe bixim şûna hemû berpirsyaran, kadroyan û ezê dîsa vî karî bi rê ve bibim. Ez ewqas nerm im. Ger neh-deh kesên wisa hebin dê ev bibe navendek û wê demê serkeftin hêsantir dibe.

Hîna wergir bi hindek derûdorên din re derfetên min ên karkirinê hene. Baldar bin ez ji partiyê jî ditêperim xwe dirêjî hêzên cewaz dikim. Ger gel bikeve rewşa nebesiyê ezê vî karî bi nifşên pêş re bikim. Ez serî li dîrokê didim, serî li mirovê dahatuyê didim, lê ezê misoger eşkere derbixim holê.

Weke ku ji beriya vê jî got, sedema vê yekê, pir hêjar û bêçare hiştin e. Ji ber ku mêtingeriya serdest gelekî xirabker e, ji min awartebûnê daxwaz dike. Vê valahiyê weke din nikarim dagrim. Dema ez negrim jî, nikarim rola xwe bilêyîzim. Ma weke din dê mezinahî çawa derbikeve holê? Ma weke din dê çawa derbe li dijmin were dayîn? Dê çawa rê ji dostan re were vekirin, dê mirovên çawa werin pîrozandin? Vaye ji bo ku mirovên me jî wisa bibin em hewleke awarte raber dikin. Lê yên neşareza ji aliyê dijmin ve hatiye lêdan, çavên wan ji rê derxistine. Rexmî hemû hewlên min ger hîna sînordar dimîne, tawanbarê vê yekê ne ez im. Lê dîsa jî ez dilxweş im, PKK yî dikarin watedar şer bikin, dikarin têkîliyên xwe bi fedakarî, bi wêrekî pêş ve bibin û encam bigrin. PKK tevgera herî hizrînêr, tevgera herî zelal rastiyan dibîne û di çalakiyê de xwedî biryar e.

Rexmî hemû rexneyên min, ez mirovê herî hezkar di nava PKKê de dibînim. Dezgeya bingeh ev der e. Yên xwedî şêwaz û tempoya xweş ji vê derê derketine û dê yê herî baştir jî derbikeve û rola pêşengiyê bilêyîze. Mirovê tê armanckirin dê li vê derê teşe bigre. Bêguman mînak jî derketin e. Li ser bîranîna van emê binkeyê xurtir bikin. Ger ji hundir ve xiyanet an jî rewşeke xafiliyê dernekeve, serkeftineke semyan misoger e. Pêşveçûyînên niha jî aliyê serkeftina vî karî destnîşan dikin. Di vê mijarê de tu takekesekî ku xwe dinepinîne û vedişêre nîne. Ez hevgirtiyê di vê derê de dibînim. Tişta pêk hatiye bi hemû hêza xwe ve rave bike, qelsiyên xwe jî eşkere bike, bila di vê mijarê de qet gumanên te tunebin. Lê tu tiştekî jî ji serî ve mehkum neke û ji destpêkê ve tu tiştekî weke tiştê herî baş raber neke.

Ger em nepeniya vî şerî û vê mucîzeyê bipirsin, ezê bibêjim, “ew bi xwe ye.” Ji asteke ku jê re şensê serkeftinê nedihate nasîn, hêviya serkeftinê nedihate dîtin, tenê dijmin ne, dostan heta şervanên me jî ji vê yekê bêwar bûn, gihiştina asteke mezin a serkeftinê tê girtin. Di eniya dijminê me de bêhêvîbûn di asta herî jor de ye, li aliyê me jî êdî her kes bi serkeftina me bawer e.

**

*

Yek jî ez bawerim têkîliya şer, hezkirin û mirovan gelekî bala mirovan dikişîne. Di vê mijarê de dibe ku jin pêhtir xwedî meraq bin û dikarin rastîntir bin. Dibe ku her kes bixwaze hîn bibe.

Ez dixwazim pêşiya çalakiya mirov vekirî bihêlim.

Ger mirov binkeya me ya di bin bandora giran a malbat-civakê de fetisiye bîne ber çavan, divê werin zanîn ku, ezê di ev şêweyê tekîliyê de nêzîkatiyên şoreşgerane û azad kêm nekim.

Kurd, di têkîliya jin-zilam de miriye.

Di vê têkîliyê de Kurd, kirêtbûye, ketiye, şerpeze ye, kole ye, girtiye, antî-siyasî ye, antî-leşkerî ye, pîrejinek e. Li gor min ev hemû di hundirê vê têkîliyê de veşartî ne. Niha emê çawa eşkere derbixin holê?

Belkî ev yek pratîka Ehmedê Xanî eşkere bike.

Ev yek dît, Kurd hindekî sewdaser e. Dem bi dem ev yek min di xwe de jî rexne kir. Ji bo ji holêrakirina sewdaseriyê ji min ve bigrin, pêl bi pêl em hetanî hundirê rastiya gel jî dadixînin. Bi ihtimaleke mezin pêwendiya we hemûyan bi sewdaseriyê re heye. Van hemû keçan û xortan wisa destpê kirine. Gotina vê yekê ne şerm e, ez jî wisa bûm. Ev yek di min de ji heft saliyê ve destpê dike. Ev yek pir xwezayiye jî. Ev ne taybetmendiyeke awarte ye, di her kesî de heye. Lê şêwaza min a bikaranînê girîng e. Di vê mijarê de em ji dilpakiya zarokekî bigrin, hetanî fermanên kevneşopiyê emê hemû şêweyên têkîliyan lêpirsîn bikin. Ez xwedî şêwaza têkîliyekê me, ku di têkîliyê de rê li ber xeteriyan venake, ya herî girîn jî ya pêwîste were veşartin çi ye, ya divê were vejiyan çi ye eşkere dike.

Ev mijar hatin lêkolînkirin û eşkere bû ku, rewş gelekî xeternak e. Min ev di temenê ciwan de didîtin.

Li gund ciwanmêrekî hêjar hebû. Cîranekî min ê hêjar bû. Ez bawerim keçek dîtibû. Her biharê derdikete rê. Çi ye dê cîz bigre! Navê wî hîna di bîra min de ye. Dixebite dixebite dê keçikê bigre. Law bila serê girtina vê keçê hezar caran bikeve biniya erdê! Ciwanmêrê me diqedîne. Min got gelekî zehmet e, bi salan dixebite ji bo girtina keçekê.

Maleke wî ya ji yek odeyê hebû. Mijûl bû, dê çawa odeya duyem çêbike? Piştre zarûzêç, xwedîkirina van. Misoger nikare ji bin vê rewşê derbikeve. Di vê wateyê de ez gelekî rasteqînî me, nikare ji bin derbikeve. Niha van hemû we jî pejirandin. Ger zilam were bîstên xwe, dê rabe bizewice, bi nîşan bibe.

Û ez keniyam û min ev yek derbas kir.

Min got ger ez wisa bim ezê bimirim. Ev pêhesîneke gelekî girîng e, pêhesîneke rastîn e. Yanî ne ji ber ku ez ne zilambûm, ji ber bêşarezayiya min bû jî. Wê demê ez xwendevanê Zanînên Siyasî bûm û xwendevanekî gelekî xwedî îdia bûm. Min qandî ku min dixwast min dikarî ez keçan peyda bikim. Lê tu kesekî weke min şikdar tunebû. Hêjarekî bêhêz, xwedî dahatuyeke nediyar. Min tu caran zilamtî li xwe nedianî.

Tê wê wateyê ku ez bi pirsgirêkeke civakî ve rûbirû me. Di vê derê de qedîna netewekî heye, bêçareyî heye. Dahûrînên malbatê li ser vê bingehê ne. Ji bo gihiştina zanebûneke wergir divê werin xwendin. Ger tu ji xwe miqayte nebî, tu çûyî, ketî golê, fetisiyayî. Tu zilamekî Kurd î. Hun hemû ketine ev girêkoriya Kurdan. Çima hun niha tam nagihên serokatiyê? Sedemeke herî girîng a vê yekê ev têkîliye.

Ne şerm e ez her tiştî li xwe mukir têm. A min jî hebû. Lê ez gelekî pê re mijulbûm. Ez hîna di mijara jinê de şer dikim. Çawa jin? Çawa têkîlî? Çawa ast? Di van mijaran de bi qandî qiyametê şerê me heye. Lê we wisa xwe têr kiriye ku. Lê ez şermezar dikim. Ji hevalên zewicî re, yên xwedî zar û zêc re rêza min heye. Lê hemû gelekî pê ve hatine girêdan. Li gor min bi vê şêwazê girêdana bi çend zarokan ve, girêdana bi jinekê ve xwe înkar kirin e.

Mirov çawa dikare bigihê hezkirina netew? Mirov dikare bigihê pêwendiya azadiya zayendiya jinê? Dema ku hun jina yekem an jî zarokê yekem dibînin, esas hun tiştan wenda dikin. Esas karê romanger û wêjevanan e. Ez nakevim nava mijarên wan. Bila dîsa jî nasbikin.

Min xeterî dît û min ev di xwe de jiyan kir. Ne şerm e, ji dibistana seretayî de tu kesî ku weke min li dûv keçan

reviyaye û li têkîliyeke ji dilgeriyê nîne. Di encam de rewşa gihiştina vê yekê di min de pêk hat, lê gihandina jinê gelekî zehmet bû. Hetanî bi keçên cîranan. Hindek balkêş bûn, hindek xweşik bûn, hindek wisa min digot gelo dê çi bibe? Li gor van hemûyan mêrekî çawa? Li gor ciwanmêran keçên çawa? Ma guncaw e yan na? Weke ku berpirsyarê van hemûyan ez bûm. Dê çawa bibe? Bi pirsîna van pirsan ve ez îro bi mîlyonan bersivan didim.

Xwişkên min bi xwe hebûn, hîna gelek dijîn. Van hêjaran, van keçan, ji riya du rojan tên dibêjin, “em keça we dixwazin.” Rojekê zilam hat, xwişk xwast û bir û çû. Ev kî bû? Gelo ma ev têkîlî rast bû? Xwişka min a ku hîna hetanî duh ku em bi hev re dijiyan çima çû ku derê? “ma rast e” ev yek min girt lêpirsînê. Ma qelen rast e? Ev zewac çawa çêbû? Bandorên vê zewacê yên li ser min çine?

Ji her tiştî re eleqeyeke min hebû.

Ya rast çibû? Ya şaş çibû? Weke ku min gotiye di vê têkîliyê de her ku diçe zilam dibe kole, lê di min de îdia bû ku ez rewşa xwîşkê cewaz binirxînim. Ev yek neqediya ye. Me ev yek li ser xwişka xwe pêk neanî, lê emê li ser hindek xwişkên din pêk bînin. Ya ez dixwazim ev yek hebû û ez vê yekê giştiyane dikim.

Encam min riya tekoşînê hilbijart.

Yek jî astengiyên bi hev re jînê hene, bêhezkirineke mezin heye.

Dema dayikbûna xwe îdia dike, tu daxwaza zarok nabersivîne. Hêza jina hêjar nîne. Jixwe ji ber vê yekê ez bi ser mêtingeriyê de çûm. Me bi diya xwe re tirsnak lihev dida. Bihizirin hemû dayik rexmî ku şêhîd dane min ji kurên xwe nirxdartir dibînin. Lê min anîbû ser ziman, min bi diya xwe re şerekî tirsnak dikir.

Piştre min ev têkîliya dayik-kur lêpirsîn kir. Diya min ji min çi dixwaze? Ez ji diya xwe çi dixwazim?

Dayik her ku çû bû welatek.

Kur her ku çû bû mîlîtanek.

Dê ev hetanî ku derê biçe. Keç kî ye, xort kî ye? Kur diçe Çukurovayê deh salan dixebite, nikare cîzekî bibîne. Dixwîne, dixwîne nikare bibe rayedarekî biçûk. Ezê ji çiyê

vê yekê re rêzê raber bikim, ji çi re rêzê raber nekim? Keç cîzekî erzan, zêrekî ûhw. dixwaze. Ezê çi bikim? Mirovahî di ku dera vê yekê de ye? Hezkirin di kû dera vê yekê de ye? Li hember van ez şêwaza xwe rêxistin dikim. Eman nekevin vê xefikê! Tu xwe jê bikşîne, lê pêwendiya xwe jî biparêze. Pêwendiya xwe ya ji dayikê re, ji keçê re, ya ji kurik re bi baldarî lêbikole, binirxîne. Tuyê misoger çareseriyekê peyda bikî.

Daxwaz, pêwendî û nêzîkatiyên min bi paş ve dikişînin, min hemû li paş hiştine. Min bi demê re berdan.

Niha rûxînêrekî mezin ê zewacê me. Ya hun dê zewacên mezin bipejrînin, an jî emê zewacên we yên biçuk bi serê we de birûxînin. Mixabin em dirûxînin. Em rûxînêrên mezin ên sewdaseriyê ne.

Ez her dem alîgirê hezkirina mezin bûm. Evîna mezin bi ser bixe ez ji te re li çepikan bidim. Ez nahesidim, evîna mezin esas digrim. Evîna Ehmedê Xanî tam evîneke mezin nîne, lê belkî jî daxwaziya evîneke wisa ye. Di Ehmedê Xanî de Kurdeyetî heye, civaktî heye. Mezin dihizire, pir mezin li ser evînê dihizire. Hindekî bi şêwaza hizirîna min e, ez neçarim vê yekê bikim. Xweziya em her wisa evînê çareser bikin, em her wisa hezbikin û werin hezkirin. Vaye niha ez vê yekê dixim pêşiya we. Ger ez vê yekê nexim pêşiya we, wê demê ezê di wateya netewî de durûtiyê bikim. Têkîliya taybet cuda ye, têkîliya beg-paşeyî cuda ye, hezkirin cuda ye, peywirên siyasî cuda ne. Vaye bi van re danîna girêdana rast, taybetmendiya min a herî girîng e.

Bêguman bi pêş dikeve, li şûna sewdaseriyê hezkirina rast bi pêş dikeve.

## Giyanên miriyan

Di 1975-76'an de di çîroka me ya derxistina komê ya ji Enqereyê de, ji serî ve hate xwastin ku ji aliyê dijmin ve kom were wênerankirin û heta bi ihtimaleke mezin plandikirin ku me bi karbînin. Ji 1976'an hetanî 77-78'an tekoşîneke wan a mezin heye û di encam de me gavavêtineke çawa pêk aniye min ji we re vegot. Ger were lêkolînkirin baş e.

Dema digihên salên 1990'an zilam pêhtir xwedî plan e. MÎT bi hemû ezmûneyên xwe yên kontrolkirinê ve yan jî ew hêzên şerê taybet ên KT ên dîrokî ji sala 1975'an ve hemû ezmûneyên xwe xwe civandine, bi encamkirine û vê carê ji destpêka sala 1990'an bi vir ve bi dirûşma "emê hetanî Cudiyê gavan nedin avêtin" derketine holê. Erê, plan pir baş e û dê ev kar biqede. Dijmin jî hindekî ji xwe bawer e. Polîtîka girtîgehan bi qandî ku makezagonan kun bike bi wergirî û çavtarî bi dest tê girtin.

Balîç ji çiyan hatiye tevlîhev e. Bi qandî ku zarokên 15 salî qetilbike çavtarî ye. Çawaniya birîndariya wî û bi wê birîndariyê ve hatina wî jî mijara lêpirsînê ye. Ma çi diyare ku ew jî wisa ji wê derê nehatiye?

Şener jixwe hundir temam kiriye, derdikeve derve. Ez bi qandî ku jê re bibêjim, "ger dirûstbe dikare bi qandî Kemal Pîr kar bike" kesekî hişmend e. Zilam weke mûbirê xwe amade kiriye, bêguman li hember min wisa ye. Li pişta min jî tam komplogerek e. Bi ihtimaleke mezin Şahîn Balîç jî wisa ye, Baran jî wisa ye. Dijmin bi amadekirina wan ve sala 1990 dihesibîne. Ez bawerim taktîk dîsa weke ya 1975'an e. Her wiha PKT(partiya komunîst a tirkiyê) jî wisa kiriye û komên din ên çepgir jî wisa kirine. Wisa heman taktîkê ji bo

me jî pêş dibîne. Lê xwe dixapîne. Vê carê dibêje "ezê di 1990 de bi ser bikevim."

Di 25 Çileyê de hevalê me Hesen Bîndal di perwerdehiyê de bi encama qezayê şehît ketibû.

Wê demê me ev qeza girt dahûrînan.

Ma ev yek qezayek e, qestek e, planek e, yan jî jiberxwedebûyînek e? Misoger pêwîstiya vê yekê bi dahurandinê hebû. Yan jî em nikarin bi binkeya xwedî qezeyeke wisa re şoreşê bikin. Wateya van dahurînan ev e.

Encam me tedbîrên xwe girtin. Wê demê min biryarek derxist. Min perwerdehiyek raber kir. Min got, Kesayetiyeke xwedî çîneke wisa ji sîxurekî herî xirab jî xirabtir e. Kesayeteke wisaye ku, wisa pir zêde qezeyan dike, wisa di bin navê qezayê de dibe mirinê. Divê carekê em vê yekê çareser bikin. Ma nîv-feodal, nîv-bûrjuvayê biçûk e? Ma kesayeteke tolaz, eşkiya ye? Çi dibe bila bibe, divê em vê kesayetê çareser bikin. An jî çavgirtina ji van kuştinan re me dibe rewşa tawanbariyê. Yek ew.

Bi yek carê min dît ku, bi rastî di hundirê me de em ji kesayetên kole bigrin hetanî her teşeyê feodaliyê peyda ne. Emê êdî hundirê partiyê ji ev bermahiyên feodal paqij bikin. Wisa mirov dikare bibêje perwerdehiyeke giştî. Û bi demê û pê ve ev perwerde di nava partiyê de tê meşandin. Ger tu hundirê partiyê qayim nekî tu nikarî derve zexm bikî. Ger tu li dij her rewşa paqijiya hundirê partiyê, tekoşîna çînayetiyê, her şêweyên provakasyonan, koledariyê, nehatina rêxistinê û rewşa nehatina rêxistinê tekoşînê nedî tu nikarî dijmin pêşwazî bikî. Bi pêkanîna vê rêgezê em hetanî roja îro hatin.

Sîxur çawa derdikevin holê? Ev yek bi zelalkirina hundirê partiyê ve derdikeve holê. Yanî êdî kesayeta esas a PKK, xetên wî yên bingehîn û yek jî kesayetên ne li gor vê yekê eşkere derdikevin holê. Jixwe bi her kêliyê re xwe didin dest. Tu kes di nirxandina vê yekê de zehmetiyê nakşîne. Bi qandî ku kesayetên sîxur û xayin eşkere derbikevin holê hundirê partiyê zelal bûye. Ger li taybetmendiyên esas ên kesayeta PKK were baldarbûyîn, êdî tu sîxûr nikarin xwe veşêrin. Ger tu ne di nav xafleteke girandebî, ne ajan-provakator dikare xwe bisepîne ne jî kole.

Ne xirabker dikarin xwe bisepînin. Her kes di heman demê de xwe dide dest. Her wiha encama vê yekê ye ku, ajan derdikevin holê. Çiye çîroka ku ev ajan raber dike? Ji beriya ku bihar were qedandin e.

Di meha mijdara 1994'an de weke sîxurê ku eşkere kirî û tiştên ew li xwe mukir hatiye, mirov dikare çi fêm bike? Weke kevneşopiyeke ji bo dijmin bikaribe pêvajoyeke girîng vala derbixe xwedî çi tedbîran e? Demekê Enqereya dijmin hebû. Di 1982'an de Beyrût hebû, dê ji Beyrûtê dernexistiba derve. Ez bawerim vê carê jî hiziriya û plan avakir ku me ji vê derê dernexe û piştre me ji Akademiya Mahsum Korkmaz jî dernexîne. Bêguman ma hêza wan têr dike yan na, ew mijareke cuda ye. Di Mijdara 1994'an de bi şandina sîxûrê bêhêz ê ji vê derê re ev yek tê fêmkirin. Sîxurekî ku herî baş hatiye amadekirin jî di demeke zûtir de xwe ji eşkerebûyînê xelas nake. Ger veşartî bimîne jî, belkî dikare hindek zeraran bide, lê weke ku tê hizirîn ne. Çima ev yek wisa ye? Ji ber bikarhatina pergala nava partiyê ye. Girêdayîneke ketûber heye. Ger girêdan hindekî jî bişidê sîxurek nikare nefesekê jî bistîne. Objektîf an jî subjektîf ger her kes rast xwe tevlî kar bike, ev yek li tu cihan nabe.

Ev her tiştî dikin. Zilam tê vê derê, belkî vekirî jî biaxive. Ev sîxurê mijara gotinê rojekê derdikeve ser man planeke çar bi çar pêk tîne. Plan dike ku ka dê çend tîman bîne, her tîm dê ji kû ve bikaribe êrîş bike. Cihê ku weke wargeh bi nav dike jî malek e. Ma dikare bike yan na? Ma dê bimeşe yan na? Ew tiştekî cuda ye, lê ya girîng niyet û planên dijmin in. Zindî bi destxistina min jî plan dike. Qaşo dê di 1990'an de ez bi zindî girtibama. Belkî derewan dike, lê ya girîng niyetên wan in.

Niha ev sîxurekî ketûber e. Yek jî li ser provakatorên weke Şener bihizirin. Ev ji dîroka PKK derketine. Bihizirin, ev hemû jî xwe gelekî hişmend dihesibînin û hemûyan jî milîtanên me, kadroyên me û bi taybet jî keçên me bêav dibirin û bêav dianîn. Çima? Ez bawerim hîna kesê ku xwe bes dibîne ez im. Çi ye ez bes im? Ez fêm dikim, ez xala nedirûstiyê dibînim. Û di heman dem û cihî de dikarim helwest raber bikim. Ev bûyera dawiyê jî gelekî girîng e, ya

di mijdara 1994'an de. Digot, "di nava hefteyekê de ezê birevîbam, minê xeber bida û me dê plana xwe pêk anîba. Ji beriya ku em bigihên biharê li vir wisa, li Ewrûpa û di nava welat de hindek planên me hene." Plana fermandariya Tirkan a tê zanîn. Ev yek carekê encama êrîşa çalak a hundirû û derve ye.

Rexmî her tiştî me bi hêzdarî dest bi 1990 î kir.

Di yekê Çileyê de dijderketina gelê Cizîrê ya ji bo şehadeta Berîvan, cara yekem rê li ber serhildanan vekir. Bi serhildanan re hindekî jî gerîla xebat kir. Û rexmî hemû hewlên provakasyonan, derkete holê em dikarin sala 1990 bi ser bixin. Jixwe kongreya me jî pêk tê û ji bo destpêkirinên xurt di destên me de gelek derfet hene.

Tê bîra min, dema em ketin biharê rewşeke gelekî baş hebû. Di başûr de komên me yên baş amadekirî hene, rewşa şidyayî ya komên di welat de mijara gotinê ye. Her wiha me got, "emê pêngavê hilperînin." Di heman demê de li wargeha me provakasyonek pêk hatibû. Em gelekî bi ser şehadeta Hesen Bîndal de çûn û vê yekê em birin vî tiştî: bêyî ku ev kesayet werin têperîn, bêyî ku pêşiya xirabkirinên hundirû were girtin, ev şer bi pêş nakeve. Di vî alî de kûrbûyîneke me çêbû. Vê yekê piştre di nava me de li dij bandoriyên bûrjuvaziya biçûk şerek xiste rojevê û me gelekî pêşveçûn çêkirin. Em baldarbûn ku em binkeyeke kêm qeza bike û li gor pîvanên partiyê tevbigere biafrînin.

Kesekî bi navê Hogir hebû. Qetilkirina gelek mirovên bêtawan mijara gotinê ye. Di kêmaniyeke biçûk de sîxur îlan dike û gelek tiştên xeternak bi pêş dixîne. Di bin navê desthilatdariyê de, di bin navê bikaranîna rayeyên xwe yên kesî ferasetên wisa serê xwe nîşan dikin. Me xwast em bi ser van de biçin. Ez bawerim tişta ku jê re axatiya pêşmergetiyê tê gotin, dixwastin di nava me de jî pêk bînin. Li şûna artêşbûneke rast, dixwast PKKê bikin pêşmerge. Lewre me piştre fêm kir ku, hindek bi KT re di nav pêwendiyê de ne, wê demê çiqasiya bêzanebûna wan negirîng e. Em pir tund bi ser wan de çûn.

Di vê serdemê de piştî şehadetên li Mêrdînê, serhildanên Mêrsîn-Cizîrê her ku çû li Kurdistanê belav bû. Ketina me

ya pêvajoya serhildanan, pêvajoyeke gelekî girîng û dîrokî bû. Xwe nîşandayîna gaveke din a serhildana viyana azadiya gel e. Û ev, dihate wê wateyê ku, gerîla gel bandor kiriye û pêşveçûn çêkiriye. Di vê wateyê de sala 1990 bi pêşveçûyînên bihêz destpêkir û ev yek her ku çû hilperiya. Dema em gihiştin dawiya sala 1990'an di qada me de nêzî hezar gerîlayî amade bû. Di wargehên başur de jî hema ewqas mirov dihatin perwerdekirin. Ev yek dihate wateya mezinbûna gerîla.

Her wiha wê demê aloziya kendavê destpêkir. Ev jî, di başûr de dihate wateya vêbûna derfetan. Me xwast em nakokiyan tevger bikin. Heta ji wan nakokiyan bi qandî wateya Şoreşa Cotmehê em dikarin encaman derbixin. Di rastiya van perspektîfan de me encamên siyasî pîvan. A herî girîng jî di xeta sînor de me gerîla kûr kir.

Weke tu tê zanîn sala 1991'an sala derbasbûna hêza me ya mezin a ji welat re ye û destpêkirina mezin a serhildana başûrê Kurdistanê ye. Encamên şerê kendavê ji bo Kurdistanê gelekî girîng bû. Em dixwazin bi kongreyê ve xwe ji vê yekê re amade bikin. Biryar û amadekariyên mezin hene. Bêguman dîsa di wê demê de bi taybet di warê taktîk de nebesiyek tê jiyîn.

Di vê navberê de me kongreya 4. li dar xist. Mehmet Şener xwast bi bisepîne vê kongreyê. Bi navê ji zindanê derketiyê, rexmî ku me gelekî jê re nirx raber kir û cewazî nîşan da, di hewayeke wisa de bû ku têr nedibû, êrîşe ser nirxan dikir û her dem dixwast hindek tiştan bi dest bixe. Lê ji bo çi wisa dikir? Me zêde wate nedida vê yekê. Ger tu bibêjî kariyer piştî min ew tê, me wisa jê re cih pêşkeş kiribû. Jiyana rihet a ku dixwaze jî pêk anî. Lê li dûv hindek tiştên cuda bû. Bêeman li dij xeta PKK ye, ji gerîla re dijmin e, ji jiyana PKKê re dijmin e, di hundir de xwe fêrî jiyanekê kiriye û vê yekê li ser me jî disepîne. Piştre derkete holê ku jiyaneke herî ketî û jiyaneke herî bêşeref bûye. Kesayete herî qediyayî bûye. Di zindanê de jî ev yek pêk aniye, sepandiye û bi ihtimaleke mezin ev yek bi piştgiriya dijmin kiriye. Jixwe hesabên wî ji berê de bûne, malbata xwe hemû kişandiye Swêdê. Niha malbateke wisa ye ku dewleta Swedê

bi çar guhan jê agahdar e. Belkî jî bi plan e. Provakatoran hemûyan barî wê derê kirin.

Li gor min tenê ne MÎT, tedbîreke CIA-MÎT û SAPO yê ye. Swêd yek PKK yî jî naxîne hundir. PKK li hemû Ewrûpayê dixebite, lê hîna nikare li Swêdê bixebite. Barkirina malbata Şener bi planeke wisa bingehîn ve girêdayî ye. Weke gelek provakator jî wir hatin bicihkirin. Heta li gor Palme ji ber ku ev yek nepejirand hate tasfiyekirin. Ev hemû aliyên provakasyona Şener ên eşkere nebûne destnîşan dikin.

Rasthatina vê provakasyonê ya li “serdema reforman” ku Ozal pê dihizirî gelekî balkêş e. Ozal gotinên weke, “em dikarin efû jî bikin, heta Apo jî dikare were.” Bi ihtimaleke mezin di hundir de hevpeymaneke Şener hebû. Dema derbasî hember min dibû digot, “ez dixwazim biaxivim.” Min digot, “biaxive” lê gotin bi paşpaşkî bi devê wî de diçûn. Ger hindekî ewleyî girtiba, yanî hindekî ez li gor vê yekê ditîbama, dê ew hevpeymana xwe ya hundirû eşkere bikira. Misoger bû ku li gor “serdema reforman” pêymanek çêkiribû, gelek diyardeyên vê yekê hebûn. Wê demê vê yekê rengê xwe dida me.

Provakasyona ku di sala 1988’an de hate sepand jî weke vê bû. Peyama parezer Yildirim dixwast ji Ewrûpa bide jî ev bû. Piştre Şener jî xwast heman peyamê bide. Tirsiya. Ji ber ku tirsiya bi şûn ve gav avêt. Lê jênegeriya. Dixwast kongreya 4. bi dest bixe. Yên din jî li ser kongreyên berê heman lîstok lêyîstibûn. Di 1982’an de provakatorê Semîr gelekî xwedî îdia bû. Piştre Fatmeya provakator hebû. Bi taybet hîna ji destpêkê ve diyar bû. Ji 1976’an hetanî 1986’an me îdare kir. Xwedî hesabên bidestxistinê bû. Her di nava hêviyêkê de bûn ku rojekê misoger emê di cihekî de liberxwe nedin û têkbiçin.

Şener jî weke ku ezmûneyên berê girtiye paş xwe, bi dewletê ve hatiye girêdan, li Ewrûpa jî cihê xwe ewlekiriye, dixwaze provakasyona herî wergir pêk bîne. Ez bawerim provakasyona Ewrûpayê jî bi vê yekê ve girêdayî bû. Ji ber ku di heman demê de darezîna Duseldorfê heye. Ev yek li Ewrûpayê jî tevgera paqijkirinê bû. Wisa tenê li paş ez

dimînim. Gelo ma min jî gelekî nerm dibîne? Qaşo dê min jî bi dest bixe, dê destpêkê PKK bikşîne xeta reformxwazan piştre dê berbi qedandinê ve bibe.

Em gelekî amadebûn. Ez bi xwe neçûm kongreya 4. lê em gelekî xwedî amadekarî bûn. Ji berê de em di bin navê konferansa netewî de xwedî amedekarî bûn. Em di wê rewşê de bûn ku, bibêjin, "biryar amade ne, berendam amade ne, her tişt amade ye, bigrin û pêk bînin." Bêguman dixwastin vê yekê jî vala derbixin. Eşkerekirina me ya vê yekê zêde zehmet nebû. Dema ev yek eşkere bû bergir hindekî hate guhertin.

Ew xwe spartina PDK ya tê zanîn. Di heman demê de xebatên Cem Ersever hene. Bi wan re yekbûn.

Di dawiya sala 1990 û di destpêka sala 1991'an de, yanî di 1'ê Çileyê de me kongre bi dawî kiriye. Ger em bi ser Zaxo ve û Dihokê ve biçin em dikarin bibin desthilatdarî. Lê serokatiya taktîk vê yekê nayne hişên xwe. Serhildana Adarê dest pê dike, serokatiya taktîk dîsa ne amade ye. Nîjadperest jî bi alîkariya emperyalîzmê ve gav bi gav desthilatdariya xwe bi pêş dixe. Û ji bo mehên sala 1991'an hindekî jî dibin salên wendakirinê. Ger ev nebesiya taktîkî nebûya, misoger me dikarî em vê salê bi ser bixin. Salekê ji xala destpêkê ve nedahurandina rast, baş fêmkirina wateya wê salê û bi taybet neavêtina gavên taktîkî nexweşiya kadroyên me ye. Ev rewş, di sala 1991'an de bi serê me de hat. Mirov dikare lêkolîn bike. Rexmî hemû bi ser de çûyînên me, bi sînordar jiyanîkirin mijara gotinê ye. Ji her aliyê welat re kom hatina şandin. Mirov dikare her alî salê bike sala pêngava mezin. Li welat gel piştgiriyeke girîng dide, lê serokatiya taktîkî nikare xwe tevlî bike. Belaya serî!

Rexmî vê yekê bi tedbîrên wergir ên me girtine ve, me li hemû eyaletan gerîla belav kir. Me metropol jî çalak xistin dewreyê. Di vê wateyê de em di rewşa destpêkirina baş a sala 1992'an de bûn.

Di destpêka zivistana sala 1992'an de, rexmî şertên giran, em dîsa jî bi hevalan re ne.

Li şûna desthilatdariya ANAP a xwedî dîtbariya sivîl a 12 Rezberê, weke desthilatdariya nû Înonû-Demirel tên. Ku,

ev ANAPê bi bîr tînin. Ji ber ku di wan salan de me hindekî şerê taybet bi paşve xistiye. Bi taybet şerê di bin rêbertiya ANAPê de, hêza xwe ya girseyî wenda kiriye, eşkere bûye, û teşhîr û tecrît bûye. Hikûmeta Înonû-Demirel a xwedî wehda reforman, ji ber ku dihizirin dê ji bo şerê taybet û kontrgerîla pêwîst be tînin ser kar. Li gel ku me hemû tedbîrên xwe wergirtibûn, dîsa jî em zirav nêz bûn. Lê weke ku min gotiye, li gel ku sala 1992'an bikin sala êrîşa mezin, bi taybet sond xwarin ku di vê salê de bi temamî PKK ê biqedînin. Çep-rast cara yekem di gotinê de dibin yek. Di hundirû de "mutabaqata milî" li derve "mutabaqata navnetewî." Hevkarên xayîn jî di dewrê de ne. Trafîka Berzanî û Telebanî ya Enqerê misoger encam dide.

Û peyman bi vê şêweyê ye: "ya tuyê dest ji gerîla (li gor wan azîneyên terorê) berdî, yan jî emê bi Tirkiyê re, bi Enqereyê re bibin yek û êrîşê bînin ser te. Dawiya sala 1991'an û di destpêka sala 1992'an de ji me re ev peyam anîn. Bêguman me jî weke "gerîlayê me her tiştê Kurdistanê ye, esasê hemû pêşveçûyînan e û divê mirov başur jî tevlî vê yekê bike" û me li ser vê bingehê pêşniyariya îtîfaqê kir. Lê ew, li ser planên tasfiyeger ên Enqereyê rûniştin. Weke tê zanîn, hevkarên başûr (yanî eniya Kurdistanî) jî tevlî plana tasfiyekirinê ya sala 1992'an bûn.

Her wiha, li Enqereyê dixwastin kêm zêde hezkariya ku ji pêvajoya rizgariya netewî re peyda bûye tune bikin. Enqerê ji wan re ev yek got: "temam li Enqerê ji we re cih heye. Lê em bi hev re li Ewrûpa PKK ê, tekoşîna rizgariya netewiya Kurdistanê ya bakur terorîst îlan bikin!" ew jî çûn. "temam tekoşîna rizgariya netewiya Kurdistanê ya bakur terorîst e, PKK terorîst e. Tirkiye demokratîk e. Demirel-Înonû gelekî demokrat in. Ozal demokratekî baş e. Em li hev hatine, emê bi wan re PKKê tasfiye bikin. Her wiha li Ewrûpayê Tirkiyê tengav nekin. Li ser navê mafê mirovan, mafên Kurdan pêwîst nake ku hun Tirkiyê tengav bikin. Ji ber ku Tirkiye nan, xwarin û kelûpelên liberxwekirinê dide me."

Di bin kumandeya DYA yê de ev xiyaneta mezin, di vê çerçoveyê de hate pêşxistin.

Xwastin sala 1992’an ji aliyê PKK ve bikin saleke tasfiyeyê. Weke tê zanîn yek jî PKK’yeke sexte derxistin holê û hewl dan zagonîkirina vê PKK ê. Xwastin HEPê bi kar bînin, lê firsend neda vê yekê. Berovajiyê vê yekê weke “ya emê bêbandor bihêlin, an jî emê li aliyê şoreşê weke amrazekî bi kar bînin” bersiv da. Wan jî di bin navê polîtîkaya “ji gel re dilxwazî” digotin emê li dij vê yekê derbikevin. Me jî gel kişand serhildanên berfireh. Dixwastin gerîla tune bikin. Me him wesfî him bêwesfî gerîla hêzdartir kir û xist dewreyê. Bi taybet ji bo darûnişkandina taktîka gerîla me hemû hêza xwe derxiste holê.

Dema mirov li dahûrînên sala 1992’an binêre mirov dikare vê yekê bibîne. Ji bo vê yekê me li wargehê dewre amade kirin. Di akademiya Mahsûm Korkmaz de me bi qandî 2500 mirov girtin perwerdeyê. Min li gel hezar karê xwe, li vê derê perwerdehiya kadro û şervanan di vê ast û wesfê de pêk anî. Ev karekî mezin e. Çima? Divê mirov hindekî bikaribe bêhna dîrokê bigre. Ger dijmin dixwaze di saleke wisa girîng de te tune bike, divê tu jî neynûk û goştê xwe bikî yek bersiv bidî. Yên me jî her ku derfet zêde dibûn, li ser dirazin. Mînak di 1992’an de hêzên me yên li başur wisa bûn.

Bi jimar em bi qandî du hezar mirov li vê derê amade dikin û dişînin Heftenîn, Çelê û wargehên Xakurkê. Fermandarên sexte jî diçin li ser wan hêzan rûdinin.

Piştre weke tê zanîn ew êrîşa 1992’an a li ser PKKê. Hesabên, “vê carê dê PKK birûxe emê bi zorê bidest bixin.” Hesab ew bû ku di sala 1992’an de him li bakur him li başur qedandina PKKê ye. Ez bawerim di vê serdemê de bandorkariya Gûreş baş binirxîne. Her çiqas Ozal heye jî, digotin “em fêrî Ozal nebûn.” Ez bawerim di vê derê de Ozal bi binket, feraseta reformê ya ku bi pêşxistibû jî negirt. Her çiqas Telebanî ketibe navbeynê jî, dema rewş li aliyê me bi pêş ket, eniya KT gelekî kete nava gumanan. KT dixwaze misoger encaman bigre, em jî dirêj dikin. Di hundir de em partiyê, gerîla pêş dixin, qada siyasî jî bi kar tînin û li derve jî dîplomasî gavan diavêje. Hetanî dawiyê serdemeke xwedî

nirxa baldariyê ye. Vaye şerê başur ê 1992'an di vê serdemê de kete rojevê.

KT, tiştên ku nekarîbû di salên 1982-86 û 1990'î pêk bîne, dihiziriya di 1992'an de temam bike. Bûyer bi girêdanên xwe yên hundirû û derve ve gelekî wergir bû.

Taybetmendiyên serdema Gûreş ku muhra xwe li van pêşveçûnan da wiha bûn: ev serdemeke Kenan Evren a nû û xetertir bû. Bi xwe bi şêweyekê fermanî û ferasetên kemalîst ve dihate fermandariya giştî. Her çiqas diyar be bi lihevhatina bi Ozal re hatibe jî, xwedî wê biryarê bû ku wî têperîne. Û li ser vê bingehê weke tê zanîn hikûmeta Demirel-Înonû derket. Van tiştan serdemeke nû îfade dikirin. Li dûv hev tevkujiyên Şirnex û Licê pêk hatin. Kar hindekî riştdar (cidi) bûne û serê fermandariya giştî hejandine. Weke ku mirov ji pirtûka Ersever hîn dibe, di pêşvexistina taktîk de tengaviyan dijîn. Vê tengasiyê hetanî li hevdanê jî çû.

Encax di dawiyê de bi êrîşa hêzên başûr a li ser me ve hindekî rihet dibin. Provakatoran jî dema fêmkirin, dê encam negrin, xwe avêtin biryargehên Berzaniyan.

1992 di vê wateyê de li gel pêşveçûyînên mezin, em gelekî rastî çewisînên giran jî hatin. Plan gelekî wergir bû. Yên me her çiqas ji xwe bawerbin jî di wê girîngiyê de xwedî amadekarî nebûn. Mirovên me hêzê dibînin xwe winda dikin. Xwe bêplan û bêperspektîf dihêlin. Lewra min digot ku, "ne mehan, demjîmêran bêeman binirxînin, bi taybet di başur de xwe baş bi cih bikin." Piştre min temaşe kir ku, li başur ji xwe re gund avakirine. Dîsa min digot, "di hundirê welat de şêwaza gerîla serdest bikin." Ev yek jî hindekî sînordar hatiye kirin. Kêmek derfet dikeve destên wan, li şûna ku vê bi pêş bixin, weke axan li ser vê yekê rûdinin. Helwestên wisa ne kêm in, yek jî ez bi van re mijûl dibim.

Dijmin vê carê gelekî xwedî plan e, ji dahizirîniya me pêhtir wergir e. Ji aliyekî ve bi teşêyê întîxarî çûyîna ser, ji aliyekî ve jî bi teşeyê radestiya hevkariyê dixwazin şerê başur bi rê ve bibin. Dijmin demekê behsa sê hezar wendahiyan kir. Esas ger destwerdanên me yên li dûv hev nebûna, diviya ku wendahiyên wisa mezin çebûna. Ger me

dest tê wernedaba, yên ku radestbûne dê wisa çûyîban, ên din bi teşeyê xwekuştinî dê winda bibûyan. Û belkî du hezar jî çûbiyan. Bi wendahiyên bi Botanê re, bi wendahiyên amadê re bi rastî jî diviya ku bibûya saleke bi gotina wan “me koka wan kola.” Li hember vê yekê jî em xwedî Amedekarîbûn. Di vê qadê de me bi qandî hezar gerîlayî dabû rawestandin. Her me mirov perwerde dikirin, û xebatên me yên piralî hene. Esas ger sê hezar jî biçin, em dikarin ji wê zêdetir şûna wan dagrin. Rewşeke beralîkariyê heye. Lê xeterî jî heye. Rêbertiya taktîkî ya gerîla tam li peywirên xwe xwedî derneketiye. Berovajiyê vê gelekî nebes, bêberpirsyar û hetanî dawiyê derfetên heyî belavkiriye. Bi taybet qada başur, bi qandî ku mirov bibêje, “qada pesindariyê, axatiya rêxistinê û qada axatiya şer” bi feraset û kesayetên jixweve çûyî ve dagirbûye.

Bêguman em di 1993’an de bi ser van de çûn. Me zivistana 1992-93 weke saleke darezînê ya bêeman xist pêşiya xwe û me got,” hun dê xwe bibînin.” Hindekî derxistin zanebûnê. Me got, “hindekî xwe kûr bikin.” Têkçûyîna şêwaza pêşmergeyan eşkere ye. Her wiha bi xwe spartina derfetên rêxistinê û bi şêwaza axageriyê ve ev kar nayê bi pêş xistin. Di vî alî me xebatên xwe xurt kirin. Ji bo ku binke bi pêşbikeve me gelekî hewl raber kir. Me berendam girtin û perwerde kirin. Dîsa di hundirê welat de mezinbûn heye. Me bi hevkomiya hemûyan ve di 1993’an de rê li pêşiya pêşveçûnên ku dijmin hêvî nedikir vekir. Gerîla weke aşutê mezin bû.

Weke tê zanîn di vê demê taktîka reforman a Ozal heye. Me ev yek bi taktîka agirbesekê kûrtir kir. Esas diyar bû ku dê Ozal bersiv nedaba vê pêvajoya agirbesê û dê nehata pejirandin. “ma Ozal çû yan hate birin” ev yek jî zedê girîng nîne. Ya girîng hikumeteke nû, ketina dewrê ya hikûmeta Çîlerê bû. Di vê serdemê de muxalefet û desthilatdarî dikeve bin fermana fermandariya giştî û Gûreş weke paşeyekî rayeyên xwe dide axaftin. Bi taybet bi destpêka havînê re, bi planeke yek salîn an jî kêmtir digotin emê “misoger biqedînin.” Di vê serdemê de pir hêrsdar û şêt bûn. Ez bawerim bi ihtimaleke mezin Ozal hate tasfiyekirin. Di nava

artêşê de derûdorên girêdayî Ozal jî hatin tasfiyekirin. Bitlîs paşa û Ersever bi darê zorê derveyî kirin. Bahtiyar Aydin jî parçeyeke vê tasfiyê bû.

Esas bi van tasfiyan ve dixwastin vê yekê bibêjin: “te li dij PKKê şer wenda kir!” Ev kevneşopiyeke Osmaniyan e. Kesê ku şer wenda bike serê wî diçe. Esas a ku li ser Ozal û yên din hate pêkanîn ev zagon bû. Serdema Ozal esas ji aliyê me ve hatibû bidestxistin. Ozal ev yek dît û fêmkir ku dê ev şer neyê biserxistin. Û kete nava hizrekê ku bi rêka siyasî him pirsgirêkê çareser bike û him jî xwe xelas bike. Heta ev yek pir vekirî got. “ezê sala dawî ya temenê xwe bidim çareserkirina vê pirsgirêkê.” Ez bawerim di vê mijarê de xwast bi dirûstî û wêrekî çend gavan biavêje, lê ev yek bû bihayê jiyana wî.

Ev ên din kemalîst bûn. Qaşo koalîsyona neteweyî damezrandibûn. Xwedî îdiabûn. Aborî xistin xizmeta şerê taybet. Bi muxalefetê û desthilatdariyê ve hemû partî xistin bin fermana şerê taybet.

Tansu xanim zêde ji van karan fêm nedikir. Jixwe dema hat jî diyar kir ku, di derbarê vî şerî de xwedî tu zanînê nîne, ev yek bi gotinên, “min gerîla di himbêza xwe de dît” rave kir. Lê piştre bi carekê ve destpêkir weke fermandarekî axifî. Got, “an dê biqede, yan dê biqede!” Esas tu rewşa wê ya fermandariyê jî tunebû. Serfermandar, paşeyê wê li tenişta wê ye. Dinepixîne, dide axaftin. Taybetmendiyeke Tansû jî hevwelatiya DYA yê ye. Ji bo vê yekê anîn û ji DYA yê dem xwastin. DYA yê ev dem da. Çû gel Mîterand got, ez layiqim, jineke wisa me.” Ji wê jî soza birîqînê girt. Ji bo Elmanyayê jixwe Demirel heye, wî jî ji wê derê pesendarî girt. Bi vê şêweyê mutabaqatên hundir û derve temamkirin.

Amadekariyên artêşê yên gelekî berfireh di dawiya 1993’an de hatibin temamkirin jî, bi destpêka 1994’an de amade bûn. Li gor planên wan dê tu tiştek xelas nebûya. Geleki giranî jî dan dîplomasiyê. Ev bi tevahî dîplomasiya dorpêçkirina PKK ê bû. Dema em gihiştin dawiya 1994’an, di gerîla de berfirehiyek wesfdariyek û di dîplomasiyê de jî serkeftinek mijara gotinê ye. “yê hatiye dorpêçkirin, ne PKK KT ye.” Gureş dibehice, rastiyan berovajî dike û dixwaze

çawaniya serkeftina xwe raber bike. Dem dirêj bûye, nakokî zêde bûne, bi Serokomar re jî nakokî derketine. Jiyana aborî û siyasî di nava lemelemekê de ye. Bêguman dema ku her pêvajo dest pê dike, em jî xwedî gotina “yan emê bi serkevin, an emê biserkevin.” in.

Di PKKê de hemû pêvajo wisa ne. Sedema destpêkirina pêngava me ya 1994’an, provakatorên weke Sari Baran, Mehmet Şener û Metîn Balîç in. Wê demê (Çileya 1993) her sê jî di rêveberiyê de bûn. Heta serdestê her tiştî bibûn an jî me ew kiribûn serdest. Ez jî gelekî xwedî hêvîbûm. Gelek xebatên kûr hebûn. Ji axaftina 1 çileyê hetanî 25 çileyê ez li wir amadebûm. Ez bawerim hemû dikin pirtûkeke mezin, divê ev were xwendin. Em kûrahiyeke mezin bi dest dixin, komeke mezin perwerde dikin. Belkî li derûdora pênsed kesî hene, bi derbasbûna van a welat re em hêvîdarin dê deskeftiyên mezin pêk werin. Bi van mijaran hemûyan ve me hetanî dawiya meha Çileyê anî. Dema me xwe wisa xist nava hewayeke serkeftinê me dît bi carêkê ve gotin qeza çêbûye.

Bêguman, her roj şehadet çêdibin, em ji vê yekê re tu tiştekî nabêjin, lê em piştre li ser hizirîn. Ev qezayeke wisa ye ku pirsa “çima” xwedî wesfekê ye ku her roj mirov dixwe û pirsa li ser pirsan dide pirsîn. Divê qet tiştekî wisa nebûya. Tu lêkolîn dikî, esas divê qezayeke wisa çênebe. Di koma perwerdehiyê de ne çekek mijara gotinê ye, ne jî ji mîlyonan yek divêtiya qezayê heye. Hîna wê demê jî me ev yek ji xwe pirsî: “ev yek ne qeza ye, ev tiştekî din e.” Esas ger hebe jî ev ihtimaleke lewaz e. Dîsa jî divê em rasthizirînê bi pêş bixin.

Kesê ku qeza kiriye xwedî kesayeteke çawa ye ku, em li ser serê şoreşê digrin, em li ser serê pratîga xwe ya wargehê digrin. Ev kesayeteke çawa ye? Dikare hevalê me yê herî nirxdar jî bi hêsanî qetil bike. Ger qeza be jî, divê mirov ev yek lêpirsîn kiriba û min got, “bi ev kesê ku vê qezayê bike ve şoreş nayê meşandin, em nikarin bi vê kesayetê ve şoreşê bikin.” Jixwe piştre me xwast em pêşiya qezeyan bigrin. Lê ew yek ne qeza bû.

Vî kesî gundiyên ji rêzê, ciwanên 15-17 salî ji ber kêmaniyeke herî biçuk jî didaye ber guleyan û hîna ev yek domandiye. Ev yek li gelek cihan pêk hatiye. Tu tiştekî nade tu kesî û dibêje, “ji ber zehmetiyan reviya” û di heman demê de dide ber guleyan. Dîsa ji gelê bêtawan jî gelek kes wisa kirine. Ev yek ne qezaye, ev kesayet cinawir e, rûpoşa wî jî rûpoşa şoreşgerî ye.

Bi aliyekî ev.

Li aliyekî din em li hevalên din ên li dora xwe temaşe dikin, qet nas jî nakin. Ger bi ya wan be, qet dê hesabpirsîn jî nebe. Bêguman, dema em nirxandineke xwe ya din bi pêvajoyên paşê re tînin beramberî hev, em dibînin ku dijmin wiha dibêje: “esas em gihiştibûn wargehê, me tam jî encam digirt.” Em bi vê yekê re rû bi rû man. Wê demê yek-du kontra jî hatibûn girtin. Qaşo ew heftê hatibû revandin. Dîsa me dizanî ku hindek kesên wisa li derûdora me digerin. Hemû diyardeyan raber dikir ku, esas ev hemû bi hev re girêdayî bûn. Bi dibêtiyeke mezin bi zanebûn bû. Ne qeza bû, çalakiyeke zanebûn. Ji ber ev yek provayek e ger encam serkeftî be dê dor were min. Yanî hindekî ji bo wêneraniya têkîliyên nava wargehê dibe ku şehadeteke wisa roleke girîng bilêyîze. Zilama belkî jî weke ku mirov ji nav ron mû bikişîne dixwastin PKK bigrin bin wêneraniya xwe. Ji ber ku piştre ev reviyan û bi pratîkên van re eşkere derkete holê ku ev kes nerast bûne.

Van hersêkan ma dikarîn PKK ê bikin rêxistineke cewaz? Dikaribûn bikin. Ger me ev yek çareser nekiriba, ji sedî nod dikarîbûn bibin xwediyê hevkomiyên PKK ê. Ev yek eşkere ye. Tenê pêdîviya wan bi yek tiştî heye ew jî dem e. Vaye xala ku sîxurekî şaş kiriye, li şûna ku bi vekirî bi ser min de were, bi ser qezayekê de çûye. Hevalê me yê Hesen bi qezayeke çawa çû? Ger ez vê yekê weke qezayekê bipejrînim û asayî bibînim belkî weke cara duyem dema bi şev bimeşe dê bibêje “teq” tifing biteqe û ezê wisa bi qezayê biçim.

Vaye dê wê demê çibûba? Wê demê dê çar bi çar PKK bikete nava destên KT yê. Bi ihtimaleke mezin ev tez rastir e. Jixwe sîxurê 1990 digot, “me nekuşt, ji ber ku ji me re

nehatibû gotin bikujin.” Yanî tişta dixwaze bibêje, kuştineke eşkere dê tevlîheviyekê biafrîne. Wê demê kontrola PKK nakeve dest. Ji kuştineke wisa zêdetir, kuştina bi şêweyê qezayê û bi vê şêwazê bi destxistina PKK tê plankirin.

Esas ji bo vê yekê zilaman kar kiriye. Û ji bo vê yekê ger hefteyeke din sebir bikin dikarin bigihên encamê. Dê çibûya? Wê demê dê hema PKK biketiba destên wan. Zilam gelekî xwedî hêz in. Yak li başûr e. Vaye Sari Baran bi PDK re xebitiya ye, yanî li cihekî bi MÎT ê re kar kiriye û em hîna jî neyîniyên Behdinan nikarine sererast bikin. Ên din weke ku ji ron mû bikşîne zindan bi dest xistiye. Hemû girseya zindanê bi wî ve girêdayî ye. Rêkûpêkiyeke wisa kiriye ku, em hîna jî nikarine sererast bikin û wan neyîniyan têperînin. Ê din jî Botan bi dest xistiye. Wateya Botanê, Metîn Balîç e. Ev yek jî çar bi çar hatiye pêkanîn.

Ma li paş çi maye ku? Parezer jixwe wê demê dibêje: “Ewrûpa ya me ye. Jixwe hemû dewletên Ewrûpa dikarin her tiştî di bin desthilatdariya xwe de bigrin.” Dijmin ji bo vê salê jî xwastiye (ku hemû diyarde vê yekê raber dikin) PKK ê têperîne. Ozal digot, “ma em hindekî makezagonê binpê bikin dê çi bibe?” Her wiha ev yek ji bo zindanan jî dihate gotin. Zilam bawer e. Yanî ji bo têperîna PKK ger dê makezagon were kun kirin, bila were kunkirin, ma ya girîng ne berjewendiya dewletê ye?

Dema hemûyan dikin yek; esas li gor xwe zilaman bi şêwaza herî hişmend, çeka PKK ê bi şêweyê herî xeternak, li dij mîrat û doza PKK bi karbînin û bi komployê dixwazin bi dest bixin. Niha diyarde vê yekê eşkere dikin. Ji ber ku xebatên paşê dîtin. Dema pratîkên hemû provakatoran tên lêkolînkirin, bi zanebûn an jî bêzanebûn dema kesên ji vê yekê re bûne amraz jî tên lêkolînkirin, pir vekirî derkete holê ku çavkaniya vê yekê ji dijmin wêdetir bi tu cihan ve naçe. Lewra objektîf jî nîne. Ji ber ku bûyera Ersever bi vê yekê re girêdayî ye. Zilam heşt salan li ser me kar kiriye, di qada başur de jî xwedî hevkomiyeke payebilind e. Şerê başur wî da meşandin. Ji ber ku tam encam negirt çû. Yek jî binkeyeke ku jiberxwe ve ji vê yekê re bûye amraz mijara gotinê ye.

Şener fêlbaziyeke rondikweşînê dikir. Di destpêkê de ev kesayeta başur, dixwast her kesî bi van rondikan bixapîne. Digot, “vaye Mazlum wisa ez xelîfeyê xwe hilbijartim.” Binke ji min zêdetir ew guhdar dikir û bi hestyarî bi wî ve dihate girêdan. Binkeya hestyar! Mînak keçek heye hîna di zindanê de ye. Dibêje, “em hemû weke kuçikan hatin girêdan.” Vaye jin e, qelsiyên wê hînbûye. Jixwe bi keça me ya herî berxwedêr re jî qaşo di asta herî bilind de ketiye nava têkîliya evînê. Pisporekî mezin e. Kesayeta başur li ber digere. Weke ku min gotiye, zilam hiziriye dibe ku kesê herî zêde bi min ve girêdayî bimîne dê hevalê min ê zaroktiyê Hesen be, fikiriye “ger em vî jî bibin tu kes nabîne.”

Çima wisa ye? Taybetmendiyên kevin, asta hestyar a kevin evqas ji provakatoran re bûye zemîn. Min keç xwedî dikirin, lê bi hestên herî erzan diçûn li paş min her şêweyê fêlbaziyê dikirin. Yanî ez ji ber xwe ve negihiştim ev dahurînên hestyariyê. Min got, çi van tê? Kesê ku ev qas xizmeta mirovbûyîna van dike ez im, kesê ku wan xwedî dike û ewlekariya wan dike ez im, kesê ku bi salan e Amedekariyên vê yekê dike ez im, ev jî nû hatiye, çi ye nediyar e. Başe ev keç çima wisa bi vî ve girêdayî ne? Min bi xwe ji xwe pirsî; çima wisa bi mirinî girêdayînê raber dikin? Vaye hindekî xapandiye û hindekî jî li gor daxwazan şerbet daye.

Di jiyana min de derfeta serkeftina komplogerekî gelekî sînordar e.

Tê bîra min, ez bawer dikim rayedarekî Rojhilatanavîn bû. Gelek baş gotin dikirin. Bêguman wê demê jî ez hindekî wisa gumanbarim. Min ji zilam re wiha got, (ma min wisa hindek xeteriyên kompoyî hîs kirin?): “Îmam Elî ji paş ve xençerkirin.” Lê wê demê navê min jî Elî bû. Ez xwe ji paş ve nadim xençerkirin. Ji wê rojê hetanî roja me ya îro li Rojhilatanavîn im, tu kes nikare ji paş ve min xençer bike. Bêguman ev jî şêwazek e. Belkî zilam şaş dimînin. Ji ber ku qada Rojhilatanavîn qada komployan e. Lewma divê mirov vê yekê jî fêr bibe. Çima? Ez bawerim ji taxima Ersever hetanî nava wargehê jî hatibûn. Hêzên îstîxbarata jendermeyan, ku wan bi xwe jî ev yek eşkere kirin. Bi

ihtimaleke mezin hindek komploger misoger bi wan re di nava pêwendiyê de bûn. Lê nikaribûn encam bigrin. Çima?

Heta sîxurek tê bîra min, qaşo di destan de keleş hebûye û li paş min bûye. Bêguman negengaz e çekê bi kar bîne. Lewma tê qerisîn. Wisa gelek kes MÎT ê bi xwe eşkere kir. Ez bawerim çend salan berê bû. (bi 1984'an re) Hûriyetê (rojnameyeke tirkiyê ye) ev yek weşand. Digot, "me deh ezmûneyên suîkastê kirine, lê yek jî bi ser neketiye." Wisa gelek kes şandine, lê qet nekarîbûn nefesê bigrin. Bêguman ev bi asta min a rêxistinê ve girêdayî ye. Ev bi baldari, şiyarbûn û zexmgirtina çeperê ya min ve girêdayî ye.

Di plangeriya takekesî de ya misoger, ji aliyê azadiya jinê ve jihevçûna girêkora 1986'an gaveke pir mezin e. Yanî weke raberkirina hêza rizgarbûna ji zincirên hezar salan ên bi zend, dest û lingan ve girêdayîne. Dibe ku kesên civînên kongreya 3. bi bîr bînin hebin, entrîkageriya jineke ketûber, hetanî qirikê nêzîkatiyeke arîstokrat feodal, dîsa mîratxwarî, misoger xwedîmaliya ku bi azadiyê re tu têkîliya xwe nîne, him jî bi durûyî, hetanî ku bigihê komplogeriyan hemû nêzîkatî vala hatin derxistin. Ger bi serbiketiba, dê bi navê hemdemî girêkorek jî ji bo PKK bihata avêtin. Yanî di rewşeke wisa de ez bawer nakim ku pêngava me ya paş bibe mijara gotinê. Ez bawerim di meha Adara 1987'an de li ser pirsgirêka jinê nirxandineke me hebû. Di wê derê de dîtina bandora wê zehmet nîne.

Piştî ku em ji tengaviya 1986'an xelas bûn, jixwe em ji serdema nû re dibêjin "meşa berbi azadiyê." Di wê derê de bi teorî hindekî hatiye ravekirin. Piştre lez dayîna me ya ji xebatên jinê re gelekî cewaz e.

Û piştî ku me ji giyaneke mirî, ji hawirdoreke fetsînêr xelas kir pêşveçûn û tevlîbûn bi pêş dikevin. Xwe nirxandina min a wê demê, rizgarbûna ji barekî mezin û di plangeriya kesî de belkî ya serkeftinek an jî azadbûnek.

Serkeftinek an jî azadbûnek.

Dema ez bi wateyî û giyanî rizgariyekê pêk tînim, ez bawerim tişta ji bo pêngava paşin pêwîst e bi dest dixim. Ji ber ku ez ferx dikim ku ez deh salan bi zincîran ve hatime girêdan. Zincîrên manevî, zincîrên exlaqî, yên siyasî û

rêxistinî ji çar aliyan ve min girê didin. Bêguman şikênandina wan, tê wateya parçekirina gelek têkîliyên dewletê, têkîliyên serdest ên paşverûtiya civakê. Ev yek gelekî girîng e.

Di dîtbariyê de ez bi kesekî ve parçe dikim. Lê di şexsê kesekî de pergala feodal a desthilatdar, pergala mêtînger,hatiye avakirin. Xwe xistiye nava giyana wî, nava exlaqê wî, di asta rêxistinî û siyasî li hember temsîlkareke wî yê bandorker çewisîneke giyanî û heta manevî hatiye damezrandin. Ez wisa bi hemû aliyên wî ve parçedikim ku, ev yek ji aliyê min ve bi taybet ji pêşdîtinên min zêdetir rê li ber vêbûna azadiyê vedike. Ez wê demê hindekî lewaz bûm, dahûrîn wisa bihêz nebûn. Di encam de dahûrîn di sala 1986 û paşê bi pêş ketin. Bawerim bi wê re rasterast girêdayî ye.

Têperîna min a wê, li cihekî dibe têperîna dîroka koledar a hezarê salan.

Di wê derê de pêvçûna dijwar a du nêrînên cewaz ên cîhanê; pêvçûna du giyanên cewaz û ya du hêzan heye. Jixwe dema em gihiştin sala 1986'an cih gelekî girîng e. Ez îro jî li ser pirsgirêka darezînê radiwestim. Di sala 1986'an de çima bi wêrekî min hêza bi ser de çûyînê raber kir? Hindek taybetmendiyên wê salê hebûn. Diyar bû ku kêm zêde aloziya 1985'an de were derbaskirin. Girêdana van kesan a bi têperandina vê aloziyê re gelekî fêmker e. Yek êdî, "yan dê were têperîn, an dê were têperîn." Weke din mirov nikare gav biavêje. Min ev yek gelekî baş didît.

Aliyê hember bi qandî ku serî li komployên dînokî bide şêt dibe. Vaye hetanî vê derê pêngava dawî ya lîstokê û rûbirûmayîn dawî.

Ew pêngavên dawî yên nêrîna cîhanê ne.

Bi temamî di vê wateyê de ye.

Bêguman di vê derê de hun dikarin aliyê planger a serhildana min bibînin. Mesela ger ez di zemînê Tirkiyê de bim, ne gengaze ku ez vê belayê têperînim. Çiya misoger di bin wêneraniya me de ye, hetanî dawiyê hawirdoreke azad e. Bi giştî tê fêmkirin ku dê tekoşîna me bênavber bidome. Her çiqas hişk derbas bibe jî, em dikarin têperînin. Vaye di vê çerçoveyê de gaveke pêşvetir tê avêtin. Û weke ku gaveke

pêş e her wiha xwedî hêz e jî. Hun dikarin li dahûrînên wê salê temaşe bikin. Ger ez şaş nebim pirtûka wê jî heye, ez pêşniyaz dikim ku hun bixwînin.

Jixwe piştî ku em ji ev girêdana paşverû xelasbûn, li dûv hev gavavêtin, weke aşutê dahûrîn, têkilî û mezinbûna rêxistinê derkete holê.

Yanî rizgarbûna min a ji kontrolê, bi pêşxistina pêngava 1987'an ve vê yekê xwe raber kir. Divê mirov vê yekê cudatir binirxîne. Ger em rast û nerast girêdana vê yekê bi dewletê re bihizirin, ger girêdana wê ya bi civakê re bihizirin, a ku li vê derê tê dayîn ne şerê li dij yekî, nêzîkatiyeke mezin a ji têkîliyên dewletan re, ji civaka paşverû re û helwestên li gor pîvanan guncaw mijara gotinê ne.

Di vê derê de ya girîng, hesabkirina min a aliyên neteweyî û civakî ya tekoşîna me ye.

Ger bala we li ser be, di hemû kesayetên Kurd de, di van têkîliyên wisa taybet de wisa aliyekî netewî-civakî nîne. Herî zêde bi şerekî kesî, dikarin di asta êşîriyê de bikevin pêvçûnekê. Her wiha bi azîneke qerase lê didin. An bi veqetîneke klasîk an jî bi derbeyeke kêre ve têkilî tê biencamkirin. Em baldar bin, di şêwaza min de ne nêzîkatiyeke bi azîneya veqetînê, ne jî êrîşeke bi kêrê heye. Cewaztir û balkêş e.

Mesela hevalê me yê ku tên beşdarî komployê bikin di vê salê de dibêje: "em bi çar hespan ve girêbidin û bikin çar parçe!" li hember azîneya serdema navîn, azîneya serdema navîn. Digotin, "em hema îdam bikin." Yanî feraseta li ser partiyê û hevalan serdest ev bû. Lê di feraseta min de ev yek nîne. Li gel ku hetanî dawiyê ez xwedî niyeta başkirinê me, ger direve jî bila bireve. Yanî nêzîkatiyeke weke dayîna revandinê mijara gotinê ye. Çima?

Ev kî ye? Ji kû hat? Ger hema ketiba axê, diviya ku gelek mijar nehatibana fêmkirin ne wisa? Mesela me nedikarî provakasyona 1988'an fêm bikin. Belkî piştî wê hemû provakasyon wisa eşkere dernediketin holê. Em ji Şeneran bigrin, hetanî parezeran, gelekên weke van diviya eşkere nebûna. Di salên 1989-1990'an de jî gelekî kesên wisa

derketin. Kor Cemal, nizanim Terzî Cemal. Niha ev hemû hindekî jî bi vê yekê re girêdayî ne. Esas ev dibin ferasetên ku bi van ve girêdayî. Heta feraseta ku ferhat nikarîbû xwe jê xelas bike jî ev bû. Şener bi çavreşî domkarekî vê yekê ye.

Xelasbûna min a jî vê yekê hindekî tê fêmkirin.

Di salên 1987-88'an de bi nêzîkatiyeke dijber ve têkîliya Şener-Sakîne derdikeve holê. Li gor min girêdanên wan pir şênber e. Lîstik an jî şerê ku em li dij KT yê dilêyîzin, ew jî bi esasgirtina azîneya min hindekî jî bi nêzîkatiyeke tolgirtinê derbasî êrîşê dibin. Heman hestyarî, heman taktîk. Ev şêwaz, di nava rengê KT yê de ye. Kesayeta Sakînê û aliyên lewaz ên PKKê rêxistin kirine û bi xwe ve girêdane. Ji vir ve jî derbe li ser derbê li PKKê didin. Hema weke ku em çawa zikê qels ê KT digrin û lê didin, ew jî dixwazin zikê qels ê PKKê bigrin û lê bidin. Vaye hemû çîrok ev e.

Ew rewş bi rastî jî mijulkar bû. Di salên 1988-89-90'an de hîna jî em pê re mijul in ku têperînin.

Çalakiya Ferhat jî aliyekî vê yê din e. Jixwe bandorbûna Ferhat şênber e. Wiha dipirse, "gelo ma nabe ku hemû provakator mafdar bin?" "ger ez pêwendiyê pêş bixim dê çawa bibe? Ma em nikarin bi azîneya siyasî çareser bikin?" dûrbûna ji gerîla û ya girîng jî di mijara jinê de rewşa ketiye nav heman tişt e. Di vê derê de aliyê pêhtir bi mijarê ve girêdayî, feraseta me ya azadiyê û xwepêçana wan a bi feraseta girtîbûn û statukoger e. Di her sê yan de jî feraseta hest û evînê ya pergalê bingeh tê girtin. Em dikarin ji vê yekê re bibêjin hestyarî yan jî evîna KT. Dîsa em dikarin bibêjin pêşveçûyîna têkîliya qebîleya feodal jî.

Ya min jî bi wane ya ku min ji ezmûneyan bi dest xistiye, weke ku min şêwaza têkîliya KT yê têperandiye, ez feraseta taybetmendiyên civakî yên seretayî-paşverû jî ditêperînim. Û di van salan de ev taybetmendî parçe dibin. Esas wateya herî girîng a ku mirov bide van salan jî ev e.

Daxwaza min a qetandina jinê ji ev girêdanên kevneşop, ji hizîrînê zêdetir rê li ber bandoreke çareseriyê vekiriye û vê yekê di hundir de jî rê li ber pitepitan vekiriye, bi taybet ji aliyê van hêmanên bingeh ve xeternak tê dîtin.

Yek hestyariyê li ser binkeya zindanê disepîne, yekî jî li çiyan jixwe ji sala 1990'an de li derûdora xwe sepandiye û bêeman dixwaze vê yekê pêk bîne û bi min re sing bi sing tekoşînê dide meşandin. Him teqlîka min dikin û him jî ji canê min re fermanê dixwînin.

Pêşbirkeke mezin heye. Hindek wisa, xwe diavêjin nava teqlîtekê ku dikarin ji min pêhtir têkîliyên baş bi pêşbixin, hest û evînên baştir bi pêş bixînin, dikevin hewayên karîyerîst. Ev der watedar e. Di vê derê de tenê heweseke takekesî ne, li hember herikîna azadiyê serhildaneke herikîna statukoger mijara gotinê ye. Di wateya civakî de li hember çalakiya azadiya ku me piştî 1987'an bilind kiriye ya van tevgereke çewisandina dijber e. Ev pir tirsnak takekesiyê dijîn. Her çiqas ez digihînim asta civakiyê, civakî dikim û digihînim netewiyetê; ev jî ewqas ji netewetiyê û civakiyê diparzînin û tirsnak takekesî dikin.

Mesela misoger divê Sakîne biaxive. Divê vê evînê careke din bîne ser ziman. Her ku çavên wê weke çar kaniyan, wisa hatiye girêdan, bi çavtarî hatiye girêdan. Min bi xwe bi çavên xwe dît, heta dixwast li hember hemû partiyê wî biparêze. Têkîliyeke taybet li dijber hemû partiyê, bi dînokî ger pêwîst bike dê bi mirinî biparêze. Di vê derê de bi qandî ku mirov bibêje tuneye cewherê xwe yê civakî wenda kiriye. Jixwe bi pîvana netewî re, girêdana wê bi şer û partiyê ve nemaye, yek jî bi qandî ku nehatiye dîtin dê vê yekê li nav partiyê belav bike. Ger firsend bibîne, dê hema li ser bingehê takekesiyê, dê hemûyan ji partiyê, ji şer û ji netewiyetê dûr bixe û li ser vê bingehê ajoyên wan sor bike. Dê ev yek bi kû ve bibe?

Ev yek li wargeha me hate sepandin. Bi zorê me pêşiya hevalan girt û me pêşniyariya cezadayînê kir. Gelekî çavtarî bû. Heman feraset di Sakînê de jî û di Ferhat de jî derkete holê. Tiştên ku di wargeha Zelê de hatine jiyîn eşkere ne.

Me konferansek bi pêş xist, li wê derê jî hatiye xwastin ku weke biryarekê were sepandin. Jixwe di nirxandinan de heye. Asta têkîliya ku Ferhat jiyaye diyar e. Yanî ji keçekê re dibêje, "em birevin." Ev êdî rastiyeke eşkere ye. Ewqas ji berpirsyariya xwe ya dîrokî, ji peywirên xwe yên netewî,

civakî û şoreşgerî direve û wisa jî dixwaze xwe takekesî xelas bike. Ji vê pêhtir xwe dayîna dest nabe.

Yên din jî wisa. Kesayeta Baran mînak e. Yanî di asta duyem sêyem de lîstokvan hene. Di navberê de revên gelek xort-jinan hene. Bêguman a me li hember van tevgereke azadî ya kûr e. Ew çiqas dibêjin girêdanên taybet û takekesî, ez jî ewqas dibêjim, girêdanên giştî, têkîliyê di asta netewî de, hezkirin û hest.

Kesayeta min a di vê derê de awarte xwedî hêz e. Divê hun bikaribin bibînin ku, ez çawa ji ev asta têkîliyê mezin bûme. Pir xweş pîvanên neteweyî bikaranînêr dikim. Baldar bin, di dîroka Kurdistanê de û heta di rastiya Rojhilatanavîn de cara yekem em asteke wisa temsîl dikin. Weke din zêde mînakên vê yekê nînin. Di van salan de bi taybet (ku ev yek hetanî roja me ya îro jî tê) kesayeta min raperînêrê jina awarte ye. Pêşvexistînêrê hestan e. Veguhêrînêrê civakê ye. Li gor asta netewî ye. Mesela bi giyana netewî xwe avêtina nava agir a keçên ciwan û xwe şewitandina wan bi vê yekê ve girêdayî ye.

Giyana hestyar a neteweyî ku bilind dibe yan jî netewîbûna azadiya ku takekes di xwe de pêk aniye dibe encama efsanebûna azadiya jinê.

Lewra çalakiya van keçan di 1990'î de bi pêş dikeve. Misoger wateya ku ez didim azadiyê jî wisa ye. Çima ev çalakî di sala 1980'an de pêk nayê, di 1990'an de pêk tê? Çalakiyeke wisa di sala 1980 nayê hişên tu keçê. Di 1985'an de jî nayê. Çima di 1990 de tê? Ji ber agirê azadiyê yê 1990 î her cih pêçaye. Xwedî wateyeke wisa ye. Bi rastî jî belkî dê di dahatuyê de pêhtir were fêmkirin.

Min ev yek çawa bi ser xist? Ji çîrokê derbasbûna romanê di van salan de çawa dibe? Hêjayî li ser rawestandinê ye.

Vaye nêzîkatiyeke min a afrînêr jî, pêşvexistina raperînê ye.

Bi qandî neyê hişên tu zilamê me têkilî bilind kir. Em neketin du şaşiyên xeternak, vaye ev der girîng e. Ne ez fetisandina têkîliyeke taybet, ne jî ketim rewşa têperîna asta jinê û sivikbûna têkiliyên jinê. Ji vê wêdetir, lêpirsîna rastiyê, lêkolîn, bangewazî, afirandina kesayeta azad, ev jî

gelekî girîng in. Ji ber ku ger di cihê min yek ji we be, têkîliya herî nirxdar a ku ew bi pêş bixe, têkîliyeke di nava sînorên kevneşop de ye. Ger milîtan xwedî takekesê biçûk, mejiyê biçuk û têkîliya biçûk be dê çalakiya wî jî biçûk be. Dê partî mezin nebe, şer mezin nebe. Xwe mezinkirina min a di pirsgirêka jinê de, partî mezin kir, şer mezin kir, gel mezin kir, netew mezin kir, pêşxist û afirand.

Ger xwe xetimandiba, di vê mijarê de min xwe nedahurandiba, min bigota “pêwîstiya min heye” û ez bi ser jinekê de yan jî bi ser ketîbûnekê de biçûma, ez bi ser şêwazê têkîliyeke paşverû ve çûbûma yan jî ger min bigota, “ez qet girîng nabînim, jin bilenet e, jin ne tu tişt e, encax wisa mirov dikare bigre bin desthilatiyê”, dê kesayeta min pir biçûk bima. Dê bi du şêwazan biçûk bima. Yek şêwazeke pir axayî ya din jî dibe şêwazeke pir takekesîn. Vaye neketina min a van dualiyên xeternak, xwedî wateyeke dîrokî ye. Ji ber çi min ev yek tercîh kir? Ev yek bi meşa min a azadiyê ve girêdayî ye, bi giyana min ve girêdayî ye. Ez xwe gelekî biplan bi rê ve dibim.

Divê her têkîlî gelemperî be. Her têkîlî divê xwedî asteke rêxistinî û civakî be. Rêgeza ku min li xwe aniye ev e.

Tu têkîlî nikare min ji asta rêxistinê, ji asta çalakiyê dûr bixîne. Ev yek gelekî girîng e. Dîsa bandora têkîliyê divê xwe bigihîne asta netewî-civakî. Kesê/a ku vê yekê esas bigre gelekî nêzî min e, pir ji dil e. Kesê/a vê yekê esas negre dixwazim di heman cihî de bikûjim. Giyana min nakişîne, hêrsdar dibim, tengezar dibim û hema diavêjim. Ev meseleyeke giyanî ye. Meseleya dapejrandina çawaniya giyana azadiyê ye. Jixwe di heman demê de ez rengê vê giyanê didim. Ez rengdidim jinê, ev jî wan netewî dike, partiyî dike û mezin dike.

Pêşvexistina kes a giyana azadiya hundirê xwe, misoger reng dide azadiya zayenda xwe, azadiya civakî û asta netewî. Min ev yek pêk anî. Tişta ku van astengiyan disepandin jî esas dijşoreşî bû. Hindekî di kesayetên xwe de êrîşa feraseta kevneşop a statukoger e.

Bêguman çîrokên balkêş hene. Ger çîrok be jî, roman be jî, di heman demê de rê li ber eşkerebûna wan vekir. Wisa

bidestgirtina min a jinê ji aliyê wan ve rê li ber neyîniyan vekir. Weke di pirtûka dawî ya wî provakatorî de jî tê dîtin, di derbarê çawaniya jiyana min a bi jinan re min xwast ez hindek tiştan bi pêş bixim. Bêguman ezê bi jinê re li ser jiyana azad bihizirim û kûr bibim. Ger ez vê yekê nekim evdalek im. Bêguman ezê pîvanên jinê bi pêş bixim. Ev peywira min a hunerî ye, peywira min a şoreşgerî ye.

Hişyarî, afirandêriya awarte ya ku ez ji têkîliya jinê re raber bikim, encax bi nêzîkatiyeke hunermendî dikare were ravekirin. Weke encam, ger jinên azadtir derdikevin, dê rêzeke me ya mezin ji vê yekê re hebe. Lê xwediyên ev nêzîkatiyên klasîk an jî kesên di sînorên feraseta namûsa feodal de mane, bi şêweyê, “vaye namus ji dest diçe” dikevin nava nêzîkatiyan. An jî tînin ser ziman ku, civak serûbin bûye yan jî dibêjin her tişt ji dest diçe.

## Li dûv bêmiriniyê.

Ya ku em dikin, nirxandina rasteqîniya şehîdan e.

Rastiya şehîdan, rastiya jiyana me ye. Divê em misoger rastiya şehîdiyê veguherînin rastiya jiyanê.

Divê em fermana di şehîd de bibînin û bikaribin bimeşin.

Divê em fermaniya şehît fêmbikin û ya pêwîst bi cih bînin. Bi taybet divê em feraseta jiyana şehîd misoger temsîl bikin.

Divê misoger em rewşeke rûreş û ketî ya weke pêwîst bersivnedayîna bîranîna şehîdan ji xwe re qebûl nekin. Divê em hêz, azwerî, berxwedan û êşa şêhîd misoger di kesayeta xwe de bidin jiyîn. Misoger divê em bibin pira di navbera şehîd û jiyanê. Divê em ferxa di navbera jiyana şehîd û mirina zindiyan de bibînin. Di nava rastiya gelekî de ku xwedî jiyana bêşeref zêde û serdestiya kesên bi bermahiyên jiyanê ve zeliqîne de, divê em ev meşaleyên jiyanê nedin tefîn.

Ez li ser para xwe ji bo ez vê meşaleyê nedim tefîn, min xwast ez gelekî xurt bim. Ez hişyarbûm ku girêdana wan a bi jiyanê re rast binirxînim. Bi nêzkirina jiyana zindiyan a ji şehadetê re û bi vî awayî nêzkirina şêhîdan a ji jiyanê re û ya zindiyan ji şêhîdan re min xwast ez rola pirekê bilêyîzim. Ji ber ku weke din negengaz e ku mirov bersiv bide. Li gel zanîna wateya mezin a jiyana şehîd, bi zanîna pêdîvîdariya hostetiya mezin a veguhertina hêza jiyanê û bi zanîna pêdîvîdariya sebra mezin û hêza berxwedanê, min berpirsyariya vê hîskir û min xwe li rola pirbûyînê pêça. Me xwast em rê nedin, kesên xwedî jiyana xaflet û xwedî jiyana sextekar. Ji aliyê din ve me şehîd kir teorîze kir û me veguherand teoriya şer. Me hêz raber kir ku em wisa

bandorkar û serdest bikin. Bi qandî ku me pêşiya jiyana sexte girt, me xwast em careke din teoriya şehadetê û jiyanê careke din zindî bikin, bigihînin hev û bibin çare. Pêşveçûn çêbûn, şehîd hate jiyanîkirin û hindekî jiyan li gor şehîdan çêbû.

Hîna çiqasiya rêzdariya we binîqaş e. Em dixwazin rêzê berdewamî bikin. Belkî bi qandî tê xwastin çênebû, lê nehate hiştin ku bêrêziyeke mezin çêbibe. Niha kesên amade ne di riya şehadetê de bimeşin, peyitîna vê yekê ye. Me ev gel jî li ser vê bingehê girt. Bi gotina, "hun nikarin bi xafilî û xayinî bijîn" ve me girêdaniya bi şehîdan ve raber kir.

Di dîroka PKK ê de li ser şehîdan gelek nirxandin hatin kirin. Min xwast bi taybet ji bo şehîdên destpêkê nirxandinên rast bikim. Ji bîranîna rêhevalê Hakî Karer hetanî bîranînên şêhîdên qehreman ên Newrozê, min nirxandina hemûyan a rast kir. Ji bo ez vê yekê ji her şehîdî re bikim jî min xwe nedida paş, lê ji pêdîviya wê ya zêde min bawer nekir. Dema min bawer kir, min pêk anî. Jixwe kesayeteke ku xwe di çerçoveya şêhadetê de bide rûniştîn, kesayeteke ku şehîd bi wateya wê ve bizanibe, dibe kesayeteke mezin.

Hindek ji we dibêjin em mirovên şehîdan in, hun dibêjin ev şehîd şehîdên me ne. Ger hun di vê yekê de ne sexte ne, hun ji dil in, divê weke şêwaza ku me daye rûniştin hun şêwazekê bidin rûniştin. Di xwe de jiyandina şehîd, rawestîna li ber jiyana bi şehîd re nakok, rast jiyandina şehîd, girêdana bi fermana "ya tuyê rast bijî, yan tu nikarî bijî" gelekî girîng e. Ger hun wisa bin dê ji we re were gotin xwediyê şehîd an jî berdewamên wan. Ev yek wisa ye; weke din bi tu şêweyan em xwe şanaz nekin.

Dema ez zarokbûm jî mirinên wisa min xirab didîtin. Min wisa xwedî wate nedidît. Piştre jî min ev yek dît, mirin esas dibin amrazê raberkirin xizaniya zindiyan. Mirov esas ew rondikên ku ji bo miriyan dirijînin ji bo xwe dirijînin. Di yê mirî de xwe dibînin. Miriniya xwe, miriniya xwe ya di jiyanê de dibînin. An jî giryaneke wisa zêde ne fêmkar e. Wisa xwe qels hiştin û wisa xwe şipandina miriyan mijara gotinêye ku, di miriyekî de qiyametê radikin. Pêvajoyeke

wisa xwezayî wiha bi rondikan fetisandin zêde ji min re watedar nayê. Her wiha di şehadetên niha de zêde girîn nîne. Gihiştandina şehîdan a hêza wêrekî û jiyanê heye. Ev jî ji mirina xirab re dibe bersive.

Dibe bersiva me.

Wisa veguherîna tirsa mirinê ya ji wêrekiyê re nayê biçûk dîtin. Ev yek bi serê xwe serkeftinek e. Tirsa mirinê ya di gelê Kurdistanê de, rewşa jana mezin û hêsirbarînê niha veguherîna şerê wêrek, pêşveçûyîneke mezin e.

Me ev yek jî kir. Me ev yek pir bi hişyarî amade kir û niha hema her kes hindekî bêmirin hatiye kirin. Li hember mirinê pêşvexistina me ya feraseta rast, dîsa rastnirxandina me ya di navbera mirin û jiyanê de ev tirs têk bir. Wêrekiya zêde, bêmiriniya li jinê, dîsa dema mirina fizîkî pêk hat jî ev yek bi mirinî nehesibandin me derxiste holê. Bêguman ev yek jî pêşveçûyîneke nebiçûk e. Ev, ji bo Kurdistanê pêk anîna pêdîviyeke mezin e. Tirsa mirinê hatiye rakirin, di jiyanê de pêdîviya afirandina hesta bêmiriniyê hatiye pêkanîn.

Vaye ev şêhîdên mezin, hindekî bûn rêberê vê yekê. Fêmbûna vê rastiyê û rola girîng a bandorkariya vê yekê bi cih anîn. Ez ji vê yekê re dibêjim, rûxandina tirsa mirinê, zelalkirina jiyanê ya ji bandoriyen mirinî, bêtirsiya ji mirinên fizîkî yan jî bêtirsiya ji şehadetan, ji ber nirxên pîroz, di mirinê de nîşandana hebûna jiyanê û bi vê şêweyê avakirina girêdaniya mirin û jiyanê. Ev pêşveçûyîneke girîng e.

Li ser şehîdên Newrozê ku di jiyanê de temsîliya vejîna roja dikin gelekî rawestiyam. Hindek rêhevalên me yên hêja bi mirineke wisa jiyanî re ev rojên biharê bersivandin.

Me kêm zêde şehadeta rêheval Mazlum jî biwate kir. Me eşkere derxiste holê ku tişta di şehadeta rêheval Mazlum de pêk hatiye li hember radestiyeke mezin, bi taybet di ew serdema xofnakiyê de li hember tunekirina hêviya dawî raberkirina nirxa jiyana binamus û şanaz e. Rêheval Mazlum bi vê yekê raber kir ku li dij van êrîşên hovane bersiva herî rast berxwedan e. Şehadeta Mazlum xwedî vê wateyê ye.

Di nava tariyeke tirsnak de çopeke kibrîtê kirina sedema ronahiyê, li hember daxwaziya radestgirtina jiyanê ya bi

şêweyeke tirsnak wisa xwe bi fedakirinê di jiyanê de bûyîna xwedî îdia, weke îdia berdewamkirina hebûna xwe gelekî girîng bû û ev yek hate pêkanîn. Ji ber ku bi wê rewşê êdî negengaz bû ku mirov êdî jiyanê bidomîne. Çewisandineke wisa, hovaniyeke wisa hebû ku, bûyîna xwedî soza jiyaneke azad, jiyaneke binamus û şanaz encax bi çalakiyeke wisa ve gengaz bû.

Derbirandina şehadeta rêheval Mazlum a vê rastiyê gelekî girîng e û eşkere diyare ku ev yek fêm kiriye. Ew, hevalekî me yê fêmkar ê îdeolojiya me bû. Bi rastî kesayeteke semyan bû ku partiya me ji giyanê ve dinasî û di vê mijarê de xwedî hişyarî bû. Di vê wateyê de ev kesayet tam dibe PKK yek. Dibe soza jiyana PKK ê, û dibe lûtkeya wê.

Ji ber ku di wê serdemê de misoger sepandina radestiyekê heye û ev radestî wisa tenê li takekesekî nayê sepandin. Heta radestî tenê li ser PKKê nayê sepandin. Bêguman em li derve têdikoşin, tiştên ku bikin jî hene, lê radestiya li wê derê tê sepandin diyarkertir dibe. Tiştên ku li paş wê radestiyê werin, belkî diyarkertir bin. Serkeftina radestiyeke li zindana Amedê, serkeftina xiyaneta Şahîn-Yildirim, dê rê li pêşiya bi hezaran radestî vebike. Li ser serê gel kirina bela ya vê yekê, bi kêmanî dê serkeftineke bi qandî serkeftina kemalîzmê ya 1925'an bûya. Her wiha xiyanetgeran ev yek bi navê "kemalîstên ciwan" dikirin.

Dîsa ev yek hindekî di rastiya Dêrsimê de derdikeve holê. Di şexsê van hêmanên ketî de, serkeftina ku kemalîzmê di sala 1938'an de bi dest xistiye, careke din bi navê "kemalîstên ciwan" di kesayeta Dêrsimê de digihê serkeftinê. Mazlum jî rastiyeke Dêrsimê ye û ji ber ku ev yek baş dizanî helwesteke wisa ya berxwedanê raber dike. Berxwedaniya Dêrsimê di Kurdistanê de berxwedaniya dawiyê ye, çiqas li paş û kêm be jî ev yek wisa ye. Xiyanet û asîmîlasyona ku li ser wê derê hatiye sepandin, xiyanet û asîmîlasyona herî xurt e. Di rastiya bilêvkirina "kemalîstên ciwan" de ev yek heye: "Dêrsim ev e, derveyî vê yekê tu rastî nabin mijara gotinê. Di heman demê de ev gotina dawî ya ji bo Kurdistanê ye. Ev gotin jî ya me ye: hun nikarin ber

xwe bidin! Derveyî radestiyê tu tiştekî ku hun bikaribin bikin nîne.” Jixwe ev yek rojaneyî pir balkêş bikaranîne, yek bi yek bi mijûlbûna kesan re didin meşandin. Yanî ji bo encangirtinê roj diyar in.

Berxwedaniya Mazlum vaye di xalê de xwe dixe dewreyê. Ji ber ku li wê derê her tişt sernûşîv diçe, radestî pir lez bi pêş dikeve. Ya ku pêwîste were kirin şêweyeke çalakiyê ye. Ew jî bi şêweyeke çalakiyê, dîsa di rojeke watedar de, di rojeke jiyanê de, di rojeke vejînê de vê yekê pêk tîne. Bi rastî berxwedana rêheval Mazlum pêvajo paşîn bi tevahî bandor kiriye û li hember radestiyê xeta berxwedanê serdest kiriye. Em baş dizanin ku, vê berxwedanê berxwedana me jî bihêz kiriye û berxwedana çiya jî xurt kiriye. Ev yek jî niha baştir tê fêmkirin ku, him berxwedaneke netewiye û vejîn e.

Ya girîng ew e ku, em her tiştî naxin ser pişta şehîdekî yan jî weke ku her tişt wî afirandiye em xwe naxapînin. Lê ger feraseteke kûrtir pêwist be, em dikarin bibêjin ku ew feraset jî kêm zêde dê evqas xwedî bandor be. Misoger em dikarin bibêjin ku wateya şehîd ev e. Mirov dikare wateya wê kûrtir jî bike, lê kurtasiya wê ev e. Ji wê bi şûn ve êdî li dûv hev çalakî hene. Bi rastî jî ji vê dîrokê bi şûn ve Newroz gelekî jiyanî bûn. Di bûyîna rojên Newrozê yên berxwedaniyê de bandoriya berxwedaniya Mazlum misoger nayê biçûkdîtin.

Şehadeta Zekiye Alkan jî li Amedê çêdibe û girêdana wê ya bi şehadeta Mazlum re eşkere ye. Çawa Mazlum di zindanê de li hember radestiya ku li ser partiyê tê sepîn çalakî ye û şehadeta xwe ve dibe serkeftineke vê, berxwedana Zekiye Alkan jî, li ser vê bingehê li hember sepandinên ketin û bêçareyiyê ya li ser amadê û hemû Kurdistanê ji gelê Kurd re dibe çare. Bi kêmanî bi girêdana wê re, dixwaze xwe wisa bike rewşa berxwedanê. Ev hevala me, bêguman dikarîbû hemû sepandinan ji kûr ve bijî. Ji bo vê hevalê tê gotin ku xwedî nakokî bûye. Rewşa daxwaziya xwe ya çareserkirina nakokiya jinê, nakokiya di navbera azadî û ketinê de tîne ser ziman ku, ev yek gelekî girîng e. Hindekî jî kesên wisa dikarin berxwedanên wisa derbixin

holê. Em bawer nakin ku kesên bênakokî bikaribin wisa rêbertiya berxwedanên watedar bikin. Mirov dikare bibêje ku, dixwaze bibe keseke azad, lê vê yekê bisernaxe, tengezar dibe, ji bo vê hêrsdar dibe û di pêvajoyeke wisa de radibe çalakiyeke wisa pêk tîne. Ji bo me ev yek watedartir e. Jixwe kesekî rihet û ji xwe bawer nikare çalakiyeke mezin pêk bîne. Kesekî ji rewşa xwe razî, ji xwe hezkirî misoger nikare wêrekiya çalakiyeke wisa raber bike.

Şerê azadiya jinê girîng e.

Jixwe ji beriya pêkhatina vê, rabûna çalakiyeke wisa û raberkirina wêrekiya wisa ne gengaz e.

Lê tam neçûyîna çareseriyê jî divê mirov bi dilnizmî pêşwazî bike. Ji ber ku ger tam azadiyê çareser bike, wê demê dikare şerê azadiyê û çalakiya wê bi rêxistinî bike. Dê bi plan pêşbixîne. Lê dîsa jî çalakiyeke mezin e û dixwaze bibe azweriyeke mezin a azadiyê. Vê yekê jî wisa di Newrozekê de, bi xwe şewitandina mîna meşaleyekê ya li ser surên Amedê îlan dike. Dîsa xwedî wateye. Jinbûna wê fêmkar e. Ji ber ku mirov encax bi jiyîna nakokiyên wisa dikare vê wêrekiyê raber bike.

Di rastiya rêheval Mazlum de jî ev yek heye.

Ew dibe giyana partiyê, dibe giyana mezin a berxwedana partiyê. Li wê derê êdî mirovek heye, jin an jî zilambûna wî zêde girîng nîne. Di wê derê de berxwedana mirovê mezin û çalakiya wî ya mezin mijara gotinê ye. Di çalakiya Zekiye Alkan de jî jinbûna wê pêhtir girîng e. Çima?

Ji ber ku Amed bixwe, ji jina xwefiroş a herî rizyayî xirabtir rewşekê dijî. Yanî zilamtiya li wê derê, di rewşeke ji ya jinê xirabtir û ketîdir de ye. Esas ji xwefiroşekê jî xirabtir e. Ger emê misoger behsa bandoriyeke Amedê bikin, an jî ger emê bibêjin navendeke Kurdistanê ye, bi nirxandina jina xwefiroş sînorê ketinê tê xêzkirin. Di wan şertan de Amed hindekî jî di rewşeke wisa de ye. Tuyê evqas bibî navenda mêtîngeriyê, tuyê evqas bêdeng bimînî û her roj tûyê evqas werî perçiqandin û tuyê werî tecawizkirin. Ev derveyî jina xwefiroş tu wateyê naderbirîne. Encax mirov dikare ji vê aliyê ve bi dest bigre. Li hember wê misoger nerazîbûnek pêwîst e. Nerazîbûna ji şêweyê jina ketî yan jî jina xwefiroş

fêmkar e. Li gor ku Amed bi xwe wisa ye, divê mirov ji wê re jî nerazîbûneke wisa raber bike. Bi şehadetê re misoger girêdaneke wê heye.

Ji aliyê din ve weke jinekê em nakokiyên wê jî fêm dikin. Weke jinekê dîtina nakokiyê, di nava lêgerîna azadiyê tevgerbûn, tê wateya ketina rewşeke giran. Ji aliyekê ve tuyê rewşa koledariyeke ketî derbixî zanebûnê, ji aliyê din ve jî dê azweriya te ya jiyana azad bi pêş bikeve, ev tengavbûneke tirsnak bi xwe re tîne. Bi rastî jî me xwast vê yekê jî gelekî eşkere bikin. Li gor feraseta min jineke kole di şertên me yên civakî de, di şertên Amedê de veguherîna wê ya zanistiyê û rêçûyîna wê ya berbi jiyana azad, wisa di nava rewşeke nakok de dîtina cihekî xwe, misoger bi bandorkariya PKK vê gengaz e. Jixwe di demê de bandora PKKê Amed rapêçaye. Rapêçana zindanê heye, rapêçana gerîla heye û ya ciwanan heye. Ez bawerim hindekî rewşa hewlên azadiya jinê tê fêmkirin.

Vaye bandorbûna kesayeteke ku ji van hêmanan bandor bûye mijara gotinê ye. Hindek dudiliyên wê hene, xwedî daxwaziya şêweyên din ên tekoşînê ye û dikare bike jî. Lê ew vê şêweyê tercîh dike. Çalakiyeke li gor xwe biplan, li gor xwe watedar e.

Ev berxwedan, dibe nerazîbûna li dij sepandinên li ser zindana Amedê, sepandinên li ser gelê amadê û dibe nerazîbûna li dij neyîniyên mezin ên jinekê. Ev nerazîbûn jî, dibe watedarkirina jiyanê û dibe gotina, “ez encax wisa dikarin jiyanê watedar bikim.” Çalakî pêk tê. Wateya ku em bidin vê jî ev e. Em qanehin ku ev çalakî jî di vê çerçoveyê de pêk hatiye û xwedî wateyeke mezin e. Wer wiha eşkere diyar dibe ku ji ve û şûnve pêşveçûyînên Amedê cewaztir in, û pêşveçuyînên di gel de jî û di jinê de jî hindekî berbi azadiyê ve dibe.

Berxwedaneke din.

Di keleha Îzmirê de bûyereke xwe şewitandinê heye.

Bi navê Rehşan Demirel berxwedana keçeke Kurd a ciwan heye. Niha li wê derê rastiyeke Mêrdînê ya Kurdistanê heye. Welatperwerî jixwe xwedî bandor e. Di ev

keça ciwan de jî ji aliyekê ve azweriya şer û azadiyê heye, lê ji aliyê din vê jî bi xwe gelekî lewaz e.

Şerê rêxistinî rastiyê bandor bike.

Rojên Newrozî jî lez û tijî tên jiyîn. Diyare ku, di vê derê de dixwaze şerekî azadiyê yê hewlnak bide û dixwaze hindek tiştan bike. Lê ji ber ku nikare zêde hêza vê ya teorîk peyda bike û nikare asta pêşveçûneke pratîkî bigre, yanî ji ber ku di cihekî de azweriya wê asta teorîk û rêxistiniyê derbas dike û ji ber rexmî vê yekê dixwaze hindek tiştan bike dikeve nava çalakiyeke cewaz. Şertên şermende yên ku girseya me ya wir dijî, şertên jiyana ketî yên ku bi feraseta wê ya azadî û jiyana azad ve nabe yek, dema bi balkêşî û vejîngeriya Newrozê re dibe yek çalakiyeke wisa ya meşaleyê derdikeve holê.

Gengaz e, di giyaneke wisa de wêrekî û piştre çalakiyeke wisa derbikeve holê û derdikeve jî. Me gotibû ku em vê çalakiyê watedar dibînin. Tê dîtin ku, vê şehadetê girseya me ye metropolan ronî kiriye, di biserxweve hatin û vegerîna welat a girse de rola vejînker û pirekê lêyîstiye û ji ber ku roleke vejînker û pira daborîna welat lêyîstiye, ji şertên jiyana ketî bi sedan kes kişandine şerkirinê û gora ku li wan hatiye sepandin veçirandiye. Peyamê di vê wateyê de bi nirxa meşaleyekê xwe peyitandiye. Ez dibêjim hêza fermandariyê peyitandiye. Ji ber ku dema bi sedan kesan bikaribe bide meşandin wê demê ev dibe rola fermandarekî. Bi taybet di aliyê jinê de rê li ber vekirina tevlîbûna bi sedan kesan, rê li ber vekirina tevlîbûnên jinê yên zêdetirî zilam, diyar dike ku ew xwedî piştgiriyeke mezin a azadiya jinê û xwedî hêza fermandariya vê artêşê.

Hindek nameyên ku şehîdên me yên Newrozê yên Ewrûpa hêlane hene. Divê mirov hindek li ser van raweste. Rêhevalên Berîvan (Nilgûn Yildirim) û Ronahî (Bedriye Taş), ev keçên Kurdistanê nameyên watedar hêlane. Ez rastî hindek hevpeyvînên wan jî bibûm. Ez bawerim dîsa gelek name, nirxandin û rAporên wan jî hene. Hindek min jî dîtin.

Ji aliyê baş naskirina van kesan ve, divê mirov li nameyên wan bi xwe nivîsandine û îmzekirine temaşe bike.

Nameyeke wan wisa ye:

“dewleta elmanan di ev mehên dawiyê de dijmingeriya pir vekirî îlan kiriye. Komelên me hatine girtin, rengên me yên netewî, alên me yên neteweyî hatine desteserkirin, bi dehan welatperwerên me hatine girtin û binçavkirin. Bi firikandina destên xwe ve planên Demîrel-Çiller-Gureş ên bi gotinên an dê biqedin an dê biqedin piştgirî dikin, ji bo berdewamkirina şerê qirêj û îmhakirina gelê Kurd bi her şêweyê piştgiriyê dikin. Tevkujiyên li Kurdistanê diqewimin bi çekên Almanan ve pêk tên. Herî dawiyê di Newroza 1994’an de pêkanîna ku bi Hîtleriyane li ser gelê Kurd hatin pêkanîn, ji bo me bûne dilopên dawî yên ku di ser berdaxê re rijiyan e.

“Di hovaniya pêkhatina li Cizîrê, Şirnexê û Amedê de, berpirsyariyeke mezin a dewleta Almanan heye. Dewleta Almanan bi ev kirdariyên xwe ve bûye xwedî tawaneke mirovî û divê misoger hesabê vê yekê bide. Di zindanên Amedê de bi sê çopên kibrîtê Mazlum Doganê ku riya gavavêtinê li pêşiya gelê Kurd vekir, bi şewitandina bedenên xwe ve Ferhatên ku bûn xwedî piştgiriyeke watedar, Zekiye Alkanên ku gotin, Newroz, bi pêxistina agirê Newrozê ve tê pîrozkirin û di surên Amedê de bedena xwe da agir, weke endamên tekoşîna azadiyê em wan bi rêz û minet bi bîr tînin. Em dibînin ku ala ji wan hatiye girtin dê di demeke nêz de li bircan were raçikandin. Em bi vîna xwe di riya necmiyên ku digotin “agir netevînin” de dimeşin. Bersiva herî mezin a ji emperyalîzm û mêtîngeriyê re, bi agirê bedanan ve tê dayîn.

Duh êvarê gotinên wezîrê karê hundir manfred kanther ên weke “ji vê û pê ve li hember PKKê dê helwesta me gelekî tund be. Divê PKKyî vê yekê bizanibin ku, êdî li her cihî nikarin serbest tevbigerin.” Em gaveke din nêzî biryara xwe kirin. Em dizanin û bawer dikin ku, agirê azadiyê yê ku me pêxistiye, dê bibe sedema pêketinên agirên mezintir. Bedenên me û ramanên me bila diyariya gelê Kurd û hemû mirovahiyê bin.

“Bila silav be ji yên di tekoşîna azadiyê de ketine axê.

“Bila silav be ji tekoşêrên Kurdistana serbixwe û yekgirtî re!

“Silav ji Serok Apo re !

“Bila bimre mêtîngerî û emperyalîzm!

“Bila bimre şoveniya Alman!

“Bijî PKK, ARGK, ERNK!

“Bijî rêberê netewî Serok Apo!

Nameyeke din jî wiha ye:

“Dema ku em ji dil Newroza we pîroz dikin, ji bo jîneke mirovî ya ku armanca me ye, weke pêwîstiya berxwedaniya we û weke ku serokatiya partiyê diyar dike, kêm be jî em ji xwe de destpêdikin û dixwazin vê yekê dewrî we bikin.”

“Weke ku Serokatiya partiyê destnîşan dike, bi taybet gelê me yê Ewrûpa derbaskirina şoreşê ya li Kurdistanê xwedî girîngiyeke jêneger e. Li ser vê bingehê ji ber ku pêywirên wisa mezin li ser milên jinên me jî dikevin, divê tam xwe ji piyan bigrin û rênîşandêriya serokatiya partiyê ve vê yekê bi ser bixin. Em ji dil, ji we û ji gelê xwe rûmet bawer dikin û baweriya me bêdawî ye.”

“Bijî serokê me Apo!

“Bijî PKK, ARGK, ERNK!

“Bijî enternasyonalîzm!

Van hevalên nameyên xwedî wateyên girîng hiştin e. Bi rastî jî negengaz e ku mirov rêzeke mezin jê re raber neke. Tê fêmkirin ku, gelekî zana û bi nirxandinên têr ve jiyane. Çalakiyên xwe jî wisa plan dikin ku, bi qandî ku rê li pêşiya binketinê veneke bihêz, bêyî xwe wendakirin û xwedî pêşdîtina encamên çalakiyê encax wisa dibe. Wisa plankirina xwe şewitandinê, ji bo ji holê rakirina dibêtiya binkeftinê, hilnebijartina qadeke ku tu kes were agir bitefîne, nîşan dide ku ew çiqas planger û encamgir in.

Di raporên din ên van hevalan de jî min hindek tişt dîtin. Hevokeke wan a di hevpeyvînekê de jî hîna di bîra min de ye. Wisa diyar dibe ku ji van dahurînan jî gelekî bandor bûne. Weke ku xwedî hewlên bibin milîtanên ku em diyar dikin, di nava şaşwaziya bi layiqî nedana bersiva vê yekê de ne. Yanî yek ji taybetmendiyên ev hevalên me jî, nesextebûn, rexmî ew şertên Ewrûpa ku gelekî xwediyê destdayînên ketinêye, wisa xwe ji piyan girtin û bi vê re raberkirina hewla milîtaniya xwedî hêz e. Ev helwest bi rastî jî di asta mînak de ye. Ya ku min di raporekê de dîtiye

hindekî jî ev bû. Min di gelek raporên hevalên şehîd de jî tiştên wisa dîtine. Esas dihate fêmkirin ku ev jî rêhevalên di vê wergiriyê de bûn. Di vê derê de ya girîng, xwerûtî, cewheriyet û bi van aliyan ve derfet nedana ji sextetiyê re ye. Van kesan jî divê misoger mirov bi vê wateyê bizanibe.

Niha dema ku em dibêjin, ew çûn şehadetê hun man, divê mirov vê yekê destnîşan bike: ger tuyê bijî, divê tu weke wan bijî. Girêdana bi bîranînan ve hindekî jî wisa dibe. Esas nêzî milîtaniya herî nêz in. Lêgerînên wan roj bi roj wisa ye. Ciwankeçiya wan, nifşiya wan duyem heta ya sêyam li Ewrûpayê, (ku em dizanin ev çiqas ketînêr e) vê yekê asteng nake.

Di çend şehîdên ên li Ewrûpayê mezin bûne de min ev yek dît. Him di hevalê me yê Firat de, him jî di hevalê Husên Çelebî de min ev yek dît. Ev ji nifşa duyem in, pêhtir di wan şertan de gihayane. Kesayetên wan gelekî balkêş in, bi qandî balkêşiyê, kesayetên wan qet ji welatperweriyê û ji feraseta peywirê dûr neketiye, heta bi qandî ku kesên ji herêmê li paş xwe bihêlin şervaniya wan mijara gotinê ye. Yanî ez hindekî dihizirim ku, kesên bixwazin bibin milîtanên PKKê divê wisa bin.

Ev hevalên me jî wisa, li ser vê bingehê xwedî pêşveketin in û pêşveçûna wan di vî milî de diyar dibe. Fêmkirina asta wan a zanebûnê dibe ku ji me re sudwer be. Bêguman ev namê vê yekê eşkere derdixin holê. Nirxandinên siyasî yên bihêz encax wisa tên kirin. Ji vê zêdetir danasîna rastiyan negengaz e. Xwedî nirxandinên siyasî yên rast in. Yek jî baş dizanin ji dijmin re bibin bersiv. Yanî xwe bi nirxandinên siyasî re bes nabînin. Bersiveke yeman didin wezirê karê hundir ku berdevkê emperyalîzma Almanyayê ye. Wezirê Alman dibêje, "dê PKK ji vê tundtir rastî helwestan were." Ew jî dibêjin, "bi vê biryara xwe ve emê bersivê bidin." Yanî li hember sepandinên dijmin di hişyariya sepandinên milîtanan de ne.

Bêguman Ewrûpa qada wan e. Lê xweseriya Ewrûpa jî piştçav nakin. Yek jî di vê xweseriyê de banga ji gel re heye. Bêguman ev yek jî nirxa şehadeta wan qat bi qat zêde dike. Esas ew şehîdên dîrok û mirovahiyê ne. Misoger banga

enternasyonalîzmê heye. Bi qandî dij-mêtîngeriyê û dij-emperyalîzmê banga wan a ji mirovahiyê re û li ser vê bingehê silavên wan a ji şehîdan re heye. Him kûrahiya têgihiştinê, him bersivdayîn, him welatperwerî û him jî girêdana bi mirovahiyê re misoger e.

Em hindekî jî bi aliyê jinê ve li ser sekinandinê pêwîst dibînin. Ji ber ku çend nirxandinên balkêş ên di hevpeyvînan de hîna bîra min de ne. Diyar dikin ku, nîjadperestî, paşverûtî, li ser serokatiyê xwedî nirxandinên balkêş in û vê serokatiyê weke kosteka ling dibînin. Bi teşeyê ku ev yek paşverûtî ye bersivdayîn heye. Tê fêmkirin ku nêzîkatiya me ya jinê weke azweriya azadiyê dinirxînin. Dîsa di derbarê zayendiyê de xwedî nirxandinên balkêş in. Giraniya qada nakokiyan dibînin. Wisa weke qadeke pir tekoşînêr dibînin. Ez bawerim di mijara kolekirina zayendiyê de jî xwedî feraset û nêzîkatiyên dagirtî ne.

Yanî ferasetên serokatiyê, feraseta azadiya jinê û ferasetên tekoşîna zayendîtiyê re gelekî kûr in. Wisa welatperwerên ketûber ên xwe fedakirinê nînin. Bi qandî Zanistiyeke ku milîtanekî herî jîr jî negihiştiye, azweriya azadiyê û felsefeyê, xwedîbûna xwe ya jiyana pratîkî jî raber dikin.

Di vê wateyê de feraseta serokatî ya rast ku em dixwazin di rastiya partiyê xwe de zelal bikin, bi van şehadetan dibe wateyekê diderbirîne. Jiyaneke ne ji bo hestên erzan ên pêwîst, jiyanîkirina azweriya azadiyê ye. Ev yek pir bihêz tê îfadekirin. A girîng ne ketîna zayenditî nîne. Tê gotin, divê ku em tekoşîna bi zayendîtiyê re, ketîbûna wê derê û şerê wir bibînin. A ku em dixwazin hindekî vebikin jî ev e. Ev rêheval vê yekê wisa baş dinirxînin, di wateyeke wisa de, li gor wê wateyê bi çalakiyeke mezin bersiv didin ku, nirxên wan qatekî din zêde dibe. Tuyê bibêjî, şervaniya azadiya jinê ya mezin û tuyê vê yekê di vê ferasetê de bibînî. Yan jî em dizanin ku ka çiqas milîtanên me yên xwedî gotinên erzan û kupên gazindan hene. Li ser vê bingehê ez wan vedixwînim ku li hember bîranîna van hevalan rêzdar bin. Dîsa gelek zilamên ji jinan xirabtir hene. Kesên ku zayenditiyê bi

şêweyê herî kirêt şîrove dikin hene. Em hêvî dikin ku ew jî ji van hevokan feraseta rast bidest bixin.

Ger emê bi şehîdan ve girêdayî bin, divê em van kesayetan rast dahûrînin û kesayetên hatine dahurandin jî divê em rast fêm bikin. Weke din mezinbûna wan nayê fêmkirin. Weke din hun nikarin ji xwe re bibêjin jin an jî mêrên egît.

Di encamê de min jî hindek nirxandin kirin. Hindek nirxandinên min jî di derbarê azadiya jinê de hene. Bi taybet ev rêheval ji van nirxandinan gelekî bandor bûne. Yan jî ev di kesayetên xwe de dahurandin e. Ji vî alî ve min jî pêwendîdar dike. Di cihekî de bûn rêberên tevgera azadiya jinê.

Wisa di nava azweriya rojane ya lêgerîna azadiyê de, di zayenditiyê de gihiştina dahûrîneke rast, li ser vê bingehê darezandina paşverûtiyê, ew mijarin ku, di van salên dawiyê de em jî gelekî bi dûv ketine û dixwazin encam bigrin. Di van mijaran de nêzîkatiya herî bandorkar, a herî maqul û rast tê wateya raberkirina helwesta herî rast. Ev şehîdên wê ne, ev milîtanên wê yên azadiya jinê ne. Ji vî alî ve ez dihizirim ku nirxa wan gelekî mezin e. Divê misoger mirov mafê wan bide.

Ev ne ew hevalin ku jiyanê fêm nekin, ev ew rêhevalin ku jiyanê pir baş fêmdikin. Di biharên jiyana xwe de wisa bi jiyaneke zivîn ve rû bi rû ne. Vekirî ye! Nirxandinên wan li pêşiya we ne. Temenên wan jî gelekî ciwan e. Tê zanîn ku, li Ewrûpayê her roj û her demjimêr bi her şêweyê jiyanê re rû bi rû ne. Rexmî vê yekê li Ewrûpa pêkanîna çalakiyeke wisa, bi rastî jî xwedî nirxeke wisa ye ku ez jî nikarin bi peyvan vê yekê rave bikim.

Di mezinahiya PKKê de dîtina van zêde zehmet nîne. PKK wisa xwedî bi hezaran şehîd e. Gelekî baş dizanim, ji bo radest nebin, di nav kesên ku jiyana xwe dayîne de, keçên ciwan sereke ne. Xwedî bûyereke wisa ya berxwedanê ne. Jixwe di şehîdên Newrozê de jî bi giranî ew in. Dîsa weke vê yekê, di şertên herî giran de li hember radestiyê berxwedana bi hezaran kesan heye. Lê wisa em li ya herî balkêş û ya bi zanebûn û plan di kesayetên van hevalan de rast tên.

Bêguman encamên ku pêwîste mirov jê derbixe hene.

Li ser wateya pêkhatina di azadiya PKKê de encamên ku pêwîst dike mirov derbixe hene.

Pêwîstiyên girêdana bi bîranîna van hevalan ve çi ne? Ev çawa bi cih tên? Peyamên di derbarê vê yekê de gelekî balkêş e, bangên wan gelekî xwedî wate ne. Zanebûna wan a mezin di derbarê jiyanê de, weke min gotiye têgihiştina wan a kûrahiya dahûrînan, me dibe vê ecamê, "di PKKê de dahurînan hetanî dawiyê navxweyî bike, azweriya azadiyê esas bigre, di zayenditiyê de jî rastiyê bigre, zayendîtiyê weke desthilatdarî yan jî amrazê kolekirinê nebîne, rêzdar be, li hember serokatiyên paşverû û taybetmendiyên serokatiyan hetanî dawiyê berxwe bide, li dijber emperyalîzmê, mêtingeriyê û hemû teşeyên îtîfaqên wan, di serdemên ku dibêjin em xwedî hêz in de û di serdema wan a herî êrîşkar de, çalakiya herî hêzdar raber bike!"

Ev hemû bangewaziyên mezin in û dayîna mafên wan, dikeve ser milên rêhevalên me yên mane. Li gor wateya wê ya xwezayî, bi şerkirin û li gor wateya wê bi zanîna milîtaniyê ve bersivandin, riya yekane û ya herî rast e. Gotinên weke, "min fêm nekir, bi kûrahî ez têgihiştim, li gor xwe pêk tînim" li hember şehîdan bêrêzî ye, ji şehîdên Newrozê re xirabî ye. Weke ku mafê me tu kesî ji vê yekê re nîne, ger bi rastî em dûvgirên wan in, ger bi rastî di bin vê xemê de emê bibin şervanên azadiyê yên girêdayî bi bîranîna şehîdan ve, wê demê jiyaneke li gor wê û şerekî li gor wê şert e.

Ger we ev di xwe de ev hêz dît û hun we bi vê hêzê ve şer kir hun layiqî van hevalan in. Wê demê tê wateyê ku we di bin fermandariya wan de hindek tişt girtine, bi rastî hun wan didin jiyîn, li gor girêdaniya bi bîranîna wan re hun didin jiyandin, hun wan bi jiyanê re dikin yek didin jiyîn, hun wan bi serkeftina şer re didin jiyîn. Wê demê hun dikarin bibêjin, "bila dilê me xweş be." Bi qandî wisa xwedîderketina li şehîdan, derfeta serkeftina peywiran bidest xistin jî sotîner e.

Ez jî gor para xwe, bêguman di rewşê de me ku bikaribim nirxa van şehîdan bizanibim.

Pêkanînên serokatiyê hene, bi qandî ku fêrbûye û dibêje, piştî şehadeta van hevalan tê xwastin bi hêzdarî tekoşînê hebûnê tê dayîn. Tê zanîn ku em wisa bi hebûneke ketûber bersiva hebûnê nadin. Bi taybet wisa bi şêweyên balkêş derketina holê ya şehadetên jinan, bi nêzîkatiya me ya ji jinê re ji nêz ve pêwnedîdar e. Ev şehît wisa weke ku hun dihizirin, ji ber xwe ve derneketine holê yan jî ji bo layiqiya we derneketine holê. Bi dahurînan ve min hindek girêdanan wan çêkir. Pêwendiya nêzîkatiya me ya jinê re û van şehadetan misoger e.

Ez dikarim hîna jî vebikim.

Di navbera ev dahurînên azadiyê de û jiyana van şehîdan de girêdaneke çawa heye?

Ger hun hindekî dahurandinan bixwînin û li ser biponijin hunê vê girêdanê bibînin. Kesayeta mezin çawa pêk tê? Niha hindekî pêk hatiye. Weke ku wan jî diyar kiriye, dê ev di dema pêş de bibe pêkanîna mezin.

Dibêjin, "agirê azadiyê dê hîna bibe sedema agirên mezin." Dahûrînan rê li pêşiya van vekir, dê ew jî rê li pêşiya jiyanên mezin vebikin. Jixwe wê yekê dibêjin.

Hun dixwazin bi şehîdan ve girêdayî bin, bêguman hunê bixwazin li hember wan rêzdarbin. Lê ger ev bi teşeyê bandorkariyeke kûr ve nebe û veneguhere hêzeke jiyanî, dê bibe bîranîneke durû yan jî wisa pir çavşil, dê bibe biranîneke weke ew çavşiliyên ser miriyên berê ku, ev yek lê nayê û ji şehîdan re heqaret e. Esas ew jî xwedî wateyekê ye. Diyare ku, tam heqdar kirin, encax bi pêşvexistina rastiya me ya şer a li dij emperyalîstan, mêtîngeran û hevkaran ve gengaz e. Ev yek di heman demê de azadiya jinê û nêzîkatiya azad a zilam jixwe re pêwîst dike. Tenê bi aliyekî nîne. Bi yek şêweyî nîne. Tê wateya bidestxistina kûrahiya vê mijarê. Li gor min ev yek misoger e. Yanî em emê bi mezinahî bibersivînin, divê em êdî bi vê yekê nelêyîzin. Divê keç, nêzîkatiyên jin-zilam bi vê yekê nelêyîzin. Ger hun bibêjin em bilêyîzin dê çi bibe, hunê werin lenetkirin. Him hunê bibêjin em bi van nirxan ve girêdayî ne, him jî hunê di bin meşaleya wan de karên kirêt bikin, hunê di nava têkîliyên nakok ên bi azadiyê, milîtaniyê û şer de bin! Ev

yek heqaret e û nayê qebûlkirin. Divê em vê encamê derbixin.

Wan jî hestên herî pîroz dizanîn; wan ji azweriya azadiya serokatiyê dizanîn. Bersiv hindekî wisa ye, ne weke ya we ye. Ew jiyanê fêm dikin, ev der gelekî girîng e. Piştî ku evqas zayenditî jî şîrovekirin ma nizanin? Ji bo we ev yek tê wateyê? Divê mirov ev hêmanên bingehîn jî bi rastiya şer re girêdayî binirxîne. Ev yek di heman demê de tê wateya peywirên mezin ên pêşiya we û ev misoger wisa ye.

Ji ber ku em van nikarin weke nebûyî binirxînin. Ew şehîdên mezin in, wan çalakiyeke biplan û encamgir pêk aniye. Wateya wê wisa ye, banga van şehadetan wisa zelal e. Ji ber ku ew şehîdên partiya me ne. Her tim dibêjin, “bijî PKK, ARGK, ERNK!” ger ev nav bi şehîdan ve dijîn, divê em li van nirxan xwedî derbikevin.

Wan misoger xwe radestî vir wir, paşverûtiya malbatê, emperyalîzmê û jiyana ketî nekirin. Bêeman şer kirin û xwe derxistin holê.

Xweziya niha ji destên me hatiba me karîbûya ev jiyan hindekî vekirana û bikirana gelerî û dîrokî. Esas ev yek li ser milên me ye. Wan çalakiyeke piçûk nekirin. Bi rastî jî çalakiya wan gelekî zehmet bû û gelekî semyan bû. Ji ew gerîlageriya we çiyan û şerwaniya we bi hezaran car gerîla xwedî dikin. Ji ber ku hîna bêyî ku heftiyek didu bi ser şehadeta wan re derbas bibe, bi dehezaran jinan meşeke herî azad li dar xistin. Dîsa li Ewrûpayê bi sedhezaran mirovê me ji dil ve bi welat re dan girêdan. Alîkariyên xwe yên madî û manevî zêde kirin. Em bibêjin ma kîjan gerîlayî rê li ber vê yekê vekir? Her wiha ev yek dê her sal pêhtir bidome. Tê wê wateyê ku ev wisa çalakiyeke ji rêzê nîne. Dema em çawaniya çalakiyeke gerîla ya rê li ber vekirina evqas wendahiyan bi ber çav bînin, dema em çawaniya dayîna girtin û bêbandorhiştina evqas rêxistinger û alîgiran bi ber çav bînin, emê eşkere bibînin ku çalakiya herî diyarker, herî encamgir û ya ku her dem xwe biafrîne ev e.

Wan ev yek pêk anîn.

Encama ku pêwîste ji vê yekê derxistin, nabe ku divê her kes wisa bike. Na, hindek kes ji sedsalan, ji hezarsalan

carekê vê çalakiyê dikin. Ew jî wisa derbasî dîrokê dibin û ev şeref ji wan re dimîne. Çalakiyek di surên Amedê de, yek li Kadifekaleya Îzmirê de û yek jî di keleha Almanyayê de bû. Erê, ev kelehên dîroka me, çarenûsa me ne. Amed, cihê daxwaziya encamgirtina îmhaya netewa me ye. Metrepola rojavayê Tirkiyê, Stenbol û Îzmir jî dîsa wisa ne. Kêmanî bi qandî ya li Kurdistanê, cihekî ku tê xwastin ji girseya me re bikin gor. Ewrûpa jî û Almanya jî ew cih in ku, dixwazin Kurdan xirabtir bikin gorê û bi şêweyê “qediya” îlan bikin. Di ev kelehên mezin ên zilmê û îmhayê de dibe ku wisa pêwîstî bi çend çalakiyan hebe. Ji van cihên wisa re ev serdaniyê dikin û van çalakiyên mezin pêk tînin. Êdî kirina kesên din dibe karîkatûr û pêwîst jî nake.

Di cihên cewaz de çalakiyên dîtir dibin. Vaye em dibêjin çalakgeriya gerîla. Rêxistinî be, bi dehan serhildanan pêk bîne. Bibe milîtanê vê, bibe şehîdê vê! Bi sedan qadên gerîla hene, artêşa gerîla damezrîne, çalakiya xwe pêk bîne, bibe şehîdê wê! Encama ku tu derbixînî ev e.

Ji bo mirov bibe şehîdêkî mezin ê gerîla, mirov neçare ku artêşa gerîla bi pêş bixîne û şerê gerîla hindekî din jî hilperîne.

Me di şehadeta rêheval Mahsum Korkmaz de jî heman tişt gotin. Me got kesayeta di gerîla de xwedî israr û bersiva herî rast a ku jê re were dayîn, di çiyayên Kurdistanê de bi asta yekîneyan gerandina gerîla ye. Ji vê wêdetir bi bîranîna gerîla ve girêdan nabe. Lewra me xwast em hindekî vê yekê bipeyîtînin. Dîsa ger dê pêwîstî bi şêhîdên wisa hebe, ger ew jî di riya şerê bilind de bimeşin, dikarin layiqî vê bibin. Ger şer bigihînin ber lûtkeyekê yan jî bikaribin rê li ber wê vebikin, şehadeta wan dibe xwedî wateyekê. Tevgera me ji şehîdên wisa re vekiriye.

Lê ev yek wisa bi hêsanî pêk nayê. Wateya şehîdên wisa pîroz e. Mirov ne wan wisa bi tengavî, ne bi nepixandinî, ne bi spartina siyên wan û ne jî wan bi piştçavkirinî pêşwazî bike. Di çerçoveyê de bîranîna şehîdan, rastjiyanîkirina wan û di bin fermandariya wan de beşdarbûna şer, şêweyê herî rast a bîranînê ye.

Min çalakiya xwe jî, bi beşeke mezin weke çalakgeriya girêdana bi rastiya şehîdan ve nirxand. Ew jî me xurt dikin. Lê çalakgeriya me ku me bi pêş xist jî misoger raber dike ku em di riya wan de dimeşin. Ev meşeke gelekî zehmet e û tekoşîneke bêeman e. Puxteya tekoşîna me vê yekê pêk tîne. Em jî bi rêzdarî pêşwazî dikin. Hetanî niha yê ku kiriyê jî û ya ku hatiye kirin jî, em bi şêweyê bêeman û ku hindekî serkeftin bi dest xistiye bi pêş ve bibin û dîrokê de û di rastiya jiyana xwe misoger bi cih bikin.

Li ser vê bingehê, wan tenê di rojekê de ne, her dem di jiyana xwe û tekoşîna xwe de bi bîrbînin û bidin jiyîn.

Bi erênî yan jî neyînî jineke ku li ser tevgera jina azad bandor bûye jî dayika min e. Niha ji bo vê jinê de bi çend hevokan pêşvexistina nirxandinekê sudwer e.

Di nirxandinên zivistana 1994'an de, li ser rastiya dayikê min hindek nirxandin kirin. Li Kurdistanê rastiyeke ku pêwîste em li ser rawestin jî rastiya dayikê ye.

Dayiktî bi giştî îfadeya zayînê ye.

Di nava me de wateya herî erzan a dayikê wisa ye, "gelek zarokan tîne û neslê xwe dide domandin." Ez ji serî ve li hember vê yekê derketim. Mirov dikare bibêje ku, bersiva herî tund min da dayîka xwe. Wê weke dayikekê, hemû mafên li ser min ên li malê bi anîna min a cîhanê ve girê dida. Min jî digot, "ma tu vê mirîşkê û çêlikan dibînî? Ger ew mirîş ji bo çêlikan çiqas dayik e, tu jî ji bo min ewqas dayik î."

Ev şipandineke pir stûr bû. Lê me ev yek kir. Heta min nêzîkatiyeke wisa raber dikir û min digot ku, " ger dê zarokê min weke yên te bin, bila qet nebin." Çima? Ji ber ku ew dayikeke ji rêzê û ez jî zarokekî ketûber bûm.

Ev nakokiyek e.

Zarok weke ku dixwaze nikare bijî, dayik jî dixwaze bi zarok re xwe bidomîne. Ev nakokiyek e.

Dema me niha behsa şehîdan dikir, min diyar kir ku gelekî xwedî pîvan, zanebûn û plan in. Dayika Ûweyş jî ewqas bêzanebûn û ewqas bêplan.

Lê li gor xwe dayikeke serhildanê ye.

Mirov dikare bibêje ku, bi rastî jî di heman demê de jineke tam neketiye bin bandora zilam. Bêguman têkîliyên wê yên bi min re tên bîra min. Çi dixwaze? Esas bawer nakim ku bi xwe jî çi dixwaze.

Dihizire, “dê kurê min bibe fermanberek, dê hindekî pereyan qezenç bike, dê ji min çend mîtro paç bikire, çend cilan bikire.” Ev wisa daxwazên zêde xwedî naverok nînin. Tişta ku ji ewladiya bixêr behs dike, hindekî razîbûna ji rewşa wê û bi madî û manevî ji wê re dayîna bersivê ye. Ez wisa dihizirim ku gelek zarok jî, di vê wateyê de bersiv didin. Hewl didin ku bibin kur an jî keça baş a dayîka xwe. Li gor qaneha min rewşa rastiya we jî bi giranî wisa ye.

Niha dijbertiya her tiştî di vê derê de destpêkir. Ev dibe cihewazî yan jî talih an jî bêtalihiyeke zarokekî, hun çi dibêjin nizanim, lê me ev yek naskir. Li gor xwe min zûtirîn li hember dayikê şerekî wisa da.

Ma mirov li dij dayîka xwe şer dike?

Me kir. Bi rastî jî gelekî sosret e, hun hîna hemû jî dibînin. Zarokên ku gelekî dayik jê hezdike, dayika ku gelekî zarok jê hezdikin. Ez dihizirim ku ez gelekî kêm ketim van rewşan an jî min nedît.

Me xwast em wisa bin. Ma tawan bû? Rastiyê çi ji min re got?

Ya rast a we ye yan jî ya min e? Hêjayê li ser rawestînê ye. Çima di temenên biçuk de tekoşîneke wisa za? Min ew jî di çend nirxandinan de vegotibû. Bêguman li vê derê em nikarin rabin û ji serdema zaroktiyê ve teoriyan derbixin. Lê psîkolog diyar dikin, teşegirtina zaroktiya li ser hemû pêşveçûyînên din xwedî bandor e. Em jî ji vê yekê ewle ne. Ev rastiyeke zanistî ye. Ger tekoşîngeriya wê demê nebe, dê tekoşîngeriya serdemên paş jî nebe.

Gelo ma ez pir hişmend bûm an jî biryar gelekî cewaz bû ku, ev tekoşîngerî sepand? Ev jî mijareke cuda ye. Li vê derê pêwîst nake em behsa rewşên awarte û taybet bikin. Ev rewşeke jiyanî ya di têkîliya dayik û zarok de ye. Lê pêvajoya ku me daye destpêkirin, hindekî jî dibe pêvajoya eşkerekirina vê nakokiyê ye. Di wan temenan de ew tê wê wateyê. Em dayîn û standina hesaban ji zû ve destpê dikin.

Ew xwedî feraseteke desthilatdariyê ye, bandorkariya wê heye, dê hindek kevneşopiyên malbatê serdest bike. Ez xwedî hindek daxwazên azadiyê me, ezê jî wan bisepînim. Kevneşopiyên malbatê çine? Ew çi fêm dike ew in. Tişta ku ez weke azadiyê fêm dikim çine? Tişta ku canê min bixwaze ew e. Desthilatdariyeke pir seretayî û li hember wê şerê azadiyê ya bi pêşdikeve.

Li vê derê xala herî girîng, ez bawerim nebandorkariya bavê ye. Mirov dikare li ser vê yekê baldar be. Otorîteyeke bavê ya xwedî hêz misoger dê rewşê cuda bike. Bi tevahî kontrolkirina bavê ya malbatê û wisa bêbandorhiştina wê dê li ser min jî hindek encam biafirandibana. Mînak min nedikarî ez rewşa nakokiyekê bibînim. Dibe ku nakokiya dê-bavê firsendê dide derketina min. Bavekî bêbandor, dîsa jî dixwaze bavtiya xwe û zilamtiya xwe raber bike, naxwaze bi hêsanî dev jê berde. Lê ji aliyê din ve jî jineke ku dixwaze xwe bigihîne asta dayiksalarî yan jî weke jineke dayiksalarî dixwaze di malbatê de cih bibîne û di vê mijarê de li gor hewl dide heye. Ev, bi rastî jî nakokiyeke girîng e.

Ev nakokî ji min re hindek derfetan pêşkeş dike. Di pêvajoyên paşê de sudwergirtina ji van nakokiyan cara yekem ez li malê hîn dibim. Yanî li hember otorîteya bavê ez têgîneke weke hêza dayikê nas dikim. Ev, di malbatê de rê li ber bêbandoriyekê vedike. Ji ber ku rê li ber vê yekê vedike jî, ez ji xwe re dibêjim ku, ez dikarim di temenê zû de dikarim azad tevbigerim. Li gor ku diya min li hember bavê min derdikeve ma çima ez nikaribim li hember hindekan derbikevim? Li gor jinên din dayikeke wisa him wêrekiyê dide, him jî min serbest û li gor xwe bûnê dihêle. Ka dibêjin a, dema du hêz bi hev re mijul dibin û hev bêbandor dihêlin, hêzeke sêyem a zarok dikare pêşveçûyînê raber bike. Ez bawerim ez hindekî ji vê yekê bandor dibim. Rewşa heyî, bêyî ku ez bikevim bin otorîteya dê-bavê jî derfet dide ku ez xwe bibînim û xwe azad hîs bikim.

Şerkirina dê û bavê, ji holê rakirina aramî û rihetiyê cih ji têgînên weke himbêza dayikê û sparteka bavê re nahêle. Esas tu li van deran nikarî cih bibînî, nikarî li spartekê bigerî, nikarî hezkirinê bibînî. Ev jixwe li ser hev du her

şêweyê bêrêziyê disepînin. Mirov zêde nikare ewlehiya xwe bi vê rewşê bîne. Ji ber ku bi rastî jî bandora malbatê ya li ser zarokan gelekî diyarker e. Divê mirov diyar bike ku gelek ji we hîna zarokên malbatê ne. Hun bi şerê malbatê û nirxên malbatê re mezin nebûn. Ez îro hîna şaşiyên ku we ji wan girtine dixwazim sererast bikim. Li hember ev nirxên kolekirinê, nepixandinê, dizekkirinê û bi sexteyî xwe xistina şûna zilaman min çawa eşkerebûn bi pêş xistiye û min çawa her roj bi van re şer kiriye dema hun bi ber çavan bigrin dê rastiya wê ya malbatê hindekî vekirî derbikeve holê. İhtimaleke mezin e ku hun hemû weke, “zarokê baş” ê malbatê hatine mezinkirin.

Erê, ez ji vê yekê re tu tiştî nabêjim. Lê di nava ev şêwaza mezinbûnê de pir gemar heye, pir girêdanî heye, pir koletî heye û pir nepixandin heye. Encamên wê yên jandar û nayê pejirîn hun derbasî nava partiyê dikin. Vaye gelek ji we dibêjin, “em partiyê weke malbatê dibînin.” Eşkere derdikeve holê ku, hun di nava partiyê de li têkîliyên malbatê digerin û xwe weke zarokê baş ê partiyê dinirxînin. Ger tu partiyê weke rêxistineke malbatê bibînî, tuyê bibî belaya serê partiyê. Malbat, saziyeke seretayî ye, ger tu nirxên vê saziyê bi yên netewî û siyasî ve têkilhev bikî, ger tu ji partiyê hêviya ew jiyana erzan û belaş bikî, rû, rêz û hezkirina ger te li wê derê dîtiye heke tu bêked li nava partiyê bigerî tuyê bibî belayeke serî. Di encam de beşek ji we belayê seran e. Çima? Ji ber ku rastiya wê ya malbatê gelekî şaş bi kar hatiye û hun nikarine xwe ji rewşa belaya seran xelas bikin. Encameke girîng a ku divê ji vê derê derbikeve ev e.

Ez înkar nakim, nirxeke mezin didim tiştên ku malbatê dayî we, didim mezinkirina malbatê ya we û didim mezinkirina dayikekê. Yanî ez dibêjim ku, bila xwedê her karî bi min bide kirin lê bila karê mezinkirina zarokekî ya dayikê nede min. Mezinkirina zarokan karekî gelekî zehmet e. Divê li vê derê ez vê yekê bînim ser ziman.

Jixwe ger ez bim, ezê bi sîle û pehînan bikevim nav, yanî sebra min ji mezinkirina zarokan re nîne. Bi wê şêweyê, di wan şertan de sebir nakim. Bêguman ez ne li dij zarokan im.

Ez wê yekê jî bînim ser ziman. Bila weke pesinkariyê nebe, dîsa ez mijulbûna bi zarokan re, bi teşeyê herî hevalbend didomînim. Ez dixwazim ji zarokekî re weke zarokekî ne, weke mirovekî ku bi pêşbikeve nêz bibim û vê yekê bi şêweyeke herî cewher jiyanî bikim. Lê dîsa jî li hember zarokan ez evqas bêsebir im. Ne gengaze mirov rojekê jî sebrê raberî girîn û qêrînên wan bike. Dayik pir hewlnak berxwe didin. Bêguman ev berxwedan jî wan dixîne û bêhal dihêle. Hemû ew paşverûtiyên dayikan hindekî ji ber zarokan e.

Na. Ev nakokiyên gelekî cewaz in û mirov dikare gelekî cuda bi dest bigre. Ji bo balkişandinê em van tiştan dibêjin. Di nava rastiya Kurdan de ev şêwaza mezinbûna li nav malbatê rê li ber encamên giran vedike. Hun çiqas nazenîn hatin mezinkirin, hun çiqas derveyî kedê hatin mezinkirin? Rexmî ku malbat xizanbûn çawa hun begane mezin kirin?

Ev nakokiyên mezin in, pirsgirêka mezin e.

Jixwe her dem zarok bi gotina "dê kurê min mezin bibe, bibe paşe" ve tên mezinkirin. Hun li hember min weke generalên bêked radiwestin. Ev yek encama şêwaza mezinkirina we ye. Hun wisa dayîne hînkirin. Her dem gotine, "zarokê min ê herî baş e, herî xweşik e, zarokê min ê herî paşe ye." Niha bêyî ku hun kedê bidin, bêyî ku hun di ber tenişta pêşveçûyîneke xwedî teoriyeke dirende û hewleke pratîk re derbas bibin, wisa lixwe anîna we ya rayeyê, lixwe anîna we ya milîtaniyê bi şêwaza mezinbûna we ve girêdayî ye. Vaye hemû başiya min, wisa nebûna mijara şêwaza mezinkirineke wisa û nejiyîna talih û bêtalihiya mezinkirineke wisa ye.

Bi wê wateyê ku, rewşa min a di nava malê de nakok an jî zûderketina nakokiyê, li ser pêşveçûyînên paşê bûye xwedî bandoreke diyarker. Gumana ku ji vê saziyê hate dîtin, li ser kevneşopiyan, spartekan û ji piya mayinên bi van ve spartî jî xistim nava gumanan. Jixwe her kes dibêje, "dê bavê min, min wisa biparêze, dê diya min, min wisa biparêze" û mezin dibe. Jixwe bêspartina dê û bavê negengaze ku zarokek mezin bibe. Lê bi şêweyê jiyankirina me ve, di temenê biçuk de pêşwazîkirina vê û qutbûyîna zû, li ser serxwebûna me ya

paşê gelekî dibe xwedî bandor. Hawirdorê pêşkeş dike ku, em nakokiya civakê fêm bikin, li gor nirxên malbatê ne, em li gor nirxên netewî û civakî hişyariyê raber bikin. Zutirîn min ji vê re vedike.

Yanî divê ez parastina dê-bavê ya ji min re înkar nekim. Divê ez vê yekê jî bibîrbînim ku, diviya ku ez bibûma zarokekî sertewan. Lê diya min li gor nakokiyên xwe di ajotina min a şerkeriyê de hewlnak bû. Heta ez dikarim bibêjim ku terbiyeya herî mezin min ji wê girtiye.

Yanî min ev yek dît: ger tu bi dijminên xwe re mijul nebî, tu nikarî nan bixwî û nikarî bijî!

Dibe ku ev taybetmendiyeke girîng a perwerdehiyê be.

Ji ber ku li gor xwe li hember dijminên xwe tekoşînêr bû. Mînak ger zarokekî kulmek li min dabûya, digot, “ger tu tola xwe hilnegirî, misoger tu nikarî vegerî malê.” Dema ez bêtolhildan dihatim, ez diqewitandim. Ez neçar dihiştim ku, “divê tu herî bersiv bidî.” Şerê min ê bi hindek zarokan re hîna tê bîra min. Ev şer misoger ji ber zorên wê bû. Ger bi ya min bûya, ezê girîbam, û minê gotiba “dayê tu here tola min hilde, bavo tu here hilde” û jixwe min wisa dikir.

Rewşa hemû zarokan wisa ye. Dema lêdanê dixwin an jî zerarek digihê wan, bi girîn, direvin destpêkê xwe li bavê dipêçin piştre jî li dayikê. Wisa dixwazin pê bersivê bidin dayîn. Di min de bersivdayîneke wisa ne mijara gotinê ye. Divê ez herim bersiv bidim. Ev, ji ber şêwaza perwerdehiyeke rast e. Ew jî zarokek e û tu jî zarokek î. Her wiha diya min bixwe jî diçû, bi xwediyên wan re şer dikir. Digot “ger zarokê te wisa kiriye, ezê jî wisa bikim.” Lê bi me jî dida kirin.

Bi kurtasî diya min hesteke wisa daye min: “wisa bi xwe spartina min ve, her bi piştgiriya min ve, her bi dîtina alîkariyê ve, wisa bi gîrin û qarîn, bi taybet bi helwestên wisa ve tu nikarî bijî, divê misoger tu xwedî bersiv bî!” gelekî seretayî be jî, ev dibe hesteke tolgirtinê yan jî gîhanê. Ji aliyê bavê ve ne xwedî hêz e, ji aliyê dayikê ve pêhtir hêzdar e. Ji aliyê bavê ve jî heye, lê aliyê dê pêhtir diyarker e.

Ev di jiyanê de taybetmendiya tekoşînvaniyê ye.

Bêguman em zêde nedan perçiqandin. Ji ber ku diviya em di şerê bi wan zarokan re bihatibana perçiqandin. Zarokên aliyê dijber bihêztir û zêdetir bûn. Li wê derê hêza xwe parastinê hebû, şerekî yeman ê xwe parastinê dihate dayîn.

Ev yek dida hîskirin: ez wisa bi hêsanî serî natewînim; ez şerê mezin dikim, qiyametê radikim.

Di gund de tu kesî ji wê navdartir tunebû.

Wisa tam tufaneke serhildanê.

Di bangdayîn û qêrkirinê de, di xeberdayînê de tu kes di ser wê re tunebû. Zilam an jî jin kî dibe bila bibe, bêtirs bi ser de diçû, bi hêrseke mezin diket. Yanî kesayeteke bûyerî bû. Hindekî jî ji aliyê parastinê ve parvekirineke min hebû. Yan jî diviya ku em kesekî qels bûna. Li gor gotina wan diviya ku em bibûna zarokekî qels û li hember her tiştî sertewan. Ez bawerim divê mirov di vê aliyê de nirxa wê teqdîr bike.

Derveyî vê zêde tu tiştekî bikarîbana bidana me tunebû. Piştî ku ez ketim pêvajoya dibistanê êdî tu tiştekî ku ez ji dayikê fêrbibim tunebû.

Pêvajoyeke qetînê ye, dimeşe û diçe.

Qetîna ji dayikan çiqas rast e? Çiqas şaş e? Zarokên mînak ên dayikê bi giştî piştre dema derfetên wan dest didin û dibin xwedî dirav, ji dayikên xwe re diyariyan distînin. Min serî li azîneyeke wisa neda. Esas diravên min jî hebûn. Rexmî ku min hindek dirav bi dest dixistin, ez nehiziriyam ku wisa ji dayik an jî mirovên xwe re diyariyekê bistînim. Belkî ev yek li zora wan jî çuye. Erê, belkî ez di vê mijarê de hindekî înkarger nêz dibûm, lê li gor min diviya kuriktî cewaz bûya. Li gel ku ez ne lawekî li gor daxwaza wan bûm, di min de lêgerîna lawiktiyeke din a baş hebû. Ez tu caran wisa bi diyariyên erzan nezî têkîliyên dostaneyî nebûm. Ez hîna jî wisa me. Min her tişt ji we re got. Min anî ser ziman ku, ka ez çiqas bi hevaltiya xwe ve girêdayî me, di temenê biçuk de çawa ez lêgervanekî mezin ê hevaltiyê bûm, ji bo ku ez bi wan re bim min çawa can diavêt. Heta ji bo ez hevaltiyên wisa avabikim, min hêzeke çawa zevtkiriye. Bêguman min didît ku ev yek bi diyariyên erzan ve nabe û esas min çawaniya diyariyên erzan jî ezmûne dikir. Ev yek jî

zêde balkêş nedibû. Firsend nedida ku hevalbendiyên xurt avabibin, kesayetên xurt avabibin û têkîliyên xurt avabibin. Ji ber wê yekê hîna di temenê biçûk de min azîneyên cewaz ên bixweve girêdana mirovan anîn hişên xwe. Min xwast ez riyên cewaz ên girêdana mezin bi malbatê re jî bicerbînim.

Bi têkîliyên erzan ên madî ve, bi têkîliyên diyariyan ve, bi têkîliyên mirovî û kiriviyê ve mirov dikare encax çend ehbabgeran qezenç bike. Tu nikarî girseya mirovahiyê bi dest bixî. Ji ber ku wê demê pirsgirêk ev bû. Em qezençkirina hemû gel li aliyekî berdin, me nedikarî em cînarên xwe rabikin. Tu kesekî çawayî ku, tu nikariye bi şêweyeke watedar cîranên xwe bi xwe re bikî yek? Rexmî ku gelekî dixwast, tu nikariye gundiyên xwe jî qezenç bikî.

Bêguman vê hestê hişt ku em hîna ji wê demê ve bikevin pêvajoya lêgerîna girêdanên kûr. Tuyê çawa karibî, mirovan, cîranan, hemû gundiyan, tevahiya gelekî û ger gengaz be tuyê çawa mirovahiyê bikî yek? Tuyê çawa kûrahiya eleqeyê biafrînî? Di me de wisa lêgerîna îdeolojîk, siyasî û partiyê bi pêş ket. Yanî mirov ewqas têkîlî û ewqas bi hêsanî dev ji hev berdidine ku, tu neçarî kûr pê ve neyî girêdan.

Girêdanên ku bi diyariyên erzan ve tên çêkirin, girêdanên ku bi pîvanên feodaliyê tên avakirin ji bo ku zêde ji min re bihêz nedihatin, min jî jê re pêwendî raber nekir. Girêdana bi olê re hindekî dîtir ji min re kûr dihat. Wê demê min xwe li wê pêça. Bi wan girêdanan ve min hewl da bi civatê ve werim girêdan, hêz bidim civatê û bibim hêz. Piştre di min de çawa têkîliyên zanistiyê, felsefeyê, îdeolojiyê pêş ketin. Çawa mezinahiya îdeolojiya sosyalîzmê,û têkîliyên siyasî bi pêş ketin?

Esas ev weke dijberiya ev lewaziyên mezin pêk hatin. Mînak di we de hîna têkîliyên sempatiyê giran in. Hun zû radestî têkîliyên lewaz dibin. An jî hun têkîliyên wisa bes dibînin an jî bêtêkîliyê asayî pêşwazî dikin. Di min de hîna pêvajoya kûrkirina têkîliyê heye. Mezinahiya siyaseta min an jî zexmiya di têkîliyên min de, hindekî jî çavkaniya xwe ji ev temenê zû digre.

Esas min gelekî têkîlî dixwastin, ji bo vê ez gavan jî diavêjim. Hun bi hêsanî bi hev têr bûne yan jî çend têkîliyên erzan ji bo we bes in. An jî bêtêkîlî ji bo we gelekî asayî ye.

Ji bo bêtêkîlîbûn îşkence ye.

Ez têkîliyên lewaz bi dijwarî pêşwazî dikim.

Di min de lêgerîna têkîliyên kokdartir, radîkaltir, zexmtir, kûrtir û yên di sedsalan hiltê heye. Vaye ev lêgerîn dibe îdeolojiyê, dibe felsefeyê û polîtîkayê, her ku diçe dibe têkîliya artêşê. Têkîliya artêşê têkîliya herî zexm e. Ger te anî rewşa têkîliya agir, tuyê di wir de bigihê lûtke. Ji ber ku kes li dûv wê jiyana xwe dadine holê. Kesayeta ku jiyana xwe daniye holê nabe kesayeteke ketûber, têkîliya vê jî ketûber nîne.

Ev yek çavkaniya xwe ji kû derê dibîne?

Weke ku min diyar kiriye, ev yek ji hêrsa hember bêtêkîliya lewaz û bêewle bandor dibe. Ger hun, belaviya netewî û têkçûna civakî ya di xwe de baş fêm bikin, encama ku pêwîste hun derbixin divê giraniya dayîna we ya ji têkîliyên rêxistinê re be.

Niha nirxandina wê zêde zehmet nîne. Ezê li asta we ya têkîlî û rêxistinê temaşe bikim, ger ne kûr û radîkal e, ezê bibêjim ev paşverûyek e. Çima? Ji ber ku hun bi çend têkîliyên erzan ve têr bûne. Di asta netewî de hun li rêxistinê û têkîliyê nagerin. Diyare ku ew dê ji bo min kesekî ji rêzê be. Pêwendiyeke mezin raberî têkîliya artêşê û şer nake. Ev nikare bibe gerîlagerekî baş. Ji ber ku wateya têkîliyê nizane.

Niha hindekî din baldar bin, kûrbûna min a li vir û evqas diyarkeriya bi çi ve girêdayî ye? Hêrsdariya min a li hember bêtêkîliya kûr, têkçûna civakê û daborîna asta netewî, dîsa hêrsdariya min a li hember qetîna mezin a malbatê bi çi ve girêdayî ye?

Ez ji malê qutbûm, lê min karîbû ez rê li pêşiya malbateke mezintir, malbata Kurdistanê vebikim. Min bêhêziya malbata xwe dît, pir zû ez ketim qutbûna têkîliyên malbata xwe û pir zû ez ketim qutbûna ji gundê xwe. Ez çawa dixwazime, pêmeniya wê û êşa wê sererast bikime? Ev min dibe, rêxistiniya mezin, girêdaniya mezin, partiya mezin, artêşa mezin û eniya mezin. Ev hemû jî min dibin

hewla zêde, lêgerîna mezin û lêhûrîna mezin. Bi vî awayî ji malbateke Kurd a helî û lewaz derbasbûna malbata mezin a Kurdistanê pêk tê.

Niha israra we ya li ser malbatgeriya erzan, pir neyînî reng dide malbata mezin a Kurdistanê. İsrara we ya di têkîliyên we yên erzan de, di hezkirin, azwerî û girêdanên we de rê li ber lewaziyê vedike. Girêdaniya we ya bi ehbabgerî, hevjîn, dost û bira-xwişka we re rê li ber lewaziya girêdaniya bi rêhevaltiyê re vedike. Rê li ber lewaziya pêşvexistina girêdana artêşa mezin vedike. Weke vê girêdanên netewî, çînî û mirovî jî rê li ber lewaz bidestgirtina saziyan û beşdarbûna we ya qels vedike. Çima?

Ji ber ku hun keviniyê dijîn. Hun van di dilê xwe de weke dayika kevin, bavê kevin, malbata kevin, birayê kevin, hevjîn û dostê kevin, kirîvê kevin, mirovê kevin û weke kevneşopiyên kevin didin jiyîn. Bi kurtasî we hîna bandorên saziyên kevin ji ser xwe neavêtine. Avêtina van û şûna van bicihkirina ya bihêztir pêk nehatiye. Ji vê aliyê ve jî hun pê re lihevtên, hun reformîst in, nîvrêyî ne, di encamê de gelek ji we wisa ne. Çima?

Ji ber ku we veguhertineke radîkal nekiriye û we di xwe de şoreş pêk neaniye. We ji zaroktiya xwe ve nekiriye, hun li ser rûniştine û hun PKKê jî bi ser ve didin helandin. Bi vî awayî hun dibin belaya seran.

Yanî em hatin di PKKê de ji nû ve kesayetê dahûrînin. Pêwîstiya me ne nîvrêyan û ne jî bi tiştekî din heye. Sedemên vê yekê çine? Hun çiqas bandor bûn? Tu kesekî ku bandor nebûye nîne. Di encam de zilam nabe damezrînêrê artêşa bihêz, nabe rêxistinêrê bihêz, nabe xwedî hestên bihêz. Jimara kesayetên weke we zêde ne, lê wesfa wan kêm e. Ev dikare çawa were têperandin?

Ev hindekî wisa dikare bi dahûrînên dayikê re û bi dahurînên malbatê re were têperîn. Hun dê bibêjin, “tu xwe dadihurînî û dikî malê netew hemû.” Bêguman divê her kes vê yekê bike. Kesê ku rastiya xwe danehûrîne, neke malê netew ma dê başiyê bike? Naxêr, dê xirabiyê bike. Kesê ku rastiya xwe nasneke, xwe nasneke, malbata xwe nasneke nikare başiyê bike.

Ez nabêjim înkar bikin an jî qet encaman jê dernexin, berovajiya vê yekê ez dibêjim bikin. Di vê mijarê de dirûst û zexmbin. Wê demê hunê bigihên rastiyê û ya bihêz. Ger min wisa diya xwe bi dest girt û nakokiyên xwe eşkere kirin, ma min ew înkar kir? Naxêr. Min hişyarî raber kir ku ez bigihêm dayika Kurdistan. Ez bawerim ku min ew jî kiriye dayikeke xwedî nav û deng. Di 1993'an de ji her aliyê Kurdistanê bi hezaran mirov beşdarî torêna wê ya cenaze bûn. Ger ez di nava têkîliyên dayiktiya kevin de bimama, dê ji gund çendsed kes hatibana û yan dê ew bi bîranîbana yan jî dê neanîbana.

Erê, rexmî hemû nakokî û pêvçûnan, dîsa jî wisa gengaze ku mirov bibe ewladekî dayikê yê baş. Yanî me pêngavek avêt. Ji têkîleyeke qedî ya dayik-kurik, gihandina têkîliyeke welat û welatperweriyê, gihandina têkîliya dayika ax dibe ya herî watedar û pîroz. Bi rastî jî esas heqê dayikekê jî wisa têye dayîn.

Dayikek, di heman demê de jinek. Mirov dikare çawa pêwendiyê raberî jinekê bike? Weke şêwaza me di dahurînên azadiya jinê de raber kiriye, encax bi şêwazeke wisa watedar mirov dikare bersiv bide. Pêwîst nake mirov diyariyên biçuk bistîne, li gor min dahûrîneke azadiya jinê, ji dayikê re jî dibe rêza min a herî mezin.

Ma qet bandora diya min nîne? Ger bandora wê nebûya, ma ez wisa nêzî jinan dibûm? Bandoriyên vê têkîliyê yên li ser min hiştiye ku ez baş baldarî jinan bim. Hêza dayikê, kêl bi kêl şervaniya wê, bandoriya wê ya li ser min, hiştiye ku ez wisa di pirsgirêka jinê de baldar bim, jinan înkar nakim û bi kêmanî hiştiye ku ez weke bavê xwe nebim an jî weke zilamên cîranan nebim. Ez wisa dihizirim ku di vê yekê de jî bandora diya min heye. Bandora jineke wisa, bandora jineke ku bi hêsanî nakeve bin desthilatiya zilam jixwe pir şênber e.

Me ev bandor piştre çawa veguherand teoriyê? Vaye dahurînên jinê.

Me ev çawa veguherandin tekoşîna azadiyê?

Dayikekê di şertên gund de, di wê paşverûtiyê de baş tekoşîn dida. Bila keçên me yên ciwan jî tekoşîn bikin. Baldar bin, ez destpêkê bi diya xwe re pevdiçim, esas ez wê

bi hêsanî naecibînim, lê bandoriya wê digihînim teoriya şênber. Piştre jî ez dibim encama "hemû jin dikarin şer bikin." Ev yek dibe çi? Hîna di asteke bilind de, hîna di giştîgeha jinê de veguherandina bûyera azadiyê, bi raberkirina girêdaniyê ve bandorkar dibe. Divê ev bandorbûneke rast be. Ez bal didim jinê. Dayika te gelekî serhildêr e, gelekî bêzanebûn e û heta bi vê wateyê ger bêçare ye, şert e ku mirov di rêxistinkirina jinê de hişyar be. Ger tu dixwazî bi dayikê ve girêdayî bî, li şûna ku tu weke diya xwe, xwe bi jinê re bes bibînî, tu dikarî bêçareyiya dayikê, veguherînî jina xwedî hêz. Wê demê tu dikarî bipeyîtînî ku tu ewladekî baş î. Teorî evqas sivik e. Lewaziyên wê tu dikarî veguherînî hêzê. Tu dikarî serhildêriya wê veguherînî artêşbûna jinê.

Hun dê bibêjin, "min dahurîna malbata xwe kir, min dahûrîna Kurdistanekê û dayikekê kir, dahûrîneke jinê." Erê, divê her kes vê yekê bike. Jixwe ger tu bikî tuyê bibî zilam. Ger tu bikî, tuyê xwe rast nas bikî, tuyê encama rast derbixî.

Bêguman dayikek di heman demê de dayika ax e. Vaye welatperweriyek e. Dayikek, azadiyek e, veguherîna azadiya jinê ye. Şerma vê yekê li aliyekî bihêlin, niha eşkere ye ku divê bi giştî her kes vê yekê bi cih bîne. Em layiqbûna ji dayikan re carekê jî wisa diceribînin. Ez bawerim a herî rast jî ev e. Ji ber ku niha dayik jî pir bi berfirehî tevlî şoreşê bûne. Niha yên herî xwedî bandor ew in û gihiştine feraseta dayiktiya rast.

Em niha baş dizanin ku, dayik bi dilxwazî zarokên xwe dişînin şer û dema şehîd dikevin jî bi tilîliyan bersiv didin. Berê jina ku li ser êşeke biçûk a zarokê xwe dicurifiya, îro dema zarokê xwe dişîne şer dibe ya herî wêrek. Esas ev yek jî diyar dike ku em rast nêzî rastiya dayikê bûne. Dibe şahid ku me ew tirs û êşa wan a mezin veguherandiye wêrekî û rêza rast.

Esas ev bi tevahî me dibin pirsa çawaniya bersiva rast a ji hiquqa dayikê re. Gelekî teorîk be jî, pir di wesfa siyasî de be jî ez bawerim ev bersiv bersiva herî watedar e. Dema nefesa xwe ya dawî daye gotiye, "bi navê min pir xêran bikin, hêwişan (dua) bikin." Xêra me û hewişa me tekoşîn e.

Bi taybet riya bûyîna zarokê xêrdar ê dayikên li jînê, li gor min bêhtir serkeftin û şervanî ye. Hêwişa xêrê şervaniya we ye. Niha ya ku ew ji we dixwazin çend diyarî nînin, jixwe êdî wê qebûl nakin. Dayikên we her roj ji min çi dixwazin? Ew dibêjin, “ev zarokên me baş bide şerkirin, em li dij şehîdbûnên wan nînin, lê evqas di nav demeke kurt de şêhîdbûna wan jî li me zor tê.” Dibêjin, “me bi zehmetî ev mezinkirin, bila ev bihêz şer bikin.”

Bi rastî jî ev daxwazên sotîner û rast in. Ev yek jî peywira we ye. Li gor ku daxwaza sotîner a dayikên we jî ev e, demdirêj şervaniyê bikin û bibin milîtanên yeman. Ger di we de tiştekî bi navê girêdanê heye, wê demê pêwîstiyên vê yekê bi cih bînin.

Tê gotin ku, mafê dayikê bi hêsanî nayê dayîn.

Di me de mafê dayikê çawa tê dayîn?

Encax bi şervaniyeke yeman ve mirov dikare mafê wan bide.

Ew baş dizanin ku çawa dayikek bêçare dimîne û çawa heqaretan dibîne. Îro çawaniya çewisandinê û qehirînê ji dayikan hîn bibin. Dîsa çawa zoriyê, êşê û tengezariyê ji dayikê hîn bibin. Ger ew niha ji me milîtaniyên baştir dixwazin, ger bi rastî em xwedî rêz in, wê demê pêkanîna pêwîstiya wê li gor min raberkirina herî rast a girêdanê ye. Dîsa ez dihizirim ku min hindek ji para xwe pêk aniye. Lê hun jî xwedî peywirên bicihanînê ne. Zû mirina we û bi dayîka dayîna lorînan nayê wateya rastbûna milîtaniya we. Berxwedaneke tekoşîner û bêeman, dayîna şerê jiyaneke bêeman, bi rastî jî bersiva herî rast a ji hiquqa dayiktiyê re ye. Ji ber ku weke din ne gengaze ku mirov bikaribe bersiva bîranîna wan bide.

Bersiva we ya herî rast a ji banga dayikan re,(ku, ez dizanim gelekî sotîner e) şerekî demdirêj û serkeftî şert dike. Ji ber ku niha dayik hemû şer dixwazin. Hemû niha zêdetir şer dixwazin. Bi meşên wan jî ev yek eşkere ye. Di ev şehîdên me yên jin de yek jî ev alî heye. Negengaz e ku mirov vê yekê nebîne. Her wiha dijmin wisa wan bi hovane qetil dike. Dijmin dixwaze bi feraseta me ya jin û namusê bilêyîze. Dixwaze me bitirsîne û bangî aliyên me yên lewaz

bike. Bersiva ku em bidin dijmin jî, şervaniya yemantir, serkeftîtir û xwedî serkeftinên mezin e.

Weke din mirov nikare bersiv bide, ew êşên mezin, zehmetî û xizaniyên mezin ên dayikên Kurdistanê.

Ez wan êşan baş dizanim. Jiyaneke wisa erjeng a dayikan û wisa çavşil heye. Wisa rawestandina êşên wan û rondikên çavên wan, weke hun dihizirin ne erzan e. Ger min hindekî rê li ber vê yekê vekiriye, tenê ji ber rast nêzîkbûna min a ji peywirên min re ye.

Bi rastî jî ger em niha hindekî bi azadî dibin bersiva wê lewazî û bêçareyiyê, ev tenê ji ber pêwîstiya feraseta me ya rêgezî û egîdiyê ye. Naxwe ez jî weke we dikarîbûm nêzî hiquqa dayikê bibûma. Diviya ku li xweşiya min jî çûba, ez zêde nedidam zehmetê jî. Lê ne gengaze mirov vê yekê weke nêzîkatiyeke şanaz binirxîne.

Dayîna mafê rastiya dayikê gelekî zor e. Heta dibêjin ku heqê dayikê nayê dayîn. Lê li gor min ger mirov wisa bike, mirov hindekî dikare heqê dayikê bide.

Divê mirov bide jî.

Bêguman divê em ji her demê zêdetir wate bidin rastiya dayikê.

Divê em Kurdistanê bixwe weke rastiya dayikekê bihizirin. Divê em Kurdistanê weke axa dayikê, welatê dayikê bibînin, binirxînin û bi azadiyê ve watedar bikin. Ji ber vê yekê jî, divê em bi hêzkirina dayîkan ve, bi pêşkeşkirina derfetên madî û manevî yên ji bo jiyanên wan ve û di roja me ya îro de jî bi pêkanîna şervaniyê ve em bersiva wan bidin. Mafê dayîkan misoger nayê înkarê. Nabe ku mirov mafê dayikê bicih neyne.

Ger mirov dixwaze layiqê dayikê bibe, ev yek encax bi gihiştina asta milîtaniya wisa ve gengaz e.

## Çavê Mezin

Em dikarin bibêjin êdî ew serdema xwe xetimandina ku di dîroka me de gelekî tê dîtin û bi xiyaneteke di xwe de berovajîkirina karan qediya ye. Pêşveçûyîneke herî girîng jî ev e. Dixwaze bila di hundirê partiyê de be, dixwaze bila di eniyên berxwedana netewî de be, êdî kes nikare bi xwe re her tiştî veşêrin. Rexmî hemû vaca xiyanetê û pratîka wê, hindekî hatiye eşkerekirin ku, êdî kes nikarin bi xwe re her tiştî bibin binkeftinê.

Gelek hewl hate raberkirin; hate xwastin ku wisa xwe weke miriyan bigrin, xwe biqedînin, xwe veçirînin û bi mirinî xwe veşêrin, lê ji vê yekê re firsend nehate dayîn. Yanî em dikarin bibêjin, me wilfa “di xwe de qedandina jiyanê” ku weke çarenûsa netewî tê dîtin şikand.

Me ev wilfa nejiyînê û mirinê şikand, him jî me bi hişmendî şikand. Lê ma tam ketina riya jiyanê, ketina riya serkeftinê çêbû? Mirov nikare bibêje ku em tam ketinê. Encax a niha heyî jî pêşveçûneke kêm nîne. Ji aliyê me ve serkeftineke girîng e ku em firsendê nadin kuştina her tiştî ya bi kesayetên we yên mirinî û nêzîkatiyên we yên kirêt.

Niha hun dibînin ku, rastbû ku kesên herî xwe girêdayî dihesibînin jî temsîlkariya mirinê dikin. Û ev mirinî li ser hemû derfetên vejîna jiyana me disepandin. Em hîna jî we lêpirsîn dikin.

Hun çiqas di hundirê jiyanê de ne, çiqas derveyî wê ne?

Hun çiqas xalên mirinî, tarî û cemidî ne? Hun çiqas derfetên vejînkar, ronak û jiyana germîn in?

Em dixwazin van eşkere bikin.

Bi taybet hun çiqas xwedî binkeyeke kirêtkar, koranî û xirabkar in? Hun çiqas bi van re xwedî nakok in?

Hun çiqas bi xweşikirinê, başkirinê û hewlên rastkirinê ve girêdayî ne?

Em van jî eşkere dikin.

Ev jî bi qandî şer karên girîng in.

Yek jî em di vî alî de gelekî ponijîn.

Em hîna berxwedanên li hember vê pêşveçûyînê jî dibînin. Baş e, ma ez we înkar dikim an hun min înkar dikin? Ma ez xweşikiyên we tarî dikim, an hun xweşikiyên ku ez dixwazim derbixim holê tarî dikin?

Ma ez ronahiyê avadikim an hun?

Yê ku tarî dike kî ye, yê ku ronî dike kî ye?,

Yê ku hêviyê şîn dike kî ye, yê ku hêviyê tune dike kî ye?

Diz kî ye, yê xwedî ked û afirandêrê nirxan kî ye?

Bêguman a ku me pêkaniye wisa pêşveçûyînê ketûber û erzan nîne. Egîdî, merdî wisa bi şerê çeka destan nîne. Hele di hawirdora civakeke weke me de ku her teşeyê namerdiyê bi pêş ketiye de, karekî herî zehmet e ku mirov wesfandina mirovê rast, merd û watedar bike û wan eşkere bike. Di serdem û sîstemeke wisa xwedî ketîbûn, namerdî, ketîbûn û kirêt de, bi ser van ve çûyîn û bi hindek derbeyan gêjkirina wan karekî hêsan nîne.

Na. Weke ku ev yek ne hêsan e, hêja ye ku mirov li ser çawaniya kirina wan raweste. Bi tevahî me xwast ku em di vê derê de xwedî puxteyeke rastbin. Me got, a girîng serdestkirina fêmkariya rastiyan e. Li şûna meşandina hindek kesan a li gor dilên xwe, me eşkerekirina rastiyan esas girt. Di nava rastiyeke wisa xwedî kesên fanatîk, kesên xwe wendakirî de yan jî her kêlîkê bi xwe wendakirinê re rûbirû de bi şêweyeke din nêzîkbûn, di vê rewşê de, dê biba bêrêziya li hember wan jî.

Dema hun fanatîkiya xwe, reva xwe ya ji rastiyan û nexwastina xwe ya nêzbûna ji rastiya serkeftinê re bînin ber çavan, dê baş were fêmkirin ku rewş çiqas sotîner in û bi ser xwe ve hatin çiqas girîng e.

Divê mirov hindek tiştan misoger rast şîrove bike û mafê wan bideyê. Bi zimandirêjiyê, bi nebesiyê û bi lîstina rastiyan ve ev kar nameşe. Ev sedemên herî bingehîn ên ketîbûnê û bêşerefiyê ne. Wisa bi çavşilî û sewdaseriyê ve

xwe spartina hindek nirxan jî, weke tê hizirîn başî nîne. Ev nêzîkatiya di nava me de xwedî bandor jî pir zêde bi bênamusiyê re pêwendiya xwe heye. Me xwast em wê jî raber bikin. Bi kêmanî qandî eniya şerê germ, me di eniya giyanî de jî şerekî wisa da.

Ji ber ku kirêtî li lutkeyên jor in. Ji ber ku di giyanan de gelek tiştên tarîkar û berbi binkeftinê dibin hene. Me ev hemû raber kirin. Ger egîd e bila derbikeve meydanê! Çima tarî dike û bi kesayeta xwe ya mîna bîra bêbinî gelek tiştan dadiqurtîne? Me nexwast em firsendê bidin van.

Dîsa me mirintî û rizîbûna we jî derxiste holê. Me raber kir ku di nava we de çiqas mirovên ji jiyanê eciz, bêbergeh û rastiya jiyanê peyda ne. Me kesên ne di ferxa mirina xwe de ne destnîşan kirin.

Li gel vê yekê pir zarokîbe jî, me hewes, daxwaz û azweriyên xwe jî raberkirin. A şerm ne ev e, ya şerm nuximandina xafleta xwe ye. Nuximandina qedîna xwe, bêrêziya xwe û rizîbûna xwe ye. Dîsa me bi neketina van ve ya herî baş kir.

Vaye, em hindek tiştan didin eniyên şerê germ jî.

Vaye, em hindek tiştan didin giyanên tarî û qerisî jî.

Em di giyanan de jî tevgereke paqijiyê bi pêşdixînin. Dixwaze bila li xweşiya we biçe, dixwaze bila neçe, em bi karên wisa re mijul dibin û şêwaza me jî wisa ye. Ger çareyên we yên dijber û tedbîrên we hene, hun azad in pêşkeş bikin. Bes bila, ji jiyanê re ne bêrêziyeke mezin be, bila her tiştî kirêt neke û nexîne bin erdê. Xwastina vê yekê şervanî ye, tekoşîn e. Bila tu kes bi zimandirêjî û demogojiyê ve wêrekiya berovajîkirina karan û nîşandayîna li gor xwe raber neke. Bila ji yê ne zilam re nebêje zilam û ji nebes re nebêje bes e. Bila navên wiha li sexte û kirêtan neke.

Rastiya kê çi ye bila wisa derbikeve holê.

Li hawirdoreke wisa di bin desthilatiya derewan de, başiya ku em bikaribin bikin ev e.

Kesê ku ji bûyîna ziman û çalakiya rastiyê direve ne em in. Weke ku tê dîtin em kêm an jî zêde hindekî bersiv didin her tiştî. Lê zilamên me zêde wisa nabin, semyan, xwedî

otorîte û encamgir nabin. Bersiveke bi şêweyê fermandaran û rêberan nadin. Alîkariyên xwe encax pir sînordar û bi lewazî pêşkeş dikin.

Baş e ma em wisa dixwazin? Naxêr!

Berovajiyê vê, em di hewayeke zehmet a besiyê de dixwazin hişyarbin û me li ser vê bingehê piştgirî da. Weke tê dîtin, ger mirov di azîne û riyekê de xwedî israr be dikare bi pêş bikeve. Me raber kir ku em çawa çareyên di xwe de derdixin holê. Bi vê yekê ew hate serxistin: ji bo serkeftineke bes, belkî me daxwaziya xwe bi dest nexist, lê me firsend jî neda ku hindek kes bibin binkeftinê. Me ev firsend ne da dijmin ne jî da kesên di hundirê me de hatine xistin û ketine binkeftinê. Vaye başiya me di vê derê de ye. Di vê mijarê de ne dijmin bi me da xwarin ne jî rengdayînên wê yên hundirê me.

Ez bawerim em bi têrahî ji piyan sekiniyan, me pêngavên dijber pêşwazî kirin û me pêngavên xwe sepandin.

Baş e, ma dê vê yekê fêm bikin? Ew der karê wan bi xwe ye. Piştî ku yên li ser milên me, me pêkanîn, êdî guneh ji stuyê me derketiye. Ez hindekî çibûna gunehê dizanim. Piştî ku me guneh ji ser xwe avêt, gunehkar çawa dimirin bila bimirin, ew min eleqedar nake. Rexmî ku me evqas riya heq û sewabê nîşanda û bangî vê yekê kir, ger hîna nakeve vê riyê û di nekirina ya pêwîst de israr dike, ew gunehkar û reben e. Û li kû derê çawa diçe bila biçe, bes bila zerarê nede hawirdorê. Vaye divê em hindekî tedbîra vê yekê bigrin. Mirov dikare encax wisa hesabê wijdanê bide.

Em bersivên wisa digihînin zindîbûna biharê. Li beramberî zindîkariya biharê, zindîkariya me jî wisa dibe. Giyanên ku ji vê yekê fêmnakin, ger êdî fêm bikin ji bo başiya wan e. Di nava gelekî de bi israr kesên ku evqas erzaniyê dijîn, kesên ku destûr didin her şêweyê bi jêr ve çûyîna gel, kesên ku çavên xwe bernadin bilindahiyan û kesên ji dil ji çarebûnê bawer nakin hebûn bi şûn ve, divê wisa xwe derxistina şoreşeke weke min jî divê sosret neyê dîtin.

Ev tolhildanek e, ma em çima serî bitewînin?

Min her tiştên wisa kir û ez kirina vê jî didomînim. Kesên li dij vê bila xwedî hêz bin û bikaribin qonaxa me bihejînin. A min jî şervantiyek e û ya we jî. Ez bi dilxwazî li ser kesên ku dixwazin di nav şervaniya min de cih bigrin re nêzîkatiyekê bi pêş dixînim. Li hember kesên beramberî xwe jî hindek tiştan bi pêş dixînim. Ên li beramberî min jî û yên li gel min jî xwedî maf in ku hindek tiştan bi pêş bixînin. Lê dirijin. Bêguman sedama vê yekê ne ez im. Ger dijmin jî, nikare baş dijminiya xwe bike berpirsyarê vê yekê ew bixwe ne. Kesên ku dixwazin me bixînin jî, bila xwedî hêz bin. Oportunîstek jî dikare xwe rêxistin bike. Oportunîstek jî dikare rêxistinekê ava bike yan jî partiyekê vala derbixe. Ger hun wisa bikin jî, dê ji we re bibêjin bijî. Pir mixabin, di gelek oportûnîstên nava me de ev yek jî ne peyda ye.

Em jî li ser karê xwe ne. Em tu kesî naxapînin, an jî em bi rica û minet nabêjin werin vê yekê bikin. Ji kesên ku bi dildarî xwe diavêjin nava van karan re gotina me ya “li gor esasê kar were rastiyê” yan jî “bigihê şêwaza wê, bigihê terbiya wê” divê bi dilnizmî were pêşwazîkirin. Li vê derê girîn nabe mijara gotinê.

Ger egîdî tê xwastin, tu nikarî wê wisa bi rebeniyê kirêt bikî, nikarî bêçare bisekinî. Pêwîstiyên vê hunerê hene.

Pêwîstiyên hunera egîdiyê hene. Ger tu wan bi cih bînî, wê demê mirin jî dibe xwedî nav û navdariyekê.

Esas me ev hemû ji berê de jî digotin. Lê li gor we ev hêsan in. Zêde fêmkar nîne. Esas ên bêfem, ên erzan hun in.

Di derbarê meşê de me hindek nirx derxistin holê.

Di derbarê mezinkirinê de, pîrozandinê de giranî ya me ye.

Ne ya we ye.

Ji we kesên gavan diavêjin jî wisa bejn bilind nabin. Ev yek eşkere bû ku, mezinên we, dê û bavên we hun bihêzî mezin nekirine. Mezinbûna we ya bi bandorên kemalîzmê û êşîretger-feodal we bêçare dihêle. Hun ne bi wan taybetmendiyan ve dikarin encam bigrin, ne jî bi şêwaza ku em dixwazin biafrînin hun dikarin bejn biavêjin. Hun di navberê de zehmetiyan dikşînin.

Ji bo em we bi pêş bixin, ma hîna çi ji we bikin?

Tê zanîn, ji karê me re gotin "karên dînan." Hun jî dikarin bibêjin. Lê dîsa jî karek e. Ev jî dibe karek, dibe şêweyeke jiyanê. Erê, hun dikarin bibêjin dînokî ye, hun dikarin bibêjin ne li gor vace jî. Lê ez jî vê yekê dibêjim: "baş e, sedema te ye dijber çi ye? Tişta tu jê re dibêjî jiyan çend peran dike? Yanî hun dikarin bi navê welatê xwe çi bibêjin, bi navê gelê xwe hun dikarin çi bibêjin? Heta hun dikarin bi navê xwe çi bibêjin?" gelek nikarin bibin darikê tirî, nikarin bibin xulamê malê, li hember efendiyê xwe nikarin bibin xirbeyek. Baş e, ev ên wisa xwedî nirxa çend pereyan in?

Bêguman ev hemû îdiayên me ne. Tê dîtin ku, kesên din jî zêde nikarin gotinên bihêz bikin. Qaşo em ji yên herî mezin bigrin hetanî yên herî hevkar û ketî hemû jî qedî ne. Gotinên bihêz dîsa me gotin. Bêguman ji vê û pê ve gotinên mezintir dikarin hindek kesên din jî bibêjin û dikarin hindek karên mezintir jî bikin. Û em jî amade ne ku xizmetî wan bikin.

Şêwaza me şêwaza xizmetê ye. Şêwazeke jiyanê ya bi kedê ve girêdayî ye. Keda pîroztir û hewlên serkeftîtir, dikare encax pesindariya me ya mezin û çepikên me kombike, dikare piştgiriya me bigre û alîkariya me li gel xwe bibîne.

Tê dîtin ku, ev mijar wisa weke tê hizirîn seranser û sivik bi dest nayên girtin. Karên ku em dimeşînin, wisa karên bêpîvan û bêpirtûk nînin. Ev kar bi sewdaserî, jixweyî û bêpêwendî nayê meşandin. Vac û giyana karên me gelekî cewaz in. Xwedî şêwaz, hewl û pîvan e û gelekî yeman e. Ger hun nikarine bixwînin ma ez çi bikim?

Ev hemû hatine nivîsandin û pirtûkan de ne. Lê hun xwe weke cahilan kor dikin û hun dibin cahilên cahilan.

Bêguman ev rewş xirab e û têperandina vê ji bo we jiyan e. Ciwan her dem dikarin hêzê pê re bigihînin. Di pirtûkên me de gelek tişt hatine nivîsandin, ji kesên xwedî daxwaz re hema her teşeyê zanînê tê dayîn, li ser esasê her tiştî wan hene. Di derbarê her karî de û her mijarê de hene. Di derbarê karê firişteyan de jî, di derbarê karê şeytanan de jî, hema her tişt heye. Di derbarê têkîliyên çalakiyên bêeman de jî, di

derbarê rewşa hestên herî pêşketî de jî raveyek peyda ye. Yên ku dixwazin dikarin hemûyan bibînin.

Bêguman ev kar hemû di nava xwe de xwedî girêdanên şidyayî ne. Wisa her tişt ji ber xwe ve, weke hun nêz dibin, yeksan û ji hev qut nîne. Her tişt gelekî xwedî kordîne, rêxistin û yekbûneke bandorkar e. Bêguman ger mirov pir şidyayî li ser van raweste mirov dikare hîn bibe. Zanîna we ya xwendevanekî baş jî, ji bo we gelekî girîng e.

Esas ev dibistanek e. Ji beriya her tiştî divê hun bawer bin ku ya me jî dibistanek e. Hun dê vê yekê bi dibistanên kesên din re têkîlhev nekin. Ev dibistan jî li gor xwe xwedî nasnameyekê ye. Divê hun ji vê bawerbin û ger gengaz be divê hun bigihên pêwîstiyên vê. Belkî bi navûdeng nîne lê dibistan e. Bi xwe jî dikare şêwaza xwe bi pêşve bixîne.

Dibistaneke gelekî azad e.

Ev kevneşopiya ku me li vê derê avakiriye, hun dikarin wisa li çiyan binexşînin ku, dikare hezar salê pêş jî diyar bike. Ger hun nikarine vê yekê bikin, ji ber lewaziya we ye. Ev, ji ber sedema nebûna we ya xwendevanekî baş e. Hun dişipin şivanên kevin. Şivan bi çêrandina çend bizinan ve jiyanê îdare dike. Hun dişipin cotkarekî xwedî helatekî ku weke din tu kar ji destan nayê. Lê dibistana me gelekî tevlîhev û xwedî waneyên şidyayî ye. Ger hun bikaribin vê bi dest bixin û pêk bînin, bi rastî jî hun dikarin rê li ber pêşveçûyînên mezin vebikin.

Em bi karên kûr ên dîrokî ve mijul dibin.

Ger hindek bi israr bêfêmî û bêkarînê bikin, emê jî rastiya xwe bisepînin.

Kesê ku me rûser bi dest digre kî ye?

Kesê ku bi layiqî yên pêwîst pêk nayne kî ye?

Kesê ku waneyên me vala derdixe yan jî wateya wan dide wendakirin kî ye?

Kesê ku ji dehan yek bala dibistana bûrjuva nade me kî ye?

Kesayeta ku ji bo fermanberiyeke pergalê çil teqlan diavêje û li vê derê rûyê xwe ji zêrên me vedigerîne kesayeta kê ye?

Kesê ku li hember xwe evqas bêrez, bêguman rast nabe.

Kesê ku nirxa pêwîst nede hînkariya xwe, nikare bibêje ez cidî me.

Hun gundiyên hişdar in, hun bûrjuvayên biçûk ên hişdar in, hun dê hemûyan li gor xwe rêkûpêk bikin. Lê rastî wisa nîne, zimanê rastiyan cuda ye. Hun her xwe hişdar dihesibînin û wisa kûr dibin. Ez jî, dubare dikim ku, zimanê rastiyan cuda ye. Rastî, ji hemû xapandinên we û ji hemû çavreşiyên we zêdetir rikdar in. Wan jî bi zêdetirîn em temsîl dikin. Jixwe em hêza xwe jî ji vê derê digrin. Wisa weke hindek kesên ku dihizirin, em hêza xwe ji otorîteya hişk û rêkûpêkiyên erzan nagrin.

Ji ber ku em ji sifirê hetanî vê derê hatine û em baş dizanin ku çawa tên.

Ez hêvî dikim ku hun fêm dikin.

Hun diçin şer, hun bi xwe soz didin xwe û dibêjin ku, "em di eniyên cuda de ji tekoşînê re amade ne." Ev tiştên baş in, lê zimanê rastiyan weke gotina min e. Ger ji we zilamên yeman derbikevin emê misoger li çepikan bidin. Em hesûd nînin. Ez hîna li dûv lêgerîna mezinahiyan im. Misoger nexweşiya min a xwe xistina şûna yê herî mezin nîne. Ger xwedê be jî ez derdikevim lêgerîna mezinahiyan. Li gerdûnê, di hucreyan de hetanî atoman di her tiştî de digerim. Vaye em evqas lêkolînêr in. Weke ku gelek kes dikin, bi xwe çewisandinê em nabêjin "kesê ji min mezintir nîne." Îdeolojiya "ji min mezintir nîne" çavreşî ye. Rebeniya bi şêweyê "ez ne tu tiştek im" jî rewşa vî ya berovajî ye. Bêguman em ne wisa ne.

Hun dibînin ku, zimanê rastiyan hindekî dibe zimanê jiyanê û zimanê şoreşê.

Bûyîna rastiyan a zimanê şoreşê mijara gotinê ye. Ger hun jî li ser şiyarbin, hun dikarin hindekî din baş bibin. Weke din cihgirtina di bûyera PKKê de, pê re meşîn, jiyîn gelekî zor e. Ev vê yekê ji bo her kesî dibêjim. Wisa hosteyên PKKê nînin. Hemû yek in. Ên kevin jî, yên nû jî hemû weke zarokan in. Ez jî di nav de em hemû encax dikarin bibin xwendevanên vê dibistanê. Ger kesekî baş bixwîne û jiyanî bike hebe, dikare erjeng dijminahiyê, kirêtiyê, xirabiyê tune bike. Bi wê wateyê ku, gelek hîna di

rewşa xuşînê de ne, hîna dixebitin ku ABCyê hîn bibin. Lê rewşa heyî dîsa jî hînbûyînek e. Zêdetir li ser hişyarbin, zêdetir hîn bibin û zêdetir pêk bînin. Xwedî terbiye bin, qet nebe hedê xwe bizanin û xwe weke cahilên kor nesepînin. Kêm hîn bibin, cewherî hîn bibin û bikin, ev yek jî tê pejirandin.

Weke din em dikarin li dij dijmin çi bikin?

Vaye em hindek tiştan dikin. Rexmî ku qada me gelekî teng e, em hîna jî van hewlan raber dikin. Em weke we nabêjin, "cihê me teng e em nikarin bilêyîzin." Em di cihekî pir teng de jî pir xweş dilêyîzin. Bi qandî ku bala hemû cîhanê bikşîne, di me de lîstika siyasî ya mezin û lîstika leşkerî ya mezin bi pêş ket. Rexmî ku cihê we fireh e, hun nizanine bilêyîzin. Ez tu caran negihiştim çiyayên azadiyê, lê dema ku ez bigihêmê jî, ez bawerim ezê di cihekî ji yê we tengtir de û di demeke ji ya we kurtir de, karên mezin bi ser bixime.

Lewra heval diçin welat, û ji bo şorbeyekê xwe didine qedîn. Bi fêrbûnekê û kevneşopiyeke kor ve dizeliqin û xwe diqedînin. Ev yek çawaniya wan eşkere dike, baş jiyîna wan naderbirîne. Na, diyar dike ku evdalekî kor bi xwe ye. Wateya xwe nedaye, şêwaza xwe negirtiye û çiqasiya evdaliya xwe peyitandiye, ewqas. Rexmî evqas hînkirinê, tu tiştekî fêm nake, ma tolazên wisa dikarin kê bixapînin, kê bidin bawerkirin!

Erê, rastiya me ya serokatiyê, rastiya me ya tekoşînê û rastiya me ya berhemê wisa ye. Ya ku ji destên me tê ev e. Tu kesî qet tu tiştek neda me ku, bikaribe ji me zêdetir bixwaze. Hun wisa, we tu tişt neda ku hetanî hun bikaribin hindek tiştan bixwazin. Me hindek tişt li hev anîn, dîtin û em wê jî didine we. Ya ji destên me tê ev e. Hun nikarine ji hindek cihên din bigrin û hun nikarine bi xwe jî avabikin. Lewma divê hun ji vê yekê re jî bibêjin, "hezar şûkir."

Radestî nîne, di serhildanê de şikestin û weşîn nîne! Hindek kes çiqas radest bibin jî, çiqas biweşin jî, bi giştî dimeşe. Derbasbûna meşê ya gel û bandorkariya wê pir kêm didome. Pêşeng bi zorê bin jî dîsa ji piyan in. Ev bûyer di dîroka me de yekem care ku em dikarin jê re bibêjin meşa

azadiyê û şerê azadiyê. Çalakiyeke mezin e. Emê vê yekê hîna jî bi hişyarî bimeşînin. Ez daxwaz dikim ku hun weke fermandarên baş beşdar bibin, daxwaz dikim hun weke şerwanên yeman beşdar bibin. Ji bo vê me jî gelek tişt dan û bi rastî jî bi qandî ku tu kes nikaribe bi kar bîne me amrazên teknîkî ji asta wan bilindtir bi kar anî, heta ji berovajiya wê ve bi kar anî û ji bo ku heval bikaribin hindek tiştan jê bigrin em bi ser de çûn. Di van şertan de û di vê çerçoveyê de ji vê zêdetir dayîn ne gengaz e. Ger hun bizanibin bigrin, esas her tişt heye. Kesê ku bixwaze peyamê bigre, çi bixwaze dikare di nav de bibîne.

Ji aliyê me ve ya pêwîst kir, emê encamên wê bibînin, ger temenê me têr bike misoger dê ji encaman re bersiveke me jî hebe.

Dema em wisa ketin nava pêngaveke mezin, bêguman em naxwazin xwe bişkînin û birijînin. Em naxwazin weke wesayiteke frêna wê teqyaye, li hindek cihan biqelibin û hûr hûr parçe bibin. Em li hember jirêderxistinan jî hişyar in û em çiqas lêzê bi dest bixin jî, em dixwazin dîsa pêşbirkê zexm bidin meşandin. Ev jî şiyariyeke girîng pêwîst dike. Vaye şêwaza me ev e, him bi zexmî bersiv dayîn, him zexm temsîlkirin û him jî dema bi lezgînî dimeşin, bêyî ku biqelibe zanîna bi rê ve çûyînê ye. Gelo ma ya we jî wisa ye?

Lez li ku ye? Ma lêdan an jî lênedanê ferx dike? Ma dibîne ku çiqas dişkîne û dirijîne? Ev pirseke wisa ye divê em her dem bikaribin ji xwe bikin. Hindek nikarine bi qandî kerekî jî xwe lez bin. Dema hindek kes dimeşin, li der û dora xwe tu tiştî nahêlin her tiştî dişkînin û dirûxînin. Lewra şoreşa me, meşeke pir hişyar ferz dike. Leza wê li gor xwe ye. Lezeke ku ne dijmin dikare bigihê, ne jî bixwe xwe dişkîne.

Bêguman ev hemû di xizmetên me de peyda ne û em jî dixwazin vê yekê temsîl bikin. An jî ma zora me li me heye? Na şêwaz bi xwe vê yekê difermîne. Ger hun wisa ne, hun dikarin bi saxlemî keştiyê bigihînin lîmanê. Berovajiya vê yekê dê biqulibe û hunê di gêrekê de bifetisin. Vaye hun hindekî wisa ne.

Bêguman mirov li ber ev rewşa we dikeve. Mirov ji rewşa we êş û jan dikişîne, ji ber mirinên we yên zû, ji ber şehadetên we, ji ber girtinên we, heta ya herî girîng di nava refan de ji girtîmayîna we û ji ber neafirandina we ya nirxan. Lewra tu têkîliya ev şêwaza we bi şêwaza me re nîne. Şêwaza me lez e, bi rastî jî bar dikşîne û digihîne lîmanê.

Ciwan û kesên newestiyan e; ger hun ferasetê rast bigrin û helwesta xwe rast bizanibin, ma kî dikare we bigre? Ger hun bibêjin, "a rast ev e" û hun rikdar bin û hun di vê de jî tam xwedî hesab bin, tu kes nikare asteng bike ku hun bi teşeyeke zexm barê xwe bigihînin lîmanê û bêyî ku hun bişkînin û birûxînin, bikaribin bi dewlemendiyên mezin ve bigihînin armancê.

Vaye ev derfet di destên we de ye. Bêguman ne barekî kêm e. Barê azadiya netewî, azadî û wekheviyê, barekî bi nirxa zêr e. Hun dê wê bi zexmî bigihînin lîmanê. Hun dê ala serkeftinê bilind bikin û li bin wê bicivin. Xwediyên vê karwanê kesên wisa ne. Gelo ma hun jî di ferxa vê yekê de ne? Ma we hetanî niha pirsên wisa ji xwe kirine? Ma li gor vê yekê we xwe rêkûpêk kiriye, hun bi rê ve çûne, we rêxistinî û pêşengî kiriye? Divê hun her dem van pirsan ji xwe bikin. Wane wisa tên girtin.

Pir eşkere vekiriye ku, ev kerwan bi zimandirêjiyê, bi demogojiyê û bi pêvçûyîna rast-çep ve nameşe. Ger hun xwedî niyetên baş bin jî, kesên ku bixwazibin kerwanê ji rê derbixin û bi vekirina kunan re avê berdin nava keştiyê kêm nînin. Ma hun wan dibînin û dikarin hêza rawestandinê raber bikin? Serkerwanekî hişmend, kaptanekî hişmend divê van hemûyan bihizire û ya pêwîst bike. Yan jî zehmet e, dê kerwan bitirse, fîncan li hev bikevin û dê bişkên. Divê hun misoger van bi kûrahî fêm bikin.

Ji ev kerwanê barê dewlemendiyên mezin re pêşengiyê bikin, rêberiyê bikin û saxlem bigihînin armancê…!

Di hindek kesan de qet azweriya jiyanê nîne, hindek jî gelekî ketî ne. Li gor min di van her du rewşan de jî azweriyên jiyanê yên nepêşketî mijara gotinê ne. Em bêeman bi ser her duyan de jî diçin. Em ji yekî re dibêjin, "tuyê werî jiyanê", em ji yê din re jî dibêjin, "tuyê dev ji

jiyana ketî berdî” serokatî di vê mijarê de tevgera du kifşên mezin e. Me niha ev yek li ser Kurdistanê sepand.

Bi hemû hêza xwe hunê vekişin jiyanê!

Hunê hemû jiyanên şaş û ketî berdin!

Vaye du ferman an jî perspektîfên mezin, du bang. Hun çawa fêm dikin, wisa fêm bikin, serokatî ev e.

Jiyana rast û banga şer a pêşdîtî heye. Jiyaneke hatiye mehkumkirin heye. Ger hun vê destnîşan nekin, hunê bibin xirbe. Di vê rewşê de nebêjin ku, “nizane, nabîne.”

Serokatî rastiyek e.

Şurekî mezin e.

Destê mezin ê dirêjbûnê ye.

Çavên mezin ê dîtinê ye.

Yanî ew tiştê tu jê re dibêjî dil, tu dibêjî teşe dê were bi hemû ziraviyên wê ve bibîne û jê bike bigre.

Li gor we gavavêtinên mezin min çima avêtin e? Weke tê dîtin gelek sepandinên ku min bifetisînin hene. Pergal, rengdayînên wê yên hundirê me, heta gelek kesên we yên xwedî niyetên baş çawa dixwazin min bifetisînin?

Emperyalîzm dibêje, “tu terorîst î” me fêm kir. Hikmê vê jixwe diyar e. Dirûşma hevpar a provakatoran qaşo wiha bû, “jiyan ji me dizî.” Dixwastin fêrbûyînên xwe û astên xwe biparêzin. Ên din xwe çawa disepînin?

Hun dixwazin bibêjin, “zêde jiyaneke min a xwedî wate nîne”, “te em ziwa kirin!” Ev yek jî ji emperyalîzmê re, ji mêtîngeriyê re û ji provakator û paşverûtiyê re dibe zemîn.

Her dem azadî, destpêkê mîna xeyalekê ye. Hêvî ye. Belkî ji ber ku we ev yek zêde di hundirê goşt û hestiyên xwe de bi cih nekiriye, hun nikarine xwe tevlî bikine. Lewra ger di sîniya zêrîn de jî were pêşkeşkirin, zêde hun nikarin bixwin. Ji ber ku hun bi hindek tiştên dîtir têr bûne yan jî hun qebz in. Hinava we nagre. Tolhildana mezin jî, hetanî ku derê û li ser çi dibe? Belkî ger em bi ser de çûyîna tolhildanê çareser bikin, em dikarin ji we re bibin alîkar.

Mezinahiya wateya ku ez didim têkîliya mirov û israra mezin a di vê mijarê de, bingehê birina encama mezin, rêxistinê û şerkirinê ye. Bi giştî dixwaze ez vê têkîliya nû bi kerekê re yan jî bi firişteyekê re saz bikim, dixwaze bi

şeytan re saz bikim, li dûv a bêeman im, bernadim. Watedar be, veguherînêr be hetanî dawiyê şêwaza min a nirxandinê serdest e.

Mezin li têkîliyê temaşe kirin, mezin nirxandin, erzan bi dest negirtin.

Têkîliya olê tê bîra min. Ez hatibûm xaleke wisa ku, bi gotina, “xwedê li ku derê ye” ve ez şêt bibûm. Dînok bûm. “Ezê xwedayê li kû bibînim? Ma xwedê gotinek e? Ma xwedê roj e? Ezê dîn bibûma.” Encama ku olê ez gihandimê. Piştre min dît ezê dîn bibim, min dev jê berda. Ya rastir min veguherand. Dema min veguherand, ez hindekî bi hizir re mijûl bûm. Û dawiyê ez ketim rastiya sosyalîzmê.

Sosyalîzm, zêdetir bûyereke civakî ye, ya rastir hizra olî û felsefeya olî nêzî jiyanê dike. Û sosyalîzm pêhtir dibe têkçûn, tevgerî û rêxistinî.

Di şênberiya Tirkiyê de sosyalîzm tê çi wateyê? Dibe rêxistinkirina gel, rêxistinkirina kedê û rêxistinkirina netewên bindest. Ji bo ku hîna bi ser neketiye, ez çawa li ser im? Lê bi ser ve çûyîneke min a tirsnak li ser têkîliya sosyalîzmê heye. Ew jî têkîliyek e.

Ji ber ku di jiyanê de jî rasteqînêr e, di encamê de dibe hebûnên wisa û bidestxistina jiyanê. Têkîliya mezin e. Mînak rêgeza netewiyetê, ez ji berê de kesekî dahî me. Min dît ku weke navê netewiyetê DDKO, û Dev-genç ê li zimanê xwe pêçane. Min weke têkîliyekê bi dest girt û îro dîsa di nav de jiyan heye, rizgarbûn heye.

Wateyeke mezin bide têkîliya pirsgirêka netewî, bi ser de biçe û veguherîne.

Vaye têkîliya partiyê. Niha di wateya têkîliya partiyeke mîna dêwan e. PKK partiyeke çawa ye? Dîsa bi wateya mezin a têkîliya min a partiyê û bi wateya mezin a ku ez didim peyva partiyê ve girêdayî ye. Misoger di nava wê de gelek taybetmendî hene. Lê esas girêdana min a bi têkîliya partiyê re, PKKê wisa dike. Her kesî, gel jî wisa dixûşîne.

Herî dawî têkîliya şerê çekdarî ya hatiye pêşxistin, têkîliya gerîla heye. Em çawa bi ser de çûn? Lê destpêkê çek tenê di asta peyvê de bû, heta em gelekî dûrî bi karanîna çekê bûn. Lê ji ber têkîliyeke gerîla ye em bi ser de çûn. Îro

min bi xwe bersiv da sererastiya gerîla ku dijmin û cîhanê di xeyalên xwe re jî derbas nedikirin. Ji ber ku ji dijmin zêdetir berendamên me yên gerîla em vala derdixistin. Lê ew israra mezin, wate barkirina ser têkîliya mezin, di encam de raber kir ku gerîlayeke wisa bandorkar derdikeve holê.

Têkîliyeke kadro jî têkîliyeke weke vê yekê ye. Niha kûrahiyeke ku hatiye bidestxistin heye. Weke têgînê wateya ku ez li têkîliyê bar dikim, dahûrîna wê, veguherîna wê, rûxîna ya pêwîst û avakariya ya pêwîst gelekî esas e.

Ez çima evqas nirx didim jiyanê bixwe?

Ya rastir, hun çima nirx nadin?

Pîvana herî girîng a sosyalîstekî, nirxa wî ya jiyanê re û rêza wî ya jiyanê re ye. Wateya sosyalîzmê rêza ji jiyanê re ye. Heta hêsan bi dest negirtina jiyanê û hêsan nedîtina jiyanê ye. Niha ez hîna jî bawer nakim ku jiyan bi hêsanî nayê bidestxistin û nayê dîtin û ji ber vê yekê jî ez hîna bawer nakim ku hun dijîn. Ez vê weke asteke azweriyê, weke asteke şopînê û weke asteke gihînê dibînim. Lê hun dihizirin ku, bi ketûber û ji berê de hatiye jiyîn. Ya li ser we serdest jiyana hêsan e, ma ne wisa? Dibêjin a, hun cixareyekê dikişînin û bi wê têr dibin. Ger dewlemendiyeke we ya hêsan hebe, hun dikarin pê têr bibin. Ger hun bigihên qonaxeke hêz-qudretê, hun têr dibin. Hun dizanin ku we jiyan bi hêsanî bi dest xistiye, hun ji ber xwe ve û bi xwezayî gihiştine jiyanê.

Rêgeza jiyan-mirinê, bilindkirina jiyanê, azadkirina wê, rêxistinkirina wê, her şêweyê sererastkirina wê û hesta wê di we de gelekî kêm e. Li jiyanê di wateya xwe pêşvexistinê de takekesî, ma di we de gelekî ne lewaz e? Di we de asta jiyanê ya civakî, ya netewî, asta jiyanê ya hunerî, çalakî û şerî pir lewaz û pir kêm e. Ji bo min jiyan çi ye?

Ji bo min jiyan çi ye?

Ji beriya her tiştî, jiyan tevgereke di destan de hilnayê ye, azweriyek e, hezkirinek e, jiyan hestek e, rêkûpêkiyek e, jiyan rêxistin e, jiyan lîstika mezin e.

Jiyan şer e.

Ji bo we jî jiyan, kişandina cixareyeke baş, ehbapgeriyeke baş, takekesiyeke baş, kevçîkirineke baş a

şorbeyê, xewkirina xeweke baş, pereyeke baş û ji bo we jiyan jin û mêriktiyeke baş e. Jiyan zarozêç, jiyan malûmilk e. Di min de ev nînin.

Ya di we de û ya di min de her berovajî ne. Bi wê wateyê ku, wateya hun didin jiyanê, asta tevlîbûna we ya jiyanê, we gelekî girtî û statukoger dike.

Di vê wergiriyê de bi dest girtina jiyanê, bêguman ji bo min taybetmendiyeke herî girîng e û ez hîna li ser bingehê van taybetmendiyan wateyê didim jiyanê û demê wisa pêş ve dibim. Divê jiyan takekesî nebe, misoger civakî be, netewî be, mirovî be; divê jiyan were têperîn, weke azweriyekê divê bi taybet ew bendên girtî û statukoger bi perçiqandinî derbas bike, weke lehiyekê biherike û biçe.

Bi guhertinî, bi veguhertinî pir di astên awarte de jiyîn. Di rastiya Kurdistanê de, di rastiya têkîliyên Kurdan de jiyan xwe dide hîskirin ku çiqas girîng e. Ez dibêjim, "hunê tirsnak veguherin." Dema ez li rûyên we temaşe dikim, ez dibêjim ku, "guhertin û veguhertina van kêmanî bi qandî lêdana dijmin rêgeke fermankar e." Kesayetên we yên ku zêde hêviyê nadin, wisa bi tirsnakî guhertin, encax ji bo vê dijmin dibe hedef. Hedef an jî azweriyek e ku, mirov asta we ya paşverû ku nikare hêza jiyanê raber bike. Ez bêyî ku xwe kêlikekê neguherim nikarim xwe rihet bihêlim. Di jiyanê de tevgerîna mezin, bi rêgeza guhertinê re pêwendîdar e. Bêyî guhertin nikarim bijîm, bêyî veguhertin nikarim bijîm. Her roj bêguhertin û bêveguhertin nikarim bijîm.

Hun ji veguhertinê nerihet in. Guherbarî bêhtir li zora we diçe. Berovajiyê vê di min de jî bêguhertinî li zora min diçe. Li gor min kesê ku her kêlikê xwe veneguherîne rengekî, guhertinê çêneke, nikare zêde bi pêşbikeve. Li gor min divê mirov di her rojê de nûbûnekê bihewîne. Her rojê bi hewayekê, her rojê bi rengekî, her rojê bi şêweyekê, her rojê bi teşeyeke cewaz silav dayîna jiyanê, hêza guhertina mezin îfade dike. Rêgeza ku min di xwe de serdest kiriye ev e.

Şopîn û însyatîf bêeman di destên min de ye.

Afirandêrî, serbixwebûn e.

Ez ji bûyîna xwe ve hişyar im ku nebim kurekî baş ê bavê xwe û nebim lawekî li gor sepandinên kevneşopiyan. Heta divê kurên wisa nebin.

Di deh saliya xwe de dirûşmeke ku min ji xwe re bilind kiribû jî ev bû. Min li hember dayîka xwe jî ev got, “ tu caran ezê nebim kurê tê xwastin!” min got, “ezê tu caran nebim kurekî ku tu dixwazî.” Ma tuyê çawa bî? Bêguman, vê çalakiya min a afirandêr diyar dike.

Taybetmendiyên min ên girîng, hêzkar û encamgir hene. Ya herî girîng jî şêwaz. Bi zexmî xwe derxistina min a ji serdeman, nêzîkatiya min, ziraviyên min, azîneyên min, tekoşîna min, şerê min û pêvçûna min çawa pêş ve diçû? Taybetmendiyên ku min bi pêş ve dibin, bi min gavavêtinan didin kirin çi ne?

Semîr jî digot, “belkî bi ser min de neyê.” Heta ma Ferhat bi çi dilîst? Ger bala we li ser be, dibêje, “ma dê bibe kujyarê bira yan na?” li gor ku ev gotin ji devê xwe derxistiye, feraseta xwe disepîne. Ezê bi navê birayekî gelek tiştan bikim, lê ma serokatî dikare bibe kujyarê bira? Yanî hizra “ezê ewqas nebesiyan raber bikim ku, ezê ewqas di peywirên giran de kêmaniyan raber bikim ku, tawana min çiqas giran dibe bila bibe ka dê serokatî çi bike?” pir dijwar jiyaye.

Yanî ez rêhevalê wî me. Çiqas di nava kêmaniyan de be jî rêhal e. Vaye weke “wisa nikare lê bide, wisa nikare bi darve bike”, hindek lêxweşkirin hene. Em hindek navên din bînin ber çavan. Ew provakatorên navdar: Şener, Cemalê Kor û Terzî bi bîr bînin. Bi qandî ku ji dil ve lê bidin tevgerê dixin nava rewşekê, lê dibêjin, “nikare bi ser me de were yan jî nikare me bi darve bike yan jî nikare çareya vê bibîne”, ne wisa? Tên wê xalê jî û gelekî jî jixwe ewle ne.

Terzî Cemal dibêje: “wateya başûrê rojava ez im. Ji çavderxistina min, ji çavderxistina wê derê ye û ev jî pir giran e.” Cemalê Kor jî vê yekê ji bo Botanê dibêje: “wateya Botanê ez im, nikare Botanê ji çavan derbixe.” Ferhat dibêje, “wateya başur ez im, nikare başur ji çav derbixe, her wiha nikare min ji çavan derbixe.” Wisa gelek lêanîn mijara gotinê ne. Şener jixwe di girtîgehê de ye. Xwedî mîrateke

mezin a zindanê ye. Dibêje, “wateya zindanê ez im. Min ev yek pêkaniye, nikare min têperîne.”

Dogu Perîncek, hêza lêdanêriya çepgir a fermandariya giştiye, pêhtir rêberê çepgirên tasfiyekar e, kesayetekî ji aliyê pergalê ve bûye rêber. Bêguman, her kes bi wî dişêwire yan jî şêwaza wî ew e. Temam, ji çepgiriyê ve rast dikare rêkûpêkiyê jî bike. Min weke îfadeya herî çepgir a tevahiya komûnîzmê pênase dike. Heta qada navnetewî jî, bi bandora dewleta Tirk ve hindekî girêdide. Vaye Kûba, Çîn an jî Qorê, ev hemû li ser çepgiriya Tirkan a tasfiyekar in. Di kesayeta wan hemûyan de yên me jî bandor dike, bi taybet ên di zindanê de. Bi vê şêweyê dibêje, “nikare me têperîne.” Dogu, di wê mijarê de gelekî şênber e û bi vê yekê ewle ye.

Ev hemû li pêşiya min weke bendavekê ne û weke vê di nava rêxistinê de pir zêde hene. Ev li ber çavan ji serokatiyê re dilêyîzin. Lê her rêber bi kêmanî li ser gelek zemînan xwedî bandorkariye. Semîr her digot, “ji çara sê em in.” Şener di zindanê de dibêje, “emê kongreya 4. damalin,” Semîr dibêje, “kongreya 2. a me ye.” Fatmayê jî dihiziriya ku dê bi tevahî li ser kongreya 3. serdest be. Û ji ber vê sedemê gelek fermandarên eyaletan ji ber eyalatan ve me berpirsyar digirtin.

Bêguman serokatî hindekî ji van hemûyan re dibe bersiv. Aliyê vê yê herî balkêş jî, lîstina van a bi taybetmendiyên bingeh ên mirovan e. Tenê bi rastiyan siyasî-leşkerî nalêyîzin. Li ser derûnî û giyana mirovan ev şêwaza fetisînêr disepînin. Heta li ser ajoyan jî xwedî hesabin.

Ma hun vê yekê niha fêm dikin?

Nêzîkatiyên ku min vedigerînin dojehê çawan in?

Mesela Cemalê Kor dibêje, “bi nazdarî kuştina serokatiyê.” Derûniya kuştinê çi ye? Dibêje, “em nadin pêkanîn, bi pêşve nabin û nahêlin serkeftî be. Ev kuştina nazdarî ye û em vê yekê dikin.” Yê din gerîla dibire. Selîm, xwe avêtiye aliyekî. Bêguman Şener tifingê biçûk dibîne, lê ji aliyê din ve mîrateke mezin a berxwedanê bidest xistiye û dixwaze bi demogojiyeke bêeman bi rê ve bibe. Bêguman, ger bi navê rêhevaliyê asta paşverûtiya we çi be, hun jî

ewqas nirxan li xwe tînin. Hun jî di nava hewaya, “nikare li me bide, nikare ji me re xeberan bike” de ne.

Lewra zarokatiya min bi bîr bînin, ez çawa qiyametê radikim? Ger hun hindekî xwedî rêz bin. Min çawa serhildanek li hember birayê xwe, li hember bavê xwe, li hember gundê xwe û piştre gav bi gav çawa bi pêş xist?

Ev serhildêr e.

Bêguman pir zexm bi destgirtina mirovan jî ne rast e. Mirov bi qelsiyan ve barkirî ye. Lê balkêşiya şoreşê di vê derê de ye: tevgera vejînker a mirovan e. Mirovê lewaz an dikuje yan jî vedijenîne. Li gor serdemê jî û li gor şêwazê jî ev yek wisa ye. İsrara min a li ser we jî ji ber vê yekê ye. Yan ma ezê ji bo çî evqas bi we re mijul bibim?

Ya ku dixwazin bi pêş bixin, karên sepandinên li ser serokatiyê û li ser paşvexistina wî ye. Yanî li gor we bi paşvexistina min ve dikarin kîjan karan bi pêş bixin?

Di hindekan de jî qet azweriya jiyanê nîne, hindek gelekî ketîne. Li gor min di van her du rewşan de jî azweriyên jiyanê yên bi pêş neketine hene.

Min 1982’an de Şiyar dîtibû. Zarokekî baş bû. Yek ji ciwan serekê yê xwedî hezkirina me bû. Lê dema ku di 1985-86’an de provakatorê yekem pê lîst hindekî xirab bû. Dîsa provakatorê duyem di 1990’an de hindekî pê lîst. Tam xirab nebû, lê kete rewşeke hejînêr û antîpatîk. Ez gelekî li ser rawestiya bûm, min hewleke mezin raber kiribû. Heta bi rexnekirina Fuat ve min gotibû, “eman hun lewaziyên wî nîşan nedin” û wî jî gotibû min fêm kiriye. Bi mehan me ew perwerde dikir. Ger ew şehadeta bêtalih nebûya, dikarîbû gelekî bihêz be. Lê weke ku min gotiye, li ser bingehê pirsgirêkan hindekî hejiya bû.

Dixwast min fêm bike. Dixwast di vê mijarê de hindekî xwe bihêz bike, lê tengezar bû. Ew jî wisa bû û Baran (doxtor) jî wisa bû.

Esas li ser serdema dawî ya Baran li gel hebûna hindek rexneyan, a ku min fêmkiriye girêdaneke balkêş a Baran hebû. Ger bijiya, dê hêza girêdanê raber kiriba. Ger neyîniyeke wî hebû jî, (ku hindekî wê ew bir vê rewşê) encama nekarîna têperandina vê bû. Lê girêdaneke

nebawerkar jî raber dikir. Lê di ev girêdana nebawerkar de qelsiyên kûr veşartîne. Dixwast em qelsiyên xwe bi girêdanê ve binuximîne.

Ya ku dixwazim bibêjim, bi ser de çûyîna me ya ser Dêrsimê de, ku dema yekem car em gihiştin wê derê me civîna xwe ya jinan çêkiribû. Civîna ku hatiye çêkirin hîna di bîra min de ye, me xwast em hindek keçan re jî pêwendiyan ava bikin. Li Elezîzê heta li gelek cihan, hema di hemû qadan de dawiya gelekan jandar bû. Sosret! Min çima wisa kiriye? Di min de wisa xwe dirêjkirin û rê li ber encamên jandarî vekirin. Niha hun jî rêwiyê wê riyê ne û ez bawerim hunê bi derxistina waneyên girîng ve bimeşin. Rewşa jandar a Saîme Aşkin hebû. Nurhayat Demîrtaş hebû, piştre me bihîst çûye cem polîsekî.

Erê, yek ji qurbanên balkêş ên şerê taybet bû. Hetanî wê demê keçeke xwedî hêz bû. Bêguman wê demê ez jî paşvemayî bûm, hêza min gelekî sînordar bû. Vaye belayên ku bi serê Fuat de hatine jî hene. Kiymet, Seher û yên weke wan bi serê xwe rastiyek diderbirandin. Bêguman di nava wan de Fatma keseke herî balkêş bû. Min eşkere diyar kir ku, di dîrokê de çi îfade dike. Ji yekem şehîdên me Rahîme hebû, Rahîme Kahraman. Yek ji wan keçan bû ku em bi zêdeyî li ser dirawestiyan. Ev heval jî, ji yekem şehîdên me ne. Li Botanê ya şehîdê duyem an jî yê sêyem e. Dîsa min behsa wê kiribû, dema şehîd ket gel digot, “firiya asîmanan.” Pîrozandineke wisa lêkirin. Şehîd Rûken jî wisa ji şehîdên yekemîn e. Keçên bi Şiyar re hatine, dijmin wisa pir bi hovane bedenên wan ji bo teşhîrê bi kar anî. Ev hemû bêsedem nînin. Weke vê bi gelek şehîdên nirxdar ve, çîrok cewaz e.

## Paşgotin

Fêmkirin baş e.

Fêmkirin, ji bo jiyanê destpêk e.

Hebûna civakî, encax bi fêmkirina rastiya civakî ve dikare were destpêkirin û jiyandin. Di vê mijarê de gelek pêmenîtî û bêzanebûn tê jiyîn. Em dixwazin wê sererast bikin.

Ya şerm, weke ku qet tu tiştek nîne, xwe bêberpirsyarî û bêçareserî hiştin e.

Ya rast, bi qandî xwe xilaskirina ji hemû şerman, dahurandin û fêmkirina rastiyan, bi azweriyeke mezin hêz anîna ji veguherînê yê re ye.

Ev, di me de tê wateya ji girêkora jiyanê derbasbûna çareseriyê ye. Di jiyana civakî de jî pêşveçûyîn e.

Em dikarin gelekî dewlemend li jiyanê temaşe bikin.

Em dikarin jiyanî di hemû eniyan de, pir alî û netêkçûyînêr bikin.

Di pratîka xwe de min xwast ez hindekî vê yekê raber bikim. Di jiyana xwe ya pratîkî de hindekî dahurandina min a vê yekê, bi lewaziyên xwe ve bi sebir û pêşdîtineke mezin pêkanîna min a riyên bihêzkirinê ji bo gelekî başiya min a herî mezin bû.

Ger kesên din nêcibînin jî ez dibêjim, "vaye meydan!" bila keremkin bixwe bikin.

Vaye li hember dijmin jiyan eşkere ye! Bila ji min baştir serkeftîbin, dixwazin bila min biperçiqînin, dixwazin bila min weke xizmetkarekî ji rêzê bidin şixulandin. Ez ji hemûyan re amade me.

Lê min carekê temaşe kir ku, tu kes xwedî li van karan dernakeve.

Bêguman ji ber ku ez hindekî bi gel ve girêdayî me, ji ber ku ez naxwazim wisa xwe weke ketiyekî jiyanê binirxînim, min rê lê vekir ku ev pêşveçûyîn bigihê asta şer.

Ev yek her dem bi gel re çêbû. Her dem bi hevalên di rewşa herî zor û herî paşve de çêbû. Min ji vê re jî hişyariyeke mezin raber kir.

Encama ku divê hun derbixin; hun dikarin a zêdetir bikin.

Dev ji jiyanê bernedin.

Bi azweriyeke mezin ve xwe li jiyanê bipêçiné

---